# ŞOREŞA CIVAKÎ Û JIYANA NÛ

**ABDULLAH OCALAN**

**Jİ TİRKÎ WERGER: CÎHAN D.PALANDOKEN**

**Weşanên Komîteya Ziman û Perwerde**

**ŞOREŞA CIVAKÎ Û JIYANA NÛ**

**ABDULLAH OCALAN**

**Weşanên Komîteya Ziman û Perwerde**

**Çapa Yekemîn:**

**Çapxaneya Azadî - 2009**

**Çapa Duyemîn:**

**Weşanxana Şilêr - Qamişlo 2017**

**Mîzanpaj û Bergê Pirtûkê: Rêvan Mehmûd**

**Jİ TİRKÎ WERGER: CÎHAN D.PALANDOKEN**

**weshanashiler@gmail.com**

**weje.vejin@gmail.com**

## Pênase

Ev pirtûka Rêber Apo ya Tirkî bi navê “Sosyal Devrim ve Yeni Yaşam” di seretayî de hêjayî wergerê hate dîtin. Di nava van derfetên zehmet de, bi hewldaneke pênc mehan ev pirtûk hate wergerandin. Pirtûkeke Rêber Apo ya wiha wergerandina zimanê Kurdî ji bo me kêfxweşî û coşeke mezin dide.

Ev xebat ji aliyê min ve cara yekem tê pêşxistin. Ji ber wê jî dibe ku di rêziman û hevoksaziyê de kêmasî çêbûbin. Hem ji bo xebatên me yê dema pêş, hem jî di çapa duyem a vê pirtûkê de ji me re bibe alîkar, dema di xwendinê de, heval di derbarê kêmasiyan de rexne û nêrînên xwe ragihînin, emê pê kêfxweş bibin.

Ez hêvîdarim ku bi vê xebatê me, mafê rûmeta vê pirtûkê dabe.

**Slav û Rêz**

**Cîhan D.PALANDOKEN**

**2007-05-27**

# NAVEROK


PÊNASE........................................................................................ 3
PÊŞGOTIN ..................................................................................... 8
ŞOREŞA ME ŞOREŞA AFIRANDINA HEZKIRINÊ YE ......................... 15
PKK Ji Bo Civakbûna Azad Tevgera Rêvekirinê Ye .................................. 20
Malbatgerî Pewîste Li Ser Hîmê Rêgeza Azadiyê Were Çareserkirin ........ 30
Bêhezkirinî Dijberiya Şoreşgerî û Jiyanê Ye ............................................. 38
Hezkirinên Me Qasî Ku Piştgiriyê Bidin Rizgariya Gelê Me Xwedî Nirx in
...................................................................................................... 53
QEZENCKIRINA JINÊ QEZENCKIRINA JIYANÊ YE............................ 62
Pêşxistina Jinê Tolhildana Ji Koletiyê Ye.................................................. 74
Sosyalîzm Hilweşandina Hendefên Di Navbera Zayendan û Newekheviyê
Ye ................................................................................................ 86
DAHURANDINA JIN Û MALBATÊ AHURANDINA JIYANÊ YE ....... 95
Em Şoreşa Civakî Ji Bo Bikaribin Hez Bikin û Bigihên Jiyana Pîroz
Pêktînin ...................................................................................... 100
PKK ZEMÎNEKE TEKOŞÎNÊ YE KU TÊ DE AZADÎYA JINÊ HERÎ
BAŞ WERE PÊKANÎN E..................................................................... 111
Kesayetên Ku Li Xeyalên Xwe Yên Zarokatiyê Xiyanet Nekirine Kesayetên
Bihêz in ...................................................................................... 122
ISRARKIRINA DI XELETÎYÊ DE, DI JÎYÎNA KOLETÎYÊ DE ISRAR E
...................................................................................................... 141
EVÎN LÊGERÎNA AZADIYÊ YE ......................................................... 151
Ji Bo Hatina Hezkirin û Hezjêkirinê Bûyîna Xwedî Hêz Pêwîst E ........... 155
Nefirotina Min A Giyana Xwe Parastina Min A Rewa Ye........................ 160
Ji Bo Riya Hezkirinê Vebikin Pêwîste Hun Jina Azad Biafrînin .............. 167
Şoreş Hunera Ravekirina Yê Nû Ye ....................................................... 176

RIZGARÎYA JINÊ DÊ BI NIRXÊN DEMOKRATÎK ÊN WEKHEVÎ Û AZADÎYÊ VE PÊŞBI-KEVE ........ 181
YEKÎTÎYA KU DI PKK’Ê DE PÊK TÊ EVÎNA HERÎ MEZİN E ........ 195
Ji Bo Têkîlîya Azad Şernekirin Li Azadîyê Xiyanet E ........ 201
Min Di Bûyera Jinê De Wekhevîyeke Mezin û Şerekî Azadîyê Meşand .. 209
Evîn Karekî Hêjayî Egîdan E ........ 218
Azadbûna Civakê Bi Azadbûna Jinê Ve Gengaz E ........ 224
DAYÎKA UWEYŞ ZAYENDÊREKE NEZAN A SERHILDANEKÊ YE ........ 231
Mafê Dayikê Bi Tenê Bi Tekoşîneke Dijwar Ve Tê Dayîn ........ 237
RASTÎYA RÊBERTÎYÊ RASTÎYA DAHÛRANDINA MALBATÊ YE 245
PÊWÎSTE MIROV BI GIRÊDANÎYA XWEŞIKBÛNÊ BI AZADÎYÊ RE BAWER BIKE Û ŞERÊ WÊ YÊ DIJWAR BIDE ........ 253
Çîroka Mın Çîroka Herkesekî Ye ........ 255
Hesta Herî Baş A Ku Mirovek Nîşanî Mirovekî Bide Hesta Xweşikbûn û Jiyanê Ye ........ 278
ŞERÊ RÊBERTÎYÊ ŞERÊ TÊKÎLÎYÊN AZAD IN ........ 291
Li Gel Min Bi Cewherê Jinê Re JÎyaneke Xwedî Ast Pêşxistin Azweriyek E ........ 300
HER CÎHEKÎ KU JIN LÊ YE, ÇAVKANÎYA JÎYANÊ YE ........ 309
Tu Wateyekî Jiyaneke Ku Tekoşîna Wê Nayê Dayîn Nîne ........ 317
MÎLÎTANÎYA PÊKHATÎ YA JINÊ NIRXÊ HERÎ PÊŞKETÎ YA ŞOREŞÊ YE ........ 329
Hezkirina Di Rastiya Rêbertiyê De Meşa Serkeftinê Ye ........ 334
AZADÎ Û BEDEWÎ BI TEKOŞÎNA JINÊ VE TÊ AFIRANDIN ........ 345
Ji Bo Pirsa “Çawa Bijîn” Bersiva Rast Em Didin ........ 351
BEDEWÎ BI XWE AZADÎ YE ........ 359
Kesayeta Zîlan Navê Yekgirtina Serkeftin û Evînê Ye ........ 369
Cewherê Tekoşîna Me, Derxistina Rastê Ya Nasnameya Jinê Ye ........ 374

DIVÊ EM BI ŞERVANÊN AZADÎYÊ RE JI NÛ VE JIYANÊ BIAFIRÎNIN ........ 379
Bi Tenê Zilamê Ku Di Her Xalê De Serkeftin Bi Dest Xistiye Tê Hezkirin ........ 385
ZÎLAN HEVPEYMANEKE MEZIN E ........ 393
Zîlan Zagona Hezkirinê Ye, Nirxeke Herî Cidî Fêm Dike û Dijî Ye ........ 399
Zîlan Manîfestoya Me Ya Jiyanê Ye ........ 412
GER BERSIVA JINÊ BI XWE NEBE, PÊKHATINA JÎYANA AZAD NE GENGAZ E ........ 419
Rêbertî, Rêbertiya Hev Afirînê Ya Beramberî Ye ........ 425
HÊZDAYÎNA JINÊ PÊWÎSTIYEKE SOSYALÎZMÊ YE ........ 437
Şoreşa Civakîbûnê Li Derûdora Çalakiya Jinê Pêş Dikeve ........ 441
Jiyana Rast Li Ser Bingehê Bihevrebûna Herdu Zayendan Ve Çêdibe ........ 445
Emê Bi Şoreşa Mezopotamyayê Ve Jinê Ji Nû Ve Jîndar Bikin ........ 457
BÎRDOZÎYA RIZGARÎYA JINÊ BÎRDOZÎYEKE CIVAKÎ YE ........ 461
Tenê Ne Ji Zilam Emê Qutbûnê Ji Hemû Kirêtiyên Pergalê Pêk Bînin ........ 465
Kuştina Zilamê Klasîk Felsefe û Bîrdoziya Min E ........ 468
Jina Ku Xwe Rêxistin Kiriye Zilamekî Ku Nikaribe Bîne Rê Nîne ........ 472
Divê Jiyan Li Ser Bingehê Bîrdoziya Rizgariya Jin Were Pêşxistin ........ 477

## PÊŞGOTIN

Serdema şaristaniya demokratîk bi qasî ku ji nû ve zayîna gelan e, ji wê hîn diyarkertir jî, serdema ji nû ve zayîna jinan e. Ew jina ku, hêza xwedawend a afirandêra civaka neolîtîkê ye, ji dîroka civaka çînî pê ve her dem bi wendabûnê ve rûbirûyê hev maye. Di wateyekê de dîrok, li gel civaka çînî ku bilindbûyînekê de bû û hêz bi dest dixist, dîroka zilamê serdest e. Karekterê çînî yê serdest bi karekterê zilam ê serdest re ava dibe. Di vir de jî, rêpîvana ku derbas dibe derewên mîtolojîk û cezakirinên derûnî ne. Di bin vê de jî, dijwariyeke çors ê pêşçav û rastiya dagirkeriyê heye. Karekterê zilamê serdest ê di civakê de, derfet nedaye ku heta roja me rastiya jinê bi zanistî were nirxandin. Mijara jinê ji olê zêdetir weke qadeke tabûyan hatiye hesibandin. Di rastiyê de, di bin navê namusê de ew rastî û mafê jinê ku zilam bi hîleyan xayînî û bi dijwariyê bi dest xistiye tê veşartin. Di dîrokê de heta niha, jin ku ji nasname û kesayeta xwe dûr hatiye hiştin û her dem di destê zilam de dîl hatiye girtin, rastiyeke ku ji çînayetiyê zêdetir rê li ber encamên neyênî vekiriye. Dîl girtina jinê ji bo koletî û ketina giştî, pîvanek e. Ji bo derew, dizî û zordestiya ku di civakê de belav bûye pîvanek e. Ji bo her cureyê qirêjî û nokeriyê pîvanek e.

Berovajîkirina vê dîrokê dê bi xwe re encamên civakî yê herî kûr bîne. Ji nû ve zayîna jinê ya bi rengekî azad, di hemû binesazî û jor-saziyên civakê de dê azadiyeke giştî, ronakbîrî û dadê ava bike. Wê bide bawerkirin ku, şûna şer aştî hîna xwedî rûmet e û pêwîste were pîrozkirin. Jina ku qezenc dike, tê wateya ku di her astî de civak û kesayeta ku qezenc dike. Ev çarçoveya kurt jî diyar dike ku demokratîkbûna di qada maf û azadiya jinê de çiqasî dîrokî ye. Di vê wateyê de, di sedsala 21. de destpêkirina serdema jinê ya ku şiyar dibe azad dibe û bihêz dibe rastiyeke ku ji rizgariya çînî û netewî hîn zêdetir xwedî nirx e. Dema şaristaniya demokratîk wê bibe serdema ku jin ji her demê zêdetir bilind dibe...

Di serhildana demokratîk a Rojhilat a Navîn de cihekî taybet a jinê heye. Weke hêzeke afirander a neolîtîkê, ji aliyê civaka çînayetiyê ve ew biçuk

xistina xwe tu caran bi xwe nedaye daqurtandin. Her dem li serdestiya zilam bi guman nihêriye. Ji her alî ve di zanebûna wê de ye ku, mafên wê tê xwarin. Bêçarebûna wê dihêle ku ew di nava êşên kûr de bimîne. Di wê zanebûnê de ye ku, tu caran ew layiqî wî tiştî nîne ku ketiye wê rewşê. Di rastiyê de ew bi rengekî veşartî, dizî alîgirê çanda xwedawend e. Tu caran bi rengekî cidî baweriya xwe bi xwedayên zilam neaniye. Di vê zanebûnê de ye ku her dem di nava valahiyekê de ye. Ew hezkirin û rêzdariya ku heq kiriye, bi êş û bi hêrs hîs dike lê nayê nî-şandan. Tu caran ev qas li destê zilam nihêrînê efû nekiriye, hîna zêdetir jî xwe bi xwe efû nekiriye. Di wê zanebûnê de ye, zilam ji hezkirinê gelekî dûr e, çors e û bêsinc e. Baş dizane ew ji hêza evînê dûr e. Qurbaniya ev qas nakokiyan weke tê bawerkirin, jin nebiriye cehalet û nezaniyê, hîna nêziktirî alimtiyê kiriye. Dema ku bawer kir xwedî hezêkê ye ku girêdaniya herî xurt nîşan dide, di giştî de hemû jin bi taybetî jî jinên Rojhilat a Navîn ji ber van taybetmendiyên xwe hêza zindî û çalak a civaka demokratîk in.

Serkeftina mayinde ya civaka demokratîk bi jinê ve gengaz e. Ji neolîtîkê hetanî niha ew gel û jinên ku li hemberî civaka çînayetiyê li bin guhê erdê ketine weke xwediyê rast ên pêngava demokratîk in. Wiha hem tola xwe ji dîrokê digrin, him jî di çepê şaristaniya demokratîk ku bilind dibe de cihê xwe digrin. Antîtêza ku pêwîst e ava dikin. Bi rastî jî çûyîna ber bi civaka yeksan û azad de sparteka civakî ya herî saxlem ava dikin. Di Rojhilat a Navîn de, avakirina antîtezeke ji bo demokratîkbûnê hîn zêdetir dê bi riya jin û ciwanan ve pêk were. Şiyarbûna jinê û weke hêza rêber a civakê di dika dîrokê de cihê xwe girtin xwedî nirxeke antîtêzbûyînê ye. Cîhana jinê, zanebûn, wijdan, hezkirin û parastina wê berendamê nirxên şaristaniyê yên cihê afirandinê ye. Ji ber pêwîstiyên karakterê çînî yê şaristaniyan û pêşketina serdestiya zilam, ji vî alî ve jî jinê tîne astekî ku bibe antîtezeke xwedî hêz. Hem di têperandina cihêbûnên çînî de, hem jî bi dawîkirina bihêzkirina zilam de xwedî nirxekî antîtezbûyînê wêdetir, sentezeke nû ye. Ji ber wê jî, asta jinê ya rêbertiyê di demokratîk kirina Rojhilat a Navîn û gelemperiya cîhanê de hem di asta antîtezbûyînê de ye, hem jî asta

sentezbûna wê, bi xwe re taybetmendiyên dîrokî dide jiyîn. Li gor min ev xebatên jinê yên ku pêwîst bû, beriya xebata rizgariya welat û kedê bihata kirin, a herî zehmet bû. Jin, çîn, netew û zayenda destpêkê yê bingehîn ku ji aliyê paşverûtî û koledariyê ve hatiye perçiqandin bû. Di dîtinê de cihêbûna zayend ji bo neyeksanî û çewisandinê weke sedemekê tê nîşandan. Dema dîrok bi kûrahî were lêkolînkirin, dê were dîtin ku ji hemû aliyan ve jin qurbanê destpêkê yê serdestiya civakî û siyasî ye. Çîna destpêkê ye ku her cure neyeksanî û kolekirin li mirovahiyê tê ferzkirin. Piştî ku jin hate kolekirin û xistine rewşeke ku bibe amurekê malê ya ku hatiye kedîkirin dor hatibû civak û dewleta çînayetî were afirandin. Zilamê zalim û derewîn, piştî ku jin xist, bi wêrekiya ku ji vî tiştî wergirtiye ve xwast mirovên din û zayenda xwe jî biperçiqîne û dîl bigre. Ew pergala wan ê ponijandinê ku derewên mezin in, mîtolojî û ol afirandine. Di rastiyê de mîtolojî û olên ku gelan nêzî rastiyê dikin jî hene. Lê belê em li ser olê û mîtolojiyên ku serdest û dagirker jê derewan û zordestiyê hildiberînin diaxivin. Dema mirov li van ol û mîtolojiyan temaşe dike, jin bi hezarûyek fêlan û zordestiyê gav bi gav ji textê xwe yê xwendawendiyê yê balkêş tê daxistin, bênirx tê hiştin û herî dawiyê jî tê tunekirin. Ez bibim şervanê azadiyê û vî tiştî nebînim, ne gengaz e. Weke zarokekî azadiyê yê vê axê, ku olê xwedawenda dayik afirandiye û ji bo xwedawendên evînê yê destpêkê malevanî kiriye, min dê bixwasta mezinên me yên destpêkê û jêdera me ya azweriyê tê bigihêm, lêbikolim û sedemên hebûna wan bibînim.

Rawestîna min a li ser pirsgirêka jinê, ji pirsgirêka rûmeta kesayetî hîna wêdetir e. Bi hemû aliyan ve dijberî pêdiviyên zayendî yên ji rêzê ne. Ji bo min gihiştina zayendan a hev li ser astên ajoyên zayendî yên lawirî xistin û derxistina astekî ku bigihê dostanî û rêhevaltiyeke mezin. Ev jî weke mêrxasiyekî ji min re rastir hat, metirsiya xwe gihandina jinê, ji bo min weke tirsonekiyekê bû. Min wiha dît û ev yek derxistine zanebûnê. Zilamê serdest tirs afirandibû, ev lêyîstok di bin navê namûsê de dihate lêyîstin, dema ku dibêje, “ez ji te hez dikim” jî di cara duyem de kêr lê dixist. Neheqiya wî, mirov matmayî dihişt. Wekî zayend jin gelekî êşandibû. Fîzîk,

hizir û hestên wê tarûmar kiribû. Jin ketibû kûrahiyên ku mirovan jê bawer nedikir. Zilamê ku herî zêde ji xwe re digot, ez sosyalîst im û heta jinên bi vî rengî jî, nekarîn xwe ji lêyîstokvanbûna vê lêyîstokê xilas bikin. Ew tîbûna mezin a ji bo azadiyê, hişt ku ez xwe bidim ser vê pirsgirêkê. Min di gelek jimaran de dahûrandin, diyalog û axaftinên kûr kirin. Ne ku weke xwediyê wan, weke hunermendekî ji sekinandina wan a fîzîkî, ya xweşik heta bibin çirûskekî hizirandinê heta bigihên astekî ku bi dengê zimanê xwe çêjekê bidin ku tu tişt nikaribe vê çêjê bide, min dest li her tiştekî wan werda. Gihiştin, mezin gihiştin, lê belê xeşîm bûn. Jiyana bi lenet û efendiyê wan ên zilam li ber serê wan bûn. Ew kesên ku xwedî ezmûn û hostabûnekî ku bikaribin li hemberî wan û bi wan re şerê zayendî yên cewher bidin, jê dûr bû. Bi êş xwe ji zinaran avêtin, di agiran de şewitandin, bi bombeyan xwe parçe kirin, wan bi navê qehremaniyê her tişt kirin, lê belê bi tenê bûn. Ew zilamtiya ku li hemberî wan bû, derveyî nêzîkbûnên çors ne dixwestin dostanî û rêhevaltiya mezin a yeksanan bînin bîra xwe. Weke gulan diçelmisîn û diçûn.

Bi qasî ku ez ji dil baweriyê bi hêza xwedawendan bînim, ez gihiştime hêza rêzdarî hezkirinê. Her çiqasî bixwazin şerê min ê mezin ê jinê ji çav bixin jî, min heqê wê dayê. Hem tuyê ji bo jinekê xiyanetê li erkên herî pîroz bikî û wekî protestokar bijî, hem jî ji bo rêhevaltiya jina pîroz tiştê ku dikeve ser milên te tuyê bi cih neynî. Di serî de ji PKK’ê re û ji hemû pêwendîdaran re min nîşan da ku tu aliyekî şerê jinê ku mirov ji rêze bi dest bigre nîne. Pêwistiya naskirina cîhana xwedawend a ku hêza rastiyê û evînê ye, bi qasî xwedayê zilam ê zordest û derewîn, pêwîst e rêzdarî û hezkirin were nîşandan, min xwest vê yekê bi rêgez û cidî heta dawiyê nîşan bidim û ferz bikim.

Her çiqasî xayîn û nokerên wan derbikevin jî, ji bo van hewldanên ku ji dil tevlîbûne, ji bîrkirina wan ne gengaz e. Hele şehîdên wan weke ezîzeyê herî pîroz ê van axan û gelê me dê werin bîranîn. Ew her yek xwedî astekî xwedawendên mêrxas in. Min yekîtî û partîbûyîna yên ku mane, bi rêzdarî pêşwazî kir û alîkarî kir. Min her dem got ku pêwîste bibin parêzvanên

jiyana azad û xweşik. Min bi baweriya ku rojek dê were, ewê zilamtiya paşverû, derewîn û zordest binîne rê, hewldanên xwe min hetanî dawiyê domandin. Mirov bi tenê jina ku milkê xwe ye ve mezin nabe. Nabe zilam. Min nexwest ez bi wî rengî mezin bim û ne jî bibim zilam. Heta min bi wî rengîbûyînê weke şikandina rûmetê dît. Ez dizanim ku min ew xistine rewşeke zehmet. Dizanim ku min ew xistine rewşeke ji agir parçeyek in. Ez dizanim di nava wan de yê ku dijmintiyê û gelek neheqiyê dikin jî hene. Ez dizanim min ew bi tenê jî hiştine lê belê rastiyeke herî girîng ku ez dixwazim ew bizanibin jî ev e; pêwîste ew bi qasî ku qedera şer jî aştiyê jî diyar bikin, xwe bihêz bikin. Ger ev nebe jiyan heram e. Ger ev nebe evîn nabe. Ger ev nebe çi hesret nayên derbaskirin. “Tenêbûn û cihêbûn.” Ji bo destxistina van mezinbûnan û serdestkirina wan riya ku hewceyî derbaskirinê heye û bedelên deynên ku pêwiste werin dayîn hene. Di welatê xwedawenda dayik û xwedawendên evînê bi hêza azadiyê û yeksaniyê ku bi hezaran salin hatine wendakirin, di xebat û şerkirina ku navenda wê jin e, dê xweşikbûn û hizir ji nû ve were afirandin. Bawerî û hêviya xwe di derbarê yên ku hene bi qasî ku bikaribin hevpeymana civakî jiyanî bikin, wê bigihîne hêza cewherî tînin ziman. Misogere ku ezê bi qasî îdîayên xwe di rêhevaltiya jinê ya ku bi hezkirin û rêzdariyê ve dagirtiye berdewam bikim û hewldanên xwe weke karkerekî evînê heta dawiya nefesa xwe bidomînim. Bêgumane ku bi qasî wate bidin û pêwîst bibînin, ez yê rêhevalê jin im û her dem jî ezê bi wî rengî bimînim.

**Abdullah OCALAN**

# ŞOREŞA ME ŞOREŞA AFIRANDINA HEZKIRINÊ YE

Di roja me de pirsgirêka jin û malbatê yek ji mijarên herî girîng e. Mijareke ku li ser lêyîstok tên kirin, di derbarê wê de gelekî tê axaftin. Mijareke ku di riya wê de gelek tişt tên kirin, di rastiya Kurdan de hinek kes di rêya wê de mêrkujiyê dikin, stranan li ser distrên û govendan li ser digerînin. Di rastiya me de ev mijar ji dijmin hîna zêdetir xwedî bandoreke kujînêr e.

Beriya vê me ji bo pirsgirêka jin û malbatê zelaliyek danîbû holê. Lê belê em dixwazin vê yekê hîna zêdetir pêş bixin.

Ew rastiyên weke ronahî û tarî, germ û sar, elektron û proton, erênî û neyênî ji bo xwezayê çi be, jin û zilam jî ji bo xwezayê xwedî heman wateyê ye. Ango nêrbûn û mêbûn jî rastiyeke xwezayê ye. Lê belê ev anîna bîra xwe nîne, di derbarê rastiya xwezayê de zêde hewce nîne ku darezandin çêbibe. Em lê binêrin ev rastiya xwezayê ya gelekî şênber e, gelo li gel me dikeve çi rewşê?

Çewisandin di giştî de heyîn û rastiyê, ji heyînî û rastîbûnê derdixe. Ger gihayek derbeyeke kevir a gelekî hişk bixwe êdî ji gihabûnê derdikeve. Giha xweşik e, lê belê ji ber ku kevir gelekî hişk e, wî gihayî diperçiqîne û derbas dibe. Mirov dikare di xwezayê de bibe şahidê bûyer û pêşketinên wiha. Di civakê de jî, curên çewisandinê yên ku dişibine vê yekê hene. Ya ku pêwîste bijî, bi çewisandineke hişk ve dibe ku ji holê were rakirin. Rastiya gelê me jî hindekî vê rewşê dijî. Gelekî lewaz û ketibe vê rewşê sedema wê çi dibe bila bibe, tunebûna wê jî gengaz e. Masiyên mezin dikarin masiyên biçûk daqurtînin, mar dikarin gelek çivîkên xweşik bixine zikên xwe, tîmsah dikarin heyînên zindî bixin nava diranên xwe yên har û sosret û hema wisa daqurtînin. Piştre jî rondikên çavan birijînin. Ev jî rastiyên jiyanî ne.

Di rastî de, di xwezayê de ev pênase nehatiye kirin. Di gerdûnê de zilambûn çiqasî derbas dibe, mêbûnî çiqasî derbas dibe? Li gor min ev pirsgirêk bi qasî rastiya mirov de heye tevlîhev û bi nakokî nîne. Bi taybet pêwîste ne ji alî ve û ne jî ji dijber ve zêde encam nede. Ev pêşketinên di

civakê de ku li ser zayenda jinê bi dijberî çêdibin, ji ber taybetmendiyên wê mêbûna xwezayî zêdetir bi derbasbûna şaristaniyê û civaka çînî ve dest pê kiriye. Di pêvajoyên çewisandin, neheqî û dagirkerî ku pêşketiye de hêmanên mêbûnê weke dezawantajekê hatiye bikaranîn, bûye mijara çewisandin û dagirkeriyê. Ez di vê baweriyê de me ku ev dîtin rast e û zanistî ye. Ger ne bi vî rengî be, mêbûn bi serê xwe ne dagirkeriyê û ne jî hatina dagirkirinê, ne çewisandinê, ne jî çewisînê rave dike. Ev tişt bi rêxistinkirina civakî, ji wir jî bi pêşketina pergala çewisandin û dagirkirinê ve girêdan nirxandineke rast e. Pêşkêşkirina hindek derfetan ku taybetmendiyên mêbûnê ji bo vê dike, di vir de diyarker nîne. Mirov nikare lewaziya fîzîkî ya jinê jî weke sedemeke diyarker derbixe pêş. Berovajî, dîrok jî ji bo vê yekê mînakan pêşkeş dike.

Tê wê wateyê ku çewisandina li ser zayend û pêşketina pergalê çewisandin û dagirkeriyê ve girêdayî ye. Malbat jî rengekî veguhertî yê civatên klan û kabîleyan e. Weke veguhertinekê yan jî weke rengekî civatê derdikeve pêşberî me. Malbat weke saziyeke ji rengên civatên destpêkê heta roja me ku dixwaze xwe bide jiyîn, ketiye nava vî karî. Bi hatina gelhev a cureyên mirovan ve rê vekiriye ku xwesazkirineke ku jê re tê gotin, malbat ava bibe. Di şêweyên destpêkê yên civatan de, di navbera malbat, klan û qebîleyan de zêde cihêbûn nîne. Ev yek hema weke hev in. Di nava her civakê de cihêbûna wê û hatina wê ya asteke ku bibe saziyekê cihê, bi pêşketina civaka çînî ve hîna zêdetir gengaz bûye, taybetmendiyên xwemalî bi dest xistine. Em dikarin vê yekê jî bînin ziman, malbat bi şêweyên xwe yên dîrokî yên ku heyî ve bi pêşketina şaristaniyê yan jî bi gotineke din ve, di nava pêvajoya pêşketina pergala çewisandin û dagirkeriyê de bû saziyeke ku her çû xwe taybet kir.

Dema pergala koledar derkete holê, xwediyê koleyan malbatên balkêş derxistin holê. Bi rastî jî hindek eserên gelekî balkêş ên pêvajoya koledariyê hene. Ew tirbên malbatên mezin di serdema koledariyê de di dewletên koledar de derketine holê. Tirbê malbateke wê demê ji mabetên bi nav û deng ên vê gavê hîna zêdetir xwedî nirx in. An jî ji salona konserê, ji cihekî

seyranê hîna balkêştir e. Ji van tirban ev derdikeve holê: li gel xwediyê koleyan de malbat bûyereke gelekî mezin e. Ji bo çi ev yek wisa ye? Xaleke bingehîn a çewisandin û dagirkeriyê malbat e. Xwediyên koleyan ku cara yekem dewletbûna mezin bi dest xistine bi rewşeke jorcivakî ve ber bi xwedabûnê ve diçin. Malbat jî şêweyeke ku herî zêde ber bi çav dibe. Di heman demê de mirovan xwestiye ku bêmiriniyê bijîn. Di tirbê firavûnên Misirî de hîna jî mumyayên wan hene. Împarator bi malbata xwe ve, bi hemû xanedan, jinên derûdora xwe ve, bi rengekî ku weke kevirekî hişk bûye, di bin erdê de ye. Li gel ku li pey bêmiriniyê de ye, xwe bi rengekî li jor xweza û civakê dike xweda û bi rengî hetanî roja me rengê xwe dide. Ji bo mîmariyê jî bi vî rengî nêzîk dibin, lê belê malbatên koleyan nînin. Mafên wan ên avakirina malbatê jî nîne. Ew jî rastiyek e.

Weke tê zanîn, di pêvajoya feodaliyê de xanedanî hîna zêdetir hate pêşxistin. Di rastiyê de xanedaniyê mezin, aîdê serdema feodaliyê ne. Ew xanedaniyên Emewî, Ebasî, Selçuqî û Osmanî yên di Îslamiyetê de her yek ji wan weke dewletên malbatî yên balkêş in. Rêncberên (serf) di vê serdemê de jî, hêdî hêdî mafên xwe yên avakirina malbatê bi dest dixin. Avakirina malbatê aîdê serdema rêncberiyê ye. avakirina malbatê yên çînên jêr û pêşketina malbatgeriyê bi serûberbûna feodalî û derbaskirina koledariyê ve gengaz dibe.

Dema ku kapîtalîzm weke pergal bi pêş ket, vê carê jî malbatên bûrjuva bi hemû balkêşbûna xwe ve derketine rastê. Li Ewrûpayê hîna jî bandorên van gelekî zindî ne. Li Fransa, Îtalya û Almanya hîna jî malbatên bûrjuva yên gelekî bihêz hene. Di vê mijarê de Îngîlîstan jî di heman rewşê de ye. Di pergala kapîtalîst de di nava jêr, di nava proleterya de hindekî din jî pêş ket. Girêdaniya vê yekê bi dagirkeriyê ve gelekî zelal e. Ji ber dagirkirinê malbat bi pêş nakeve. Di koleyan de, rêncberan de û proleterya de rewş bi vî rengî ye. Lê belê di çînê dagirker û zordest de jî malbat gelekî balkêş bi pêş dikeve.

Gelo emê pênaseya malbatê çawa bikin? Di nava saziyeke ku evqasî bi dagirkirinê û dagirbûnê, çewisandinê û çewisinê ve girêdayî ye, çi nabe û çi

lêyîstok nazîvirin. Saziyeke bi vî rengî pêwîste herî zêde were lêkolînkirin. Di rastiyê de di vê mijarê de lêkolîn hîna nû têne kirin. Tê xwêstin naveroka malbatê, hîmê felsefîk ku xwe dispêre pirsgirêkên ku afirandine vê gavê were dîtin. Bi taybet zêdebûna nifûsê ya balkêş jî mijara gotinê ye. Tê gotin ev zêdebûna nifûsê mirovatiyê û cîhanê tehdît dike. Girêdana vê yekê bi malbatê re heye. Pirsgirêkên malbatê ku di pergala emperyalîst de him gelên têk çewisandin û girêdayîne him jî welatên kapîtalîst emperyalîst de derdikevine holê. Mirovatî hereşe (tehdît) dikin. Ger tedbîr neyên girtin mirov nikarin di cîhanê de bijîn. Bi rengê ku hatiye pejirandin malbat û weke ku saziyeke bingehîn e, ku mirovahiyê li aliyekî dihêle ber bi dawî anîna mirovatiyê ve diçe.

Ji ber vê yekê jî malbat û şêwazên têkîliyan ên ku yekser bi malbatê ve girêdayî ne, dê werin lêkolînkirin, werin nirxandin û riyeke çareseriyê were dîtin. Ji lewra ew serûberkirina têkîliyan di navbera her du zayendan de li ser mirovahiyê dibe hereşe. Têkîliya di navbera her du zayendan de ku di nava gelên li Efrîka, Emerîkaya Latîn û di Rojhilat a Navîn de dijîn de jêdereke qeyranê ye. Malbat bi tenê ne zêdebûna nifusê de di afirandina pirsgirêkên weke bêperwerdetî, bêkarî û qeyrana derûnî de jî bûye saziyeke rûxandinê. Li gel vê yekê jî li welatên kapîtalîst ên pêşketî de tê dîtin ku ber bi encamên hîna xetertir ve çûyîn çêdibe.

Şêwaza têkîliya zayendî, bi taybetî sererastkirin û serûberkirina wê welatên kapîtalîst ber bi îflasê ve dibin. Ew rêpîvanên ku hatine danîn, bi navê exlaq, bêexlaqiyê derdixe asta herî bilind. Cihekî weke Efrîqa ku bandora pergala klanan lê peyda ye, têkîliya zayendî di rewşeke nexweşiyê de ye. Ajoyên zayendî hiştiye ku mirov nikarin ji nav derbikevin. Ev tişt gelekî zelal e. Pêwîste di giştî de malbat û şêwazên têkîliyan di navbera zayendan de, bi taybetî jî saziya malbatê bi lez were lêpirsînkirin û ger gengaz be ji nû ve were avakirin.

Bi rengekî gelekî balkêş, lêpirsîna van têkîliyan tê kirin û tê xwestin yê nû were pêşxistin. Lê belê hîna jî çareserî nehatiye dîtin. Olan xwestin ku şêweyekî diyar bi cih bînin. Dîsa şêwazên civakî, aborî xwestin li gor xwe

mînak zagonên exlaq bi pêş bixînin. Lê belê hemû jî kêm dimînin. Gelo nêzîkbûnê felsefîk ên nû û bingehên exlaq heta nêzîkbûnên nû di derbarê vê pirsgirêkê dê çawa bibe? Li gel pêşketina zanistiyê di vê mijarê de dê çi were gotin? Pêwîst e mirov bi baldarî binirxîne û lêkolîn bike. Ji lewra ev pirsgirêk bi hemû pirsgirêkên civakî ve ji nêz ve girêdayî ye. Di civakê de ji bo pirsgirêkên vê saziyê ku weke saziyeke bingehîn tê bi bîranîn gelo dê çiqasî girêdayî zanistiyê çareseriyek were dîtin. Ev pirsgirêk dê çiqasî ji bo zanistiyê werin nîşandan? Di vê mijarê de zêde pêwîstî bi ponijandina kûr û felsefekirinê nîne. Ev, arîşeyeke (problem) çi qasî cidî ye, li hemberî mirovahiyê sekiniye ev rastî gelekî eşkere ye û zelal e. Dibe ku zanistî ber bi çareseriyekê ve biçe, dibe felsefe û exlaq hindek tiştan bi pêş bixin, li ser vê bingehê teqeze dê ji bo şêweyên têkîliyan çareserî were dîtin, dê şêweyên nû yên têkiliyan derbikevin rastê. Jiyan di çarçoveya ku di sînorên tên pejirandin de û aliyê wê yê azadiyê hîn pêş ve diçe û berdewam dike.

Di bin ronahiya nirxandinên ku giştî hatine kirine de em li rastiya xwe binêrin. Rastiya gelekî ku têk çûye bandor û encamên xwe yên rûxînêr di nava saziya malbat ku weke saziyeke li ser piyan maye de xwe nîşan dide. Weke ew kesên ku dibêjin di dest me de tenê malbat maye gelo bi rastî jî li ser piyan maye? Piştî ku rastiya netewî hate perçiqandin hemû pergalên sazî û têkîliyên civakî têk çûn dîl hatine girtin û hatine hilweşandin, rûbirûyê dagirkeriyê û çewisandinê hatin bi bişaftinê (asîmîlasyon) hatin tasfiye kirin, ji bo wê malbata ku di dest de maye mirov dikare çi bibêje? Hela ji bo malbatekê her tişt dayîna pêş çavên xwe tê çi wateyê? Derveyî malbatê tu armanc nedîtin tê çi wateyê? Gotina “her tişt ji bo malbatgeriyê” tê çi wateyê. Pirsên bingehîn ku pêwîste bigihên zelaliyekê ev e.

Li gor me, karesata rast hebûna rastiyeke me ya malbatê bi vî rengî ye. ji ber ku bi tevî rewşeke her tişt hatiye wendakirin de bi rengê “sparteka min a dawiyê” an jî “hemû hebûna min” hembêzkirina malbatê ji rê derketineke mezin e. Xerîbûna ji cewher e, xilasbûn e, xwe derveyî rastiyê hiştine û apolîtîk kirine. Dijberî netewbûnê ye. Heta malbatên li gel me kesan li hemberî saziyên din ên civakê nezan û bêkar dihêle. Rewşeke bi vî rengî

diafrîne. Ew kesê ku di nava rastiya malbata me de mezin dibin jî em in. Tê wê wateyê di hindek welatên din de nirxê girtîbûna malbatê yek be li gel me bi qasî hezarî ye. Hele ev bi taybetmendiyên serdema qebîleyên hov û bi rêbazê şerê taybet ê dijmin ve gihiştibe hev û pêşkêşî me hatibe kirin, tê wê wateyê ku em rûbirûyê karesatekê rastî ne. Yekî ku nû ji dayik dibe hîna nû çavên xwe vedike ewlehiya xwe di nava malbatê de dibîne. Hinekî mezin dibe yan jî nabe ewlehiya xwe di malbat avakirinê de digere. Di nava malbatê de her kes dibêje "em hewcedarê hev in, pêwîste bi her tiştê xwe ve em vê saziyê bidin jiyîn." Ên ciwan jî, yên temen mezin jî vî tiştî dibêjin. Pêşxistina rastiyên weke netew, civak, sazî û dezgehên din ne di bîra tu kesekî de ne, van tiştan jî gelekî ne pêwîst dibînin.

## PKK ji bo civakbûna azad tevgera rêvekirinê ye

Min vê rewşa malbatê di têkîliyên xwe de gelekî zû dît. Min derxistine zanebûnê ku jiyaneke mezin di nava saziyeke teng, weke malbatê de tê zîndankirin. Ev yek tê çi wateyê, van mirovan tu saziyên din pêş nexistine. Heta bûne xwedî nêrîneke herî kirêt, herî xweşik, herî rast, herî bêkêr, herî baş û herî xirab ên malbatê. Ez bi rengekî biheq ji ber vê rewşê gelekî zû ketime nava gumanan. Rastiyeke wiha xwe "her tiştekî ji malbata min tekûz e û jêneger e" rave dike. Di vir de malbatgerî heye.

Di civakên din de jî malbat bênirx e. Heta ku hindekî pêşiya pêşketinan bigre, wê demê weke dijmin tê hesibandin. Li gel me malbatgerî û di vê wateyê de bi qebîlegeriya hov û eşîretgeriyê ve ber bi pevçûneke kor ve diçe û xilasbûnê tîne. Tişta herî xirab jî, di mijara malbatgeriyê de girtîbûnek heye, çavê kesayet ji xêncî malbatê eşîretê û qebîleyê tiştekî din nabîne. Yê ku hîna baştirin jî, ber bi çûyîna sazîbûneke netewî û civakî qebûl nakin. Ev hîn jî li gel me serdest e. Pêwîste mirov vî tiştî hindekî vebike. Dema ku em plansaziyên çalakiyên xwe jî pêş dixin, pêwîste teqez rastiya malbatgeriyê pêş çavan re derbas bikin. Ji ber ku hemû pergala zilam, pergala malbatê ye. Ji bo vê pergalê rizgar bike dikare bibe sîxur, cerdewan, noker û zilamekî herî sosret û bêkêr. Sedema vê yekê jî rizgarkirina pergala malbatê ye. Ew

mirovên ku di nava refên me de ne jî, hetanî bi qirika xwe bi pirsgirêkên malbatê ve dagirtîne. Di nava malbatê de bûne kole, dîl û malbatperestek û derketine. Her çiqasî li ser rastiya netewî û civakî gotinan bikin jî ev zêde rast nîne. Ji dilê min  bawerkirina vî tiştî nayê. Hûn dikarin behsa kîjan rastiya netewî û civakî bikin? Hebe nebe rastiyeke malbatê ya mirovê Kurd heye. Lê belê ew jî dijberê netewbûnê û civakbûnê ye. Bûyê dijberê her du tiştan jî. Pêwîst dikir ku biba hêzeke ji bo tiştan, bi sedan sal in, bi destên dijmin ristekî paşverûtiyê lêyîstine û gihiştiye astekê ku bibe dijberê civakbûn û netewbûnê. Pêwîste mirov vê yekê baş bibîne.

Herî aliyê xirab ê kesayetan jî, bi rengekî gelekî balkêş li ser bingehê malbatgeriyê teşe (şekil) girtine. Bandoreke girîng ku muhra xwe li kesayetê daye jî ev rastî ye. Weke ku gelek caran tê gotin, li derveyî “kurê bavê xwe, keça malbata xwe” tu pênaseyên din nînin. Asoyê wê yê netewbûnê, taybetmendiyên wê yên pêşketina netewî û heta civakî gelekî tevlîhev e. Encama ku di wir de derdikeve holê hevalên me hîn jî ji mercên malbatê gavekî jî ne di pêşdetir in. Rêxistinê jî bi wî rengî dizanin. Tiştê ku hevalên me yên di asta herî jor de jî didin axaftin, malbatgeriyeke ji rêzê ye. Partiyê jî weke malbata xwe dizanin. Him jî ne di zanebûna wê de ne ku vî tiştî dikin. Me partî li ser bingehê dijberiya malbatgeriyeke bi vî rengî ava kir, lê belê hevalên me di du rojan de partiyê vediguherîne malbatên xwe. Sedema ku hun bi vî rengî ne feraseta we ya malbatgeriyê ye.

Min ji heft saliya xwe hetanî niha, ji saziya malbatê guman kirin, li hemberî wê şer kir û min xwe pêş xist. Berovajî hun zarokên wê yê taybet in. Ew kesên ku hemû nirxên malbatê pejirandine nikarin taybetmendiyên netewî yên bihêz bidin axaftinê. Di kesayeta wan de taybetmendiyên netewî yên bihêz şax nadin. Hun hîna jî negihiştine van taybetmendiyên netewî, civakî yên bihêz. Sedema vê jî hun di kesayeta malbatê ya gelekî girtî de mane. Mirov dikare herêmî û çandên hov ên din jî li ser zêde bike û hun bi van ve gelekî tijî ne.

Tê wê wateyê, di me de malbatgerî ji malbatê zêdetir rewşeke nexweşiyê rave dike. Ev tişt him di malbatên noker, feodal de him malbatên bûrjuva

yên xeşîm de him jî di malbatên gundî û bingehê xwe bûrjuvaziya biçûk in bibandor in. Ew polîtîkaya ku wateya xwe di gotina “hebûn û nebûna min ji bo malbatê ye” dibîne, ji aliyê berjewendiyên malbatê ve hatiye diyarkirin. Heta pirsgirêka jiyanê jî bi vê yekê ve girêdayî ye. Li gel me berovajiya vê, ger hîn di serî de rastiya malbatê ber bi rexneyeke tund ve neyê birin û gelek bandorên wê neyên hilweşandin, baş tê zanîn ku şoreşgerî nabe û partîgerî nayê kirin. Di vê wateyê de PKK’îbûn navê şerê li hemberî bandorên malbatgeriyê ye. Ew bi qasî ku li hemberî bandorên dagirkeriyê şer dike, ew qasî jî li hemberî bandorên malbatgeriyê şer dike. Di nava me de derketina holê ya malbatê bi vî rengî ne. Hema ji bo hemû kesayetên civakê re tiştê ku weke berjewendî tê nîşandan, berjewendiyên malbatê ne. Dema ku tê gotin “bibe mirov” tê gotin bibe mirovê malbatê. “Bûyîna mirovekî baş” tê wateya bûyîna layiqê malbatê. Ango hemû gotinên armanca lêgerînên têkîliyan li gor xwe avakirin, heta tiştên weke xwendinê her dem di nava sînorên malbatgeriyê de xwedî wate ye.

We malbat bi dest xist jî, çi kete destên we? We malbat rizgar kir jî çi bû? Ew malbata ku we rizgarkiriye çî ye? Dema ku we malbat rizgar kir, netew xelas bû, gel xilas bû. Em li netewên din ên hemdem binêrin, hun nikarin ji kêleka sazî û dezgehên ku ew anîne asta wan a îro jî nikarin derbas bibin. Hun ji ber sazî û dezgehên ku ji bo netew pêwîstbûn jî derbas nebûn û bi qasî pênc qirûşan we rûmet neda wan. Li hemberî malbata ku we rizgar kiriye tiştên ku we wenda kirine ev in. Ev tê wateya we malbat xirab rizgarkiriye. Dîsa rewşeke wiha heye, ji aliyê xirab ve gelekî nirx hatine wendakirin. Em ji bo çi li hemberî sazî û felsefeya malbatgeriyê şer dikin? Ew kesayeta Kurd a bêrûmet ku ji bo netewbûn û civakbûnê girtiye, ji bo ku têkîliyên malbatê yên ji rêzê ne rizgar bike tiştekî ku nefiroşe nîne. Bi tenê bikaribe malbata xwe xilas bike.

Me li hemberî vê kesayetê şer destpêkir, kesayeta alternatîf a ku PKK dixwaze biafrîne kesayeteke gelekî radîkal û rizgarîxwazê netewî ye. Ji ber ku PKK baş dizane ev pirsgirêk bi derbaskirina malbatgeriyê ve girêdayî ye. PKK dixwaze ji bo civakbûneke azad rê vebike. Ji bo vê jî pêwîste saziya

malbatê ku dijberê azadiyê ye û hetanî dawiyê girtiye were rûxandin. Di heman demê de di vê saziyê de hetanî çokê xiyanet heye. Ji ber ku dijberê rizgariya netewî ye. Pêwîste girêdana bi malbatê re were perçekirin. Di mercên malbatê de xerîbî, înkarkirina rastiya civakî û netewî heye. Ji ber vê yekê jî êrîşî netewbûn û civakbûnê dike. Bila têkîliya malbatê ku ji bo rastiyan girtiye têk biçe ku netewbûn û civakbûn pêş bikeve.

Ev hemû tişt zilamê ku em dixwazin di demên dawiyê de hîna zêdetir zelal bikin tîne bîra mirovan. Di demên dawiyê de me girîngî da lêpirsînkirina jin û zilam. Ew rewşa zilam a sexte û mêrbûna wî ya zilam û jinbûna zêde ya jinê me dike nava fikaran. Zilambûn di giştî de bi egîdî û zayendî ve wekhev tê dîtin. Weke “mirovê weke zilam, jina weke zilam” tê ravekirin. Ev jî weke awantajekî tê hizirandin. Tiştê ku hema di destpêkê de em bibêjin, ev e. Ger ew mirov zilam be, ji bo çi erkên xwe yên rizgarîxwaziyê nayne cih? Ger egîd be, ger zilam be wê demê bila pêwîstiyên vê yekê bike. Ji ber wê jî pêwîstî bi dahurandina zilam nîne. Hîn zêdetir em dixebitin ku zilamtiya di kesayeta Kurd de tê çi wateyê fêm bikin. Zilamtiya di kesayeta Kurd de taybetmendiyeke zilamtiyê ku ji rê derketiye. Zilamê Kurd bi gihiştina hestên zilamtiyê ve weke ku hemû nakokiyên xwe çareserkirine. Bi taybetî jî di mijara têkîliyên zayendî de di zilamtiyê de hesteke ku weke dagirkeriyê bi bin xistiye û dewlet avakiriye diafrîne. Ev xerîbûn û xwe xapandineke mezin e.

Dema mirov hindek taybetmendiyên civak û dewleta Tirk jî pêş çavan re derbas bike, ev rastî hindekî din baştir tê fêmkirin. Asta zilam a zayendî li hemberî jinê weke ku radeyeke qehremaniyê dide wî, ev tiştekî seyr e, lê belê rastiyek e. Ev rewş di civakên din de ne di vê astê de ne. Di vê mijarê de dema ku em zilamê Kurd ji kûr ve lêkolîn bikin emê bibîn ku di vê wateyê de tenê bi tatmînekê ve li ser piyan dimîne. Wî jina xwe kiriye pîrek, jin jî hîna zêdetir bi pîrekbûnê ve li ser vî bingehî weke zilamekî ye. Wisa tê bawerkirin ku bi vî rengî hemû nakokî hatine çareserkirin. Bêguman girêdaniya vê bi nirxandinên malbatgeriyê ve hene. Çawa ku rizgarkirina malbatê ji rizgarkirina welat girîngtir be ji bo zilam têkîliyên zayendî jî ew

qasî girîng e. Di rastî de zilamê Kurd di mijarên din de xelas bûye. Li hemberî dewletê xilas bûye, li hemberî civakbûnê û netewbûnê xilas bûye, li hemberî nirxan û tekîliyên civakî xilas bûye. Ger bi wî rengî be, gelo têkîliyên ku dihêle di nava malê de ew aktîf be û zordest be çi ye? Ev têkîlî ya li hemberî jinê ye, ew jî bi têkîliya zayendî dest pê dike û hetanî her cureyê çewisandinê ve diçe.

Dema mirov balê lê bikişîne, zilam bûyera têkîliya zayendî weke bûyereke serdestiyê bi dest digre. Her têkîliyekê zayendî ku dikeve tê de weke ku bûye yekemîn dinirxîne. Ev rewş ji rê derketina exlaqî ya cidî ye. Pêwîste mirov bi vî rengî binirxîne. Ev têkîliya ku di civakên din de û di demên dîrokî yên din de gelekî xwezayî ye, ji bo çi di rastiya me ya civakî de çawaniyeke cihê bi dest dixe? Ev ji bo civaka Tirkiyê û heta gelek civakên din jî derbas dibe. Em hîn zêdetir dixwazin rastiya civaka xwe dahûrînin. Bi taybet vê gavê pêdiviyên me bi vê yekê hene. Ango gelekî ku di nava pergaleke civakî û netewî de her tiştê xwe wenda kiribe, di her tiştekî wê de xilasbûyînek hebe, pêwîste mirovên me nebêjin “ez gelekî mezin im.” Ev rewş hîn jî dibe mijarên henekan. Mînak, zilamên Tirkan li hemberî Ewrûpiyan qaşo bi zilambûna xwe pesnên xwe didin, ev hemû çîrok in. Ev di civaka Kurdan de hindekî din balkêştir e. Hîna zêdetir ji bo bandorên civakî û encamên xirabtir rê vedike. Li gor min mijara ku herî zêde em li hember şer bikin ev e. Hela ew kesên ku di temenekî biçûk de naskirina wan a têkîliya zayendî ya bi vî rengî ve gelo çi wenda nakin? Têkîliya zayendî li ser bingehê azadiyê an jî evînê wê çawa çêbibe? Ji bo nîqaşê vekiriye. Ger ev yek rast were nirxandin dê ji bo pêşkeftinan rê vebike. Ne ber bi xerîbiyê ve dê ber bi gihiştin û jiyaneke bi wate ve bibe. Ger di nava gulokeke kaosa civakî û têkîliyên civakî de ev tişt weke amurekê çareserkirinê ya herî bingehîn were hizirandin ev dê rê li ber karesatan vebike. Mirovên ku dema azweriyên wan ên zayendî negihêne serkeftinê û întîhar dikin ne kêm in. Di rastiyê de ev rewşeke nexweşiyê ye. Di rewşeke wisa de kesayet xwe weke tunebûyî dibîne. Kesên bi vî rengî qurbanê şaşîtiyên mezin in.

Dema hêza zilam a zayendî zêde bû xwe gelekî bi hêz dibîne. Ji vî tiştî jî ji bo xwe para pesindayînê derdixîne. Dema mirov balê lê bikşîne yê ku bêhêz e, gelekî xwe dixe nava zehmetiyê. Ev yek him ne pêwîst e û him xeter e. Civaka herî zêde ji vê rewşê êş kişandiye di heman demê de tenê ji bo têrkirina ajoyên zayendî na, di asta civakî de jî encamên xirab derdikevine holê. Yekî ku ji aliyê zayendî ve çavbirçî be, dê ne yek jinê diduyan heta sisiyan jî bîne. Di serî de jî dê biçe kerxaneyan, ew jî têrê neke dê di sukên vekirî de li jinan bigere. Rewşeke wiha tê dîtin ku ji aliyê exlaqî ve ji rûxandinan re çiqasî rê vedike? Dema mirov li pergala me ya civakî temaşe dike rewşên ew kesên ku xwe gelekî baş binamûs û malbatger dibînin tê dîtin ka çiqasî di asta nexweşiyeke civakî de ye? Nexweşiya ku ew belav dikin, ji nexweşiya dijmin belav dike kêmtir nîne.

Mijareke ku min destpêkê îsyan kiribû ev bû. Dema digotin “me tu aniye vê dinyayê” min bersiveke “we bi anîne min a dinyayê ve bêrûmetiyeke herî mezin kiriye, bi tevî ku tu derfetên we yên min weke zarokekî baş mezin bikin nebû jî we ez anîme dinyayê û vî tiştî jî li serê min dikin bar. Zarokekî ku hun nikaribin tiştekî bidinê we çi wêrekiyê anî vê dinyayê” dida wan. Min di temenekî gelekî biçûk de ev tişt dît. Ger zarok geleki binirx be pêwîste hun cîhana wan amade bikin. Ma li gel me malbat bi vî tiştî dihizirin? Ma zilam û jin vî tiştî dihizirin? Bi taybet gelo zilam vî tiştî dihizire? Di rastî de her du jî nahizirin, di vê mijarê de di nava bêexlaqiyeke mezin de ne. Hun ji bo zarokê xwe yê xwedî nirx çi dikin? Vê gavê ew hemû li her çar aliyên dinyayê û metrepolan belav dibin. Lê belê zilam û jin tawanê vî tiştî gelekî ji zû de pêk anîne. Di rastî de ew jî bêçareye, di panzdeh saliyê de hatiye wendakirin. Ma weke din dikare çi bike? Carekê têk çûye, jin çi fêm dike û zilam çi fêm dike. Ew vê rewşê bi sedan salin dijîn. Ji ber vê sedemê gavavêtina şoreşgerî ya mezin li hemberî van têkîliyan hemûyan e. Lê belê pêwîste mirov xerîbûn û ji rê derketina di mijarê de bibîne.

Weke ku min diyar kiriye, zilam serkeftina xwe ya di têkîliyên zayendî de weke çareseriya hemû nakokiyan dinirxîne. Berovajî çêbûna pirsgirêkên

balkêş di vê kesayetê de ye. Heta ger ji aliyê bêhêziyê be, û ji ber ku di bin zexta zayendiyê de ye nikare xwe têr bike, dîn dibe yan jî dikeve nava helwestên êrîşkar, dikeve nava kompleksan, her cure tolaziyê û serberdayiyê dike. Dibe jêdera pirsgirêkên gelekî mezin. Bêyî ku çareseriyê di mercên xwezayî û rast de bigere dikeve nava rewşên hîn bêhtir xerîbkirinê, çewisandinê, jin revandinê, di bin zextê de pêkanîna xwe têrkirina zayendî, heta dawiyê dikeve riyên her cure derveyî exlaq. Ger hêza wî ji bo vê yekê nebe, vê carê dikeve nava helwestên keşetiyê (papaz). Ev yek jî bi xwe re ji rê derketineke weke din pêş dixe. Li gel me kesayet li ser vê bingehê him parçe bûye, him jî binexweşî ye. Tenê qelend, pereyê avakirina malbatekê jî ji bîst-sî mîlyonan jî kêmtir nîne. Qasî ku tê bîra min, berê xortekî deh salan kar dikir an malbatek ava dikir an jî nedikir. Vê gavê hîna zehmetir e. Zilam bi tenê ji bo bikaribe malbatekê ava bike, ji panzdeh salî hetanî bîstûpênc saliya xwe pêwîste xwe di sûka kar de bi erzanî bifiroşe. Di rastî de ev yek bi tenê ji bo ku malbatê biparêze û berdewam bike ye. Dema ku zarok û marok jî çêbûn, hîn zêdetir pêwîstî bi pereyan heye, mirovên me bi vî mantiqê mezin dibin.

Mirov li hemberî saziya malbatê matmayî dimîne. Dema ku min tişt weke mijulbûnên bingehîn ên jiyanî nirxandin, pirsên min ên destpêkê wiha pêşketin. Ma dema malbat zarok tîne dinyayê yê dayik û bav gelo ma her tiştekî rave dike? Min ji xwe pirsên bi vî rengî kirin, li hember wan helwest nîşan da û xwe li ser vê bingehê pêş xist. Dema ku saziya malbatê xeterî li ser me zext kir dîsa min li ser vî hîmî lêpirsîn pêş xist. Herî kêm bi qasî eniya dijmin min ev enî jî lêpirsîn kir û hetanî ez gihiştime helwestên rast, min şerekî rast meşand. Bi tevî ku di bin rêbertiya PKK de pêşket jî sedemê hebûna vî şerî dîsa PKK ye. Bi qasî ev şer bi zehmet e jî, ger şerekî wiha neyê dayîn em nikarin bi mîlîmekî jî rê bigrin. Di vir de mirov dikare vî tiştî diyar bike. Ger kesayeta we îro di bin bandora giran a malbatgerî û zayendîtiyê de ye, hêza gihiştina çareseriyê û tekoşîna wê di xwe de nabîne ew rewş dide diyarkirin ku ji bo çi hun kesekî wiha ne. Di demên wê de neçareserkirina van pirsgirêkan bi taybet tekoşîna vê nedayîn dibe sedema

lewazbûn, biçûkbûn, ji gelek aliyan ve pêşneketin û nebûna we ya şervanekî mezin e. Hun xwe têrkirinê û girtîbûnê ji ber van kesayetên xwe yên lihevketî jî dijîn. Di rastî de bi destgirtina van mijaran dikeve ser milên wêjevanan. Li ser vê gelek sekinandina min ji bo rêxistineke şer gelo çiqasî rast e? Lê belê dîsa jî bi xetên stûr pêwîste mirov li ser vê mijarê raweste. Ji ber ku di dibistanên şer ên li Tirkiyê jî ev mijar tê bi dest girtin. Li ser rayedaran sazûmaniya malbatê ya saxlem tê ferzkirin. Ev ji rayedartiyê re şertekî gelekî grîng e. Pêwîste rayedarek di nava nêzîkbûneke malbatê ya saxlem de be. Ew vê saziyê weke bingehê mihafazakariyê dihizirin. Em jî weke bingehê şoreşê rexne dikin. Pêwîste herî kêm mirov van pirsan zelal bike. Ji aliyê zayendî ve ji her du aliyan jî, ji rê derketinek tê jiyankirin. Ev jî ji ber lêgerîna bêsînor a xwe tatmînkirina zayendî û azweriyên zayendî ku bi şêweyên ji rê derketî ve yan jî harbûyî ve vegotin e. Bi taybet li gel me ku mirovên temen mezin bi keçikên temen biçûk re dizewicin, mînakê herî zelal a vê yekê ye. Helwesteke berovajiya vê jî di bin veşariya olî de tê tevgerîn. Ji dinyayê her tiştê xwe dikişîne nêzikî jinê nabe û vê jî weke tawanekê dibîne. Ev jî cureyeke ji rê derketinê ye. Malbatekî ku li ser vê bingehê tê avakirin, di nava bêçariyê de ye. Malbat, bi qasî ku nikaribe xwesteka zayenditî ya bêsînor tatmîn bike, ji ber doxmatîzma olî jî dijî, zehmetiyan dikişîne. Bandora van helwestan di ketina malbatê rewşa qeyranan de û bibe bingehê vê mezin e.

Mirov dikarê vê mijarê ji aliyê têkîliya jin û zilam ve bigre dest. Encamên vê yên din jî hene. Ya herî girîng, dema ku bibêje “min malbat baş avakir, min jin kire pîrek, ez serdest im” gelekî kêfxweş dibe. Weke ku pêwîstiya cîhanê aniye cih, dema di nava malbatê de têkiliya jin û zilam, bi vî rengî were avakirin, çavkaniya girtîbûn, paşverûtî, faşîzm û dagirkeriyê ji xwe re hîmekî têkûz dibîne. Jinê dike polîs, jina ku polîse jî çeka xwe baş bi kar tîne. Heta nava refên me jî, jinê baş bi kar tîne. Ew çavbirçîtiya zayendîtiyê bi rengê xistinê dinirxîne. Ji bo qadên weke sînema, televîzyon, kerxane têne pêşkeşkirin, dîsa jin in. Firotina jinan gelekî belav bûye û ev rengekî gelekî bibandor tê bi karanîn. Em dev ji civakê berdin, dixwazin me

jî bixin. Li hemberî yê ku zayenditî weke tawan dibînin jî olê weke çekê bi kar tînin. Jixwe ev bikaranîn jî. Mînak; Hizbûlah dibêje “PKK malbatê azad dike, ev li hember darezînên me yên nirxan êrîşeke mezin e” û êrîşeke dijber dest pê dike. Ev her du şêwazên ku di nava ji rêderketineke zayendî de ne, li hember rizgarîxwaziya netewî û şoreşgeriyê ristekî dilêyîzin. Ev jî jêdera xwe ji bingehê malbatê digre. Bi vî rengî nirxandina vê rastiyê de, ew ji wî alî ve rolekî dilêyîze. Di rastî de ev bingeh yekser bi dijmin re di nava têkîliyan de ne û ji bo bandorên dijmin hetanî dawiyê vekirîne.

Encamekî vê ya din jî, tenê ji bo xwarin û vexwarinê bidine zarokan pêwîste ku xwe di sukê de çil caran bifroşin. Xwendina dibistanê zehmet e, bêperwerdehî û cehalet heta çokê ye. Tenê ji bo perwerdeya zarokekî pêwîste dê û bavek xwe çil caran tune bikin. Gelo yê ku deh bîst zarokên xwe hene dê çawa ji bin vê derbikevin? Ev rewş li gel ku arîşeyeke xirab e, sedema koletiyeke rastiye jî. Tenê ji bo muçêyên (maaş) xwe xilas bike û ji bo ku karekî ji xwe re peyda bike, gelo malxweyê malê çi dike û çi nake? Ger van pirsgirêkan çareser neke, dê were şer bike, zarok û jina xwe bifroşe. Jixwe dema zarok di malê de ahengiyekê nebîne, dê xwe di kolanan de bibîne. Dê zaroka keç ji malê bireve, dê zarokê kur jî bibe tolaz. Malbat hetanî astekî ku balkêşe de sedema tolaziyê ye, qaşo dibêjin malbat tolaziyê naxwazin, berovajî malbat jêdera tolaziyê ye. Bav û dê naxwazin keçên wan ji malê birevin. Lê bêlê sedema vê dîsa malbat e. Feraseta malbatê ya kêm e. Bi tevî van tiştan jî malbat xwe weke temsîlkarê exlaqê dibîne.

Mirov dikare pirsgirêkên wisa bi dest bigre, em dixwazin yek du aliyên din ên malbatê zelal bikin. Bi taybet ber bi çûyîna çareseriya şoreşgerî de pêwîste em hindek tiştan bi bîr bînin. Hindek rexne hatin kirin, ew pirsgirêkên ku ji ferasetên kêm re rê vedikin, me yek bi yek danîn holê. Em dikarin hîn jî berfirehtir bikin. Pêdîvî bi nirxandinên ku li ser çareseriyê bandor bikin heye. Dibe ku ev yek xwe di dema pêş de bide hîskirin, em dikarin ne tenê di civakê de bi taybet li bin sîwana partiyê de jî çareseriya vê pirsgirêkê ya sotîner bikin. Hêmana ku pêwîste were fêmkirin û were zelalkirin ev e. Saziya malbatê ya di civakê de û têkîliya jin û zilam, çawa

ku weke saziyeke ketinê, xwe ji her alî ve bazarkirinê û her cureyê harbûn û xerîbûnê tê nirxandin û ev nirxandin jî çiqasî girîng e, di nava partiyê de jî bi bandora wê ve tekoşîn dayîn jî ew qas gîring e. Pêwîste mirov van bandoran nexe nava partiyê. Di nava partiyê de ber bi çareseriyeke rast ve çûyîn û riyeke rast girtin girîng e. Di rastiyê de ev mijareke gelekî kûr e. Ev mijar ewqasî ji cewher hatiye derxistin ku, ji bo hemû bêrûmetiyan ew qasî bingeh avakiriye ku di serî de çareserkirina wê çawa ku gelek ji we bi wî rengî bawer dike, ew qasî hêsan nîne. Ev pirsgirêkên ne bi zewacên şoreşgerî yên erzan, ne bi înkarkirin, ne jî bi rêbazên pêşxistina zextê ve nayên çareserkirin. Pirsgirêk hîna berfirehtir e. Ev pirsgirêk bi qasî ku dîrokî ye, pirsgirêkê wisa ye ku pêwîste di riya wê de tekoşîn were dayîn.

Dema ku serdestiya partiyê bi pêş dikeve, milîtaniya partiyê hêzê bi dest dixe, tişta ku destpêkê tê bîra mirovan, serdestiya li mirovan e. Serdestiya li ser mirovan de şêwazeke zext û dagirkeriyê heye. Şêwazeke din jî wan azad bikî û bi kar bînî ye. Ger kadroyên me di nava têkîliyên malbatê yê kevneşop de ne û li ser hîmê serdestiya dewletê hatine mezinkirin, ev yek tê wê wateyê ku ew serdestiya partiyê, ya dewletê û ya malbatê tevlîhev dike. Ji ber wê jî dema ku dibêje ezê partiyan an jî gelan bixim bin serdestiya xwe, di rastiyê de hetanî dawiyê xeteriyê nîşan dide. Ji bo ferasetên serdestiyê yên derveyî xwe re rê vedike. Ger ev bi rengê koletiyê xwe nîşan bide hîn xetertir e. Bêhêz e, ji serdestî û erkgirtinê agahiya xwe tuneye. Ji bo koleyekî kî çi bibêje ewê bi wir ve biçe. Ber bi kû ve were xwestin dê biçe wî alî, ew jî gelekî xeter e. Dema ku ev rastî li ser jinê bi pîvanên zilam ên kevneşop were pêkanîn jî, ev tiştekî hîn xetertir e. Li hemberî azadiyê û wekheviyê bêhêz e. Tiştê xirab jî, dema ku derfet bibîne, yan aliyê xwe yê înkarkirinê yan jî ketibûnê dide axaftin. Ev her du rewş jî xeter in.

Dema ku di bin bandora nêzîkbûnên kevneşop an jî têkîliyên her du zayendan de bimîne, ya nikarê wê derbas bike yan jî dê înkar bike. –ku ev di her du kesayetan de jî gelekî bi bandor e- Ev rastî vê pirsgirêkê giran dike û ber bi çareseriyê ve nabe. Çanda wî lewaz e, asta wî ya perspektîfan lewaz e. Ya herî girîng jî hewldan û tekoşîna wî lewaz e. Pirsgirêk bi vê nêzîkatiyê

ve nayê çareserkirin. Beriya her tiştî xwe di asta ferasetê de amade nekiriye. Ji bo têkîliya di navbera zayendan de gelo bi kîjan feraseta bingehîn ve nêzîkbûn çêdibin? Di vê mijarê de tişta ku destpêkê tê bîra mirovan "bavê min bi dayika min çi kiribe, dayika min bi bavê min çi kiribe, yan di kolanan de yan jî di televîzyonê de çawa tê pêşxistin ezê bi wî rengî bikim" ev nêzîkbûn e. Asta wî ya dîrokî nîne, asta azadiyê nîne, asta şer nîne hînî rêzefilmên tv yê yên sînemayê bûye, nêzîkbûnên ku ji vir girtiye, nêzîkbûnên ku malbatê ew hîn kiriye, yê ku ji malbatê dîtiye û dizane ye. Tê zanîn ku ev çiqas tiştên bi nexweşî ne. Heta ev nexweşî yê ku faşîzm tehrîk dike ye. Gelekî zelal e ku ev nêzîkbûn ji serdema despotîk maye.

## Malbatgerî pewîste li ser hîmê rêgeza azadiyê were çareserkirin

Gelo ji bo rastiyê dê hêz ava bibe? Ev yek bi asta azadiyê ve û ew kesên ku li gel me ne çiqasî milîtanên azad û şoreşger in, bi bersiva wê ve gengaz e. Ger em gihiştibine van encaman, ew bi şoreşgeriya me ve gengaz e. Ji ber ku em şoreşger in. Ev jî tê wê wateyê ku pêwîste em li ser vê pirsgirêkê serê xwe biwestînin. Em dîwarên malbat û zayendê ve rastî hev hatin. Ji ber wê jî çareserî xwe ferz dike. Ger tu rêberê partiyê bî tuyê çareseriyê pêk bînî. Weke din tu nikari ji bin vê pirsgirêkê derbikevî. Ez zehmetiyê dikişînim, bi nêzîkbûnê "serdestiya min bihêz bû, ez xanedaniyekê ava bikim, dijberê rêgezê serokatiyê derbikevim" ve xelaskirina rewşê ne gengaz e. Ev jî me lewaz dihêle, gotina "ezê înkar bikim" jî dê bihelê mirov li şûna şoreşê bihêle, ku ev jî bi jiyanê ve tund girêdayî ye. Ji ber vê sedemê pêwîste em çareseriyeke kûr di ferasetê de û ger gengaz be di gavên xwe de pêk bînin. Em li ser vê bingehê nêzîk dibin.

Gelo feraseta me ya di derbarê vê mijarê de dê çawa bin?

Ya yekemîn, pêwîste em teqez li hemberî malbatgeriyê seknekê ava bikin. Pêwîste hun taybetmendiyên malbatî derbas bikin. Pêwîste hest, hezkirin û bandorbûnê xwe yên ku xwe disprên saziya malbatê hun dê teng

bikin û derbas bikin. Ew hiquqa ku bi yê malbatê ve bisînor e, hunê dev jê berdin. Hêvî û hînbûnên xwe dev jê berdin. Reva ji malbatê jî weke rizgariyekê nebînin. Derbaskirina malbatê cuda ye, jê rev cuda ye. Di vê astê de nêzîkatiyeke li vê pirsgirêkê bikin. Vî tiştî jî ji bîr nekin, ev sazî bi serê xwe nîne. Saziyeke taybet e ku dijmin bi ziravî bi dest digre û derdixe beramberî we. Bikartîne û bingehê xwe yê dîrokî gelekî bihêz e. Xwe bi xwe nehatiye vê rewşê, ev sazî tenê saziyeke ku di Kurdistan'ê de li ser piyan maye. Lê belê saziyeke ku belaya seriyan e. Li pêşiya pêşketina hiquqî ya civakbûn, netewbûn û mirovahiyê astenga herî mezin e. Ev pirsgirêk bi tenê bi milîtanbûneke bi pergal ve tê derbaskirin. Derveyî vê mirov nikare tu riyeke din bihizire.

Ya duyemîn, girêdayî ya yekem, têkîliyên jin û zilam, şêwazê têkîliyan a ku li ser tê ferzkirin, weke encamekî jiyana çanda malbatgerî û dewletê hunê derbas bikin. Hun dê li têkîliyan navbera zayendan pêwîste di vê çerçoveyê de lê temaşe bikin. Hun dê nirxên ku ji têkîliyên zayendî û têkîliya navbera zayendan re tê dayîn ne bi çanda sînema û televîzyonê, ne pîrozkirina dewletê û ne jî bi helwestên exlaq ên malbatê ve wekhev nebînin. Hun dê bixebitin ku girêdaniya uslub, rêgezên têkîliyên di navbera zayendan de bi dagirkeriyê ve, dewletê ve, serdestiya paşverû ve û faşîzmê ve bibînin. Bi taybet hunê bibînin ku, nêzîkbûnên îro li hember jinê tên kirin, ji faşizmê û çewisandinê re serdestiyê re xizmet dike. Kesayetê tevlîhev dike û li xwe xerîb dike. Ev tenê ji bo zilam derbasdar nîne, pêwîste her du alî jî hindekî vî tiştî bîninin. Ev zelal e. Hunê bibînin ku ev qada bi neyîniyên cidî ve dagirtiye. Mirovan girtî dihêle, bêhêz dihêle, ji hêzê û fîzîkî û manewiyatê dixîne. Yê ku her dem li pey têkîliya zayendî ye, ji aliyê madî û menewî ve ji hêz dikevin. Pêwîste hun vê yekê bibînin û li hember wê helwestê daynin. Hunê bibînin ku ew nêzîkbûnê li gor ol û mûmînan jî ne çare ye. Înkarkirin jî nabe çareserî. Ev dijberî rêpîvanên jiyanê ye. Ev jî dê ji rêderketinan re weke din rê vebike.

Ya sêyemîn; hunê xwe li ser bingehê pirsên weke, gelo ezê nêzîkbûnên rast û xwezayî ji bo vê têkîliyê serbixim? Gelo ma hêzeke min heye, gelo

ma di têkîliyeke ku bi sedan sal in û bi taybet jî di nava pergala serdest de, ev qasî ber bi xerîbûnê ve çûye bi ber bi paş ve çûyînan ve dagirtiye û bi derewan ve hatiye hunandin de, ezê çawa rastiyê bibînim de xwe lêpirsîn bikin û bawer bikin ku çareserî bi hêsanî çênabe. Hunê bawer bikin ku çareserî bi qasî çareserkirina arîşeyeke felsefê yan jî siyasî zehmet e. Hunê vî tiştî baş bizanibin ku çareseriyên hêsan nînin. Pirsgirêk li hevhatina du kesan jî nîne, ev pirsgirêk di mercên şoreşê de hîn jî girantir e. Ger em bi rengê “me hev ecibandin û gihane hev” nêzîkî pirsgirêkê bibin, tê wê wateyê ku me riya dibe karesatan hilbijartiye. Çareseriyeke wisa ya seranser bi qasî yên din dê we rûbirûyê encamên xeter ve bîne. Pirsgirêkeke sempatiyê ya ji rêzê, pirsgirêkeke ji hev têgihiştin û fêmkirinê jî nîne. Hela pirsgirêka du kesan qet nîne. Bi qasî ku pirsgirêkeke ya siyasî ya gelekî cidî ye, di heman demê de bi serê xwe pirsgirêkeke şer e. Dibe ku gelek kes bibêjin, “tu gelekî mezin dikî, du kesan li hev kirin, ji hev hezkirin û gihiştin hev” lê belê di nava me de jiyan nîşan dide ku ev yek ne bi vî rengî ye. Tê dîtin ku di malbatên hatine avakirin de rewş ne bi vî rengî ye. Weke ku pirsgirêk bi qasî dêwekê ye û ezmûnên di nava partiyê de jî datîne holê ku ev ne bi vî rengî ye. Ji ber ku ger jêdera wê kûr be, di bin dîrokê veşartî be û xwe xapandin, xeflet hetanî çokê be, ev encameke cuda nade. Tê wê wateyê ku hun bûne qurbanê sedan salan. Jixwe tiştên li gel me tên kirin, bûyîna qurbanê niyeta baş e.

Ya çaremîn, pêwîste li ser çareseriyeke rasteqîn lêgerînê wê hebin. Di vir de zanebûn girîng e, hunê di derbarê vê mijarê de xwe zane bikin. Hunê bingehê wê yê dîrokî bi roja me ve girêdana wê hebûna her sê nêzîkbûnên neyênî ku me di mijarê de behs kiribû bizanibin, ji her alîyî ve bigihêne zanebûna wê. Piştî ku hun gihiştinê wê zanebûnê, pêwîste nêzîkbûneke we ya ku di giştî de were pêşxistin, bi rengê şêwazê têkîliya di navbera zayendan de bi kîjan rêgezê ve dê were sererastkirin, çêdibe bi exlaqî, felsefî û civakî ve girêdan hebe. Nêzîkbûnên wê yên felsefî ji bo vî tiştî çi ye? Zilam jinê û jin jî zilam çawa dibîne? Mêbûn û nêrbûnê hun çawa dibînin? Di vê mijarê de helwesteke we ya exlaqî ya çawa heye? Ew helwestê exlaqî

ku jêdera wê ew mijar e, ango ew kategoriyên ku weke gelekî hişk-nerm an jî durû ku şêwêyên nêzîkbûnan e, yan jî kes li hember hev rave dikin, dibe kategoriyên exlaqî. Jin ji bo ku li hember zilam bikeve rengên exlaqî xwe dixe nava rewşên balkêş. Dîsa zilam jî xwedî gelek helwestên ku dişibine vî tiştî ne. Rexneyên van helwestan hatine kirin.

Wê demê pêwîste dê helwestên exlaqî çibin, divê nêzîkbûn çawa werin pêşxistin, ji ber ku çareseriya şoreşgerî heye, girêdaniya vê yekê bi azadiyê ve çi ye? Hezkirin û rêzdarî di nava kîjan pîvanan de ye? Girêdaniya vê yekê bi azadiyê re çiqas e? Pêwîste mirov bersiva van pirsan tevî bide. Jixwe li gel me azadî tenê bi şer tê bi destxistin. Ji ber ku em ne azadiyê koletiyê dijîn. Li gor ku di bin koletiyê de azadî nayê hizirandin, têkîliyeke azad jî nayê hizirandin. Ev jî rastiyeke û dualî ye. Hunê aliyekî vê yekê jî wiha bibînin, her çiqas em xwe azad hîs dikin û bi viyaneke azad têkîliyan datînin jî, ev xwe xelitandin e. Ev tenê di qadekê de ne, di hemû qadên jiyanê de wisa ye. Hun azad nînin, ji netewbûnê derketine, ji taybetmendiyên her civakê yên bingehîn dûr in. Bi vê rewşa xwe ve hun dikarin çawa bibêjin ku em azad in? Ew qaşo demokratên ku li ser bingehê dijmin, hatine xelaskirin dibêjin em azad in. Li ser bingehê tunekirin û bişaftina dijmin dibin demokrat û xwe azad dibînin. Ev nêzîkbûneke xeter e, tu pêwendiya xwe bi azadiyê re nîne, demagojîk e. Bi qasî ku bi welat û bi rastiya civakî ve pêwendiya xwe nîne, li gel dijmin têkîliyeke xwe ya li ser bingehê xayiniyê heye. Tu pêwendiyên xayinan jî bi azadiyê re nîne. Ji ber wê jî têkîliyên jin û zilam bi azadiyê ve girêdayî ye. Azadî, bi derbaskirina koletiyê ve gengaz e, ev yek jî bi şer ve gengaz e. Ji ber vê sedemê ger em dixwazin di têkîliyên jin û zilam de bigihên azadiyê hun neçarin jiyanê azad bikin.

Ev yek gelekî zelal e. Ger hun vê pirsgirêkê weke hevxapandinê û xelitandinê nabînin, ger hun dîtineke bi rengê hevpariya azad û şervantiya azad nêzîk dibin, we pê bawerî aniye, wê demê hunê vê bibêjin, hîna gelek karên ku em bi cih bînin hene. Tekoşîneke azadiyê ya ku em bi ser bixin heye. Gihiştina jinê ya zilam, gihiştina zilam a ji jinê re, di vê çerçoveyê de

wateyê diderbirîne. Ger ne wiha be, dê bibe ji rêderxistin, dê bibe lêyîstok, dê bibe durûtî. Gotina we ya "me hev dît em li hev hatin" û hev xistina we nayê efûkirin. Jixwe hindek hev digrin û direvin. Di vir de têkîliya şer û azadiyê ber bi xiyanetê ve tê birin. Çi pêwendiya we bi avakirina têkîliya azad ve heye? Ma we kîjan arîşeyê azadiyê çareser kir ku hun vê asayî bibînin? Bêyî ku hewldanên şerê azadiyê ku gelekî pîroz e were jiyîn, bi rastiya me ve bi taybet di nava partiyê de têkîliyên di navbera zayendan de yên bi wate, bi têkîliyên erzan ve nayên pêşxistin. Pêwîste mirov ji vê yekê bawer neke. Ev tenê rêgezek nîne, di heman demê de raveya rastiyê ye. Ji ber ku li gorî me, li ser têkîliyên jin û zilam pêwîste azadî serdest be. Ev rêgeza giştî em şerê azadiyê bidin jî nedin jî derbasdar e.

Lê belê ji bo me tenê rêgez têr nake, yek jî rastiya îro heye. Ew jî koletî ye. Hunê vê koletiyê bibînin, hun nikarin koletiyê ji neditî ve werin. Bi tenê xwe spartina rêgez û bi wî rengî têkîlî pêşxistin jî têr nake. Jixwe xala herî zêde ya ku heval xwe tê de şaş dikin ev der e. Qaşo li gor rêgeza azadiyê dikarin têkîliyê avabikin, dibêjin "ez azad im" û xwe dispêrin rêgeza azadiyê têkîliyê bi pêş dixînin. Ew şêwazê kesê ku di nava xefletê de ye. Gelo ma rêgeza azadiyê di şênber de tê jiyîn an na? Bi serkeftiye yan na? Gelek kes vî tiştî nahesibînin. Di bingehê têkîliyê  çelexwarî de ev yek heye. Wisa bawer dikin ku bêyî ku şerê azadiyê bimeşînin, dê têkîliya azad, evîn, zewac û dostaniyê bijîn. Ev xwe şaşkirin e, him jî xwe şaşkirineke gelekî cidî ye. Xwe şaşkirineke ku gelekî hêsan dikevine navê ye. Ev jî ji hemû aliyan ve rewşeke derveyî rastiyê ye. Ji ber ku derveyî rastiyê ye, têkîliyeke bitenduristî jî nîne. Qaşo girêdaniya dil, girêdaniya hest ew qasî bi hêze ku tu şer nikare wê hilweşîne. Em li kesê ku di nava têkîliyeke wisa de ne temaşe bikin, di nava du rojan de ava wê têkîliyê derdixin. Tê wê wateyê ku hun derewkar in, hun nikarin rast binirxînin. Piştre jî her yek ji we dibin belayek.

Me ev tişt got, çawa ku malbat li pêşiya azadiyê asteng e, ger ew neyê derbaskirin em nikarin bigihên azadiyê di nava partiyê de jî, ew pergala têkîliyan a ku dualiye jî, neyê derbaskirin em nikarin di şerê azadiyê de pêş

bikevin. Ger em malbatê û malbatgeriyê derbas bikin, emê bikaribin di azadiya civakî û netewbûnê de pêşketinan ava bikin. Di têkîliyên dualî de jî, ew seranseriya heye, tengbûn û sextetiya ku heye em çiqasî derbas bikin, hem dê şoreşê bi pêş bikeve û şerê azadiyê bihêz bibe, hem jî ji ber şerê azadiyê dê wateya têkîliyên di navbera zayendan de xwerû bibe, asayî bibe, dê her cure sergirtinan, derewan, dûrûtiyan û ji xapandinan were rizgarkirin. Pêwîste ev hêman baş were tê gihiştin û baş were pêkanînin. Erkeke me ya erênî jî, di vê benda çaremîn de veşartiye. Rêgeza azadiyê baş e, lê belê her tişt bi wê nayê çareserkirin. Ew bingeh e, ango di navbera zayendan de ferzkirin nîne. Hizirandina bi ferzkirinê, yan jî bi pereyan ferzkirina têkîliyan li dij rêgeza me ya azadiyê ya giştî ye. Bêyî ku rewşa koletî ya ku heye were derbaskirin, bêyî ku asta milîtanekî serkeftî were bidestxistin, bêyî ku ew bi xwe bandora şer a azadkirinê pêk neyne û wê nejî, mirovek nikare vê rêgeza azadiyê bi rê ve bibe. Ger hem di rêgez de hem jî di şênber de rewş ev be, pêwîste ya kevin ferz neke. Dawiya ew kesên ku dibêjin, “ezê tiştê dizanim bikim, azwerî gelekî bihêz in, hest, rêgez û rêpîvanan nas nakim” diyar e. Li gel me gelek kes vî tiştî dikin, ew jî yan dê biçin xiyanetê yan jî bibin xirabkarên ku nayên zevtkirin. Ma bi vî rengî nabe? Li gelek cihan ên ku xwe ferz dikin hene. Ev kes ji rêgez, azadî û ji bingehê dîrokî yên têkîliyên azad bêagahî ne. Ji rewşa şênberiyê jî bêagahî ne. Çi ye, qaşo gelekî hev diecibînin û dê hev bigrin û birevînin. Ev têkîliyekê dizî ya herî hov û ketîbûnê ye. Ji ber vê sedemê yê ku ji refên me direvin jî hene. Hindek kes bûne navgînên provakasyonan jî. Heta li partiyê rexneyên neheq jî dikin. Ev dijminê azadiyê ne, mirov dikare tîpên wiha weke kujerên têkîliyên pîroz binirxîne. Wan gelekî partî jî xirabkirin, ji hêz xistin, pêşkêş kişandin, ji bo azwerî û hestyariyê nirxên herî bingehîn ber bi xiyanetê ve birin. Xebitîn ku gelek eniyan birûxînin. Ev di nava partiyê de bûn û endamê partiyê yên demekê bûn. Lê belê ji ber ku bala xwe li rêgezên azadiyê û şênberbûna wê nekişandin ketin vê rewşê. Di serî de ne sîxur bûn, li ser bingehê hestan û azweriyên ku nikaribin xwe li ber bigrin nêzîk bûn. Encam jî rewşeke ku ji xiyanetê hîn xetertir bû. Ji vî aliyî ve gelek mînakên vî tiştî hatine jiyîn. Wê demê pêwîste em vê birînê baş fêm bikin.

Em baş têbigihên ku ger kole bi hêsanî nikarin malbatan avabikin, ji bo me jî ku em koletiyeke bi caran dijîn, têkîliyeke azad ewqas bi hêsanî nayê avakirin. Ev pêwîste baş were zanîn, hun di dibistan û saziyên çandî yên Tirkiyê de fêrî "dê çawa evîndarbûn çêbibe?" bûne. Dibe ku we romanên klasîk ên cîhanî de jî xwendibe, gelek ceribandin li pêşiya çavên we ne. Ger ev tiştên ku di PKK de tê pêkanîn azadî be, ger her cure rabûnên ji nû ve di şoreşa Kurdistan'ê de be, wê demê hunê girêdayî vê rêgezê bin û baş bizanibin û wê pêk bînin. Ger bi wî rengî be ew têkîliyên di romanên cîhanî de çine? Ew têkîliyên ku bi zaravayên Kemalîst tê pêşxistin çi ye? Ew têkîliyên ku di çarçoveya kapîtalîzma di Tirkiyê de di bin zextên saziyên çandî ku bûrjuvaziya Tirkiyê bi rê ve dibe (di bin zextên îdeolojîk, em bibêjin rêpîvanên feodalî) çi ne û ev tişt xwe di nava me de çawa didin nîşandan? Di bin bandora van de mayin, bi wan re tevgerîn û çûyîna hindek çareseriyên sexte bi qasî ku li dijî xwezaya şerê me ye di heman demê de jî zehmet e. Pratîk vî tiştî didin diyarkirin.

Koleyan ji bo ku mafên xwe yên avakirina malbatê bi dest bixin bi sedan salan şer kirin. Bi heman rengî pêwîste herî kêm hun jî çend salan şer bikin ku bikaribin mafê têkîliya azad bi dest bixin. Gelek ji we ji vî tiştî agahdar nînin. Bi dest xistina mafê têkîliya azad hêsan nîne. Dest danîna ser hindek têkîliyên partiyê yên amade xeter e. Ew nêzîkbûnên ku dibêje, "çawa be jî ez bi bandor im, çi bibêjim dê bikin ji bo şervanan bibêjim bimre dê bimire, ji jînê re bibêjim xwe bispêre min dê xwe bispêre" xwe rave dike nêzîkbûnên kevin û gelekî xeter in. Di nava PKK de bikaranîna bi vî rengî ya têkîliyan tê wateya nîşandana wêrektiyê ku berê xwe dide şêweyên xeter û ew jî wî kesî mehkum dike. Têkîliya xeter dê zû yan jî dereng wî kesî xilas bike.

Ya pêncemîn, ger têkîlî bi azadiyê ve, ger azadî jî bi şer ve were girêdan di encamên vê de dê hezkirin bi pêş bikeve. Ev rêgezeke rast e û hezkirina rast jî bi van rêgezan ve hatiye girêdan. Ger ji çar hêmanên destpêkê encam were girtin wê demê ji hêmanê pêncemîn jî dê encam were girtin û emê bikaribin ji pirsgirêka hezkirinê re nêzîkbûneke rast avabikin. Ger li gel we

ev her çar hêman di nava hev de negihiştibe serkeftinê hunê jî nekaribin bigihên hezkirinê. Hezkirin, encameke ku weke dareke fêkî bide, hunê şitil mezin bikin dê şax û çiqilên darê çêbibin, gul bidin û piştre jî fêkî bide. Vaye hezkirin ev e. Di gelekan de hezkirin, bêdar û bêgiha ye. Tenê bi rengê encam e.

Min hîna di serî de ji hestan û hezkirinan guman dikirin, min digot ev van hestên seyr ji bo çi dipejirînin? Hez dikirin lê belê li ser kîjan bingehê? Ma welatê wî, mala wî xirab bûye, paşeroja wî nîne, ev ji bo çi pêwîstî bi evqasî bi hev ve girêdaniyê dibînin? Min ev dîtin û ez jê zinixîm. Him jî gelekî jê zinixîm. Niha tê dîtin ku ez biheq im, li gor min hezkirina rast piştî bi cih anîna her çar hêmanan dê bi pêş bikeve. Di hezkirinê de kêmasî û xirabî nayê gerîn. Hezkirin nayê rexnekirin. Lê belê ger girêdayî wan hêmanên bingehîn be. Ev wiha ye. Berovajiyê vê bi lenet e, bi zinixî ye. Hezkirin pirsgirêkeke netar (notr) nîne. Dagirkerî û faşîzm bi taybetî ferz dikin ku, ev bi vî rengî ye. Faşîzmê got ku “li hemberî hev bi dilrihm bin, ji hev hez bikin” herî zêde ev peyv bi kar anî. Mî û gur kirin gel hev û gotin “ji hev hez bikin” di asteke balkêş de, kirêt û xweşik anîn gel hev û gotin hez bikin. Faşîst û şoreşger anîn gel hev gotin “li hev werin” em dizanin ku pergalê dixwest çi qasî tiştên “nabe” bike “bibe”. Qaşo vê gavê jî dibêjin, Kurd û Tirk dê bi hezkirinê bikelijin. Dixwazin bang li hestan bikin ku li ser bingehê ji rastiyan qut vê rewşê xilas bikin.

Ev feraseta hezkirinê feraseta faşîzm û dagirkeriyê ye. Feraseta hezkirinê ku gelek kes tê de dijî û salane ferz dike jî ev e. Ev hezkirin ji naveroka dîrokî dûr e. Ji pergala çewisandin û dagirkeriyê, ji kirêtî û pirsgirêkên malbatî dîsa ji kedê bêagahî ye. Ez bawer nakim ku hezkirineke li ser bingehê derveyî rastiyê bi wate be. Hebe nebe, nirxê vê hezkirinê bi qasî ku hun di kerxaneyan de dibînin e. Ew bi qasî têkîliyên li bazarên Ewrûpa û metrepolên wê ku di navbera zayendan de pêş xistiye bi nirx e. Dibe ku ew qas nirxê wê jî tunebe. Ew hezkirina ku berdevkê faşîzma Tirkan ferz dike ew qas nirxê wê jî nîne. Jixwe wiha nebûna vî tiştî jiyan bi xwe nîşanî me dide. Tirs, zext, dagirkirin, kirêtî, bêhezkirinî û helwestên hovane hiştiye ku

civak mehf bibe. Di rastiyê de herî zêde di bin navê hezkirinê de hezkirin kuştine û tunekirin e, lê belê dîsa jî herî zêde ew behsa hezkirinê dikin.

Ya rast, feraseta hezkirinê ya ku em dixwazin pêş bixin e. Pêwîste em di hezkirina ku bingehê wê yê rastî heye û feraseta wê de bi israr bin. Lê belê pêwîste em rasteqîn bin. Bêyî ku di van hêmanan de hun serkeftî bin, hun nikarin di hezkirinê de serkeftî bin, hez bikin û werin hezkirin. Bi gotina "min hez kir, çavên min dît, dilê min xwest, me li hev nihêrî em li hev hatin" ve hezkirin nabe. Ji bo çi? Ji ber ku hun ji xeteriyên mezin û wê ev hezkirin çi bîne bêagahî ne. Bi vê têkîliyê ve hunê di roja diduyan de bibin xayin. Ji bo ku hun vê têkîliyê rizgar bikin, hunê xwe bispêrin dijmin, naxwe ev feraseta hezkirinê rast nîne, hela meseleyeke din qet nîne. Ew mijareke şer e.

Koleyan ji bo çi bi sedan salan hizra avakirina malbatê neanîne bîra xwe? Ji bo çi karê dil bi hêsanî nayê bîra jinên kole, zilamê kole, rêncberên jin, rêncberê zilam, karkerên jin û karkerên zilam? Ew nikarin wisa bi hêsanî têkîliya dil bi pêş bixin. Jiyan, ji bo wan tiştekî gelekî cuda ye. Sedemên wê hene, naxwe yên din rewşeke ji rê derketinê rave dike. Ber bi qurbanbûna taktîkên faşîzmê yên xapandina gelan, dagirkeriyê û emperyalîzmê ve dibe. Wê demê hunê di vir de helwesteke exlaqî raber bikin. Di mijara hezkirinê de helwesta exlaqî ew e ku mirov nebe hêsîrê têkîliyeke erzan a hest û dil. Hunê di vir de gelekî hişk bin. Hunê bi xwe re di nava şerekî rast de bin. Bi qasî şerê ku hun li hemberî dijmin dikin, hunê li hemberî şêweyê têkîliyan ku ew ferz dikin û gelê me dixe jî şer bikin. Hunê li hemberî şêweyên sîxuriyê yên objektîf û subjektîf ku li ser vî bingehî pêş dikeve jî şer bikin. Bi qasî ku şer hate kirin, bûyera ku jê re tê gotin hezkirin jî dê bingeh bigre.

## Bêhezkirinî dijberiya şoreşgerî û jiyanê ye

Hezkirineke ji rê hatiye derxistin û xwe spartiye bingehên seqet, rengekî din ê qetilkirina jiyanê ye. Lê belê rengê vê yê ku ji rê derketiye jî herî kêm bi qasî wê xeter e. Gihiştina hezkirinê, tê wateya gihiştina jiyanê. Ger mirov gihiştina hezkirinê nezane tê wateya ji şoreşê tênagihije. Lê belê gihiştina

hezkirina erzan jî şer nekirine,bêhewildanî ye û heta bêhizirî ye. Ev jî gelekî girîng e.

Ew her çar hêmanên ku me hêjmartiye bi hizirandinê ve girêdayî ye. Em ji bingehê dîrokî bigrin dest, heta asta felsefî û zanistî hûnê bihizirin. Nexwe têkîliya hezkirinê bi hizir, felsefe û zanistiyê ve heye. Ji bo ku hûn gavekî ber bi hezkirinê ve bidin avêtin, pêwist e hinekî agahiya we ji felsefe û zanistiyê hebe. Girêdana şer bi hezkirina rast ve heye. Li gel me azadî û têkîliya azad bi tenê şer ve tê bi dest xistin rastiyeke ku bi şer tê pêk anin e. Di rêya hezkirinê de hezar û yek hest û girêdaniyen bi navê hezkirinê hatine derxistin û xefik hene. Hûnê neyêne van leyîstokan. Hûnê xwe li hemberî her cûre rengên hezkirinê yê ku ji rê derketiye bêhezkiriniya xapînok bi sekinandineke saxlem ve li şûn xwe bihêlin. Hûnê bizanin ku bêhezkirinî dijberiya şoreşgeriyê û jiyanê ye. Teqez pêwist e ku dunyaya we ya hezkirinê hebe pêwist e hûn bigîhine vê dunyayê. Hûnê bibêjin ‘Pêwist e ku hezkirina min hebe. Pêwiste ez di rewşekê de bim ku bêm hezkirin û hezbikim.’

Hatina rewşeke ku dikare hezbike, tê wateya di wan herçar hêmanên ku me diyarkirye de serkeftî bûne. Ger mirov di wan her çar hêmanan de û di hêmanê pêncemîn de ku ew jî encamê wan yê din e, bi serkeftî be, tê wateya ku hûn gihiştine asta hezkirinê. Ev di heman demê de tê wateya hûn gihiştine asta bikaribin hezbikin. Dema hûn gihiştine van taybetmendiyan tê wateya ku we hem hezkirinê de hem jî hatina hezkirinê de kesayet avakiriye. Berûvajî vê hûn nayên hezkirin û nikarin hezbikin. Hinek dibêjin “dile min xwest ez hezdikim, ew jî ji min hezdike, hûn nikarin bibine asteng.” Ev derew e. Bi vî rengi hatina hezkirin û hezkirin nabe. Pêwist e hûn bingehê zanistî deynin û nexelitînin. Ji xwe hûnê rojekê benê hezkirin, roja duduyan jî benê avêtin. Hûn nikarin bersivê ji hezkirina xwe re bibînin û bi erdê ve bibine yek. Ji ber vê jî xwe nexapînin û nekevine nav bûyera hezkirin û hatina hezkirinê ya ku li ser bingeha xelet de pêşdikeve. Pêwist e di hêmanên ku hatine hêjmartin de serkeftin çêbibe.

Kesayeta Kurd ji bo çi nayê hezkirin? Ew kesên ku pêwîst e di dinyayê de herî zêde werin hezkirin, ji bo çi di vê mijarê de û di rizgariya welat de ne serkeftî ne? Ji bo çi di azadiyê de, şer de, di hemû pirsgirêkên rêxistinî de ne serkeftî ne? Kesekî ev qasî bêserkeftine, ji bo çi were hezkirin? Jixwe kirêt e jî. Girêdayîna kirêtîbûn û xweşikbûnê bi tiştên ku hatine jimartin ve heye û misogere ku, bûyereke civakî ye. Ger di van hêmanan de serkeftî bin, hun xweşik in, berovajiya vê hun kirêt in. Asta vê ya fîzîkî jî heye, asta fîzîkî yê kirêt û xweşik diyarker nine, ya diyarker di hêmanên ku hatine jimartinê de rewşa serkeftîbûn û bêserkeftinîbûyînê ye. Bi qasî mercên hezkirin û hatina hezkirinê, pêwîst e ku hun baweriya xwe bi pêwîstiya hezkirinê binin. Hun nikarin bibêjin, “ez bi sernakevim, di van hêmanan de serketina min zehmet e. Wê demê ezê hêviya xwe ji hezkirinê qut bikim. Bila tu kes ji min hez neke û ez jî ji tu kesî hez nakim.” Ev yek jî ne rast e. Pejirandina vê tê wateya hêvî ji şer û şoreşê qutkirin e. Heta ji partiyê, gel, ji jiyanê hêvî qutkirin e. Şoreşger ne mirovên ku hêviya xwe ji jiyanê qut bikin in. Wan her tiştên xwe, fedayî jiyaneke azad kirine. Naxwe hunê her dem hezkirinê di xwe de weke azweriyeke mezin bihêlin. Lê belê bêyî ku mirov bikeve nava hizrên “nabe” û xefikan pêwîste mirov derfetên serkeftinê û pêkhatinê bide wê. Ev jî, kulîlk vekirina milîtaniyê ya di kesayeta wê de ye û serkeftina egîdiyê ye. Egîdî digihê lûtkeyê serkeftinê.

Weke tê ditin, riya ku diçe serkeftinê bi qasî ku bi zehmetiyan ve dagirtiye, ew qasî jî girift e. Di vê riyê de meş, egîdiyê dixwaze. Ger em wiha bikin, ew şertên civakî yên di welatê me de ku gelê me jî dijî, bêhezkiriniya mezin, dexesî, bêrêzî dê were derbaskirin. Em di wateyekê de şoreşa xwe li hember rewşa ku welatê me ketiye nav de, ango bêhezkirinî û mîratebûn ku tê pêşxistin, di heman demê de jî li hemberî bêhezkiriniya mezin ku di dilê gelê me de heye, me ev şoreş pêş xist. Şoreşa me şoreşa hezkirinê ye, şoreşa hezkirina welat û gel e. Lê belê şoreşa hezkirinê li hemberî ev qasî, zinixî û zordariyê bi şerkirinê ve pêk tê. Ger ne wiha be, gotina faşîzmê ya “hezkirin her tiştî çareser dike” ji cewher dûrxistin e. Tê wateya bawerî anîn û xapîna derewên faşîzmê, hatina lêyîstoka wê ya mezin

e. Mixabin hun di mijara hezkirinê de hatine vê lêyîstoka mezin. Em hindekî we, ji vê lêyîstokê dikişînin û derdixin. Em we bi serê xwe bihêlin, kê dizane hîn dê çi were serê we. Em dibînin, bêyî ku hun hewl bidin, çi qasî ji hev hez dikin. Ma hetanî duh jî, we bi vê yekê bawer nedikir? Dibe ku we bêyî ku bikevine zanebûna wê, we ji mar hezkiribe, we mar xistibe şûna evîndara xwe, ma ev yek ne hun in? Hun bi kirêtiyê ve hetanî qirika xwe, di himbêza hev de dijîn. Pêwîste hun lêpirsîn bikin ku, şêweyên jiyana we çi qasî di çerçoveya feraseta hezkirinê ya dijmin e. Ma yê ku feraseta hezkirinê ya dijmin dijî, gelo dikarin ji hezkirina rast para xwe bigrin? Gelo jiyana ku hun dijîn, çi qasî weke jiyaneke pîroz tê pejirandin?

Ez van hemû tiştan ji bo ku we bitirsînim naynim ziman. Pêwîste misoger jiyana we di ber çavan re were derbaskirin. Ez dixwazim, vê pirsgirêkê bi taybet di astên feraset de zelal bikim. Dibe ku gav bi gav, derbaskirina vê ya jiyanê bi sedan salan çêbibe. Min ji bo ku têkîliyeke ku were hezkirin û mirov bikaribe vê yekê bijî, ev qas salên xwe da. Min jî di vê mijarê de çend gav avêtine, hun dixwazin her tiştî di carekê de çareser bikin. Sedemeke ku milîtaniya we zêde ne rasteqîne jî ev e. Ez her dem behsa kesên dixapîne û dixelitîne dikim, sedemeke vê ya herî bingehîn jî di nava çerçoveya ku we avakiriye de ye. Hun xwe yan mehkumî bêhezkiriniyê dikin, an jî hezkirina sexte. Dilê we çawa dikare vî tiştî hilgire? Mêjiyê we pêwîstiya hizirandinê jî nabîne. Ev çîroka we ye. Hun dikarin di milîtaniyê de, egîdiyê de, hestên mezin de û hezkîrinê de çi qasî bi xwe bawer bin?

Gelek ji we hezkirina xwe ya zarokan heye. Hindek heval ji bo ku zarokan çi qasî hezdikin raber bikin, bi zarokan re henekan dikin. Mirov dikare bi vê yekê bikene û derbas bike, ji ber ku jiyana zarokên me hatiye pêrîşankirin, ji bo hezkirina wan tenê nefesek jî nehiştine. Lê belê gelek kes vî tiştî ji rêzê dibînin. Dibêjin, “xweziya zarokekî min jî hebe, ez jî bi vî rengî jê hez bikim” dinya wî reş bûye. Feraseta wî jî bi vî rengî ye. Kesên wiha, deh salan jî di nava me de bijîn, di encam de ew dijberê partiyê ne û revok in. Di hewaya xortan an jî keçan de bêhna azweriyê heye. Dibe ku mirov ji van re tiştekî nebêje, lê belê dema tu wan bi azweriyên wan re li gel

hev dihêlî, roja diduyan şerekî mezin dest pê dike. Azweriyên mezin, hestên mezin di mercên xwe de digihên wateyekê. Mezinkirina zarokekî baş, di mercên welatekî azad û serbixwe de, bi şertên civaka azad de derfetê peyda dike. Azweriyên mezin, tenê di qadên xwe de dikarin derfeta jiyanê peyda bikin. Wekî tê zanîn, dema du kes hev direvînin, daweta wan li dar dikeve, lê belê roja diduyan hun biçin binêrin, hemû ketine nava hev. Ji hezkirin û rêzdariyê tu şopek xuya nake. Gelo çi wateyeke van azwerî û hezkirinên wiha heye. Jiyana pratikî raber dike ku, ev yek ne wiha ye.

Ev rexneyên ku ez li we û civakê dikim, rasteqîn in. Duayeke ku neyê pejirandin, ji bo çi em jê re bibêjin amîn? Hezkirineke ku hun nikaribin bi pêş bixînin, ji bo çi emê jê re bibêjin, hezkirineke baş e? Azweriyeke ku welat û gel nayne asteke bixêr, ji bo çi em jê re bibêjin, azweriyeke rêzdar e? Mixabin, di şûnde ya ku bi zehmet dimîne, em hindekî jî kole ne. Koleyan bi hezaran salan, malbat, zarok, jin, zilam çi ye nehizirîne. Dibe ku em weke wan koleyan nînin, lê belê ji hindek aliyan ve em di rewşeke xirabtir de ne. Mînak, di qutbûyîna ji welat û civakê de ev yek bi vî rengî ye. Ji ber wê jî pêwîst e, em hindek hest û ferasetên xwe yên jiyanê hindekî din rasteqînêr nêz bibin. Ez van tiştan, ne ji bo ku hezkirinê mehkum bikim dibêjim, ji bo ku di nava me de dê hezkirin çawa bi rê ve biçe, bi çi ve girêdayî ye? Zelal bikim, diyar dikim. Welat jî, gel jî, şer dixwaze êdî şer bûye navê jiyanê, ev yek di heman demê de, dibe watedayîna şervantiya we. Tevlîbûna we bûyereke ku ev qasî jiyanê diafrîne, ji ber vê naveroka xwe ve we pîroz dike.

Îro şer ji bo çi ev qasî bûye weke azweriyekê? Ji ber ku îro şer afirandêr û zayinêrê her tiştî ye. Me ev yek hindeki, bi civakê tê gihand, sibe emê hîna zêdetir tê bigihînin. Ger em îro bi we jî bidin fêmkirin, hun dê gelekî balkêş şer bikin. Ji ber ku jiyana we di encamê şer de veşartiye. Rizgarbûna we, ji her cure kirêtî, bêhezkirinî û heqaretê kêm zêde bi dayîna we ya vî şerî ve gengaz e. Ger bi hemû kûraniya wê ve were fêmkirin, hunê bibin şervanên gelekî balkêş. Siya jiyanê heye, ew bi xwe nîne, navê jiyanê heye ew bi xwe nîne. Gelo yê jiyan bi xwe çawa bibe? Naxwe, wê jiyan bi şerkirinê bibe.

Ew kesên ku hun gelekî jê hez dikin, hunê bi vî awayî bigihênê. Ji beriya her tiştî ger hun wiha şer bikin, dê her parçeyekî welat ne weke kavilekî, weke bihuştê bixuyê. Dê ew malbat, dayik, bav, hevjîn û dostê ku hun jê direvin, dê li we weke heyînên herî xwedî nirx bixuyên. Gelê we, weke navnîşaneke ku hatiye jibîrkirin na, dê bigihê rastiyekê ku weke nan û avê bi hev re bijîn. Dema ku em vê daxînin têkîliyên jin û zilam, ne weke xerîban li gor pênaseya du perçeyên xwezayê ku hev cihê nabin, teqez hev temam bikin, dê derbikeve holê. Mirovê dê li ku derê û çawa bigihê vê rastiyê? Hemû nîqaş, polîtîka, hizirandin, avakirina partiyan û pêşvexistina şer ji bo gengazkirina jiyaneke bi vî rengî ye. Dibe ku di jiyanê de azweriyên kor, nêzîkbûnên derveyî rastiyê we bidin jiyîn, lê belê ev tişt serkeftinê naynin. Hun di vî aliyî de gelekî ketin, we serê xwe li çepê û rastê da, lê belê dîsa jî encam nîne. We nekarî ne malbata xwe, ne jî hevjîn û dostên xwe ji merhebayekê xelas bikin. Wê demê me ji vê jiyanê çi fêmkir? Gelo em dikarin ji vê re bibêjin jiyan, an jî azadî? Bihizirin û di mijara jiyanê de plansaziyên baş ava bikin. Bibin rêxistinêr û çalakvanên baş. Ev dê riya jiyanê raberî we bike. Dê derfetên hezkirinê bide destên we. Dê ji bo gihiştina dinya hezkirinê derfetan amade bike û wê demê hun dikarin bibin evîndarek. Di gelek nameyan de wiha dinivisînin. “Evîndara wiha û wisa” ez ji van peyvan şerm dikim. Bi heqbûna min, vê gavê hîna baştir tê fêmkirin. Li gel me zêde evîndar nînin. Ev asta ku heye ve gihiştina wê jî gelekî zehmet e. Çi kêfxweşiyeke ji bo wan hevalên ku gihiştine asta ku me diyar kiriye, hemû gel û rêhevalên wan ji wan re dibêjin, heyînên me yên evîndar. Gihiştina rengekî wisa bi tenê şertekî ku me diyar kiriye ango serkeftî şerkirin, qehremanbûn û egîtbûnê ve gengaz e. Ev yek jî bi zanebûnê, bi jêhatiyên polîtîk û leşkerî yên cidî ve gengaz e. Ger hun wiha bin, ji bo çi em ji we hez nekin? Ji bo çi em ji bo we çepikan lê nedin, ji we re nebêjin, ji pîroziyan hîn pîroztir cihê we heye? Ji bo çi ez xwe layiqî tiştekî erzan û cihekî ku min heq nekiriye bibînim? Ev yek dibe sextekarî. Tê wateya ku ez xwe û yên din dixapînim. Ez vî tiştî nakim. Lê belê ji bo dîtina riya rast jî mijulbûnên min hene. Bêyî ku zêde xeletiyan bikim, ji rê derbikevim û tevlîhev bikim ez hewldanan nîşan didim. Helwesta min ev e.

Ez li we gelekan temaşe dikim, hun ji me dixwazin ku, em we weke zarokan li ser destan bigrin. We xwe ne aniye astekî ku hun cidî werin girtin. Ezê çawa ji we hez bikim? Ez bi hêsanî ji kesekî hez nakim. Gelo ev xwe gelekî ecibandin e, gelo ev qas rexnekariya min, ji ber ku ez tu tiştî rast nabînim e? Naxêr, ev hemû tişt ji bo yê rast, ê ku tê ecibandin derxistina rastê ye. Hunê rexne bikin, lê belê piştre jî hev biecibînin, gelo hunê bi vê çi bi dest bixin? Gelo ma hun dikarin du kesan bînin gel hev? Lê ez dikarim bînim gel hev. Mirov bi min re hatine gel hev û hîn jî tên.

Di nava partiya me de, em mirovên hez dikin û rêzdariyê nîşanê hev didin li aliyekî bihêlin,yên ku hev weke rêhevalên dilsoz pêşwazî dikin gelekî kêm in. Gelo çend kes, ji bo ahengî, yekîtî û şerekî hevpar dikarin werin gel hev û bi hev re kar bikin? Ger hun nikarin werin gel hev gelo ma wê demê hunê behsa kîjan hezkirin û rêzdayînê bikin? Hun di vê mijarê de xwe dixapînin. Ev yek jî rewşa pêkneanîna ahengiyeke rast û hev ne ecibandinê rave dike. Hev ecibandin di çarçoveya şer û li gor têkîliyên şer bi hev re meşê ve çêdibe. Hunê ew kesên ku bi hev re dimeşin, nekine kadroyekî baş bi ser de jî hunê bibêjin, “me hev eciband” bi vî rengî him hun xwe dixapînin him jî têne xapandin. Di we de ev kêmasî hemû hene û hun ketine nava van xeletiyan.

Weke ku min diyar kiriye, sererastkirina vê yekê jî şer dixwaze. Ez naxwazim vî karî daxînim astên hunerî û estetîkê. Pêwîste ew jî werin bi dest girtin.Di şoreşên giştî de bi taybet jî di şoreşa me de pêwîste mirov balê li avakirina hunerekê bikişîne. Pêwîste milîtanekî şoreşger çalakiya şoreşgerî weke hunerê bineqişîne. Şoreş, hunera herî pîroz e. Şoreşger jî, hunermendekî herî mezin e. Dema mirov balê li vî tiştî bikişîne, pêwîste hun hizrên xwe hest û çalakiyên xwe heta fîzîka xwe weke hunermendekî bi pêş bixînin. Ev yek hetanî dawiyê bi hev ve girêdayî ne. Hunermendiyek û dema ku pêwistiya wê hate bicihanîn, jiyan û dinya hezkirinê wateyeke bi dest dixîne. Pêwîste şoreşa me weke din neyê fêmkirin, weke din neyê şîrovekirin. Dibe ku gelek kes, şoreşa me weke tevgereke hilweşandinê bibîne, dibe weke tevgereke hêrsê binirxîne, lê belê tevgera me, tevgereke

jinûve avakirinê û nirxa herî pîroz dayîna hezkirinê ye. Tevgera ji bo hestan û hezkirinê bi rengekî herî rast û herî pîroz gihiştinê ye. Ev yek tê çi wateyê? Tekoşîna di wir de û şêwazê meşandina rêxistinê, şêwazeke herî nêzî tekûzbûnê ye. Kesayetên wan jî bi qehremanî ye. Sererastkirina bi vî rengî ye.

PKK ku di bin berpirsyariya me de bi pêş dikeve, pêwîst nake mirov nîqaş bike ku wiha bi pêş dikeve. Ji ber ku tiştên têne vegotin, çîroka rastiyê ye. Tê dîtin ku weke di hemû şoreşan de çêbûye, di şoreşa me de jî saziyên ku pêwîste werin rûxandin û werin derbaskirin, bi qasî ku di van saziyan de têkîlî, feraset û azweriyên werin derbaskirin hene. Ew qasî jî saziyên ku li şûna van jinûve werin avakirin û nirxên mezin hene. Hizirandina rast û nêzîkbûna rast di astê felsefîk de fêrbûneke exlaqî ye û zanistiyê ve girêdayî ye. Ya herî girîng jî girêdaniya vê bi çalakvan, rêxistinkar û şêwazên şer ve gelekî berfireh hate destgirtin. Di giştî de ji bo hemû şoreşan wiha ye. Ji bo şoreşa me jî bi vî rengî ye. Ger ev welatê me Kurdistan û herêma ku ew tê de cih digre Rojhilat a Navîn be, dest girtina bi vî rengî hîn zêdetir girîng e.

Vê gavê bi tenê em dikarin pirsgirêkan danin rastê û li ser riyên çareseriyê yên ku çêbibin rawestin, nîqaşan bi pêş bixînin. Tişta herî girîng jî, em bi milîtanî nêzî pirsgirêkê dibin û girêdaniya wê ya bi şer ve gelekî baş datînin. Encamgirtin sebreke mezin û hostetiya hewldanê dixwaze. Weke din em ji şoreşê re xirabiyê neynin. Bi taybet em bawer in ku, şehîdên me li ser vî bingehî bi jiyanê ve girêdayî bûn. Naxwe, wan bi vî rengî xwe feda nedikirin. Herî kêm ji bo şahadet û wesiyeta wan, bi şoreşeke wiha bersivandin tê wateya layiqbûna bîranîna wan. Ev yek rastiyeke kûr e ku gelê me li ser vî bingehî derfetên jiyanê di me de dibîne, her tiştê xwe fedayî şoreşê kirine û tevlî vî tiştî bûne. Dibe ku hun ne di zanebûna vê yekê de bin jî. Ji ber ku gelê me ketiye zanebûna vê jiyanê, hun li vê derê ne û li hemberî zehmetiyên mezin li ber xwe didin.

Emê rastiya şoreş, partî û şer ji her demê zêdetir bibînin. Emê dîsa bibînin ku ji bo em ber bi dinyayeke bikaribin hîna zêdetir tê de bijîn, tevlî şoreşê bûne û bi qasî ku me ev yek dît, emê kar bikin û bi wî rengî hîna

baştir bibin. Bi qasî me mezinbûna wê hîskir, hizirandina wê hate kûrkirin, çalakî û rêxistina wê gelekî pêwîst hate dîtin û hate serxistin emê bibînin ku gihiştina dinyayeke em tê de bikaribin bijîn û jê hez bikin ava bûye. Gelê me bi tenê ev welatê me yê ku tê de şopeke hezkirinê û jiyanê nehatiye hiştin bi vî rengî şerkirinê ve dê bigihê welatekî ku mirov dikare tê de bijî û rastiyeke gel ku mirov jê hez bike. Şoreş ji bo vê yekê pêwîst e. Şoreşger jî ji bo armancên wiha yên pîroz vê fedakariya mezin û wêrekiyê raber dikin, hewldanan pêk tînin. Tu asteng nikarin wan ji armancên xwe yên pîroz ên wiha û dinya ku ew dixwazin biafrînin dûr bixe. Di destpêkê de ew çi qasî lewaz dibin bila bibin, em dizanin ku ew dinya, dinyayeke afirandinê ye û li ser vî bingehî her cureyê afirandêriyê û hewldanê pêş dixin. Digihên jîneke wiha û dinya hezkirinê.

Tiştên ku hatine diyarkirin girîng in. Pêwîste encamên gelekî dorfireh jê werin derxistin. Em di bin bandorên pirsgirêkên kesayetê de ne. Bi taybet ew rewşên ku di têkîliyan de hatine afirandin, zextên dijmin jî bi me dane jibîrkirin. Li hemberî erkên jiyanî, watedayîna têkîliyên we me dixe nava tengasiyê. Ew jî tê fêmkirin. Ev êşên şoreşgerbûnê ne. Lê belê pêwîste ku hun xwe dermankirinê jî bizanibin. Di rastî de em rûberûyê kesayetên gelekî binketî û xwe ji bo pejirandina her tiştî razandine ne. Ev yek me tengav dike. Ew nêvenga giran a demagojîk hêza gotinê lewaz dike, ew qutbûyîna ji dinya hizirandinê pêwîste were çareserkirin. Di heman demê de terbiye xwedî nirxekî zêrîn e. Hun ne dikarin bibin şagirt ne jî mamoste. Di vê dinyayê de hun naxwazin ne çavên we, ne guhên we ne jî mêjiyê we vebibe û bijîn. Derfetê di riya rast de bi hezbûnê heye. Hindekî bi ser xwe de biçin, hest û kesayeta xwe perwerde bikin. Derfetê perwerdeyê heye, weke din pêdîviyên xwe yên bingehî diyar bikin. Pêwîstiya serkeftinê di xwe de hîs bikin û bi ser bixin. Weke din ev kar nameşe. Xwe spartina hizirandina rast ve bijîn. Xwedî rêgez bin. Rêgezan bidin axaftin. Di vê mijarê de hindekî girêdayî bijîn. Pêwîste êdî bûyîna mirovekî biryarê hêza pêkanînê di xwe de bi ser bixin.

Deh kes kar dikin, yek xirab dike, bi erzanî dixwaze dest dayne ser. Êdî pêwîste em di vê mijarê de hêza xwe ya venêrînê pêş bixin. Mirov dikare ji bo pirsa “çawa bijîn?” bersivên hîna nêziktir bide. Li ser vê bingehê hun di derbarê jiyîna rast de, sondên balkêş dixwin. Lê belê gelo hun dikarin hetanî dawiya temenê xwe kesayeteke bi vê ve girêdayî bimîne nîşan bidin? Hun dê tengav bibin. Bi ya rastî, pêwîste em hetanî dawiya temenê xwe bi dilsozî girêdayî bin. Ev tiştên ku hatine diyarkirin, di nivîsandina gelek romanan de ristekî kilît dilêyîze. Dikare ji bo jiyanê nêzîkbûnên cihêreng û yê ku çareser dike, derfetan ava bike. Di pêşketina pîvan û jêhatiyên hilbijartinan de û têkîliyan de dikare risteke gelekî girîng bilêyîze.

Nêzîkbûna milkiyetê û malbûyînê di têkîliyan de gelo rast e? Bi taybetî ew milkiyet û malbûna di têkîliyan de bi qasî aliyê exlaqî, ji aliyê siyasî ve jî tê çi wateyê? Li gel ku hêmaneke girîng e, xaleke ku hîna zêdetir were zelalkirin ev yek e. Li gel zayendîbûn di tekoşîna siyasî de weke amurekê tê bikaranîn, milkiyet li ser tê kirin û weke malekî tê hizirandin. Nayê înkarin, ez di vê baweriyê de me, pêwîste ev yek nebe helwesta me ya exlaqî û siyasî. Di rastiyê de pêwîste malbûyîn derveyî exlaq û di polîtîkayê de nêzîkbûneke herî oportûnîst were nirxandin. Ev bi qasî ku di astê rêgezên giştî de rast e, di rastiya me de jî ev bi rengekî gelekî xeter tê jiyîn. Em vê yekê dibînin. Heta tiştê li gel me tê jiyîn, em dikarin bibêjin cewherê milkiyet û malbûnê ye. Ger ev yek bi vî rengî be, ev yek bi rêgeza azadiyê ve gelo nakeve nava nakokiyan? Em di wê baweriyê de ne, yekser di nava nakokiyê de ne. Ji ber wê jî, têkîliyên ku hun dijîn, her dem milkiyet û malbûnê diafrînin. Ev jî, tu têkîliya xwe bi rêgeza azadî û sosyalîzmê re nîne. Bi wê re di rewşeke nakok de ye. Lê belê ji ber sererastkirina civakî – ku ev aliyekî wê ava dike- giran derbas dibe. Têkîliyên nêzîkbûnên we, ji milkiyetê qutkirin cewherê wê yê ku xwe spartiye malbûnê tunekirin gelekî zehmet e. Bi qasî zehmet e, pêwîstî bi tekoşîneke serketî heye. Em xwe nekin mijara milkiyet û malbûnê. Milkiyet, ger bi rengê mal, bibe malê kesayet dibe ku wê demê hîna xetertir bibe. Ev rewş bi jiyîna lawirbûnê ve di heman wateyê de ye.

Şîroveya ku em ji bo rêgeza azadiyê tînin, gelekî jiyanî ye. Pêwîste ku em jiyana xwe şênberbûna xwe di navbera vê sêkuçê de çareser bikin: di lûtkê de rêgeza azadiyê, di seriyekî de malbûn û milkiyet, di seriyê din de jî fahişebûn û ji bin venêrîna rêpîvanan derketin. Gelo hun li kû dera vê sêkuçê ne? Pêwîste hun bi taybetî di vê mijarê de xwe lêpirsîn bikin. Ev di cihekî de pevçûna mirovahiyê ye. Di nava vê de, rizgariya netewî jî heye, azadiya civakî heye, şer jî heye û aştî jî heye. Ev hemû bi rast destgirtina sêkuçê ve gengaz dibe. Di lûtkeya sêkuçê de ango di xala azadiyê de cih girtin, yekem riya gav avêtinê ye. Yek jî gelo ma ji bo çi hun dikevin sêkuça ku şeytan ava kiriye, hunê xwe çawa jê biparêzin? Karê we zehmet e. Ev hemû rewşên bi nexweşî ku civaka çînayetî afirandiye. Ev xwe di hemû têkîliyên mirovan de, di hemû qadên jiyanê de nîşan dide. Ya herî xirab jî, ew saziyên fuhûşê yên ne fermî gelekî belav bûye. Di her bajarî de peyda ye. Tê diyarkirin ku di gundan de jî pêş dikeve. Ji vê re bi qedexekirin û çalakiyê ve bersiv dan têr nake. Di mijara plansaziya malbatê de tişta ku pêş dîtiye, bi teknîk, exlaq, bi taybetî jî pergalê re girêdaniya xwe heye. Ji ber wê sedemê pêşîgirtina wan gelekî zehmet e.

Dîsa ji bo têkîliyên ku di temenên biçûk de ku kolebûn çêdibe, ji nişka ve bi zagonan ve bersivandin, bûyîna çareseriyeke mayinde dûr e. Em di vê qadê de jî pêdiviyê bi şoreşekê dibînin. Li gor min bêyî şoreşeke bingehîn pêk were bersivdana van hêmanan gelekî zehmet e. Ev hebe yan jî nebe bersivdaneke di wateya dest lê dana seriyekî ye. Ev jî qet têr nake. Jixwe bi destgirtina bingehîn a vê pirsgirêkê ji ber giranbûna wê ye. Gotina min a “ger gengaz be ji nava we hindek kes bila di vê mijarê de kûr bibin, bibin milîtanên bingehîn ên vî karî, bibin kesên ku rêpîvanan datîne û dimeşîne” vala nîne. Ev hêman bi hewldaneke cewherî û şîroveya exlaqî ve pêkanîn şert e. Ger ne wiha be, bi dîtînên dawî yên teknîkê û zextê ve pirsgirêk ji çareserkirinê dûr e. Bêguman di bingehê têkîliyan de taybetmendiyên damezirandinê radizê. Hoste jî li ser vî karî zêde nesekinîne. Ev pirsgirêk xwedî taybetmendiyeke ku herî zêde hatiye têperandin. Dema mirov di vê mijarê de li têkîliyên Marks û Lênîn temaşe dike tiştên ku anîne ziman

mirov bibêje, girêdaniya xwe bi sosyalîzmê re heye zehmet e. Ez wisa texmîn dikim, têkîliyên ku di avakirinê de bi giranî têkîliyên bûrjûva ne. Sosyalîzm di mijara malbatê de ev qasî kûr nebûye. Wê gotinên sosyalîzmê yên nû ku di derbarê malbatê de bibêje hebin. Herî zêde jî rewşa bûyîna hêza çareseriyê, herî zêde di sosyalîzmê de peyda ye.

Em dikarin bibêjin, şoreşa me di vê mijarê de jî yê gelekî ji xwe bawer be. Jixwe nêzîkbûnên ku hetanî niha me ji bo têkîliyan aniye, heta sînorkirin ji bo çareserkirina van mijaran de, dibe ku bibe serê ta. Lî şûna ku hun xwe di rewşa rizgarbûnê de bihêlin, ger hun di vê mijarê de dilsoz bin, tu carî zilam nikarin li hemberî we jinan bi şêweyeke ku hun naxwazin bi nêzîkbûnên ku hun naxwazin nêzîkî we bibin. Ji ber ku hun bi çeka tekoşîna azadiyê ve bersivê didin. Ger hun vê çeka azadiyê li ser bingehê çareserkirina pirsgirêkên xwe bi kar bînin, yek zilam jî nikare nêzikî we bibe. Ger hun bi lewazbûnên xwe yên jinbûnê ku piralî ne bersivê bidin aliyekî hun nabin jinên azad, dê koletiya we jî berdewam bike. Gelo ma hun wê hêzê di xwe de dibînin ku, bibin jina azad? Ma hêza we ji bo vê yekê heye? Ew hêmanên ku bibe şêweyê bersivê ji bo pirsa jina azad ki ye? Yan jî jina ku were amadekirin kî ye, we girtiye? Ji ber ku hun wê nikaribin bigrin, hunê nikaribin tekoşînê jî bimeşînin.

Em dixwazin jinan nas bikin. Tiştê ku min di piraniya jinan de dîtiye, nekarîne xwe ji mijarbûna malbûna zayendî derbixin. Zayendîbûna xwe hîn jî ku serdestan bi sedan salan heta bi hezaran salan teşe dane, li ser bingehê weke amûrekî dixwazin bi kar bînin. Xwestin vê yekê li ser min jî pêk bînin, ez ji wan hindekî din şiyartir im. Naşibim zilamên din. Ji ber ku min xwe baş rêxistin kiriye. Bi hêsanî nikarin min bînin lêyîstokan, nikarin min bixapînin û bi binbixin. Ev jî şerek e, em bi qasî şerê li hemberî dagirkeriyê, di şerê paşverûtiya jinê de jî hoste ne. Gelo ma zilamên wiha hene? Sê hevalên min ên zilam hebin, emê dinyayê birûxînin. Ger zilam xwe şaş binirxîne, dê jinê bi bin bixe û dikare bike kole jî. Ev ne riyek e ku bibe hilbijartinek. Min li hemberî paşverûtiya jinê tekoşîn meşand. Em di wê baweriyê de ne ku pêwîste bi vî rengî be. Ew xefikên ku zilaman danîne, bi

xwe ketine tê de. Ew xefik çi ye? Wisa bawer kirine ku ger jinê bixin rewşeke ku jin bibe mijara milkiyetê wê ji bo wan bibin malekî baş. Jin jî ji ber ku hebûnekî zindî ye, helwest nîşan dide. Ev helwest jî zayendîbûna xwe weke malekî dinirxîne, xwe dispêre wê û plansaziya jiyana xwe pêş dixe. Dinya jinê jixwe li ser vî bingehî çawa xwe pêşkeş bike û bi vî rengî çawa xwe bilind bike, ava dibe. Di rastiyê de şertê exlaqê mêrbûnê ya di civakê de bi vê rastiyê ve ye. Di bingehê dinya zilam de jî, ji bo ku milkiyeta xwe ya li ser jinê biparêze serî li zextê dide. Dîsa weke encamekî xwezayî ya milkiyetê ji bo ku jinê bike weke malekî û bixe rewşekî ku weke amûrekî ye. Ji ber ku malxweyê malê ye, vê yekê dike armanc. Hemû saziyên di civakê de vê weke helwesteke exlaqî tê digihên. Bi vî rengî tevnekî gelekî bihêz ava dibe û jin nikare nefesê jî bigre. Bersiva jinê ku di nava vê tevnê de bide jî, “ger we min bi vî rengî kir, ezê jî zayendîbûna xwe bi şêweyekî herî xirab weke çekekê bi kar bînim û we bikirim.” Ev jî tê wateya malbûna ku kiriye mal.

Di rastiyê de ev rewş dihêle ku mirov ji nav têkîliyê dernekeve. Ew gotina “fêhlê jinê zilam bi binxist” ji bo vê hatiye gotin. Ew tevgera zilam a çewisînêr hiştiye ku ketiye vê rewşê. Lêyîstokên jinê hiştine zilam bikeve rewşeke xirabtir. Di têkîliyan de hev xistineke balkêş, durûtî û xeribî tê jiyîn. Ew bi yek peyvê ve zinixî ye. Ma têkîliya di navbera zayendan de dê wiha bûya? Ez vê hîn jî bi metirsî pêşwazî dikim. Mixabin, hun hemû vê yekê dijîn. Li gel min di giştî de bi vî rengî xistina têkîliya jinê helwesteke gelekî zinix, kirêt û derveyî exlaq tê dîtin. Ez xwe bi xwe dipirsim, gelo ev çawa dijîn? Ji jiyînê wêdetir hîn a kirêtir dikin. Jinê weke malekî ji sukê dikirin, mirov pejirandina vê ferasetê ya bi vî rengî, gelekî bi zehmetî dike. Ev feraset bi tenê wateya çors de nayê jiyîn. Weke ku ketiye nava hestiyên têkîliyan.

Min hêvî kir ku hemû têkîlî ji ber pêwîstiya van rêgezan ava bibe. Min ew ji bo xwe weke pîvan girt, ez çareseriyê di vir de dibînim. Ji bo min pirsgirêkên din ên ku tên jiyîn talî ne û wekhev in. Tiştê ku ez dixwazim vê gavê di PKK de bi ser bixim her çiqasî teorîk heta sembolîk be jî, di dema

pêş de bi nêzîkbûneke cewher di rêya wê de were şerkirin û bikaribin hêza nêzîkbûnê raber bikin û hêzê bidin jiyanê. Ew jî bi emperyalîzmê, faşîzmê, cehaletê, rastiya malbatî ya heyî, heta hemû sazî û dezgehên civaka me re bi şerkirinê ve ava dibe. Piştî wê tişta girîng gihiştina mezinahiya ferasetê rastiya ku em çi qasî vê ferasetê di jiyana xwe de pêk tînin e. Tişta ku ji van hemû tiştan were fêmkirin ev e. Em vê mijarê ji aliyê civakî, malbat û ji aliyê kesayetê ve bi kûranî dest bigrin. Ji bo peydakirinê di serî de, ji bo çareseriyên razber û sembolîk jî pêdîvî heye. Berê dema ku min rewşa jinê ya koletiyê didît, yekser min klasîkên sosyalîst hembêz dikirin. Ji bo gelo ezê bikaribim çareseriyê bibînim? Ketime nava felsefe û qadên dişibine vê. Di rastiyê de hindek jî ji bo ku ji vê pirsgirêkê xelas bibin vî tiştî dikin.

Di rastiyê de pêwîste rewşa min were lêpirsîn. Ew hêmanên ku min bi pêş xistine û hizrên ku min rexne kirine tên çi wateyê? Rayedarên MÎT’ê jî dibêje, “ez dizanim ku Apo bi saet bi saet li kû dera Bekaayê dimîne, lê belê tişta girîng, li kû derê ye nîne, çi dike ye?” ew zilam jî dihizire ka, “Apo çi dike?” dixwazin tiştekî bikin. Ji bo wê jî dixwazin hîn bibin ku ka em çi dikin.

Bi tevî hemû hewldanên min tişta ku rêhevalên me yên jin afirandine bi sînor dimînin. Mînak, nêzîkbûna herî wêrek min nîşan da. Di hatina jinê ya gel hev, di kişandina wan a çiyan, di kişandina wê ya ji nava saziyên kevneşop, min hewldaneke mezin nîşan da. Hemû dinya dizane ku ew gelekî balkêş e û pêşketineke di asteke pêş de ye. Dîsa jî ez vê yekê kêm dibînim. Ew pirsa ‘jin û zilamê werin pejirandin kî ne?’ jî girîng e. Ger gengaz bûya me bikaribiya vê kesayetê bi roman, sînema û curên din ên hunerê ve bi serkeftî nîşan bidaya. Kesayeta jin û zilam ku em esas bigrin, divê çawa be? Çawa bijîn? Di vê mijarê de dahûrîn amurê herî girîng e. Ez di vê mijarê de gelekî hesas im. Jina weke barkêşan (hemal) zilamekî wekî tirpan çend qirûşan dikin? Armanceke herî girîng a şoreşê jî afirandina mirovê ku pê re were jiyîn e. Berovajî hun ji vê yekê direvin. Gelo ma hun dizanin, ji bo çi direvin? Ji ber ku hun kirêt in, direvin. Ez kirêtbûnê, tenê di wateya fîzîkî ne, di wateya giyan (ruh) û hizirandinê de jî diyar dikim.

Dinya giyan û hizirînê li gel we gelekî tevlîhev e. Şoreşgerî “bûyereke hunermendiyê ya mezin û artîstiyê ye”. Hîn ez jî dihizirim, ka gelo serdestiya şoreşê ez di xwe de çawa temsîl dikim? Ez her roj xwe bi rengê “gelo ez şoreşê dikujim, şoreşê kirêt dikim?” lêpirsîn dikim. Ev yek tê çi wateyê? Ev tê wateya min çi qasî têkîlî sererast kirine. Ger ez vî bi ser nexim, ezê xwe wekî tawanbarekî mezin bibînim. Lê belê hun van pirsan ji xwe napirsin jî. Mirov bi rewşa we diêşe. Ew kesê ku mirov nêzî bibe, bi hev re aram be û were pejirandin kî ye?

Di rastiyê de şoreş mezinbûneke cuda rave dike. Ev hêmanên ku di rêya wê de bi hezaran berhem hatine nivîsandin, em nikarin bi carekê ve di rastiya xwe de çareser bikin. Lê belê dîsa jî em nikarin ji nedîtî ve werin û ser vê pirsgirêkê bigrin. Ev yek ji bo çareseriya pirsgirêkê dîtînê bingehîn in. Berovajî mirov dibe reformîst. Gelo ma mirov bi hêza şoreşê jinê çawa bîne rewşa hezkirinê û rêzdariyê? Ger em wiha nekin, em nikarin bersivê bidin pirsa “gelo jina şoreşger kî ye?” Ger jin wiha nekin dê bibin kesên kirêt, ji nedîtî ve werin û yên ku her kesek dixwaze jê bireve. Di heman demê de mirov dê bibe dîlê azweriyên xwe yên ezez û nikare xwe rawestîne. Êdî gava destpêkê û gava dawiyê ya vî karî tuneye. Pêwîste were serxistin, nikare xwe bi xapandinê bide pejirandin. Ne dikare zayendîtiya xwe erzan bi kar bîne, ne jî bi hewldaneke çors dê bi ser bixîne. Rêhevalên me yên jin, bi gotina “ez jî çekê bi kar tînim” vî karî bi ser naxîne. Hun dê bi hêmanên çareseriyê ya şoreşgerî yên piralî û kûr ve bibin bersiv. Ev gelekî zehmet e. Lê belê şêweyê pejirandina milîtanên şoreşger di vê çerçoveyê de ava dibe.

Jixwe emê jî jina şoreşger biafrînin. Rêhevalên me yên jin navenda vî tiştî ne. Ez bi vê pirsgirêkê ve ew qasî mijûl dibim. Ji ber ku pêwîste mirov azwerê azadiya jinê be. Hêmana ew qas bingehîn a jiyanê çavên xwe lê girtin, layiqê şoreşgerekî cidî nîne. Ger ne wiha be, mirovê bibe şoreşgerê pergala serdestiya zilam, ev yek jî ne li gor min e. Çavkaniya herî bingehîn a jiyanê anîna ber çav a pêwîstiya xwe bi azweriyeke mezin heye. Gelo ev yek li gel me heye? Gelo dema ku mirov dibêje azwerî hun çi fêm dikin? Dema hun têkîliyeke jinê ya rêzê dibînin, dibe ku ji bo we her tişt xelas bibe, di

rastiyê de ew ji bo me ne wisa ye. Hîn zêdetirê wê pêwîst e. Gihiştina rastiya jinê pirsgirêka gelekî zehmet e. Vê gavê bi qasî nêzîkbûnek avakirinê, gihiştina asta hêza siyasî jî pêwîst dike. Bûyîna hêzeke siyasî ji bo çareserkirina pirsgirêka jinê dê sudwer be. Di demên derbasbûyî de pêkanînek jî jin li qesran û hareman dihate girtin hebû. Ew di serdema koledarî û feodaliyê de hate jiyîn. Dema ku em li kapîtalîzmê temaşe dikin, ne tenê jin hemû mirov weke koleyan in. Lê belê yê jinan hîna zêdetir e. Kapîtalîzm, vî tiştî bi şêweyekê ziravtir dike. Pişt re sosyalîzm derkete holê, çareseriyekê pêk tîne ku van hemû tiştan digre dijberî xwe û girêdaniyekê diafrîne. Wêneya li gel me hîn cihêtir bi pêş dikeve.

Emê vê pirsgirêkê çawa çareser bikin? Çareserî bi “min kirî-min firot” ve çênabe. Bi gotina “em li hev hatin” ve jî nabe. Diyarkirina pirsgirêkan tenê dahurandin nîne. Ji bo me bi destxistineke mezin a hestan ji aliyê cewher û naverokê ve gelekî pêwîst e. Ger hêza we têr bike beriya hun bibêjin “ajoyên me şiyar bûn” bi rengê “ew têkîliya ku girêdaniya xwe bi her cure paşverûtiya me ve heye, emê nêzîkbûneke çawa raber bikin, emê çawa çareser bikin?” bihizirin. Bi avêtina derveyî tekoşînê ya jinê û bi qezenckirinê ve ev pirsgirêk nayê çareserkirin. Pêwîste em hev bi rengê li gor çareseriyê biguherin. Li ser vê bingehê em hev bigihînin dinya dilsoziyê, dostaniyê û hezkirinê û wisa jî bi pêş bixin. Di vê xalê de ez dixwazim xwelêpirsînkirinê bi pêş bixim. Di nava partiyê de misogere ku dê di vê mijarê dê zext çênebin. Lê belê hindek jî ji ber ku zext nîne nikare xwe bispêre erk, hêz û fîzîka xwe û vî tiştî îstîsmar dike. Wê demê emê bi jinê re baş ji hev fêm bikin. Jin dê bikeve rewşekê ku hindekî din zilam bipejirîne. Wê demê plansaziya malbatê, kerxane dê ji pirsgirêktiyê derbikevin.

## Hezkirinên me qasî ku piştgiriyê bidin rizgariya gelê me xwedî nirx in

Tiştê me di vê mijarê de bi ser xistiye ev e. Em jinê cidî digrin. Jin hindekî xwe fêm dike û xwe nas dike. Me nêzîkbûnên zilam ên kevneşop, çewisînêr û diperçiqîne asteng kir û sekinand. Tu caran êdî nikarin zextan

pêk bînin. Her çi qasî di cewher de veguherîneke mezin nejîn jî, di nava jiyana partiyê ya bi rêpîvan de nêzîkbûnên taybet di nava civakê de derbas dibin nikarin bidomînin. Em nikarin vê gavê qezencên mezintir soz bidin. Ez rewşê zêde bêhêvî nîşan nadim. Ji bêhêvîtiyê wêdetir, ez bawer nakim ku ev zêde hatibe nepixandin jî. Bi taybet di vê pêvajoyê de çareseriyeke bingehîn nabe. Pêwîste ji bo jinê pênaseyeke rast were dayîn. Ango ji bo gavavêtina wê yekser nêvengeke azad were pêşkeşkirin. Bi heman rengî ve ji bo zilam jî pêwîste pênaseyek were dayîn. Pêwîste em wî jî ji bo çareseriyê daynin cihekî ewle.

Hezkirin rastiyek e ku her diçe mirovan mezin dike. Bûyera hezkirinê di mercên Kurdistan'ê de –ev heman tişt ji bo Tirkiyê jî derbasdar e- pewîste rast were bidestgirtin û were pêşxistin. Di vê mijarê de gelek karên ku werin kirin hene. Encameke girîng ku ji tiştên me diyarkirine derdikevin, kesayet hêza xwe ne ji bo hev û hevqezenckirinê ji bo ezeziyên xwe û azweriyên xwe têr bikin bi kar tînin. Li ser vê bingehê têkîlî tên pêşxistin. A rastîn, pêwîste ku em têkîliyan li hemberî erkên erênî yên bingehîn ku di cewherê wê de hene qezenc bikin. Tiştê li ser hemû têkîliyên me serdest e ev e. Bi taybetî pêwîste mirov cih bide bûyera hezkirina xwedî nirx. Ew rêhevalên ku dikarin vê bikin, dikarin bi ser bikevin û xwe bidin qebûlkirin. Li ser vê bingehê ji ber ku hem mamoste û hem jî şagirtên hev in, di xwedayîna qebûlkirinê de zehmetiyê nakişînin. Em jiyana baş ji vî alî ve qezenc bikin. Ger hun li ser vê bingehê hev qezenc bikin, partî bi we re ye, bi rastî pêwîste ku hun bawerbin ku we hev bi vî rengî qezenc kiriye. Ger hun wiha nebin partî we qebûl nake. Hun li ser vê bingehê qezenc bikin, dê partî qezenc bike, gel qezenc bike, ev yek jî qezenceke herî baş e.

Hezkirinên min, qasî ku piştgiriyê bide rizgariya gelê min xwedî nirx in. Azweriyên min, qasî hêzê bide partiyê xwedî nirx in. Ew azweriyên ku vî tiştî dixe zehmetiyê bila bimirin. Sempatiya ku vê dixe zehmetiyê bila tune bibe. Ez dibêjim, bila ev hemû ji min dûr bin. Helwesta exlaqî ev e. Hunê ji bo çi nekaribin vê helwestê nîşan bidin? Ji bo çi em xwe li ser vî bingehî perwerde nekin? Ma mêrxasî ne ev e? Gelo li ser vî bingehî hev ecibandin û

qezenckirin ne riya herî bi namus e? Gelo ya rastî gotina, “min te ji bo xwe kire yar, ez çar bi çar serdest im” e? Kêfxweşiya di vir de çi ye? Di şûna bi vî rengî de, vê jiyanê qet nejîn hîna baştir e.

Em ji bo nêrînên PKK’ê yên di vê mijarê de hûrbûnê û berhemdariyê didin qezenckirin. Nêzîkbûneke partî ya gelekî diyarker derdikeve rastê. Pêwîste jiyaneke partiyê ku hun bi qasî jiyana xwe pê ve girêdayîbin hebe. Tevlîbûna we ya ji bo doza gelan, weke rêhevalekî helbet baş bûye. Jin xwe azad hîs bike û bide hîskirin, di nava refên me de tevlîbûnê çêbike baş e. Pêkanîna me ya vî tiştî biçûk nayê dîtin. Ev bêguman destpêkeke girîng e. Em bi hev re ne, lê belê her tişt nehatiye çareserkirin. Lê belê ger em hewldanên xwe kûr bikin, her dem hêman û armancê nêzîkbûnê ji bo pêşerojê bînin ber çavên xwe, emê di vê hevaltiya rê de kesayetên birûmet biafrînin û hev qezenc bikin. Ev piştgiriyeke ku gelê me pêwîstiya xwe gelekî pê heye. Ji bo çareseriya pirsgirêkên ku me diyar kiriye jî, ev bingehek e. Pêwîste ku hun baş bizanibin, dema ku me çareseriyeke bi vî rengî di nava partiyê de pêk anî, emê bikaribin vê pêl bi pêl li hemû civakê jî belav bikin.

Ji bo çareseriya di nava partiyê de were pêkanîn, di rastiyê de em gihiştine hêza ku ev li ser civakê serdest bibe û bi wê jî gav werin avêtin. Ên din pirsgirêkên teknîkî ne. Pirsgirêkên weke pêkanîna teknîka zanistî, pirsgirêkên ku em tê de zêde zehmetiyê nakşînin û dikarin pêk bînin in. Bi ser xistina şoreşeke bi vî rengî ve, qasî ku ji bo pirsgirêkên serdema me çareseriya herî baş tê dîtin, li hemberî neçarbûna balkêş ku kapîtalîzma emperyalîst ferz dike, PKK jî bi jinê re nêzîkbûneke ku çareseriyê tîne bi pêş dixîne. Ev çareserî, nêzîkî çareseriyeke ku hetanî niha sosyalîzm negihiştiye heta dereng xistiye, zêde ber bi zelaliyê ve nebiriye. Ger kêmasiyên me hebin, emê çareser bikin. Ji bo vê jî ne kesekî hêrs bibe, ne xwe tengavbûyî hîs bike, ne bibêje rûbirûyê xiyanetê hatime, ne jî zêde hêvî bike ku were qebûlkirin.

Rêhevaltiya di tekoşînê de xwedî rêgezekî ye ku bi girêdaniyên bêmiriniyê ve dimeşe. Ji bîr nekin ku rêhevaltiyên herî birûmet ên ku li ser

vî bingehî bi we re ne, yên ku hezkirinên wan herî mezin bi we re ne û ev jî her cureyê hezkirinê û kêfxweşiyên kesayet birûmetir e. Bi wî rengî ye ku çavkaniya hezkirin û kêfxweşiya takekes, ev partiyek dibe, hemû gel dibe, hemû mirovahî dibe, dema ku hun serdestî van hemû tiştan bibin wê demê rûmeteke we ya jiyana takekesî dê çêbibe. Berovajiyê vê nêzîkbûna ku emperyalîzm ferz dike ye. Ev nêzîkbûn mirovahiyê înkar dike, gelan ji her cureyê nêzîkbûnên rizgarîxwaz tune dihesibîne. Ew bilindbûna azadiya takekes, ji rê derketin û lawirbûna ku emperyalîzm diafrîne hê ji niha ve tê zanîn ku dawiya dinyayê tîne. Pergala kapîtalîst, emperyalîst li ser vî bingehî dawiya dinyayê tîne. Têkîliyan weke lêmonê guvaştiye. Weke mirovahî guvaştiye, ava wê derxistiye û avêtiye aliyekî. Vê pergalê mirovahî tune kir.

Sosyalîzm tam di demeke wiha de xwedî li mirovahiyê û jiyanê derdikeve. Ji sedan salan hetanî niha gelek ol derketine holê. Olan xwestin li hemberî lawirbûnên bi vî rengî xwedî li mirovahiyê derbikevin. Niha jî dixwazin xwedî lê derbikevin. Gelo ma ev yek pêwîst e? Yan ji dinyaya bêşerefan, bêaran ên ku îşkence dikin û kirêtiyan dikin rizgarnebûna me ya ji wan, hîn baştir e? Ez bawer dikim, hêviyên we hene û hun dixwazin di nava feraseteke baş de bijîn. Heta ez ji vê ewle me. Di vê mijarê de di asta niyet de mirov nikare tu qisurekê layiqî we bibîne. Lê belê ji bo ku niyetên baş pêşçav bibin, pêwîstî bi nêzîkbûneke wiha û şerê wê heye. Mirov nikare bi niyetên xwe weke dixwaze bijî, tenê dema ku pêwîstiyên jiyanê hatin bicihanîn dikare vê yekê bi ser bixe. Em jî şerê vê didin. Ji bo ketina bi hezaran salan, bi dîroka kurt a partiya me ve bersiv dayîn hêsan nîne. Bi feraset, bi sebir û ya herî girîng jî tekoşêr bin.

Pêwîste di vê tekoşînê de jin jî cih bigrin. Em bi wan re rêhevaltiyê kûr bikin û tiştê ku wan wenda kiriye, di vê pêvajoya rêhevaltiyê de careke din bi wan bidin qezenckirin. Dîsa taybetmendiyên ku zilam weke zêdebûnekê dibîne, yên ku ji pergalên çewisînêr û dagirker mane, lê belê ji aliyê partiya me ve nayê qebûlkirin, derbaskirina wan tiştan armancên partiya me ne. Bi hemû hebûna xwe ve em şer bikin ku bigihên wê. Ew doza pîroz a ku em

dibêjin bigihêjinê, li ser bingehê bi destxistina serkeftinê, çi ji destên me tê em pêk bînin. Ev ji bo me gelekî pêwîst e û em milîtanên vê riyê ne. Ji bo me çi kêfxweşiyeke ku me ev rê girt û em bûn şervanekî baş ê vê riyê.

Ez wisa bawer dikim ku milîtanên me yên birûmet zêde di zanebûna wê de nebin jî xwe di riya jiyana pîroz de balkêş feda kirin. Baweriya xwe bi wê roja ku şeref, rûmet û hezkirin dê çêbibe anîn, radestî pergala kirêt û koledar nebûn. Dema em di vê mijarê de rojên destpêkê tînin bîra xwe, em ewle ne ku dê ev yek wiha be. Gerîlayên me yên ciwan, hezar caran jiyana ku pergala sexte ferz kiriye nehlet lê anîne. Ev dozeke mezin e û girêdana zanebûna wan bi vê armancê ve misoger e. Emê bi bîranînên şehîdan ve girêdayî bin. Jixwe ev tevger jî, weke pêwîstiyeke bi girêdaniya wan ve tê pêşxistin. Em bawer dikin ku hun bi temamî li ser vî bingehî, bi hêviyan ve barkirîne. Ji ber ku ev hêvî, jiyana pîroz pêkan dike, em ji bo wê dijîn û şer dikin. Ev mirov bi şehîdên xwe ve, bi şervanên xwe ve, dibe ku piştî sedan salan jî yê şer bikin, bi wî rengî karekî herî pîroz dikin, wiha jî dê wate bidin ku riya herî rast girtine, gelek asteng derbaskirine, weke di hemû dozên girîng ên di dîrokê de hatine dîtin û weke di jiyana milîtanan de hatiye peyitandin, ez ewle me dê mezinbûnekê pêkbînin û bi ser bixin. Ez ewle me ku, hun di mînaka me de jî, dibe kesayeteke herî pîroz ava bikin.

Me di vê çerçoveyê de hun hetanî vir anîn. Pêwîst e baweriya ku her yek di we de heye, li ser bingehê vî tiştî ber bi pêş ve were birin. Me PKK li ser vî bingehî hetanî vir anî. Pêwîste em navekî xirab neynin ser vê. Ji bo ku hîn kûrtir were jiyîn, pêwîste hun weke wateya bingehîn a jiyana me cihekî girîng bidinê. Pêwîste em vî tiştî li ser her tiştî re bigrin. Di partiyê de serxistina vê esas bigrin û ji bo serdestkirina li hemû têkîliyan hişyarbin. Tu gumanên me nemane ku em komeke rêhevalan ên wiha ne. Çareserî bûye ya giştî. Çareseriyeke ku wiha bûye ya giştî jî, tê biserxistin.

Min hetanî niha bi vê yekê bawer kir û kar kir. Bi xebateke dilnizm ve min dinyayeke baweriyê û biryarê ya mezin afirand. Piştî ku min hun û gel ev qas gihandin hev, dibe ku ji bo hindekan nepixandî be jî, ew kesê ku têra xwe nakin jî dikarin di nava mirovahiyê de bibin xwedî çareseriyekê. Em ji

bîr nekin ku ên gelekî ketine, bilindbûna wan jî mezin çêdibe. Ew kesên li şûna mirovahiyê hatine hiştin, gavavêtina wan bi şoreşê ve gengaz e. Dibe ku bi vê gavavêtinê mirov dikare li pêş mirovahiyê be, weke hember sekinandina her cureyê pergalên zext û dagirkeriyê di cîhana azadiyan de, di asta têkîliyên jin û zilam de, li hemberî pûçbûnê û bêhezkiriniya mezin ku mirovahiyê dixwe, em ewle ne emê jiyanê û mirovahiyê temsîl bikin û di vê wateyê de em zêde ne. Ez dihizirim ku ev yek hatiye peyitandin, em gihiştine asteke hêza mezin. Pêwîste hun misoger zirarê nedin qezencên PKK'ê yên mezin ên di vê mijarê de. Ew jiyanên ku xwe feda kirine, em bi takekesiya xwe ve wan biçûk nekin û reş nekin. Ji ber ku pêwîstiya mirovahiyê bi vî tiştî heye. Hela gelên ku tenê perçiqandin hîna zêdetir pêwîstiyên xwe bi vê yekê hene. Pêwîste ku balê li vê yekê bikşînin, li gel ji her demê zêdetir hun xwe di feraseta partiyê de, kesayeta tekoşer û milîtan de ava bikin, pêwîste hun derfetê bidin serkeftinê ya ku her diçe kûrtir dibe. Dema ku em rast tevbigerin, em ewle ne ku li ser vê bingehê em ji bo ketîbûna jinê ya balkêş hêzeke çareseriyê ne û bi vê yekê jî kêfxweş in.

Bi dinya jinê re, bi vî rengî gav dayîna avêtin ji bo me jî hêzek ava kiriye. Jin hîna ji niha ve pêl bi pêl tên nava refên me. Emê bawer bikin ku wan bikin çavkaniya rast a hêza xwe, bi rist qezenckirina wan ve emê cihekî baştir bidine wan. Nêzîkbûna bi vî rengî di bûyera Rêbertiyê de girîngiyeke jiyanî ye. Ger rêhevalên zilam jî vê layiqê gav avêtineke Rêbertiyê dibînin, pêwîste ji bo çareseriya wê jî alîkar bin. Çareseriya ku tê hêvîkirin jî ev e.

Hun pirsgirêkan dibînin, giran be jî hun tiştê ku dikeve ser milên xwe bikin. Di tekoşîna me de her tişt azad tê nîqaşkirin, ê ku dixwaze berdewam bike dike, yê ku naxwaze dê bihelê û biçe. Min nexwest ez bi xeyalên we yên ciwaniyê bilêyîzim. Ez naxwazim hun bi hesteke xwefedakirinê ya ji rêzê di nava refên me de bimînin. Ev nîqaşeke azadiyê ye û ji bo jiyanîkirina vê yekê jî şer hewce dike. Ger hun zehmetiyê dikişînin, bêyî ku min jî û xwe jî biêşînin, bi serbestî dikarin biçin. Lê belê tevgera ku ez dixwazim berdewam bikim, di vê mijarê de vê yekê dibêje, vê dixwaze û dixebite ku vê bike.

Ez xwedî rêgez û baweriyê me. Bi qasî ku min hêza xwedîderketina hemû jinan û hêza hezkirinê nîşan da, li ser mêrxasiyê jî ez serdest im. Di vê mijarê de xwe şaş nekin. Ger hun dikarin rabikin, em bi we re bimeşin, lê belê ez pêwîstiya tekoşînê jî dixwazim. Zext jî nîne. Pêwîstiyên kesên dimînin jî, yên bi min re bimeşin zelal e. Ez vê diyar bikim. Bi ruxmî we, em bi ser naxin. Ger îradeya we ya azad, xwestek û hezkirina we tunebe, ez nikarim vî karî çareser bikim. Rêgez ev e. Pêşketina ku kêm û zêde bi girêdayîmayînê ve hatiye pêkanîn peyitandina vê ye. Di mînaka xwe de bi hemû partiyiyan ve, bi qasî hêza xwe bibine hêza çareseriyê ku ji bo xelasbûna ji dojehê piştgiriya xwe çêbibe. PKK, ji hemû aliyan ve tevgera mêrxasiyê ye. Ji vî alî ve hatina we hindekî mêrxasî ye. Înkarkirina vê yekê ne gengaz e. Lê belê emê ji bîrnekin ku serkeftin mêrxasiyê dixwaze. Destpêk têr nake, ji bo encamê pêwîstiya me bi şervanên mezintir û mêrxastir heye. Ez hêvî dikim hunê hêza vê nêzîkbûnê nîşan bidin. Ger hun nîşan nedin jî, ez zêde teng nabim. Lê belê ji bîr nekin ku ezê biryar û hewldanên xwe bihêztir bimeşînim. Di vê çarçoveyê de tiştên pêwîst ku ez di we de nebînim, we efû nakim. Çi pêwiste were kirin, wê nîşan bidin. Li vî tiştî balê bikişînin, gelekî bihizirin û li ser vî bingehî bi partiyê ve werin girêdan. Li ser we ev qas sekinandina me bêsedem nîne. Bersiva we nebe, meş çênabe. Dema ku dirêjiyên dijmin û hindekên di nava me de bi israr ji înkarkirina nasnameya me dest pê bikin û destdirêjiya nirxên me yên jiyanî bikin û bixwazin van biperçiqînin, teqez e bersiveke me jî dê li hemberî van hebe. Emperyalîzm ev qasî bihêz e, li her derî serdest bûye. Ez ji vê bawer dikim, lê belê tu caran min bawer nedikir ku ez li hemberî vê tune me. Bi me keniyan, dibe ku me jî di çalakiyên xwe de derfetên serkeftinê nedît, lê belê ez ji vê bawerim di çalakiya gotina rast a destpêkê de yek-du gavên serkeftî esas e. Van tiştan hemûyan em anîne vê astê. Dibe ku hindekî din bihêz bin, lê belê ez bawer nakim ku weke berê ew tiştên ku dixwastin, li ser me ferz bikin di vê wateyê de ew rastiya ku em gihiştine, rastiyeke vala nîne. Bûye malê gel û hatiye rewşekê ku herî zêde bala dinyayê dikşîne.

Em li ser pergalê gelekî rawestiyan, tevî hemû van rexneyan em ewle ne ku me ya herî rast bi dilnizmî kiriye. Pêwîste serkeftina me biçuk neyê dîtin, di hemû partiyiyan de –ku hêjmar zêde girîng nîne- tişta tê hêvîkirin jî ev e. Ger hun zêde girêdayî bimînin, emê vî karî bimeşînin. Pêwîste mirov xemgîn nebe û têk neçe, pêwîste hun kêfxweş bin. We derfetên nêzîkbûna kesayetên pêvajoyên wiha dîtiye. Ev kesayet naxapîne û ger rast vedibêje, dikare serkeftina mezin bi dest bixe. Kesayeta ku fetih dike, balkêş e. Kesekî ku vî tiştî qebûl nake nîne. Dijminê ku derketiye hemberî vê binketiye. Ev tiştekî baş e. Tê wateya ku di vê riyê de xwe fedakirina jiyanê ji mînakên pîroz di hemû pêvajoyên dîrokî de ku mirovahiyê jê derxistiye yekî ji wan temsîl dike.

Ma hilbijartineke din heye? Mirov ji taybetmendiyên xwe yên civakî û netewî dûr xistine. Vî tiştî têr nabîne, dixwaze mirovahiyê bixe bin erdê. Cihekî ku mirov biçe nemaye. Cihekî ku nehatiye çewisandin nemaye. Helbet piştî vê rewşê dê mezin were lêyîstin û mezin were şerkirin. Ev tiştê ku li we têne ferzkirin in. Weke dinê hun xwedîderketinê nikarin bihizirin. Hun ji pirsgirêkên xwe yên malbatî, dê, bav, hevjîn, dost û evîndarê xwe zêdetir tiştekî din nikarin bihizirin. Ev şoreş ji bo vê yekê çêdibe, şehadetên mezin, zehmetiya mezin ji bo vê ye. Em li koşeya herî jor a dojehê bin jî, emê bisekinin, sebir bikin, şer bikin û gav biavêjin. Me ji bo vê xwe avête holê, hun hatin û tevlî bûn, lê belê em jî dibêjin pêwistiya vê tevlîbûnê jî ev e. Li ser vê bingehê emê xwe bidine şerê piştî wê. Tiştê ku ez dikim ev e. Hun jî ger bixwazin vî tiştî bikin. Ez jî weke şervanekî dilnizim dixwazim jiyana xwe bi îradeyeke azad û bihêz berdewam bikim. Dema ku kesek nebû jî, dîsa min ev yek berdewam kir. Niha gelek hevalên me hene û dîsa ez berdewam dikim. Tişta ku ez dixwazim, hêzdayîna me ya hev e.

Ez bawer dikim ku rêhevalên me yên jin, ne çavkaniya lewazkirina tekoşînê ne, çavkaniya hêzê ne û misoger ez dixwazim bi wî rengî nêzîkî we bibim. Dixwazim we zêdetir nas bikim, weke çavkaniyeke hêzê binirxînim. Ewê jî dê xwe bibînin, weke xwediyên hêza herî mezin di bingehê rast de tevlîbûnê bizanibin. Di van hemû mijaran de gihîştina feraseta mezin,

hember sekinandina pergala kapîtalîst-emperyalîst û afirînên wê yê dagirker-faşîst bersiva herî mezin e. Di kesayeta me de bersivdayînên ku narûxin ji bo van tiştan dê berdewam bike.

Em herin ku derê jî, em kîjan çekê bigrin destên xwe jî, di kesayeta we hemuyan de emê baş şer bikin û teqez encam bigrin. Di cewherê PKK'ê de ev yek heye.

**12 Tîrmeh 1992**

# QEZENCKIRINA JINÊ QEZENCKIRINA JIYANÊ YE

Jiyankirina bi jinê re xweşik e, lê belê bi jina azad re, ya ku şer dike re. Ya ku xwe li ser vê bingehê diafrîne re, jiyan hîna zêdetir birûmet e. Pêwîste rêza zilam jî ji bo vê hebe. Ji ber ku qezenckirina wan û jiyanê bi tenê jina azad re çêdibe.

Ez dibînim ku şêweyên lêkolîna di asta jinê de gelekî kêm e. Ez bawer dikim ku sersekinandina hin pirsgirêkan dê baş bibe.

Di Kurdistan'ê de û di Tirkiyê de rastiya jinê gelekî dişibine hev. Bi tevî hemû hewldanan jî jin ji bo lehiya şoreşê û gavavêtina azadiyê tevlîbûneke bisînor nîşan dide. Di vê mijarê de pêşketin hene, lê belê em ger hewldanên rojane bi pêş nexin, dê dijmin bi şerê taybet ve jinê bîne ber bi fetisandinê.

Ji bo we azadî tê çi wateyê? Gelo ma hunê bikaribin di azadiyê de berdewam bikin? Ev tişt zêdetir me didine hizirandin. Weke ku em dixwazin nebe jî, me gel xiste bin bandora xetê. Weke em dixwazin neyê meşandin jî, rêbertiya partiyê dizane ku li ser karê xwe sekinandinê zêdetir tu çareya wî nemaye. Bi rexmî hemû ketîbûn û lêyîstokên di rastiya jinê de hişt ku em jina ku bi sedan salin hatine kolekirin bikişînin asoyê azadiyê. Jin niha li gor berê him ji aliyê çawaniyê him jî ji aliyê hêjmar de ji bo dahûrandinê guncaw in. Rêbazên me di gavavêtina azadiya giştî de pêşketinan çêdike. Li gel vê girtîbûnên balkêş jî tên dîtin. Heta provakasyon bi pêş dikevin. Weke kesekî ku li ser rastiya Kurdistan'ê ye, him hêza min a çavdêriyê ve, him jî ezmûnên xwe yên guhertina pratîkî ve ez ê herî berfireh im. Ez vî tiştî jî ji nedîtî ve nayêm ku çareserî tenê bi hewldanên min ve jî çênabe. Di vê mijarê de niyeta baş jî têr nake.

Şoreş li gel ku di wateya azwerî, hêrs, tûjbûna nêzîkbûnan, hewldanên ku têr dikin û serûbinbûnê, tê wateya bersivdayîna pergalê û bi hostetî bersivdayîna van hemû tiştan e. Gelo ma hun dikarin, van hemûyan çi qasî di nava hev de temsîl bikin? Bi çawaniyên yekalî û yek astî ve şoreş nayê bihêzkirin. Bi tenê dema bi qasî hest, hizir, bi qasî teorî û pratîkê jî di cihê xwe de û di asteke têr de, were bikaranîn dê di şoreşê de ristekî bilêyîze. Ez

felsefeya we ya jiyanê baş nizanim, dinya we ya azweriyê û têkîldariyê asta we ya azadiyê ji aliyê min ve zêde nayê zanîn. Ev xwezayî ye, derfeta me nîne ku em yek bi yek lêkolînê bikin, jixwe nayê lêkolînkirin jî. Dîsa jî ji bo dahûrîna takekesiyê pêwîstî heye ku nirxekî bilind were dayîn. Bi taybet ev di ezmûna PKK'ê de xwedî girîngiyeke mezin e. Di kesayetekî de zayend û civak dahûrandin, rêbazeke lewaz nîne. Dahûrîna civakê bi têgîhiştina takekes ve jî dibe.

Di nivîsandinên klasîk ên heta niha de hîn zêdetir astên civakî û nepenî têne dahûrandin. Lêkolînkirina asta kesayet ji bo wêjeyê tê hiştin. Lê belê em nikarin xwe tenê bi wêjeyê ve bes bibînin. Ger dahûrîna civakî, dahûrîna takekes di asta siyasî de bibe rêbazeke bingehîn, dê nêzîkbûna partiyekê jî ez bawerim zêdetir encaman bigre. Taybetmendiyeke PKK'ê ya bi vî rengî ji berê ve heye. Hetanî mirov dikare PKK di vê mijarê de weke partiyeke herî pêş de jî binirxîne. Di astên navnetewî de jî ev wiha ye. Ji ber wê jî pêwîste mirov dahûrandina takekes neyînî nebîne.

Herî zêde pêwîstiya jinan bi dahûrandinan heye. Bûyera jinbûnê pirsgirêkeke ku herî zêde bûye girêkeke kor e. Gelo em avabûna we ya heyî çi qasî qebûl bikin? Vê çi qasî derbas bikin? Bêguman girêkbûneke takekes ku di bin bandora civakê ya dijwar de hatiye avakirin, mijara gotinê ye. Gelo ma em dikarin çi qasî bi vê şekilgirtinê ewle bin? Bêyî ku em fêm nekin, ji bo kê şekilgirtin, ji bo kê jiyan, ji bo kê avabûna kesayetê pêwîst e, cihdayîneke bi şêweyê şoreşgerî ve di nava jiyanê de wê bi xwe re xeletiyan, kêmasiyan û heta şaştiyan ava bike. Jixwe mînakên ku derdikevin holê nîşan didin ku ev yek wisa hêsan nîne. Ger ez we di nava têkîliyên heyî de bihêlim, ez ne bawerim hun ji bo şoreşê bisûd bin. Heta ez we li gor dinya we ya azwerî, hest û hizir hindekî azad bihêlim, dîsa ez ne bawerim ku ev jî zêde encamê bigre. Hun bi xwe jî dizanin ku, hun di jiyanê de zêde bi bandor nînin. Heta hun nikarin nefesê jî bistînin. Ew newêrekî û neçarbûna di kesayeta jinê de, di asteke pêş de ye. Hun asta kesên ku ji bo xwe dijîn ne, ji bo hindekî din dijîn ava dikin. Hun bi karekî li gor hindekên din hatiye kirin ve li gor xwestek, azwerî, feraseta serdestiyê û zordestiya civakê –ku

ev civakeke serdestiya zilam e- we şekil girtiye. Dijberî vê eniyê jî ev e. Dema helwest nîşan da, yan jî dij derket, dema hatine gotin, “ji malê revî, ji ber zexta zêde kete kolanan, benê xwe qetand” rêpîvan nenasîneke bêsînor derdikeve holê. Weke ku ya rast nîne, dinyayeke we ya di navbera her duyan de hatiye zîndankirin heye. Ji bo helwestên we gelekan, ne rêgeza azadiyê, ev her du rêgez bandor dikin.

Mixabin rexmî hemû hewldanên me, em dibînin ku hindek kesayet li şûn tiştên ku dihatine hêvîkirin mane. Peyama ku em dixwazin bidin nikarin ji hemû aliyan ve bigrin. Di vê mijarê de pêwîste mirov asta sîxuriya objektîf baş bibîne. Bêyî ku mirov rewşa giştî ya gelê me sîxuriya objektîf, bi taybet jî xirabtir xistina jinê fêm neke, gihiştina dahûrandinên bihêz negengaz e. Hêmanên ku yek carê min di vê mijarê de dihizirîne şêwazên we yên lêkolînê yên gelekî şaş û kêm in. Pêşxistina we ya şêwazên lêkolînê sedema herî girîng e ku hun nikarin bigihên encamên rast. Biryar ev e, ger dahûrandin neyên kirin di Kurdistan’ê de meş çênabe, şer nayê pêşxistin, azadî nayê bidestxistin, tiştên ku li Akademiya Mahsum Korkmaz dihate dahûrandin tenê hindek rastî nebûn. Tiştê ku dihate dahûrîn, di rastiyê de çarenûsa ku bibû girêka kor, ê hatiye dahûrandin ew qeydên ku em pê ve girêdayî bûn. Ê ku hatibû dahûrandin kulmek endamên wê Akademiyê jî nebûn, hemû dîrok û civak bû. Gavên ku dihatin avêtin jî bi rojane ew qasî berfireh bûn û encam digirtin.

Hun xwedî gavavêtinên azad in. Ji bo we azadî çi ye? Hun kesên ku van tiştan gelekî bihizirin û encamê bidin in. A guncaw jî, hun di vê nêvenga tekoşînê de hindekî dihizirin, di dika filmên herî navdar de jî platformeke wiha nayê serûberkirin. Ger hun bi hestyarî binirxînin, hun dikarin hem hest û hizrên xwe rabikin ser piyan, hem jî ji bo jinûve ava bikin, hunê qebûl bikin ku ev tişt gelekî guncav e. Bi qasî ku ez dibînim, xala herî zêde ku hun tê de asê dimînin pirsgirêkên weke zayendekê ji rastiyê ku hun dijîn çêdibe. Ez dikarim vê zelal daynim holê û bi we re nîqaş bikim. Hun dikarin vî tiştî bigihînin asta rêgez. Tu wateyeke ku hun ji vê tengav bibin, vî tiştî tenê weke pirsgirêkeke exlaqî bi dest bigrin nîne. Ew rêgezên ku hun jê re dibêjin

rêgez, di rastiyê de exlaqê feodal e. Di nava wê de qirêj, berjewendî, malbûn û milkiyet û herî zêde jî windakirina we heye. Dîsa tiştê ku çêdibe bi serê we tê. Di bin pêçeka exlaqî ya heyî de yên ku wenda dikin bi giştî gelên ku tenê perçiqandin û zayenda tê perçiqandin e. Hun, heta dawiya temenên xwe êşa wê û tengasiya wê dijîn, piştre bi aqilbûn zêde bi kar nayê. Pirsgirêka me, em bi şêweyê rizgarîxwaz nêzîk dibin, tenê ji bo xwe ne, ji bo rizgariya civakê û zayend gava biavêjin. Bêguman tê xwestin ku girêdaniya azadiya zayendî bi civaka çînî û siyasîbûnê ve gelekî baş were avakirin. Ez wisa bawer dikim ku dema rastiya Kurdistan'ê dibe mijara gotinê di dinyayê de têkîliya malbat û civak, malbat û siyaset a herî baş û bihêz em datînine holê. Dîsa di nava malbatê de asta jinê gelekî baş hatiye vekirin. Bûyera ku jê re tê gotin, "jin" çawa ye, di nava nêzîkbûneke çawa de tê girtin gelekî bi zanistî hatiye danîn. Di vê mijarê de dostê me yê birêz Îsmaîl Beşîkçî jî dibêje, "pêwîste mirov balê li aliyê sosyolojîk a Apo bikşîne, civaknasî (sosyolojî) zanistiyek e, pêwîste mirov piştgiriya wî ya di vê mijarê de jî bibîne." Her çi qasî niyeteke min a wiha nebe jî ew bi xwe vê yekê dibîne, di rastiyê de malbat û civak, jin û malbat bûyerên girîng ên sosyolojîk in. Lê belê dema rastiya Kurdistan'ê dibe mijara gotinê aliyekî vê yê siyasî ya vê pirsgirêkê jî derdikeve holê. Pêwîste ku mirov vê yekê dayne holê.

Dema mirov balê lê bikşîne ger min misoger malbat çareser nekiribiya em bihêlin gihiştina azadiyê dibe ku bêyî ez bigihêm çardeh saliya xwe, ez di pevçûnên malbatê de tune dibûm û diçûm. Ez zaroktiya xwe ji bo ku bibe mînak bînim bîra we. Armancên weke çiyan didan pêşiya min. Wisa plan dikirin "ev zarok bila mezin bibe, ji bo şeref û rûmeta malbata me tolê bistîne, mirovan bikuje." Dema ji bo ku nekevime nava vê min digot, ez naxwazim mezin bibim. Ez wiha dihizirîm, ezê çawa dijmin bikujim, hêza min tuneye. Ezê zû bimrim, min wê demê dest bi siyasetê kir. Pîrika min digot, "çavên vî hindekî bi bênamusiyê temaşe dike, xeteriyek heye ku ji bo malbatê şer neke." Di rastiyê de pêwîste ev yek weke ez zarokekî baqilbûm were şîrovekirin. Ger ez weke zarokekî bingehîn ên malbata xwe mezin bibama, min nedikarî ji gund gavekî biavêjim derve.

Hun jî baş dizanin di hemû malbatên Kurd de zilam weke zarokê xas, kurê xas tê mezinkirin. Li ser vê bingehê hemû hîn negihiştine. Di dozên xwînê de, di pevçûnên malbatê de, di pirsgirêkên erd û mal de pevçûnên ku dendikê hêjirê jî danagre, yên mirişk û kuçikan de tune dibin û diçin. Min ji ber vê sedemê biryar da ku ez ji bo van nekevim hewldanên mirinî. Ez ji malbatê hêrs ketim, pevçûna min a bi malbatê re dest pê kir û piştre jî berdewam kir. Nakokiyên min bi dayik û bav, gund, civak, dagirkeriya Tirk, ol û felsefeyê ve her çû bi pêş ket. Xuyekî min heye, ez xwe naxapînim, dema ku ez bi nakokiyekê re rûbirû mam, weke ku bifetisim dixwazim wê çareser bikim. Dibêjim, ezê heta dawiyê bi ser de biçim û wê çareser bikim, teqez dikarim encamekê bi dest bixim. Hizirandina xwe de ez her ku diçûm digihiştim xala xwekuştinê. Ji bo sosyalîzmê jî ez li ser bingehekî bi vî rengî nêzî çareseriyê bûm. Em hîn jî li ser sosyalîzmê him bi teorîk û him jî bi pratîk gelekî berfireh disekinin. Ji bo azadiya zayendî jî asta min ev bû.

Berê jî ez ji ketina têkîliyê bi jinê re ditirsiyam. Heta li hemberî jinê hindekî nefreta min hebû. Zayendîbûna dayika xwe min zêde baş nedît, ji ber ku ji bo min zêde bi tendûristî nedihat. Ango her carê ew baweriyên heq û hiquq xwe disparte vê û zêde serdeçûyîna ser zarokên xwe di min de nêrînek ava kir, ku pêwîste dayikek bi vî rengî nebe. Ji ber wê min li hemberî dayika xwe helwest nîşan da. Li gor min ev jî parastineke mafdar bû. Dayik nikarin zarokên xwe bi vî rengî biwelidînin û mezin bikin. Min di jiyana xwe de ji bo vê nirxeke di asta rêgez de rûmet dayê. Jixwe hun vê yekê nizanin. Ez hîn jî bi vê rêgezê ve dijîm. Zarok hemû jî gelekî neçar in, dibe ku hun jî ji zarokan hez bikin an jî dilê we bi wan dişewite, lê belê ez bawer nakim ku hun di vê de cidî û xwedî biryarbin. Dayik û bav jî di nav de yê ku di vê de dilsoz in, ji bo ku dinya wan zarokan rizgar bikin dê hindekî rast bin. Tu tiştê zarokan, tu pêşeroja wan nîne û ev jî zarokên Kurdan in. Malbat jî zarokên xwe gelekî xirab hez dikin, min hîn ji wê demê ve jê nefret kir. Hîn wê demê jî rexmî ku di derbarê pêşeroja van zarokan de tu plansaziyên wan tunebûn, min digot ji bo çi ev qasî zarokan himbêz dikin û ew himbêz kirina wan a zarokan ji bo min weke rondikên tîmsahan dihat.

Ji ber vê min ji van nêzîkbûnan nefret kir û hezkirin nexwest, min got li şûna zarokekî bi vî rengî hebe, bila qet nebe. Ez di vê mijarê de girêdayî rêgezekî dijîm. Zarok îro, ji min gelekî hez dikin, ez herim ku derê li tenişta min artêşeke zarokan heye. Dinya zarokan jî min fêm kiriye. Qet nebe dibînin ku ji bo wan hêviyek hatiye afirandin.

Ez ji bo vê yekê diyar dikim pêwendiyên min piralî bûn. Ji bo rastiya jinê jî pêwendiyên min ên ku dişibine vê hebûn. Ez ji rastiya jinê çavtirsî dibûm. Ji dinya jinan û ji valatiya vê dinyayê ez ditirsiyam. Ji neçarbûna jinê çavtirsî dibûm. Zimanê wê nebû ku yek du gotinan bike. Destên wê nebûn ku, destekî dirêj bike.Bi ketina zanebûna vê ez di temenekî biçûk de bandor bûm. Wekî din min di têkîliyên jinan de ketin didît. Bi jinekê re pêşxistina têkîliyekê dê berpirsyariyên giran bîne û min zû dît ku ev dikare mirov ber bi ku ve bibe. Ango min digot, li şûna ku ez têkîliyê bi pêş bixînim, qet bi pêş nexînim baştir e. Ez di vê mijarê de gelekî birêgez tevdigeriyam. Ev ne ji bo ku min ji jinê heznedikir, berovajî gelekî biçûk bûm jî ji bo hevaltiyeke baş bû.

Ev van ji bo ku min xwe di feraseta feodal de hepis nekiriye vedibêjim, diyar dikim. Di vê mijarê de ez dikarim bi rihetî diyar bikim ku di nava nêzîkbûneke alîgirê rêgezê wekhev de bûm. Pêwîste di hemû jiyanê de hevpariya bi jinê re pergala jiyana hevpar a bi jinê re were avakirin. Di temenekî biçûk de, di lêyîstokê de yan di hilberînê de yan jî di dibistanê de nêzîkbûnên min bi ser vî alî bûn. Bi qasî ez mezin bûm, min dît ku derfetên vê zêde nînin. Jin ji zû ve wenda bûye, hevaltiya wisa wekhev û azad zêde nayê pêşxistin. Weke din tiştên ku tên ferzkirin jî gelekî cuda ye. Jinekê diavêjine serûçavên ciwanekî, bi vê re jî şêwazekî têkîliyê ku dînbûnê wêdetir naçe derdikeve holê. Bûyera zewicandinê hişt ku ez bi vî rengî çavtirsandî bim. Bêguman tenê ez ji bo xwe, çavtirsandî nedibûm, hemû zewacên ku hatine kirin, min çavtirsandî dikirin. Ev zewac, ez digihandime hestekî ku min digot, him jin û him jî zilamên xwe ve em wenda dikin.

Ezmûneke ku ez jiyabûm hebû, ew ezmûn îro jî tê nîqaşkirin. Hun ji van nîqaşan çi encamê derdixin? Ez li rojnameyan temaşe dikim, hîn jî

dinivisînin “xezurê Apo kî ye? Bi ajaneke MÎTê yê çil salî çi karê wî hebû? Têkîliyên wî bi filan jinê re çi bû?” Diyare ku MÎT dixwaze van nîqaşan bi pêş bixîne. Ev têkîlî xwedî taybetmendiyekê ye ku di dema pêş de wê bi serê xwe were bi destgirtin û tê destgirtin jî. Bêguman, dê hîna jî li ser were nîqaşkirin. Ez bi xwe bawerim, bi xwe ewle me ku di vê mijarê de rast nêzîk dibim. Min ji bo gel, ji bo dîrokê encamên herî baş derxistine. Misogere ez dilsozane nêzî vê têkîliyê dibûm. Ji bo armanc helwestên min ên wekhev û azad misoger bûn. Lê belê ez xwedî tevdîr bûm, pirsa gelo jî her dem di koşeyeke aqilê min de bû. Ev tenê ji bo ku ew endameke malbatekê bû nebû. Ji ber şemitokiya wê jinê bû. Çi qasî ji dil e û girêdayî ye, çi qasî dikare bi hev re jiyanê temsîl bike?

Vê têkîliyê ew qasî ez westandim ku rojek hat min xwest ji malê birevim. Weke tê zanîn, di giştî de jin ji malê têne avêtin an jî ew bi xwe direvin. Ma we dîtiye ku zilaman dev ji malê berdane û revîne? Êdî hun dixwazin bibêjin, sîxuriya objektîf e yan jî ya subjektîf e, ev têkîlî di sala 1978’an de hate rewşekê ku mirov nedikarî ber xwe bide. Bi hevalê kevin re gelek caran em li ser vê têkîliyê disekinîn. Hevalekî me yê ku hîn dijî, nêzîkbûnên hevalê Kemal Pîr ji bo me vedigotin. Diyar dikir ku Kemal bi şêweyê “wê jinê Serok xelitand, di rastiyê de me dixwest em wê jinê bikujin, lê belê dibe ku tiştekî Serok dizane heye” nirxandin kiriye. Kemal Pîr, bi me ve gelekî girêdayî bû ev heval tenê ne di vê mijarê de bi rastî jî bi vê girêdaniyê ve xwedî berxwedaniyeke gelekî qehremanî bû. Ew bi xwe ne Kurd bû jî, lê belê dîsa jî berxwedaniya herî mezin nîşan da û ew mirovekî ku herî zêde bi min ve girêdayî bû.

Ez dixwazim vî tiştî bibêjim, şerekî mezin dest pê kir, ez dikarim diyar bikim ku ger me ev şer nedaya vê gavê PKK, gerîla û serhildan çênedibûn. Hun dikarin bibêjin gelo ma têkîliyeke bi vî rengî çawa rê li ber avakirina PKK’ê, gerîla û serhildanê vekir? Ger hun bi tenê dahûrîna Rêbertiyê rast tê bigihên hun dê bibînin ku ev bi rengî ye. Di bûyera wê jinê de li hemberî hemû niyetên min ên baş, hestyariya min û hêviyên min, dibe ku sîxuriya objektîf be jî yan subjektîf be jî feraseta ku hatiya ferzkirin, “ger tu bi min re

dixwazî têkîliyeke tendûristî ava bikî, pêwîste di destpêkê de tuyê stûyê xwe li hemberî rastiya çînî û civakî ya min bitewînî û bibî amurê vî yan jî hîna wêdetir. Tuyê bi KT ve girêdayî bî” bû. Ez gelekî bi rêgez tevgeriyam, di rastiyê de wê ev tişt gelekî eşkere nedigotin, berovajî gelekî şêlû, neyekser û bi raveya rûyê xwe yê weke jehrê bi şêweyê nêzîkbûneke weke stirî, bi rûyekî reş nêzîkbûnên ku ne her roj her kêliyê weke ku tola xwe bistîne nîşan dida û digot. Ez vê yekê mezin nakim, bûyer û astên têkîliyan hatine tomarkirin.

Ev tenê bûyereke kesayetiyê jî nebû. Dahûrandina Rêbertiyê bi giştî ve gelekî ji nêz ve girêdayî ye. Ji ber vê sedemê ye ku Kemal Pîr gotibû êdî têkîliyeke bi vî rengî nayê efûkirin, ev xwe ferzkirineke gelekî xirab e. Bi wî rengî ye ku mixatabê me jî gelek caran digot, “zilamekî Kurd ê herî navdar be jî teqez dê bikeve panîkê, herî kêm yek du rojan ferzkirin berdewam bike, dê yan kêra xwe yan jî çeka xwe bikişîne lê bide yan jî biqewitîne. Lê belê ez dizanim ku ji ber girêdaniya te ya sosyalîzmê tu vê yekê nakî, ez dizanim ku tu li benda demekê yî.” Di rastiyê de tespîteke rast dikir, bêguman ez têkîliyan ji rêzê û biçûk nagrim dest, li ser têkîliyên ji rêzê dahurandinên ji rêzê nakim. Ger min wisa kiriba, bêguman ez nedigihiştim asta Rêbertiyê. Zilamekî ji rêzê bûya dê bi sîleyan li jinê daba. Ez ne ji ber bêhêziyê, ji ber bihêzbûnê bi wî rengî tevdigeriyam. Ger wê demê ez bibûma amurê azweriyên xwe vê carê binketin, dê jênerev bûya. Hindek ji bo vê dibêjin neçarî, hîn jî hindek dost min neçar û reben dibînin. Lê belê di rastiyê de yê ku wiha dibêjin, qediyan e. Ew xwedî tu çareserî û pêşketinan nînin. Dîsa pêşketin bi min re dest pê dike û bi min re dimeşe. Ev ne ji ber neçarbûnê yan jî pêwîstbûnê nîne, çawa ku ez nava ketîbûneke zayendî de nînim, ev rewş ji bo min jî gelekî şerm nebû. Ev di nava metirsiyên min de bû, lê belê diyarker nebûn. Dibe ku gelek kes bi min qerfên xwe bikin, dayika min jî bi qasî ku bikaribe ji min re bibêje, “nikare axaftinekî ji jinekê re bibêje” qerfên xwe bi min dikirin. Lê belê min zêdetir berjewendiyên gelê xwe û partiyê esas digirt.

Malbata jinê ji serhildana Kurd a 1925'ê heta serhildana Dêrsimê, heta 1940'an bi Kemalîzmê re hevkarî kiriye, malbateke ku ji Înonu belge wergirtiye, li gor dewletê malbateke baş e û ji ber ku xizmeta dewletê kiriye spasname wergirtiye. Min ev yek dizanî, lê belê ez ewlebûm ku ihtimal heye vê bidomîne û weke hevkarê dewletê ristê xwe bilêyîze. Di wê demê de CHP'ê (Partiya Gel a Komarê) xwe pêşverû didît. Bêguman dewlet çi qasî pêşverû be, CHP jî ew qas pêşverû be. Wê demê min bawer dikir ku ev jin ihtimal heye bibe welatparêz, lê min ev ihtimal jî dida ku ew bibe temsîlkarê çîna xwe ya noker. Dewletê jî bi ihtimalek mezin rastiya vê têkîliyê dizanîbû, ji ber ku wê demê ev malbat, bi saziya ewlekariyê ve girêdayî bû. Pîlot, asta min a di sala 1977'an de heta 1976'an de dizane û hatin û çûyînê li gel vê malbatê dike. Li gor min dijmin texmîn dikir ku, xwe bispêre vê malbatê û min kontrol bike.

Gelo ez ji dil ketime bin vê kontrolê? Naxêr! Ugur Mumcu wiha dinivisî "gelo ma bi taybet MİT'ê Apo parast?" MİT nikare min biparêze. Ji ber ku ez rojê yek trîlyonê zirarê didim dewletê. Vî tiştî rojnameyên bûrjuvayê dinivisînin. Ma MİT zilamekî her roj trîlyonekî zirarê dide dewletê tu caran diparêze? Xelitandina herî mezin min bi vê dewletê da tahmkirin. Darbeya herî mezin min lê da. Di sala 1979'an de dema ku ez derbasî Rojhilat a Navîn bûm, hevalekî me yê li Akademiyê digot, endamekî MİT'ê gotiye "me çawa ev zilam ji nav destên xwe revand? Û li serê xwe daye. Cuneyt Arcayurek di rêzenivîsa xwe ya bi navê 'em çawa hatin 12 Êlûnê?' de dibêje "ev mar bihostek bû, ger leşkerên me potînê xwe rabikira dê ew biperçiqandiba. Lê belê me xefleteke mezin jiyan kir." Armanca van kontrolkirina min a bi riya vê têkîliyê ve bû. Gelo ma min ev taktîk bi zanebûn meşand? Min got hevkar be jî, dibe ku ji vê malbatê şoreşger derbikeve. Dibe ku ev hevala me jî bibe rêhevaleke me ya birûmet. Misoger baweriya min bi vê yekê hebû. Ya duyemîn, min semta (ihtiyad) xwe ji destan berneda. Min bi xwe ji xwe re got, hişyariya xwe ji destan bernede, ihtimale ku tu ji vir ve werî kontrolkirin. Wê îdare bike. Bi kar bîne. Pîlot jî di nav de min hindekî ew bi kar anîn, Ugur Mumcu di vê mijarê de wiha

dinivîsand, “Apo gotiye Pîlot roniya çavên me ye em wî biparêzin.” Dibe ku min ev gotin, bi heman rengî negotibe lê belê nêzîkbûneke ku dişibê min bi pêş xist. Ji ber ku ger me Pîlot kuştiba hîn wê demê PKK’ê navê xwe li xwe nekiribû, dê bihata tunekirin. Dîsa ger min ev têkîlî berdewam nekiriba misoger e ku bûyera derketina derve jî de, me dê zehmetî bikişandibana. Hîna di sala 1975’an de dewlet dibêje “ev zilam ber bi damezrandina artêşa netewî ya Kurdistan’ê ve diçe, pêwîste were kontrolkirin.” Vê zanyariyê di sala 1975’an de girtiyekî DDKD’ê ji me re ragihandibû. Navê Dev –Yol hîna derneketibû. Ez wê demê di nava Dev-Gencê de tevdigeriyam. Min vê carê jî pirsên weke “Kurdperest e yan jî di Dev-Gencê de ye” afirandibû. Me salekî jî wiha derbas kir. Pişt re dihizirin ku ez di bin kontrolê de me û kengê bixwazin dikarin min bigrin. Min jî di vê wateyê de ji vê têkîliyê ne yekser sud girt û weke hun jî dizanin em derketin derveyî welat. Di pêvajoya derketina me de jî dîsa ev şer hate jiyîn.

Fatmayê provakasyonên mezin kirin, ji ber nakokiya Semîr a 1982’an de xwest Partiyê ber bi fetisandinê ve bibe. Di sala 1982 û piştî wê de jî pevçûneke sexte afirandin û xwestin partiyê bikin du beş. Me ev yek vala derxist. Di sala 1986’an de dîsa lêyîstokeke bi heman rengî xwest bi ser bixe, wê demê jî em li dij derketin. Di hemuyan de jî hate xwestin ku jin gelekî xirab were bikaranîn. Xefilbûn, di vê mijarê de asta wê ya çareseriyê nebû. Em bi vî rengî di şevreşiyê de dimeşiyan. Min pêşiya vê lêyîstokê bi sebreke mezin girt. Ji aliyekî de ez dihiziriyam emê çawa bigihên azadiya jinê, ji aliyekî din de jî ez dihizirîm ev jiyana dojehê dê çawa were kişandin. Min xwest bi hemû hêza xwe vê tekoşînê bimeşînim. Dibe ku gelek hevalên me vê pêvajoyê nizanibin, ji ber ku rewşên hestyariyê ku hatine jiyîn, zêde bi peyvan nayên vegotin. Hêza berxwedanî, hêza sebrê û rik di belgeyan de me nekariyê em zêde cih bidinê. Hîna zêdetir me ev bi encamên xwe yên siyasî ve tomar kir.

MİT’ê wê demê di rojnameyan de nûçeyên weke “zilamê Fatma Apo kuşt, PKK parçe bû” dida weşandin. Di rastiyê de pevçûneke ku dişibiya vê yekê hebû. Bêguman me bi sebr û hişyarbûnê derfet neda wan. Ev rewş di

kongreyên 1982 û 1986’an de hate jiyîn û herî dawiyê gihişte provakasyona 1988’ê. Di bin vê provakasyonê de Fatma hebû. Parêzer tenê lêyîstokvan bû. Piyon bû. Herî zêde di vê salê de xwest Partiyê bêhêz bihêle. Li gor min di provakasyonên ku heta Başûr berdewam kir jî vaca wê hebû. Li gor min KT di bin nêrînên wê de plansaziyên provakasyonan bi pêş dixist û pêk dianî. Bêguman ew jî hêzek e. Dewlet çil salan bi Kurdan re mijûl bûye, dibe ku wê bidomîne. Ew hevkarî û sîxuriya weke Kemal Burkay, KUK, DDKD, PDK û hwd. Li kêleka van provakasyonan gelekî lewaz dimînin. Lê belê şerekî min ê bi van re çêbû û ev hîn jî şerekî ku ez bi serê xwe dimeşînim e. Lê belê ez bi hemû aliyan ve di bin gumanan de bûm, her kesekî têkîliya min weke “bi keça sîxûran re çi digere?” rexne dikirin. Hevalên me jî weke “ev têkîliyeke bi çi rengî ye?” pirsyar dikirin.

Fatmayê bi xwe her roj mirov dixistin. Ew bi xwe dibêje “pêwîste em mirovan xerç bikin” bi fermî hindek hevalên jin fetisandin, hindek daxistin sifirê û hindekî pêşkeş kirin. Ev polîtîkayeke ji bo jinan bû, ji bo ku bi tenê rêhevalek dernekeve çi pêwîst bû dikir. Kesên ku wê afirandine, heta îro jî bûne bela serê min. Veşidiyayî ne û bi arîşe ne. Zilam jî wiha ne, ez dixwazim dîrokê hindekî din zêde bikim, ango tam deh salan zêdetir me yekser ji eniyê şerekî dijwar meşand. Bandora vî şerî hîna jî berdewam dike. Gelo ma ev şer, şerekî ku girêdayî vê têkîliyê taybet hatiye kirin? Naxêr, ev yek gelekî zelal e, siyasî ye û şerekî eşkere ye. Şerekî di hest de, di hizir de û di rêxistinkirinê de ye. Ew bi xwe di gihiştina me ya gerîlabûnê de astengeke herî mezin bû. Ev şer li hemberî wê ye. Ev şer di dîtinê de li hemberî kesekî ye, lê belê li hemberî him KT’yê ye, li hemberî hêza wê ya lêdanê ya herî xeter Kontr-gerîla ye, li hemberî şerê taybet e, li hemberî MİT’ê ye. Ji bo hun baş têbigihên, gelo ez di kîjan çarçoveya siyasî de nêzîkî têkîliyan dibim, dîsa bingehê dîrokî çawa bi dest digrim, van tiştan ez diyar dikim. Ango mirov nebêje, têkîliyeke zayendî ye û neavêje aliyekî. Ji bo ku hun gelekî seranser nehizirin, ezê van tiştan diyar bikim.

## Pêşxistina jinê tolhildana ji koletiyê ye

Di zilam û jinên Kurd de ketibûna di têkîliyên zayendî de di asteke herî pêş de ye. Di felsefeya gundî de têkîliya zayendî ya kor bi şev û roj heye. Di dîtinê de gelekî binamûs e, nimêja xwe dike, bi xwedayê xwe re ye. Lê belê li gor min jiyana wan hemû têkîliya zayendî ya kor e. Ev têkîliya zayendî ji asta malbata pêvajoya hovîtiyê jî şûndetir e. Tiştê tê jiyîn ev e. Çi qasî bi êş e ku ji bo vê hovîtiyê qilifê binamûsiyê lê dikin. Dema ku mirov tîne asta malbatê di wir de rastiya Kurd ji hemû aliyan ve di têkîliya zayendî de hatiye fetisandin. Di rastiyê de bi hemû aliyan ve nasnameya netewî û welat çûye, her tişt di vir de hatiye wendakirin. Vê gavê tengasiya herî mezin hîna jî ev e. Ne zilam û ne jî jin dikarin bêhna xwe bistînin. Ev tenê bi nirxandinên wêjeyî yên dirêj û siyasî ve tê vegotin.

Ji gundîtiyê, ji bo çi zilamekî baş dernakeve? Rexmî hemû hewldanan ji bo çi berpirsyarekî siyasî û leşkerî yê xwedî hêz dernakeve? Ji bo çi pêşmergeyan ji ber malbata xwe çil caran xwe firotin? Zilamê Kurd, ji bo çi ev qasî xwe firote Ewrûpayê? Ji bo malbata xwe û ji bo kar rojê çil caran parsekiyê ji dagirkeriyê re dike. Ji bo qaşo malbata ku xwedî namûs e, heta tenê ji bo jiyana xwe ya ji rêzê rizgar bike, li hemberî mûçeyekê (maaş) tiştekî ku nefroşin nîne. Ma rûmet û namûs maye? Exlaq li ku dera vî tiştî ye? Lê belê tenê vê xilas bike li hemberî îşkenceya dinyayê berxwe dide dikare ji çolên Erebistanê biçe wî milî dinyayê Swêdê. Ev di heman demê de dramek e.

Şoreşger ji bo pirsgirêkan bi qaliban nêzîk nabin. Ew dizanin bi şêweyên afirandêr û bikaribe ber bi rizgariyê ve bibe nêzîk bibin. Wê demê hun dê çawa nêzikî van pirsgirêkan bibin? Ji ber ku hem min weke takekes jiyan kiriye, hem jî hêza min a çavdêriyê ya giştî heye dibêjim, li gor min ji beriya her tiştî pêwîst e azadiya zayendan were pêkanîn. Pêwîste têkîliya zayendî ji xapandinê, ji xistinê, ji bûyîna amurê avakirina mal û milk û malbatê derbikeve. Heta pewîste mirov têkîliya zayendî ji amurbûna ketinê derbixe. Ji ber ku têkîliya zayendî her dem weke bûyereke gelekî şerm tê nirxandin.

Têkîliya di navbera zayendan de, têkîliya zayendî weke tiştekî gelekî şerm tê bidestgirtin. Gelo ma ev nêzîkbûn rast in? Ger em li gor zanistî, li gor zanista azadiyê lê temaşe bikin girêdaniya têkîliya zayendî bi paşverûtiyeke mezin ve, bi girtîbûnê ve, bi pêşketina civaka çînî û bi pergala mal û milk ve heye û heta ev yek weke nîşaneke vê ya herî ji rêzê û hêsan e. Di vir de tawana herî mezin ku li hemberî mirovahiyê hatiye pêkanîn, bingehê bêexlaqiyê di bin navê exlaq de derdikeve holê ye. Bi namûsbûna di vir de navê rûyê wê yê din bênamûsî ye û rûyê din ê girêdaniya zêde bi mêrê xwe ve jî fahişetî ye. Her du jî bi hev ve gelekî girêdayî ne. Van hemûyan di Kurdistan'ê de civaka me fetisandine û dinya me ya hizirandinê tune kiriye. Ango derfet nedaye ji bo pêşketinên ku jê re tê gotin, taybetmendiyên netewî û rastiyên siyasî. Hun dikarin vê hizirandinê bêhtir bi pêş bixînin. A herî girîng jî hun dikarin li ser pêk bînin.

Ez weke zayendekî xwe hindekî azad hîs dikim û şerekî min ê herî girîng jî ez xwe di asta azad de dihêlim. Gelo ma min bi vê yekê ve çi bi dest xist? Gel bi azadî, jin jî hindekî din bi wêrekî nêzikî min dibin. Ma gelo min ji bo gel got, bibêjin "Bijî Apo?" di carekê de her kesî li her cihî ev tişt got. Ma gelo ez jinê dikişînim gel xwe? Ger hun balê lê bikişînin, di we rêhevalên jin de pêwendiyeke kûr bi pêş dikeve û ji ber vê pêwendiyê di dîroka Rojhilat a Navîn de cara yekem ev qas jin bêtirs li serê çiyan çekê digrin destên xwe. Me rê ji vê yekê re vekir. Gelo ma ez nebûma dikarîbûn gavan biavêjin? Çepê Tirkan jî heye, bila gavan bidin avêtin. Misoger e ku girêdana vê bi sererastkirina jiyana min ve heye. Ji ber ku min dev ji asta xwe ya azadiyê berneda, civak û jin ber bi azadiyê ve diçin. Hunê hindekî bizanibin ku vê lêkolîn bikin. Rewşa azadiyê çi ye? Jin ji bo çi ber bi wê ve diçe? Ger mirov balê lê bikişîne, bûyera hezkirinê bi pêş dikeve, hunê hindekî dakevine çavkaniya vê yekê. Ev hezkirin çawa bi pêş dikeve? Pêwendiyên min hene, pêwîste ez ji bo gel berfireh bihizirim. Misoger bi sebreke mezin û rik li ser xebatan bim. Ji bo we jinan jî her dem ji bo cihekî diyar şer bikim, ji bo asta azad û têkîliyên azad şerekî bidim. Gelekî li pêş çav e ku min bi hêzeke kişandinê ya mezin ve jin kişandiye azadiyê.

Gihiştina hindek encaman çêbû. Hindek pêşketin derketin holê. Bibînin ku rewşa min, rewşeke ku hindekî kar dike ye. Ez nabêjim, tiştê ku ez dibêjim misoger rast in û yekcar van qebûl bikin. Lê belê hindekî lêkolînkirinê bizanibin. Herî kêm ger hun girêdanê baş çêbikin, hunê bikaribin mifteya avsûnî ku digihê asta azadiyê bi dest bixin. Ev li gor min mifteyeke herî xwedî nirx e. Ev yek ji bo nîqaşê jî vekiriye.

Ez di vê mijarê de dixwazim gelekî wêrek tevbigerim, her kesekî gotiye jin û bi ser de çûye. Nazim Hîkmet jî gotiye, “jina me ye, di sifra me de piştî gayê zer xwedî cih e” û bi ser de çûye. Ji hizirandina zarokeke xemilandî heta bi gelek taswîran diçe. Ango ku gelekî wêjeya wê hatiye kirin. Di encam de weke topeke di bin lingan de diçe û tê, heta dawiyê rewşeke xirab derketiye holê. Jinê di rûmet û şerefê de, di beşa duyem de cihê xwe girtiye. Gotina wê zêde nayê guhdarkirin, zêde cidî nayê girtin. Di pêvajoyên biryarên civakî û siyasî de cihê wê weke mirov tune hesab e. Ew qasî kêm e. Di mijarên leşkerî de jixwe cihê wê tuneye. Di malbatê de jî cihê wê weke hatiye diyarkirin, “piştî gayê zer” tê. Eziyet û mineta dinyayê tê kişandin. Lê belê vê rewşê bi vî rengî qebûlkirin û ji vê re jî gotina rûmet li gor min heqareta herî mezin e ku li mirovan were kirin. Li dijderketina min her cureyê têkîlî û zewacan ku dibe encamên bi vî rengî heta çanda wê ji ber vê yekê ye.

Ger hun lê temaşe bikin, sebra min mezin e. Ez mirovê rêgezê me. Ez bawer nakim ku yekî din bi qasî min hêza girêdaniya rêgezan bi tebat nîşan bide. Kesekî ku hindekî min nas dike, ji bo min dibêje, “navê te birêz rêgez e?” min bihîst ku berpirsyarek wisa dibêje. Digotin, “em cara yekemîn, li rastî yekî tên ku jiyana xwe li gor rêgezan sererast dike.” Pêwîstiya min nîne ku ez kesekî bi erzanî bi xwe ve girê bidim. Lê belê doza civakî a mezin û rêhevaltiya mezin û dîsa ji bo gihiştina vê jiyana min bi xwe ye. Me ji civaka Kurd ya bêziman, kesayeta Kurd a ku hezar caran tune bûye ev qehreman afirandin. Nirxandina gav bi gav çawa hatine xeta qehremaniyê ne zehmet e. Ez nabêjim her tişt bi min dest pê dike, lê belê pêwîste ku mirov hewldaneke wiha jî baş bibîne. Hun dijmin bin jî vê yekê rast

binirxînin. Bi wî rengî ye ku serokê artêşa Tirkan jî min rast dinirxîne. Ji kesayetên ku nedikarîn nefesa xwe bistînin û ji siya xwe ditirsiyan, afirandina vê rewşê gelekî girîng e. Heta ev yek tê wateya her tiştî jiyan bi xwe ye. Pêwîste mirov rêgezê wê jiyanê bizanibe.

Di rastiyê de min bala xwe da rizgariya we, pergala têkîliya her zilamekî bigrin dest. Zilam xwe nade karên bi vî rengî, heta van tiştan bêwate dibînin. Hevalên me demeke dirêj e dibêjin, ew dixwaze bi van jinan ve çawa Partiyê bimeşîne û me vedibînin. Ev feraset demeke dirêje li ser pişta min weke barekî bû. Ew têkîliya taybet a ku min pêş xistiye, hemû têkîliyên ku piştre her kesekî ji bo weke ezmûnekî xwekuştinê dihizirî û weke ku min karekî herî xeter kiriye dinirxandin.

Ji ber jinê tiştê zilam û hun rêhevalên me yên jin qebûl dikin, bûyîna mal û milkê yê nêzîkbûna hestyarî ya ku destpêkê nîşan daye ye. Zilam dibêje ji sedî sed jin malê min e, hun jin jî dibêjin “ez wisa bûm” ma hêsan qebûlnekirina min xerabiyek e. Bêyî ku jin û zilam werin dahurandin hindek rastî çi hatin, hindek li gor rêpîvanên malbatê, hindek li gor rêpîvanên mal û milk, hindek li gor erk û hêzên xwe dikevine nava nêzîkbûnan. Tiştê ku piştî vê bi pêş dikeve jî girêdana jinê ya bi malê û zarokan ve ye. Pêwîste mirov bi rengê ev çi qasî exlaqî ye, yan jî çi qasî xizmeta azadiyê dike binirxîne. Rexneyên di vê mijarê de gelekî berfireh in û dahurandin jî gelekî pêş de çûne. Gelo em bi kirina vî tiştî ve, gelekî we tengav dikin an jî gelo em pergala we serûbin dikin? Dibe ku ev hemû jî çêbibin, ez li rewşên ku derdikevine holê temaşe dikim ez tê digêhim ku dinya we ya hestan hilweşiyaye û ev ji bo bertekan rê vedike. Min hin dîtin nirxandin, li gor wan ez zilamekî bixof im. Nirxanên weke ma balkêş e mirov nikare bihizire yan jî ev gel Rêbertiya xwe nas dike, ma gelo dizanin Rêber bi vî rengî ye? Heye. Ez van hevokan him bi tirs dibînim, him jî bi xwe îftîhar dikim. Ji ber ku ez wiha me, ez ji bo xwe dibêjim bravo. Min ji dîrokê û rastiya koletiyê toleke baş wergirt. Ez xwe bi hêsanî naecibînim. Lê belê di hindek xalan de min hindek encamên bingehîn girtin. Di mijarên kê û kîjan hest em

hilweşandin de hunê hindekî hişmend û ji dil bin. Hindekî baweriyê bi xwe bînin û xwe nas bikin.

Ew nêzîkbûnên ku we jiyane çi bûn? Hun jin û civaka Kurd gelo dizanin? Zarokên deh diwanzdeh salî girtine dane zilamê temen mezin, gelo wan tu caran hezkirin û rêz dîtine. Serê wan ew qasî dixebite? Gelo ma tu tercîhên wan û raweyên wan ên hezkirinê çêbûne? Gelo ma ew layiqê tu hurmetê bûne? Hun baş dizanin ku pêwîst e, ji bo vê bersiva, naxêr were dayîn. Destên wan û dilên wan vala ye. Zimanê wan hatiye girtin, çavên wan hatine korkirin. Bi rengekî girêdayî li cihekî hatine rûniştandin. Şerê min li hemberî vê yekê ye. Dibe ku dibêjin, “mafê her kesî ji bo dinya hestên erzan û têkîliyeke erzan a bi destxistinê heye.” Heta hun baş dizanin ku tê pirskirin, “tu çawa PKK di vê rewşê de dihêlî? Ev qas jin û zilam bêyî ku bizewicin çawa têne girtin? Hevalekî digot, “jin û zilam weke agir û barûtê ne, tu çawa di nava hev de digrî?” wê provakatorê jî digot, “emê di nava 48 demjimêran de pirsgirêkê çareser bikin. Kê dê bi kê re bizewice biryar bigrin, pirsgirêkê ji binî ve çareser bikin.” Di vê mijarê de provakatoran soz dabûn hev û digotin, “ger em Partiyê bikin destên xwe, emê we malên ku hun dixwazin, têkîliyên ku hun dixwazin de bigrin.” Bi sedan heta bi hezaran xebatkar bi vê riyê bêbandor hatin hiştin.

Ger mirov baş lê temaşe bike, çîrok heman çîrok e. Ha zilamê li gund têkîlî bi vî rengî bi dest girtiye, malbat avakiriye, ji xwe re pîrek aniye, bûye mêr, ha di nava refên me de hatiye kirin, ji hev ne cihê ne. Gelo me jin û zilam serbest bihişta ma dê çawa çêbûya? Weke wan bi xwe digotin, yek kes nediçû Botanê, dê biçûna li Ewrûpayê bijiyana. Gelo ma hun dikarin mirovê li Ewrûpa dijî bikujîn jî, serê wî jî jê bikin, bibêjin, “were tu bûyî dewlet, te serxwebûn bi dest xistiye” û bînin welatê wî? Gelo ma hun dikarin kesekî bikîşinin şerekî wiha bi zehmet? Ger em li ser bihizirin, emê bibînin ku ev yek ne gengaz e. Wê rûberûyê her şêweyê heqaretê, her biçe ber bi komkujiyan ve biçe, lê dîsa ew ji xwe re weke çarenûs diyar kirine. Kê çi ferzî kê dike? Ferzkirinên min çibûn? Di serî de rastiya xwe binasin, ji bo vê yekê PKK’ê û ji wê wêdetir sosyalîzma di nava PKK’ê de nas bikin. Herî

dawiyê de jî xwe weke zayend nas bikin. Pêwîste em vê platformê vekirî bihêlin. Nûbûna herî girîng a ku em nîşanî we bidin, ew e. Hun platformeke vekirî bihêlin ku bikaribin xwe azad binirxînin. Destpêkê em derfeta hizirandineke ku xwe ji kaprîsan û ji azweriyan xelas kiriye pêşkeş dikin. Hun bi vê re bi rê bikevin, bi hev re nîqaşê pêşbixin, ji bo hev tiştên rast ferz bikin, çarenûsa xwe nîqaş bikin. Ji ber wê yekê jî pêwîst e kes ji bo tu kesekî nebe asteng. Bi taybetî ferzkirinên hemberî hev bila sînoran zêde tengav nekin. Tengavkirina sînoran nayê wateya “tu bûyî yê min û ez bûme yê te, hev kor nekin. Bi hezkirin û rêzdariyê ve dagirtî bin, lê belê kesek xwe nêzikî rewşên ku em dikarin jê re bibêjin, tengavkirinên fîzîkî ango tacîzê nebe. Ev yek hîn zêdetir ji bo we pêwîst bû. Ji ber ku pêwîstiya we bi hindekî hizirandinê û xwe komî serhevkirinê hebû. Ev yek ne ji bo komekê dihate kirin, ji bo dîrokê dihate kirin. Ji bo pêvajoyeke dîrokê gaveke azadiyê bidine avêtin, dihate kirin.

Azweriyên we û şêweyê we yê hatina tekoşînê, hiştiye ku hun heta qirika xwe bikevine nava hêrsê, min li hember vê yekê li ber xwe da. Ji bo vê jî min hindek nêzîkbûn bi pêş xistin. Min pirs kir ev çi azwerî ye? Min ev azwerî guherande welatparêziyê, têgihiştina gel, naskirinê û girêdaniyê. Me ev mijar him berfireh nîqaş kir û him jî me xwest em wê ferz bikin. Ev ferzkirineke rast e. Ji ber ku ez ji bo berjewendiyên we bi qasî nêvenga nîqaşê ya wekhev û azad bidim ew qasî jî maf û berpirsyariya tercîhkirinê didim we. Lê belê gelo ma tiştê girîng ev bû? Gelo ma ya girîng xwe tunekirin bû? Tişta girîng fêmkirina vê rastiya dîrokî ye. Gihîştina rêgeza rizgariya giştî ye û bi vê re jî rizgariya kes pêşxistine. Hate xwestin bi we re têkîlî di vê çerçoveyê de were sererastkirin.

Piştî van diyarkirinên giştî di pratîkê de ji bo çi hîn jî hindek pirsgirêk tên jiyîn. An jî rewşên ku mirov dikare jê re bibêje sîxuriya objektîf derdikeve holê. Sedema jiyîna vê tênegihiştina rêgeza azadiyê ye. Sînor neanîna ajoyan e. Yan jî hêza avakirina girêdana siyasî nîşan nedan e. Siyaset xetek e, ev xet her ku diçe dibe rêxistin û çalakî. Ji ber ku bi wê re girêdanî nayê avakirin tê xwestin azweriyên bêrêgez were bilêvkirin. Di vê mijarê de em

hindekî astengiyan çêdikin. Tişta rast ferz dikin, ev jî bi helwestên tund ve tê pêşiwazîkirin. Di encam de ev entrîka û paşbêjiyan derdixê holê. Ev jî dihêle ku pêşiya pêşketinên ku çêbibin were girtin.

Di vir de em Yalçin Kuçuk bi bîr tînin, di nivîseke xwe de dibêje, "Ocalan bi bûldozeran mêjiyan –ez dikarim li ser vê dilan jî zêde bikim- cot dike û gulan diçîne, mêjiyan vediguherîne baxçeyên gulan." Di rastiyê de ew me lêkolîn dike û digihê hindek encaman. Bi rastî jî zewiya Kurd encax bi bûldozerê were cotkirin û ger hindek tov werin reşandin dibe ku gul an jî gihayên cuda şîn werin. Di bexçeyê Kurd a niha heyî de ne gul ne jî giha heye. Baxçe hatiye şewitandin, xirabe ye. Lîtav e. Mirov nikare ji bêhnê û ji nefretê jê derbas bibe. Ew kesên ku hindekî hêzên wan ên nêzîkbûnê hene dikarin vê yekê bibînin.

Dibe ku hindek ji we hez bikin, di vê mijarê de ez hindekî jinan û keçikan şermezar dikim. Ez zêde tolhildêr nînim. Lê belê rewşên ku nayên efûkirin tên jiyîn. Dîsa jî em wan efû bikin. Hindekî digihîne astekî ku devê wan dikare axaftinê bike, hindekî digihên hêza hizirandinê lê belê ji ber ku nikarin xwe ji hemû aliyan ve bi pêş bixin dikevin nava rewşên gelekî xeter. Ma gelo wan çi kirin ku çi dixwazin? Kîjan şer meşandin û dixwazin çi bistînin? Gelo hewldanên me heta ku derê fêm kirin? Ez bawer nakim derdê van ê Kurd fêmkirinê û di Kurdistan'ê de jiyînê zêde hebe. Tê xwestin ku xaleke girîng were derbaskirin. Lê belê di hemû provakatoran û oportunîstan de hewldanên ku di pêvajoyên bi vî rengî de ji cihê herî jiyanî derbeyê lê bidin heye. Tenê di vê mijarê de na, di gelek mijarên cihêreng de min bi sedan mînakên vê yekê dîtin. Mînak, şer di dema krîtîk de ye û ger rast nêzîkbûn çêbibe, dê gavê gelekî mezin werin avêtin, lê belê mirovek derdikeve holê û oportunîzmeke wisa ferz dike ku derfetên xwedî nirxekî zêrîn tê wendakirin. Bingehê van ê çînî heye. Wisa ye ku mirov dikarin bi min re gelekî balkêş bimeşin.

Hun baş dizanin ku ez bi astengiyan re şer dikim û dixwazim xwe nexapînim. Astê civakî û pîvana edaletê ya ku ez dibêjim xwe nexapînin gelekî girîng e. Em sosyalîzmê temsîl dikin. Ji bo têkîliyan ên diperçiqînin û

tenê perçiqandin bi qasî ku raberkirina hêza teorî ji bo pratîkê jî gelekî girîng e. Tu kesek vê jî nahesibîne, naxwaze hîn bibe. Ji ber ku bêdil in. Tiştê ku min kiriye, neqebûlkirina vê bû. Li hemberî girtîbûneke mezin me bi serê xwe şer kir. Hun jî dikarin bibêjin, em ji bo azadiyê şer dikin û dijîn. Lê belê gelo ev yek bi hewldanê me ve çi qasî digihên hev, hun çi qasî girêdayî me ne. Tengasiyeke we ya hundirîn çêdibe. Hun vê dizîvirînine bertekê û nerihetiyê. Bi vî rengî di dilê we de ji bo me cih namîne. Heta hîn wêrekbûna min, hîn zêdetir hatina min a hezkirinê xerab tê dîtin.

Hemû jin, gelekî binirx dîtin şopa hêza kesekî bihêz e. Ev yek me ji bo we vekirî diyar kir. Ez ne li pey avakirina ast û haremê bûm û hîn jî di asta xizmetkarekî de me. Ez ji bo we xizmetê dikim. Gelo ma we dikarî ji mêrê xwe, ji evîndarê xwe pêwendiyeke wiha bidîta? Gelo evîndarekî we hebe ku bi vî rengî were derdê we guhdar bike, ev qasî xitabî dinya we ya hundirîn bike û pêwendî nîşanî pirsgirêkên we bike hebû? Hembêz dikir, bi we şadibû û du rojên din rûhê we derdixist. Ev gelekî vekirî ye. Ez zilaman herî kêm bi qasî we nas dikim, azweriyên we avahiya we ji bo vê yekê gelekî vekiriye. Hun di nava lewaziyan de ne. Wê ew bi kar bianiya heta dawiya temenê xwe we dê jiyaneke aloz bidomanda. Gelo ma ev yek tiştekî gelekî xweşik e? Gelo wê wendakirinên we yên mezin çênebûya? Berî her tiştî ma gelo mêrxasiya we, kesayeta we bêyî ku pêş bikeve ji dest nediçû. Gelo tiştên ku hatine wendakirin, qet nebûn? Van tiştan nîqaş bikin. Dibe ku zilam baş jî nêzî we bibe, we baş biparêze, gelekî hez jî bike, we kêfxweş jî bike lê belê gelo ma bi rastî jî kêfxweşî ev e? Wêneyê malbatên kêfxweş ên bi vî rengî têne çêkirin, gelo ma bi rastî jî wiha ye? Hun dema li civakê temaşe dikin wiha nebûna wê bi çavtirsandî pêşwazî dikin û dibînin. Gelo ma di têkîliyeke bi vî rengî de aramiya keçeke ciwan çi qasî tê parastin? Rêzdayîn û nirxdayîna wê çi qasî çêdibe? Li derûdora xwe ya herî nêzîk temaşe bikin, gelo çi qasî rûmeta we heye? Ger hizirandinên mirovekî asayî ji rêgeza azadiyê ya bingehîn û xeta siyasî qut bibe ew dikare her cure çorsiyê bike. Hele ku li şûna azweriyê ajoyên xwe rakirina ser lingan hizirîbe, ji wî her cureyê belayan derdikeve. Ji bo wê jî dê bibêje azadî,

azadiyê jî bi vî rengî tê digihên. Ev nêzîkbûneke gelekî erzan e û wan îflah nake. Dîsa jî hilbijartin a we ye.

Tiştê ku ez dixwazim bikim, bikaribim derfetên hilbijartinê jêhatiya ecibandin û hilbijartinê biafirînim. Ji ber ku xwe pêşkeşkirina min a ji bo we, ne encamê ketîbûnekê de ye. Di rastiyê de dixwazim vê yekê bi we bidim hîskirin. Ew mirovê hun ji xwe re weke Rêber dizanin jî, di mijara jinê de pêwîste bi we re weke evîndarekî mijûl bibe ew qasî xizmet bike. Ji bo azadiyê jî wêneyeke ew qasî vekirî çêbike ku hun xwe nexelitînin. Pêwîste hun bibêjin ger Rêberek jî wiha dike, mirovên li hemberî me gelo dê çawa bike? Hunê bibêjin ku Rêberek ev qasî serdest e û bihêz e, wiha nêzikî me dibe, tuyê ji bo çi nêzîkbûneke wiha nîşanî me nedî? Pêwîste mirov vê di we de bîne rewşeke xwestekê. Ev jî her ku biçe bigihê asta tekoşînê. Ev şerê we yê azadiyê ye. Hun dizanin ku ev nêzîkbûneke gelekî bihosteyî ye. Ez nabêjim artîstiyê dikim, lê belê gelo yê ku min di vê de dihelê kî ye? Gelo em wiha nekin, ma em dikarin bi qasî milîmekî gavan bidin avêtin? Gelo ma di vî karî de kesên xwedî nêzîkbûnên azad in, weke we derbikevin? Ger hun bibêjin, “di rastiyê de heta vê derê ye, pêwîstiya me bi hilbijartina azad nîne, ya ku em biecibînin me ecibandiye.” Wê demê ezê ji we bipirsim, we ji bo çi şoreşgeriya xwe bihêz nekir, ji bo çi hun hatine vê derê? Ji bo çi hun binketî ne? Ji bo çi hun nikarin hêz bidin karekî rast? Li jiyana xwe temaşe bikin, hun dê bibînin ku ev yek bi vî rengî ye. Ji ber wê jî hun kêm in, di nava xeletiyan de ne. Misoger pêwîstiya we bi veguherînê heye.

Hun dizanin ku nêzîkbûneke bi vî rengî çi qasî pêwîst e, diyare ku hunê ji nêzîkbûneke wiha encamên herî girîng derbixin. Ev tişt eşkere derdikeve holê. We ji bo çi xwe xiste vê rewşê? Min ji bo çi xwe xiste bin xizmeta we, ma ev yek pêwîst bû? Ez van pirsan ji we dipirsim. Ji ber ez şoreşger im. Di destepêkê de min tu caran nekire pirsgirêk û li ser pirsgirêkan ez bi caran rawestiyam. Di hizirandinê de û di helwestan de jî gelekî şaşitî hebûn, bêyî bipirsim bi ser we de hatim. Hindekan ev yek weke ferzkirin fêm kirin, bi we re ez dem bi dem axivîm, li gor min dibe ku keçeke me, jineke me îro

bibe perçeyekî welat. Di rastiyê de ev yek hindekî rast e jî. Di rastiya jinê de, rastiya me ya civakî û netewî hîn jî dijî. Zilam jî ji ber nokeriyê, xerîbûnê, ji ber ku xwe rojê çil caran li ber dijmin tewandiye tune bûye. Ji ber vê sedemê ew nikare nirxên netewî zêde temsîl bike. Jin çi qasî paşde be jî –jina ji bo Botanê Kurdê bêriya çar hezar salan temsîl dike- zêde ber bi bişaftinê ve neçûye. Her jinek di rastiyê de weke nirxeke netewî ye. Yê ku baş temaşe bike dikare vê yekê tespît bike. Ji ber wê jî pêwîst e weke parçeyeke welat were pêşwazîkirin. Dibe ku hun bipirsin “em kesên bêhnpêketî û tunebûyî ne, ji bo çi tu wiha weke helbestan dihizirî? Ji bo çi xeyalên te ew qasî mezin in?” Welatparêzek jî pêwîste wiha bihizire. Ev şêweyeke baş ê hizirandinê ye, xeyalekî baş e. Jin weke parçeyeke welat pêşiwazîkirin û wisa hizirandin mezinahiyek e. Her çi qasî hun layiqê vê yekê nebin jî pêwîst e mirov we bîne vê rewşê. Ma gelo xirabî di kû dera vê de ye?

Di rastiyê de rûmeta jina Kurd piştî gayê zer tê. Te çawa bi dest girtibe dê wiha be. Ma aliyê vê yê mirovî heye gelo? Jinê ev qasî ji dîrokê welat û ji çandê qut bigre dest piştre jî bibêje, canê min û malê min, bi ser de biçe. Bêrêzî û ferzkirina herî mezin di vir de ye. Têkîlî û azadiya zayendî ku xwe dispêre vê, gelo çend qirûş qîmeta wê heye? Azweriya te şiyar bûye û te hembêz kiriye. Ev tişt dibe rêgeza koletiyê, rêgeza lawiriyê heta dibe xerîbiyê û dagirkeriyê. Di vir de rêxistinbûyîn û çalakî nîne. Vaye feraseta gundîtiyê ya rastiya têkîliya zayendî, ya kor ku bi şev û rojê li rastê ye. Ma ev azadiye yan ev namus e?

Ez ji karkirinê eciz nabim, çawa ku ez di zaroktiya xwe de bi coşa hevaltiyê tevdigeriyam, hîna jî wiha me. Di hizir û jiyana min de kesayet xistina pîrek, an jî zilamkirina sexte nîne. Ez di jiyana xwe de cih nadim van tiştan. Ev yek bi min gelekî kirêt tê. Hevjînî tiştekî xirab nîne, lê belê gelo hevjînî çawa pêş dikeve? Ev yek ji bo min hîn jî pirsgirêkeke şer e. Şer û mijûlbûna mezin dema ku ber bi vê yekê ve diçe girîng e. Ji bo hindekan riya ku diçe hezkirinê weke av vexwarinê ye. Lê belê ev gelekî zehmet e. Li gel me riya ku diçe hezkirinê vekirî hiştin bi şerekî dijwar ve gengaz e. Ez

dahûrandinan kurt dikim, lêkolînekirina vê guneh e. Devê wan hindekî axaftin dike, wê jî gelekî xirab bi kar tînin. Ez ditirsim, gelek dê bikevin rewşeke wisa ku ew hewldanên ku hatine kirin, dê înkarbikin û hewldan vala biçin. Dê vê fêm nekin û biçin. Encamê vê baş nabe, yê ku dîroka xwe û hewldanên ku hatine pêşxistin înkar bike, ne dibe sosyalîst ne jî di riya rizgariyê de dibe xwedî ezmûneke qayîm. Dê rewşa wan weke li welatên Rêel Sosyalîst de bibe.

Hun di têkîliyan de gelekî zehmetiyê dikişînin. Baweriya we ya bi xwe gelekî lewaz e. Pêwîste mirov wêrek be. Di vî alî de ger hun bixwazin, ez dikarim xebatên jinê bi sînor bikim. Lê belê ez ditirsim hun xwe wenda bikin, ji ber ku ez bawer nakim zêde piştgiriya we hebe. Ez bawer dikim ku min hindekî tekoşîna jinê di teoriyê de û di pratîkê de wateya wê ya rêxistinî çi ye, fêm kiriye û ez vê yekê dikarim bimeşînim. Lê belê rewşa sabotekirina vê xebatê heye, di vê mijarê de hun bi xwe dikevine nava kêmasiyan. Ev jî min dide hizirandin û dihelê ku ez tedbîran bigrim. Ger baş were temaşekirin, ev nêzîkbûn hetanî dawiyê zanistî ne û ji bo azadiyê bangewazî ye. Pêwîste mirov bi jinê ewle be, pêwîste mirov him jê bawer bike ku bi wê re jiyan dê hîna baştir were pêşxistin, him jî pêwîste mirov di nava hewldanên wê yên taybet de be. Pêwîst nake ku keçik xwe bikin nava zehmetiyan, em zêde tiştan ji wan naxwazin. Pêwîst nake ku hun bikevine nava hewldanên weke “em bibezine şer, çekê hilgirin, bibezine çiyê û yan jî pêwîst e ez xwe bipeyitînim” jî. Pêwîst nake hun xwe bi qasî hin azweriyan girêdayî hîs bikin. Pêwîst nake ku hun xwe bi zincîrên koletiyê ve jî girêdayî hîs bikin. Ez jî di nav de li hemberî we tu sazî û kes ne li hemberî zayenda we, ne jî zayendîbûna we, dikarin bibin xwedî bandorekî ferzkirinê. Hun dikarin hetanî dawiyê azad nêz bibin. Pêwîste ku jêhatiyeke we ya hilbijartinê hebe. Pêwîst e ku hun bikaribin xweşikbûnê bibînin. Heta hun wê bikin malê xwe.

Dema ku jin bû mijara gotinê em nikarin wê ji jiyanê qut bigrin dest. Di Kurdan de “jîn” him tê wateya jiyanê û him jî tê ya jinê. Ev penaseyeke gelekî rast e, lê belê gelo ma ev ketiye çi rewşê? Li gel me jiyan jehr e, stirî

ye, di nava birînan de ye, belayeke ku bi navê wê dikevine nava her cureyê bênamûsiyan. Jin jî di vê jiyanê de zayenda herî zêde hatiye katalîzorkirin û wiha jî tê bikaranîn. Armanca min ew e ku ez jiyanê bînim astekê mirov bikaribe bijî. Me xwest em wêneyekê ava bikin, me got ku ji jinê jî serok derbikevin, demeke dirêj e bi hindek rêhevalên me yên jin re, di vê mijarê de em kûr bûn. Ez hizirîm ku dibe hindek pêşketinên girîng çêbibin, ev xebat taybet bû û hindek tişt afirandin. Di vê mijarê de pêşketinên gelekî girîng hatin pêkanîn. Di dema pêş de wê bandorên hîn mezintir, di vê xebatê de werin dîtin û jixwe hatiye dîtin jî.

Di hemû rabûnên gel de xebatên me bandorên diyarker pêk tîne. Ew jinên ku berxwedaniyên mezin kirin û çûn şehadetên mezin, me ew afirandin. Ew berhemên van xebatan in. Hindek xayin derketin, lê belê beşeke mezin ketine rewşa qehremanan. Pêwîste ez Bêrîvan a ku li Cizîrê cara yekê şêhîd ket bi bîr bînim. Dibistana seretayî qedandibû û ji bo li zarokên malbatê binêre çûbû Ewrûpayê. Di nava me de jî bû perçeyeke azadiyê û derket. Ev di nava pêvajoya ku bi min re kete têkîliyan derkete holê. Berê koleyeke reben bû, axaftin û ken nedizanî, piştre dît ku çi qasî qîmet tê dayîn, bi vî rengî bi sedan jinên azadîxwaz hene. Ma gelo rûmetdayîna me anîna asteke şervantiyê xirab bû? Dibe ku azweriyên xwe nejiyan, lê belê di dîroka gelê me de cihê xwe yê pîroz girtin. Tê xwestin ku ev tişt hemû şaş werin nirxandin. Di rastiyê de ev pêşketinên ku hebûna netewekî ne û rûmeta jinê ne.

Hun li ser vê bingehê bi pêş dikevin, pêwîste em xwe bi vê yekê ve têr nebînin, hîna zêdetir pêşveçûn hebin. Xizmeta min tenê têr nake, ji bo hewldanên we him pêwîstî heye, him jî hun hêza bingehîn a vî karî ne. Di bûyera Kurd de misoger girtina we ya vî cihî gelekî girîng e. Lê belê hîna jî hun newêrek nêzîk dibin, hun zêde ji xwe ne ewle ne. Girêdaniya rêgezê tê derbaskirin, zêde biedeb nînin. Hun tengav dibin û carna digihên asta teqandinê. Ew jî diyar dike ku hun di gihiştinê de lewaz in. İsrara di mayîna jineke lewaz de û ji bo yekî qûl û kolebûnê ne ji bo suda we ye. Berfirehkirina jêhatiyên xwe yên hilbijartinê û nirxandinê yên ku têkîliyan

baş e. Lê belê bi rêgezbûnê, bi terbiyebûnê û bûyîna berendamê azadbûnê hunê bizanibin. Nirxandina me ya ku em we weke rêhevalên dilsoz dibînin bila xirab neyê dîtin. Ev rewş pêwîste we ber bi xwe mezindîtinê û delalîbûnê ve nebe. Di heman demê de neyê gotin ku gelo niyet xirab in. Ne hun ew qasî pêşketî ne, ne jî nêzîkbûn bi niyetên xirab in.

## Sosyalîzm hilweşandina hendefên di navbera zayendan û newekheviyê ye

Şoreşgerî hunera afirandinê ye. Lenîn dibêje, "pêwîst e, xeyalên me yên mezin hebin, lê belê pêwîste ew zanistî bin." Weke din wiha li ser zêde dike, "şoreşgerekî bêxeyal nabe, lê belê pêwîste xeyalên xwe bispêrîne rastiyê". Li gor min em di pratîka xwe de bi vê ve girêdayî man. Niyeta mezin, xewnên mezin di cihê xwe de ye. Şaşitî û kêmasî di vir de ye. Hun ne di wê rewşê de ne ku xwe weke hêmaneke esas ê jiyanê binirxînin. Pêwîste mirov vê li ser we ferz neke. Ez vî tîştî ji ber ku hun di rewşa yekser werin jiyana malbatê de ne diyar dikim. Di vê mijarê de pêwîste hindekî azadiya we ya hizirandinê û helwestan hebe. Mînak li Ewrûpa jî wisa bi hêsanî hetanî sih salî nazewicin. Teqez ez nabêjim wisa bikin, lê belê ew ketine wê zanebûnê ku zewac ji azadiyê gelek tiştan dibe. Hîn jî tiştên din ên ku pêwîste em bi tekoşînê qezenc bikin hene. Di vê demê de zayendîtî weke nirxekî dibe mijara weke malekî ku were firotin. Weke nirxekî ku were gotin "wey ji destên min çû, her tiştê min tune bû" û were xelaskirin têgihiştin. Zayendîtî rewşeke xwezayîbûnê rave dike. Lê belê civaka serdest, civaka çînayetiyê ev tişt xistiye rewşeke ku nayê naskirin, kesayetên bi hizrên azad û bi îradeyên azad ku dixwazin zayendîtiyê weke xwe bijîn, ev dibe helwesteke exlaqî. Hunê zayendîtiya xwe çawa ku hun hebûna xwe li hemberî her cure êrîşan diparêzin, weke wê biparêzin. Ew wisa di wateya çors de parastin nîne. Zayendîtî civakîbûn, malbat û siyaset bi hev ve tund girêdayî ne. Ev nêzîkbûn rast e. Ger zayendîtiya we ji destên we biçe asta we ya civakbûnê kêm bibe, siyasîbûna we nebe, hunê rewşeke herî xirab bijîn.

Em van weke kesayeta piralî dixwazin di we de biafrînin. Pêwîste hun ji bo vê yekê hêza têgihiştinê nîşan bidin, ger kesayeta we ya piralî çêbibe dê wê demê jêhatiyên we yên hilbijartin û nirxandinê pêş bikeve. Wê demê hun bixwazin dikarin têkîliyê çêbikin, ger hun nexwazin hun çênakin. Ji ber ku hun xwedî kesayeteke birêgez in. Hun di rewşeke de ne ku li hemberî her cureyê paşverûtiyê dikarin şer bikin. Ji bo vê, yê ku bi hemû hêza xwe piştgiriyê dide em in. Ez bim jî ji ber pêwîstiya helwesta azadiyê îradeya xwe serdest bikin, lê belê lêkolîn bikin, xwe ji xeletiyan xelas bikin, ji kêmasiyan xwe dûr bixin û weke din xwe bihêz bikin. Bi qasî ku ev hate pêk anîn, bila hêza we ya hezkirin û ecibandinê hebe. Ger ev neyên pêkanîn hunê bêdadiyê bikin û neheqiyê bikin. Hunê ji tiştên neyên hezkirin hez bikin, ji tiştên pêwîste were hezkirin jî hez nekin. Ev jî bêdadî ye û hunê li xwe jî neheqiyê bikin, bi qasî layiqê we ye pêwîste hun hezbikin û hezkirinê jî pêş bixin. Ger hun vê pêk neynin hun nikarin bibin sosyalîst.

Sosyalîzm tê wateya ji holêrakirina xerîbûna mirovahiyê ye. Derxistina rastê ya nêvenga herî azad, di navbera zayendan û şêweya rave û têkîliyan e. Hilweşandina kendalên di navbera zayendan de ku hezaran sal in berdewam dike ya newekhevî û dîwaran e. Li ser bingehê têkîliyên nû yên azad û wekhev nîşandana nêzîkahiyên hev e. Min xwest di vê mijarê de ez hin tiştan bikim û her tiştekî ku hatiye kirin jî, ji bo nîqaşê vekiriye. Hin hevalan hîn jî em fêm nekirine, binkeya partiyê di vê mijarê de kêmasiyeke kûr dijî û hevalên me nikarin têkîliyan bi pêş bixin. Têkîliyên ku tênê pêşxistin jî gelekî tevlîhev in. Rast nagihêje bûyera hezkirinê, ji bo provakasyonan gelekî dibine amûr. Bi rengekî gelekî xeter sîxuriya objektîf tê kirin. Dijmin jî bi şerê taybet xwe dirêjî vî tiştî dike. Vî tiştî yekser dike mijara şerê taybet û têkîliyên jin û zilam tehrîk dike. Di encam de zirara ku endamekî dijmin nikare bide em ji bêperwerdehiyê û ji nêzîkbûnên nerast dibînin.

Partî dixwaze li ser vê bingehê kadroyên xwe bi perwerdeyê ronahî bike û têbigihîne. Ev jî him di asta netewî, çînî, zayendî û di asta navbera zayendan de dayîna şerekî ku dem bi dem pîvanên gerdûnî derbas dike, dixwaze. Ji bo vî şerî û ji bo encama wê em bi wêrekî nêzîk bibin, gavan bi

pêş ve biavêjin, kêmasiyên ku hene em derbas bikin, em hemû bi hev re bigihên şêweyên têkîliya ku bi îradeya azad hatine diyarkirin. Em di vê mijarê de ji dîroka paşverû, ji têkîliyên civaka paşverû tola xwe wergirin. Pêwîste ku hun bizanibin li ser bingehê şerekî bi vî rengî yê herî zêde pêwîstiya xwe bi tolhildaneke dijwar heye hun in. Ez tenê piştgirê vî yê tund nînim, di heman demê de rêveker û şervanê vê me.

Kesayetên wisa hene ku hindek min reş dikin, hindek jî pirtukên min mezin dikin dinivisînin, çawa dinivisînin bila binivisînin, ez fêmbikirama û bihiziriyana dê hîna baştir bibûya. Di rastiyê de ez girêdaniya rastî ya wan bi jiyanê û azadiyê re çêdikim. Tam di vê xalê de rika wan digre, tiştê ku ew dixwazin jî “tiştê ku tu dixwazî bi me bike, emê bi hêsanî bawer bikin” dibe. Na nabe, dê bûyera hezkirina Kurd vebibe. Jixwe vedibe. Kê pênûsê dixe destên xwe dinivisîne, niha jî rojê pirtukek derdikeve, bêguman pêwîste hewldanên min ên di vê mijarê de baş were fêmkirin.

Ez niha rewşenbîrên Tirk hindekî din baştir fêm dikim, bi taybet keçên Tirkan ji me hîna zêdetir bandor dibin. Ger ez bi keçên Tirkan re mijul bibama, min dê hîna zêdetir pêşveçûn pêk anîbaya. Mînak, jineke Yewnanî bi min re hevpeyvînek çêkiribû, digot “ji bo we heyraniyeke mezin hîs dikin” li Ewrûpa jî bi vî rengî ye. Nêzîkbûneke me ya azadiyê ya ku mercên hemdem derbas dike heye. Ji bo wê hun nikarin tevlîbûnê raber bikin. We anîna rewşeke ku hun bikaribin bi me re di heman astê de bimeşin, tiştekî baş e. Hindek ji we teng dibin, hindek jî ji rewşekê dikevine rewşeke din. Ji bo bûyîna rêhevalên ku bi me re wekhev dimeşin, wêrek bin. Hun dizanin feraseta azadiyê ya hindekan çi ye? Zilamekî wekî dêwekî dibînin, dibêjin “mêrê min zilamekî xweş, baş, bihêz û biquwet e” di rastiyê de ew kesayetekî ku îflas kiriye. Zilam mirovekî wekî dêwan e, xanima me jî yeke li gor wî hundirê wê vala ye. Zilam wiha bibêje, wiha dibe, wisa bibêje wisa dibe. Dibêje “jiyana min, namûsa min, malê min” û tîne nava partiyê. vê jî dixwaze weke exlaq bifroşe. Tiştê ku herî biaqil ez dikim tu caran vê tiştê cidî nagrim. Ma li gor we ev biaqîlî nîne? Şûna ku mêrê we yên wiha hebin, bila tu caran nebin. Ger wiha ye, ji bo çi hun xwe ew qasî dixin? Ez van

tiştan ji bo ku ez dihesidim diyar nakim. Lê belê li gor min nêzîkbûnên zilam gelekî dirûxîne û şêweyeke jiyanê ya ku dixe ferz dike.

Fatmayê ji bo vê taybetmendiya min digot “xwe xiste şûna zilamekî û xwest min biperçiqîne” di rastiyê de min nedixwest di têkîliyan de ferz bikim, ji bo vê ez bi hêrsbûna Kemal Pîr hêrs dibûm. Gelo bêyî ku destên xwe ji ava sar naxe ava germ ev qasî li ser tiştên amade dijî, li ser pişta partiyê jiyînê ve ew xwe çi dihesibîne? Noker e, bi xwarina heram ve mezin bûye. Min nedixwest ez li rûyê wê bidim, di rastiyê de min dixwest ez wê qezenc bikim. Min nedixwest bibêjimê heramzade. Di rastiyê de ew keçeke Kurdan e, dibe ku were qezenckirin, lewaziyên min jî di vî alî de hebûn. Teqez ez dixwazim bi xala herî dûr ve bigrim û xelas bikim. Ew jî pêwîst dike ku têkoşînek were dayîn, naxwe dê bibe belaya serî. Ez bawer nakim ku di dinayê de yekî din hebe ku bi vê şêweyê tekoşînek jiyabe. Di hemû têkîliyan de bi qasî aliyê pejirandinê, aliyê wê yê redkirinê jî gelekî bihêz e.

Di Kurdistan’ê de kesekî ev qas keçikên dewlemend di nava hev de nedîtiye, hemû jî ji ber ku ji vê axê hezkirinê biceribînin, ji civaka heyî revîne. Welatparêzî bi hezkirina min ve dest pê kir. Me ji bo we qiyamet rakirin, hun hîn jî nêzikî ji me fêmkirinê nabin. Lê belê pêwîste ji bo jinê hêza we ya pejirandinê hebe. Hun çawa dibêjin, ji bo qezenckirinê pêwîstiya we bi hewldanan nîne, tu caran ji bîr nekin hun di civakê de çend caran hatine wendakirin û ew hêzên ku we dikişînin, çi qasî bêmerhemet in. Di rastiyê de hun nikarin vê jî fêm bikin, ez ji bo we xemgîn im, hewldanên min ji bo çi nehatine fêmkirin? Gelek hêz we dikişînin, tenê ne emperyalîzm, dagirkerî û feodalîzm tenê malbat jî na, hemû we yek bi yek dikişînin. We ji we dibin, ji ber vê sedemê hetanî dawiyê lewazî bi pêş ketiye yan jî hun ketine rewşekê ku êdî nayêne naskirin. Û hun vê yekê berdewam jî dikin.

Di rastiyê de hêza kişandinê ya azadiyê a min heye, ev qas pêşketinan, derxistina ser dika dîrokê ya gelê Kurd û jinê em bi hêza mezin a kişandinê û pejirandinê ve derdixine rastê. Dema ku hun li vê yekê temaşe dikin şaş nemînin, ji ber ku hêzên ku we bi şûn de dikişîne û nahêle ku hun bibin ê

xwe gelekî zêde ne. Provakatorekî ji bo min digot, “tu dixwazî me ji me bidizî” naxêr, ez tiştê ku komara Tirkan ji we diziye, dixwazim bi şûn ve bigrim. Ev ferqkirin gotin, “tu dixwazî tiştê ku me girtiye dubare ji me bigrî” Kemalîstekî jî digot, “zarokên me ji destên wî xelas bikin” gelo ma bi rastî kê diz e, dê kî ji kê were rizgarkirin?

Hun carna dibêjin, em rast û wêrek in. Ez dixwazim ji we ewle bim, di nêrîna min de jin dikarin bibin rêhevalên baş. Hindek gelekî neyînî derdikevin jî, yên ku girêdaniyên bihêz jî raber dikin hene. Di rastiyê de pêwîste mirov jinê biçûk nebîne. Her jinek gelekî binirx dîtin, şopa hêza kesekî xurt e. Ji gelê xwe, ji jinên xwe, ji her mirovekî re rûmetdayîn û bi wateya rasteqîn ve nêzîkbûn hêza kesayet nîşan dide. Tiştên rast pejirandin, erkekî herî bingehîn ê welatparêziyê ye. Lê belê hevalên ku van fêm dikin, bi qasî mirov bibêje nîne, ew qasî kêm in. Hindek kes bi nêrînên giştî ve heta bi tawankirinê ve pêşwazî dikin, hun jî vê napejirînin. Hun dibêjin, “ez jineke kêm im, jineke ku pêwîste were perçiqandinim” û hun xwe dikine amûrê vê.

Hun di nava rewşekê de ne ku bi qasî tekoşîna welatparêziyê pêwîste hun tekoşînê bikin. Diyar e ku pêwîstiya we bi hêzkirina têgihiştinê heye. Hun ji ku derê tên? Kîjan hêzê we kişandiye, kîşan bayên dijwar hun li gelî û bestan belav kirine? Li wan deran kê û çawa we difetisîne? Mirov dikare mînaka xezal an jî kewa ku di destên pilingekî de hatiye nêçîrkirin bide. Ji bo jinê carna remzên wiha tên afirandin. Hatine revandin, hatine birîndarkirin, hindekan jî xwestin xwe rizgar bikin. Diyar e ku pêwîst e mirov ji gelek aliyan ve nêzîkê vê pirsgirêkê bibe. Ez li xwe dihizirim, min êşa bêalîbûnê jiyî, ez êşa yekalîbûnê û lewazbûnê dizanim. Lê belê min ev weke qederekê nedît. Berovajî ji bo çi ev yek bibe qederek, ji bo çi em xwe piralî nekin, ji bo çi em xwe mezin nekin?

Ev rêgeza “tu tuneyî” li ser jinê çawa hate pêkanîn? Li ser bingehê rêgeza “tu hîna tuneyî” ve tolhildana jinê dest pê kir. Ev tê wateya “ez ne ku tune me, tuyê vê bibînî” wê demê jiyana min dişopînin. Ger hun weke rêhevalekî dipejrînin, ji bo çi hun vî şerî naşopînin? Ez ev qasî dişopînim, nêzikî we

dibim. Li hemberê vê hun ji bo çi nêzikî min nabin û min naşopînin?” Gelo hun vê pêwîst nabînin? Gelo ma çîroka min, gelekî watedar nîne? Ger hun min neşopînin, hunê bêdil û bêalî bimînin, bêhêz bimînin. Çi sud di gotina “em jinên çêkirî ne, dê hindek werin me bigrin û me bibin” heye? Hunê vê kesayeta ku di hestan de seranseriyê, di xwestek de kêmbûnê, di vînê de lewaziyê, di hêza biryarê de bêîdîabûnê dijî çi bikin? Ger balkêşî û ziravî hebe, hunê çi ji vê jiyanê bikin? Li xwe binêrin û şîrove bikin. Ger hun şîrove nekin, hûn nakin. Ev yek jî tê wateya “dagirker dê bibêjin, ezê jî bixwînim” tu jêhatiya vê ya hunerî û tu nirxekî vê ya xweşikbûnê nîne. Di rastiyê de ew nêrîna “ji xwedîkirina ajalan wêdetir kêrî tu tiştan nayên. Hunera wan eşqiyatî ye” aidî dijmin e. Em pêwîste vê hilweşînin.

Pêşxistina meclîsa jinê û rêxistina wê bûyereke xweşik e. Ez ji dîtina ku jinê weke eşyayên sivik dibînin, tinazên xwe pê dikin nefretê dikim. Lê belê ji vê yekê re hun rê vedikin. Hun xwe bi sivikbûna xwe ve tînin astekî ku her dem bawerî bi we neyê anîn û her dem di bin fermana îradeyên din de bin. Bila êdî ev yek were derbaskirin. Bila êdî civînên jinê, kesayetên jinê balkêş bin, tu wateya her dem di bin siya hindekan de bûyînê nîne. Hun rêhevalên min in, lê belê tu caran ez naxwazim yek ji we di bin siya min de bin. Ez weke gerstêrê ji rêzê û şopgerekî ji rêzê yê xwe naxwazim bibînim. Pêwîst e hun bibin civata ku yeksan û wekhev dimeşînin. Lê belê pêwîst e, di nava civatê de hunê çawa cih bigrin, baş were pêşçavkirin. Em hindekî ji vî tiştî biwêrin, ez jî mirovên çêkirî na, mirovên ku jiyanê parvedikin dixwazim. Hun derûniya keçeke ciwan baş dizanin. Teng dibe, wêjeya “wey wiha bi vî rengî ye” pêş dixe. Aliyekî vê ku mirov bi dest bigre tuneye, dema dibêjin jin, weke kesekî ku xwe ji rewşekê dixe rewşekê, ji rengekî dike rengekî din tê dîtin. Makyaj jî, sembola vê ye. Xwe ji rengekî dixe rengekî, dike her cureyê şêweyan. Di rastiyê de ev çanda paşketî ya sedan salan e. Ji bo we statuyên ku ji berê de hatine avakirin hene. Weke “ew dê bibe keçikek xanim a baş, jina bûk a baş wiha dibe, jina baş wiha dibe, wiha li mêrê xwe dinêre, wiha pesnên xwesuya xwe dide” ye. Ev derveyî demê ye

û bi serê xwe koletî ye. Li gel em van hemuyan înkar nakin, pêwîste nêzîkbûnên nû werin nîşandan.

Înkar nekin, jiyan ne bêyî jin, ne jî bêyî zilaman dibe. Lê belê di vê mijarê de kûrbûna ku koletiya me gihiştiye jî em nikarin ji bîr bikin. Li ser koletiyê jî jiyan nayê avakirin. Ez bawerim ji van hemû tiştên ku ez vêdibêjim, encamên ku hun derbixin ev in: ev mirov vê hewldana balkêş ji bo ku hindekî azad bijî, ji bo hindekî bişeref be bi pêş dixe. Baş tê bîra min, zilam mafê axaftinê nedida cidî nedigirt, tinazên xwe pê dikir. Min ji van tiştan gelekî kişand. Min got, ma tu ev î û bi qasî ku ez hêza xwedê avabikim bi ser de çûm. Çîroka civaka Ereb jî, çîroka çolê û herikîna Îslamê ya di çolê de jî hindekî wiha ye. Carna derketina PKK'ê Îslamiyetê tînim gel hev. Wê demê jî dibêjin, "ev xwe pêxember dibîne" pêwîst nake ez xwe pêxember bibînim, ji ber ku di roja me de bi zanistî kar tên kirin. Lê belê dîsa jî tiştên dişibine hev gelekî balkêş in. Di rastiyê de kesayeta çolê tunebûnê diafirîne. Derketina Mihemed jî weke teqandina volqanekî di çolê de ye. Di Ereban de zarokên keç bi zindî dihatin binaxkirin. Gelek kes dikarin Mihemed weke "ev qas jinên wî hene, ev qas cariyên wî hene" rexne bikin. Lê belê min hindekî cuda dît. Ev jî xirab nirxandin. Zewacên Mihemed ên bi armancên siyasî hebûn. Lê belê ew jinên ku pê re zewicîbûn, li gor wî jinên ku pîroz bibûn bû. Li gor dema xwe ev gaveke nû ye û li vê mijarê bi çavekî cuda nêrîn ne rast e. Zewacên Mihemed, jinên wî, keçên wî, jinên ku dîrokê de navdar in. Hz. Fatma, Hz. Eyşe, Hz. Xetîce her yek ji wan sembol in. Tê wê wateyê ku di civaka Ereban de, di civaka Îslamê de ji bo jinê nirxek hatiye dayîn. Hz. Mihemed li gor wê demê gelek jin bi wê şêweyê nêzîkî xwe kiriye. Di dema me de, ji ber sedemên hilberîn û teknîkê ev ber bi veguherîna reng ve diçe. Lê belê ev hemû aliyan ve xirab dîtin ne rasteqîn e. Di heman demê de di nava mercên dîrokî de nirxê wê yê şoreşgerî ya mezin fêmnekirin jî, ne rast e. Ji bêhêziya çolê, hêzeke wisa derxistina rastê, lêkolîn bikin. Aliyê vê yê ku PKK'ê re dişibin hev hene. Ger we hindekî dîrok lêkolîn bikira, we dê li têkîliyan hîn dewlemendtir û hîn pîroztir nêrandinê fêr bibûna.

Di bûyera Kurd de rewşên ji çola Erebîstanê xirabtir tişt tên jiyîn. Dibe ku jin, zindî nayên binaxkirin, lê belê di mercên hîn şermtir de tên tunekirin. Bêyî ku hun vê yekê fêm nekin, nêzikî jiyanê nebin. Pirsgirêkên we, weke çiyan mezin bûne. Dibe ku hun min matmayî pêşwazî bikin, ez vê yekê xirab nabînim. Ji ber ku hun ji nêvengên çolan hîn germtir tên. Bêyî têkîlîbûn, bêhêzî, bêferasetî, bêhestî di astên metirsîdar de ne. Rewşa we ji eşîret û qebîleyên Erebîstanê yên wê demê hîn xirabtir e. Ez nêvenga ku hun jê hatine baş dizanim, li gor min tiştên ku we bi zindîtî xistina bin axê, zêdetir we dixine rewşên xirabtir hene. Ez we li ser vê bingehê dikişînime tekoşînê.

Hun dikarin bibêjin, li gor Kemalîzmê û Ewrûpayê mafên mirovan pêşketiye, lê belê Ewrûpa û Kemalîzm tunekirina we ya netewî ye. Hun nikarin van tiştan bi min bidine daqurtandin. Hun nikarin li hemberî emperyalîzma ku tune dike, her cureyê dagirkerî û nokeriya wê behsa tiştên mirovî bikin. Gelek hevalên me bi qalibên wan nirxandinan dikin. Ez vê yekê gelekî xeter dibînim. Em nikarin bi qalibên wan mafên mirovan binirxînin. Bi biryar dijberbûna emperyalîzmê, dijberbûna dagirkeriyê û dîsa li dûr sekinandina ji jiyana nokeran a xemilandî ya herî rast e. Ger hun van bipejirînin, di heman demê de tiştê ku serdestiya zilam li ser jinê ferz dike fêm bikin, biryar û îradeya we bihêz be, ev yek tê wateya ku hun ji bo me rêhevalên birûmet in. Li ser vê bingehê jinûve qezenckirin, hembêzkirin û hezkirin nêzîkbûneke baş e. Li ser vê bingehê qezenckirinê ve dê jinûve hezkirin, gihiştin, feraset, rêhevalbûn, civakbûn, siyasîbûn û rêxistinbûn bi pêş bikeve. Ev tê wateya jiyana Kurd. An jî gelek bi şoreşê ve vejiyaye. Ez vê bawer dikim û bi hemû hêza xwe ve di bin fermana vê dozê de me. Min ev doz him afirand him diherikînim. Kesên ku dikevine bin fermana vê dozê jî pêwîste balê li vê bikîşîne û bibe rêhevalê vê yê bijarte.

Sedemên vê yên objektîf û subjektîf hene ku ez vê ev qasî vedibêjim. Ez hêvî dikim ku hun rasteqîntir û kûrtir nêz bibin. Em hebin jî, nebin jî hun bibine şopgerekî nêzîkbûnên rast. Em bawerin ku me tiştên kêm nekirine. Ji bo rizgariya we jî kêm xebat nehatine kirin. Me baş bişopînin, dibe ku di

hindek kêmasiyên me de, di hindek nêzîkbûnan de zêdebûnî hebe, lê belê van zêde mezin nekin, ji ber ku cewher girîng e. Cewher tê wateya ku hun bibin xwedî jîneke bi şêweyê ku rûmetê dide, di mercên wekhev û azad de bibin xwedî jiyaneke bişeref û birûmet. Di bin fermana vê de bin, bibin milîtanên serdestkirina vî tiştî û ji bo vê bibin milîtanên mêrxas ên ji bo bîrdozî, siyasî û leşkerî şer dikin. Her tiştekî ku ji bo vî şerî dibe asteng, bi erdê ve bikin yek. Her tiştekî ku şer pîroz dike û ber bi serkeftinê ve dibe, bibin rêhevalên wan ên zexm.

Vê nirxandina ku ez dikim, ji bo bîranîna rêhevalên jin ên şehîd ku pêwîste em bîranînên wan bikin parçeyekî jiyana xwe ya jêneger Mizgîn, Rosa û Bêrîvan diyar dikim. Emê bîranînên wan her dem pîroz bikin û cihê ku misoger wan dixwastin bigihênê emê bi gihandina wir ve bersivê bidin. Em, şehîdên mezin ên radestnebûnê çi qasî bi bîrbînin ew qasî kêm e.

**Sermawez 1992**

# DAHURANDINA JIN Û MALBATÊ AHURANDINA JIYANÊ YE

Avabûna PKK'ê çareserkirina rastiya civakî û netewî di Kurdistan'ê de ya ku bi şer ve ye. Di vê çareseriyê de giranîdayîna yek ji hêmanên herî diyar pirsgirêka jin û malbatê ye. Girêdana wê bi jinê û şoreşê ve çêkirin û veguhertina rastiya jiyaneke ku mirov dikare bipejirîne ye.

Em dema ku bi qasî bingehê wê yê objektîf aliyê wê yê zanebûn û rêxistinî jî dibînin û bi vî rengî şoreşê bi pêş dixînin. Em dizanin ku zelalbûna pêwîst û hêza çareseriyê ya ji bo pirsgirêkê neyê nîşandan em nikarin pêşketinê pêk bînin. Heta mirov dikare bibêje di rastiya me ya civakî û netewî de û ew nirxên ku ji dîroka şaristaniyê hatine wendakirin di rastiya kesayet de bûne girêka kor, qezencên mirovahiyê ne. Ew neçarbûna li hemberî her cure mercên jiyanê ku bingehê vê wendakirinê ava dike binketina di her astê de dibe taybetmendiya jiyanê ya herî berçav.

Rastiya me ya herî bingehîn ku paşverûtiya me ya îro dipeyitîne çawaniya kesayetên me ne ku ev aliyê wê xwe dide der. Di vê wateyê de ew rastiya me ya neçariyê ku bûye girêkeke kor şoreş dixwaze vê yekê biguherîne, ne qederek e, ne jî bi taybet rengê wê yê çewisandinê û dagirkeriyê ku giran tê sedem nayê nîşandan. Mirov nikare bi vî rengî bibêje ku ji bo gavavêtin û rizgariyê sedem nînin. Berovajî pêwîst e ji her alî ve were şerkirin. Dibe ku ev taybetmendiyeke me ye, bi rastiya gelekî û tu welatekî ve nayê qiyaskirin. Ew qas e ku pêwîste her roj, her saet tekoşîn were dayîn. Şoreşa me pêwîste li ser vê bingehê were pêşxistin.

Bêguman di şoreşa Kurdistan'ê de gelek pirsgirêkên bingehîn derketine rastê, li gel vê mînakên din ên kesayet, malbat, eşîret, qebîle, ol û çandê zêde derfet nedîtina ji bo siyasîbûnê astekî gelekî paşketî ve di leşkeriyê de zelal bûye. Aliyê vê yê sedem-encam, nakokî-têkîlî di navbera van hemûyan de di nava agirê şoreşê de hîn zêdetir tê fêmkirin.

Bandora fetisandinê ya jiyanê di Kurdistan’ê de herî zêde xwe di malbatê de û hêmanên wê yên herî zêde hatiye dîlgirtin, di jinê de dide nîşandan. Dema rastiya jinê tê bidestgirtin ketina wê ya rewşa teng dîsa giranî nedayîna aliyê cewherî, giranî dayîna aliyê talî wê ji bo nêzîkbûn û helwestên xelet re rê vebike. Pêwîste mirov hetanî dawiyê ji vê dûr bisekine û rastiyê bi rengekî pêşçav û cewherî bigre dest. Ev yek gelekî girîng e.

Kapîtala Marks bi dahurandina metayê ve hatiye nivîsîn, dema taybetmendiya jinê ya malbûna malan mirov tîne pêş çavan û di rastiya me de jî ev ku hîn zêdetir wiha ye, derdikeve holê jin bi dijwarî pêwîstiya xwe bi dahurandinê heye. Wateya dahurandina jinê û ew malbata ku tê de rengê xwe girtiye, di cihekî de wateya dahûrandina jiyanê ye. Tê wateya bi qasî qada siyasî û leşkerî ya jiyanê, qada çandî û aborî jî dîsa bi qasî dîrokî di çûyîna ser pêşeroja wê de ji aliyê rastiyan de xelekeke bingehîn e.

Mirov li kû derê lê temaşe bike bila bike û bi kîjan rastiyan ve nêzîk dibin bila bibin, derxistina rastê ya pirsgirêka jinê çi qasî girîng e, nêzîkbûnên seqet û xelet ji bo vê pirsgirêkê ew qasî dê binketinê bîne. Tişta herî xirab jî sergirtina pirsgirêkê nêdîtina pirsgirêkê dê rê li ber encamên kêm vebike. Hela ew pêvajoya ku di şoreşê de tê jiyîn, dê bihêle ku ew dê di rewşeke gelekî kêm de were hiştin. Ger em dixwazin şoreşê bikin xwedî naverokeke dewlemend û ger em dixwazin ber bi encama azadiyê ve bibin pêwîste em di vir de li ser jinê berfireh bisekinin, bi qasî ku em koletiya wê bibînin, ew qasî jî di riya diçe azadiya wê de çi rave dike pêwîste em nîşan bidin. Hîn ji wê wêdetir pêwîste em jinê rabikin çalakiyan û di rewşeke ku em jê re dibêjin pêkanîna azadiyê de bihêlin, bidin şerkirin û bidine jiyîn. Pêkanîna vê tê wateya bersivdayîna pêwîst a ji bo aliyê civakî ya herî bingehîn a şoreşê, heta dawî pêkanîna şoreşê, kûrkirina wê û her biçe wê di çareseriya gelek pirsgirêkên din de ristê xwe bilêyîze. Ev ji her demê zêdetir derdikeve holê. Di şoreşa ku PKK jê re rêbertiyê dike de jî em ji her demê baştir dibînin ku ber bi pêşketineke wiha ve gavan diavêje.

Di hewldanên me yên rizgariya jinê de ku tevlîbûneke berfireh dê çêbibe û di nêvenga şer de wê rastî hîn rasteqîntir derbikevine holê. Ev di pêş çavan

re tê derbaskirin û hun ber bi xebateke Kongreyê ve diçin. Bêguman xebatên bi vî rengî xwedî wateyeke lûtke de ne. Tiştê pêwîste were kirin bi qasî nêzîkbûna hizir û teorîk a herî pêşketî mirov bikaribe helwesta pratîkî ya nêzîkî azadiyê bigre. Ji bo vê bi qasî bilindbûna asta nîqaşê mirov bikaribe derfetên jiyanê bide helwestên bi tenduristî jî. Ger kongreyek di vê wateyê de tiştê pêwîst bike tê wateya ku ristê xwe bi layiqî aniye cih. Diyare tenê pirsgirêkên jinê ku di binkeya partiya me de kûr dibin re bi çareseriyeke teng ve xwe besdîtin nayê kirin. Ji vê zêdetir ji bo pirsgirêkên malbatê ku her diçe giran dibe re jî ji bo bersivên rojane were dayîn nêzîkbûn çêdibin. Li gel van bi qasî astên dîrokî yên vî karî ji bo pirsgirêkên jiyaneke saxlem a pêşerojê jî bersivên berfireh tên gerîn. Di şoreşa Kurdistan'ê de ku rêbertiya wê PKK dike, ger kongreyeke jinê ya şoreşger ku xwe şênber bike, dê ji bo asta me ya heyî jî bersiva pêwîst bide. Ger bi qasî rastiya teorîk a PKK'ê rastiya şerê wê jî di şerê jinê de were nîşandan, ji bo kongreyeke encax ewqasî berfireh nirxandinek li ser roja me, dê ew qasî pêşerojê jî binirxîne, bi qasî nirxandina paşerojê dê roja me jî şîrove bike. Bi qasî dahurandinan armanca û erkan jî diyar dike, vê vediguherîne rengên çalakî û rêxistinê, ji bo vê nîqaş dike û biryaran digre. Ger em şerê me yê di her astê de û şerê di vê qadê de bigihînin helwestekê ku van bi çalakiyê re digihîne hev û em bigihên Rêbertiyeke wê, tiştên pêwîst were kirin.

Dema ku em li dîroka PKK'ê temaşe dikin asta pêşketina teorîk, bîrdozî û siyasî ku ji bo şoreşa Kurdistan'ê hatiye pêkanîn bi asta tekoşîna pratîk û şer ku ew qasî tevlîhev e ve girêdayî tê nirxandin. Bi hev re bûna teorî û pratîkê encax bi layiqî partiyeke wiha şoreşger pêşketinekê nîşan dide. Ew bi hev re bûna tekoşîna teorîk û pratîk di kîjan pirsgirêkê de were nîşandan, dê bihêle ku pirsgirêk wê saxlem danîna holê çêbibe û derfetê çûyîna çareseriyê bide. Di pirsgirêka jin û rizgariya malbatê de ev yek hîna diyarkertir wisa ye. Di partiya me de bi şêweyeke ku nabe nasîbê partiyeke din jin û malbat weke teorîk tê bidestgirtin û dahurandin. Li ser riyên rizgariyên ku çêbibin û şêweyên wê tê rawestandin. Bêyî ku ketina rewşa xwe ya têrdîtînê çêbibe, bi rengekî berfireh jin ji bo nava refan bi xortayî tê

kişandin û li her astê şer belav dibe. Him di zelalkirina pirsgirêkê de, him jî jin bi xwe bersivedayîna wê ya çareseriyê ji ber wê jî ji bo rêbaza herî rast were girtin ziraviyek tê raberkirin.

Tenê ne di Rojhilat a Navîn de di hêzên rêber ên gelek welatên din ên hemdem de ji bo vê pirsgirêkê gotina ku bi hêza teorîk bi plan û bi şer nêzîkbûnek çê dibe zehmet e. PKK'ê hindekî ev yek bi ser xistiye. Herî kêm nêzîkbûnên ku xwedî naveroka siyasî û civakî yên bingehîn a şoreşa Kurdistan'ê de pêşketinên di derbarê gelek aliyên şoreşê de xwe dide nîşandan û bi rengekî ku balan dikişîne hîn ji niha ve di asta netewî û navnetewî de ku bandora xwe nîşan daye, zelal nîşan dide ku li vê pirsgirêkê nêzîkbûneke rast çêdibe û bingehên afirander a taybet hatiye girtin.

Çawa ku her rojeke derbas dibe pêwîstiya têgihiştin û derxistina zanînê ya PKK'ê bi hemû aliyan ve û rastiya serokatiyê em hîs dikin helwesteke ku dişibe wê jî ne tenê di pirsgirêka jin û malbatê de, di pirsgirêka ku rûyê wê yê din e, bi hev re di nava têkîlî û nakokiyê de ya zilam de jî pêwîste daynine holê. Bi qasî ku teorîk e, di derbarê gelo çawa xwe di jiyanê de nîşan dide, aliyê wê yê derûnî nîşandan jî girîng e. Ev pirsgirêk ku tunekirina netewî û xerîbûna civakî ye, gelekî bi kûrahî tê bidestgirtin. Di vir de şûna ku bibe çavkaniya jiyanekî hatiye înkarkirin, taybetmendiyên wê yên ku dibe bela serê wê tê dîtin çareseriya têkîlî û nakokiyên wan tên pêkanîn. Tenê weke nirxandineke siyasî namîne, ji bo çareseriya wê jî hîn zêdetir hewldan tê nîşandan. Bi taybetî tiştên ku dîroka gelek welatan de bi wêjeyê têne kirin, bi hunerê tenê pêşxistin ango mijareke jiyanê li gel me pêwîstî heye ku bi şer ve di nava hev de were destgirtin, em vê weke helwesteke bingehîn datînine holê. Çareseriyên welatên din ji ber sedemên cihê yên tên zanîn ku bi sedan salin ji bo pirsgirêkên jin û malbatê û ji bo pirsgirêkên xwe yên civakî yên din bi wêjeya şoreşgerî ve danîne, em di nava xebatên rêxistinî, siyasî û leşkerî de dixwazin pêk bînin. Di nava hev de weke hêmaneke ku wê bandor dike û jê bandor dibe em bi dest digrin, di asta komkujî û dagirkirina ku îro dagirkerî pêk tîne ve girêdayî ye. Weke encameke vî tiştî li gel her cure karê şoreşgerî neçar dihelê ku di kêliyê de

were bidestgirtin û çareserkirin. Mercên ku em dijîn nîşan dide ku em nikarin zêde bingeh û dem daynin navbera wan û ber bi çareseriyê ve biçin.

Rastiya me ya dîrokî civakî û siyasî asta tunekirina netewî û dagirkerî derfetên ku welatên din bi sedan sal in bi hunerê dike neda me. Li gel şoreşê ji bo pirsgirêkê çareserî dîtinê ferz dike. Ji ber wê jî çareserkirina girêka kor a civakî di pirsgirêka jin û malbatê, di nava agirê şoreşê de gengaz dibe. Ev yek jî weke taybetmendiya herî bingehîn a şoreşa me derdikeve pêş. Ev dibe encameke yekser a qutkirina ji dîrokê û qutkirina girêdaniya bi serdemê ve. Partiya me jî girêdayî vê rastiyê pêwîstiya pirsgirêk wiha danîna holê û çûyîna çareseriyê li ser vê bingehê hîs dike û vî tiştî dike.

Piştî ku me bi xetên stûr rêbaz diyar kir, di dîtina pêşketinên ku qadên teorîk û pratîk de jî feyde heye. Pêwîste neyê jibîrkirin tu pirsgirêkên civakî negihê nêrîneke teorîk a saxlem nikare bigihê gaveke pratîk a saxlem. Di Kurdistan’ê de zanebûna gel hema di her astekê de heta dawiyê hatiye reşkirin. Ji wê zêdetir nasnameya wê di astekî girîng de ji holê hatiye rakirin. Wendakirina hemû astên netewî û civakî hîn zêdetir erk datîne ser milên teoriyê. Ji ber ku rastî hem di asta zanebûnê de hem jî madeya ku zanebûn xwe dispêrê de hatiye texrîbkirin. Asta texrîbê çi qasî pêş de çûbe, çûyîna ser teoriyê jî ew qasî pêwîst dibe. Girîngiya nêzîkbûneke wiha ya PKK’ê ya ji bo teoriyê ji ber sedemên rastiyên xwe niha hîna baştir tê fêmkirin. Demeke dirêj karên teorîk û xebatên bîrdozî, polîtîk bi rengekî ku asta xetî de bi israr meşandina wê ji ber sedemên ku rastiya me naşibe tu rastiyên civakî û netewî yên din in.

Sedemên ji bo pirsgirêka rizgariya jinê û malbatê ku em nêzîkbûneke teorîk, bîrdozî û siyasî ya bilind nîşan didin jî ji ber vê yekê ye. Ev tişt jî pêwîst dike ku em hîn zêdetir hêza têgihiştinê bi pêş bixînin. Ew wendakirina giştî û fetisandina di tarîtîyê de di vê qadê de hîn berfirehtir tê jiyîn. Ji ber wê jî ger tê xwestin ev pirsgirêk were ronahîkirin û tê xwestin ber bi çareseriyê ve çûyîn çêbibe, bi qasî pêşxistina gavên pratîkî yên birêgez û bilindkirina hêza têgîhiştinê bi vî rengî di nava hev de bi dest girtin, weke erkeke şoreşê pêwîste were biserxistin û ev qada jî pêwîste

wiha were bidestgirtin. Ji ber vê sedemê ne hewceye ku em li pratîkên welatên din binêrin bibêjin “ji bo çi di wan de wiha nîne, li gel me wisa ye?” û bikevine nava ferasetên şaş. Mercên ku îro hene ferasetê ferz dike û rêgezê bi rê ve dibe. Tiştê ku tê kirin jî ev e.

## Em şoreşa civakî ji bo bikaribin hez bikin û bigihên jiyana pîroz pêktînin

Ji dîroka şaristaniyê pê ve pêşketina civaka çînî civakîbûn û netewîbûn ji koletiyê heta roja me heta rengirtinên civakê yên cihê her yek ji eşîret û civatên gelan bi rengên cuda pêk hatine. Carna bi aştî, carna bi şer, carna bi rêbazên çandî û aborî, carna bi rêbazên siyasî hiştiye ku hindek erênî bi pêş bikevin û hindek jî tune bibin. Ji bo hindekan jî rê vekiriye ku di asta navîn de bi pêş bikeve û ji ber sedemên hundirû û derve pêşketinên civakî û netewî di Kurdistan’ê de gelekî lewaz maye. Encameke bi vî rengî derxistiye holê. Mirov dikare bibêje welatê me ji bo cara yekem derketina koletiyê ji civaka mirovan re dergûşî ango navendî kiriye. Hemû pêvajoyên şaristaniyê bi rengên gelekî neyînî, bi rengê dagirkirin, zordarî û talankirinê xwe dide nîşandan. Ev yek jî ji bo reva çiyan û di asta malbat û qebîleyên hov de were jiyîn rê vedike. Şaristanî di Kurdistan’ê de ne bi aliyên erênî hîn zêdetir bi aliyê dagirkirin û talanê cih digre. Ji ber wê jî ger tê xwestin di nasnameyeke ku em bikaribin jê re bibêjin Kurdîtî hebûn were domandin pêwîste mirov xwe bispêre çiyan. Ev yek jî her dem ji bo gelek deman tenê bi rengekî li ser piyan mayinê derdixe pêşberî me.

Malbat asta eşîret û qebîleyan jî di cihekî de pêvajoyeke hov a pêşketina civakî temsîl dike ango rengê civakê yê bingehîn a serdema komûnal a hov rave dike. Asta netewî û civakî paşketî ye. Hela siyasîbûn hîn jî paşketiye. Astên din ên aborî û civakî qat bi qat paşketîbûneke giran dijî.

Dema ku rengirtina jin, zilam û malbatên li gel me mirov bîne pêş çavan balkişandina vê taybetmendiya dîrokî girîng e. Bi qasî ku mirov bibîne ka pêşketina şaristanî ji bo her welatî û ji bo her gelî çi rave dike, ger bi rengê

anîna gel hev ve were bidestgirtin dê çawaniya vê rengirtinê hîn zelaltir were fêmkirin. Di heman demê de ev yek dê me bibe pergala me ya têkîliyan a gelekî têkîlhev û rastiya me ya civakî ku ketiye rewşa kaosê dê hîna rastir fêm bikin. Ew jina ku bi tenê tê xwestin bi kevneşopiyan were rizgarkirin û di riya wê de tekoşîneke ku bi rengekî xirab paş dixe tê dayîn, malbata ku derûdora wê tê avakirin û ew feraseta qaşo namûs û exlaq ku li ser wê tê bilindkirin dibe ku berovajî vediguhere taybetmendiyeke ku herî zêde xizmeta dijmin dike û wan tune dike.

Me gelek zelal derxiste holê ku ew helwesta exlaqî ya bingehîn li derûdora jin û malbatê ku dikevine navê û bi rengekî heta dawiyê kevneşop û hişk tê avakirin. Raveya wê ya herî berbiçav jî ew binkeyên namûs, rûmet û kesayetê di rastiyê de bêyî ku bikeve zanebûna wê dijberê xwe diafrîne. Bi gotineke din ve namûs dibe navê bênamûsiyê, rûmet ê bêrûmetiyê, kesayet jî dibe rûpoşê bêkesayetiyê. Her çi qasî bi êş be jî di rastiya me ya civakî de ev yek wisa ye. Dema hate xwestin hîn baştir û kûrtir were dahurandin dê were dîtin ku tiştên ku li hember dîrokê û di roja me de li hemberî dijmin ber bi her cureyê binketinê ve dibe di encamê vê yê xwezayî de me dibe şertên jiyaneke hîn paşketîtir û nayê qebûlkirin. Ew wateyên ku em didin van têgehên di riya wan de her tiştî feda dikin û encamê helwestên ku têne girtininin. Rastiya Rêbertiyê di PKK’ê de ji dayîkbûna xwe heta roja me vî tiştî bi rengekî balkêş dibîne, bi dahurandinên berfireh ve nasnameya civaka nû û netewî dide, li hemberî rastiya dijmin ku dorpêç kiriye dîsa li hemberî aliyên nokerên kevneşop û feodalên girtî ku xizmetê wê dike, weke şerekî ku tekoşînê dide tê bidestgirtin. Bi vî rengî ew helwesta ku em jê re dibêjin azadî dê were çi wateyê derdikeve holê. Ji ber wê jî civak gelekî tund tê rexnekirin. Ew feraseta têkîliyan ku rewa tê pejirandin tê rexnekirin û lêpirsîn. Ev lêpirsîn hetanî kesayet tê daxistin. Asta azadiyê xwe nîşandana vê ji bo exlaq û şêweyên cihê yên çandî ya herî girîng jî cihê vê di rastiya şer de tê danîn. Girêdaniyên berê çi qasî ristekî asteng dilêyîze û şermê ava dike derdikeve holê. Di vir de her tişt serûbin dibe. Berî vê yê ku rewa hatiye pejirandin ne rewabûna wê yê birûmet hatiye hesibandin, bêrûmetiya

wê yê jê hatiye şermkirin neşermbûna wê tiştên ku pêşketin hatiye gotin nepêşketina wê tê zelalkirin. Serûbinbûneke wisa tê jiyîn. Vejîneke jinûve ya li ser lingên xwe dibe mijara gotinê. Ev xwe dide hîskirin û nîqaşên di nava PKK'ê de wê jiyana nû pêwîste çawa bibe derdixe holê. Pirsgirêk bi rengekî gelekî zelal û berfireh tê hîskirin. Tiştê ku di dîrokê de hatiye wendakirin, dubare anîna wê ya rojeva dîrokê wiha çêdibe. Her pirsgirêk çawa ku despêkê dibe rojev û li bersiva xwe digere rojevkirina bersiveke wiha ya partiya me jî mijara gotinê ye. Pirsgirêk baş li holê hatiye danîn. Mirov dikare vê yekê hîna berfirehtir bike. Lê belê pirsgirêk bi aliyê xwe yê çareseriyê û bersivên hîn girantir ve dikeve rojevê.

Em tenê xwe bi rexnekirin û tawanbarkirina ya kevin ve têr nabînin. Tiştên nû û tiştên pêwîste em biafirînin çî ye, di têgihiştinê de û di pêkanînê de emê çawa nêzîk bibin jî derdixînine holê. Pêwîste neyê jibîrkirin ji bo biryarên rast werin dayîn û gihiştina helwesta rast çêbibe, kesayetên serbixwe pêwîst in. Ew kesayetên ku ji hemû aliyan ve girêdayî ne, di hest de, hizir de û helwest de kesên ku wiha ne gihiştina wan a biryarên azad û rengên jiyanê ku ji vî tiştî çavkaniya xwe digre zehmet e. Yan jî bigihên jî ev jiyan gelekî tevlîhev e. Pêşketineke herî pîroz ku partiya me de hatiye pêşxistin jî di nêzîkbûnên jin û zilam de helwesta serbixwe bi jîrbûneke mezin, sebir û hewldanê ve hatiye pêkanîn. Çareseriya ku di nêvenga PKK'ê de em gihiştinê yan jî bersiva ji bo pirsgirêkê hatiye dayîn di rastiyê de pêkanîna jin û zilamê serbixwe ye.

Dema em rexneyên di hundirê partiyê de tînine ber çavên xwe dê were dîtin ku êşên herî zêde têne kişandin ew xwesteka şêweyên têkîliya yên heyî feraseta malbat û qebîleyê bi mirinî anîna nava me ye. Partî di vê mijarê de bi tekoşîneke birêgez û mirinî ji bo vê bersivê dide. Ji ber ku partî datîne holê ku ev nêzîkbûn asta netewî û civakî lewaz dihêle herî kêm bi qasî komkujiya dijmin civakê tevlîhev dike. Ji ber wê jî şerê li hemberî wê şerekî bîrdozî û siyasî ye. Di encamê de her kesekî ku dixwaze PKK'yî be nêzîkî rastiya şer bibe, bigihê kesayeta serbixwe bi taybet dixwaze ji koletiya ku li jinê tê ferzkirin jê rizgar bibe û ew pergala têkîliyan ku li dijberî jinê ne

derbas bike, pêwîste ji serî hetanî neynokê serbixwe be. Bibe xwedî helwestên azad, bibe xwedî vîn û hizrê azad. Wiha ye ku helwestên wan jî dê bibe raveya azadiyê. Em dema asta azadiyê ya partiyê bi pêkanîna vê rêgezê ve girê didin, pêwîste mirov vê yekê di civakê de jî belav bike. Ev bersiveke gelekî mezin e. Asta pêşketinê ya PKK'ê dibe ku ji hemû aliyan ve derneketiye holê. Lê belê pêwîstiya têgihiştinê heye. Di serî de rizgariya civakê di nava PKK'ê de digihê bersiveke wiha. Mirov dikare bibêje ger ew bersiv bi rengekî bibiryar di civakê de were nîşandan şoreşekî gelekî xwedî bingeh hê ji niha ve digihê hêmaneke saxlem.

Bêguman çareseriya di partiya me de em gihiştinê him teorîk e, him jî bi rengê ev qas hêjmareke kadro ku mirov nikare biçûk bibîne hêza wan a hizirandina serbixwe û biryardayînê derdikeve holê. Em her dem tînin ziman dema ku ji bo têkîliya jin û zilam rengê wê yê berê rexneyên hişk têne kirin û nepejrandina wan tê nîşandan, li şûna vê ji bo têkîliya azad nêvenga wê û rengê wê ev qasî zelalkirin ji bo helwesta bi vî rengî azadbûyînê nêvengeke guncaw pêşkeşkirin dibe pêşketineke herî mezin. Dibe ku rewşeke gelek kes fêm nakin û pîroziya wê teqdîr nakin, îro di xebatên jinê de weke pêşketineke gelekî girîng nirxandin, vê astê hîn dewlementir kirin, erkê herî bingehîn a xebatên jinê ye. Ji ber wê jî kongreyeke jinê pêşketineke herî girîng ku di vê mijarê de hatiye pêkanîn e. Ji bo xwe kirina mijara nîqaşê ya bingehîn, li ser bingehê vê nîqaşê ji bo xwe erk diyarkirin hîn pêşçavtir yekirina jiyanê riya herî saxleme ku mirov bikeve tê de. Bêguman ger ev hêman her dem were şopandin mirov destên xwe biavêje kîjan têkîliyê dê bigihê encamên bitenduristî.

Girêdaniya vê bi rastiya şer ve baş derketiye holê. Wateya bûyîna xwediyê helwesta azad a bi vî rengî di nava jiyana şer a balkêş de cihê xwe diyarkirin, dîsa di nava avahiya rêxistinê de cihê xwe girtin û bûyîna xwediyê xebateke siyasî ya bihêz e. Ger tê xwestin asta azadiyê di têkîliyan de were avakirin û tê xwestin veguhere şêweyeke jiyanê pêwîste baş were şerkirin, baş siyasîbûn çêbibe û ji bo wê jî pêwîste rêxistinbûn baş were pêkanîn. Ji ber wê jî em bi ziravî diyar dikin ku kesayetên gelekî baş rêxistî

nebûye, li ser vî bingehî siyasî û leşkerî nebûye nikare azad bibe. Ger tiştê mijara gotinê rastiya Kurdistan'ê be, rêxistina ku ji vê re rêbertiyê dike PKK be, em li asta rêxistinbûna ew kesên ku dixwazin bibiryar bin û bibêjin, "ez azad im, xwedî biryara azad im" temaşe bikin. Emê ji bo rêxistinbûnê li perwerdeyê, ji bo siyasîbûnê şûna astekî berfireh kûranî girêdaniya siyasîbûnê bi şer ve, çi qasî tevlî dibe û çi qasî şensê pêşketinê dide, temaşe bikin ku em bizanibin ka pileyên wan helwestan ên azadiyê çi qas e? Misoger têkîliyên wan bi hev re gelek in. Qutbûna di qadekê de dê rê vebike ku qadên din jî ji dest biçin. Ji bo vê yekê jî pêwîste mirov bi sîstem bigre dest, bi qasî tê dîtin di heman demê de ew bi xwe re disîplîneke tund jî tîne.

Azadî weke ku gelek bawer dikin, lîberalîzmeke ne cidî û kevin nîne. Azadiya li gel me helwesta azadiyê ya çînê herî kedkar e. Lê belê ew jî bi tenê bi disîplîneke ji dil a bihêz ve dê were pêkanîn. Bi rêxistinbûn, siyasîbûn û leşkerîbûn di rastiya Kurdistan'ê de û di rastiya wê ya şer de jiyaneke di asta herî jor de bi disîplînbûnê, ji bo rêgez li ser bingeha xetê ku gelekî tund girêdaniyê hemû jiyana xwe fedayî vê yekê kiriye û hewldanên vê yên herî serkeftî pêwîst dike. Ji ber wê jî ger jin dibe, ger zilam dibe yê ku nekeve rêxistinbûneke di asta bilind de hewldanên wê siyasîbûnê û leşkerîbûnê nede yê ku bi girîngiya kedê me ve û pêwîstiya bi cîhaniya wan ve neyê girêdan, milîtaneke ku xwe dixapîne ye. Pêwîste mirov zêde bi kesayetan ewle nebe. Ger em bizanibin bi biryarî, bi asta rêxistinbûyînê ve bi hewldanên berfireh ên di hemû qadan de bi taybet girêdaniya wê ya bi rastiya şer ve ew jî tenê bi axaftinê na, pêwîste li pratîkê nêrînê ve wekhev tê dîtin. Ger em pêwîstiya vê pîvanê pêşçavgirtinê her dem bizanibin emê bigihên helwesta azadiyê ya zexm.

Hevala Gulnaz Karataş (Bêrîtan) ku di şerê Başûr de şehîd ketibû, ji aliyê azadiyê ve xwedî hewldaneke mezin bû. Raporeke ku wê hevalê ji min re şandiye hebû, min hîn nebihîstibû ku şehîd bûye û her dem ev heval di bîra min de bû. Digot, "ez dixwazim ji dahurandinên Rêbertiyê sudê werbigrim û ceribandina romanekê bikim." Li gel me hetanî niha kesekî gotineke wiha negotibû. Hevaleke gelekî pêwendîdar bû. Min digot, ger min ev hevala

bidîta û nîqaş bikira dê baş bibaya. Piştre xebera şehadeta wê hat. Keçikeke gelekî qehreman bû. Di asta rêbera taximê tevlî çalakiya qereqola Rûbarok bûye û di vê çalakiyê de birîndar bûye. Tevî ku birîndare jî di eniya şerê Başûr de li herî pêştir helwest girtiye, di wir de jî hetanî ku guleyên wê qediyane di sengerê de maye. Piştre hêzên xayîn û noker derûdora wê dorpêç kirine û gotine "radest bibe, em tiştekî bi te nakin" lê belê helwesta vê hevalê gotina, "we bi dijmin re hevkarî kir, hun ji Başûr êrîşê Bakûr dikin, hun xayin in ez radestî we nabim" bûye. Bi navê Rêbertiya Partiyê jî di asta diruşmê de qêriyaye û xwe ji kendalê ve avêtiye.

Ev çalakiyeke watedar û gelekî wêrek e. Di rastiyê de weke teorîk gelekî bihêz e. Tenê ji welatparêziyê û berxwedaniyê bingehê xwe nagre, di heman demê de keseke ku dixwaze dahurandinan jî bi kûranî fêm bike. Ji ber ku dixwaze asta wan hîn zêdetir bike. Ev rewş tê wateya ku ji vê rêhevalê dê dahurînêreke baş derbikeve. Kesayetên ku di têgîhiştinê de xwedî biryar in û ji bo vê her cureyê berxwedêriya qehremaniyê pêk bînin jê derdikevin û pêwîste mirov rûmetê bide vî tiştî. Pêwîste mirov bersiveke baş bide bîranîna vê hevalê. Ev kesayet û helwest wisa ye ku mirov ji rêzgirtinê zêdetir nikare tiştekî din bike.

Li ser vê şehadetê heval dibêjin, "em bi bîranîna vê hevalê ve girêdayî ne, emê navê wê bidine tabûrê." Pirsgirêk bi navê wê dayîna tabûrê ve û çawa berxwe daye bi vegotina wê ve nayê çareserkirin. Pirsgirêk helwesta ku ew dişopîne dayîna jiyîn e. Jixwe yê ku van encaman derbixe holê jî ev helwest bi xwe ye. Em wê bingeh digrin. Ev hindekî dibe mînak an jî modelê ku hevalê em dixwazin pêş bikevin e.

Ev hevalê ku di pêşketinê de bibiryar e, di rastiyê de bi gelek çewtbûnan re jî rû bi rû maye û dibe ku şaşitî jî kiribin. Lê belê her diçe di xeta rast de kûr dibe û dikare biçe encameke gelekî bibandor jî. Tiştê ku ez dixwazim diyar bikim ev e. Ger em rê vekirî bihêlin dê kesên mêrxas hetanî qehreman derbikevin. Ji ber ku ji berî vê di vê qadê de dihate gotin, "jin gelekî giraniyê çêdike, em çi ji van bikin?" min ev yek got, "yê ku we re got giranî ye, berovajî ye. Jin di rastiyê de hêzeke mezin a fedayî ye. Hatina wan

hevalan a wan deran weke ku di gelekan de hatiye dîtin, li gel feraseta xwe fedakirinê wêrekiyê jî rave dike.” Hun vê yekê nanirxînin. Bi nêzîkbûnên feodaliyê ya gelekî paşketî û ya pergalê ve nêzîk dibin. Ev nêzîkbûneke ne rasteqîn e. Dibe ku hêza we têr neke, dibe ku nêzîkbûnên rast pêşkeşkirin jî zehmet be, lê belê feraseta min jî ev e. Ji ber ku rastbûna vê ferasetê derkete holê. Piştre gelekan gotin, “hemûyan di sengerê de berxwe dane, qet nerevîne, tu caran weke ku me bawer dikir nebû. Ev yek di şerê paşê de derketê rastê.” Ev jî wisa encamên zêde werin mezinkirin nînin. Her çi qasî asteke ku hindekî din were pejirandin hatiye girtin nîşan bide jî hatinên mezin ên rastiyê, dê piştî vê bibe mijara gotinê.

Ez hêvî dikim hewldanên me ku ji bo jinê em bi pêş dixin, him were fêmkirin û him jî mezin were nirxandin. Dibe ku em hindekî li ser we ferz bikin. Dibe ku jiyana bidisîplîn we teng bike, lê belê bedêleke azadiyê û pêşketinê heye. Bêyî ku mirov van bedêlan bide nagihê van tiştan. Dibe ku çareseriya erzan asta têkîliyan ku rihet bike û hînbûnên jiyana rojane we têr bike, lê belê tu caran nabe azadiyê. Ev yek jî kesayeteke lewaz derdixe holê. Em naxwazin xwe bi vê yekê têr bibînin. Ger em bixwazin dikarin we gelekî hêsan bi rê ve bibin. Hun fedayî ne, ji bo her cureyê şeran hene. Lê belê gengaze ku hun bi hêsanî werin bikaranîn, hindek dikarin vî tiştî bikin, lê belê ez dihizirim nêzîkbûneke wiha bêrûmet xeter e. Ji ber wê jî pêwîstiya kûrkirina bi we re karkirinê, ez helwesteke hîn rastir dibînim. Ji ber ku yên gelekî seranser çûne welat hêsan wenda dikin. Dema mirov vê yekê tîne pêş çavan me peyitand ku nêzîkbûnên me layiqê jiyandinê ne.

Em dixwazin we bikin xwedî helwesteke ku gihiştiye vîneke serbixwe, helwesta azadiyê û raveya wê bi hêsanî nakeve rewşên şaş, di gihiştina kesên ku em dixwazin biafirînin de hindekî bi biryar herî kêm di vê mijarê de bi sebir û rik. Ez dihizirim ku ev yek hîna baştir e. Bêguman pêşketinên pêvajoyên pêş de ku partiya me di azadiyê de bijî, têkîliya jin û zilam, têkîliya malbatê û xwe nîşandana van a di jiyana azad de gihiştina wê ya him zelalbûnê û him jî pratîkê dê bibe bûyereke ku ew bi xwe tê jiyîn. Ev jî bi hemû aliyan ve li gel tekoşînê û berfirehiya hewldanan ve dê çêbibe.

Pêwîste mirov kêliyekê jî piştçav neke ku bêyî were şerkirin em nikarin jiyana civakî ya herî di asta jêr de jî rizgar bikin. Asta me ya netewî û civakî ya heyî rastiya dijmin a ku ew afirandiye jiyana malbat, jin û zilam emê bi şer serûber bikin. Bi rengekî xayînî ketî, yê ku ji hêzê dixe û dibe binkeftinê na, emê bibin xwedî helwestekê li ser bingeheke azad dibe serkeftinê û yê nû. Ew rengên ku jiyanê hîna zêdetir watedar dike, bi tenê emê bi şer bigihênê.

Raveya vê ya din jî asta ferasetê ku di civaka me de gelekî hatiye texrîbkirin, pêşvexistina wê ye. Em tenê vê encamê dema ku me dît civaka me çi qasî li dijî hev e, mirov çawa weke stiriya bi hev re diçin, di nava malbatê de, di nêvenga her eşîret û qebîleyê de dîsa di navbera kesayetên cihê de çawa tevlîheviya têgehê û kaos didome bi taybet di bûyera rêzdarî û hezkirinê de lewazbûneke çawa em dijîn, wê demê dê baş were fêmkirin ku şerê em didin di cihekî de şerê hezkirin, rêzdarî û ferasetê ye. Ew riya ku di Kurdistan’ê de diçe hezkirin, rêzdarî û ferasetê jî pêwîste girêdayî rastiya şer, bi cihanîna hemû pêwîstiyên wê be. Ger hun dixwazin bigihên nêvengeke ku hîna zêdetir dikare hez bike, wê demê hunê bibin xwedî derfetên hîn zêdetir ên şerkirinê. Misoger bi qasî ku ev diyardeyeke rast e, bûyereke ku bi hewldanên rojane ve girêdayî ye. Bila tu kes bêyî ku şer bike, bêyî ku hewldanên vê yên pêwîst nîşan bide hezkirinê û rêzdariyê hêvî neke.

Xwenîşandaneke şoreşa Kurdistan’ê di kesayetê de yek jê jî ev e. Me ev yek serkeftî daniyê rastê. Tiştê ku dimîne pêwîstiya li ser vê bingehê rêxistineke baş derdikeve holê. Li gel derfetên vê dîsa weke ku gelekî tê xwestin derfetên leşkerbûnê jî diyar bûne. Piştgiriya nêvengên ku hene, ji bo leşkeriyê nikare biçûk bibîne. Ya herî girîng em ji bo hîn zêdetir werin hezkirin, rêz were girtin û bigihên jiyana pîroz ku aîdê mirovan e, şoreşê dikin. Ji bo têgehên ku di rastiya civak û netewa me de hatine wendakirin û ji bo me bi qasî nan û avê pêwîst e, ji bo ku ev yek xwe di jiyanê de bidin nîşandan, em neçarin şer bikin. Kê dibêje ku, di van mijaran de tiştên layiqê

wê ya bigihê, pêwîste şer bike. Him jî pêwîste bi serkeftî şer bike ku bigihê azadiyê. Cewherê diruşmên me jî ev e.

Bêguman ev mijar bi wêjeya şoreşgerî ve hîna baştir tê vegotin, bi şerê wêjeya şoreşgerî ve jî mirov dikare bigihê asta derûnî ya kesayetê, serûberkirina têkîliya jin û zilam, zelalkirina wê asta huner û şêweyê hunerê ku em jê re dibêjin xweşikirin. Ev yek tê wateya asta xweşikirinê yê şoreşê li ser huner zêde bikin. Riya wê jî bi girêdayî şerekî şoreşgerî ya wiha ve hatiye danîn.

Em nêzîkî Newrozê dibin, kongreya jinê ya netewî tê pêşxistin û 8 Adarê roja jinên kedkar ên cîhanê tê nirxandin. Bi vî rengî hatina çend rojên watedar ên li gel hev, pêwîst dike ku careke din li ser pirsgirêkê were rawestandin. Têkîliya di navbera zayendan de misoger di heman demê de têkîliya di navbera çînan de ye. Heta girêdaniya vê bi asta netewî ve jî heye. Xeyalê jiyana sexte zêde kêfxweşiyê nade. Jiyan xedar e. Rûmet û hezkirin bi hêsanî nayê qezenckirin. Hela evîn weke tê gotin tu caran hêsan nayê qezenckirin. Lê belê dîsa jî pêwîste em qîmetê bidin hev. Jinek ger bikaribe kesayeta xwe zelal, xwerû û çîrûskeke zeka bike bibe xwedî uslûbeke şêrîn, bi qasî wêrekiyê bizanibe hestiyar be, vê yekê li her qadên jiyanê serdest bike hêza nîqaş û çalakiyê nîşan bide, jineke wiha dikare were astekê ku dişibe xwedawendan. Hun dikarin li şûna ku xwe bispêrin hindekan bibin xwedî dewlemendiyekê û mezinbûnekê ku her kesek xwe bispêre we. Ez vê derfetê dibînim û pêwîste mirov bi vê kêfxweş bibe. Weke zayend şûna ku perçiqandin û lewazhatina dîtin, bûyîna xwediyê xaweniyê bi vî rengî gengaz e. Ev yek di heman demê de balkêşbûn e. Ma gelo tiştên şerm li ku dera vê yekê ye? Koletî û ji rêzêbûn li ku dera vê ye? Ev bi şerên mezin ve – ez tenê di wateya çors de behsa şer nakim- bi qasî hêza hizirandinê ya gelekî pîroz bi bûyîna xwedî hêza rêxistinî û çalakiyê ve jî girêdayî ye.

Me jî her dem xwest ku di vê çarçoveyê de bi we re pêwendiyê bi pêş bixin, ji ber wê jî em ji bo rastiya jiyana jinê ya giştî bi taybet jiyana jina Kurdistan'ê ku mirov nikare bipejirîne û pêwîst e were derbaskirin, em rêzdariya xwe wiha diyar dikin. Li gel ku tiştên me kirine ne kêm in, ev hîn

destpêka vî karî rave dike. Piştî vê emê xwe bispêrin ezmûnên xwe û hîn baştir tekoşînê bikin. Rojên pêş rojên ku mirov hîna zêdetir bipejirîne û biwêre bijî ne. Wê demê, dema ku hun diçin kongreya jinê bi qasî ku hun di van hêmanên bingehîn de zelal bûn pêwîst e em xwe rûbirûyê erkên zelal bikin û hewldanên wê kêm nekin. Ev yek gelekî girîng e. Ger weke partî em li ser vê bingehê baş têbigihên û tiştên pêwîst were bicihanîn, em dikarin ewlebin ku em di riyeke baş de ne.

Xebatên we yên kongrê ku li ser vê bingehê dimeşin em bawer in ku hunê serkeftinên girîng pêk bînin. Em ewle ne ku hemû heval tiştên li ser vê bingehê dikevin ser milên wan dê hîna zêdetir bi cih bînin. Em bawer dikin ew piştgiriyên ku di hemû qadên şer de wê pêşvetir bibe. Em hêvî dikin emê piştgiriya xwe bêkêmasî bi cih bînin, hun hemû jî di vê qadê de jî bibin xwedî serkeftinên bilind. Em pêşketina bilind û bi serkeftî bi dawîkirina wê silav dikin. Silav û hezkirinên xwe pêşkeş dikin.

-Bijî Kongreya Jinê ya Netewî Ya Kurdistan'ê!

-Bijî PKK'ya ku Jê Re Rêbertiyê Dike!

**5 Adar 1993**

## PKK ZEMÎNEKE TEKOŞÎNÊ YE KU TÊ DE AZADÎYA JINÊ HERÎ BAŞ WERE PÊKANÎN E

Dema ku tekoşîna me ya şoreşgerî rê li ber gelek pêşketinan vedike, mirov nikare bihizire ku ev li ser hunerê bandor nake. Heta mirov dikare bibêje di Kurdistan'ê de huner çavkaniya xwe jî di bingeh de hindekî ji şoreşa me ya ku pêşketinan nîşan dide digre. Bi taybetî hunera wêjeyê bi rengê "jinûve vejînê" cara yekem li gel serûbinbûneke ku hemû hêz û asta xwe bi rengekî cidî dijî û tê ser hişên xwe, vedije û çavên xwe ji jiyanê re vedike. Ristê huner niha ji her demê zêdetir derdikeve holê. Bi taybetî ristê hunera wêjeyê ku bilêyîze her diçe watedartir dibe. Ew cure wêjeyê ku di roja me de gelekî berfireh e, "roman" ji bo jiyana şoreşgerî vebêje û bersivê bide, gelo jiyaneke şoreşgerî ya rast çawa ye, ketiye pêvajoyeke herî berhemdar. Ew serûbinbûna di jiyanê de gelekî berfireh e. Ew qas guhertin û veguhertinên bingehîn di jiyana civakî de çêdibe tenê di nirxandinên bîrdozî, siyasî û leşkerî de mijarbûna wê têr nake. Berovajî pêdivî bi dahurandinên wêjeyî ku her diçe zêde dibe jî heye.

Şoreş bêyî wêje nayê hizirandin. Hîn watedarbûna tekoşîna şoreşgerî, hîn xweşikbûna wê û pêşketina wê dê ji hunerê gelekî hêzê bigre. Tenê yê jê re çavkanîbûnê neke, hêzgirtina ji wê jî dê girîngiyekê qezenc bike. Ji ber wê jî ew serûbinbûna ku tevgera me jê re rê vekiriye, di eniya huner û wêjeyê de jî gihandina raveyên vegotinê yên rasteqîn erkekî nayê taloxkirin e. Jiyana şoreşgerî bi xwe weke hunerekî, weke berhemekî dimeşe. Heta di gelek xalên ku bibe şaxekî hunerê yê balkêş şopan nîşan dide. Ger bi pêkanîneke rast ve bikaribe bersivê bide, bêguman dê xebatên ku vê ji bo xwe bingeh bigre û zanistiyên herî mezin derbixe holê. Di vê mijarê de hindek ceribandin têne kirin. Ceribandinên helbest û roman bi pêş dikevin an jî bîranîn tên berhevkirin. Lê belê asta pêşketinan pêdîvî bi romanên berfireh dibîne. Romanê ku tekoşîna me bi gelek rengan ve tîne ziman êdî bûye pêwîstiyek. Em hizirîn ku xeta bingehîn a tekoşîna me yek jî ji vê aliyê ve bînin ziman. Di derbarê vê de li ser hindek gelaleyan nîqaş têne meşandin.

Nêrînên milîtanan ku ji aliyê cihê ve tevlî tekoşîna me bûne, bêguman dê piştgiriyê bide vî tiştî. Ger jiyana di zindanê de li çiyan, jiyana di qadên cihê de dema ku me anî ziman û dema ku me ev daxuyanî pêşkêş kir, dê wê demê amrazên romaneke dewlemend derbikeve holê. Ev gotarên ku em bi pêş dixin ji bo em bikaribin di vê wateyê de amrazekî hîn dewlemendtir derbixine holê ye.

Ji beriya vê jî me gelaleyeke romanekî bi pêş xistibû. Bêguman ev gelale gelekî kêm e. Me bi xetên bingehîn ve ev danîn rastê. Lê belê ev yek gelekî kêm bû. Me gelek xebatên ku piştgiriyê bidin kirin. Ew nirxandina bi navê 'Çîroka Vejînê' gotarên cihê û hetanî dahurandin jî, di mijara romanê de dê gelekî piştgiriyê bide. Em van hemûyan weke amraz dinirxînin û van her roj bi mînakên nû ve bi pêş dixin. Em nirx didin ku hemû rêheval tevlî van nîqaşan bibin. Ez ewle me ku ev rêbaz berhemdar e. Bêyî ku mirov hêza xeyalê piştçav bike, jiyan bi xwe vegotin, ji zimanê yên ku jiyane anîna ziman weke rengekî şêwazê din em dihizirin.

Dibe ku hun bi hindek pirsan ve kûraniyê bidin vê mijarê di gelaleyê de derveyî gelaleyê di derbarê hindek mijaran de hêman û pirsên ku hun diyar bikin em dikarin nîqaş bikin.

-Rêbertî, di têkîliya xwe û Fatmayê de diyar kiribû ku bi taybet di demên destpêkê de nêzîkbûneke hestiyarî hebû. Gelo ast û şêwazê vê hestiyariyê çawa bû?

**Rêber Apo:**

-Ez bawer nakim ku min hestiyariyek jiyabe. Aliyê xwe yê metirsiya siyasî girantir bû. Ev têkîlî spartina vê bingehê hîn rastir e. Ger bingehê xwe yê siyasî nebûya, ez bawer nakim ku nêzîkbûneke hestiyarî bingeh bigrim. Dibe ku bingehê vê çavkaniya xwe ji bingeha siyasî girtibe. Ev her diçû bû xwedî bingeheke siyasî. Di hizra min de têkîliyeke ku bingehê xwe yê siyasî nebe, nirxeke xwe yê siyasî nebe gelekî bêrûmet e. Ez dikarim bi dilrihetî diyar bikim têkîliyên min ên herî nêzîk ger ji bo armanceke siyasî xizmetê neke ez ji wan nefretê dikim. Dixwazim wan parçe parçe bikim û ji xwe dûr bixim. Ji bo min mirovekî ku ez pê hestiyar bim, dema ku pêşketineke siyasî

ya cidî pêkanîbe û gav avêtibe, jiyaneke demdirêj a pîroz derdikeve holê. Dema ku ez dixwazim kesayetekê çêbikim pêwîst dibînim dema derbasbûyî binirxînim.

Di bingehê hestên min de xizmetkirina armancekê heye. Dema pêşketina li ser bingehê plan û li ser bingehê hêmanên li gor hêza hizirandinê ya wê demê hatiye diyarkirin çêbibe, ezê wê bi azwerî hembêz bikim. Ez dikarim diyar bikim ku di vê mijarê de ez nirx nadim her çi saziyeke bicihbûyî ya kevneşop û helwesteke exlaqî. Em ji girêdaniya dayik û bav a di nava malbatê de bigrin, ji bo girêdaniya xizmî û mirovahiyê ez her dem di vê çarçoveyê de nêz bûm. Ji bo min hevaltiya rê, bingehê hestan e. Kê bi min re ber bi armanc ve dimeşe, bi wî re dilsozî bi pêş dikeve. Ez dest biavêjime ku derê herî kêm ew qasî nirx didim û pêwendî raber dikim. Ger ne wiha be ezê têkîliyekê, saziyekê û jiyanekê derbixime derveyî vê û dest jê berdim. Di jiyana min de jî mînakên vî tiştî yên bêjimar hene. Kesayet çi qasî di nava tekoşînê de dimîne bila bimîne, roniya çavên min be jî zêde xembar nabim. Li hemberî wê hestiyar nabim. Rewşeke ku ez xwe hildibijêrim heye.

Lê belê pêwîst e bingehê hestan hîna bi kûranî were têgihiştin. Ez dibînim ku di têkîliyên me de weke ji bingehê siyasî dûr ketina nava hestiyariyên kîn, nefret û hezkirinê çêdibin. Pêwîste ez diyar bikim ku ev zêde nirxê raber nakin. Bi taybet kîn, nefret û hezkirinên ku xwe naspêrin rêxistinê helwesta bîrdozî û bi taybetî jî siyasîbûneke cidî zêde watedar nabin. Wiha ye ku xweşikbûna mêjî bi kûrbûna siyasî ve ji ber wê jî li ser vî bingehî bi dahurandina jiyanê ve girêdayî ye. Dahurandina siyasî û rastiya rêxistinî milîtankirina wî zêdetir çi qasî pêş ketibe dê ew qasî bi pêş bikeve.

Pêwîst e tu caran neyê jibîrkirin ku yê ku di têkîliyên xwe de kûrbûna rêxistinî û siyasî, hêza dahurandin, çalakî û vegotinê nikarin ava bikin, bi riyên din çavkaniya pêwendiyê di encamê vê de jî hêza hest nikarin zêde bi dest bixin. Her çi qasî weke bi dest xistine diyar bibin jî ev çêkiriye, kesî ye encameke xwe ya cidî û mayinde nayê girtin. Ev hêmaneke ku gelekî kêm bal lê tê kişandin e, lê belê rastiya vê yekê wiha ye. Têkîliya ku were

hezkirin, têkîliya ku li ser bingehê siyasî şax daye, têkîliyeke ku raveya xwe ya rêxistinî heye, têkîlî û helwesteke ku weke nirxekî propagandayê xwe bi girseyê gel daye pejirandin e. Ev Kurdistan'ê de ji hemû aliyan ve wiha ye. Derveyî vê lêgerîna çavkaniya xweşikiyê û hezkirinê zêde watedar nîne.

Li gel ku hîm û bingeh wiha ye, pêwîste mirov girîngî bide teşeyê jî. Ez ji vê re dibêjim pêşxistina ûslub û şêweyê jiyanê û rengê wê. Wisa ye ku yên saxlem in, dê di van mijaran de jî gihiştibûnekê bijîn. Di Kurdistan'ê de hest, bi tenê xwe bispêre van bingehan û çavkaniyan dê bi pêş bikeve. Rengên din ango têkîliyên xizmatiyê, têkîliyên di encamên zehmetiyên mayînê de pêk hatine têkîliyên ku xwe dispêrên pereyan, ên xwe dispêrên radeyan, hestên ku tenê xwe dispêre fîzîk nêzîkbûnên ku ez zêde ewlehiyê pê naynim in. Mixabin civaka me di vî alî de gelekî bêrêgez e. Di nava hest û têkîliyên ku bingehê xwe yê rêxistinê, siyasî û bîrdozî nînin de fetisî ne. Rondikên çavan azwerî û heyecanê her dem wiha fêm dike. Lê belê tu caran jî kêfxweş nabe û nagihê dinyayeke hest a bitenduristî. Em bi tenê diyardeyên li ser bingehê tevgereke ku armancên xwe yên pîroz hene û bi milîtanî gihiştina vê esas digre de, emê bikaribin bigihên dinyayeke hest a bitenduristî, em nakin. Li gel vê pêşketinên ku her roj jiyan bi xwe jî zelal nîşan didin jî heye. Dinya hestan li ser vê bingehê derdikeve holê.

Hest em bixwazin li hemberî nirxên neyînî bi rengê kîn û nefretê çêdibe, em bixwazin bi rengê sempatî û hezkirinê çêdibe. Pêwîst e xwe bispêre xetê û bi pêş bikeve. Teqez kûrbûneke û çavkaniya xwe ya hêzê hebe ku wateyeke ava bike. Derveyî vê bi kar anîna hestan rezîlane ye û ev yek jî gelek caran ji nefretê re rê vedike. Hindek dema ku ji rêgez û xetê derbikevin nêzîkê min be jî, roniya çavên min be jî ez naxwazim bi wî çavî bibînim. Pêwîst e ew ji hemberî min tune bibe û bikeve bin erdê. Ez di vê xalê de gelekî bêtehemul im. Lê belê li hemberî yê ku rast nêzîkî xetê dibin, ez bi hezkirineke mezin pêwendî nîşan didim û alîkar dibim. Di têkîliyê de nêzîkbûna min ev e.

- Em serdestiya îradeyê di kesayeta Rêbertiyê de dibînin. Gelo ma di vê rastiya serdestiya bihêz de ristê bêvînî û neserdestiya gelê Kurd an jî zilamê Kurd çi ye? Hun di serdestbûna îradê de çi weke pîvan digrin û vê çawa pêk tînin?

**- Rêber Apo:**

Bêvîniya mirovê Kurd ku di min de hêrs û bertek afirandiye pêwîstiya gihiştina hêza vînê ya awarte derxistiye holê. Jiyan û çîroka min ew bêhêziya balkêş a ku tê jiyîn, veguhertina hêzê ye. Ez vê bi qasî ku hun bawer dikin hîn kûrtir, berfirehtir, bihesab û bipîvan pêş dixim. Ez dibe ku tu hevalên me ji bîra xwe derbas nake û xeyal nake nirx didime bêhêziyê veguherînime hêzê, bêvîniyê veguherînime vînê, bêrêxistinbûnê veguherînime rêxistinbûnê, rebeniyê veguherînime balkêşiyê, her cure tembeliyê û vala mayînê veguherînime zîrektiyê.

Ji bo min gihiştina hêz û îradeyê û di vê mijarê de bi karanîna jêhatiyên mirovan tenê felsefeya jiyanî nîne. Di heman demê de azweriyek e. Derveyî vê jiyanê nahizirim, pêwendiyê jî nîşan nadim. Li gor min di jiyanê de tu nirxên mirovên lewaz nîne. Tu kerametê mirovê ku jêhatiyê xwe pêş nexistiye nîne. Ez tu caran van mirovan cidî nagirm, jê hez nakim. Naxwazim zêde fêm bikim, guhdar bikim û bi wan re biaxivim.

Ew bêvîniya kûr a di mirovê Kurd de, zanebûna ku belav bûye, dinya wî ya xirab bûye û zîhniyeta wî ya nediyar e li pêy çi dibeze û jiyana wî ya bêpergal di min de bertekeke mezin afirandiye. Bênamûs e, ketî ye, bêşeref e. Ez bi rêzdariyê li van nanihêrim. Berovajî bi hêrseke mezin ve li wan dinêrim. Di kesayeta min de li hemberî wê berxwedaneke ji hemû aliyan ve pêş dikeve. Ji zarokatiya min hetanî niha ev yek wiha ye dema ku min di nava malê de têkîliyeke pîvanên lewaziyê dît, bi wê rewşa xwe ya zarokatiyê ve weke ez hêrs dibûm û min dixwest ji gel wan birevim. Bi qasî hêza min têr dikir, min şer dikir dema têr nedikir, ez direviyam û ev gelekî bi pergal bû. Min pêwendiyên xwe ber bi di riyeke watedar de meşînê, di riyeke rast de komek avakirinê û helwestên ku min bihêz bike ve bir.

Bi kurtayî hindek tiştên ku min di we de nedîtiye ev in. Hun jiyaneke gelekî lewaz, vîneke lewaz layiqê xwe dibînin. Bi lewazbûna tevgerê, bi hizirandinên nehatine dahurandin û bêpergal ve dîsa bi îradeyên tûjnebûyî ve bi rihetî dikarin li hev werin. Ev pêşî li pêşketina we ya mayinde digre. Yekser meşa we ya ber bi armancê ve dema ku hun dimeşine armancê di asteke bilind de tûjbûna we disekinîne. Kesayetên we yên lewaz hindekî jî encama vê vînê ye. Bi qasî ku hun li derûdora armanca pîroz û bi zanyariyeke siyasî ve bizanibin bibin hêza vînê, hunê bêhêziyê veguherînin hêzê, bêvîniyên xwe veguherînin vînê, lewazbûna xwe veguherînin hêzê.

Pêwîst e hun di vê mijarê de jiyana min baş lêkolîn bikin û kûrtir nêzik bibin. Min ji zarokatiyê heta roja me di bingehê bîrdozî, rêxistinî û çalakiyê de veguherîna ji bêhêziyê ber bi hêzê ve gelo çawa kir? Gelo uslûb û şêweyê min çawa bû? Ji bo komkirina hêzê min kîjan rêbaz bi rê ve birin? Hemû helwestên min gelo çi qasî kom dike, plansaz e, tûj e, dide şerkirin, cihê dike, bijarte ye, parêzger e û her dem pêş dixe? Ger hun kesayetan di van hêmanan de nas nekin hunê bûyera Rêbertiyê gelekî seranser fêm bikin. Pêwîst e hun di vî alî de nêzîkbûna pêşketina kesayetê û ger gengaz be li ser vê bingehê komkirin û gihandinê bizanibin. Bêyî ku hêza îradeyê ya bilind hebe, meşa we ya şoreşgerî ya bihêz nabe. Ew meşa ku hun li hemberî leza dijmin bikin de, wê teqez ji pişta we bi cihekî bigre û bixe. Yek riya pêşîgirtina vê gihiştina hêza vînê ye ku tu caran dijmin nagihê.

**-** Li gel ku berî wê têkîliyeke Fatma ya hestiyarî hebûye, piştî ku Rêbertî di nava komê de derkete pêş, em dibînin ku xwe nêzî Rêbertiyê kiriye, tevî ku Rêbertiyê ev nêzîkbûna berjewendîperest dîtiye gelo ji bo çi têkîlî pêş xistiye û gelo di vir de ristê hestiyariyê heye?

**Rêber Apo:**

- Ez bawer dikim hun li têkîliyan gelekî bi hestiyarî dinêrin, nêzîkbûnên min wateyeke civakî û li gor wê demê xwedî wateyeke siyasî ye. Di dîtînê de weke hestiyariyê ye, lê belê piştre di cewherê xwe de pêşketineke siyasî ya mezin daye jiyîn. Ev baş tê fêmkirin. Tevgerîna wê ya ku xwe dispêre berjewendiya kesayetê lêgerîna min a siyasî û nêzîkbûna min a li ser

bingehê siyasî naguherîne. Ez di nêzîkbûnên hema her kesekî de wiha me. Di dîtinê de têkîliyeke gelekî dostanî û kesayetî tê fêmkirin. Lê belê piştre derdikeve holê ku nirxeke xwe ya kûr a siyasî heye. Li pey berjewendiyên xwe yên kesayetê bûyîna wê pêwîst nake ku ez wê zêde cidî bigrim. Têkîlî di çarçoveya ku min daniye holê de ye. Malbateke ku di Kurdistan'ê de pêwîste hesab bide heye. Partiyeke ku pêwîst e ev malbat hesabê bide heye. Dîsa çepgiriyeke ku pêwîst e ew malbat hesabê bide heye. Ev ji bo min têr dikin û têkîliya hestiyariyê jî têkîliyeke hesab pirsînê ye. Hewce ye ku hun hindekî vê yekê fêm bikin. Di têkîliyên min ên mezin de mirovan bi yek alî ve dest girtin nîne. Bi şêweyeke ku ji hemû aliyan ve lêpirsîn dike tê jiyîn. Her têkîliyeke ku ez nêzîkî dibim nayê wê wateyê ku ez pê re baş li hev têm. Têkîliya ku asteke mezin dijmintî jî tê de ye heye. Gelek têkîliyên ku tê de bertek û pevçûn jî hene.

Hîna di serî de diyar bû ku ev têkîlî dê bibe têkîliyeke pevçûnê ya mezin. Armanc jiyîna hestên gelekî dilsoz û gelekî pêşketî nebû, hesab pirsîn bû. Lê belê me dê piştre bidîta ka ev hesab pirsîn, veguhere rewşeke erenî yan na? Jixwe ez wê diyar dikim, ger bibe şoreşgereke baş ev qezencek e. Ger nebe itîfaqek e. Me ev itîfaq guherte bi aliyê xwe ve. Ev MÎT be jî emê MÎT'ê jî bi kar bînin. Ez bi van metirsiyan ve nêzîkî vê têkîliyê dibûm. Ji ber wê jî naveroka siyasî ya vê têkîliyê gelekî mezin e. Ez nêzîkbûnê de bingeh, armanc û asta pêşketinê digerim. Dibe ku têkîliya dijmin be jî, ger tu bi dijmin re baş mijul bibî, dibe ku ev jî rê li ber serkeftinê vebike. Ger ez bi kesekî rewşeke gelekî paş de jî mijul bibim, ez dikarim wî jî pêş de bibim. Li ser helwestên min mantiqê "ez her dem dilsoz bim û gelekî rihet bikim" serdest nîne. Ez her dem bi rengê têkîliya şer bi dest digrim.

Mirov nedikarî pêşî li berjewendîparêzbûna wê bigirta. Ewê min tehrîk dikir. Ji bo çi wiha dikir? Em vê hindekî din fêm bikin. Seqetî bi kîjan sedemê bi dest digirt? Şertekî ku ez lê digeriyam ev bû. Tenê bila nereve. Tenê hindekî hêza meşînê raber bike. Ji vê zêdetir min tu tiştek hêvî nedikir. Min hêvî bikira jî ev yek ne diyarker bû û ev tişt hemû zelal nedihate diyarkirin. Weke hêza me ya veşartî jî kesayeta me hindekî wiha ye.

Hesasbûn û metirsiyarî mirovan gelekî şiyar dihêle. Dişibe vî tiştî. Mînak li vir marek hebe, tuyê di her gavavêtina wî de gelekî baldar bî. Bi hizirandina ew mar dibe ku her kêliyê derbikeve hemberî te tuyê gelekî baldar bî û ev jî dê rê li ber bihêzbûnê vebike. Jiyana min her dem wiha derbas dibe.

Hunê bibêjin gelo ma aramî hebû? Di mala me de aramî nebû. Endamên malê her roj pevdiçûn û vê jî ez tehrîk dikirim. Dibe ku ji ber vê taybetmendiya malbatê min têkîliyeke wiha bi dest girt. Vê jî hişt ku em pirsgirêkê hîn rasteqîntir binirxînin. Xafil nebin, gelekî şiyar bin dîsa nexapînin û em jiyana ku xwe dispêre hêza xwe bijîn.

Pêwîste mirov bi têkîliya biratî, dayik û hwd neleyîze, li hemberî van cidî be. Dema têkîliya hevjînî û dostaniyê wiha were bikaranîn, tê wateya ew mirov bênirxbûna xwe datîne holê. Lê belê civaka me bi vê yekê gelekî kêfxweş dibû. Ez di jiyana xwe de vî tiştî hîn bûm. Tu caran tuyê xwe di bilindbûnê de, bi helwestên erzan ve tevgerînê ve asê nehêlî. Ji ber ku ev biçûkbûn e. Encamên ku min girtine, min kesayeta xwe serûber kir. Kesayeta xwe gelekî balkêş û binirx kir. Di vir de ez milê min ê rastê be jî xwe naspêrim. Di bingeh de ez xwe dispêrime xwe. Ew gotinên “min xwe spartibû te, lê belê hêviyên min vala derketin, ez hilweşiyam” wêjeyên erzan in, bêwate ne. Pêwîste tu xwe bi mirinî nespêrî tu kesekî. Hun dibînin di jiyana min de girêdaniya dostaniyê û rêhevaliyê çi qasî girîng in. Lê belê tu caran bi hemû tiştan ve min xwe nespartiye dostekî yan jî rêhevalekî.

Hun dizanin hestên min çi qasî bihêz in. Lê belê min tu caran hestên xwe bi koletî bi kesekî ve girênedaye. Ger wiha be dê bêrêzdarî be. Ez çi qasî feqîrbim jî pêwîste dîsa jî ez weke xwe bimînim. Çi qasî biçûk tê dîtin bila were dîtin, ez pêwîst e bibim xwe. Ger ezê bigihême mezinbûnekê pêwîst e ev bi xwe spartina hindekan ve nebe. Pêwîst e ez vê bi ked û hewldana xwe ve pêk bînim. Li gor min ev xweşiktir e. Ji ber wê jî di têkîliyê de parastina serxwebûnê girîng bû. Jixwe ez van hêmanan ji zaroktiyê hetanî niha dijîm. Sedemê wê û rengê wê çi dibe bila bibe, min serxwebûna xwe parastiye. Min rengekî têkîliyê ku gelekî kesan dê jê derbe xwaribana, ji bo armanceke siyasî ya diyar min da xizmetkirin. Mirov dikare bibêje min cara yekem di

Kurdistan'ê de veguhertineke wiha berfireh pêk anî. Di vê wateyê de ev veguhertin xwedî nirxeke dîrokî ye.

Bi qasî ez dibînim hun hindekî seranser nêz dibin. Dema ku ez têkîliyekê bi pêş dixim paşeroja wî kesî çî ye, ew kes çawa ye lêpirsîn dikim. Li gor min dibe ku sîxur jî be, lê belê ez wî di bin çavdêrî û vîna xwe de digrim. Di encamê de baş be jî, xirab be jî derdixime rastê. Yek jî ez baweriyê bi xwe tînim. Kesayetan bi pêş ve dibim, bihêz dikim, dikarim bimeşînim. Nêzîkbûna min a mirov wiha ye. Jixwe bi mirovên tekûz ve destpêkirina min a kar ne gengaz e. Di Kurdistan'ê de tu mirov tekûz, saxlem û zelal nînin. Lê belê ger di agirê tekoşîna şoreşgerî de ji nû ve were afirandin, dibe ku hindekî wiha be. Ev nêzîkbûna min nêzîkbûneke giştî ye. Ez mirovan di nava pratîkê de digihînim, bihêz dikim û têdigihînim. Ji bo min pîvan di nava pratîkê de ye. Di nava agirê pratîkê de pêşketin e. Bi rojane hêza tevlîbûna jiyanê ji bo min girîng e. Weke hindekî hêvî dikin û bawer dikin nakevime têkîliyan, têkîliyan nadomînim. Dîrokê nîşan da ku şêweyên têkîliyên binirx, şêweya ku me bi pêş xistiye. Mirov dikare ji vê jî gelek encaman derbixe. Ev şêweyeke kevneşop û hatiye hînbûn nîne. Şêweyeke balkêş e, lê belê şoreşgerî ye. Pêwîst e hun li ser vê biponijin û encaman jê derbixin.

**-** Tevî hemû hewldanan jin ji bo çi nikare cihê xwe di tekoşînê de bigre? Gelo mirov dikare kêmasiyên di vê mijarê de bispêre çi tiştî?

**Rêber APO:**

Tiştê ku ji bo gelê me were gotin çi be, ya ji bo jinê jî were gotin ew e. Rastiya gelê me ku rewşeke dişibe wê dijî. Tiştê ku jin dijî jî, koletiya gelê me dijî, rengê wê yê hindekî din hatiye kûrkirin e. Ji yeke ku koletiyê ewqas bi kûranî dijî, hêmaneke ew qasî lewaz a jiyanê ye, di carekê de gavavêtinên bihêz jê hêvîkirin ne gengaz e. Ji ber ku dê her cure neyîniya paşverûtiyê li ser xwe bide jiyîn. Kişandina jinê ji bo tekoşîna azadiyê weke berê nîne. Bi dahurandinan û hewldanên pratîkî ve di vê mijarê de hindek pêşveçûn hatine pêkanîn. Di roja me de ev gihişte asta balkêş. Di tekoşînê de astengî çêkirina jinê ew qasî girîng nîne. Ji ber ku tekoşîna şoreşgerî her kesekî tîne rê. Di vê

mijarê de şêwazê Rêbertiyê jin jî û zilam jî aniye rewşeke ku bandor dikin. Zelalkirina me ya pirsgirêkê gelekî girîng e. Tekoşîna me ya dijwar a ku me ji bo pirsgirêka netewî em deynin holê nebû. Em îro ji herî jor a Çankaya'yê bigrin hetanî şivanekî li çiyan ê ku pirsgirêka netewî heta hestiyên xwe hîs nake nemaye. Me pirsgirêka jinê hindekî aniye wê rewşê. Ger di refên me de dibe, ger di civakê de dibe beşeke ku vê pirsgirêkê heta hestiyên xwe hîs nake, me nehiştiye. Di çarçoveya vê çareseriyê de çi qasî têgihiştin hatiye pêkanîn derketiyê rastê. Ji nava jinên Kurd hin şervanên azadiyê derdikevin. Qada azadiya jinê berfireh dibe, wekhevî xwe dide hîskirin. Nêzîkbûn rast hatiye nîşandan û di vê mijarê de rê jî baş hatiye diyarkirin. Yê ku dixwazin bijîn jî dê di vê riyê de bimeşin.

Ger baş were temaşekirin, li gel azweriya jiyanê ya gelekî ji we xwesteka di vê riyê de meşê heye. Yê ku dest ji jiyanê bernadin, ên di vê riya hatiye diyarkirin de dimeşin in. Pêl bi pêl hatina wan a refan jî vê yekê zelal raber dike. Di rastiyê de çareserî derketiye holê. Derketin û nederketina milîtanên bihêz a holê hewldan diyar dikin û ketina nava van hewldanan jî çêbûye. Lê belê ev hewldan kêm dimînin. Dibe ku nikarin asta Rêbertiyê bigrin, lê belê her roja ku derbas dibe ku tê hînbûn xeta Rêbertiyê û temsîla wî girîng e. Di jiyanê de bi biryar û xweşikbûn jiyana xwe watedarkirin, girêdayî vê yekê ye. Derveyî vê yekê tu rê nînin. Vî tiştî hema êdî her kes hîs dike û dijî. Wê demê ger ev yek neyê îhmalkirin, pêşiya wê her dem vekirî were hiştin û her dem hewldan dagirtîbin ango perwerde, rêxistin û tekoşîn di nava hev de werin domandin milîtana jin a hatiye çareserkirin, têkîliya jin û zilam a hatiye çareserkirin dê derbikeve holê.

Ez bi israr diyar dikim, ev hemû bi kedê têne afirandin. Di serî de têkîliyên amade jî nebûn, bi we re jî ez her roj di nava şer de me. Hun çi qasî xwedî niyetên pak bin jî, bi mirinî girêdayîbin jî ev rewş pêwîstiya tekoşîndayînê ji holê ranake. Ji ber ku emê mirovên xwe bi tekoşînê biafirînin. Ger hun hêzeke rêxistinî qezenc nekin hêza bi dijminê xwe re şerkirinê qezenc nekin, ez bi we re lihev nakim û ezê her dem bi we re pev biçim.

Ez rasteqîn im, dibe ku aliyê we yê wiha bi pêş neketibe lê belê ger hun wiha bimînin, kesayeteke we ya tekoşêr nebe, helbet hun nikarin çareseriyên bihêz pêk bînin, milîtaniyeke bihêz pêk bînin û nikarin bijîn. Di vê mijarê de jî şêwazê Rêbertiyê gelekî balkêş e. Di têkîliyan de her dem tekoşîn ku derdikeve pêş, di vê mijarê de rê li ber gelek pêşketinên bihêz û ferzdar vedike. Her kes tênagihê û pêk nayne. Ev pirsgirêkeke cihê ye. Lê belê ev şêwe têkîliyan diafirîne mirov û jinê bihêz dike. Ev yek eşkere ye. Qezenckirina hêzeke pêkanînê ya bilind bi afirandina jina bihêz ve li gel wê wekheviya xwe li ser zilam ferzkirinê, zilam jî guhertin û veguhertinê ve cihê xwe yê di civakê de ku heq kiriye û pêwîst e bi dîtina wê ve tê pêkanîn.

Bêguman ev jî bi rengê “em tevlî PKK’ê bûn, her pirsgirêk çareser bû” neyê fêmkirin. Wateya tevlîbûna PKK’ê destpêkirina tekoşînê ye. Him jî tê wateya tekoşînê di asta bîrdozî, hizrî û giyanî de di hemû qadan de kûrtir berfirehkirin e. Hun nikarin bibêjin “em rêheval in, li hev hatin her tişt qediya” tekoşîna rastî, di nava partiyê de û bi partiyê re dest pê dike. Azadiya we her tiştê wê di nava partiyê de û bi partiyê ve dest pê dike. Di vî alî de PKK di heman demê de hîmeke tekoşînê ye ku azadiya jinê tê de herî baş were pêkanîn. Di PKK’ê de bi tekoşînê qezenckirina azadiyê mijara gotinê ye. Em vê mijarê jî xelet tênegihên. Hun dikarin têkîliya me ya jinê jî çi qasî binakokî pêş ketiye bi PKK’bûnê ve dest bigrin. Tê dîtin mînaka ku me jiyaye, şerekî nakokî, tekoşîn û rêxistinê ya balkêş e. Ev guhertî be jî kêm zêde ji bo her kesî derbasdar e. Hun nikarin demeke dirêj ji nedîtî ve werin ku her têkîliyeke hun ava bikin têkîliyeke tekoşînê ye. Dema ku we wiha kir hun dê wenda bikin.

Tişta girîng di vê romanê de aliyê tekoşer a di têkîliyan de ye. Aliyê hember dilsoz bûye yan nebûye ew qasî girîng nîne. Ferzkirina tekoşînê bi tekoşînê qezenckirina mirov û meşandina wê gelekî girîng e. Ji ber ku li gel me mirovên amade hatine pîvandin nînin. Mirovên heyî binexweşî ne. Ew bandorên dijmin dijîn. Bi zanebûn an jî nezanbûn lewaz û bêvîn dimînin. Ez bi wan re lihev jî werim, evînê jî bijîm, hestan jî pêş bixim, bizewicim jî zêde nirxa wî tiştî nîne. Ji ber ku ew kesayetên mirî ne, di nava tekoşînê de

jî dibêjin “em partiyî ne, em li hev hatin, li hev bûn bi dijwarî em bi hev re bûn.” Ez baş dizanim di jiyana pratîkî de ev jî zêde bingehîn nabe.

Di Kurdistan’ê de di rastiya PKK’ê de hêsan li hev hatin ne gengaz e. Pewîst e mirov bi hevrebûna tekoşîneke gelekî berfireh him li hember hev û him jî li hember dijmin bi rengên cuda û bi xwe spartina pêvajoyan bimeşînin ku têkîliyên mirovan ên bi rêzdarî derdikeve holê. Di vê mijarê de di dahurînên romanê de û di vegotinên din de gelek şop hatine dayîn. Nirxeke bilind bidin van şopan û li ser wê bingehê veguherînê pêk bînin.

## Kesayetên ku li xeyalên xwe yên zarokatiyê xiyanet nekirine kesayetên bihêz in

**-** Di gotareke xwe de hun dibêjin “bêyî ku ez xiyanetê li xeyalên xwe yên zarokatiyê bikim, hetanî vir hatim”. Gelo ma ev xeyal hîna didomin û bi pêş dikevin?

**- Rêber Apo:**

Tiştê ez behsa xeyalên xwe yên zarokatiyê dikim, tiştên baş hizirandin, tiştên baş têgihiştin her dem ê xwezayî, yê tê hezkirin, hevaltî û aştî hêvîkirin bû. Xeyalên zarokatiyê kêm zêde wiha tê diyarkirin. Zarok biharê dixwaze, tiştê şêrîn dixwaze, hezkirinê dixwaze, aştiyê dixwaze, pêwendiyê dixwaze bi kurtayî dinyayeke xeyalî dixwaze. Rewşeke me ya ku em ji bo bigihên dinyayeke wiha, me jiyana xwe danî holê. Wateya xiyanetnekirina xeyalên xwe yên zarokatiyê afirandina dinyayeke ji dijmintiyê ferzkirinê û her cure kirêtiyê ku xwe rizgar kiriye, her kesek weke zarokan şad kêfxweş e, hev weke dijmin nabîne, her dem aştî û hezkirinê dijiye. Xeyal ev in. Wê demê jî ev xeyal hebûn, niha jî hene. Lê belê ev xeyal bi tekoşînê her diçe bi şerekî dijwar ve tê bidestxistin. Wateya xiyanetnekirina xeyalên xwe jênegerîna dinyayeke wiha ye.

Tekoşîna min û kesayeta min a ji wê rojê hetanî niha ku min pêş xistiye dadîtine holê ku, ez bi tundî xeyalên xwe dişopînim, ev jî şêwazeke baş e. Kesayetên ku xiyanet li xeyalên xwe yên zarokatiyê nekirine, kesayetên

bihêz in. Hindek ji van mirovên zanist, hindek mirovên çalakiya şoreşgerî, hindek jî dibin hunermend. Kê çi qasî xeyalên xwe yên zarokatiyê rasteqîn bijî ew kesayet ew qasî mezin dibe. Ez dikarim bi dilrihetî diyar bikim, xiyanet nekirina min a zarokatiyê ez birime milîtaniya şoreşgerî ya berfireh. Ji ber ku xeyal, hêvî, azwerî û xwestekên wê demê dest jê nehate berdan û gav bi gav azwerî û hêza pêkanîna vê hate bidestxistin. Ango hindekî din zanistî bû. Hindekî ev dinya hate naskirin. Neçariya bi nakokî û rastiya xwe ve ferzkirina çareseriya şoreşgerî derkete holê. Xeyalên zaroktiyê di cihekî de tenê bi hembêzkirina şoreşê ve tê bidestxistin. Şoreş jî hindekî amrazekî herî bingehîn a gihiştina xeyalên zaroktiyê ye. Ji ber vê jî şêweyê jiyana şoreşgerî şêweyê jiyaneke zarokatiyê ye.

Em hindekî jî weke zarokan in. Ji ber ku em bi xeyalên wan ve dagirtî dijîn. Wê demê jî wiha bû û niha jî bi vî rengî ye. Cihêbûna di navberê de niha em bi rastiyên dijwartir re di nava hev de ne, di nava tekoşîn û şerekî berfireh de ne. Lê belê xeyal dîsa ew xeyal in. Hindekî din serkeftin heye, hindekî qezencekî rastî mijara gotinê ye. Tê wê wateyê ku me ji zarokatiyê pê ve jiyan rast bi dest girt, ji bo xeyalên zarokatiyê bi tundî giredaniya me bi hemû hêza xwe ve himbêzkirina me ya wan xeyalan, sedemeke herî girîng a din ku me hêz qezenckiriye û em di riya rast de ne. Me xiyanet nekir, em rast cewherî û paqij man. Lê belê em rasteqîn bûn. Me xwe tenê bi xeyalan têr nedît. Bi hewldaneke mezin ve em ber bi tekoşînê ve çûn. Ev jî nîşan dide ku em ji zarokbûnê dûr ketin û mezin bûn. Me ev jî di dema wê de raber kir. Di encam de me dinya herî baş, têkîliyên herî baş bi kurtayî girêdaniya mezin a doza gihiştina jiyana azad wiha fêm kir û wiha jiya. Em kar dikin ku vê ji bo civakeke mezin û mirovahiyê pêk bînin.

- Kesayeta azad çawa tê avakirin? Kesayet kengê dikare bibêje “ez xwedî kesayetekî azad im?”

**- Rêber Apo:**

Azadî xebatkirin e. Xebat bi jiyanê ve gengaz e. Ji bo çi em ev qasî li ser xebatan disekinin? Ji ber ku xebat me azad dike. Kesayet çi qasî bixebite ew qasî azad dibe. Azadî bi xebatê ve, xebat jî bi şer ve girêdayî ye. Hizirandina

şer, amadekariya ji bo şer di kesayet de çi qasî bihêz be, perwerde û serûberkirina şer –şerê leşkerî û siyasî ferq nake- heta şerê bîrdozî çi qasî pêşketî be, kesayet jî ew qasî azad e. Hun çi qasî azad bibin, hunê ew qasî weke jineke mezin bijîn. Dema hun azadiyê di jinê de temsîl bikin, bi tenê wê demê hun dikarin jiyana azad temsîl bikin. Jin dibe zilam dibe ger yek dikare bibêje "ez azad im" di şerê azad de ango di qada bîrdozî, leşkerî û siyasî de bi xebatên pratîkî yên xwe ve xwe ispat kiribe û bi pêş xistibe nirxekî wî yê mirovî heye. Hun dikarin bi wî mirovî re bin, kar bikin û bijîn. Ên din gotinên pûç in û rezîltî ye. Misoger e ev qasi xebata me ji bo jiyana azad e. Hun jî çi qasî xebatên xwe rast bimeşînin ew qasî em dikarin bibêjin hun xwedî jiyanê ne. Şêweyên din ên têkîlî û jiyanê li gel me xwedî tu nirxan nînin. Eşîretgerî, malbatgerî, qebîlegerî, biratî, pîrekî û mêrîtî tunebûn e û rezîltî ye. Ger mirovek dibêje "ez xwedî kesayetekê azad im" pêwîste ku xwe ispat bike. Ger xwe ispat neke di jiyana me de cihê wî nîne.

Armanca tevlîbûna me ya şer û berxwedana me ya li hemberî zehmetiyên wê, ji bo ji we kesayetên azad derxistinê ye. Derveyî vê ji bo me mirovahî û rê nîne. Hemû riyên din li me hatine girtin. Em tenê dikarin xwe li vir bikin mirov. Hemû zehmetî û hewldanên me ji bo vê ne. Di vê riyê de mirovên azad û birûmet bi pêş dikevin. Em dikarin bi van mirovan re jî bimeşin û bi hevrebûnê pêk bînin. Em dixwazin mirovekî baş û serkeftî bi pêş bikeve. Mirov bi vê re jî jiyaneke bişeref bidomîne. Mirov dikare bi mirovên azad re bimeşe. Di Kurdistan'ê de mirovên azad wiha tên pêşxistin. Di vê mijarê de tu riyeke me ya din nîne.

**-** Têkîliya azad ji kîjan alî ve jin û zilam bihêz dike? Di nava vê têkîliya azad de reng û ristê ajoya zayendî pêwîste çi be?

**- Rêber Apo:**

Têkîliya azad di wateya navhevdebûn nîne. Têkîliya azad tê wateya mirov hêza serbestî, hêza hizirandina azad û çalakiyê qezenc bike ye. Ev têkîlî tambûna mirov rave dike. Wî dixe hundirê çalakiyê. Yê ku têkîliya azad qezenc kiriye vîna wî di bin bandorên cihê de felc nebûye, di bin bandora îradeyan, kevneşopan, edetan û siyên din de nîne. Dibe ku

dewleteke emperyalîst xwedî hêz be, dibe ku kevneşopeke girêdanîner be, dema pêwîst kir dikare li hemberî wan jî bisekine. Pêwîst e mirov azadbûnê berfireh pênase bike. Bi qasî wiha azadbûn hate pêkanîn, an jî yên ku wiha azadbûn e, bi qasî pêşxistina têkîliyê mirov dikare behsa têkîliya azadiyê bike. Ev bi hemû helwestên xwe ve yên gel in. Dikarin encamên helwestên xwe bibînin û berpirsyariya wê rabikin. Jixwe wateya peyva azadiyê pêşketin û pêşveçûn e. Kesên ku gihiştine vê xalê di têkîliyan de azad e. Mirov dikare bibêje, serkeftina azadiyê ya têkîliya azad bi pêş ketiye. Bi kurtayî di vê wateyê de dikare di têkîliyên azad de ristê xwe bilêyîze. Em dixwazin vê mijarê hindekî din vekin, ji ber ku pêwîst e baş were zanîn li ser vê gelek lêyîstokên mezin tên lêyîstin.

Ajoyeke ku her diçe tune dibe û fahîşe dibe jî, dibe ajoya zayendî. Li gor min hîn jî ajoyeke mirov ku herî kêm têgihiştin û herî kêm wate tê dayîn jî ajo û têkîliya zayendî ye. Ji demeke dîrokê ya dirêj hetanî niha rewşeke ku ketina bin bandora pergala civakî, siyasî û aborî mijara gotinê ye. Di dîtinê de ajoyeke xwezayî ye. Lê belê ketiye rewşekê ku bûye eşya û malekî herî xirab bi kar tê anîn. Têkîliyeke gelekî xwezayî û teqez pêwîste azad were jiyîn, ji bo çi hatiye vê rewşê? Di vê mijarê de divê dîrok û civak were lêpirsînkirin. Ji ber ku di asteke mezin de qedexeyên serdest ve dagirtî ye. Zayendîtî di bin bandora qedexeya giran de ye û ev aliyekî wê ye. Aliyekî din jî şopa milkiyetê ya giran dide jiyîn. Bi nêzîkbûnên mal û milkirinê, malbûnê ve weke hatiye rewşeke bi nexweşî. Ev di civaka Kurd de jî wiha ye. Di rastî de li gor her çînekî û tebaqeyekî hatiye serûberkirin û gelekî kirêt e.

Ev jî rastiyek e ku li gel me têkîliya zayendî rê li ber hilweşandin û tunekirina mirov vedike. Dema li gor kevneşopan guncaw be wê demê jî bi şêwazê milkiyetê tê nirxandin. Hunê rojekê lê temaşe bikin ku ew têkîliya jê re tê gotin milkiyeta pîroz weke têkîliya fahîşetiyê ya herî xeter hatiye darezandin û cezakirin. Mijareke herî zêde pêwîste were zelalkirin jî ev e. Zewac fahîşetiyeke dualî ye. Zewac jî di rastiyê de rûyê din ê pergala milkiyetê ye. Bi qasî ku milkbûyîn û rewşa jinê milkbûnê bi pêş ket, eniya

vê tiştê ya din fahîşebûn û giştîbûn ava dibe. Ev her du jî koletî ne. Rastiya milk kirinê û mijara fahîşetiyê jî gelekî xeter in. Ev rastiyê de serdestkirina exlaqekî durû ye. Ji ber çi ev wiha ye? Wisa tê fêmkirin ku karakterê giştî ya civaka çînî bi taybet jî rejîmên zordest ên Rojhilat a Navîn bi qasî ku zirav e, li ser milkeke pîroz ê bingehîn rengirtina wê mijara gotinê ye.

Civak û mirovan çi qasî milk bi dest xistibin jî ji hemuyan zêdetir jin û zayendîtiya jinê tê girêdan. Dema ku zilamek bi jinekê re têkîliyeke biçûk, zewacek an jî destgirtiyek ava kir, ji bo çi dibêje teqez a min e? Heta dema yekî şaş li jinê temaşe kir ev rê li ber mirina wî vedike. Em dikarin vê yekê çawa dahûrînin? Em dikarin vê weke encamekî bûyîna mijara têkîliya milkiyeteke ku gelekî bingehîn e û kevneşopekî gelekî tund e binirxînin. Mînak te têkîliyek ava kiriye, ji bo çi zilam dikare ev qasî li ser te serdest û bi bandor be? Ji bo çi te weke mal dibîne? Vaye hêza kevneşopiyan di vir de derdikeve beramberî me, bi jiyana me dilêyîze. Di vir de azadî nîne. Berovajî bûyîna mijara milkiyetekê kevneşop a tund heye. Mirov bi destxistina mal, milk û pereyan bi hêz dibe. Ev jî bi destxistina jinê ve yan jî bidestxistina jin û zilam ve çêdibe. Hindek taybetmendiyên ku mirov bike mijara milkbûnê hene. Ev bi vegotineke weke çi qasî zeviyên te, pere û zayendîtiya te zêde hebe ew qasî tu têr dibî ve tê ravekirin. Di vir de tiştê mijara gotinê mirov e. Milkiyeta li ser pere û axê ewqasî rê li ber xeteriyan venake. Lê belê li ser zayendîtiya mirovekî ev qasî serdestî û milkiyet dibe ku bibe çavkaniya koletiyê.

Wisa tê fêmkirin ku di me de xelasbûn û her cure feraset bi mayîna me ya nêzîkbûna malbatê ya gelekî hov û paşverû ve ji ber wê jî bêwelatî ji nasnameya netewî, ji rastiya welat û heta dûrbûna me ji rastiya civakî û gelekî şûn de mayîna me ji nêzîk ve bi feraseta zayendîtiyeke wiha ve girêdaniya xwe heye. Jin dibe yan jî zilam dibe, dema ku zayendîtiyekê bi dest xistin ev wana têr dike. Di Kurdistan’ê de ev yek gelekî bibandor e. Zayendîtiyeke gelekî çors û pergala malbateke ku li dora wê tê avakirin, mirovên me xelas dike û tune dike.

Pêwîst e di vir de hun taybetmendiyeke min bi dest bixin. Li gor min di vê mijarê de jî kesayeta min xwedî gavavêtineke balkêş e. Nêzîkbûna min a zayendîtiyê ya gelekî bi tevdîr, bi hevseng û gelekî azad xaleke mifte ya pêşketina şoreşgerî ye. Netemaşekirina min a ji bo vê ya weke her kesî di pêşketina min a şoreşgerî de risteke mezin dilêyîze. Weke ku ji bo gelek mijaran ez li gorî kevneşopan nêzik nabim, li gor çanda kolanan jî nêzîk nabim. Ji bo her duyan jî ez metirsîdar nêzîkbûm. Pêşkeşkirina jinekê çi qasî hesta kirêtiyê anî be giştîbûna wê yan jî veguhertina wê ji bo jina kolanan jî ew qasî kirêtiyê tîne. Ez çi qasî li hember bûyîna mijara mal û milkbûnê ya jinê hêrs bûme, bi kirina mijara harem û aleman jî ez hêrs bûm. Van tiştan bi kûranî ez ponijandim. Yek jî ji bo têkîlî û jiyana min yek jî vî tiştî rê da. Hîn jî ez di bin bandora vê de me.

Çi qasî li jin û zilam ji pergala mal û milk wêdetir were temaşekirin, çi qasî ji pergalê û fahîşetiyê qutbûn were pêkanîn ew qasî bi rengê çalakiyeke mirovê azad vediguhere. Ez çavkaniya xweşikbûn û her cure pêşketinê hindekî li vir digerim. Ez bawer dikim ku kesayeteke wiha azad bûye. Yê zayendîtiya wan jî were rizgarkirin. Azadiya zayendîtiyê dibe taybetmendiya çalakiyê ya kesayeteke ku azad dibe. Nexwe, xwe pêşkeşkirin bêguman azadiya zayendîtiyê nîne. Di heman demê de her roj ketina têkîliya zayendîtiyê jî nabe azadiya zayendîtiyê. Li gor min kesayetê ku azadî bi dest xistiye di zayendîtiyê de jî xeleka azadiyê bi dest xistiye. Lê belê ji ber ku kesayet hîn jî di bin bandora giran a kevneşopan dijîn ev bi tenê di nava partiyê de gengaz e.

Ji ber ku ji azadiyê re di asteke bisînor de nêzîkbûn tê raberkirin, mijara zayendîtiyê jî dibe mijareke ku herî kêm em wêrekiya dest dayînê raber bikin. Nêzîkbûnên gelekî hov hene. Nêzîkbûnên li gor ol û kevneşopan heta nêzîkbûnên bi taybetmendiyên herêmî ve dagirtîne dihêlin ku zayendîtî neyê naskirin. Nêzîkbûnên cuda weke ku kesayeta we ji kûr ve birîndar dike. Gelekî kêm kes di vê mijarê de asta azadiyê ji bo xwe bingeh digre. Li gor min hîn jî pirsgirêkeke herî bingehîn ev e.

Em zayendîtiyê tenê bi serê xwe bi dest nagrin. Bi hemû aliyên xwe yên aborî, civakî, hunerî û rastiyên civakî ve bi wan re di nav bandor û helwest, têkîlî û nakokiyê de bi dest digrin. Asta azadiyê ya di van mijaran de û asta têkîliya zayendî pêwîst e bi hev re were bi dest girtin. Kesayeteke ku xwe di vê xalê de gihandiye û kûrbûna wê bi dest xistiye, dê rast bijî û bide jiyîn. Tiştê ku şerme û pêwîste neyê qebûlkirin feraseta ji ber ku lihevhatina zilamekî ya bi keçikekê re yan jî keçikekê ya bi zilamekî re weke ku dixwaze bijî ye. Ango ji ber li hev hatiye, li gor edetan zewiciye, ji ber bi fermiyetê ve hatiye girêdan, ev têkîlî zêde min têr nakin. Ev rengên têkîliyan hîn di serî de zêde min jê hez nedikirin.

Girêdana asta azadiyê ya bi şoreşê ve bi şer û rêxistinbûnê ve gelekî zelal e. Min ji bo xwe rêgezek ava kir ku têkîliya li derûdora vê bi pêş bikeve dê watedar be û bi rêzdarî dê bi pêş bikeve. Taybetmendiyeke vê ya şoreşî û civakî heye. Em ji bo welatê xwe şerê vê dijîn. Ji gotina “em wiha têkîliya azad bijîn” wêdetir em tekoşînê û kesayetan azad bikin ku mirov ji bo têkîliya azad û azadiya zayendî jî bikaribin rast nêz bibin. Qedexekirina zayendîtiyê, milkiyet û fahîşebûn hiştiye ku kesayet neyên naskirin. Dibe ku lingê her mirovê bişemitîne. Hunê li ser xwe serdest bin, radestî van ferzkirinan nebin û nekevin nava nêzîkbûnên gelekî erzan. Li gor min pêşketina şoreşê, azadiyê û kesayetê dikare di vê mijarê de çareseriyê ava bike. Ji ferasetên têkîliyan ên derveyî vê re ez zêde wate nadimê û kirêt dibînim.

Dibe ku were gotin “em tengav bûn, pêwîstiya me bi vê têkîliyê heye.” Di civaka Kurd de mirov gelekî tengav bûne. Bi tenê zayendîtiya çors ve têrbûnê pêk tînin. Jin piştî panzdehan, zilam jî piştî bîstan diweşin û bedenên wan xirab dibin. Dibe ku bi zayendîtiya çors ve jiyanê bimeşîne. Ev jî bi tenê sînorên hovbûnê diyar dike. Naxwe çareserkirina vê pirsgirêkê diyar nake. Taybet her kes di vê mijarê de asê maye. Bi taybetî di rastiya Kurdistan’ê de ev yek wiha ye. Riya derbaskirina vê tekoşîneke ku ji sînorên zayendîtiyê hîn mezintir dayîna ber çavan e. Mirov dikare bibêje pêwendiya xwe bi zayendîtiya çors ve nîne. Bi têrbûna zayendiyê ve jî zêde

pêwendiya xwe nîne. Dema ku têrbûna zayendî jî were lêkolînkirin dê were dîtin ku dema rast neyê bidestgirtin dikare jiyanê tune bike. Weke meşa li ser pira siratê ye. Dema rast hate bidestgirtin, dibe ku pîroziya wê têrbûnê jî hebe. Hunê balê li hevsengiya hemû civakê bikişînin. Qada tekoşîna zayendî weke qada şer e. Perwerde û têkîliyeke zayendî ya xelet dibe ku mirov tune bike. Dîsa înkarkirina çors a zayendîtiyê mirov gelekî seqet dihêle.

Gelo ya rast çi ye? Ya rast tekoşîneke gelekî dijwar e. Ji bo zayendîtî azad bikin hunê rast bi dest bigrin. Hunê di sîwanê tekoşîn û şer de azad bikin. Hunê xwe ispat bikin ku wateyeke zayendîtiyê hebe. Naxwe tenê bi wateya çors de gotina, “zayendîtiya min heye, ez zilamekî wiha me, jineke wiha me” nêzîkbûneke xercî alem e. Dibe ku pirsgirêkên kesên wiha li kerxaneyan, kolanan û di zewacên ehmeqî de were çareserkirin. Lê belê tê zanîn ku ev hemû li gel me ne çareserî ne. Ketin e, avahiyeke civakî ya hov e û ji bo her cure bandorên dijmin vekirî ye.

Di dahurînên Rêbertiyê de pirsgirêka zayendîtiyê bi wate derketiye rastê. Jiyana di vê mijarê de jî jiyaneke gelekî dijwar e û pêwîste cidî were bidestgirtin. Bi dest girtina ji zarokatiyê heta roja me nêzîkbûna têkîliya jinê, têkîliya dayik û bav, têkîliya bihest, têkîliya bi partiyê re bi ziravî hatiye diyarkirin. Hîn jî rêveçûneke gelekî baş a vê rêgezê heye. Di PKK’ê de çîrokeke meşandina saxlem a azadiya zayendî heye. Gelek kes ne di zanebûna vê de ne. Lê belê di giştî de rêgeza azadiyê û xwe nîşandana vê di qada zayendîtiyê de gav bi gav pêş dikeve. Yê ku nikarin xwe li gor pêwîstiyên vê rêgezê pêş bixin di gelek qadên din de jî bi paş dikevin an jî pêşketineke zêde bibiryar nikarin bijîn. Ev jî tekoşînê dixwaze. Li şûna ku mirov pirsgirêkê weke tabuyekê bibîne, pêwîste bi tekoşînê ve qezenc bike. Ger hun baş bizanibin, zayendîtiya zayendên jin û zilam bêdagirkerî, bêmilk ji dûrûtiyê û serdestiyê dûr azad û wekhev bi rêxistibûna siyasî û çandî ve bi dest bigrin, li pîvanên di vê mijarê de balê bikişînin, wê demê wateyeke têkîliya zayendî dê hebe. Berovajî hun dê rezîlbin û gelekî xirab wenda bikin. Di tekoşîna şoreşgerî de bi taybetî jî ger hun di nava rêxistina siyasî û artêşê de bin bi şertê ku hun zirarê nedin xebatên nava artêşê de li ser

çareseriya rast a zayendîtiyê hun dikarin nîqaş bikin. Hun dikarin di vê mijarê de lêgerînên xwe yên rast bidomînin. Weke din pêwîste hun di vê mijarê de hesas bin, dîsa uslûbê tekoşînê bingeh bigrin. Ji ber ku lêyîstokên herî mezin li ser zayendîtiyê tên lêyîstin.

Di zilaman de mijara zayendîtiyê mijara serdestiyê ye. Kêmasiyên we ji bo wan sedema serdestiyê ye û karektereke zordest bi zilam dide qezenckirin. Ger hun li ser vî bingehî xwe pêşkeş bikin, dibe ku derveyî armancên we hunê xwe bikin amrazê serdestiya zilam. Ji ber wê jî ji bo ku li ser zayendîtiyê serdestiya zilam a zordest bi pêş nekeve pêwîste hun xwe gelekî bi pêş bixin û azad bikin. Hun neçarin di vê mijarê de bi zilam re tekoşînê bigrin ber çav. Bêguman ez van tiştan di wateya çors de diyar nakim. Zayendîtî weke çekekî, weke hêza kirîn û firotinê bi kar anîn kirêtî ye. Ez di vir de behsa tekoşînkirinê ango ji aliyê civakî û siyasî ve di nava sînorên ku ew ji hemû aliyan ve were qebûlkirin de hatina rewşeke kesayetbûnê dikim.

Ger hun jî ji bo zayendîtîya xwe bibêjin, “çi be jî gelekî pereyan dike, ger li vir nebe jî ezê li wir bifiroşim, ezê ev qasî biha bifiroşim.” Wateya vê hunê xwe bikin mijara milkbûneke gelekî xirab. Hunê bikevine bin serdestiya hindekan û xwe bifiroşin. Bikevine rewşekê ku bibine malekî pênc qirûş nayê dayîn. Riya pêşîgirtina van xeteriyan, riya ku em ji bo xwe bingeh digrin e. Pêwîste neyê înkarkirin jî. Pêwîste mirov nebêje “malê min e, ji bo ku biha bifiroşim ezê li benda kiryarekî mezin bim.” Ez van weke sembol diyar dikim. Ji van zêdetir pêwîste bibe raveya rêzgirtina mirov a ji bo xwe û xwezayîbûna xwe. Lê belê ji bo vê jî pêwîste mirov bibe mirov. Gelo li gel me kesayet çi qasî mirov e? Ev tekoşîn tekoşîneke mirovahiyê ye. Em dixwazin bibin mirov. Diruşma me ya din jî ev e. Ji bo bikaribin zayendîtiyê weke mirov bijîn pêwîste hindekî tekoşîna çînî were qezenckirin.

Ez nirxandineke giştî bes dibînim. Pêwîst e kesayet li ser vê biponijin û nîqaş bikin. Hindekî xwe tengav bikin û em dixwazin çi bibêjin hindekî têbigihên. Ez tekoşînekê dimeşînim. Ev tekoşîneke zehmet e û ez bawer di-

kim ku min bi vê encamên baş derxistine. Naxwe jinên ku ev qasî alîgirên azadiyê ne dernediketine holê. Ger di refên me de zilamek erzan nêzî jinê nabe, ev rewş nîşan dide ku tekoşîn berhemên xwe dide. Nêzîkbûnên erzan gelekî hatine bisînorkirin. Pêşketinek heye, nêvenga têkîliya rêzdar tê afirandin. Ger xiyanet lê neyê kirin, li çepê yan jî li rastê neyê razandin her biçe gihiştina pêvajoyeke têkîliya mirovî gengaz e. Pevçûna mirovên rêzdar ber bi dinyaya têkîlîyê ya mirov zêdetir rêzdar dike gengaz e.

Têkîliyên di bin pîvanên zewacê de her çi qasî di bin navê şoreşgeriya klasîk de be jî ez zêde watedar nabînim. Têkîliyên we yên erzan ên di dibistanan de jî zêde cidî nagrim. Nêzîkbûnên weke "lihevhatiya min e, evîndara min e" jî têkîliyên weke ne cidî dinirxînim. Ji ber ku naveroka van nîne û ne xwedî nirxin. Têkîliyeke birûmet di asteke wiha de nayê bidestgirtin. Ewên ku têkîliyên bi vî rengî dijîn, em wan dihejînin û dibêjin "were ser hişên xwe, têkîliya mirov a bi mirov re ji rêzê negre dest." Di heman demê de şêwazên têkîliyên pergalê ne. Şêwazê têkîliyên pergalê taybet ên faşîzma 12 Rezberê di giştî de ya serdestiya emperyalîst ku bi ragihandinê weke bahozê di nava mirovan de belav kiriye û mirov gelekî kirine kole ye. Pejirandina vê stûtewandin bi xwe ye û wendakirinê rave dike. Ev yek ne azadiye jî. Ev dibe rewşeke ku em dixwazin vê hindekî bi tekoşînê derbas bikin û qezenc bikin.

Em dixwazin jinên hîn nêzîkî azadiyê ne û zilamên hîn nêzîkî wekheviyê ne ji aliyê estetîk ve pêş bixin. Ji têkîliyên ku mirov jê nefret bike dûr bixin. Rewşên ku hev gelek xirab bi kar anînê derbas dikin û bigihînên rewşên ku kêm zêde rêz were nîşandan. Li ser vê bingehê hêdî hêdî ber bi çareseriyê ve çûyîn çêdibe. Ger her kes di vê mijarê de bi baldarî li ser xwe bisekine, xwe rast şîrove bike û rast xwe tevlî çareseriyê bike wê pêşketin ronahîtir bibe. Zayendîtî weke ajoya jiyanê ya gelekî xwezayî dê ji bo pêşketinan bingeh ava bike û mirovan bihêz bike. Di şûna nêzîkbûnên seqet hatine hiştin an jî weke siyasî, civakî û çandî li dijberî civakê tên xebitandin, wê bigihên nêzîkbûnên ji bo pêşketinên siyasî, civakî û heta çalakî ku gelekî hêzê dide. Li gel bin xistina vê ve dê zayendîtî ji binketinê rizgar bibe û bigihê ristê

xwe yê bingehîn. Bi destxistina vê ve dê bibe civakbûn û siyasîbûna bihêztir û ev jî çareseriyeke rast e. Lêhûrbûna me li ser vê bingehê ye.

Mijar li ser vê bingehê gelekî hate bidestgirtin. Ger zêdetir bi wêrekî serdeçûn çêbibe, zehmet be jî her çi qasî em ji pêvajoyeke zehmet û azad re derbas bibin jî em rûmet bidin ku emê bigihên çareseriyeke saxlem. Em hêvî dikin bi hindek sebir, tehemûl, rexne û tekoşînê ve emê pêvajoyeke azad bi dest bixin. Wê demê pêwîste em hêz bidin vê kesayeta saxlem bi dest bixin, perwerde bikin û bihêz bikin. Azad bikin ku bi vî rengî hun bikaribin ristê çareserî û rêbertiyê bilêyîzin.

-Em dizanin ku di civakê de bandora tore û kevneşopan giran e û jin bi hemû aliyan ve dibe kole. Di azadkirina jina kole de gelo hun kîjan rêbazan bi kar tînin? Di van rêbazan de bi destxistina nêzîkbûnan de gelo hun zehmetiyê dikişînin? Gelo ev nêzîkbûnên we ji aliyê hindek kesan ve tê bikaranîn?

**- Rêber Apo:**

Rêbazên ku gelê Kurd dikişîne azadiyê em ji bo jinê jî pêk tînin. Bihêzkirina jinê wêrekîkirin, zanyarîkirin û vê jî bi ezmûna pêşxistina hêmanên ku em her dem berçav dikin in. Bêguman dê bikaranîn çêbibe. Tiştê ku bi vê şêweyê em îdealîze dikin diyar e. Li şûna pirsa jinek bidestxistin û li ser bingehê kevneşop û modern, pergalên malbateke çawa tê avakirin, bersivdayînê em dixwazin kesayeta jinê ku di bin her mercî de şer bike, biafrînin. Avakirina vê kesayetê berfireh e û gelekî tevlîhev tê pêşxistin. Mirov dikare bibêje dibe ku ev yek neyê biserxistin. Ger Rêbertî di vê mijarê de sitîla xwe ya bingehîn nede axaftin derketina holê ya jinên azad û pêşketina wê zehmet e. Pergalên têkîliyan ên heyî bi qasî tê bawerkirin, zêdetir bi kevneşopên feodal û pergalê ve bar kiriye, bi nêzîkbûnên ku wan bingeh digrin ve bar kiriye. Bi destxistina azadiyê ya aliyan watedayîna wan têkîliyên azad gelekî zehmet dibe. Di vê mijarê de tengasiyên mezin dijîn. Ji ber wê jî şoreşgerkirina hev gelekî bisînor e. Berovajî asta wan a hev xistinê hîn zêdetir e. Di vê mijarê de navnîşaneke hêsan nîne.

Weke her dem ez diyar dikim, bidestxistina azadiyê û azad jiyîn bi qasî pêşxistina şer hêza hizirandinê, hostetiya teqtîk û sebir dixwaze. Bi rengekî erzan nêzîkbûneke bi şêweyê “min hez kir, me têkîlî ava kir, çêbû û çû” dê bibe sedem ku kesayet wenda bike. Bi rihetî gengaz e ku mirov bibêje, li gel me hezkirin û têkîliyên erzan zêde watedar nînin. Di vir de bi qasî tê bawerkirin hîn zêdetir tekoşîneke dijwar pêwîst dike. Kê çi qasî di zayendîtiyê û ji rêzêbûna têkîliyên jinê de asê bimîne ew qasî wenda dike. Tenê weke ajoyekî wate bide, ew qasî dikeve. Bêyî ku dahûrînên zayendîtiyê bike têkîliyên ku bi pêş bixîne dê gelek tiştan bide wendakirin.

Jixwe di pirsên berî vê de min diyar kir ku tiştên pêwîste hîna zêdetir were zelalkirin ev e. Ew torên ku li derûdora zayendîtiyê hatine hunandin, çawa ji pergalê re xizmetê dike, ji dîrokê hetanî niha çawa hatiye hunandin û kesayet jî ev çawa xistiye milkiyetê? Dîsa me danî rastê ku ev şêwazekî milkiyetê ya gelekî hatiye ziravkirin e. Bi vê ve jî azadî nayê bidestxistin û azadî nayê jiyîn. Di bingehê girêdaniyan de girêdaniyeke wisa cih nagre. Diyar e ku malbat di vê mijarê de şêwazeke milkiyetê ya herî xirab e. Bêyî ku rengê milkiyetê yê di malbatê de were derbaskirin, em nikarin zêde serkeftî nêzî azadiyê bibin. Milkiyeta di malbatê de mirov hetanî milkiyeta herî xirab dibe. Ev jî zelal e. Di vir de tenê mal û milkê malbatê, milkiyeta pere, ax û amrazan na, di wir de mirov jî dibin milk û hetanî dawiyê tevlîhev dibin. Jin di vir de dibe amrazeke herî zirav. Jin dibe zindiyeke ku metabûyîna herî zirav dijî. Dahurînên me li ser vê bingehê ne. Azadî bi vê dahurînê ve pêş dikeve û ev jî tekoşîneke girîng dixwaze.

Vê pirsê her kesek dipirse gelo ma jinek an jî keçikek ji bo ku di vê mijarê de lewaz nebe divê çi bike? Bersiva vê di dahûrînê de veşartî ye. Misoger dê bizanibe ku bi hêsanî azad nabe. Ji hemû aliyan ve dê temsîla dahûrînên şoreşgerî bi dest bixe. Dê balê li pîvanên jiyana hundirê pergalê bikişîne. Dê nekeve nava xefan û di vir de hişyar be. Li gel vê weke zayendekê dê xwe her dem azad bike.

Azadiya beden, giyan û hizirandinê gelekî pêwîst e. Carekê pêwîste hun têbigihên ku bedena we çi qasî azad bûye? Li gor min bedena we hemû ji

bûyîna mijara milkiyetê rizgar nebûye. Gelek ji we di asta ferasetê de xwe li ser bingehê milk qebûlkirinê ve bi sînor kirine. Ew zîhniyeta “hindek dê li min xwedî derbikevin, hindek dê min bistînin, hindek dê min bi kar bînin.” Li kûrahiya giyana we de cih girtiye. Mijara milkiyetê di vir de veşartî ye. Pêwîste bersiva berovajiya vê were dayîn, bibe mijara gotinê li şûna ku hun her dem bibêjin, “hindek dê wiha li min bikin, hindek dê min bigrin û bistînin, hindek dê min wiha bi kar bînin” pêwîste hun bibêjin, “ezê çawa xwe azad bikim, çawa xwe ji vê rewşê derbixim, biryara min, îradeya min û jêhatiya min a ecibandinê dê çawa pêk were?” ev bi gotina, “bi rastî jî ez kî me, çi dixwazim, tişta ez dixwazim ezê çawa bi dest bixim? Ve çêdibe.

Ji bo ku hun nebin malê tu kesekî û ji bo hun xwe bi çorsî girê nedin, hunê çawa balê li rêgezan bikişînin, hunê li rêgezên şoreşê, rêgezên welatparêziyê, rêgezên partîbûnê, bûyera rêxistinê ji hemû aliyan ve jiyana şoreşgerî hunê çawa nirx bidine şêwazê xebat û şer bizanibin. Hunê bi van ve kesayeta xwe bihêz bikin. Aliyê birêgeziyê û pratîk her dem di ber çavan re derbas bikin. Li ser vê bingehê hun dê xwedî li xwe derbikevin. Li gel xwedîbûna xwe ve karê parvekirinê, bi mirovên azad re yên ku ji parvekirinê fêm dikin û vê jî bi keda azad ve dikarin bimeşînin, naxapînin û durûtiyê nakin re di her astê de têkîliya azad çawa tê avakirin û pêşxistin hun dê bizanibin. Hun dê vê jî bêyî ku ev yek ji hemû aliyan ve şerê azadiyê ji bîr bikin, bi hestên erzan, azweriyên azad û nazdariyan ve nayê serxistin bizanibin. Ev jî destpêkê şerê bîrdozî, siyasî, rêxistinî û giyanî pêwîst dike. Ev şerekî parastina bedena xwe ye. Her dem girêdayî bi tedbîrên ku xwe nexistina rewşên tengav e. Wê dê di vê mijarê de biryara we û zimanê we bihêz be û hunê her dem wiha tekoşînê bikin. Bi vî rengî hunê xwe li hemberî xeteriyê biparêzin. Riya ku diçe azadiyê dê hindekî wiha were qezenckirin. Ev şer bi tenê bi hestan ve nayê meşandin. Bi rêgez e, bi siyasîbûnê û bi pêşketina rêxistinî ve gelekî girêdayî ye, bingeheke xwe ya mantiq heye. Hest jî bi tenê li ser vê bingehê watedar bin û pêwîst e li ser vê bingehê xwe rave bike.

Ez bi zehmetiyan ve rûbirû dimînim. Jin li gel me weke ucubeyan e. Tiştê herî ji me hêvî dikin, an axayek an birayekî mezin an jî helwestên mêrekî ye. Ev yek zelal e ku ev li hemberî van helwestan in û rastiya Rêbertiyê jî wiha nabe. Ew kekîtiyê, xwişka mezintiyê, pîrekiyê, mêritiyê, axatiyê nake. Mezintiyê nake, xwedî şêwazeke milîtan e. Naxwaze yê li hemberî xwe weke milkekî bibîne. Dê bixwaze ku mirov azad bibîne û bi pîvanên azad ve nêzîk bibe. Ger pêşketineke yê beramberî xwe nebe bêguman dê vê yekê şaş fêm bike. Tiştê ku ew ji nêzîkbûnê fêm dike "wisa nêzikî min bû yan jî wisa li min nihêrî" bibe. Ev helwesta pîrejinekê ye. Feraseta kevneşop anîna ziman e û bi kurtayî hovane ye. Di refên me de tiştê ku li şûna vê were rûniştandin û pêşxistin neçare cuda be. Dema du kes li hev hatin, yekcar têkîliya xwe dikarin bibin rengên herî kirêt û pişt re jî nikarin ji bin vê yekê derbikevin. Di kolanan de dimînin, diçin xiyanetê. Ev ji ber têkîliyên bêrêgez wiha ye.

Hindek jî di nava helwestên gelekî çors û înkarkirinê de ne. Ji bo ku xeletiyan nekin, înkareke kûr dijîn. Ketîbûn û înkar di rastiyê de weke du rûyên madalyonê ne. Em dixwazin van herduyan jî bidine derbaskirin. Ev rastiya mirovekî ye û taybetmendiyeke wî ya xwezayî ye. Nayê înkarkirin. Lê belê şerê azadkirina wê û rastjiyîna wê jî tê dayîn. Ji bo ev yek xelet neyê têgihiştin êdî pêwîstî bi milîtanbûnê heye. Jixwe ji ber wê em ev qasî bi we re mijul dibin. Heta ku mirovên xwedî kesayetên azad derbikevine holê dê hewldanên bi zehmet berdewam bikin. Ger em dixwazin gavan biavêjin, gelek tiştên ku di vê mijarê de werin kirin hene. Hunê ezez nebin. Karê ku hun dikin nirxeke xwe ya dîrokî û civakî heye. Hunê vê yekê bibînin û kesayeta xwe wiha amade bikin. Hunê bi hezaran kesan jî li ser vê bingehê perwerde bikin. Dema hun fermandariyê dikin, xebatên rêxistinî dikin her dem van di pêş çavan re derbas bikin. Hunê van zehmetiyan bi hemû aliyan ve derbas bikin pêşî li ferasetên xelet bigrin.

Feraseta namûsê ya hov heye. Di rastiyê de di bin vê feraseta namûsê ya hov de ketîbûn tê jiyîn. Mînak tu caran nikarin zayendîtiya xwe kontrol bikin, bi rihetî dikarin bibin heta rengên herî kirêt. Nikarin pîrozkirina

zayendîtiyê pêk bînin û nikarin taybetmendiyeke ku di xizmeta tekoşîna me de rist bilêyîze pê bidin qezenckirin. Xistin, revandin û xiyanetê didin jiyîn. Ev jî encamê malbûna kûr a kesayet de ye, hilweşandinê ye û neçariyê ye. Rêbertî dixwaze girêka kor a di vê mijarê de çareser bike. Dixwaze xetimandinê û girêka ku gefan li jiyanê dixwe çareser bike. Ev qasî girîngî dide hewldanên afirandina jinê. Bi çareserkirina girêkan, derxistina rastê ya xetimandinan û bi taybetî jî sextetiyê ve mijûl e. Pirsgirêk ji xwetêrkirina kesayet hîn wêdetir e. Em balê li encamên polîtîk dikişînin.

Her tiştekî ku aliyê xwe yê erênî û neyînî bandor dibin hene. Rasterast meşandina vê ne gengaz e. Her dem ê ku xirab pêşwazî dikin, dinirxînin û îstîsmar dikin dê hebin. Dibe ku her kes vî wiha bibîne û ferz bike. Dîsa jî hunê dest ji helwesta azadiyê bernedin û derfetê nedin ku xwe hêsanî bikin kole. Hunê xawêniya bûyîna kesayeteke azad gelekî baş bizanibin û vê berdewam bikin. Zimanê şoreşê hindekî zimanê xwe herikandinê ye û bi hêsanî xwe dîlnekirinê ye. Pêwîste keçikên ciwan jî ê herikandinê û dîlnebûnê baş bizanibin û nekevin rewşên ku rê li ber têgihiştinên xelet vedike. Ango kevneşopan jî di pêş çavan re derbas dikin, lê belê ji rêgeza azadiyê tawizan nedin. Bi şerekî taktîkî ya baş ve vê qadê pêwîste hun baş bimeşînin. Ev ji dahûrîneke teorîk zêdetir tekoşîna pratîk a di jiyanê de ye, di kesayeta azad de israr e.

Bûyîna min a çavkaniya hezkirinê misoger bi dahurîn û xebatan ve girêdayî ye. Piştî ku çi qas têkîlî û nakokiyên hezkirinê disekinînin û tevlîhev dikin hebin, hemû hatine çareserkirin û piştî ku bingehê azad a riya ku diçe hezkirinê ev qasî hatiye vekirin bêguman dê civak veguhere çemê hezkirinê. Ji ber ku em destên ku komkujiya hezkirinê ferz dike dişikînin û şoreşa hezkirinê didin avakirin, ev têkîliyên rast in. Bi qasî ku têkîliyên rast bi pêş dikevin, hezkirin jî weke lehiyekê mezin dibe. Ji ber ku em bi qasî raveya wê ya zanistî hewldana pratîkî jî nîşan didin, îro Rêbertî gelekî tê pejirandin. Ji ber ku ew pêdîviyeke dîrokî pêşwazî dike û ji bo nakokiyên civakî dibe hêza çareseriyê bi pejirandin û hezkirineke mezin ve hatina qebûlkirin encamek e. Ger her kes xwe li ser vê bingehê bidê dibe ku bibe

heman mijara hezkirinê. Her kesekî ku gavê vê yê dîrokî dibîne dikare bibe hêza çareseriyê û di vê mijarê de bi biryarbûna xwe dizane nîşan bide, bi rihetî dikare di bûyera hezkirinê de pêşketinê pêk bîne û were hezkirin. Ew nakokiya bêhezkiriniyê û bêrêziya di hundirê xwe de dikare çareser bike.

Di hewldanên Rêbertiyê de dîtina vî tiştî gelekî hêsan e. Di vê mijarê de jî spartekên şoreşa hezkirinê û lêhûrbûna hezkirinê heye. Pêşxistina têkîliya azad di serî de bi asta xebatên siyasî û rêxistinî ve, bi kesayetekî ku bi hêsanî bi bin nakeve û ji bo hemû pirsgirêkan çareseriyê dibîne ve pêwendîdar e. Ya herî girîng jî di hewldanên berfireh û helwestên xweşik ve bi yek peyv be jî di cihê wê de bi kar anînê ve pewêndîdar e. Bi qasî ku helwestên gelek xweşik û uslûbên xweşik ve, bi erkên bingehîn ve girêdayî jiya, her kes tê hezkirin û dikare rê li ber şoreşa hezkirinê vebike. Bêguman di vê mijarê de gelek karên ku milîtan bikin hene.

- Em hewldanên Rêbertiyê ji bo azadkirina xwe dizanin. Ger piştgirî û hewldanên Rêbertiyê nebûna, dê hewldanên hevalên zilam ên ku di nava refan de çêneba?

**- Rêber Apo:**

Hewldanên Rêbertiyê tenê ji bo azadkirina jinê nînin. Ji bo azadkirina zilame jî. Her çi qasî serdest diyar bike jî, eniya din a koletiyê zilam e. Ji koletiyê bi qasî jinê zilam jî berpirsiyar e. Dahûrîna zilam jî û kişandina azadiyê weke hewldaneke berfireh berdewam dike. Rêbertiyeke sosyalîst di vê mijarê de xeteriyên serdestiya zilam jî û nehatina wî ya pejirandinê dibîne û li dij vê disekine. Di hewldanên Rêbertiyê de temsîlkirina azadiya her zilamekî li aliyekî bimîne, bi hêsanî tawîz nedana ji serdestiya zilam bêguman xeter e. Li hemberî vê yekê di serî de pêwîste jin tekoşîneke gelekî xwedî rêgez bimeşîne. Gelek derfetên ku civaka serdest a zilam ku dide zilam hene. Dibe ku zilamên şoreşger an jî yên ku xwe wisa dibînin ne di zanebûna vê de bin, lê belê jin neçare di zanebûna vê yekê de be.

Taybetmendiyên serdestiya zilam, ku xistina bin serdestiya xwe û ferz dike gelo çi ne? Jinê di vir de dê tekoşîneke gelekî biaqil, di cihê xwe de û mirov dikare pê re bi aheng be bide. Weke anarşîstî bi şêweyeke ku

yekîtiyê, azadiyê û tekoşînê tengav bike na, yê ku bi wê re bi tundî berjewendiyan bi pêş çavan re derbas dike, lê belê wê dê jiyan û tekoşîneke ku taybetmendiyên serdestiya zilam mehkûm dike jî esas bigre. Jin bi taybet di vê mijarê de ristê ku dikeve ser milên xwe dê bilêyîze. Pêwîste li ser vê bingehê zilaman bikişîne partiyê. Pêwîste di mijara xwe kişandina xeta Rêbertiyê de rexneyan bike, heta bi berfirehî perwerde were dayîn. Ya herî girîng jî hun bi kesayeta xwe ya kole ve tawîzan nedin kesayetên serdest. Tawana herî mezin hun bi xwe dikin. Ji ber zilam dihizirin ku bi rihetî li ser we serdestbin, ê ku dibe sedema vê ferasetê şêwaza we ya jiyanê ye. Hun çi qasî xwedî niyeteke baş bin jî, çi qasî wekhevî û azadiyê bixwazin jî hun bi şêwazê jiyana xwe ya kevneşop ve bi wan didin hîskirin ku hunê xwe weke mal ji bo wan pêşkêş bikin. Ji ber vê sedemê pêwîste kesayetên we azad û hindekî serdest be. Di astekê de be ku xwe li beramberî xwe azad û wekhev bide hîskirin.

Bêguman hun dikarin vê yekê bi tekoşîna ku kesayeta we dide ve pêş bixin. Bêyî ku hun bigihên vê kesayetê hunê her dem li hemberî zilam stûtewandîbin, lihevhatî û li dora wan bigerin. Ew jî dikarin we bi rihetî tune bikin. Ji ber wê hemû zewac, hemû evîn, hemû dostanî li dijberî jinê bi encam dibin. Encamê ku jin jî ji vê derdixe gihiştina kesayeteke jinê ya fêlbaztir, qurnaztir û ji rêzê ye. Zilam zêdetir dixe lê belê di civakê de ya herî zêde wenda dike jin e. Em di vê mijarê de jî naçin hêsaniya vî karî. Em tiştê bi hemû aliyan ve hildibijêrin, ev jî nêzîkbûna azadî û wekheviyê ye. Ev hest û azweriyan ve ne, hindekî bi tekoşînê û hewldanên wê yên berfireh ve tê çareserkirin. Hunê kesayeta xwe ya li hevhatî û ku her dem li benda rêvebirinê ye derbas bikin, hunê xwe hindekî li beramberî xwe bidine hîskirin. Ev jî bi kesayeteke pêşketî ve gengaz e. Bi kesayeteke têdigihê, dikare rêxistin bike, dikare têkoşînê li her qadê bi pêş bixe û di giştî de dikare jiyanê azad bike ve gengaz e. Bi kurtayî, bi ehbapgerî ve, bi hemşarî ve, bi gotina “em ji hev fêm dikin, ji hev hezdikin” ve ev pirsgirêk çareser nabin. Bi rêbazên “gelek pêdîviyên me bi hev heye, pêwîste em hîna zêde hev bixapînin” ve mirov nikare ji bin barê vî karî derbikeve. Di vê mijarê de

jî rêgeza azadiyê, rûmet, berxwedan, mêrxasî, wekhevî, wêrekî, fedakarî û gelekî şiyarbûn pêwîste hebe. Ger hun li gor me bijîn, bêguman hun dikarin wan jî bi dest bixin û bixine riya rast.

- Gelo pêwîste di têkîliyan de çi qasî xwezayîbûn hebe?

**Rêber Apo:**

- Pirsgirêka xwezayîbûnê bi serê xwe wateyekê rave nake. Di rastî de kesayeta xwezayî taybetmendiyê xwezayî, helwestên xwezayî nînin. Xwezayîbûna ku mirovî ye, ji zû ve çewisandina wê, veguhertina wê ya ji bo tiştekî din û li gorî berjewendiyan veguhertina wê tê jiyîn. Hin têkîlî di gotinê de nêzîkî azadiyê ne, lê belê kesayetên wiha nînin. Mirovên Efrîqî ji bo şêweyên têkîliyên xwezayî hindekî nêzîktir e. Lê belê em ji dîrokê baş dizanin ku ev xwezayîbûn di demeke gelekî kurt de çawa digihê asta serdestiyekê û milkiyetê, çawa rûbirûyê veguherînekê ve tê.

Di rastiya civaka roja me de di pîvanên kesayet de xwezayîbûn zêde bi bandor nîne û heliyaye. Di şûna wê de têkîliyên gelekî cuda, di her taybetmendiyên wê de bêhna civaka çînî jê tê, bi wê ve seqet bûyîn mijara gotinê ye. Ji ber wê jî ger bi tenê azadiyê ve bigihê hev, wateyeke xwezayîbûna mirov çêdibe yan jî kesayet azad bibe dikare xwezayîbûnê bi lêv bike. Ew jî xwezayîbûneke di wateya hov de nîne. Xwezayîbûneke pêşketî ye. Di vê wateyê de em dikarin xwezayîbûna sosyalîzmê weke ew rêpîvanên ku civaka çînî qetil kiriye derbaskirina wan û xwezayîbûnê bi kesayeta azad a pêşketî ve yekgirtinê binirxînin. Kesayeta sosyalîst ew taybetmendiya xwezayî ku civaka çînî perçiqandiye dubare bi dest xistine. Lê belê weke mirovê hov ne, weke mirovekî pêşketî ve jiyîn e. Mirov dikare pêwendiya di navbera xwezayîbûn û azadiya sosyalîst de wiha ava bike, kesê ku azadî bi dest xistiye dikare xwezayî be. Derveyî vê mirovekî di çarçoveya civaka çînî de tevgerîna wî ya xwezayîbûnê ez bêderfet dibînim. Teqez li ser bingehê bandorên pergalê de van helwestan bandor dike.

Her çi qasî hindek xwe di bin navê helwestên xwezayî de bifiroşin jî, bi qirêjiyên emperyalîst-kapîtalîst ev peyv qirêjkirinê û reklamê wê kirinê wêdetir nikarin bibin xwedî wateyeke din. Xwezayîbûna ku heye, reklamek

e. Em baş dizanin ku ka di nava şêwazê jiyana kapîtalîst-emperyalîst de reklamgerî çi qasî pêşketî ye. Xwezayîbûnê gelekî îstîsmar dikin. Dixwazin xwezayîbûneke nîne weke ku gelekî pêşketî nîşan bidin. Berovajî di vê mijarê de durûtiyeke mezin mijara gotinê ye. Tund e, pîvanên wê di xizmeta milkiyetê de ye û li ser bingehê qetilkirina xwezayîbûnê ye.

Azadbûna şoreşgerî dikare xwezayîbûnê bi dest bixe. Di vê navberê de têkîliya xwezayî bi pêwendiya xwezayî û bi jiyîna aştiyan a bi xwezayê re bi aştî jiyîna mirov bi xwezaya xwe ve pêk tê. Di vir de li ser bingehê ji feraseta mal û milk dûrketinê û xwe bi azadî ravekirinê ve dikare di zayendîtiyê de jî bigihê xwezayîbûnekê û rewşa ku em dikarin weke têkîliya azad bi nav bikin çêbibe. Di vê wateyê de şûna durûtî û çewisandina di têkîliyan de û xirab bi karanîna wê li derûdora mirov de weke heyîneke xwezayî, lê belê di mercên civakî ya azad de jinûve hilberînê ve ev mijar hîn xwezayîtir dibe ku were nîqaşkirin. Di vê wateyê de zayendîtî jî ji koletiyê rizgar dibe û azad dibe. Bi rastî jî ev pirsgirêkeke ku tekoşîna şoreşgerî balê lê bikişîne û gelekî hewldanan nîşan bide ye. Derveyî vê lêgerîna xwezayîbûnê xapandin e. Ev jî dê wê kesayetê bi durûtî di çarçoveyên pergala heyî de ber bi xwe xapandinê ve bibe.

Ev nîqaş bi taybetî weke xwe nabe ku di romanê de were nîşandan. Ev nîqaş ji bo pirsa dema kesayetên romanê têne bidestgirtin, gelo pêwîste mirov xwe bispêre kîjan dahûrînan û pênaseyan, were zelalkirin tê pêkanîn. Wê ji bo têgehên bingehîn, têkîliyên bingehîn, kesayetên bingehîn, nêzîkbûneke çawa çêbibe em binesaziya wê ava dikin. Bêguman mirov dikare bi nîqaşan vê yekê dewlemendtir bike. Em dikarin gelek pirsan bikin, gelek kesayetan zelal bikin, gelek mînakan bidin û piştgiriyeke mezin bidin hunera romanê. Li ser vê bingehê ez dubare hezkirinên xwe ji we re pêşkeş dikim.

**8 Gelawêj 1993**

## ISRARKIRINA DI XELETÎYÊ DE, DI JÎYÎNA KOLETÎYÊ DE ISRAR E

Pirsgirêka malbat û jinê dibe ku weke pirsgirêka malbat û zilam jî were nirxandin. Ger ev pirsgirêk ji hemû aliyan ve nexweşiyeke xeter be û neçare mirov li ser maseyê birazîne û bi ameliyatê baş bike, gelo ji bo parçe û dirêjahiya wê mirov dikare çi bibêje?

Civak ji zilam û jinê ava dibe. Civak bêyî zilam û jinê nabe. Malbat, têkîliya jin û zilam an jî weke têkîliya zewacê bi navên cihê ve anîna gel hev e. Pênase gelekî hêsan e. Lê belê dema di roja me de em li şêwazên li gel me pêk tên temaşe dikin, "ji bo xwedê çi bi malbatê hat, ev çi jiniktiye, ev çi zilamtiye" negotin ne di destan de ye. Zilamê çawa, jina çawa, malbata çawa? Mirov dikare ji bo malbatê bibêje hêlîn jî. Tê gotin dayik û bav heyînên birûmet in. Em bi vê bawer dikin û wiha hîn dibin. Lê belê di temenê biçûk de bi rengê li gel me tê jiyîn, malbat pirsgirêkeke mezin e. Ev bi rengekî balkêş di malbatê de derdikeve holê. Yan jî weke barometreya wê ye. Dema em vê yekê diyar dikin nanepixînin.

Ger hun dixwazin asta netewî û civakî fêmbikin, malbatê, zilam, jin, zewacê û têkîliya wan baş tê bigihên. Ma hun dê çi nebînin! Di rastiyê de em têgeha netewî û asta civakî di gotin de zêde bi kûranî nizanin. Têgihiştina van hindekî din çand û zanyariya hîn pêşketî dixwaze. Lê belê hun dikarin malbatê hîn baştir têbigihên. Ji ber ku herî zêde hun bi vê rastiyê re têkelhev bûne. Ji bo wê jî têgeha malbatê di vegotina asta netewî û civakî ya cihê de bikaranîn di cih de ye. Pêvajoyên di derbarê civakbûn û netewbûnê di malbatê de dîtin an jî bi wê dest pê kirin gengaz e. Di vî alî de em bi giranî cih didine vê mijarê. Tenê malbatê yan jî zilam-jin û bi taybetî weke tê bawerkirin koletiya jinê û azadiya wê ji bo têgihiştinê na, ji bo fêmkirina rastiya netewî, astên civakî, exlaq, şerefa kevneşop ji bo têgehên weke rûmet û mêrxasiyê fêm bikin jî dîsa ji bo fêmkirina têgeha dijmin û têgeha ketîbûnê jî bi giranî cih dayîna vê mijarê ji aliyê rêbaz de jî di cih de

ye. Ji bo zelalkirina têgehên hest û hezkirinê jî lêkolînkirina têgeha malbatê dibe ku hindek tiştan hîn bike.

Min xwest bi nêzîkbûnên cudatir ve û bêyî ku tiştên hetanî niha hatine gotin dubare bikim, nêzîkbûnan bi pêş bixim. Lê belê astên we ferz dike ku em her tiştî ji nû ve dest pê bikin. Ji ber vê sedemê em neçar dimînin vê mijarê dubare bi dest bigrin. Ger em ne şiyar bin dibe ku hemû tiştên me kirine vala herin. Me got em hindekî jin û zilamên azad biafirînin. Lê belê ger em tekoşîneke berfireh di nava hev de nemeşînin, ji rêderxistinên di vê mijarê de baş nebînin, rastiya ku li gel me veguhertiye rastiyeke namûsê ya herî xeter û bûye navenda malbûyîneke herî xeter çareser nekin, ji rêderketineke ku hemû xeletiyan bide jiyîn, emê neçarbin bijîn û di gelekan de jî wisa tê jiyîn û berdewam dike. Em di bin bandora vê ya giran de ne.

Malbat cihê ku xerîbûna herî mezin tê jiyîn e. Tê gotin malbat qaşo cihê jin û zilam ji hev fêm dikin e. Lê belê li gor min cihê ku herî zêde li hev xerîb dibin e. Malbat di vê mijarê de mînakeke balkêş e. Ji min re nebêjin “tu di bin bandora wê de yî, malbata te wisa bû, vê jî tu li me ferz dikî” pirsgirêk ne ev e. Rastî bi rengekî pêşçav danîna holê ya malbata min ji bo min weke şansekî bû. Ev dijûn û pêvçûnên wan ên sosret rê vekir ku ez bandora balkêş a vê saziyê ji zû ve bibînim. Rastiya malbatê ya we ev tişt gelekî sexte û sergirtî jiya. Ji ber wê jî hun hatine xapandin.

Dibe ku bi malbatê dest bi karkirin, ji gelek aliyan ve di cih de be. Zelalkirina şêweyê malbatê, fêrbûnên malbatê, kevneşopên malbatê dê we bibe ronakbûneke balkêş û ji nû ve avabûnê. Dîsa em bi destgirtina rastiya dê û bav bigrin û heta zelalkirina têgehên hevjînî, dostanî û zarok dibe ku we bibe encamên girîng û pêwîst. Hêza wê ya nêzîkbûna rast gelekî lewaz e. Nêzîkbûneke ew qasî bi xeletiyan ve dagirtî heye ku emê ji kîjan dê û bavê behs bikin? Hemû jî reben in. Emê ji kîjan zarokan behs bikin? Hemû perîşan in. Emê ji kîjan zilam û jinê behs bikin? Hemû rûreş in û neçar in. Di rastiyê de pêwîst bû ku vê saziyê û vê têkîliyê hêz bidaba, jixwe ji ber wê xwedî girîngiyeke mezin e. Tê gotin ku malbat di civakê de saziyeke herî bingehîn a jêneger e. Lê belê li gel me veguhertiye saziyeke bêhêzbûnê û

her diçe dibe amraza di bin pirsgirêkan de fetisînê–ev rist ji aliyê dijmin ve tê lêyîstin. Zêde pêwîstî li ser mijarên dagirkerî û malbat, ji dîrokê heta niha malbat, bi taybetî 12 Rezberê û malbat, dîsa di wateya giştî de têkîliya jin û zilam, wekhevî û têkîliyên azad de teorîkirinê nîne. Bi taybet di nava refên me de hindek ji cewher dûrketin derdikevine holê. Ji ber xwezaya tevgera azadiyê dema em dibêjin jin jî, zilam jî weke ku dixwazin dikarin tevlî vî karî bibin ji ber ku şêwazeke têkîliyê ya herî bingehîn e, dema ku me têkîliya jin û zilam ji asteke ku heta qirika xwe tevlî dijmin bûye, yan jî xefletê bûye dewr girt, ger hun tevdîr negrin û şiyar nebin, hunê belaya herî mezin bînin serê xwe. Ji bo jinûve sererastkirina têkîliyan tevlîbûna tekoşînê pêwîst e. Lê belê ger hun şêwazên wê yên rast ferz nekin ew bi serê xwe ji bo belavkirina arteşekê têr dike.

Ger têkîliyên jin û zilam bi rêgeza partiyê ve li ser bingehê wekhev û azad de bi şêwazên ku em jê re dibêjin nêzîkbûnên rêhevaltiyê ve çênebe, emê xwe di du rojan de tasviye bikin. Ev dê him jî bi navê hezkirin û azweriyê ve were kirin. Me dît ku tevdîr nayên girtin gelek herêmên me tasviye dibin an jî bi zehmetî pêşî li tasviyebûnê tê girtin. Di vê mijarê de jî ez ezmûn û çavdêriyên xwe datînim holê. Di vê mijarê de bi qasî wêrekiyê gelekî balkêşbûn jî çêdibe. Em li vir ger gelek nêzîkbûn û şêwazên têkîliyan ji kîjan kevneşopî, kîjan nêzîkbûnên mal û milkê bingeh digre, dîsa ji bo kê berjewendiyê pêk tîne, ji bo xwe yan ji bo dijmin dixebite, dibe azadiyê yan jî koletiye nediyar e, bêyî ku em bi hemû aliyên wê ve dernexine holê em zêde fêm nakin ku ka em şoreşê ji bo çi dikin û em nikarin pêşî li hewldaneke xedar li serê me bibe bela bigrin.

Ger hun pêşiyê lê negrin, wê jina ku bi xeletiyan tê nava tekoşînê we tune bike. Me ji zû ve xwe ji van mijaran cihê kir. Ger min nekarîba di temenên gelekî biçûk de li van mijaran bi guman û dijberî kevneşopan lê temaşekirinê serxistiba, ez niha ji zû ve tune bibûm. Pêwîste jin û civakbûn bi hev re bimeşe. Di vê mijarê de em gelekî şiyar bûn û em ji heft salî hetanî niha ji bo pêşxistina şêwazekî dixebitin. Ger hun bûna ji heft salî hetanî niha ji vê ketibûne nava vî karî. Jixwe cudabûneke me jî wiha derdikeve holê.

Mînak we wisa bawer kir ku hun hev hêsan diecibînin, bi hêsanî evîndar dibin û hestyar dibin. Kê dizane di hundirê we de çi azweriyên mezin hene. Dema derfet bibînin hunê wan bixin çi rengan?

Ji ber ku ev hemû hene, ez we gunehbar nakim. Ajoya zayendî ajoyeke gelekî xwezayî ye. Azweriyên jin û zilam gelekî xwezayî ne. Pirsgirêk ji ber ku ev hene, rexnekirina van nîne. Ger em vê yekê bikin emê xwezayîbûnê înkar bikin. Ev jî bi rasteqîniyê ve nagihê hev. Pirsgirêk cudatir e. Mînak bi navê ajo û evînê çi hate serê me? Di bin têkîliyan de çawa têne xapandin û dixapînin. Di nava têkîliyan de derew, koletî, bêtêkîlîbûn û înkar heye. Me êdî di vir de birîn teqandin. Ev têkîliyên wiha ji bo çi û ji kîjan birînê derdikevin holê? Min ev yek îcad nekiriye. Dijmin bi sedsalan lêyîstiye û birîn veguhertiye qangrenê. Me got dibe ku baş bibe, derzî tê re kir û me xwest were ser hîşên xwe, me vala negot ev têkîlî sîxuriya objektîf e. Ev sîxuriya objektîf têr dike ku li gel partiyê, tevgera rizgariya netewî bi erdê ve bike yek. Weke her şêweyê koletiyê ji bo şêweyê vê qadê jî em stûyê xwe natewînin û hev nakin kole. Ji bo ku em ajoyan hestên erzan û heta hindek evînan nejîn emê xeletiyên mezin nekin. Emê di vir de bi pêwîstiya kuştina azwerî û evîna xelet bawer bikin. Ger li ser bingehê rast hindek tişt bi pêş bikevin, li ku derê kengê û çawa dibe bila bibe emê bi pêwîstiya di riya van de şerekî mezin dayîna pêş çavan bawer bikin.

Ev pirsgirêk weke tiştekî ku li hemberî dijmin berxwedan an jî neberxwedanê ye. Ger di cihekî de weşîn û wendakirin hebe hunê li hemberî wê berxwedanê pêş bixin. Ger we bi navê hest û evînê wenda kiribe, gelo we ji vê çi fêm kir? Zilam di riya jinekê de her cureyê bênamûsiyê dike û ji bo vê jî dibêje namûs. Welatê xwe mala xwe, bi kurtayî hemû tiştên xwe dikare ji bo jinekê bifiroşe. Jin jî wiha bawer dike ku bi zayendîtiya xwe ya çors ve dê heta dawiya temenê xwe bijî. Me ev tişt dîtin û xwe jê dûr xist.

Gelo ma hun hemû di vê mijarê de çi qasî biaqil bûn? Hun ji vê têkîliyê çi fêm dikin û çi didin? Dayika min jî digot, ma ez ne dayika te me? Li ser te ev qas maf û hiquqa min heye. Ez zarokekî biçûk bûm jî min digot, ma dayikek ji bo çi ev qas daxwazan bike? Di wan deman de di bin axûrê de

mirîşk û civîkên wê dimeşiyan. Min ji dayika xwe re got, vaye têkîliya wan çi be têkîliya min û te jî ev e. Ev şibandineke gelekî çors bû, lê belê min got. Piştre min fêmkir ku rastî hindekî jî ew e. Ji ber ku malbat bêplan e, nezan e, bêberpirsyarî ye. Min hindek zewacên ku hatine kirin dîtibûn. Zilam diçe li Çûkûrovayê bi salan dixebite, dibêje "li beramberî ev qas qelendî de me keçek stend." Xwişkên min jî bi wî rengî birin. Ma gelo ev rewşên asayî ne? Me bi van pirsan ve dest bi kar kir piştre kar mezin bûn.

Hindek ji ber hînbûnê, hindek jî ji ber pêwîstiyên kevneşopan dizewicin. Ya me zewaceke bingehê xwe yê polîtîk di giraniyê de bû. Ger me bi serê xwe têkîliya jinê bi nêzîkbûneke rast ve bi dest negirtiba, emê heta ber bi bûyîna zilamekî dewletê yê herî baş ve biçûbana. Baş bû em şiyar bûn. Sîxur bûn û nebûna ya li hemberî me jî girîng nebû. Dibe ku yeke gelekî ji dilbûya jî. Lê belê ger bi wê ferasetê, bi wê şêwazê tekoşîn nehatiba kirin me dê wenda kiriba. Gelo ma kesekî din ê ku bizanibe weke me bijî dê derbikeve? Di wateya hevxistinê û bêhêz hiştinê de çend kes hene ku ji sîxuriya objektîf nikare biçe sîxuriya subjektîf. Têkîliyên gelek kesên di nava refên me de bi pêş xistine, hiştiye ku refên me bêhêz bimîne. Mînak yekî ku çar sal in di nava refên me de ye dibêje "têkîliyeke min hebû ez ji wê dûr ketim, ez jî ji rêxistinê xeyidîm û tu caran partiyî nebûm." Sedema partînebûnê tu caran bi rêxistinê re neyekbûna wî "êşa çavê wî ya destpêkê" bûye. Hindek têkîlî ava kirine, dema ku têkîlî weke ew dixwazin bi pêş neketine, bi hêrs bûne. Ev veguhertiye bertekê û ew jî tu caran nehatine rêxistinê û artêşê. Ev tişt di dema xwe de îtîraf jî nekirine û çareser nekirine. Alozî her ku çûye girantir bûye. Ev dahûrînên dawiyê ji ber ku hindekî wêrekî daye wî niha derdikeve rastê.

Tiştê ku dibêje têkîliya destpêkê çavêşa destpêkê jî hindekî li hev temaşe kirine, evîndar bûne, qaşo bi hev şabûne. Li gel me şabûn gelekî bihêz û xeter e. Em hemû hindekî wiha ne. Lê belê ev tişt çi qasî xelet û xapînok e em baştir tê digihên. Ez bi qasî ku bi hêsanî neyêm lêyîstokan bihêz im. Mirov nikare bibêje ji bo her kesekî wiha ye. Bingehê vî karî ew nêrînên ku xwe derdixe holê, rêxistin, artêş û şerê me ji dijmin zêdetir bandora neyînî

dikin in. Kê dizane hîna di binî de çi heye? Di rastiyê de tu caran me nexwest bikevin nava pirsgirêkê. Lê belê me got bila jin jî zilam jî tevlî tekoşînê bibin, emê temaşe bikin ka dê çawa çêbe? Piştre me dît ku di hindek herêmên me de vê pirsgirêkê her çûye şer ber bi îflasê ve biriye. Di rastiyê de hemû kesayetên ji dil bûn. Hindek têkîlî bi pêş xistibûn û şer xwe bi xwe ber bi wendakirinê ve dibir.

Şoreşger wêrek û fedakar in. Ew dema pêwîst kir dest ji hest û evînên xwe yên ku dibine xeflet û xiyanetê berdidin. Hevjînên xwe jî berdidin. Ger vê hêzê raber nekin nikarin bibin şoreşgerekî mêrxas. Ez vê yekê li ser xwe jî pêk tînim. Bi tevî hemû rexneyên min ez bi rengekî rast bi malbatê ve girêdayîbûm. Em girêdaniya gund, bajar û welat nîqaş nakin. Bi tevî rexneya mezin girêdaniya herî mezin em nîşan didin. Ev çawa ye li ku derê ye, bi kîjan rengî ye, ne girîng e. Hîn jî bi rengekî berfireh mijûl dibim. Me got evîn û hest piştre me berê xwe dayê û dît ku ji ber vê evînê me xwe xistiye rewşên çênebûyî û ji dijmin hîn xirabtir in. Me li ser vê yekê pirs kir ku gelo divê girêdan çawa pêş bikeve?

Ger evînên we yên mezin hebin, pêwîste welatekî we yê ku hun ji wê re cih çêbikin û gelekî azad hebe. Ji ber ku wê cenderme werin mêrên we yan jî jinên we ji dest we bigrin. Her roj dijmin tê xeberan ji dayik û jina we re dike. We ji vê têkîliyê çi fêm kir? Di mercên pergalê de yan jî bi pivanên we yên kevneşop ve pêşxistina têkîliyekê êdî ne gengaz e. Pirsgirêk êdî di bin sîwanên sînorên pergalê de ji çareserkirinê dûr e. Pêwîste ev hemû tişt me bibe hizirandinê. Ger hin hest û têkîliyên we yên erzan hebin, pêwîste di pêş çavan re were derbaskirin. Pêwîste hun di vê mijarê de hindekî mêrxas bin.

Dahûrîna me ya malbat û jin, zilam ji bo bersivandina van pirsên bingehîn in. Di vê mijarê de hin bersiv hatibûn dayîn. Lê belê ji ber ku ev kar hindekî din giran bû, bi taybetî danîna holê ya pirsgirêkê û heta pêşxistina dahûrînê na hindekî neçariya bersiv derxistina pêş xwe ferz dike. Me malbat hilweşand, tiştê ku were dahurîn hate dahûrandin. Lê belê aliyê ku hindekî derbikeve pêş emê yê nû çawa ava bikin e. Malbat têkîliya jin, zilam, têkîliya hezkirin û hest pêwîste çawa be? Têkîliya di van mijaran de

divê çawa be, em lêpirsîn dikin. Mînak bi rengê ger ev têkîliya jiyanekê be jiyaneke çawa pêwîst dike, em dipirsin. Jixwe em navê wê jî bi rengê "**emê çawa bijîn?**" datînin. Em ji ber vê sedemê nîqaşeke mezin bi pêş dixînin.

We di paşerojê de çi kiriye ew qasî ne girîng e. Ya girîng derxistina van a zanebûnê, dahûrandin û ya nû çawa ava bikin pêşxistin e. Pêwîste em vê bi zelaliyeke mezin, bi nîqaşeke azad ve pêş bixin. Bêyî ku biçine durûtiyê, sextekariyê û xapandinê bi taybetî bêyî ku li dijberî welatparêziyê şerê azadiyê yê bingehîn û hêza wê ya rêber derbikevin, bi nîqaşeke azad ve li ser bingehê bi hêzkirina wê û zelalkirina van têgehan de gelo em dikarin çi bi pêş bixin? Ji bo vê yekê çi qas hêza me heye, pêwîstî heye yan nîne? Jin û zilam çawa dikarin têkîliyan bi pêş bixînin? Me ev kar heta artêşbûna jinê anî. Hê ji niha ve me komîteyên têkîliyên wekhev û azad pêş xist. Ev hemû diyar dike ku em hê jî di destpêka xebatê de ne. Di danîna holê ya pirsgirêkê de jî, di kûrkirina çareseriyê de jî hîn gelek tiştên ku em bikin hene. Ez van hemûyan di wateya çors de ne, di wateya ji şêwazên şaş qut bibin ber bi rastiyê ve bibin diyar dikim. Mînak hun zewicîne yan jî evîndar in. Wê demê hun jî xwe ji rengên xelet qut bikin. Ger nebe ji bo giyana xwe de û zanebûna xwe de, ji bo avakirina yên nû hewl bidin. Ji ber ku di xeletiyê de israrkirin, tê wateya jiyîna gelekî bi kûranî ya koletiyê ye. Ev jî dê we bikuje.

Milîtanên me yên çar pênc salî hene. Bi rik azweriyek û têkîliyeke ji rêzê hembêz kirine rêxistinê nas nakin, nayên şer û artêşê. Di vî alî de ger hun nekaribin derbixin derve jî di hundir de parçe bikin. Ger hêza wê ya mukirhatinê nebe wiha bikin. Ger hebe weke min vekirî bibêjin. Mînak min hemû şermên xwe danî holê. Ez him her cureyê şermên xwe datînim rastê, him jî ji bo derbaskirina van dixebitim. Ya rast ev e. Di van mijaran de ya xirab veşartin, sergirtin a herî girîng jî di nehatina rêxistinê de kirina amrazekê ye. Di rastiyê de xwe bi girêdaneke paşverû ve girêdaye. Tu caran nayê girêdana rêxistinî. Du kesayet hene, ya yekem kesayeta xwe ya sexte taybet e, ya duyem jî kesayeta pispor a rêxistinê ye. Dudiliyê dijî, hindekî rêxistinê, hindekî jî xwe dijî. Ev jî rengê jiyanê ya herî xeter e. Berovajî ger

xwe di hemû aliyan de, di kesayeta rêxistinê ya pispor a fermî de bihelîne û li ser wê bingehê wateyê bide têkîliya taybet an jî têkîliya civakî dê ya herî rast bike. Lê belê ew vê yekê nake û ber bi her cureyê durûtiyê, bertek û valaderxistinê ve dibe. Em van ji her demê zêdetir derdixine holê.

Ne şerm e mirov bibêje “paşerojê de min çi kir, xwe çi qasî xapand?” pêwîst e em di van mijaran de nêvengên têkîliyên azad ên gelekî mezin biafirînin. Pêwîste tu kesek nebêje “hevjîna min, evîndara min.” Pêwîst e ne zilam û ne jî jin bibêje “azweriya min, evîndarê min, hezkiriya min.” Berovajî pêwîst e hun di vê mijarê de nîqaşan bi pêş bixin. Ev tiştê ku hun dibêjin evîna min çend qiruşan dike? Di nava vê hezkirinê de çi heye dê bibe ku derê? Ew paşverûtî û bertekên ku we di riya jinekê yan jî zilamekî de aniye serê me gelo çi qasî zirar daye me? Ev xal girîngtir e.

Ger ji dil nebûma ger ez bibûma dîlê xapandina jinekê yan jî ajoyên zilamtiyê min dikarî belaya herî mezin bi xwe bînim serê rêxistinê. Lê belê bi şêwazê ku min dizanî bi dest girt û heta vir anî. Ez bawerim encamê wê baş bûye. Pêwîste neyê gotin “ma gelo ev jî zilamtî ye.” Li gorî min nêzîkbûnên ku ne jinîtî û ne zilamtî ne. Ew nêzîkbûnên ku hev dixapînin, tune dikin, li ser navê hezkirinê bêhezkiriniyê, bi navê ajoyan her cureyê ketibûnê heta dawiyê ji bo xwe rewa dibîne ye. Nêzîkbûna min azadî ye. Ezê ji bo çi di riya kevneşopan de mehkûmê têkîliyeke paşverû bibim? Ev ne layiqê min e. Ya rast jî ev e. Ji bo çi bi tenê keçeke te û jineke te çêbû, tuyê stûyê wê li hemberî jiyaneke ku hemû jiyana wê heram bike bitewînî? Di rastiyê de di vir de kirêtî û koletî heye.

Bilindkirina azadiya mezin di heman demê de bilindkirina bedewiyê ye. Ev jî pêşbirka kedê ye. Keda xweşik, keda bedewiyê tê wateya pêşketina hewldan û derfetên xweşik. Mînak zilamekî şêst salî ger hindekî pereyên wî jî hebin, di riya kevneşopan de û bi girêdaniya xizmatiyê ve keçikeke gelekî xweşik distîne. Di vê de kirêtiyek û neheqiyeke mezin heye. Vî tiştî dispêre pereyan, kevneşop û toreyan û dike. Li gor min gotina “namûs e, ma ji bo çi tu li hember derdikevî? Jina wî ye destên xwe nedê” ne rast e û pêwîst e mirov jina wî ji destên wî bigre. Ya rast ev e. Bi hezaran têkîlî ku li ser vî

bingehî hatine avakirin hene. Li ser bingehê neheq de çêbûye û xizmeta paşverûtiyê dike. Pêwîste ev werin parçekirin, ev hev xapandin e. Ji bo çi emê stûyê xwe li vê têkîliyê bitewînin? Têkîliya ku em bipejirînin ya ku heta dawiyê xwe disperê ronakbîrî û hebûna vîna azad e. Ev têkîlî di heman demê de têkîliyeke ku qut nabe ye.

Hemû têkîliyên ku di nava refên me de tên avakirin jî xwe dispêrin bandora rêveberiyê, hatina rêveberinê û hêzê ye. Di nav de têkîliyeke ku xwe dispêre azadiyê û vînê, kedê û tekoşînê nîne. Tenê stû tewandin heye. Ma gelo ezê vê têkîliyê çawa bipejirînim? Her roj gelek têkîliyên wiha derdikevine pêşberî me. Rexnekirina me ya têkîliyên bi vî şêwazî nayê wê wateyê ku em têkîliyê înkar dikin. Lê belê pêwîst e rengê têkîliyan ên rast bi pêş bikevin. Ez nabêjim evîndar nebin, evîndar bibin, lê belê pêwîste li ser bingehê girêdaniya evîna herî mezin pêş bikeve. Heta em ji bo girêdaniya herî mezin bibêjin evîn. Mînak ê ku vî tiştî dike ger evîna welatparêziya mezin û nîşandana vê ya di şer de pêk bîne ezê ji bo wî li çepikan bidim. Li gor min a rast ev e. Şeref jî û namûs jî ev e. Hewldan û evîna hindekan hebe dê li hemberî dijminê xwe serî hilde, vînê li gor wê bide axaftin û were rêxistinê. Ger hezkirina we ya zarokan hebe dê tiştên ku bi serê milyonan zarokan de hatine bihizire û ji wan hez bike. Ew jî dê rê li ber dilekî mezin vebike. Ger hezkirina dê û bavê hebe, dayik û bavê wî ku pêrîşan bûye dê bi wan bihizire. Ew hizirandin dê bi wî hêzeke çalakiyê ya mezin bide qezenckirin.

Bi vê şêwazê vekirina pirsgirêkan rast e. Rengên din xeter in. Ez bawerim rengên din gelekî bandordar in. Dema ku we li gor can û kêfa xwe têkîlî ava nekir piştre hun dibine protestovan. Hevalê min ên herî kevin jî wiha ne û hindek înkar dikin. Mînak di vê mijarê de weke ku tu têkîlî nayên avakirin, her têkîliyeke ku tê avakirin di bin navê “têkîliya beredayî” tê derbaskirin. Ez vê dijberiya xwezayîbûnê jî rast nabînim. Dê têkîliya jin û zilam bi hêzê were pêşxistin. Bêguman ev yek gelekî zehmet e, ji ber ku hun kole ne. Bi koletiyê re em şer dikin. Diyare ku ev şer jî dê bi qasî şerên din bi zehmet derbas bibe. Diyare ku şûna şer bike gotina “ezê ji têkîlî avakirinê

birevim weke kêşe yan jî weke rahîbeyan bijîm” jî ne hilbijartina me ye. Ev hilbijartina kesayet bi xwe ye. Em tevlî vî tiştî nabin. Lê belê em nikarin ji vê re bibêjin şêwaza têkîliyê ya rast û bi tendurustî jî. Hindek dibêjin “ez bêyî jin nikarim bikim” hinek jî dibêjin “ez bêyî mêr nikarim” ez ji bo van kesan dibêjim, hun bûne ajal. Kesekî ku li ser ajoyên xwe ev qasî ne serdest e, nikare zêde pîrozbûnê pêk bîne. Ger em van şêweyên bêsînor nenirxînin, em nikarin bi van rewşan re derbikevine serî.

Ya herî girîng jî şêweyên koletiyê bi kûrahî jiyîn e. Koletî ew qasî xwedî bandore ku kesayet ji landikê heta tirbê bi rê ve dibe. Rêdayîneke ku fermandarekî kontrgerîla nikare bike ev têkîlî dike û bi rê ve dibe. Bêyî ku em van tiştan derbas bikin, em nikarin bigihên milîtanên azad. Ji ber ku hun dikevine bin bandora koletiya vê saziyê yan jî vê şêweyê afirandiye. Hun dikevin nava şêwazên ku yan radestî ajoyên xwe yên hov dibin an jî dibe întîxarê û zêde nikarin ji bo têkîliyeke rast hêzê ava bikin, lewaz dimînin. Ev mijareke zehmet e. Lê belê xwedî nirxekî ye ku mirov di riya wê de hewldan û heta şer dide ye. Ez bi hindek aliyê wê ve pêwîste pirsgirêk çawa were têgihiştin datînim holê. Ji dubarekirina hêmanên ku tên fêmkirin zêdetir em dixwazin ji bo pirsa bi taybet emê çawa nezikî şêwazên ku dibe rastiyê û şêwazên têkîliyên rast bersiv bidin. Ger di nava gerîla de be, ger di hemû beşên jiyanê yên din de be, em dikarin hindek pirsên şêwazê nêzîkbûna rast amrazê rêxistin û çareseriyê dê çawa be, bi pêş bixin. A herî girîng jî di heman demê de ev têkîlî, têkîliya hest hezkirinê ye. Pêwîste hun di van mijaran de kûr bibin.

Gelo hezkirina rast, hesta rast çî ye? Evê çawa were bidestgirtin? Pêwîste li ser vê bingehê hun asta xwe ya ferasetê bi pêş bixin û baweriyê bi xwe bînin. Hilweşandin nayê wateya wendakirina her tiştî. Lê belê zêde tenezûlê bi awahiyên erzan jî nekin. Tişta herî zehmet jiyana ku bi pevçûneke gelekî zehmet ve hatiye sazkirin hîn bi nirxtir e û nayê hilweşandin.

**17 Çile 1994**

## EVÎN LÊGERÎNA AZADIYÊ YE

Şoreşa me şoreşeke rêzgirtina cewherê mirov û girêdayîmayîna bi xwezayiya mirov li dijberbûna ew hêmanên ku pêşiya vê digrin e. Riya çareseriya siyasî û leşkerî ji bo çareserkirina pirsgirêkên girêdayî civakî û aborî ye. Li gel me riya jiyana xwezayî ji hemû aliyan ve hatiye qutkirin. Wê demê şoreşa me şoreşa vekirina riya pêşketina xwezayî ye û çareserkirina wê ye. Nexwe dê şoreş bibe bûyereke tolhildanê û xwînrijandinê, ne bi vî rengî berdewamkirina me ya vî tiştî gengaz e, ne jî xwînrijandin bi vê şêwazê encam dide. Di vê rewşê de şoreş dê bi lez ji rê derbikeve û tune bibe. Dijwariya kor ku dijmin ferz dike jî ji bo vê hindekî rê vekirine. Nêzîkbûna me ya ji bo hemû pirsgirêkan em bikaribin çareseriyê ji bo hemû pirsgirêkên me yên jiyanî bibînin e. Rêxistinkirin, tekoşîna siyasî û her cureyê xebatên leşkerî ji pirsgirêkên jiyana mirovan re ku gelekî giran in re û ji bo derfetên pêşketinê re em bikaribin hindekî hêz ava bikin.

Jixwe asta leşkerî ya rastiya civaka me û gelê me qet nîne. Asta wê ya siyasî jî xayînî ye. Ji pêşketina civakî ya gelê me behskirin zehmet e. Bi civakbûn û netewbûnê ve di nava dijmin de helandin heye. Ji aliyê aborî de mirov nikare behsa aboriyeke talanê jî bike. Li ser vê bingehê şopek ji têkîliya di navbera zayendan de jî nîne. Hun di vir de nikarin ne li gor ol, ne li gor pêşketina hemdemî û ne jî li gor têkîliyan çareseriyekê peyda bikin. Ev bi kûraniya dagirkeriyê ve girêdayî ye. Me ev yek tespît kir. Me li xebatên xwe yên pratîkî çareseriyê vê pirsgirêkê jî zêde kir û hetanî îro anî.

Em kar dikin şêwazeke ku him piştgiriyê bide şerê me, him jî bide pêşketina wê ya rasteqîn bi dest bixin. Hewceye sererastkirina vê têkîliyê teqez xizmeta şer bike û wê bi hêz bike. Pêwiste ev şer bi qasî ji bo hemû pêşketinên civakî di heman demê de piştgiriyê bide pêşketina di malbatê de yan jî çareserkirina pirsgirêkên di vir de û ew têkîliyên di navbera zayendan de ku xetimîne, ji bo ku bikeve riya pêşketineke rast xizmetê bike. Sedema gotina me ya riya pêşketina têkîliyeke bitenduristî ji şerkirinê derbas dibe, ji

ber ku şer derfetên piştgirîdayîna ku hun asta têkîliyan bi tenduristî pêş bixin ava dike.

Nakokî ev qasî berfireh in ku di vê mijarê de kevneşopiyên pergala klanê û pîvanên hemdem di nava hev de ne. Jiyîna vê di nêvenga dagirkeriyeke serdest a herî sosret û herî bilêyîstok mijara gotinê ye. Di rastî de rewşên ku hun dijîn zehmet in an jî neçare zehmet be. Hîn di heftsaliyê de têkîliya di navbera zayendan de hatiye fetisandin. Feodalîzma giran bandora kevneşopiyê ya giran û piştre jî di deriyên dagirkeriyê de xwe bi hezar caran firotinê ve neçariya berdewamkirina têkîliyeke ji cewher dûrxistinê ragihandin û televîzyonên emperyalîst û faşîst bandorên giran ên ajoyî bi rastî jî mirovan difetisîne. Weke ku min rizgarbûna ji vê di pratîka xwe de dahurandiye çîroka vê jî bi dirêjî vegot. Ev hemû ji bo hindek şopên çareseriyê bikaribim nîşan bidime. Di rastî de ji bo zelalkirina vê pirsgirêkê sî sal pêwîst bû. Ji bo di vê astê danîna holê ya vê pirsgirêkê jî ji heft saliyê hetanî niha hewldanên min hene. Me weke zincîran bi girêdayî hev hetanî vir anî. Çîrok ev qasî dirêj e ku bi tenê bi sedan cild pirtûkan ve pêvajoyên ku hatine jiyîn nikarin derbixin rastê. Lê belê me di zimanê polîtîk de vegotina polîtîk bi pêş xist û me xwest bi formûlên gelekî balkêş ve van nîşan bidin. Em hizirîn ancax wiha dikarin hindek tiştan xelas bikin. Mînak ew şêwazê têkîliya ku hun hîn di temenên biçuk de dikevinê hîn dehsalî we bi nîvenîv an jî bi hemû aliyan ve tune dike. Him têkîliya kevneşop we tune dike, him jî dema ku hun derfetê nedin wê jî di çerxên dagirkeriyê de asê bimînin têkîlî tune dibe. Êrîşa ragihandin û çapemeniyê ya bîrdozî û di bin bandora giran a ajoyan de hun difetisin. Encam jî ew tengasiyên ku hun dema pêkanînê de dijîn e. Pirsgirêk ev qasî bingehîn e.

Başiya herî mezin a ku em ji we re bikin diyarkirina rastiyan e. Ji hemû rewşên ku hun dijîn re çareserî peydakirin ne gengaz e. Lê belê ger em rastiyan nîşanî we bidin dibe ku hindek ji we yên bi biryar dikarin ber bi çareseriyê ve biçin. Hindek aliyên girîng ên him di vê mijarê de lêgerînên min him jî tiştê ku hewce ye ez derbixim holê hene. Me ew pêçeka li ser têkîliyan perçe kir, aliyê têkîliyan ên berjewendiyê û kirêt me derxiste holê.

Me aliyê wê yê hetanî dawiyê paşverû û ku difetisîne heta aliyê wê yê bi siyasî û şerê leşkerî ve pêwendîdar e derxiste holê. Ev girîng in û hewldanên zelalkirina pirsgirêkê ye. Bêyî ku ev pirsgirêk were çareserkirin, ber bi şoreşê ve çûyîn û bi şoreşê re pêşveçûn ne gengaz e. Bi navê şoreşê gelek tişt werin kirin jî dibe ku gelek tişt werin wendakirin û dibe ku bi rengekî gelekî lewaz meş çêbibe. Lê belê ew jî di cihekî de wê bişkê û were wendakirin.

Em di dîrokê de dizanin zayendîtî gelekî xwezayî ye. Lê belê ev yek tu tiştekî rave nake. Di nava qebîleyên Efrîqî de hîn jî jiyaneke zayendî ya gelekî xwezayî heye. Ya xwezayî şêwazên jiyanê yên di mercên me de bi rêpîvanan ve nehatiye girêdan ber bi têkîliyeke kirîn, firotin û berjewendiyê ve neçûye. Neketiye nava koletiyê û ev taybetmendiyên vê jiyanê ne. Em baş dizanin ku bi destpêkirina şaristanî û taybetbûnê ezeziyet û li ser vê bingehê malbatgerî bi pêş ketiye. Têkîliyên malbatgeriyê yên destpêkê bi gelek seriyan e, yan jî gelek hevjînî ye her diçe ji dayiksalariyê ber bi baviksalariyê diçe piştre heta hevjîniyekê tê dibe ku di bin wê de jî bi gelek pirsgirêkên din ve tê meşandin, hun dizanin. Li ser têkîliya di navbera zayendan de gelek tişt tên nivîsandin, di vir de ya girîng ji hemû aliyan ve dîtina pirsgirêkê bêguman di bin navê xwezayiyê de her tiştekî ku tê hizirê mirovan nekirin û radestnebûna ajoyan e. Ev pêwîstiya destpêkê ya vî karî ye.

Ev yek îro derdikeve rastê. Ger zayendîtî nekeve bin kontrolê dibe ku mirovahî tune bibe. Nexweşiya AİDS bi pêş dikeve. Ev nexweşiyeke bi zayendîtiyê ve pêwendîdar e. Ger pêşî lê neyê girtin wê mirin zêde bibin. Ger pêşî li teqandina nifûsê neyê girtin mirov di cîhanê de bi cih nabin û dê jiyan raweste. Ji ber ku mirovahî nikare pêşî li encamên zayendîtiyê bigre û dê xwe tune bike. Lê belê ji aliyekî din ve jî ger zayendîtî nebe diyare ku jiyan nayê berdewamkirin. Ger taybetmendiyeke jiyanê ya jêneger neyê kontrolkirin, ger di pêşketina civakî de bi rêpîvanekê ve neyê girêdan an jî di vê wateyê de di asteke herî nêzîkî baş de neyê berdewamkirin, ji bo vê ne şoreş ne jî dîroka mirovahiyê têr dike. Dibe ku mirovahî di bin vê nakokiyê

de bifetise. Jixwe hê ji niha ve pirsgirêk li ser vê bingehê tê bidestgirtin. Çavkaniya pirsgirêka derûdor jî ev e. Dibe ku sedemeke ku şer hîn dijwartir bi pêş dikevin jî ev be. Ev ji ber xwe ve dernakevine holê. Ev rewşên ku pêşketinên civakî û mirovahiyê derxistine holê ye. Ev teqandina nifûs a di salên dawiyê de çêbûye û texrîbata derûdor ku ji vê bingehê xwe digre û nexweşî di rastiyê de bi pêşketina civakî ve girêdayî ye. Li hindek cihan pêşketineke tevlîhev heye û mirovahî ji ber sedema vê pêşketina tevlîhev xwe tîne rewşekê ku bi zanistî û teknîkê ve tune bike. Dibe ku şoreşa pêşerojê bibe şoreşa pêşîgirtina vî tiştî. Dibe ku bibe şoreşa pêşîgirtina zanistî, teknîk û teqandina nifûsê. Hîn ji niha ve şoreşa paqijkirina derûdor her ku diçe dibe armanceke sereke.

Pirsgirêk bi rengekî çors ve danîna holê jî têr nake. Pêwendiya pirsgirêkê bi kapîtalîzm û bi destpêkirina emperyalîzmê ve ji nêz ve heye. Pêwendiya xwe bi anîna hêza çareseriyê ya sosyalîzmê ji bo pirsgirêkan û bi pêwîstiya bîrdoziyeke şoreşa nû jî heye. Bêguman di vê mijarê de lêgerîn hene û dê hîn jî bi pêş bikeve. Civaka mirovan di asteke mezin de encameke çalakiya mirovan e. Dê li ser civakê nîqaş bi pêş bikevin. Jixwe sosyalîzm nîqaşa herî berfireh a li ser civakê ye. Anîna wê ya asteke herî nêzîkî zanistiyê ye. Bîrdoziya sosyalîst, felsefeya sosyalîst heta zanistiya sosyalîst di derbarê têgihiştina rastiya civakê de ye. Bi qasî ku nîqaşên mirov ji lawiran heta li hemberî bandorên xwezayê parastinê ew girêdayîna bi jênegeriya bandorên xwezayî ye. Bi kurtayî dê zanistiyên mirovî hîna jî bi pêş bikevin. Ol û felsefe wê careke din di pêş çavan re werin derbaskirin. Bi qasî ku pêwîst e dê were girtin û yê ne pêwîst jî dê were avêtin. Heta li gel nêzîkbûnên nû yên olî û felsefî ji bo pêşxistina zanistî jî wê xebat werin kirin û li gel van hemû tiştan ji bo pirsgirêkên giran ku xwe ferz dikin dê çareseriyek were qezenckirin.

Sedema diyarkirina me van nêzîkbûnên giştî ji ber ku hun pirsgirêkan gelekî bi takekesî digrin dest, ji bo ku em diyar bikin bi tu şêweyan em nikarin erzan nêzikî pirsgirêkan bibin, çareseriyên gelekî stewr (kısır) û di hundir de hatiye girtin ne gengaz e û ev qasî giştî pêwendîdar dike. Gelo ji

bo çi zayendîtî ji bo mirovên destpêkê xwezayî bû, îro ji bo me bûye pirsgirêkeke mezin? Ji bo ku em li ser sedemên vê we hindekî bidin hizirandin van diyar dikin. Ger ajoyeke gelekî xwezayî bi venêranekê zanistî û civakî ve neyê serûberkirin nîşandana ku mirovahî bikeve rewşekê nayê jiyîn û girêdana bi vê ve danîna rastê girîng e. Ev hemû mirovan dibe pêşxistina dewlemendiya ferasetê. Bi rûniştandina çerçoveya giştî ve pêwîstiya nêzîkbûnê datîne holê.

## Ji bo hatina hezkirin û hezjêkirinê bûyîna xwedî hêz pêwîst e

Hewceye mirov girêdaniya vê mijarê bi şer ve bibîne û binkeya me ya kadro zelal bike. Ew rewşên têkîlî û nêzîkbûnan artêşa me difetisîne, xebatên me yên siyasî felc dike. Derkete rastê ku girêdana gelek pêşketinan bi vê pirsgirêkê ve heye. Ger têkîliyeke yekî ya ku xwe disepîne yan jî pê ve hatiye girêdan hebe, ger ev têkîlî weke ew dixwaze neye dahûrîn wê demê ew li hemberî artêşê û partiyê dibe protestokarek û derdikeve. Hatiye girêdan lê belê bi koletî yan bi azadî ve hatiye girêdan ne diyar e. Ez van ji bo tawanbarkirinê diyar nakim. Lê belê dema ku rûbirûyê rastiya şer ve dimînin têkîlî felc dibe, rê li ber pirsgirêkeke mezin û bertekê vedike. Pêwîste kesayet bibêje “zagona şer e, zagona siyasî ye, hewceye ez xwe bi van ve bikim yek.” Lê belê hêza wî ji bo vê yekê jî têr nake. Jin an jî mêrê ku ji mala xwe yan jî ji gundê xwe reviyaye rewşa wan a hatina siyasetê û leşkeriyê ev e. Bi rastiyê ve rûbirûyêhevbûn gelekî balkêş e.

Ji ber ku çareseriya vê pirsgirêkê ne hêsan e, ez van diyar dikim. Ezê pirsgirêkê hîn bi bandortir daynime holê. Têkîliya hêsan, hestên hêsan, zayendîtiya hêsan û evîna hêsan nabe. Ezê hindekî li ser rastiya van hemûyan û pêşketina di nava me de yan jî pêwîste çawa bi pêş bikeve bisekinim. Kesayeta we çi qasî dikare van rabike. Hun dikarin çi qasî tê bigihên, dema hun tê gihiştin dikarin çi qasî pêwîstiyên wê bi cih bînin? Dibe ku rewşa we bidilêşî be, ez dixebitim ku rewşên we bigihînim hevsengiyekê.

Aliyekî de pêwîstiyên teqez ên şer hene, gelo ma emê binkeya xwe ya partiyê weke leşkeriyê yan jî weke siyasî bigrin? An emê ew tiştên ku hun dibêjin gelekî hewce ne, di asta pêdîviyên civakî, pêdîviyên malbatî, pêdîviyên hestan de bigrin? Pêwîst e mirov hevsengiya hundirîn a van hemû tiştan bibîne. Ev kar bi vê jî rizgar nabe. Asta me ya netewî heye, asta me ya netewî û civakî xetimiye. Pêwîst e mirov asta netewî dayne holê, hestên ku xizmetê asta netewî dike û têkîliya ji bo civakê bibe mînak derbixe. Ger ev nebin hun nikarin çareseriyekê ji bo pirsgirêkan bibînin, hun nikarin asta netewî asta ku ji civakê re pêşkeşiyê bike, zagonên me yên artêşê, tekoşîna me ya siyasî û rêxistinî li aliyekî bihêlin, hestan, zayendîtiyê û evînê bidine axaftin.

Ji aliyekî din ve jî înkarkirina vê mijarê ya çors jî dijberî xwezayê ye. Hun nikarin bi tevlîhevkirinê, bi şêweyekî sergirtî ve veguhertina derewan û her cureyê teoriyên aloziyan ve jî ji bin derbikevin. Em bi tenê ji hemû aliyan ve rastiya xwe daynin holê, em dikarin rastiyê bibînin. Pêwîste ji beriya hestan rastiyên me û hestên ku rastiyên me di pêş çavan re derbas dike bi pêş bikeve. Rastiya me jî rastiyên rêxistin, partî, artêş û dijmin in. Dijmin jî zayendîtiyê, jinê, zilam û malbatê bi kar tîne. Di vê mijarê de xebateke sîxuriyê ya mezin heye. Rastiya me sîxuriya objektîf gelek balkêş dide jiyîn. Ev rastî ne. Gelo ma em çavên xwe li van rastiyan bigrin, ma em dikarin çi çareser bikin? Em bi mînakan ve dizanin ku di nava refên me de hindek kesayet dikevin nava hestên sewdaser çawa dibin bela seriyan, çawa destpêkê didin hestên xwe, çawa nêzîkbûnên derveyî şer raber dikin? Gelek fermandar û şervan ji ber vê yekê reviyan û xebat sabote kirin. Ger hindekî venêrîna me ya rêxistinî nebe binkeya me ji ber sedemên van hestên ku xwe naspêrin rastiyan, tevlîhev, seqet û têkîliyên bêpîvan dê serûbin bibin xwe bi xwe tune bikin.

Pirsgirêk bi vegotina van hemû tiştan ve jî, bi hemû aliyan ve dernakeve holê. Gelo ma hezkirin an jî evîn dê tu caran nebe? Dagirkeriyê di me de ji vî alî ve texrîbateke mezin, bêrêziyeke mezin bêevîniyeke mezin afirandiye. Heta dagirkeriya hezkirin û evînê jî heye. Em dikarin vê gelekî balkêş

vebêjin. Ew evîn û hestên ku pê ve hatine girêdan hemû bi mohra Yeşîlçamê ne. Yeşîlçam biryargeha evd û kolekirina gelê Anatoliyê û hemû gelan a pergala sermayeyê ye. Biryargeha şerê taybet e. Em hindek îstîsneyan li aliyekî bihêlin gelek biryargehên ku dagirkeriya hest û evînê dikin hene. Em gelekî baş dizanin ku ev hemû jî ji aliyê şerê taybet ve tê bikaranîn.

Ez bi rihetî dikarim daynim holê ku bi tenê di bin beralîkirina hestan ve gel çawa tê dîlgirtin. Pêwîst e ku mirov bibêje bi taybet di demên dawiyê de emperyalîzmê di giştiya cîhanê de zayendîtiyê dike rojevê û derfetên dagirkirineke balkêş ava dike û mirovahiyê rûbirûyê pirsgirêkên herî mezin ve dihêle. Emperyalîzmê şêweyekî gelekî cuda ya bikaranîna jinê derxiste holê. Reklamgerî, bûyera xwenîşaniyê, binesaziya filmên porno heta seksolojî pêş xist û mirov xiste bin ferzkirineke îdeolojîk ku bi tu pêvajoyê ve nayê qiyaskirin. Di vê mijarê de hun hemû xistine bin bandorê vê gavê gelekî baş tê fêmkirin ku emperyalîzmê di demên dawiyê de bi ajoyên gelekî xwezayî yên mirovan ve bi taybetî jî bi zayendîtiya wê ve lêyîst, di vê mijarê de jin jinûve dagir kir û kire wekî malekî. Bi qasî bandora giran a îdeolojîk riya sermayeyekê jî vekir. Heta bi vê ve zêdebûneke balkêş a sermayeyê jî tê avakirin.

Em dagirkeriya hestan ku Tirkiye di demên dawiyê de dike bi dest bigrin. Hunermendên ku dagirkeriya hestan dikin hene. Ew hestyariyên ku ew bi pêş dixin tenê ketina bin bandorên bîrdozî ne, sermayeyeke balkêş jî ava dikin. ji vî alî ve gel şêlandin. Asteke nû ya herî pêşketî û gelekî guhertî ya zexta çînî di vir de derdikeve holê. Ev ferzkirin bi rengekî wehşîtir hizir û jêhatiya mirovan dîl digre. Bêguman nêzîkbûna şoreşgerî pêwîste van hemû tiştan bibîne û bi qasî dibîne riyên rast ên pêkan jî derbixe holê. Li gel me ji rengên dagirkeriya hemdem û bîrdozî ku dixe bin bandora ya emperyalîzmê wêdetir, ji bandorên ferzkirina kevneşopan behskirin girîng e. Hindek cureyên girêdaniyê hene ku ji ferzkirinên emperyalîzmê hezar caran zêdetir ber bi encamên xeter ve dibin. Tiştên ku di saziya zewacê de çêdibin, rewşên berê zewacê û piştî wê ji van in. Di rastiyê de yê ku gelo ma malbat saziyeke çawa ye? Fêm dikin jî nîne. Dem bi dem dema ku tê pirskirin “ji

bo çi tu zewicî?” hêjmara yê ku bersiva “min mereq kir” didin jî gelek in. Em dizanin ku hema her kesek ji ber ku mereq dike dikeve nava vî karî. Ne di zanebûna wê de ne ku ka dê encam çi be û ne çi be? Gelo ew nêzîkbûnên ku di bin bandora giran a kevneşopan de ye were rexnekirin û li hember were derketin jî dê li şûna wê çi were dayîn? Dîsa li hember tiştên ku emperyalîzm pêş dixe were derketin gelo ya rast dê çawa derbikeve holê? Di vir de jî neçariyeke mezin xwedî bandor e.

Gelo ma hun dikarin çend têkîliyan ku ne di bin bandora hestên giran de ne, heta ajoyan de ne yan jî ne di bin bandora kûr a rastiyên me de ne pêş bixin? Em ji zayendîtiya herî xwezayî yan jî şêweyê wê yê tê pejirandin bigrin heta ya herî were redkirin dîsa em ji şêweyên kevneşopan ku pêwîste herî zêde were redkirin bigrin heta şêweyên emperyalîzm û dagirkerî tehrîk dike redkirina wan gelo ma hun dikarin rexmî van hemûyan ji bo nêzîkbûneke azad ku pêwîste bi azadiyê were pêşxistin çi qasî hêzê ava dikin? Bêyî ku serî li durûtiyê bidin, bibin dîlê lêwaziyên xwe, aliyê mirovî û pêwîste were jiyîn hun dikarin çi qasî hêzê ava bikin? Hunê girêdaniya vê ya bi şoreşê re çi qasî daynine holê? Yê ku bi xwe bawer in, pêwîste ji van hemû pirsgirêkan re zelaliyekê bînin. Yê ku ji xwe ne bawer in dê tevlîheviyê bijîn.

Ez pêşniyar nakim ku hun bibin rahîbe yan jî keşe lê belê we dît ku xeterî heye, dê serê we bikeve xeteriyê wê demê heta ku we ya rast dît û derfet bi dest xist hunê xwe kontrol bikin. Zayendîtiya ku têkîliya xwe ji mêjî qut bûye xeter e. Dîsa nêzîkbûna zayendîtiyê heta malbatî ku girêdana xwe ya bi armancê siyasî qut kiriye, herî kêm bi qasî dijmin rê li ber encamên bizerar vedike. Kadro keseke ku pêwîste xwe di vê mijarê de jî bi disîplîn bike. Pêwîst e ku em diyar bikin kadroyên me bi tenê ew kesên ku xwe di vê mijarê de bi disîplîn bike nîne. Kesek e ku pêwîste çareseriyeke girîng jî biafirîne. Pêwîst e kadro çareseriyê ji bo xwe ne, ji bo civakê hilberîne. Di van hemû mijaran de şûna ji bo van pirsgirêkan bibin bersiv, dema me ji hemû aliyan ve destgirtin ferz kir hunê bibêjin hêza we nikare rabike. Lê belê pirsgirêk ev qasî berfireh e. Qet nebe serî li riyên çareseriyê yên erzan

nedin. Ev hemû ji bo pêşxistina cidiyetê ye. Pirsgirêkên we dê hîn şênber bi taybet pirsgirêkên we yên rastiya me şer a dijwar hereşe dike çi ne? Em neçarin van hîn balkêştir bibînin, binirxînin û çareser bikin.

Artêşbûna jinê ku bi pêş xistiye gelo tê çi wateyê? Bi artêşbûnê ve jin hindekî fizîkî, giyanî û hizrî bi pêş dikeve. Ev çarçoveyek e û çareseriyek e. Ji ber ku bi kesekî hêz qezencnekirî ve zêde derfetên têkîliya azad nayê afirandin. Bi kesên neçar ve pirsgirêkên civakî nayê çareserkirin. Mirovên neçar nayên hezkirin. Ji mirovên neçar re tê girîn. Lê belê şoreş hunera girînê nîne. Di heman demê de şoreş bûyereke kenê ye. Ji bo kenînê pêwîste mirov were hezkirin, ji bo were hezkirin û hez bike pêwîste mirov xwedî hêz be. Yê ku hêza xwe nîne nayê hezkirin. Ji bo ku hêz hebe hunê rêxistinbûn û artêşbûnê bizanibin. Ji bo ev çêbibe dê armancên we yê siyasî yên cidî û girêdaniya we ya bi wan armancan ve hebe. Ev dibe mijareke hezkirinê, xizan ji bo çi her dem digrîn û ax û wax dikin, ji ber ku hezkiriyên wan nînin. Ger hebin jî hemû dibêjin “ji dest min çû, min ji destên xwe revand, kurikê ku min jê hez dikir, keçika min jê hez dikir wiha bû, rabû çû.” û qiyametê radikin. Hezkirina mirovên bêhêz girîna wan an jî strana wan çend pereyan dike? Jixwe me ji bo vê got partî çareseriyek e. Bihêzbûna siyasî ya partî û rêxistinbûna wê çareseriyek e. Destpêkê bihêzbin, bi vî rengî hun dikarin derfeta hezkirinê bi dest bixin.

Ez bawerim we ji tiştên ku me diyar kiriye jî zêde tiştek fêm nekiriye. Min rastî diyar kirin. Lê belê gelo we çawa fêm kir? Fermandarên we û rêberên we yên siyasî çawa fêm kirin? Dema hindekî bihêz bûn axayê dagirker ên li ber serê xwe mînak digrin. Ew bi xwe jî têkîliyan yekcar wisa bi kar tînin. Yê ku hindekî derfetên bihêzbûnê dibînin ger jin be yekcar dibeze gel rêveber, ger rêveber be yekcar weke koleyekî jinê bi xwe ve girêdide. Ev tişt hate serê bihêzbûnê jî. Rewşa bihêz û bêhêzên di nava partiya me de li gor civaka koledar a kevin jinûve reng digre û ev jî gelekî bibandor e.

Me ev yek diyar kir, ji bo çi mirov nikare behsa hezkirin, heta evîna Kurd bike? Ji ber ku Kurdekî ev qasî ketiye nikare bibe xwedî hezkirinê. Ev di

heman demê de rastiyeke civakî ye û derfetê hezkirinê nade we. Yek jî kesayetên ku hun bikaribin jê hez bikin zêde dernakeve holê. Kesayetên ku hun bixwazin jê hezbikin tarûmar bûne. Hizrê wî, madiyat û manewiyat belav bûye, her çi qasî hindekî fîzîkî xweşik be jî giyana wî reş e, hizirandina wî nîne. Bi vê rewşa xwe ve dê bibe belaya seriyan. Ger hizirandina wî hebe jî pêwîste ew hindekî bikeve riya siyaset û şer. Dibe ku çareserî hindekî di vir de be. Ev axa û begên ku bûne xwedî hêz, polîs û cendermeyan jî bi tenê jin di xistinê de bi kar anîne. Jinê jî bi xwe firotinê ve zilam xistiye. Ez encamekî diyar bikim, ger hun zayendekî wiha bi kar bînin dê ew zayend jî bi rengekî hîn ketîtir bi kar bîne. Ger hun zayendekî wiha biçewisînin dê ew jî xwe bifiroşe û we bixe rewşekê ku jê nayê derketin. Rezîlî dê her biçe pêşbikeve, pirsgirêka exlaq dê bigihê asteke xirab.

Ger ji bo hindek têkîliyan hetanî dawiyê azadî bihata naskirin, dê ne li gor pênaseya ku me pêş dîtiye, bi rengên ku pergalê pêş dîtiye dê bihata domandin. Ev gelekî zelal bû. Wê derfetên partiya me û nêvenga azad hindekî ji rê bihata derxistin û ji sîxurekî herî navdar zêdetir zirar bihata dayîn. Jixwe vê tiştê hindekî xwe di refan de raber kir. Gelo pênaseya hest, pênaseya hezkirinê hatiye kirin? Gelo yê ku evîndar bûne, dema evîn bi dest girtine xwe spartine zanebûnekê û bingehên siyasî yên cidî? Têkîlî weke hatiye hînbûn, “min tu dîtî, ez bi te ve hatim girêdan, tu bi min ve hatî girêdan” tê meşandin. Ev şêwazeke têkîliyê ya herî ji rêzê ye. Em nikarin bi vê yekê ve dest pê bikin. Destpêkirina bi vê tê wateya piştî vê ev feraseteke sewdaser bêyî ku xwe nûbike domandin e. Wê wateya rê li ber hemû qirêjiyan an jî hemû helwestên ku dirûxîne, difetisîne, bêrêxistin dihêle û ji şer dûr dixe vebike.

## Nefirotina min a giyana xwe parastina min a rewa ye

Min ezmûna xwe ji bo we vekir. Ji bo ku ez wêrekiyê bidim we her dem behsa vê yekê dikim. Bi tevî ku ev qas jêhatiyên min ên çareseriyê heta bihêzbûna min hîn jî li hemberî vê pirsgirêkê ji aliyê madî û manevî ve ez

gelekî bi tevdîr im. Bi rengekî gelekî xeter ketina nava serpêhatiyeke evînê wêrekiyê dixwaze. Li gor min evîn hatiye dahûrîn û bi encamekê ve hatiye girêdan. Me hest û hezkirin bi welat ve girêda. Me ji vî alî ve evîn bi pêş xistin. Lê belê hîn jî ez bi qasî we wêrek nînim. Girêdaniya yek kesî dibe ku we bixe xayin.

Min ji pratîka jiyana xwe herî zêde ev encam derxist. Mafê tu kesekî nîne ku zêde ji yekî din hez bike. Tê gotin "bi mirinî û bi dînîtî ez ji te hez dikim" lê belê dibe ku di vir de xiyanet hebe. Ji gotina dibe ku wêdetir, ger pêşî neyê girtin dibe ji vê sîxurekî super derbikeve. Ew aliyekî vî karî ye. Pêwîste mirov hêza hestan tenê bi kesekî xwe nepixandî ve ne, bi welat ve, ger welat nebe bi şerê wê ve girê bide. Pêwîste mirov vê veguherîne hezkirina gel, partî û rêhevaliyê. Me ev yek jî tespît kir. Yekî ku gelekî zêde bi têkîliyekê ve hatiye girêdan gelekî çavtarî dibe. Di herêmparêziyê de jî ev yek heye. Min di hevalên xwe yên herî nêzîk de jî ev yek dît. Bi keçikekê re yan jî ger keçik be bi zilamekî re mehên xwe derbas dike. Lê belê ji bo erkekî şoreşgerî ya herî ji rêzê nîvsaet dema xwe jî venaqetîne.

Ez pirsgirêkan bi zanistî digrim dest. Ger ev qasî bi yekî re pêwendîdar dibe wê demê ji bo çi bi rêxistinê ve qet mijûl nabe? Ji bo çi her kesekî hez nake? Hezkirina xwe veguhertiye putekî. Teoriya putê jî wiha derkete holê. Mînak em hezkirina Hz Mihemed bi dest bigrin. Her çi qasî sembolîk be jî, hewldaneke wî ya şikandina putan hebû. Piştî ku put şikandin jî dibêje "rebê we li asîmanan e" wateya vê ev e, di wê demê de her eşîreteke Ereb xwedî putekî bû. Her kesî ji bo putê xwe îbadet dikir û putê xwe pîroz dikir. Ji ber wê jî yekîtî çênedibû. Dema ku yekîtî nedibû, serdema cehaletê û têkçûn serdest dibû. Mezinahiya Mihemed di vir de ye. Di rastî de bi şikandina putan ve şoreşê dike. Dema ku dibêje "rebê we li asîmanan e" di wateyekê de hezkirinê razber dike û tîne asteke giştî.

Gelo em çawa dikarin vê nêzîkbûnê di nava me de pêk bînin? Di rastiyê de li gel me ezeziyet, qebîlegerî û malbatgeriyeke ku ji eşîretgeriyê gelekî paşketîtir heye. Ji ber ku her kesek ji nirxên xwe yên netewî û civakî qut bûye. Li derveyî têgeha netewî jî maye. Di dest xwe de hindekî malbatgerî û

qebîlegerî maye. Heta malbat û qebîle jî têk çûye. Bi tenê du kesên ku hev dixapînin mane. Rastiyeke ezezîtiyeke sosret a di nava me de û sparteka wê ya civakî wiha bi pêş dikeve. Girêdana bêsînor a bi kesekî ji bo kesekî din tê wateya rastiya netewî û civakî –ku di heman demê de ev rastiya leşkerî û siyasî jî, di cewherê xwe de dide jiyîn- li aliyekî dihêle û bi hemû hêza xwe ve ji yekê hez dike, xizmeta yekê dike û dikeve bin fermana wî. Him jî bêsînor dikeve bin fermanê. Hîn baştir tê fêmkirin ku azweriyên kesayetê tê çi wateyê, rewşeke çi qasî xayînî, çi qasî bêpîvanî, çi qasî dînîtî derdixe holê?

Gelo bi yekê ve girêdan hindekî xeter nabe? Li şûna ku tuyê bi yekê ve werî girêdan bi hemû hevalên xwe ve were girêdan. Li şûna ku tuyê tenê bi dayik û bavê xwe bihizirî hindekî dayîk û bavên din jî bihizire. Li şûna ku tuyê li xizmên xwe bihizirî, li mirovên din jî bihizire. Piştî ku te ev yek bi pêş xist, netew, çîn heta hemû mirovahiyê bihizire. Yê li gel me jî gundiyekî ji rêzê ye û yekcar bi têkîliya jin û zilam a xetimandî ve hatiye girêdan. Di nava wan têkîliyan de siyasîbûn û civakîbûnek tuneye. Hela mirov tu caran nikare behsa asta netewî bike. Eşîret jî têk çûye, tenê jin û zilam maye. Yê van jî têkîliyeke wan a zayendîtiyê ya ku gelekî çors heye. Çorsbûn di vir de ye. Hewayeke van têkîliyan a siyasî bûn civakî tuneye. Bi qasî ji vê hewayê qutbû, qasî ku ketin nava  pirsgirêkên giran li gel pirsgirêkan zayendîtiyeke gelekî çors û rastiya malbatê ku mirov nikare ji nav derbikeve derdikeve holê. Destpêkê li hemberî hev evîndar in çavtarî ne. Di vî alî de dikarin kuştinan jî bikin, lê belê di roja diduyan a zewaca xwe de wê li hev bidin, ji ber ku têkîliyên derew, têkîliya tunebûnê mijara gotinê ye. Bi azweriyeke zayendî ya çors ve herî zêde çend mehan evîn û mevînê bijîn. Piştre jî pirsgirêka malbatê ya giran, pirsgirêka zarok a aborî û yên tenduristiyê derdikevine holê. Piştre jî pevdiçin û êdî her roj jiyaneke bipevçûn dest pê dike.

Ev tişt têne serê evînê. Gelo di vê têkîliyê de evîn û hest maye? Bêyî ku bigihê bîst saliyê jiyan fetisî. Em van hemûyan dipeyitînin. Rêbertiya partiyê, rêberê çalakiyê yê partiyê û xeta wî ya bîrdoziyê van pirsgirêkan

dibîne û çareseriyê jî dibîne. Ji bo vê her çi qasî hindek kes xetimandinê ferz bikin jî, em çareser dikin. Mixabin evîn û hestên wiha zêde tiştekî rave nakin. Em nikarin bi girêdaniya fîzîk û zayendîtiyê ve rewşê rizgar bikin.

Ez bawerim di nava refên me de hindek kes vê mijarê ji rê derdixin. Berpirsyarî û hêza rêxistinê di wateya çors de bi kar anîn heye. Li şûna ku hezkirineke asayî bi pêş bixin û bixin nava şêwazên ku partî pêş dibîne, vî tiştî bi rengê gelekî tevlîhev bi kar tînin. Em neçarin biaqil bin. Dagirkeriyê riyên hezkirinê qut kiriye. Tu caran derfetên pêşxistina evîneke bi tenduristî nade. Em dibêjin ji bo evînên girîng, hezkirinên girîng û armancên bilind em şerê rizgariya netewî bi pêş bixin. Ev çi ye? Ev rêxistinbûn e. Rêxistinbûn çi ye? Perwerde ye. Yekî ku vî tiştî fêm nake nebêje, "di rastî de evîna min girêdayî vê ye" û xwe nexapîne. Ji ber ku beşekî wan ê mezin xwe dixapînin. Ên ku hatine şev û roj hev bihizirin nikarin fêr bikin û fêr bibin. Di vir de hunê xwekuştina evîn û hestan bikin. Ger bûrjûvaya biçûk xwekuştina çînî pêk bîne dê bibe proleter. Hun jî ger hindekî xwekuştina hest û evînê bikin dikarin rêxistinê bikin.

Di hindek destanên me yên ku gelekî sembolîk diyar dikin de her dem evînên ku di nîvê rê de rûbirûyê xiyanetê mane û bi mirinê ve bi encam bûne hene. Gelek çîrokên weke Mem û Zîn, Memê Alan têne zanîn. Ew jî rastiyekê rave dikin. Raveyeke sembolîk a negihiştina armanca netewî ye. Gelo ji bo çi bi hevrebûnên evînê pêş nakeve? Ji ber ku hevgirtina netewî pêş nakeve. Cihê ku hevgirtina netewî bi pêş nakeve mirin û xiyanet heye. Ji kelem û fesadan re tê gotin. Xirabkarên rêxistinê kîne? Di nava rêxistina me de jî gelek Beko (di destanê evînê yê Kurd de kesayetê xiyanetkar) hene. Pêwîste hun bibin Mem û Zînên ku xwe ji bo rizgariya netewî razandine.

Evîn li ser bingehê ku me gihandiye zanistiyê bi pêş ketiye. Biaqilbûna min a di vê mijarê de ji bo vê çîrokê him raveyeke zanistî bi dest dixe, him jî weke ku gelek ji we dijîn bi encam nake. Bi rastî jî evînên we her dem dimirin. Jixwe neçare di bin mercên feodalî û serdestiya dagirkeriyê de bimire. Mînak di nava me de xirabkarekî têkîliya xwe "têkîliya dîrokî" li me ferz kir. Ger me pêşiya vê têkîliyê negirtiba dê veguherta têkîliya tunekirina

partiyê. Ev têkîlî vê gavê têkîliyeke ku di milê emperyalîzmê de dijiye. Weke van bi hezaran kes hene. Ezê Mem û Zînên wiha çi bikim? Bi hezaran Mem û Zînên wiha hene. Lê belê vê gavê em têkîliyan dikarin hîn şênbertir bi dest bigrin. Bûyer bi rastî jî zehmet e. Ango em hîn ji çareseriyeke kevneşop jî dûr in. Ez bawer nakim ku hun zêde evîndar bin jî. Van hestên xwe yên erzan li xwe mukir werin. Ne şerm e. Ez jî li xwe mukir hatim. Hindek evînên min jî çêbûn an jî rewşên wiha ku min jiyan hebûn. Lê belê armancên min nebinketin, nemirin û stûtewandin nebû.

Gelo ma hunê bikaribin bûyera Rêbertiyê ji vî alî ve jî lêkolîn bikin? Ev mijareke girîng a lêkolînê ye. We nekarî bûyera Rêbertiyê yan jî rêhevalekî xwe weke min ji vî alî ve nas bikin. Pêwîste we bizanibiya ku ez di vê mijarê de jî şervanekî gelekî mezin im. Ji heftsaliya min pê ve hevalên min keç hebûn. Hîn jî hevalên min ên keç hene. Lê belê ev hevaltiyên mezin in. Ez bi hevalên xwe re mijûl dibim. Min dest ji hevaltiya xwe bernedaye. Balê bidinê ez hîn jî van xebatên xwe didomînim. Li ser bingehê hêviyên min ên heftsalî ve min lêgerînên xwe yên evînê bi pêş xist. Evîn wiha dest pê dike. Lê belê li pêşiya evînê astengên feodal hene. Astengiya feodal di temenekî biçûk de keç û kur dikişîne aliyekî, di duwanzdehsaliyê de sozê dide, derfet an jî nêvenga evînê tune dike. Di panzdehsaliyê de dizewicîne û bi her awayî dikuje. Lê belê min lêgerînên xwe domandin. Ev mijar derbasî pirtukan jî bûye.

Ji vê derdikeve holê ku ez azadîxwazekî baş im. Hevalê min ê zarokatiyê zewicî, lê belê pêwîst bû ku ez li wî bigeriyama, ev lêgerînek bû û nîşan dide ku ez xwedî hêvî me. Ez bawerim we dest ji hevalên xwe berdaye. Ew kes bû jina wî, ew kes bû mêrê wê. Min wê demê keç jî û kur jî nehişt. Yek çû bi yê duyem re û heta bi hemû netewê re mijûl bûm. Em şêwazê Rêbertiyê bi rasteqînî lêbikolin. Keçikek çû ez bi gelek keçikan re mijûl bûm. Mînak di dema dibistana amadeyî de, di dema zanîngehê de gelo ji bo çi hêza min a têkîliyekê nebû? Zarokên bûrjûva di nava pergala têkîliyeke gelekî xwezayî de bûn. Lê belê ez weke ku min bi zincîrê ve kirine bêtêkîlîbûm. Weke ku hindek hêzan min bizmarkiribûn. Wê demê

sosyalîstbûyîna me û mijûlbûna me ya bi diyarkirina netewan a çarenûsa xwe rewşeke evînê bû.

Ji bo bûrjûvazî, evîn an jî pergalên têkîliyan a gelekî rihet ku li gor wê hene. Serdema feodal, kapîtalîzm evîn sekinandin. Keça Kurd jixwe fetisiye. Li ber serê min çend zilamên Kurd hebûn bela seriyan bûn. Mînak yekî ku bavê wî miftî bû, yê bela seriyan hebû. Rojekê kêra xwe kişand êrîşî keçikekê kir. Dê keçik birîndar kiriba. Li hemberî vê ez matmayî bûm. Xwe bi xwe re min got, “hewar xwedêyo pêwîste ez nebim zilamekî Kurd ê wiha” her kesekî tinazên xwe bi wî dikirin. Vaye evîna Kurd di salonên Fakûlteya Zanyariyên Siyasî de wiha tune dibû. Gelo ji bo çi her çi Kurdek be jî pêşxistina hindek tiştan gengaz e? Ev rastiyeke Kurd e. Gelek ciwanên Kurd jî evîna xwe di serê kêrê de nîşan didin. Ev jandariyeke mezin a evînê ye. Gelo mirov jandariya evînê ne, dikare ji bo vê bibêje dînîtî? Hema hemû xort wiha ne. Ev her roj dikarin ji ber têkîliyekê kuştinan bikin. Di vir de tewanbariyeke mezin, pîskopatî yan jî bûyereke tewanê heye.

Ji aliyekî din ve keçik an jî zarokê bûrjûva yên ku werin hezkirin hebûn. Lê belê min sînorên xwe dizanîbû. Ji ber ku wê demê hêza min a hezkirinê tunebû. Li gel wê bi wî rengî nêzîkbûna min encamên ku derdixe holê ew bû ku ez yekî biaqil im. Weke Kurdan min kiriba ezê her roj birîndar bibûma. We jî gelekî wenda kir. Hun bûne evîndarê bûrjûvaziyê. Ji ber vê sedemê we hest û giyana xwe firote bûrjuvaziyê. Gelo ma kesên ku giyana xwe nefirotine bûrjûvaziyê hene? Kesê ku giyana xwe nefirotiye xweşikên filmên Yeşîlçamê, xweşikên televîzyonê hene? Ji bo ku hun pîroziya hestan bi dest bixin, pêwîste ku hestên we neyên firotin. Lê belê ihtimaleke mezin we hemûyan hestên xwe firotine. Ev hemû nîşan didin ku hun çima di evînê de asê dimînin. Ger we ji nirxên bûrjûvayê hez kir hunê ber bi hevkariya wê ve jî biçin. Ger hun ber bi keça axa ve biçin, tê wateya ku hun bi axa ve hatin girêdan. Axa jî ji ku derê pere tên bi wir ve girêdayî ye. Pere jî ji dagirkeriyê tê. Wê demê tê wateya ku te evîna xwe û hestên xwe firotiye dagirkeriyê.

Di zanîngehê de, di salên ciwaniyê de tiştên ku min kiriye, parastina rewa bû. Wê demê ji ber ku hêza min ji bo têkîliyekê têr nedikir, min xwe diparast. Şûna ku bi navê evînê ez her tiştî wenda bikim, min ji xwe re xwegirtina hundirê xwe hilbijart. Ji ber ku demên ciwaniya min bû. Ger ez xirab asê bibama dibe ku belayên mezin bihatana serê min. Hun di salên ciwaniya xwe de sosret asê bûn. Bi vî rengî we gelek tiştên xwe û dibe ku we giyana xwe wenda kir. Gelo ev giyanên weke wehşan kengê derketine holê? Wehşbûna giyanê çî ye? Gelo hun xurifandina giyan, ji rê derxistina giyanê lêkolîn dikin? Giyanên di we de giyanên kê ne? Hestên wê hestên kê ne? Ev ji kê mane? Ev helbest helbestên kê ne? Çavkaniya stranan çî ye? Azweriyên we çavkaniya xwe di kur de dîtin? Dema ku keçê ji kurik û kurik jî ji keçikê hez kir, gelo di nava wê de naverokeke civakî netewî ya cidî hebû? Qet nebû. Wê demê tê wateya ku giyanên we hatin firotin. An jî ev tişt pirsgirêk nekirina we tê wateya ku hun evînê înkar dikin. Di vir de giyanên firotî, giyanên noker, hestên tunebûne hene. Evîn li ku derê ye? Xortên evîndar li ku derê ne?

Weke ku min diyar kir, tiştên ku min di van salan de kiriye xwe kişandina parastina rewa bû. Xwe li hemberî fêrbûnên bûrjuva û azweriyên wê parastin bû. Ez li gund jî wiha nêzîk bûm. Wê demê li hemberî şêwazê ku gundiyan ferz dikirin ez derbasî rewşa xwe parastinê bûm. Min têkîliyên bi vî rengî nekarî bipejirînim. Ji ber ku ez dihizirîm, hest û keçikên wiha ne li gor min in. Piştre min têkîliyeke taybet bi pêş xist. Hate dîtin ku ger bi şiyarî neyê bidestgirtin, têkîliya jinekê wê di bin navê girêdaniya hest û têkîliya taybet de hemû hewldanên min tune bike. Bihizirin ger ez jî weke we bûma, gelo wê demê dê rewş çawa biba? Min ji komê re, ji pirsgirêka Kurd re pêşkeşî dikir nirxekî mezin dida sosyalîzmê. Ger ev erkên min ên mezin nebana, ger ez yekî ji rêzê bûma ihtimaleke mezin ez tune dibûm. Ger ez weke Kurdekî klasîk nêzik bibama ev dê biba sedema tunebûnê. Ger min bigota “azwerî ye, zayendîtî ye” û serî bitewanda dê ew jî tunekiriba. Pevçûneke bêdem jî nabe. Min got pirsgirêka demê baş bibîne û bi ser xwe de biçe. Gelo pirsgirêka te çî ye, ev kî ne, tu çî yî, te ji bo çi kir? Bi pîvanên

çors an jî hoste tê bigihê ku yê hemberî te bela ye. Gelo belaya KT ye, belaya feodal e, yan jî belaya bûrjûvaziya biçûk e? Bi van re hesabên xwe baş bike. Ger hêza te têra yê hemberî te nake, bila hêza te têra te bike. Ger tekoşînek tê ferzkirin wê demê tekoşînê bike û xwe wenda neke, hostetiyê jî ji dest bernede. Min ev hemû lêpirsîn kir, şêwazeke tekoşînê bi pêş xist.

Gelo di serî de min dixwest ku wiha bibe? Naxêr! Lê belê min pêwîstî bi nêzîkbûneke ku ji bo her rewşekê ku tê jiyîn dît. Bi vî rengî min dest ji netew, partî û şer berneda. Min got ger hest û evîn çûbe, bila biçe. Ew jî derkete holê ku ew ne hest û evîn e, sarbûna marekî bi jehr, zindiyekî ji zû ve mirî ye. Ger min li hemberî vê yekê xwe wenda kiriba, bûyera ku jê re PKK tê gotin jî dernedikete holê. Dahurandina kesayeta xwe û hestên xwe di bin hestên xwe de xwe neperçiqandin bûyereke gelekî girîng e. Ji aliyê Kurdistan'ê ve xwe pêkanîneke min a herî girîng jî ku min kiriye ev e.

Wateya di Kurdistan'ê pêşxistina evînê û bilindkirina hestan dîtina asta netewî ye. Em nebêjin Mem û Zîn derbas nebin. Di rastiyê de ew pirsgirêkeke hevgirtina netewî ye. Ger hevgirtina netewî û hindekî jî demokrasî hebe, ew bavê feodal jî nebe di rastiyê de Mem û Zîn dikarîbûn bi hev re bijîn. Ev mirina ku tê zanîn jî pêk nedihat. Em dikarin jiyana wan ji gelek aliyan ve lêkolîn bikin. Ehmedê Xanî yekîtiya netewî dixwaze, nivîskar dibêje "ger hukumdariya Kurd hebûya, ev tişt nedihate serê me" di wî de azweriyeke mezin a yekîtiyê heye. Vî tiştî di vê destanê de diyar dike. Em dikarin bibêjin di riya yekîtiya netewî de hewldaneke mezin daye û ketiya riya evînê. Ger hun hindekî şoreşa demokratîk a netewî bi pêş bixin hun dê hindekî riya evînê vebikin.

## Ji bo riya hezkirinê vebikin pêwîste hun jina azad biafrînin

Ew dahurîna Çernîşewskî ya di esera wî ya "Çawa Bikin?" de hindekî dişibe dahûrînên me. Min nexwend, lê belê ez bawerim ên me hîn berfirehtir

û zanistîtir e. Yê ku ev pirtuk xwendî hebe em dikarin di derbarê naveroka wî de nîqaş bikin.

**A:** –Di pirtukê de têkîliyên feodalîzm û kapîtalîzmê tê bidestgirtin. Bav û malbata kesayeta jin a destpêkê bûrokrat e. Di lêgerîna zewaca destpêkê de hezkirinê nabîne. Hîn zêdetir têkîliyeke ku xwe dispêre berjewendiyê heye.

**Rêber APO:** - Wê layiqê hezkirinê nabîne.

**A:** -Layiqê hezkirinê nabîne. Heta di dîtinê de bi zilam re pirsgirêkeke cidî nîne, lê belê wî jiyanî nabîne.

**Rêber APO:** - Jixwe hezkirin wisa bi pêş nakevin.

**A:** - Piştre pêşxistina têkîliyên bêberjewendî heye.

**Rêber APO:** - Gelo ber bi têkîliyên azad ve ye?

**A:** - Têkîliya civaka sosyalîst jî bi xwe re...

**Rêber APO:** - Gelo ma ber bi wê ve diçe?

**A:** - Vê carê ber bi hezkirineke wisa ve çûyîn heye. Dema ku ber bi hezkirineke wisa ve diçe bi kesê ku têkîliya berê pê re hebû re pev naçe. Bi wî re pirsgirêkê hindekî hêsanî çareser dike. Yek jî asta ku daye ev e. Mirovên ku bi wan re diaxivin kesên ji aliyê çandî, siyasî û civakî ve pêşketî ne.

**Rêber APO:** - Ango hezkirin pêwîstiya xwe bi bingehekî gelekî cidî ya çandî heye. Ji bo hezkirin ji rewşa bûyereke ajoyî ya erzan derbikeve pêwîste hezkirin bi çandê ve were bidestgirtin ango weke paçekî were hunandin.

**A:** - Jixwe dema jin gava destpêkê diavêje keçeke bûrokrat e. Asta xwe ya siyasî û çandî nîne. Bandorên feodal jî dijî. Lê belê di wateya bûrjûva de pêşketinek heye. Di wir de hezkirinê nabîne.

**Rêber APO:** - Di derketina jinê de tiştek nîne. Pirsgirêka wê pere nînin, heta ji berjewendiyê jî direve. Gelek bûrokrat hene lê belê li rûyê wan jî nanêre. Dema ku pereyekî zêde dîtin, gelo ma keçeke ku li pey neçe heye? Ji

ber ku evîn û azadî tuneye. Dê weke masiyan xwe biavêjin tê de. Mixabin keçikên me wiha ne. Gelo kî heye ku derfetên mezin ên madî û têkîliyên erzan qebûl neke û pêwîstiyê bi azadî bibîne? Xort û keçên bi wî rengî hene?

**A:** - Ew lêgerîna jina di pirtukê de bi civakê ve bi hev re pêş dikeve.

**Rêber Apo:** - Ev pirtuk di pêvajoya biêş a şoreşa netewî demokratîk a li Rusyayê tê nivîsîn. Ji bo têkîliya azad a wê demê re dibe çareseriyek. Mezinbûna wê jî di vir de ye. Lenîn jî wê pirtukê li ser wê bingehê bi dest digre.

**A:** - Tevlîheviyeke wiha nîne. Zayendîtî di asta pêş de nayê bidestgirtin. Aliyê vî karî ya siyasî û civakî digre dest. Hizirandinên xwe yên di derbarê civakekê de hetanî pêkanînên van heye.

**Rêber APO:** - Di nava van hemûyan de zayendîtiyê azadiyê bi dest digre. Lê belê destgirtina me hîna komîserhev e û kûr e.

**D:** - Rêberê min di wê pirtûkê de, di zewaca destpêkê de hesta minetê serdestir e. Jin li mêrê xwe yê destpêkê bi çavekî rizgarîxwaz temaşe dike.

**Rêber APO:** - Ma gelo zewaceke ku bi hestên minetê ve hatiye kirin mijara gotinê ye?

**D:** - Belê. Piştre jî rizgariya jinê xistina malê rizgariya netewî heye. Her du bi hev re pêş dikevin.

**Rêber APO:** - Jin xwe ji hesta minetê rizgar dike yan jî wê napejirîne. Gelo ma ew bi xwe têkîliyê bi çi ve girêdide? Qehremana jin a vê esera mezin kî ye?

**D:** - Vera.

**Rêber APO:** - Navê zilam çi ye?

**D:** - Kîrsanov û Lopûhov.

**A:** - Du zilam hene.

**D:** - Di wir de bi perçebûna civaka feodal ve nakokiyên kapîtalîst jî tên jiyîn. Bi taybet malbata keçikê ji bûrokratekî gelekî dewlemend zêdetir

weke kehyayê malbatekê ye. Dayik keçikê ji bo firotinê derdixe. Li gor nirxên civakê ji bo pêşerojeke aram wê difroşe. Keçik ji bo vê yekê serî hildide û bi alîkariya yekî rewşenbîr ve ji malê derdikeve. Piştre dibîne ku ew zewaca ku hatiye kirin, ji diliyê gelekî dûr e û hezkirin tê de tuneye. Di zewaca ku kiriye de bi giranî rêzdarî heye.

**Rêber APO:** - Di vir de dibîne ku hezkirin nîne. Ev dişibe lêgerînên min û tespîtên ku min kirine. Ango hezkirinê nabîne yan jî di vir de hezkirin tune bûye.

**D:** - Rêzdarî hîn zêdetir e. Nirxekî mezin jî didê.

**Rêber APO:** - Lê belê rêzdarî têr nake.

**D:** - Qîmetê dide lê belê di vir de hezkirineke ku xitabê xwe dike nîne. Ji bo jê rizgar bibe lêgerînên xwe pêş dixe. Mînak dest bi kar dike. Komeke biçûk a sosyalîst ava dike, kargehekê vedike. Vê carê dihizire dibe ku hezkirineke xwe ya cihê jî çêbibe. Dikeve nava lêgerîneke cihê.

**Rêber APO:** - Gelo ma ev yek dibe ezmûneke hezkirina sosyalîst?

**A:** - Mirov dikare wisa jî bibêje. Hindekî xeyalperestî heye.

**Rêber APO:** - Li gor min xeyal e. Têkîliyeke wisa jî nehatiye jiyîn.

**A:** - Rastiya xwe nîne.

**Rêber APO:** - Ev hêviya Çernîşevskî ya têkîliya sosyalîst e. Em wê wiha têbigihên, di rastiyê de tiştekî wisa nehatiye jiyîn. Lê belê wî mînakên ku dişibe wê lêkolîn kiriye û razberiyeke wisa ava kiriye. Di heman demê de roman razberiyek e.

**A:** - Projeya civakî li ser têkîliyeke diyar saz kiriye.

**Rêber APO:** - Misogeriyeke ku pêwîste were rûxandin û rastiyeke civakê ya ku di bin bandorên giran a kevneşopiyê de heye. Pêvajoya şoreşa netewî demokratîk e. Xwe rizgarkirina Vera, xwe rizgarkirina ji feodalîzmê ye. Rewşenbîr e û hindekî jî bûrjûvaziyê temsîl dike. Lê belê pêwîstiyê dibîne ku xwe ji wê jî rizgar bike û xwe rizgar jî dike. Piştre ber bi projeya sosyalîst ve diçe.

Em dixwazin vê hindekî bi dahûrînên kûr ên rastiyên me ve bimeşînin. Kesekî ku xwe rengekî çavtarî bibêje evîn û xwe dayne holê hebe, pêwîste bizanibe ku rewşeke wiha ya evînê û hezkirinê tuneye. Mînak Vera zewaca ku bi rewşenbîrekî re kiriye de dîtiye ku evîn nîne. Li gel me bihêlin rewşenbîr ewên ku hezar caran paşketî ne, hestên erzan weke qaşo evîn an jî hest pênase dikin. Ne gengaz e ku em ji vê re bibêjin azadî. Ji ber ku gelekî di asta paşketî de ye. Ez ji bo ku hun xemgîn bin an jî xwe biçûk bibînin diyar nakim. Lê belê di mercên îro de bi destxistina evîn, hest û hezkirinê ji teoriya Eînsteîn hîna zehmetir e. Hun dizanin teoriya îzafiyetê teoriyeke zehmet a fîzîkê ye. Dibe ku evîn hîna ji wê jî zehmetir be. Ji bo wê jî ew qasî pevçûn û nîqaş hene. Ger evîn hêsan bûya em jî ev qasî mijûl nedibûn. Tiştê ku ez bi hemû hewldanên xwe ve dixwazim bikim, ger nebe ew giyanên ku hatine firotin, canên mirî û azweriyên qirêj ên hatine girêdan hindekî bi sînor bikim. Ger gengaz be afirandina nêvenga hezkirinê ye.

Em li aliyekî bihêlin ku hun hezkirinê bijîn, ji nêvenga vê jî dûr in. Li gel we vîn, armanc û azweriya vê yekê nîne. Ez vê ji bo asta civakî diyar dikim. Di rastiya me ya netewî de hîn ev tişt nînin. Mirovên ku gelekî çors in mijara gotinê ne. Ez ji ber ku gelekî xwe diecibînim nabêjim. Lê belê ez ne nêzîkbûna keçikekê ya ji bo xortekî ne jî ya xortekî ji bo keçikekê rast dibînim. Her cureyên hest û danûstandinên wan ez gelekî kirêt dibînim. Hesteke ku li ser min serdest e ev e. Hestên xweşik, dayîn û stendina xweşik hîn min bi xwe jî ne daye daqurtandin. Dibe ku hun bibêjin, “gelekî xweşik dike” lê belê tiştê ku ez dikim gelekî kêm dibînim. An jî qet naecibînim. Jêhatiya min a ecibandinê û mijûlbûna min a bi têkûzbûnê ve tê zanîn. Ev hewldaneke gelekî mezin dixwaze. Di vê mijarê de şerekî ku bibe mînak an jî bersivê bide hemû pergalên me yên nirxan pêwîste were dayîn.

Ger em şer bi pêş nexin, evîn û hestan em li aliyekî bihêlin we naxin şûna mirovan jî. Dê cendermeyek were roja diduyan jina te û keça te ji destên te bigre. Jixwe mêrê tê tazî û rût dike, lê dide û rezîl dike. Ma di vê rastiyê de evîn û hezkirin çêdibe? Mezinbûna me di vir de ye. Dema min ev rastî dît, min got ez nakevim nava karên malbatgeriyê. Li şûna ku wiha be bila qet

nebe. Girêdanên min bi jinê re girêdanên şer in û ev sînor gelekî girîng e. Hun naxwazin vê yekê jî fêm bikin. Hindek jin û zilam balê li vê nakişînin û xirab têk diçin. Tu caran ji bîr nekin ku tevlîbûneke we ya li ser bingehê girêdana şer heye. Niha navê evîna we tekoşîn e û şer e. Em dikarin vê gavê evînê wiha bi pêş bixin. Destpêkê gelo emê çawa şer bikin? Ev gelekî girîng e. Di nava têkîliyên gelekî dijwar de dibe ku hindekî evîn jî hebe. Lê belê pêvajoya vê gavê şer e.

Di vê mijarê de nûbûneke ku min kiriye heye. Di min de serî tewandina ji bo yên gel xwe nîne. Me Zîn û Mem çi kirin? Şûna ku em serî li pîvanên feodal bitewînin û di nava pevçûneke kor de hev tune bikin, kişandina we ya ji bo şerê gel şerekî azadiyê yê rastiya Kurd serkeftineke mezin e. Ev ji bo evînê gaveke gelekî mezin e. Min da diyarkirin ku ez di vê mijarê de di nava şerekî gelekî girîng de me. Dema ku ez jin û zilam dadihûrînim û dikşînime şer bi şêwazekî gelekî hostetî pêk tînim. Ez ji bo ku xwe binepixînim diyar nakim, lê belê hun dizanin ku ez we ji têkîliyên we yên xeter û têkîliyên kole yan jî têkîliyên xiyanetê bikişînim çi qasî tevdîran digrim, çawa li ser çareyan dihizirim? Her kesek matmayî dimîne ku me ev qas zilam û keç çawa kişandin û van xebatan çawa li gel hev dimeşînin. Di hatina jinê ya refên tekoşînê de bûyereke azadiyê heye. Yê ku bixwazin vê yekê bibînin gelekî kêm in. Gelo em di van mercê şer de ji bo çi têne gel hev? Rexmî ev qas birçîbûn û tîbûnê ev evîna me çî ye? Kesek vê ji xwe napirse. Dema ku derfet dîtin, bi nêzîkbûneke durûtiyê ve xirab nêzîk dibin. Ev jî gelekî xeter e.

Ger hun naxwazin wiha nêzîk bibin hunê rast nêzîkî rastiya şer û rêxistinê bibin. Di vê demê de evîn bi rêxistinbûnê û bi pêşxistina şer ve çêdibe. Hun van tiştan fêm nakin, kesekî weke min bi pêwendîdar û bi azwerî kêm tê dîtin. Ger hun balê bikişînin tevî ku derfetên min ên mezin hene, tu caran min berê xwe neda zayendîtiya erzan. Bi hezar û yek sedemên vê hene. Lê belê ez dîsa jî bawer nakim ku tu zilamek bi qasî min bi jinê re pêwendîdar bûye. Ger di nava PKK'ê de, ger jî li derveyî PKK qadeke min a pêwendiyê ya di vê mijarê de heye. Gelo min di jinê de ev

bandor çawa afirand? Di rastiyê de ev bûyereke mezin e. Hîn jî şerekî min ê azadkirinê ya mezin heye. Ez vê xebatê bi xapandinê yan jî pereyan nameşînim. Ji bo çi hemû rêhevalên me yên jin ên şoreşger bi min ve girêdayî ne? Jina Kurd ji bo çi gelekî balkêş tên girêdan? Pêwîste mirov vê yekê fêm bike. Ji bo çi mêrên xwe heta gelek xizim û dostên xwe berdidin? Ma gelo ez ji wan re dibêjim dev ji wan berdin? Naxêr. Hêzeke min a çareserkirina pirsgirêkan heye. Ez hezarûyek sedemên bi rastiya Rêbertiyê ve girêdanê datînime holê. Ev xebat xebateke mezin e.

Dema ku ez van hemûyan diyar dikim xwe naxime şûna yekî ku ji hewayê bi zembîlê daketiye. Ez behsa hewldanekê dikim. Dayîka min digot "kesek keça xwe nade vî" rast e. Ne min keç digirt, ne jî kesekî keç dida. Tê wê wateyê ku hê ji wê demê û pê ve sekinandineke me ya cihê heye. Lê belê xebatên jinê xebatên mezin ên azadiyê hatin kirin. Keçik hemû hatin vê tekoşînê. Ji bo tu kesî ferzkirin nîne. Ger hun rêhevalên me yên jin ferz bikin jî hun nikarin bi hêsanî ji vir biavêjin. Ji ber ku hemû bi mirînî girêdayîne. Bi sedan rêhevalên me yên jin şehîd ketin. Evîna hemuyan bû şahadet. Wateya van tiştan jî heye, pêwîste ev hindekî werin dahûrandin. Derdikeve holê ku têkîliyên ku pêş xistine ne ji rêzê ne. Me têkîliyên xwe nekirine qurbanê zayendîtiyeke ji rêzê. Dikarin bêyî ku çavên xwe bigrin ji bo welatê xwe bi tekoşînê re bimeşin. Ev jî bûyereke evînê ye. Yan jî weke rengekî evînê bi pêş dikeve.

Ger hun baldar bin a ku hun ferz dikin ezeziyet e. Ya ku ez ferz dikim jî netewiyet e. Gelo ya ku ez ferz dikim an a ku hun ferz dikin xwedî bandor e? Vê gavê ew netewiyeta ku ez ferz dikim xwedî bandor e. Ev yek jî bi şer pêk hat. Yê ku qaşo bi armanca têkîliya azad nêzîkî min bûn, ên ku dixwastin min tune bikin û komplo bikin jî hene. Di pirtûka Cem Ersever de hindek jin bi riya jinê bi ferasetên komploger ve çawa gihiştin gel min datîne rastê. Em ji xwe dizanin ku gelek jinên sîxur hatine şandin nava refên tekoşînê. Her çi qasî van hemuyan li hemberî me şerekî mezin meşandibe jî, gelek rêhevalên me yên jin ku bi tekoşînê û bi rastiya Rêbertiyê ve bi mirinî girêdayî hene. Ev hemû rastî ne.

Ev hemû xwe bi xwe na, weke berhemekê hewldanên mezin bi pêş dikevin. Zagonên van hemû tiştan hene. Yên ku nizanin pêwîste fêr bibin. Ger emê behsa evînê bikin di vê wateyê de zagonên evînê jî hene. Ger hun jî jêhatî bin wiha bi pêş bixin. Di vir de pirsgirêka min bi jinekê re pêşxistina têkîliyê nîne. Ez giştiya cîhanê li aliyekî dihêlim, di bûyera Kurd de bi afirandina jina azad ve mijûl dibim. Ji ber ku ji bo hun bikaribin riya hezkirinê vebikin, pêwîste destpêkê jina azad biafirînin. Ji bo ku ez bidim şermkirin diyar nakim. Ez xwe jî zêde naecibînim. Lê belê tu tiştên zêde ku mirov ji jinên heyî hez bike û bi wê re bimîne nînin. Ez vê ji bo biçûkxistinê jî nabêjim. Hemû feqîrên xwedê ne. Mirov dikare rêzê bide wan lê belê ji wan nayê hezkirin. Dibe ku fîzîka wê hebe lê belê giyana wê, hizir û zimanê wê nîne. Wêrekiya wê heye, lê belê ziraviya wê nîne. Ger hun van di pêş çavan re derbas nekin hun nikarin tekoşîneke serkeftî bimeşînin û nikarin hez jî bikin. Lê belê hunê gengazbûna pêşxistina hezkirinê jî bibînin. Hezkirin hunerekê, ziraviyeke mezin dixwaze. Bi qasî gotinên gelekî xweşik, xweşikbûna fîzîkî pêwîste xweşîkbûneke giyanî ya balkêş û tûjbûna hizirandinê jî hebe.

Navê min derketiye. Yekî ku min nedîtiye jî xwe dispêre min. Bawer dikin ku ez kesayetekî bêyî ku xwe bispêrim tu berpirsiyariyan, navêkî siyasî, dikarim bi jêhatî azadiyê bidim axaftin. Lê belê rêhevalên me min weke serdestekî gelekî mezin dibînin. Bi girêdaniyeke feodal, bi girêdaniyeke eşîret û olê hun jê re çi dibêjin bibêjin bi wê re digrin dest. Ev ji bo min bêşensiyeke mezin e. Dibe ku ji ber vê xeteriyê nepêşxistina evîneke azad çêbibe. Lê belê hun hêza xwe bi rengekî gelekî xeter bi kar tînin. Ez dixebitim ku wê hêzê li aliyekî bihêlim û têkîliya azad biafirînim. Ango jin li gel zilamên me dibe ku biricifin. Lê belê neçarin li gel min gelekî guhertîbin.

Ger ez pêşiya girêdaniyên ku bingehê xwe ji serdestiyê digrin û pêwendiyên gelekî cihê negrim, van bi azadiyê ve girê nedim wê derbikeve holê ku ez şervanekî baş ê azadiyê nînim. Ev jî dibe xirabiya herî mezin ku ez li xwe bikim. Hun qet bi vê yekê nahizirin, berovajî hun bi vê kêfxweş

dibin. Ez ji girêdaniyên wiha nefretê dikim. Lê belê di riya girêdaniyên azadiyê de jî hewldaneke mezin didim. Li ku derê jineke ku pêwîste were azadkirin hebe weke nêçîrvanekî ez wan digrim û bi azadiyê ve girê didim. Ev jî ji bo min hunerek e. Zilam ji bo min dibêjin “jinên me keçên me nehiştin, hemû kişandin û birin.” Nêçîrvantiya azadiyê jêhatiyek e. Lêgerîneke azadiyê ye. Ev jî evînek e. Ez wiha dijîm. Wisa bawer nekin ku ev xwe bi xwe çêdibe. Yê ku bawer dike ev wisa ye hebin wê hemû jî li bin guhê erdê bikevin.

Pêwîste mirov ji bo hezkirinê ji çiya, ji asîmanan xweşik behs bike. Lê belê niha li çiyayên me bombe diteqin. Dijmin riya evînê xetimandiye nahêle çavên we vebibin. Bi tenê amûrekê ku hun himbêz bikin rêxistingerî û çalakgerî ye. Lê belê dîsa jî ji evînê û hezkirinê hêviya xwe qut nekin. Ez ji bo ku zilaman an jî jinan bixim zehmetiyê van hewldanan bi pêş naxim. Bi me hêrs nebin, protestokar nêzîk nebin. Ji bo ku hun evîndar nebûn an jî ji bo vê ji hestyariyên xwe re nêveng nedît li me nexeyîdin. Helwestên hindekî ji we tund in. Ji ber ku şêweyê jiyana ku dixwast ji dest hatiye girtin. Provakatorekî digot “te jiyana me dizî, vê PKK’ê jî emê bixin bin erdê, li Ewrûpayê keçika ku em dixwazin re jiyan bikin, lê belê tu tiştekî din ferz dikî.” Dixwast wiha tola xwe ji min wergire. Vaye xeteriyeke we ya jiyana li gor vê teoriyê heye. Li gor min jî dê li Kurdistan’ê wisa neyê jiyîn. Ev jî zagona min e. Ez dibêjim şûna ku wiha bijîn, ezê wê jiyanê bixim bin erdê. Ew jî dibêje “ew jiyana ku tu dibêjî ezê bixim bin erdê, em ji wê re dibêjin azadî, ya ku te pêş xistiye jî emê bixin bin erdê ji ber ku ew dîktatorî ye.” Îdîayeke dagirkeriyê jî ev e. Ev çespandineke yekser e. Gelo hun ji kîjan alî ne. Ger hun li aliyê min in, ji ber çi napeyîtînin ka şervanê azadiyê divê çawa bin? Ji bo çi hun nayên artêşbûnê û partîbûnê? Ger hun li aliyê me ne ji bo çi hun zû dimirin? Berovajî hun her roj bi me ve girêdaniya xwe diyar dikin. Lê belê di girêdaniya Rêbertiyê de hun gelekî bi stûtewandinê nêzîk dibin. Ji bo ku hêza we têra azadiyê nake, hun tenê serê xwe dihejînin. Ev jî dibe şêwazekî we valaderxistinê, negirêdayîbûnê yan jî di bin navê girêdayîbûnê de ne girêdanî ye.

Hun dibêjin “hezkiriyên me û malbatên me hebûn, em fêrî wê jiyanê bibûn.” Hindek kes maleke rihet, hindek hevjîn û dost, hindek ehbapger hindek jî li putekî digerin. Ji ber ku ji wê qutbûye li hemberî me bihêrs e. Naxwe ger ne wiha be gelo navenda me ev qasî giran nêzîk dibe? Kadroyên me yên pêşeng ma gelo dikarin ev qasî bi me bilêyîzin? Bi salan e hun di nava şer de ne, ger ne wiha be, gelo wê dê di avanekirina artêşeke balkêş de ev qasî israr kiriba? Hindekî protestokariya we heye. Ev jî kêrî we tê. Hun dixwazin bi şêwazên xwe ve bijîn. Ez jî bi we ve girêdayî me û girêdaniya xwe jî wiha datînime holê. Hun hêza min a dahûrandinê û afirandina derfetên pratîkî dizanin. Weke din girêdanî nabe. Kurdek kirina mirov weke din çawa gengaz e? Ne Kurd jî mirovekî azad afirandin çawa gengaz e? Hun bibêjin ez li gor we tevbigerim. Lê belê ger hun weke çareserî min bingeh digrin, ez jî van tiştan dibêjim.

Ez hewldaneke gelekî berfireh didim. Ez bi rengekî ku mirovek nikare biwêre dest diavêjim pirsgirêkan paşeroj û pêşêrojê ber çavan re derbas dikim û hindek karan dikim. Bi vî rengî ez dixebitim ku pêwîstiyên rêhevaltiyê bi cih bînim. Gelek mijar hene. Ez tenê ji bo hêza we ya çareseriyê û hizirandinê bi pêş bikeve hindek diyardeyan didim. Ji ber ku hun di bin mercên girande ne. Dîsa xwestina fedakariyê jî zêde wate nade. Tenê pêşxistina şer jî têr nake. Ev hemû bi hev ve girêdayî ne. Ji bo ku mirov bikaribe heqê van hemû tiştan bide ez dibêjim pêwîste hêza çareseriya mezin milîtaniya piralî û pêvajoyek pêwîste were avakirin. A herî rast jî ev e. Em ên kevin dirûxînin. Lê belê ji bo yê nû avakirinê jî me pîvanên xwe zêde pêşnexistine. Em nikarin vî karî bişibînin konê qereçiyan. Dîsa bi înkarkirinê jî em nikarin ji bin vê pirsgirêkê derbikevin.

## Şoreş hunera ravekirina yê nû ye

Şer di her qadê de şer e û em dizanin ku her şoreşek şerê afirandina xweşikbûnên xwe dide. Di rastî de şoreş ji bo xweşikbûnê ye. Ji bo jiyaneke ku zêdetir tê pejirandinê ye. Ango ji bo hezkirinê ye. Ger hun tenê bi rûxandinê re pêwendîdar bin, hunê bibin zordest û anarşîst. Ev jî ji bo

şoreşekê têr nake. Pêwîst e mirov birûxîne û belav bike, lê belê hun dikarin şoreşê tenê bi avakirinê rizgar bikin, an jî tenê bi avakirinê cudabûna şoreşê ji zordestiyê û anarşîzmê derdikeve holê.

Siyaset evîn e, rêxistinbûyîn evîn e, propaganda evîn e. Ma ez dînim ev qasî rêxistinkirinê bi pêş bixim? Ez ji bo evîna xwe rizgar bikim siyasetê dikim, rêxistinê dikim, ev qas derfetên şer datînime holê. Sedema pêşxistina min a azadiya jinê ji bo rizgarkirina evîna min e. Lê belê hun jî gelekî baş dizanin ez ajîtator, propagandakar û rêxistinêrekî gelekî balkêş im. Ez kesek im ku her roj derfetên şer zêde dikim. Ger hun evînê dixwazin wê demê xwe rêxistin bikin, siyasî û leşkerî bin. Vaye evîna balkêş ev e. Berovajî vê evîn dê bibe înkar. Ger hun gelekî dixwazin hez bikin, ê ku hun dixwazin jê hezbikin biafrînin. Hun dikarin ji kê hez bikin? Gelo kesekî ku bi rengekî balkêş diwêre hez bike heye? Zewac û destgirtîtî tê çi wateyê? Ez ji zewacê re dibêjim zincîrkirin. Zewac hev zincîrkirin e û girêdan e. Di demên derbasbûyî de wateyeke wê ya sembolîk hebû, ew jî rewakirina wê têkîliyê û li ser pîvanên civakê zêdekirin bû. Di me de ev yek berovajî ye. Ev têkîlî dibe girêdan, koletî ber bi derveyî rewatiyê ve dibe.

Dema me girêdaniya wê bi dagirkerî û 12 Rezberê vê çêkir hate dîtin ku ev têkîlî di dîtinê de rewa ye, lê belê di cewher de ya herî xeter e. Ji bo hestên we jî mirov dikare van tiştan bibêje. Di dîtînê de gelekî xwerû ne, lê belê hestên ku we dikişînine xiyanetê ne. Ji ber ku hun ji rêxistinê û ji şer direvin. Ev weke objektîf xiyanet e. Jixwe di dawiya roja diduyan de bi xiyaneta subjektîf ve tê bidawîkirin. Gelo ma wê demê evîn û hest li ku derê maye? Mînak bûyerên cilên bûkîtiyê hene, ew jî bûyereke sembolîk e. Gelo ma bûkek çawa xwe bi ser û ber dike? Di rastiyê de bûk bûyera xweşikbûnê dixwaze di asta herî jor de bijî. Min jî ji wê re digot, “wê kefen li xwe kir.” Dibe ku bi we zehmet be, lê belê teoriyên min hindekî wiha ne. Herî dawiyê de rastbûna vê derkete holê.

Di rastiyê de ne zilam ji jinê cihê bûye, ne jî keçikê bawer kiriye ji zilam cihê ye. Cihebûn wisa nînin. Ji ber ku çûye şer, pêwîste em nebêjin ji hev cihê bûne. Cihêbûn jî û bihevrebûn jî hindekî cudatir in. Em ji bo ku bigihên

hev gavavêtineke ev qasî mezin a azadîxwaz ji xwe re esas digrin. Dibe ku ji bo bihevrebûna mezin bi hezaran şehîd jî çêbibin. Ger hun fedakirina dayik, bav, hevjîn û dostan nedin ber çavên xwe hun nikarin gavavêtina mezin bikin. Dayik jî dema ku nirxên xwe yên herî birûmet ji bo welat şehîd didin, ji ber ku dizanin ji bo yekîtî û gihiştina mezin e, li hemberî vê berxwe didin. Weke tê zanîn hezkirina dayik û zarok di astekê de ye ku li hember nayê berxwedan. Ew pêşketinên di Kurdistan'ê de dema em tînin pêş çavên xwe şehadet jî di nav de hemû cihêbûn di wateya hevgirtinê de ye. Di giyana wan de bûyereke hevgirtinê heye. Vaye ev dibe hevgirtina netewî. Tê wateya li ser hîmê demokratîk, azadbûna gel û hevgirtina wê. Pêşmerge ji vê fêm nake. Pêşmerge tenê rojekê ji jina xwe dûr bikeve tune dibe. Pêşmerge teqez di bin bandora zagonên feodaliyê de ne. Em vî tiştî red dikin. Ji ber wê jî emê cihebûnên wiha zêde mezin nekin. Emê hevgirtinê di cihekî din de bigerin.

Em ji bo yê ku dixwazin evînê bi pêş bixin, ên ku dixwazin bigihên keçik an jî xortê ku jê hez bikin derfetên mezin pêşkeş dikin. Gelo ma hun dikarin êdî ji min çi bixwazin? Ne weke ku Pexember bihuştê wehd dike, em tiştekî ku bi qasî neynuk goşt, nan û av pêwîst e didin we. Hun dihizirin ku evîn hêsan e. Berovajî namûs û dilê Kurd nîne. Jixwe îdîa dikin ku ez ne Kurd im an jî ev bi tenê me. Li Kurdê kevin, têkîliya kevin a binketî û tunebûye dewlet xwedî derdikeve û tenê min nayê efûkirin dibîne. Ev rastî ne, ez îcad nakim. Ez bi ferzkirinê jî nabêjim min biecibînin an jî bi min re bimeşin, ger bi kêfa we ye û we biryara xwe dabe hunê bizanibin ka ez şervanekî çawa me, rêhevalekî çawa me û bi vî rengî gavên xwe biavêjin.

Ji bo çarçoveya rêhevaltiyê vebêjim, gelo pêwîste ez çi bikim? Gelo hun ji bo çi naxwazin nêzîkî fêmkirinê bibin? Bi qasî ku ez xwe nas dikim bi hevaltî û rêhevaltiyê ve mijûl dibim. Ya hîn baştir hun bikin, ez tevlî we bibim. Jixwe ez tevlî dibim jî. Dema diyardeyeke herî biçûk a zindîbûnê di we de dibînim, ez gelekî balkêş tevlî wê dibim. Hun jî hindekî hêza bilind a tevlîbûnê nîşan bidin. Sedemê ev qasî pêşxistina me ya rexneyan ji ber çareserî ev qas nêzîk e, ger pirsgirêkan ev qasî balkêş em datînin rastê ji ber

ku bersivên balkêş jî ketine dewreyê ye. Di cihekî de pirsgirêk çi qasî giran bin, tê wê wateyê ku çareserî jî ew qasî nêzîk bûye, ji ber wê jî hun dikarin ji her demê zêdetir bi hêza xwe ya serkeftinê bawer bikin. Hewldanên ku têne kirin pêwîstiyeke şoreşgeriya bi plan ku tê raberkirine. Şoreşgerek her dem xwedî plan e. Ew dizane hewldanen xwe ji hemû aliyan ve bi hesab bike û raber bike. We ew hetanî niha zêde pêk neanî, we pêwistiya me ya planê heta pêwîstiya me ya armanc û taktîkê we gelekî derbas kir. Dawiya vî karî nîne.

Şoreş hunereke ku her dem tiştê nû rave dike. Ango di nava wê de misoger disîplîn û rêpîvan heye. Em ji rêpîvanên asayî yên din ên di pergalê de zêdetir serdestiya xwe bi cih tînin. Em bi berpirsyariyeke hîn mezintir nêzîkî vê bibin. Ger hindek ji we xebatan ku weke pêwîst dike bimeşînin û hêza pêşvebirinê nîşan bidin, wê teqez serkeftinê bi dest bixin.

Me mijar bi beşekê ve danî holê, ger kêm be pêwîst dike ku mirov wêjeya vê pêşbixîne ji bo me vegotina ji bo çend romanan pêwîst dike. Pêwîst e semînerên berfirehtir werin dayîn. Di van mijaran de pêwîste helwesteke exlaqî were diyarkirin û feraseteke xweşikbûn, zayendîtî, zewacê pêwîste hebe. Ji bo van hemû tiştan dê pêwîstiya hêmanên nû diyarkirinê çêbibin.

19 Berfanbar 1994

## RIZGARÎYA JINÊ DÊ BI NIRXÊN DEMOKRATÎK ÊN WEKHEVÎ Û AZADÎYÊ VE PÊŞBI-KEVE

Dema ku xebatên jinê her dem dixebite ji bo asta jiyana azad bi pêş bixîne dixwaze pîvanên vê bi dest bixe, temsîlkirina vê xebatê ya bi biryarbûnê, hevsengiyê bi dadweriyê, ji diliyê û xweşikbûnê wateyeke mezin rave dike. Ger hun dixwazin kesekî ji hemû aliyan fêm bikin, di nêvenga giştî ya jinan de û bi taybetî komeke ku ji keçikên ciwan ên şoreşger hatiye avakirin ve venêrîna we ya wî kesî û têgihiştina we ya çawaniya wê dê gelekî balkêş be. Gelekî sedemên vî tiştî hene. Ew nêvenga ku ji keçên ciwan ava dibe, bi qasî ku ji bo pîrozî bangawaziyek e, dibe ku rê li ber nêzîkbûnên gelekî xeter jî vebike. Ji ber ku ew mijareke têkîliyan ku ji civaka çînî heta di hemû pêvajoyên girîng ên pêşketinên civakî destpêkê li ser disekine, dinirxîne, bi qasî ku ji civakbûnê re rê vedike, ew qasî ji çînayetiyê û ji çewisandina wê re rê vedike ye. Di wateyekê de tê xwestin weke malekî xwedî nirx were dîtin. Yekî ku serdest e û dikare hêzê serûber bike, ji bo ku jinê bixe nava pergala serdestiyê û bixe milkê xwe di asteke azweriyê de nêzîkî vî tiştî dibe. Rengên zewacê, rengên hest li gorî hêza wî teşe digre. Di vê navberê de tê xebitîn ku asta koletiya jinê û cihê wê yê di nava civakê de were diyarkirin. Kesayet herî zêde dixwaze di vê mijarê de xwe çareser bike. Ger em zayendîtiyê weke rastiya zayendên beramber ku dixwazin tenêbûnê herî zêde aş bikin an jî bisekinînin, pênase bikin û di pêş çavan re derbas bikin wateya wê hîna balkêştir dibe.

Me gelek caran diyar kir di xebatên xwe de bi jinê dest bi karkirin, him bi îsabet bû, him jî ji bo rast pêşketinê girîngiyeke xwe ya mezin hebû. Pêşketineke ku ji wê rastiyê bêagahî ye û dahûrîneke civakî ku xwe naspêre çareseriya vê rastiyê her dem bi kêmasiyên mezin ve rûbirû ye. Derfetên pêşxistina tevgereke civakî ya tendurist nade. Di dîrokê de pêvajoyên şoreşê yên girîng de ji ber pêwîstiya xwezayî ya şoreşê kesayetên rêber ên şoreşan li ser van bingehan teqez dixwazin mohra xwe li pêşketinan bidin. Tîpên bijarte, girtî û şoreşger dibe ku xwe li rû bidin. Şoreş çi qasî kûr û xwedî ast

be, teşegirtina kesayetan jî ew qasî balkêş dibe. Pêvajoyên şoreşê pêvajoyên zelaliyê ne. Pêvajoyê şoreşê bi qasî ku rûxandina têkîliyên kevin e, ew qasî pêvajoya gengazkirina têkîliyên nû ye.

Mirov dikare bibêje ku di rastiya me de tenê muhafazkarî rastiya pêvajoya berî şoreşê nîne. Tunebûn aliyekî herî pêşdetir a rastiya me ye. Ji her tiştî dûrbûn û tunebûn taybetmendiya bingehîn rave dike. Tiştekî ku were girtin, were parastin ne mijara gotinê ye. Di vir de damezrandina pêvajoya şoreşê hîn balkêştir e. Ger mirov li cewher xwedî derbikeve pêş xistin û rengdayîna têkîliyê wê di kesayet de derfetên bi destxistinê derbixe holê. Li gel bêhêvîbûnê dema ku bibîne qezenckirin ne gengaz e dê daxwaza qezenckirinê ya bilind û hewldanên wê hîn bihêz be. Ji ber ku cîhaneke wî ya demê derbasbûyî ku zêde were parastin jî nîne. Ne sermayeya wî, ne jî xeyalên di derbarê demên derbasbûyî de hene. Ger hun dixwazin bijîn hun pêwîstiya qezenckirinê û hewldanên wê yên mezin raber bikin. Ên ku li ser rastiya rêbertiya PKK'ê serdest e hindekî jî ev e. Di demên derbasbûyî de rewşeke nedîtina tu tiştî yan jî tiştekî ku xwedî nirx e, mijara gotinê ye. Her tişt li ser bingehê jê dûrbûn, bêhêzbûn û tunebûnê ye. Lê belê ger dest ji jinê jî neyê berdan wê demê di her tiştî de hêrseke qezenckirinê û afirandinê jinûve rengdayînê hebe. Tê zanîn ku ew jî çawa balkêş tê jiyîn.

Di têkîliyên jinê de jî ne gengaze ku mirov şopên vê yên kûr nebîne di rastiyê de dema ku rastiya rêbertiyê xwe dît an jî rave kir, weke ku ji bo bi rengê xwerûbûna keçeke ciwan de bimîne gelekî zirav nêzîk dibe. Dema tê gotin xwerûbûna keçika ciwan ev yek tê çi wateyê hun bi xwe baştir dizanin. Di giştî de jin bi taybetî keça ciwan ji ber ku di destpêka ciwaniyê de ye xwe zêde xwedî mal û milk nabîne. Lê belê ew rewşa bûyîna mal û milkbûyînê ku li benda wê ye heta serê wê di têgihiştina wê de zehmetiyê dikişîne. Xwerûtî hindekî di vir de ye. Di ciwaniya we de ev yek hîna balkêştir e. Pirsa “ezê çi bibim” her diçe derûniya wê ji bingeh ve dihejîne. Dema ji rewşekê dikeve rewşeke din û metirsiyekê dijî ji bo hêviyên xwe ava bike jî baldar e. Pirsa ezê çi bibim her diçe rewşeke sotîner digre.

Sedemên vê yên gelekî girîng hene. Civakê yan jî bi taybetî malbatê ew keça ciwan aniye rewşeke wisa ku tiştê ku li benda wê ye tenê mêrekî bişens e. Rastiyeke zilam wisa ye ku yê herî baş jî xwedî kesayetekî ye bi helwestên xwe yên bêpîvan ve di carekê de hemû azweriyên xwe ji jinê derdixîne. Bi nêzîkbûnên xwe yên ku heta êrîşkariyê diçe weke wehşekî ye, her çi qasî bi zehmetî jî çend gotinên hest ji devê wî derdikevin jî di rastiyê de neyê hêvîkirin ku ji yê hemberî xwe fêm bike û hela xwedî feraset be. Nabe ku hêvî werin kirin. Têkîliya vê ya bi pergala milk, rastiya malbat û dijmin ve heye. Bixwaze jî hêza wî têra vî tiştî nake. Zilamê me yê herî navdar jî li hemberî jinê tune ye. Çend gotinên hêsan û helwestên wiha pêş xistina wî gelekî zehmet e. Rast nêzîkbûna wî ya ji bo pîvanên rêzdarî û hezkirinê ji bo wî hîn zehmetir e. Di hemû nêzîkbûnên xwe de dê bixwaze li ser jinê serdest be, dê bixe milkê xwe û heta ku tune bike bi xwe ve girêbide. Kesayeta wî şêwazeke hetanî dawiyê tunekirinê ferz dike. Di vê mijarê de kompleksên wî, hêrs û kîna wî pêşî lê nayê girtin. Nikare tehemûl bike ku mal ji destên wî derdikeve heta ji bo axaftina wê ya azad jî tehemûl nake. Ger ketibe qada bandorbûnê û bi têkîliyên taybet hindekî hatibe girêdan dibe ew bibe sedema doza xwînê. Dema ku em li rastiya me ya civakî temaşe bikin dê bibêje “ma tuyî yê ku li keça min dinêre?” hela ew jina wî be li gor xwe helwesteke xirab raberkirin dê bibe sedama mirinê. Tiştê ku di dahûrînan de hatiye diyarkirin ev feraseteke namûsê nîne. Tiştê ku di qebîleyên Efrîqî de azad in li gel me dibe sedema qetilkirinê û ev jî rengekî paşverûtî ye. Ev pîvaneke malbatê ya saxlem nîne. Pîvaneke malbata tunebûyî ye. Derdikeve holê ku pîvanên malbata tunebûyî jî li pêşiya welatparêziyê astengiyan ava dike. Me gelek caran eşkere kir ku dagirkeriyê hîn zêdetir li ser vê bingehê vê saziyê esas digre, bi ser de diçe û dixwaze encamê bigre.

Kesayeta şoreşger bi qasî ku di pîvanên alternatîf de pêş ket ew qasî dikare hêza nêzîkbûna saxlem ji vê têkîliyê re nîşan bide. Asta azadiyê ya kesekî xwe di têkîliyên xwe yên bi jinê re û di xebatên jinê de diyar dike. Ger kesayet bi tenduristî dixebite ew xwedî xebateke gelekî binirx e. Ger di

demeke kurt de difetisîne, tevlîhev dike ev kesayet sosyalîstbûn û demokratîkbûna wî li aliyekî bimîne, kesekî ku di sînorên dijşoreşê de digere û pêwîste mirov jê bitirse. Min ev tişt bi gelek aliyan ve di ezmûna xwe de tespît kir. Nêzîkbûnê bi qasî ne baldar e, dema ku derfet dît pergala têkîliyên kevin jî li şûna xwe dihêle ji bo xebatan dibe xeteriyeke mezin. Ev pirsgirêk hîn jî refên me gelekî bandor dike. Di hêjmareke gelekî kêm de têkîlî hene ku vê nêzîkbûnê derbas dikin.

Ew asta ku tê xwestin di rastiya rêbertiyê de were girtin gelekî bi watê ye û pêwîste hun balê li vê bikişînin. Dahûrîna jinê bi taybetî jî zelalkirina taybetmendiyê kesayeta azad a şoreşger aliyekî herî girîng a polîtîkaya me ya kadro ye. Ji ber wê jî di gelek qadên me de nêzîkbûnên xelet, kêm û tasvîyekar a ji vê pirsgirêkê re tê nîşandan, li rêxistinkirinê û artêşbûnê bi rengê tasviyekariyeke gelekî pêş de xwe dide nîşandan. Mînakên vê gelekî dewlemendin. Me ev derxiste holê. Têkîliyeke hêsan û amade nabe. Hezkirin ji xwe bi pêş nakeve. Weke ku hun bawer dikin nikarin hestiyar bin. Dilê we gelekî bixwaze jî hun nikarin evîndar bin. Zagonên vê hene û em ji vê re dibêjin zagonên evînê.

Ez berhemên wêjeyî zêde naxwînim, heta ew berhemên bi rengê çîrok û destanên di nava civaka me de jî naxwînim. Lê belê bi zanyariyên xwe yên ji rêzê jî min karî derbixime holê ku Mem û Zîn di pêvajoyeke demokratîkbûna netewî de kilîtbûneke feodaliyê raber dike. Dema mirov kesayetên heyî lêkolîn bike pêşketineke netewî û hindekî din demokratîk tê xwestin. Ji ber ku ev di kevneşopa me de gelekî bi bandor e, hema di dîroka gelek netew û gelan de wiha ye, xwe weke çîrokeke evînê bi lêv dike. Di rastiyê de pêwîst dikir ku keçeke beg gelekî bi hêsanî bikare bi kurekî beg re têkîliyê bi pêş bixîne. Ji ber ku zewacên ew bi hev re bikin dê wan bihêz bike. Serdeman navîn bi mînakên vê ve dagirtiye. Jixwe çîna feodal hindekî li ser vê bingehê ava bûye. Lê belê vê carê li ser vê bingehê ava nabe. Di Mem û Zînê de ev yek wiha bi pêş nakeve.

Ev berhem di dawiya sedsala 16’an de tê nivisîn. Em dawiya vê sedsalê bihizirin yekcar tê fêmkirin ku ev dem demeke ku hêviyên yekîtiya netewî

di giraniyê de ne û astengiyên feodal li pêşiya vê yekîtiyê astengiya herî cidî ava dike. Muhafazakariya feodaliyê, perçekirin û dijmintiya feodalî ew qasî bêrehm tê birêvebirin ku mirov dikare jê re bibêje destan e. Neserxistina vê ez fêm dikim. Ev evîn ji bo çi bi neyînî encam bû? Min bi pratîka xwe ve jî danî holê. Heta hun kadroyên me hindekî temaşe bikin hun dê bibînin ku di wir de her cure pîvanên feodal û bûrjûvaziya biçûk heye. Ew kesên nû çêdibin ferzkirinên wan ên pîvanên bûrjûva hene. Gelek ji we feodalên çavtarî ne û bûrjûvaziya biçûk ên çavtarî ne. Ez kesek im ku min hindekî ev pîvan derbas kirine. Ez dixebitim ku rêbertiyeke netewî, demokratîk û sosyalîst bikim. Li hemberî nirxên feodaliyê û dîsa nêzîkbûnên bûrjuvaziya biçûk jî heman tekoşêriyê berdewam dikim. Ji bo gihiştina taybetmendiyên sosyalîst hêzeke mezin didim. Welatparêziya sosyalîst û demokrasiya sosyalîst bi rengekî ku taybetmendiyên demê gelekî derbas dike tê jiyîn.

Ev bi yekîtiyeke weke yekîtiya PKK'ê dikeve rewşeke vînbûyînê. Heta dijmin jî dibêje "ev ne partiyek e, heta yekîtiyeke netewî jî nîne, binkeyeke hîn pêşdetir e." Di nava xwe de xwedî maf e, di vir de çîroka jinûve afirandina netewekî heye. Bi qasî ku li ser bingehê demokratîk riya ku diçe sosyalîzmê de û bi destxistina mirovên nû de gelekî zirav e pêşketineke ku di her mijarê de bi mirovê kevin re pevçûnê esas digre jî heye. Ger mirov kûrtir bike di rastiyê de ev tenê şerê eniyê nîne ji wê wêdetir tenê şerekî çînî yê civakî jî nîne. Wê were dîtin ku şerekî çand, hest, derûn û şerekî vejînê yê gelekî radîkal e. Jixwe ji ber xwezaya vî karî neçare bi vî rengî be jî. Weke din dahûrîna Kurd û vejîna Kurd ne gengaz e.

Hun di asteke mezin de kesayetên mirî ne. Di hêmanên taktîkî yên herî bingehîn de jî hun ew qasî paşketî ne ku vê tenê hun dikarin bi kesayetên mirî ve rave bikin. Rastiyeke ku gelekî hêsan şaşiyan dike û ber pozê xwe jî nabîne, gelo mirov dikare weke din çi navî lê bike? Ji bo vê rastiyê mirov nikare bibêje çepgirî yan rastgirî jî. Em ji bo vê dibêjin rastiya nîvbelavbûyî û xirabûyî. Hêmanên jiyanê ku hun tê de tengav dibin hene. Hun dibêjin "ez hezkirinê nizanim, ji bo hezkirinê nikarim vekirîbim yekcar xeletiyan dikim, xwe tune dikim û bi lez dibime kole." Ev tişt datîne holê ku hun gelekî

wêdetirî jiyanê ne. Rengekî tevlî jiyanê nakin û dewlemendiya we ya jiyanê ava nabe. Jixwe hun wisa ne jî. Ger em bi gotinan bînin ziman hun dê bibînin ku bi taybetmendiyên gelekî paşketî yê şerê we yê netewî, demokratîk heta bi pîvanên dijmin ve hun dijîn. Ji ber wê jî di taktîk de, di jiyanê de, di raveya wê ya rêxistinî û çalakiyê de hun ne serkeftî ne. Wê demê di rewşekê de ne ku dijmin dixwaze we bixe qurbanê pêvajoyên ew dixwaze tune bike. Di vê wateyê de pêwîste hemû çîrok bibe vî tiştî di kesayeta we de berovajî bikin. An jî dema ku hun dibin mijara gotinê hest û têkîliyên hêsan dikevine bîra mirovan. Her kurekî ciwan û keçeke ciwan hatine gel hev bi lez têkîliyên van bi pêş dikevin. Gelo ma ev rast dibe? Hun di vê mijarê de bi pêşketineke balkêş a rêbertiyê re rûbirûyê hev in.

Hun ji pergala têkîliyên gelekî hêsan hatin. Heta hun bi xwestek û hînbûnên pergalê ve ew qasî ketine nava hev dibe ku serê we jî were jêkirin, em nikarin we ji wan têkîliyan qut bikin. Dibe di wir de mirin heye. Bêguman di vê mijarê de dahûrîna hest, dahurîna evîn û hezkirinê nirxeke mezin rave dike.

Paşverûtiyên 12 Rezberê ku ji bo malbat û jiyanê anîne mirov nikare biçûk bibîne. Li holê ye ku bi hevkariya çandî ya emperyalîzmê re ev hîn jî tune kiriye. Ciwanên ku têne nava şer de dibine bela. Ji ber çi wiha ye? Li gel pûçbûna serdema feodal cudaxwazî û heta bi dijmintiya wê ve xistina emperyalîzmê di zayendîtiyê de şoreşeke dijber a misoger e. Hun ji wê jî bandor bûne. Encam kesayeteke dijşoreşê ya mezin e. Ev kesayet dibe bela. Rastiya rêbertiyê van hemû tiştan dibîne. Ger em ji aliyê hest û wêjeyî ve li vî karî temaşe bikin, ger em dahûrîna şoreşê di vî alî de pêş nexin, ew xetimandin, qeyran û çewisandinên ku em gelek caran diyar dikin ve dê şoreş xwe bi xwe û bêyî ku careke din biçe serkeftinên mezin dê tune bibe.

Li ser vê bingehê gelo ma derûniya keçeke ciwan çi wateyê diderbirîne? Vê keça ciwan zexta feodalîzmê dîsa xeteriyên xistina pergalê ya gelekî xirab dîtiye. Ev rewş di wê de zexteke derûnî diafirîne. Ji ber vê sedemê gavavetina jinê ji bo azadiyê watedar e. Ew berteka ji nêvenga ku me behskirî ve her tişt dayîna ber çavên xwe û tevlîbûna tekoşînê jî pêşketinek

e. Lê belê ger bêçek bimîne, zimanê xwe nikaribe bikarbîne, dilê xwe nede axaftin, hela di rêxistina siyasî de lewaz be ev tevlîbûn dişibe tu gava destpêkê di daristaneke gelekî tarî de biavêjî û her dem rûbirûyê xwarin û daqurtînê werî. Sotîneriya tekoşînê her dem wisa ye. Ger nayê xwestin şoreş di vir de were wendakirin û di çîtikên feodaliyê de were perçekirin, nayê xwestin di dijşoreşbûna bûrjûvaziya biçûk de û ji rê derketina wê de were wendakirin pêwîste bi ziraviyeke mezin şoreşgeriya keça ciwan were pêşxistin.

Çawa ku serxwebûna welatekî û azadiya gelekî em pêk tînin, emê azadiya keçeke ciwan jî zindî bihêlin. Di nêzîkbûna Rêbertiyê de ev alî gelekî balkêş e. Lê belê kadro vê yekê pir zêde fêm nake. Em demeke dirêje di refên me de dixebitin ku zindîbûna keçeke ciwan li ser piyan bihêlin. Min hetanî niha nedît ku yekê serê wê dixebite ji vê yekê encamê derbixe. Di rastiyê de ev gelekî girîng e. Ger hun baş temaşe bikin ez dixwazim we di zindîbûna keçeke ciwan de her dem xwerû û pak bigrim. Ev yek tê çi wateyê? Ger ev rewş di tekoşînê de were têgihiştin û derbasî welat bibe, di rastiyê de ev dê ji bo welatekî serbixwe û gelekî azad bibe pîvanek û modelek. Ev di cihekî de yekîtiya netewî ye, demokrasî ye, têkîliya azad e û hezkirin e. Di xwe birêvebirina rastiya Rêbertiyê de ev alî gelekî balkêş e û li holê ye ku rexmî we vî tiştî bi hostetiyeke mezin çawa dimeşîne.

Di rastiyê de ev qas bal kişandina bihevrebûna azad û wekhev a bi hezaran keçên ciwan û xortên ciwan û dayîna pîvanên ku pêwîste li pergala têkîliyan serdest be şerekî mezin a netewî demokratîk e. Ger gengaz be ev di heman demê de li ser vî bingehî pêşxistina hestan e. Ew jî şerekî mezin e. Ew asta evînê ku di mînaka Mem û Zîn de nehatiye pêşxistin di rastiya Kurd de hatina bidestxistine. Ez nabêjim min ev yek berê plan kir û pêş xist, lê belê ji ber ku ez bi zanistî nêzîkî rastiya netewî dibim û demokratîzmeke gelekî radîkal esas digrim, min ev hewldan raber kirin. Ez yek carê bi hestên xwe nikarim bidim daqurtandin ku keçeke ciwan bikeve rewşekê ku bibe mal û milk. Di “çîroka vejînê” de çîrokeke ku dişibe vê yekê heye. Tevî ku ji ser zewaca keçeke ciwan di gundê me de heftiyek derbas nebû, min asta

wê ya bûkbûnê cidî nedît. Wê demê gotina min a ez dixwazim bi wê re lêyîstokê berdewam bikim, gelo di rastiyê de tê çi wateyê? Ew zewaceke feodalî bû, kesayet ji jiyana azad û ji lêyîstokên dema zarokatiyê dûr xist. Hîn wê demê jî min didît ku gelek tişt tên wendakirin û bertekan datîne holê. Li hemberî saziya zewacê nêzîkbûneke min a metirsîdar hebû.

Di gelaleya romanê de hindek tişt hatin ziman. Tiştên ku malbatê di mijara jinê de ferz dikirin, di min de guman û metirsiyeke mezin diafirand. Lê belê ji aliyekî din ve jî pêwendiyeke min a ji jinê re hebû. Misoger pêwendiya ji jinê re tenê weke ku di civakê de tê fêmkirin yekcar zilamtiya xwe ispat bikim, xwetêrkirina zayendî pêk bînim, wiha bi dest nagrim. Weke divê qey xaçepirsek e ez nêzîkî dibim. Gelo di nav de çi xeterî hene, gelo dê bi ku ve bibe? Bi qasî di vê mijarê de ez gelekî şiyar im, di serê xwe de jî bi pirsnîşanan nêzîk dibim. Ez dixebitim ku xwe ji xeteriya vê saziyê xelas bikim.

Di têkîliya jinê de nêzîkbûna gumanbar û rexnekar pêwîstiya xwe bi nêzîkbûneke ku li pîvanên azad baldare heye. Ji bo di têkîliyên hatine avakirin de neyê wendakirin rê li ber şerekî mezin vedike. Ger bihata wendakirin an bi koletî yan jî bi şêweyekî gelekî bi bertek bihata çareserkirin PKK dernedikete holê. Wateya derneketina holê ya PKK’ê jî ji hemû aliyan ve wendakirina netewekî û -mercên 12 Rezberê jî were hizirandin- tunebûna ji hemû aliyan ve bû. Ev dê bi tenê ya partiyekê na wendabûna netewekî û wendabûna wê ya ji dika dîrokê hemûyî bû. Di vê mijarê min xwe bi baldariyeke mezin ve dadinî holê. Ez li hemberî hevkariya dewletê ya vê têkîliyê taybetmendiyên wê yên nêzîkî pîvanên arîstokrat û asta wê ya ku ber bi bûrjûvabûnê ve diçe şiyar bûm. Dîsa nirxên şoreşgerî yên çêbibin jî min di pêş çavan re derbas dikir. Min dixwast ez vê têkîliyê bi rengekî bingehê xwe yê siyasî girantir e têbigihêm. Lê belê di heman demê de bi xwe wendakirinê ve min nedigot têkîliya jinê û min pîvan wenda nedikirin. Rexmî ku hest hebûn, ez radestî vê nedibûm. Min bi xwe re şerekî mezin dijî û weke ez ji vê direviyam. Dîsa jî min nedixwast dest ji vê têkîliyê berdim. Ji ber ku di nava vî karî de dewlet, civaka kevin a

paşverû û bûrjûvaziya noker li gel vê jî nêzîkbûneke ku tunekirina Kurdistan’ê ji xwe re kiriye armanc hebû.

Ji aliyekî din ve jî ger ji sedî yek aliyekî vê têkîliyê ku were rizgarkirin hebe, ji bo wê pêwendiyek hebû. Di cihekî de pêwendiya vê bi welatparêziyê re heye. Ger aliyekî vê yê were rizgarkirin hebe ev dê baş be. Nexwe dê şer bi pêş bikeve. Nêzîkbûneke me ya wiha heye û ev nêzîkbûn jî rast e. Ji ber têkîliyeke ku Kurdistan’ê tune dike mijara gotinê ye. Ger aliyê wê yê nokeriyê nehatiba dîtin, piştî ku hate dîtin bi wê re şer çêneba, misoger ne PKK ne jî şerê PKK’ê derdikete holê. Bi qasî ku şêwazê me zanistî ye ew qasî jî vînî ye. Bi qasî ku ji bo tiştên erênî nirxeke mezin tê dayîn, li hemberî taybetmendiyên dijmin jî ew qasî şiyar e. Di encam de ev şer rê li ber encamekî bêhempa ji serkeftina PKK’ê re, ji jiyîna pêvajoyeke gelekî girîng a rizgariya netewî re, ji gihiştina pêşketineke asta herî jor de ya rizgariya jin û demokrasiya gel re vedike. Ger em vê dahûrînê bi pêş bixin, di nava wê de hesabxwastina ji sedan salî heye. Bi qasî şerekî ji bo hêviyên we hemûyan e, şerekî li hemberî paşverûtiyan jî heye. Ev şerekî netewî ye. Jixwe afirandêriya me ya mezin hindekî di vir de veşartiye. Em vê bûyerê weke têkîliyên du kesan bi dest nagrin. Têkîliya di asta netewî de bi dest digrin. Encamên wê yên siyasî pêş çavan re derbaskirin girêdaniya wê bi rêxistin û şer ve dîtin û li ser vî bingehî nêzîkbûna kesayet girîng e. Yê we jî berovajî bi pêş dikeve û ji ber vê jî hun wenda dikin. Hun têkîliyên xwe dualî ji siyasîbûnê, rêxistinbûnê û dîrokîbûnê gelekî qut dikin. Hun têkîliya gelekî şexsî dikin û dikine milk. Di encam de hun bi vê ve xwe tune dikin. Sedemeke herî girîng a wendakirina we bi vî rengî derdikeve pêşberî we.

Ji aliyekî din ve hun dikarin têkîliyan înkar bikin û hun dikarin bi hêsanî ber bi jirêderxistina têkîliyan ve biçin. Hun nikarin xwe bi xwe hestên xwe rave bikin, pîroz bikin û veguherînin. Di vê mijarê de yekcar durûtî tê pêşxistin. We têkîliyek xistiye dilê xwe û hun çil salan bi wê re dijîn. Dahûrîna we ya têkîliyan nîne. Ger ev têkîlî ne li gor berjewendiyên we be, wê demê jî hun wê înkar dikin û dixwazin jê xilas bibin. Îhtîmaleke mezin hun wiha dijîn. Ew çîroka ku tê gotin, “dema derfet dît, an diçe gewendeyan

an jî diçe zirneciyan” pêk tê. Lihevhatineke bêpîvan bi taybetmendiyên dijmin her cureyê taybetmendiyên bûrjûva ve hetanî di bin fermana wê de şerkirin tê jiyîn. Dema ku keçeke ciwan derfet dît xwe yekcar xistina nava têkîliyeke din tê vê wateyê. Pîvan nîne, hizirandin nîne, gelekî seranser e yan jî gelekî ji jiyanê qut e û weke miriyan e. Ev jî bi kêmanî bi qasî yê din xeter e. Keçeke ciwan nabe ku weke miriyan be, dê berovajî bibe temsîlkarê vejîne, bibe çavkaniya hezkirinê, dê balkêş û sotînêr be. Lê belê gelek ji wan di vê mijarê de weke miriyan in. Bi kesayetên ku bêhn bi wan ketiye ve gelo kîjan şoreş, kîjan jiyan bi azadî tê avakirin? Wateyeke din a bûyîna keça ciwan jî ji bo şoreşgeriyê gelekî vekiriye. Ji ber ku bi pergala mal û milk ve zêde têkîliyê xwe nîne. Tê xwestin ku ew her dem bibe mal û milkê hindekên din û berteka wê ji bo vî tiştî heye. Dîsa bi pergala kevin ve zêde têkîliya xwe ya berjewendiyê nîne. Ji ber vê sedemê dikare bi hêsanî li hemberî pergalê bibe xwedî bertek. Dikare bi hêsanî li hemberî têkîliyên ku ne li gor berjewendiyên xwe ne bisekine.

Jin di nêvenga azadiyê de weke şoreşgereke objektîf e. Li ser bingehê ku nebe mal û bi koletiyê ve neyê girêdan, jin şoreşgereke mezin e. Hele keçeke ciwan şoreşgertir e. Bi israr pêşxistina wê ya vê asta xwe û bi israr domandin dibe ku qasî jê tê bawerkirin zêdetir rê li ber bûyîna xwedî ristekî şoreşger vebike. Ev yek jî bi hêza we ve nirxê ku hun didin rizgariya netewî, demokrasiyê, pîvanên wekhevî û azadiyê ve girêdayî ye. Ger hun gelekî girêdayî ne, pêwîste hun şervantiyeke gelekî kûr esas bigrin, bibin raveya vê ya rêxistinî û hestan. Bi taybetî ew keçika ciwan girêdana şoreşê ya bi şer ve û bi rêxistinkirina wê ve di asteke mînak de dimeşîne. Ew keça ciwan di vê wateyê de di rewşeke ku xwe di şoreşê de digihîne serkeftinê de ye. Mizgîniya serkeftinê dide, di şoreşê de sembolê bi dest dixe û di gelek şoreşan de mînakên vî tiştî hene. Di şoreşa Îslamê de, ya Fransizan de, di şoreşa Rûsan de em dikarin ji bo vê gelek mînakên din jî nîşan bidin.

Ez dizanim ku di vî alî de hindek hêviyên we hene, lê belê ez dizanim ku hun ji stûyên xwe, ji lingên xwe, ji dilên xwe û ji gelek cihên xwe ve bi zincîran hatine girêdan. An jî we xwe bi zincîran ve girêdaye. Bi qasî ku

erka me perçekirina van zincîran e, di bin navê nûjeniyê de bi hindek zincîrên din ve girêdan nîne. Bisemtiya me ya mezin û şiyarbûna me dihêle ku nêvenga partiyê ji bo bi kêmanî jiyîna azad guncaw be. Ger hun zerarê nedin vê û bi erzanî negrin, hunê bikaribin ristên xwe hîn bihêztir bilêyîzin û lezekî bidin pêşketina şoreşgerî. Bi qasî ku vê kûr bikin hun çavkaniya hezkirinê ne û hun nikarin bûyîna çavkaniya hezkirinê bi erzanî bi kar bînin. Hunê çavkaniya hezkirinê bînin asta netewî. Hunê bixin malê vejîna gel. Hunê xwe di vê mijarê de ji bo netewbûnê û gelerîbûnê amade bikin. Bi tenê hun dikarin wiha asta netewî bi dest bixin, ango ne weke malê kesekî bûyîna nirxê netewekî û xwe tevlîkirina gelekî ku vedije ve gengaz e. Rastiya Rêbertiyê jixwe di vê mijarê de mînaka herî mezin ava kiriye.

Di vir de ji têgehên weke kaprîs, hesûdî, ezezî, seranserî û bûyîna koleyê hestan re cih nîne. Dîsa ji bo têgehên weke xetimîn, tirs, bûyîna mal û milk an jî hestên bi destxistinê, nezanî, her dem hatina xapandin û hatina lêyîstokê re cih nîne. Ew keseke ku ji her alî ve di zanebûna kûr a rastiyê de ye, ristê xwe baş fêmkiriye û wê jî bi tekoşîneke mezin ve dimeşîne. Em dixwazin wateyeke wiha bidin rastiya jina azad. Di giştî de rastiya milîtaniya azad di jinê de şênberbûna wê dibe ku wiha balkêş be. Dema ku balkêş bû jî asta şoreşê hîn pêşketîtir e. Li ser vê bingehê ber bi avakirina civakê ve çûyîn dibe ku şoreşa me bibe cihekî ku ji şoreşên berê ku çêbûne hîn wêdetir bibe. Ev hêsanî pêk nayê, hêvî ye. Lê belê her şoreş hindekî jî wiha ye. Mezinbûna hêviyan û kûrbûna hewldanan, çawaniya vê şoreşê, hêza wê û cihê wê yê di dîroka mirovahiyê de diyar dike.

We dest pê kir ku hun rastiya Rêbertiyê ji van aliyan ve fêm bikin. Em jî dixebitin ku xwe hindekî din dahurînin. Em di pêvajoya şoreşa netewî û demokratîk de ne. Rêbertiya vê kirin erka we hemuyan a jêneger e. Hun zehmet têne qezenckirin û zehmet tên pêşxistin. Xwe bi hêsanî nedin tunekirin û bikaranîn. Dibe ku malbatên we, hun mezin kirine û parastine, lê belê weke koleyekî û weke heyîneke ku ji dest derbikeve dîtiye. Hun cara yekê di nava malbata partiyê de derfetên jiyana azad bi dest dixin. Ev jî bi destxistineke zehmet e. Ger em yekî didin, pêwîste hun wê bikin deh û

biparêzin. Dibe ku bêezmûniya we, we bixelitîne, dibe ku ciwaniya we, we bibe bêhesabiyê û bêpîvaniyê lê belê pêwiste ku hun derfetê nedin vî tiştî. Pêwîste bi qasî hunê rasteqîn bin, qîmetdayîna vê û parastina wê dê ya we be.

Hun xwedî jiyana azad in û yê ku we kûr bike jî hun in. Tiştê dikeve ser milên me jî ezmûnên xwe danîna holê ye. Pêwîste hun tu caran ne asta hestyariyên erzan, têkîliyên erzan û kesên ku bi hêsanî tên van têkîliyan nebin. Misoger divê hun xwedî rêgez bin. Ji xwarin û vexwarin û razanê bigrin, heta birina qadên şer ên gelekî dijwar jî, divê hun baldar nêzîkî rêgezên xwe bibin. Misoger divê hun bi her kesî bidin hîskirin ku hun xwedî rêgez in û hun di bin fermana wê de ne. Hun dikarin jinbûna xwe ya azad wiha bi dest bixin. Berovajî hun dê bikevin, werin xistin û bi qasî ku hunê werin bikaranîn ku cihêbûna we ya ji paçekî namîne. Hunê bikevine rewşekê ku hun ji wê jî bênirxtir bin. Ev jî wendakirineke gelekî xirab e. Dibe ku her dem ev xeterî were serê we. Ji vî alî ve şoreş û di şoreşê de hêsan wendanekirin girîng e.

Li gel me hezkirin bi tenê şerekî şoreşgerî ya wiha ve girêdayî ye. Yê ku şerê şoreşgerî wiha bi pêş naxin, gihandina wan a hezkirinê jî ne gengaz e. Tiştê ku ev bi navê hezkirinê bikevine navê sextekariyek e, xwe xapandin e. Ew jî bi taybet kesayeta jinê bi qasî bikaribe wê bixîne, bîne rewşa jina ketî. Ji bo ku xwe avanekiriye û bêhêz e her dem li wê tê dayîn. Dema ku hun ber bi vî sînorî ve hatin mirinê hilbijêr in. Di vê astê de mayinê qebûl nekin. Di vî alî de divê şoreş ji bo we bibe mijûlahiyeke herî girîng. Ji hezkirinên hêsan û hatina hezkirinên wiha, ji azweriyên hêsan re rê nedin. Lê belê bêyî ku hun bibin çavkaniya hezkirinê ya bihêz jî, hun nikarin rola xwe bilêyîzin. Hezkirin û hatine hezkirinê divê di keçeke ciwan de, di asta herî pêş de were temsîlkirin. Bi qasî rêgezên wê pêwîst e hun jidiliya wê û xweşikbûna wê jî bi dest bixin. Di vê mijarê de zirav bin û heta bibin mînak. Ez zêde bawer nakim ku zilam di vê mijarê de serkeftî bin. Jin zêdetir dikarin serkeftî bin.

Ezê jî heta ji destên min were bixebitim û wiha bibim. Misoger rastiyeke Rêbertiyê heta zagoneke Rêbertiyê heye. Zirav e, bi qasî ku li hemberî

kolekirinê û her cureyê xistina jinê ye, bertekeke wî ya mezin li hemberî nêzîkbûnên muhafazakar ê ku hezkirinê tevlîhev dike û ji cewher derdixe jî heye. Li hemberî van disekine û baweriyê bi xwe tîne. Li ser bingehekî rast çawa dê bigihê hezkirinê, çawa wate were dayîn, ji bo kesayeta jin têkîliya wê bi hemû rastiya civakî û netewî çî ye şîrove dike û van dixwaze li cihê wê bide rûniştandin û di encam de ewleye ku vê qezenc bike. Ya ku pêk tê jî hindekî ev e. Hun dibêjin em di mijara Rêbertiyê de gelekî xelitîne, li gor min ev nêvengên ku hun jê hatine de jî Rêbertî ji bo we gelekî tevlîhev hatiye vegotin. Gelekî seranser hatiye vegotin. Ez vê yekê xirab nabînim, ji ber ku asta têgihiştinê ya binkeya me ya kadro bisînor e. Ne di wê astê de ne ku ji rastiya dîrokî û rastiya şoreşê wisa têbigihên. Nêzîkbûneke jinê ya ji rêzê ji bo wan evîneke mezin e. Yan jî têkîliyeke ji rêzê ji bo wan mal û milk e. Ne gengaz e ku şoreşgerekî wekî min wiha be û pêwîste neyê hêvîkirin. Di heman demê de şoreşgeriya me belavkirina têkîliyên wiha ye. Dixebite ku ji girêdaniya gelê Kurdistan’ê ku tune dike, ji têkîliyên koletiyê heta ji têkîliyên malbat û zewacê bikişîne. Dixebite ku ji hestên erzan û zayendîtiya ku dixe rizgar bike. Girîngiyeke mezin dide ku ajoyên zayendî werin pîrozkirin. Him di teoriya xwe de him ji pratîka xwe de vê mijarê weke xebateke girîng dibîne û tiştê pêwîste dike.

Yê ku ev tişt fêm nekirine dibe ku piştî pêncî salan fêm bikin. Lê belê ya girîng sî neanîna ser mezinbûna şoreşê ye. Yê ku xwedî aqil in dikarin ji xebatên me hêzeke mezin bigrin û encameke girîng derbixin. Em ji bo xatirê pergalê û derûdor şoreşê nakin. Berovajî rexmî derûdor –dibe ku ev derûdora partiyê be jî- û pergalê em şoreşê dikin. Ez gelekî baş dizanim ku ger hun bi halê xwe ve werin hiştin, dibe ku ji aliyê fîzîkî, giyanî û hizrî ve çend roj temenê we hebe. Hewldanên me we zindî dihêle, hindekî hun ber bi kêleka jiyanê ve tên kişandin, ji ber wê jî emê vî tiştî bidomînin. Ji her demê zêdetir emê bi xwe ewle bin û bi berhemdarî ve berdewam bikin. Hindek nirx hatine bidestxistin, emê zêdetir bi destxistinê jî bizanibin.

Hun jî bixebitin ku azad tevlî bibin û gelekî kûr bibin. Li ser vê bingehê qezenckirina we bi xwe dê bibe destkeftiyên me hemûyan.

**28 Reşemî 1994**

# YEKÎTÎYA KU DI PKK'Ê DE PÊK TÊ EVÎNA HERÎ MEZİN E

Roja jinên kedkar a cîhanê di heman demê de roja Kurd e. Min ev mijar cara yekem bi rengekî serûber 8 Adarê ya 1987'an de bi berfirehî bi dest girtibû. Di rojên destpêkê ku me ev mijar bi dest girtiye hetanî niha me diyar kir ku ew azadiya di PKK'ê de pêk tê û pirsgirêka azadiya jinê bi rengekî pirsgirêka zayendekê bi destgirtinê zêdetir em di vê mijarê de xwedî nêzîkbûneke ku aliyê xwe yê civakî û siyasî hîn girantire ne. Ev jî gelekî di cih de ye û him jî nêzîkbûneke rast temsîl dike. Vê gavê ev yek zelaltir tê fêmkirin. Di vê mijarê de jî derfetên partiya me ya çareseriya bîrdozî û siyasî kûr dibe û pêş dikeve. Me çi qasî rastiyên çînî û netewî bi dest girt û kûrbûnek pêk anî, ji bo destgirtina rastiyên jinbûn û zilamtiyê jî astên nû didin bidestxistin.

Sedema vê ya herî bingehîn ev e. Ger di cihekî de jinbûn ketibe rewşekî ku mirov nikare tê de bijî, bi heman rengî zilamtî jî heta vê rewşê hatibe di wir de karê ku destpêkê were kirin, mirov serê xwe bixe nava her du destên xwe bibêje ev tişt ji bo çi wiha bû û bihizire.

Di rojên dawiyê de di nava civakê de çalakiyên harbûnê gelekî pêş ketine. Bûyerên weke zarokên xwe serjêdike, xwe ji piran ve diavêje, hestên erzan û mînakên ku mirov xwe dixine amûrên azweriyan û nayên naskirin gelekî tên jiyîn. Bi qasî jinan zilam jî hemû riyên pêşketinê li aliyekî dihêlin. Di mijara jinê de ji xwetunekirinê heta gelo dimire yan jî dijî, ku ew jî nikare sînorên wê dayne holê her tişt mijara gotinê ye.

Emê dest bi jin û azadiya jinê, zilam û azadiya zilam bikin. Lê belê ev mijareke gelekî zehmet e, bêguman em nikarin vê bi hemû aliyan ve dest bigrin. Tenê emê bala xwe li hindek hêmanan bikişînin û hîn zêdetir jî dikarin wateya wê ya di nava dîroka tekoşîna me de bidin.

Heyîneke ku balê dikişînê, malek û têkîliyeke ku ketiye rewşeke ketî lê belê zindiyeke ku herî kêm tê nasîn. Tê gotin bêyî wê nabe, lê belê bi rengê

xwe yê heyî ve rastiyeke têkîliyan a ku bûye mijara rewşeke ku nayê jiyîn û tu caran nayê bi destxistin. Rengeke têkîliyê ku herî zêde pê ve tê girêdan, lê belê girêdanê herî zêde tevlîhev dike û herî zêde bêwate dike. Saziya harkirina civakê malbatgerî û taybetî li gel me asta wê û pêşketina wê ye. Qada têkîliyan ku tunebûna jiyana civakî bi rengekî herî balkêş tê jiyîn, cîhana hêviyan ku tu rastiyeke wê jî nemaye. Têkîliyên ku gelekî bi çavtarîtî nêzîkbûn çêdibe, lê belê herî zêde rûbirûyê xiyanetê dimîne... gelo ma emê çawa ji bin van hemû tiştan derbikevin? Hunê çawa ji bin ew têkîliya pêwîstbû herî pîroz û rêzdarî nêzîkbûneke çêbibûya, ketiye rewşekê ku herî zêde hatiye xistin û herî zêde bêrêzî tê de tê jiyîn derbikevin?

Pirsgirêk bi giştî di cîhanê de tê nîqaşkirin, her welat û netew kêm zêde dixwazin hindek tiştan bidin, destpêkê ji jina xwe û ji malbata xwe dest bi vî karî dikin. Dibe ku vê gavê hêza me têra wî tiştî neke. Di mijara nêzîkbûnên giştî cîhanê de ji bo vê pirsgirêkê em gotinên mezin nekin. Heta di derbarê rewşa civaka xwe de jî em gotinên mezin diyar nekin. Gelo emê civata biçûk a partiya xwe çawa amade bikin? Di vê mijarê de em hindekî berpirsyar in û erkdar in. Jin ji jinbûna xwe poşman e, zilam jî ji zilamtiya xwe poşman e. Ger kar hatibin li cihekî rawestiya bin û hatibe rewşekê ku êdî jiyan nayê berdewamkirin ger jiyan ji aliyê herî bingehîn ve tê hereşekirin, gelo em dikarin behsa kîjan jinê û zilamî, kîjan têkîliyê û pêwendiyê bikin? Rastiya PKK’ê di vî alî de jî rewşeke balkêş derdixe pêş. Jixwe taybetmendiya Kurd gelekî nêzîkî taybetmendiya jinê ye. Rexmî ku gelekî xwe bi zilamtî nîşan bide jî ev yek wisa ye. Tunebûna jinê ya civakî û siyasî çi be, civaka Kurd jî zilamê Kurd jî bi taybetî kesayeta wî ya civakî û siyasî tam jiniktî ye. Ev hêmaneke xwedî nirxekî were lêkolînkirin e. Di navbera jin û zilam de bi tenê di wateya biyolojîk de cudabûnên zayendî yên xwezayî hene. Ez di wê baweriyê de me ku derveyî vê tu cudabûneke civakî, siyasî û çandî nîne. Em neçarin vê yekê fêm bikin, ji ber ku weke din em nikarin vê birînê teşhîs bikin.

Ji bo jinê pêşketina civakî hele pêşketina siyasî û leşkerî nayê hizirandin. Ew ji berê de mehkumê mêrê xwe, mehkumê zilamekî ye. Zilamê Kurd jî

zêde li pey pêşketîbûna civakî, siyasî û leşkerî nîne. Zilam çi qasî mêrê jinê be, serdest, zordest û dagirker jî ew qasî mêrê zilamê Kurd in. Şibandineke gelekî balkêş e. Ew bi rastî jî watedar e. Aliyê vî karî yê seyr di vî alî de zilam çi qasî dişibe jinê, di civaka me ya zilamî de ew qasî ji aliyê fîzîkî ve bi zilamtiya xwe şad dibe. Pêwîste mirov vê yekê lêkolîn bike. Ji aliyê, siyasî, civakî, çandî, leşkerî heta aborî ve derketina derveyî civakê ya mirovê Kurd em dikarin bi hêsanî bipeyitînin. Gelo ma hun ji bo xwe leşker in? Naxêr. Gelo ma hun dikarin siyasetê bikin? Naxêr. Gelo ma xebatên we yên aborî hene? Naxêr. Gelo ma em dikarin çanda xwe bijîn? Naxêr. Di jinê de jî ev wiha ye. Wê demê ji bo çi ew qasî kêfa we ji taybetmendiyên zilamtiya zêde re tê? Tenê hun di wateya fîzîkî de xwe bi nîşandana zilamtiyê ve şadibin.

Ev bi ihtimaleke mezin ji tolhildêriyê tê. Em zilamekî ji hemû qadên bandorkirina yê civaka serdest a zilam hatiye dûrxistin, bînin pêş çavên xwe. Em civatên di bin xizmeta dagirkeriyê de qaşo ev zilam li ser serdest e bihêjmêrin. Ew zilamê ku li serê van ciwatan e bihizirin. Gelo ma dê ev zilam çi bike? Çawa ku rewşa jinekê di asta herî xirab de ye, rewşa zilam hîna zêdetir wisa ye. Ev zilam di hemû bandorê ya civakî de binketî ye. Wê demê yê serdestiya xwe çawa bipeyitîne? Li rast û çepê xwe dinêre, li zilamên civak û netewên din dinêre, xwe jî weke wan zilam dihesibîne. Vî tiştî bi fantaziyên mêraniyê yê hov û xwenîşandanan ve îhtîmaleke mezin jî xwe di serê jinê de teqandinê ve nîşan dide. Pêwîst e mirov piştî eniya zilamê Kurd hindekî wiha fêm bike. Rexmî ku zilamekî gelekî lewaz e ku em baş dizanin çawa hatiye lewazkirin, ji bo ku ser vê rewşa xwe bigre, gelekî kêfa wî tê ku xwe weke zilamekî çawa bihêz e nîşan bide. Vê jî dixwaze bi hêza zayendîtiyê ve bipeyitîne. Di rastî de ew qasî di zayendîtiyê de jî xwedî hêzê nîne. Ez bawerim dê bi cil û bergên xwe, bi ferzkirinên xwe yên zêde zilamtiyê di nava malbatê de bike.

Di rastiyê de bi hemû aliyan ve zilam êşa binketina xwe bi desthilatdariya xwe ya li ser jinê û zarok a di malbatê de, ew asta malxwetiya malê ku gelekî paşverû ye li ser wan ferz dike û wisa derdixe. Ji

ber vê jî mirovê di nava malbata Kurd de gelekî tevlîhev e. Jin dikeve rewşeke jinê ya xirab, zarok jî dikeve rewşeke ku gelekî kêm û negihiştî. Ev zilam ji jinê hîn belatir e. Ji hêzxistina jinê, ji aliyê binkeya civaka serdestiya zilam ve, ji dîrokeke kevin ve dest pê dike, heta roja me bi rengên cihê didome. Ev taybetmendiyeke giştî ye. Lê belê civakeke zilamên we wiha ne, kêm in. Di dinyayê de çend civak hene ku zilamên wan gelo weke zilamên Kurd bin? Ger em hesab bikin, di wateya xwemaliyê de ev zilam yek e. Ji ber wê jî dibe ku pirsgirêka zilam girantir be. Ji ber ku civakeke wiha ya serdestiya zilam li tu cihan tune ne. Ji ber vê sedemê ger em zilamtiyê rast pênase nekin, em nikarin tespîtên xwe yên civakî rast bikin. Ger dahurînên me yên zilam bi pêş nekevin, em nikarin zilam bixin riya rast. Em bawer nakin ku zilamekî neyê dahurandin partiyî be. Zilamekî ku di nava malbatê de wiha mezin dibe, di civakê de jî wiha digere nikare bibe partiyî.

Ez li vir xwe deynim ser masê. Ez zilamekî çawa bûm û min xwe kire zilamekî çawa? Ezê emeliyatê destpêkê ji xwe de dest pê bikim. Dibe ku rûmeta we ya zilamtiyê bişkê. Ez wê zêde nakim mijara gotinê. Bi qasî ku min xwe weke zilamekî nas kir, ez bi guman nêzîk bûm. Ez dikarim vî tiştî eşkere diyar bikim. Jinbûna wiha jî, zilamtiya wiha jî xeter e. Hîn jî ew keçikên ku dixwastin xwe ji çavan wenda bikin, jinên ku nedikarîn xwe tevlî jiyanê bikin û di bin çarşefê de vedişartin, têne bîra min. Ev wendakirina kesayetê ve bi hev re dimeşiya. Ew zilamên ku her diçûn xwe derdixistine pêş, zilamên ku xwe nîşan didan û rûdidan jî tên bîra min. Min ev rast nedidîtin. Ev rêveçûn û qutbûn, ev cihêbûn ji başiyê re nebû. Bi rewşa xwe ya zarokatiyê ez van tiştan baş nebînim jî derfetên min ên hember derketina van nebû. Zagonên civakê bi rê ve diçûn û xwe ferz dikirin. Ji yekê re digot, “tu wiha bikeve riya jinbûnê” ji yê din re jî digot, “tu wiha bikeve riya zilambûnê.” Di demeke kurt de çîroka ku derdikete hemberî keçikê, xort jî xwe xemilandin û gotinên destgirtîtiyê bû û wiha dest pê dikir.

Ez dikarim diyar bikim ku min ji van girêdaniyên wiha guman kirin û min ev tişt zêde bi xweşbînî pêşwazî nekir. Min digot ihtimaleke mezin di

bin van hevpeymanan de, di bin van destgirtinan de pêşketinên aliyê xwe yê wendakirinê hîn girantir mijara gotinê ye. Min destgirtîtiya xwişka xwe weke wendabûnekê dinirxand. Di destgirtîtî û zewacên zilamên me yên nêzîk de jî min wendakirinek didît. Ez dihizirîm ku ev zilam dê biçin, êdî bi hêsanî nayên nîqaşan û karê civakê yên wê demê. Mînak dê biçin Edeneyê bixebitin, careke din ne gengaz bû ku werin hola gund, lêyîstokekî bilêyîzin an jî nîqaşekî bikin. Tenê ji bo pereyên qelend peyda bikin piştre avahiyeke yek ode, yek beş çêbikin çend salan xebat pêwîst dikir. Bi vî rengî xortên me çûn. Jixwe keça me jî bêyî ku xwe bijî, bêyî ku hestên xwe hêviyên xwe bîne ziman wê tune bibe. Hela qet behsa hizirandina wê nekin. Bêyî ku derfetekî du peyvan axaftinekî bibîne tê wendakirin û di demeke gelekî kurt de fîzîka wê giran dibe û dibe weke pîrejinan.

Me bi wê rewşa xwe ew rêveçûn, rêveçûneke weke were hilbijartin nedît. Min hêrî zêde ji bo xwe hêz avakirinê ceriband, hun di vê xalê de jî ji me gelekî cuda ne. Bi ihtimaleke mezin pêwîst dike ku mirov li ser vê bingehê zilamtiya we û keçbûna we hindekî dahurîne.

Pêwîste ez destpêkê kesayeta xwe binirxînim. Min nêzîkbûneke “her çi qasî ferzkirinên kevneşop û malbatê jî hebin, xwe azad dihêle, xwe zêde nexe nava van tiştan” nîşan da. Ango rewşeke bi îhtiyadbûnê û metirsiyê hebû. Min zilam û jin lêpirsîn dikir. Lê belê min xwe jî ji van têkîliyan diparast. Dema xortbûnê ya destpêkê min xwest hindekî wiha pêşwazî bikim. Wê demê vê taybetmendiya me dayik û bavan jî didît û em cihê didîtin. Tespît kiribûn ku em li gor mercên wan ber bi sazkirineke malbatê ve naçin. Ev tişt di heman demê de hatine tomarkirin. Cudabûna me ya ji we jî ev e. Ev nêzîkbûneke girîng a azadiyê ye û rawestgeheke girîng a pêşketina min e. Hindekî şêwazê li hember sekinandina saziya malbatê û zincîrkirina wê em rizgar kirin. Min digot di keçikan de xweşikbûn heye. Pêwîst e mirov li ser vê yekê raweste û bihizire. Dîsa ez dihizirîm ku mirov balê li zilamtiyê bikişîne û neşibe rewşa giştî ya zilaman. Piştî wê di pêvajoyên dibistanê de dema ez ber bi bûrjûvayeke biçûk ve diçûm, dibûme fermanberekî dewletê min pêwîstî dît ku wê demê xwe bi şêwazê şoreşgerî

ve hindekî amade bikim. Piştî ku mirov mûçeyek wergirt, tiştê destpêkê were bîra mirovan, lêyîstoka zewacê ye, mijara zewacê ye.

Min zewac nexistibû rojeva xwe, hindek lêgerînên malbatê û hindek fêrbûnên derûdor min zêde cidî nedigirtin. Min ber bi çûyîna şoreşgeriya salên 1970’an esas digirt. Pêwendiya bi pirsgirêkên netewî û sosyalîzmê ji bo min ketibû şûna zewacê. Girêdaniyeke wiha cidî ya civakî bi rêvebirin gelekî girîng bû. Di rastiyê de mirov di van temenan de gelekî bi liv e. Keçên û xortên wiha jî hene. Ya min hindekî bi sofîtî û hîn zêdetir bi nirxan ve girêdayî nêzîkbûneke bîrdozî bû. Berî wê jî ez bi olê ve mijûl dibûm. Piştre girêdaniya me bi sosyalîzmê ve û her çû bi xebata komekê ve girêdaniya me bi pêş ket. Vî tiştî jî em têr kirin. Lê belê dîsa jî pêwendiya ji jinê re bi rengekî ku ji zarokatiyê maye berdewam kir. Ger mirov balê bikişîne ev feraseteke zêde pêşketî nebû û zêde afirandêr jî nebû. Feraseteke tenê macerayê jî nebû. Ez bawerim tiştê ku di malbatê de hatine jiyîn, di vir de xwedî bandor bû. Têkîliya dayîk û bavê, rewşa keçikan em gelekî hesas dikirin. Şiyarbûna li hemberî vê saziyê jî min bi tiştên ku di malbatê de dihatin jiyîn ve girê dida. Dema ku min bêhêziya malbatê didît, min fêm dikir ku çavkaniya hêzê ne malbat e. Min malbatgeriyeke baş bûyîna hêza malbateke baş zêde watedar nedît. Encamê ku min ji rastiya malbata xwe derxistibû ev bû. Ji ber wê jî ez li pey saziyê hîn guhertî û girêdaniyên hîn guhertî dibeziyam.

Nebûna min zarokekî baş ê malbatê dibû mijara tinazên derûdor, lê belê min digot bila tinazên xwe bikin, dîsa jî min zêde pişta xwe nedida vê saziyê. Ji bo ez nebûme zarokekî baş ê dayîk û bavê serê min nehate girêdan, pêwîst nedikir ku ez xwe zêde gunehkar bikim û xembar bim. Ji ber ku min dikarîbû vî karî bihêlim biharekê yan jî demeke din û gavekî biavêjim. Ez dixebitîm ku bi vê nêrînê ve riya xwe bidomînim.

## Ji Bo Têkîlîya Azad Şernekirin Li Azadîyê Xiyanet E

Rexmî ku em gelekî şermok û bi ihtiyad bûn di dema komê ya piştre ber bi çûyîneke wiha çêbû. Me şêwazeke ku aliyê xwe yê hest û siyasî hebû, tirs, metirsî û azweriya wê hebû weke ku were gotin “tu dixwazî belayekê bînî serê xwe? Ha ji te re bela” hilbijart. Di rastiyê de şêwazeke ku nedihate hêvîkirin bû. Ev rewşeke ku xwe di jiyana me de gelek caran nîşan dide ye. Ev şêwazên ku nayên hêvîkirin heta berovajiya wê nîşandan, em bixwazin jê re bibêjin tesadûf an jî tengasiyeke rastiya me ya civakî, yan jî em bibêjin rawestgeheke wê pêvajoyeke girîng bû. Dibe ku were gotin ev rewşeke kesane ye, pêwîst nake ku mirov zêde li ser bisekine. Lê belê piştre hate fêmkirin ku ev rewşeke kesayetê nîne, girêkeke kor a civakê ye. Ger çûyîneke rast bi ser vê de çênebe û neyê dahûrandin ne PKK, ne jî netewbûn li holê namîne. Rewş hatibû vê astê. Ev mijareke hîskirinê ye. Gelo ev nêzîkbûneke baş hatiye hizirandin û hatiye gelalekirin e? Yan derfetek, pêdîviyek hate nirxandin. Gelo di bin bandora wê de bû mijara gotinê? Dibe ku para van hemûyan tê de hebe. Dibe ku em ji taybetmendiyên kesayet bigrin, çawaniya nîqaşên civakî û siyasî ya wê demê, çawaniya civakî ya yê li hember asta sosyalîstbûnê û pêvajoya ku pirsgirêka netewî hatiye, pêwîstiya ji bo pêşketina komê tê dîtin, pêşwazîkirina kêmasiyeke xwe dide hîskirin bandorên gelek tiştan heye.

Di vir de tişta girîng tenê bi çavên têkîliyeke di navbera du kesan de nehate nêrîn. Di bingeha vê têkîliyê de ev yek nêbû. Pirsgirêka netewî ku bûye girêka kor û siyasî hebû. Ez vî tiştî gelekî baş dizanim. Têkîlî ne bi hêsanî tê bidestxistin, ne jî bi hêsanî tê bikaranîn. Lê belê dîsa jî pirsgirêka hilbijartinê ye. Pêwîste ez diyar bikim ku di vê mijarê de ez di nava muhafazakariyeke hişk de tevdigeriyam û rexmî xwestekeke min a hezkirinê jî hebû, min xwe disîplîn dikir. Temenê min dihate bîstûpêncan jî dîsa jî min xwe disîplîn dikir. Lê belê ez ber bi têkîliyeke wiha ve çûm. Di nava şêwaza pêkhatina van mijaran li gel we bandorên giran ên malbatê, fêrbûnên taybet bandorên temen û zayendiyê heye. Ez dikarim diyar bikim ku di hemû van

mijaran de lewaz im, weke xwe vedişêrim û naxwazim xwe derbixime holê. Mirov dikare ji vê re bibêje rewşeke lewaz û tirsonek. Di vir de şêwazeke nêzîkbûnê ya li gor xwe hebû.

Têkîliya van hemû tiştan bi pirsgirêka jinê ve heye, ez pêwîst dibînim ku nûjen bim û di vê pirsgirekê de pêvajoyeke pêş de bijîm. Teqez hewce ye hun vê yekê bibînin û binirxînin. Ji ber ku em di vê qadê de rewşeke xirab a tawanbariyê dijîn. Ji ber wê jî ez pêwistiya hindekî vekirina vê pirsgirêkê dibînim. Pêwîst nîne ku em xwe weke yekî navdar diyar bikin an jî hoste, afirandêr û mezin nîşan bidin. Lê belê pêwîste em baş fêm bikin ku em bi pirsgirêkeke civakî ya girîng ve hatine girêdan û pêwîste em vê pirsgirêkê çareser bikin. Gihiştina zanebûna vê weke hêmaneke jêneger e.

Hunê têkîliyan bi pêş bixin, lê belê gelo hunê çi qasî li hemberî encamên wê li ber xwe bidin? Di van têkîliyên wiha de taybet di zewacan de aliyê civakî girantir e. Weke ku aliyê zayendî yê vî karî di asteke talî de tê nîşandan. Jixwe piştre jî her tişt tê serê zayendîtiyê, li gor vê yê ku dizewicin ne hun in, di kesayeta we de dayik û bavê we ne. Tenê we mereq kiriye û hun zewicîne. Yan jî we têkîlî daniye. Mînak di çapemeniyê de di hindek bernameyan de tê pirskirin “tu ji bo çi zewicî” yên ku dibêjin “min mereq kir, ehmeqî kir” zêde ne. Piştre jî dikevine nava girêka kor û poşman dibin. Mirov ji ber meraqê nazewice. Ev dibe gotineke ku bi biryareke çi qasî ji rêzê ve ketina nava vî karî nîşan dide. Hindek ji bo ku di malê de nemînin, hindek jî ji bo fêrbûneke civakî bi cih bînin dikevine nava vî karî. Di vê tengavbûnê de xwe bi xwebûneke balkêş û ketina nava rewşeke mirov dawiya wê nabîne. Hemû jêhatîbûna min a di vê mijarê de min hindekî netewbûn û asta civakî xiste serê vî karî.

Gelo asta netewî çi bû? Him dibêje ez ji bo pirsgirêka netewî heme, him jî paşeroja wê ya malbatê ya di netewbûnê de neyînî ye. Ev jî xaleke sereke ya binakok e. Ji asta civakî bêhna çîna serdest, nîvfeodalî û bûrjûvatiyê tê. Ya me di vê mijarê de dîsa di her du tiştan de jî cuda ye. Têkîliyên ku hîmê netewbûneke erênî û taybetmendiyeke civakî ya tê perçiqandin tê de heye hindekî wiha ye. Kesayetên ku xwe weke sosyalîst didin nîşandan, bingehê

vê yê erênîbûnê ava dikin. Nêvenga Enqere, nêvenga civakî ya Tirkiyê, serdestiya Kemalîzmê, paşverûtiya me ya feodaliyê, ev hemû eniya dawî ya vî karî ye û rûyê wê yê piştê ye.

Ev rewşa ku ji sala 1976'an heta 1986'an ku di bin berpirsyariya min de hatiye meşandin, di bûyera netewbûn û partîbûnê de rê li ber bandoreke weke bombeya ku diteqe vekir. Ger ev têkîlî rast were nirxandin û bi rêvebirin dibe ku encamên mezin derbikevin. Dibe ku di aliyê erênî û neyînî de tunekar be jî. Li gor min ger di bûyera Kurd de ev şêwaza têkîliyê rast neyê dahurandin em rizgariyê li aliyekî bihêlin, dê di jiyanê de tunebûn were jiyîn. Ez nizanim gelo taybetmendiyeke kesayetê ye yan na? Lê belê ev tişt hîna di min de didome. Ez bawerim cudabûneke min a mezin jî di vir de ye. Rewşeke min heye ku heta ez digihêm cewhera karekî heta karekî diqedînim, bi pêwendiyeke mezin û şopandineke mezin ve ez li dûv wî karî me. Dema ez dest diavêjim pirsgirêkekê qut nakim û navêjim xwezaya wê çi be ez digihêm wê. Vala be vala ye, dagirtîbe dagirtî ye, dibînim û li gor wê jî ji nava kar derdikevim. Ev nêzîkbûneke jiyanê ye. Me têkîliyeke wiha bi dest girt, min dît ku ez zilamekî çi qasî lewaz im, jin jî çi qasî lewaz e. Çi qasî dijmin e, çi qasî Kemalîst e, çi qasî arîstokrat e yan jî li gor mercên Kurdistan'ê çi qasî sosyalîst e, çi qasî berxwedanvan e, çi qasî rêxistin dike, weke vê di gelek mijaran de her roj ceribandin pêk hatin. Her dem ceribandin jî gelek dersên fêrkirinê ava kir. Gelo dê çawa bibe netewî, sosyalîst û rêxistinî? Dê çawa bibe jin, çawa bibe navenda rêxistinê? Ger hun li ser vê rojê çil caran lê hûr bibin, hunê bibin alimekî mezin. Yek jî ku bibe mijara şerekî dijwar ev bi serê xwe têr dike ku we pêş bixe. Lê belê rewşeke berovajî jî dibe ku bibe mijara gotinê ye.

Di vir de pêwîst e, mirov wate bide têkîliya Kurd. Em têkîliya jin û zilam a Kurd pêş çavan re derbas bikin. Ev ji bo Tirkekî jî derbasdar e. Dema ez dibêjim Kurd, ev ji bo Kurd e. Lê belê ez aliyê wê yê girantir tînim pêş çavan. Em şêwazê têkîliyê ya hindekan raçav bikin. Ew şêwazên têkîliyan ên destpêkê ku we pêwendî pê kiriye diyar in. Tiştên ku li ser we hemûyan serdest e, hestên xwe bi gotinê xemilandî ravekirin, ger hun di asteke azwer

de bin, ew zîvirandina evînê piştî ku hun zewicîn bi ezmûnên zayendî yên ku çend rojan tên jiyîn ve rewşeke ku kesayetên halê wan nemaye, dê wêre jiyîn. Di vê dema kurt de zilam zilamtiya xwe, jin jî jiniktiya xwe dipeyitîne. Ev taybetmendiyeke giştî ye. Gelo tiştê tê peyitandin çî ye? Tiştê hatibû nepixandin çi bû? Ev hemû mijarên wêjeyê ne. Di vir de pêwîst nake ku mirov hetanî dawiyê vebike. Ez ezmûna xwe tînime pêş çavan û dixwazim hînkar bim. Bi îhtîmaleke mezin tiştê ku di we de pêk were ev şêwaz e.

Di vê xalê de cudabûna me heye. Şêwazê pêkhatina min ne ev qasî hêsan dibe, ne jî dikare bibe. Hun ji nêzîkbûna zayendîtiyê bigrin heta lihevhatina giyanî û her taybetmendiyeke parvekirina bi hev re ya jiyanê di her mijarê de tam şerek dihate jiyîn. Tiştê di we de pêk tê, girêdaniyên gelekî hêsan ku ez gelo jê re bibêjim erzan an jî sewdaser. Piştre jî bi bêpêwendîtiyên mezin ve hevberdan çêdibe yan jî hev weke malekî cuda dîtin heye. Bi encambûna têkîliyan û kesayetan hindekî wiha dibe. Nêzîkbûnên min ne wiha bûn. Pevçûn her ku diçû kûr dibû, di rastiyê de ez hezkarê pevçûnê nebûm. Tê zanîn ku ez yekî herî zêde ku wate didime mijarên pevçûnan. Li gor min pevçûn bi xwezayîbûna wê ve meşandin, bi qasî ku di min de pêş ketiye, di kêm kesan de pêş ketiye. Ev di min de di asteke hunerê de ye.

Ev mijar gelekî hesas e. Çawa be jî em jî zilam in. Herî kêm xwestekên zilam ên tevlîbûna jiyanê ya di mercên wekhev û azad de heye. Feraseteke wiha heye, em weke zilamekî feodal nebin, lê belê herî kêm weke kesayetekî sosyalîst pêwîstiyên jiyana mirovan bixwazin. Armanca wê jinê (Fatma) tenê li gorî pîvanên jin û zilamên giştî tevnegerîna wê, em li aliyekî bihêlin asta me ya civakî û netewî tunekirinê wêdetir dibe ku dixwest me jî tune bike. Nêzîkbûn û xwesteka wê ya rêxistinê, tekoşînê û çalakgeriya wê fetisandin û ji bo wê jî têkîliyê weke çek bi kar anîn mijara gotinê bû. Çawa ku me dixwest bi çekeke wiha ve di keleha KT yê de hindek derizandinan biafirînin, ew jî tam ketibû nava vê kelhê. Digot ku “ez evdal û gundiyê xwedê bi kar bînim” bi ihtimaleke mezin jî rastiya vî karî wisa bû. Ango em Enqereyê weke kelha KT bihesibînin, Kurdekî wekî min hatiye vir û dîsa

kesayeteke weke wê ya noker dihate çi wateyê? Ger ezê gavekê biavêjim ev dê ji derizandinên di kelha KT yê de ku çêbûne dê çêbibe û ji hindek têkîliyên di nava kelehê de dê çêbibe. Naxwe ev yek bi xwe ji xwe ve çênedibû.

Di vê nêvengê de teqez serdestî hebû, keleheke ku ji kelehên serdema navîn çil qat zêdetir hatiye zexmkirin mijara gotinê bû. Di mijara bîrdozî, siyasî, civakî û çandî hema di her mijarê de teqez serdestî hebû. Tu gundiyekî ji rêzê ku pêdîviyên te hene, tu naskirina çep û rasta xwe de jî zêde bibandor nînî. Lê belê bûyereke Kurd ku wiha bû, heta ji wê zêdetir kesayetekî sosyalîst dixebitî ku di Enqereya 1970’an de şoreşê bike. Wê demê yên wekî Mahîr û Denizan ku bingehên xwe bajarî bûn, him jî gelekî zanyar û xwedî ezmûnên jiyana bajaran bûn, dema dest bi çalakiyê kirin du mehan jî berxwenedan. Bi bêmerhemetî hatine tunekirin. Ev kesayetên rêber bûn. Piştî ku ev hatin vê rewşê sosyalîstekî weke min –yê ku çanda xwe ya bajaran nîne, ji derfetên bajar hetanî dawiyê dûr, di heman demê de Kurd. Du malbatên Kurd ku xwe bispêrê nîne û têkîliyeke xwe ya Kurdan jî nîne-him jî dê çawa nirxên mezin qut bike û bi saxlemî ji kelehê derbikeve?

Me çend gav wêdetirî Anitkabîrê li ser bingehê sosyalîst Kurdeyatî dikir. Li hemberî ewê ku hetanî duh tu fetisandiye, tune kiriye û ser te jî beton kiriye, tu serî hildidî. Dema ku dixwaze te tune bike, kesayeta ku tu xwe weke têkîlî dispêrî, kesayet an jî malbata ku dixwazî binirxînî nokerê herî mezin ê vê hêza ku te tune dike ye. Saziyeke ku di tunekirin û betonkirinê de ristê herî mezin pêk aniye. Heta erka xwe şênber dimeşand. Ev têkîliya ku di nava kelehê de bû, têkîliyeke gelekî xeter bû. Ez nabêjim min bi şêwazeke zanyar fêlbazî kir, lê belê hindekî hîsên min û hizreke min weke “gelo ez nikarim ji vê têkîliyê sud wergirim?” hebû. Di serî de hizreke min a bi karanîna jinê ve siyasetkirin nebû. Ger hebûya min dê ev gotiba, lê belê dema rewşa nokeriyê û nejidiliyê bû mijara gotinê di nava min de hîseke weke, “gelo ji vê çawa sûd tê wergirtin?” hebû. Hizreke bi plan nebû. Dibe ku her dem ev têkîlî têkîliyeke sîxur derbikeve. Jixwe ez kesekî hetanî dawiyê gumanbar im. Di jiyana min de cihê gumanan gelekî mezin e. Ji ber

ku guman nebin, zanistî û lêkolîn nabin. Ew jî mirov vexwendina şiyarî û berpirsiyariyê ye. Jixwe wisa jî çêbû.

Careke din min ew kesê ku çûye wir Kurdê proleter ê ku bi dagirkeriyê ve hatiye girêdan têkîliya dijber rave dikir. Min ew Kurdê ku ji bo navendbûna KT yê ji dil xizmet kiriye temsîl dikir. Çepgiriya ciwanan, rewşeke tevlîhev derizînek afirandibû. Jixwe provakator û sîxur di van refan de bûn. Hinek bi şaştiyekê, hindek bi daxwaza azadiyê ketibûne nav. Di wê tevlîheviyê de yên ku hev dinasîn û asteke wan a wiha hebû, em du Kurd bûn. Ev têkîlî di wateyekê de macera, di wateyekê de gelekî pêwîst bû, di wateyekê de rizgarîxwaz ji aliyekî ve difetisîne. Ango têkîliyeke ku di rewşekê de bû, hemû taybetiyan di nava xwe de bide jiyîn.

Derketina min a Enqerê di havîna 1978'an de û hatina min a Amedê bi şêwazê bi karanîna vê têkîliyê bû. Ji ber ku piştî rê ji vê têkîliyê re were vekirin, mirov nedikarî li Enqerê demeke dirêj bimîne. Ger were mayîn an dê sîxurbûn çêbibe yan jî em jî dê bibana karmendekî bûrjûvayê biçûk û tune bibana. Derveyî vê tenê me dikarî em gavan biavêjin Kurdistan'ê. Me hilbijartina xwe ji aliyê çûyîna Kurdistan'ê ve kir, vê têkîliyê bi qasî germahiya havînê em ji hêrsan dişewitandin. Aliyan dixwestin encam bigrin, me dixwest di Kurdistan'ê de encam bigrin, wê jî dixwest bi aliyê KT yê ve di wateyeke misoger de encamê bigre. Rewşeke me ya em hêdî hêdî benikan qut bikin hebû. Berê her çi qasî weke ku xwe girêdaye kiribe jî, di rastiyê de me ev ji bo benikan rizgar bikin kir. Di vê mijarê de tam taktîkek mijara gotinê bû. Ji bo tu benê paşverûtiya mezin a dagirkeriyê qut bikî, ger tu xwe di dîtinê de bi wî benikî ve hatiye girêdan nîşan bidî û ew ben yê ku tu qut bikî be tê wê wateyê tu pisporekî heta dawiyê yê taktîkê yî. Ya me jî hindekî wiha çêbû. Min ev destpêkê hîs kir, piştre ez li ser hizra "ez dikarim çawa rizgar bibim" hûr bûm û bî vî rengî ji kelehê derketin min pêk anî.

Gelo me li hemberî derketina Enqerê yan jî têkîliyeke wiha çi da? Me li hemberî tiştên ku hun bi hêsanî nikarin jê bigerin da. Em bi hestên xwe evîndar nebûn. Her çi qasî neyînîtî were ferzkirin jî, her çi qasî bibe qada

tunekirinê jî me hêza tehemûla li hemberî nîşan da û ji bo derfetên azadiyê ya din navgîntî kir. Ev têkîlî li derveyî welat jî berdewam kir, lê belê asta pevçûnê ya têkîliyê hîn kûrtir bû, bikaranîna beramber a hev dijwartir bû.

Gelo ji bo me pêwîst bû em derbikevin derveyî welat? Gelo hîn ji wê demê ve xelaskirina vê têkîliyê guncaw bû? Me ev neda berçavên xwe. Hun dixwazin ji vê re bibêjin tirsonekî, dixwazin bibêjin ketîbûn, em hizirîn ku di bin bandora giran a vê têkîliyê de hetanî dawî berdewam bikin. İhtimaleke mezin aliyê hember zanyar bû. Dibe ku bi qasî me dernexistiye zanebûnê, ev lêyîstok ferq kiribû û dilêyîst. Heta nava 1986'an me hêza berxwedanê nîşan da. Dibe ku ev kar ber bi encam ve diçû, veguherte karesatekê, komployekê û şantajekê. Tiştê ku me pê re şer dikir, tenê jinek, nakokiya zilam û jinekê nebû. Dibe ku ev weke şerên du artêşên mezin ku li aliyekî rizgariya netewî, li aliyê din jî KT hebû, pevçûneke wiha dijwar bû. Di dîtînê de şerê derûnî, ku di navbera du kesan de derbas dibû dixuya. Lê belê di wateyekê de rewşeke pevçûna dîrokî bû. Tişta girîng ji vê ders derxistin e. Mînak di nava vê de yê ku dixwaze dersa sebrê, yê ku dixwaze dersa ihtiyadiyê, yê ku dixwaze dersa israriyê, yê ku dixwaze dersa hestiyariyê, yê ku dixwaze dersa xwesteka azadmayînê, yê ku dixwaze encamê ber bi xwe ve veguherînê bi dest bixe.

Ger me hindekî kariye ber xwe bidin, ez bawerim hun dikarin bi rihetî serkeftî bin. Min heta ku cihê xwe saxlem nekir, di mijara jin, siyaset û hemû karê PKK'ê de yek gotineke bêtevdîr nekir. Ger em li vê pirsgirêkê weke asta têkîliyeke jin û zilam wêdetir, weke tekoşîneke hundirê partiyê temaşe bikin em dikarin wateyekê bidinê. Ger hun bûna we dê rojê çil caran pevçûn derbixista û her carê jî bi nêzîkbûneke misoger ku tasviye dibe ve bi ser jinê de biçûna. Gelo ez zilamekî bihêzbûm? Ji bo çi min ev qasî li ber xwe da? Ez dikarim vê bi tenê taybetmendiyên xwe ve rave bikim. Ji bo çi rexmî ev qas tehrîk û şerê hêrsê min xwe girt û min negot, li ser çavên te re brûyên te hene. Min li hemberî van hemû tiştan ber xwe da. Ji ber ku di girêdaniyê de têgihiştinê de, tekoşînê de û nakokiyê de bihêzbûm. Li gor min kesayetekî ku xwe di van hemû mijaran de berfireh kiriye, dikare

tekoşîneke baş bimeşîne. Yê me hindekî wiha dibe. Min got ku gelo ev jin çi diceribîne? Dixwaze bigihê ku derê? Û min xwe li gor vê serûber kir. Ger hun balê bikişînin, rexmî ku di serî de bi dewletê re bû, dewlet li ser wê serdestbû jî ez bi her tiştê xwe pê ve girêdayîbûm. Lê belê ez radestî wê nebûm. Ev xal jî gelekî girîng e. Berovajî hun yekcar radest dibin. Di wateya teqez de merc alîgirê jinê bûn. Lê belê min nîşan da ku ez dikarim li ber xwe bidim.

Jin bi jinbûna xwe li pey bû ku radestiyê ferz bike. Ferzkirina wê ya radestiyê li ser zayendîtiyê, hest û hêzê hebû. Gelo li hemberî van ferzkirinên radestiyê ez ji bo çi û çawa li ber xwe bidim? Sebra min, tevdîrên min, nefrotina min a giyana xwe û girêdaniya min ji bo tiştên ku ez weke doz dizanim, dibe ku bibin çekên min ên berxwedaniyê. Dizane ku em girêdayî ne, lê belê her roj tehrîk dike. Da ku em neçar bimînin, bi van nirxan bilêyîzin. Ger tu yekcar têkîliyê belav bikî, ma çi naynin serê te! Ger ev têkîlî nebe, ger di vê têkîliyê de girêdanî berdewam neke dibe ku dewlet weke ku tu careke din dernekevî dê te girê bide. Rewşeke ku pêwîst dike, tu bi tevdîr bî û nêzîkbûneke kesayeteke cuda ava bikî, mijara gotinê bû. Di vir de rewşa zilamekî ji rêzê û klasîk nîne û ya girîng jî ev e. Weke em dihizirin, zewacek, hestiyariyek û zayendîtiyek nameşe. Di vê mijarê de zilamê Kurd jî hetanî xwe tune dike. Kîjan zilam dibe bila bibe xwesteka wî ya bi vê têkîliyê xebateke bêrêpîvan dike, dijberî wî ye. Ger ev têkîlî nebûya derketina ji keleha Enqerê çênedibû. Ji ber wê jî pêwîst dikir ku kesayetekî gelekî cuda derbikeve pêş û em xebitîn ku wê jî bijîn.

Misoger e ku hun ji ezmûneke wiha mezin derbasnebûne. Ji ber hun derbas nebûne girîngiya netewbûn û partîbûna Kurdistan’ê jî nikarin bi dil û mêjiyê xwe bidin pejirandin. Ji ber ku we êşa wê nekişandiye, zehmetiyên vê nizanin. Mînak min piştî operasyonekî nekarî şûşeya çayê di destên xwe de bigrim. Min çay bi ser çoka xwe de rijandibû. Ji ber ku destên min diricifîn, ez di mercên derketina Enqerê de wisabûm. Hun hatine bi wêrekiyê li ser tiştên amade rûniştine. Ji ber wê jî girêdaniya rêxistinê, wate û girîngiya pêvajoyan ji bo we ew qasî ne pirsgirêk e. Hun roja reş û roja

zehmet nizanin. Ji bo vê jî hun têkîliyan û girêdanên rêxistinî hêsan ava dikin û bi hêsanî xirab dikin. Berovajî ji bo min tu tişt hêsan nîne.

Em ji Enqerê jî wiha derketin. Gelek gavavêtinên wiha hene, dibe ku ev li gorî we gavavêtinên gelekî ketûber bin, lê belê ji ber wate û girîngiya xwe ya dîrokî ve ji bo binkeya me ya civakî girîng e. Ji ber ku kevneşopekî serûbin dike. Her yek ji van zincîrekî dişikîne û parçe dike. Parçekirina min a zincîra malbatê ji bo gelek gavên piştre ku ji bo azadiyê hatine avêtin, derfet afirandin. Dayika min jî berê ji min re digot “min dixwest li ber çoka min girêdayî bijî.” Gelo min li ber çoka wê bijiya, mirov dikarîbû behsa tiştekî jê re Rêbertî tê gotin bikira? Rexmî ku bavê min yekî reben bû, bi keviran dihate ser min. Ger li hemberî wî min bi keviran ber xwe nedaba, ma gelo min dikarî gaveke wiha wêrek ji malbata serdest a zilam biavêta? Min tiştên ku tu zarok nikarin bikin kirin. Derketim û min serî hilda, ev di şertên xwe de girîng e, pêwîste ev têkîlî jî wiha were bidestgirtin. Em dikarin ew gava ku tê zanîn jî li ser vê têkîliyê zêde bikin.

Ketina nava olê, xitimkirina olê, bi Xwedê re mijûlbûn, ketina nava sosyalîzmê her yek ji van çîrokeke xwe ya gelekî balkêş heye. We ev hemû jî jiyan nekirine. Gelo ezê bi bîrdoziya ol û felsefeyê çi fêm bikim? Lê belê carekê min xwe têkil kir. Gelo ji bo ez bikaribim bi hizra Xwedê re mijûl bibim, hizra min çi qasî têr dikir? Lê belê carekê ez mijûl bûm. Gelo ezê ji nava vê çawa derbikevim? Di encamên pêvajoyên gelekî dirêj û biêş de gavavêtin an jî gihiştina pêvajoyeke pêştir hatiye pêkanîn. Gelek gavavêtinên ku dişibine vê hene.

## Min di bûyera jinê de wekhevîyeke mezin û şerekî azadîyê meşand

Heta ku ev jin hate dahurîn tekoşîneke mezin hate dayîn. Asta tekoşînê ya netewî, civakî û dîrokî heye. Têkîliyeke ku ketiye nava çewisandina serhildanên Kurd û bi ihtimaleke mezin ew tekoşîna ku di bin Rêbertiya me de bi pêş dikeve xwe erkdar hîs dike ku bi heman çarenûsê ve rûbirû bihêle

mijara gotinê bû. Li hemberî binkeya lewaz a civakî, neteweyeke lewaz û zilamekî lewaz, jineke gelekî bihêz, binkeyeke civakî ya gelekî bihêz û têkîliyeke dewletê ya gelekî bihêz hebû. Gelo di van mercan de emê ji pirsgirêka Kurd re çawa çareseriyê bînin. Bêyî ku van nakokiyan nebîne û nîşan nede, nejî û nede jiyîn çi qasî bi qehremanî serî jî hilde û pev jî biçê, di encam de ji kuştinê rizgar nabe. Tê wê wateyê ku pêwîste li ser bingehekî wisa de pevçûn were pêşxistin. Di bingeha malbatê de pêkanîna şoreşgerî, di keleha dijmin de afirandina zemîna gavavêtinê heye. Dema ku me ev tişt hemû kirin, ji zemînê dayik û bav, jin û mêr û zaroktiyê gavavêtineke saxlem hate pêkanîn. Gelo we di van mijaran hemûyan de gavavêtin pêkanî yan na? Dibe ku ev ji bo we weke çîrokên pêkenînê bin. Lê belê li gor min dahûrandina Kurd e.

Jin di nava partiya me de weke ku muhafizê kelehê bû, dibe ku xwe heta dema dawiyê jî wisa didît. Yê ku erk dane wê, ew kirin muhafiz an jî parezvanê ku di destên wê de qamçî heye, gotibûn “jinbûna xwe bi kar bîne, tuyê zilam mihafaza bikî.” îhtîmaleke mezin erk wiha hatibû dayîn. Ji bo wê hatibû gotin, “dibe ku ew ji Enqerê derbikeve, lê belê tu sedî sed serdest î. Dibe ku çep û rastan ve biçe, lê belê benê zilam di destên te de ye.” Ez ew qasî wêrek nînim. Ger hun bin hunê bibêjin, “gelo ma ez dikarim stûyê xwe ji bo jineke wisa bitewînim?” û ji nava vî karî derbikevin. Li gor feraseta zilamtiyê ku li ser we serdest e, we dê yekcar çend sîle lêdaba û yekcar biqewitanda. Berovajî dema ku min kom avakir, dema manîfestoya komê nivîsand ez ji malê reviyabûm. Li gor we gelo zilam ji mala xwe direve?

Ji bo jiyaneke gelekî balkêş, min çawa tehemûl kiriye, bi rastî jî mijareke hêjayî lêkolînkirinê ye. Di vir de bi tevdîr tevgeriyan, bûyerek an jî rastiyek bi hemû aliyan ve nirxandin heye. Bi qasî serê derziyê be jî sebir û berpirsyariya bi karanîna derfetên heyî heye. Gelo jinek ji bo çi wiha dibe? Jinek ji zayendîtiyê û xizmeta malê çi fêm dike? Ez karê malê bikim, lê belê pêwîst e ew jî bike. Ango dema rêhevalek hat, bi kêmanî bizanibe bixêrhatinekê bike, ji bo çêkirina xwarinekê alîkariyê bike. Misoger bû ku ew ji jinekê zêdetir dişibiya her tiştî. Misoger bû ku çeka jinê kesayeta jinê,

hêza jinê yan jî bêhêzbûna wê bi rengekî dibe ku nedişibiya tu kesayetekî bi kar dianî. Bi salan me bi wê re jiya û me berdewam kir ku em gelekî xwedî sebir bin.

Li pêşiya PKK'ê rawestîn an jî li pêşiya min bisekine û bêerk bihêle ceribandin. PKK û Kurdistan girt. Bi tenê xwe bi vê yekê ve jî têr nabîne û dixwest piştre jî teqez serdest be. Derûdora nêzîk bandor dikir. Wê demê bi çend kesan re mabû û ew hemû bibûn zilamê wê. Çend milîtanên me kiribûn weke leşkerên xwe. Çend jin hebûn ew şêwazê têkîliya ku li ser wan dimeşand gelekî girîng bû. Bi tevî ku tu têkîliya xwe bi jina azad re, bi têkîliya azad re nebû jî, ihtimalê wê dizanî emê hindekî jinê azad bikin, ji ber wê jî dizanî emê derbeyekê li cewherê têkîliya koledarî ya têkîliya wê bidin û temsîlkariya feodalîzmeke noker tune bikin. Çawa ku derbe li serdestiya dagirker hatibe dayîn, li gel wê li serdestiya feodal jî hatiye dayîn, derbe lêdana wê dê bihata wateya di şexsê jinê de riya ku ji azadiya jinê re tê vekirin de gavên mezin bihatana avêtin. Li ser vê bingehê di azadbûna jinên di nava partiyê de jî gaveke mezin bihata avêtin. Ji ber ku ev hesab dikir, ji bo PKK'ê ji azadbûna têkîliya jin û zilam re vekirî nehêle di vê mijarê de li ser PKK'ê, feodalîzmê û stûtewandinê serdest bike, di dîtinê de têkîliya hevjînî ye bi kar dianî. Gotinên weke "mêrek pêwîste wisa bi hevjîna xwe ve girêdayî bimîne" bi kar dianî. Di rastiyê de rewşeke xwe ya ji hevjînbûnê zêdetir dişibiya her tiştî hebû. Lê belê li gor namûsa Kurd, li gor ku bi fermî têkîliyeke wisa heye, herî kêm derûdor bandor bike, wisa diyar bibe gelekî girîng bû. Nirxandineke wê ya din ev bû "tu zilamekî çawa yî? Ez bi salan e nêzîkbûneke wiha ferz dikim, lê tu dikarî li ber xwe bidî, zilamekî din ê Kurd bûya min dizanî ez çi bikim." Wê min lêpirsîn kiribû. Di demên dawiyê de min ji wê re gotibû "ez hunerê ku tu bi kar tînî baş dizanim, tuyê bi vê hunerê ve bikevî rewşeke xirab, tu dixwazî jinbûna xwe wiha bi kar bînî û min bêbandor bikî, bixî û tune bikî. Lê belê tu qet dihesibînî ku tuyê di dema pêş de bikevî rewşeke çawa? Bi şêwazê bi kar anîna zayendîtiyê, jinbûnê, têkîliya taybet û zewacê ve tu di tekoşînê de

şêwazê herî xirab hildibijêrî." Şêwazeke gelekî xirab bû. Gelo ma dikarî çawa bi wijdanî –bêguman ger wijdana wê hebe- rihet bihêle?

Bi îhtîmaleke mezin weke provakatorekê, kontrayeke bêhempa ku bi hêrsa binketina xirab jiyaye ve, dixwest derbeya dawiyê lê bixe. Ger hun lê baldar bin, mal a min e, nêveng a me ye, xwe spartekên partiyê yên gelekî bihêz hene. Lê dema min ev gotin digotin, hetanî dawiyê şermok û hindekî jî bi tirs ez dihizirîm, ka ev nirxandina min gelo gelekî zêde ye û min wisa digot, dîsa jî ez di nava pîvanên dilnizmiyê de mam. Min got, "ji bo te dê baş nebe, ez dîsa dikarim xwe îdare bikim, em ji mijarên zilamtiyê û zayendîtiyê bigirin heta di hemû riyan de ez dikarim gavan biavêjim, lê belê tuyê çi bikî?" û dev jê berda. Jixwe piştî çend rojan ji malê derket û me biryar da ku em careke din wiha hev nebînin. Pêwîst e ev kar li vir sekîniba, lê belê xelas nebûya. Ji ber ku ez pê ne ewlebûm. An jî min tam wate nedidayê, derfeteke şer ê gelekî vekirî nedayê. Min şêlû hişt. Ez nabêjim min ev gelekî bi hostehî kir, lê belê ez di vir de di nava nêzîkbûnên ku dihate vê wateyê de mam.

Dibe ku hun bibêjin, çi pêwendiya vê bi azadiya jinê re heye. Di rastiyê de gelekî pêwendiya xwe heye. Ez dihizirim di mijara jinê de ez bi rewşeke ji dojehê heta ji zindanê wêdetir ve rûbirû mam. Li gor xwe ez di nava berxwedanekê de bûm. Vi tiştî hişt ku ez li ser jinê têkîlî, zayendîtî, mijarên siyasetê û têkîliyên jin û Kurd di derbarê têkîliyên malbata Kurd de bihizirim. Piştî ku zilamê Kurd xwe di vê rewşê de hişt, bi rengekî xwezayî ezê jinê, zilam, malbatê, nokeriyê û kesayeta noker gelekî binirxînim. Ev hemû jî dê min bixe xwedî zanistî. Ev tişt bibû rêbazeke xwe perwerdekirinê, ez têkîliyê ava dikim, lê belê ez wê têkîliyê li gor pergalê nikarim bijîm. Ez dixwazim wê ber bi encama wê ya xwezayî ve bibim. Ger armancek hebe, min dixwast bi wê bidim xizmetkirin. Encam dê bi awayeke gelekî balkêş bi pêş bikeve. Ger hun balê bikişînin, di vê dîrokê de ev têkîlî, ber bi xelasbûnê ve diçû, min çîroka tunebûna KT meşand. Dema ku em jineke wiha feodal bi vî rengî tunebûnê re rûbirû dihêlin, jina azad jî hêdî hêdî derdixine holê. Keçik û zilamên li kêleka me bûn ne di wê rewşê de

bûn ku ji vê yekê fêm bikin. Hun jî nikarin bînin pêş çavên xwe ka tekoşîn çi qasî berfireh dimeşe. Lê belê dîsa jî bingehê pêşketineke cidî avêtin û binketina jina feodal ji aliyê Kurdistan'ê ve bûyereke mezin bû.

Min hetanî dawiyê hewaya min bi karbîne dida wê. Dema ku min niyeta xwe diyar dikir, gotina "ezê te jehrî bikim" bi kar dianî. Ger bizanibe ezê ji destên wê rizgar bibim, ma gelo kê dizane ma min jehrî nake? Armanca wê ev bû. Wê jî mirin dabû pêş çavên xwe dikarîbû zilam bi rihetî bi karbîne. Zilamên biguman hebûn, hîn ji wê wêdetir jî bi wan re hevkarî dikir. Dixwest têkîliyên ku ez xwe dispêrimê bi kar bîne. Jixwe ew bi xwe jî hoste bû. Gelo li hemberî vê rastiyê mirov dikare çi bike? Ez nikarim bibêjim "hey jinê ezê te biperçiqînim, tu min nas dikî, li hemberî te Rêberek heye, tuyê werî rê, tuyê rêzê bigrî" tiştekî wisa jî nakim. Ez neketime nava bêtevdîriyeke ku rê li ber şopandineke şaş vebike. Min bêpîvaniyek nekir. Li hemberî têkîliyan rewşa min û ya wê çi qasî bi hev ve girêdayî ye? Ger hun di rewşa yekî weke min de bûna gelo we dê çi bikira? Di vir de misoger hêmanên ku hun jê dersan derbixin hene. Hun dibêjin, "ez provake bûm, hatim tehrîkirin, min li ber xwe neda" gelo ma ez çawa li ber xwe didim? Ev çîrokeke Kurd e. Hunê ji vê encaman derbixin. Riyeke vê ya din nîne. Hun bêyî ku demanceyeke we, çend qirûş pereyên we hebin, di bin serdestiya dijmin a teqez de siyasetê dikin. Di vê rewşê de gelo hun dê çawa xwe nerm nekin? Ger hun bibêjin "ezê bigrîm, tehrîk bibim, bikujim" hunê çend rojan bijîn? Tiştê ku hevalên bi me ve girêdayî û yên herî baş bikin, hizirandina kuştinê ye. Gelo ma ew dikare van karan rizgar bike?

Dema min têkîlî ber bi tasviyeyê ve dibir, sengerê min ê saxlem û têkîliyên min ên ku ez xwe bispêrimê hebûn. Misoger bû ku em bi Kongreya Sêyem ve PKK'ê ber bi pêvajoyeke pêş ve bibin. Heta me hindekî jin jî bi pêş xistibû. Hindek jî me azad kiribû. Misoger pêwîst bû em li hemberî dîlbûna jina feodal, him pergala feodal û kesayeta feodal ku li PKK'ê tê ferzkirin, him jî hêza dewleteke serdest ku derfetê nade azadiya PKK'ê û têkîliyên hevaltiyê, em di pêş çavan re derbas bikin. Ger me ev tişt

nekiriba me nedikarî em polîtîkayê bikin. Ez dîsa jî rexmî vê di PKK'ê de gelekî balkêş dixebitim. Bi taybet ez giraniyê didim mijarên rêxistinî.

Ger ez di jiyana xwe nebûma xwedî hewldanekê dibe ku li derûdora min çend rêxistinên komplo dê bi pêş ketibana. Di rastiyê de durûtiyeke her cureyî nîşan dida. Dikete nava têkîliyeke din û digot, "benê vî jî, yê partiyê jî di destên min de ye" ev tişt jî digot, "li Fransayê li pişt qralan ên ku qral dikirin qral hindek kesên din hebûn. Li Tirkiyê jî li pişt qralan her dem qralek heye." Heta dema ku cûnta bûne mijara gotinê digot, "cûntagerekî ku cûntayan bi rê ve dibe heye" dixwast vî tiştî bibêje: di vê PKK'ê de jî qralekî ku qral îdare dike heye! Dema diçe gel hindekên din dibêje, "min esas bigirin" hindekan re jî digot, "ev gundiyekî ji rêzê ye zêde jêhatî nîne, hêza bingehîn li gel min e" û dixwast bi xwe ve girêbide. Hindek têkîliyên me hebûn, dixwast wan têkîliyan jî bixe destên xwe. Ev hemû li gor xwe karên hosteyî bûn. Lê belê tekoşîneke me, planeke me û serûberkirina me jî hebû. Yê ku bi ser biketa, dê ew hewldan nîşan bida. Hewldanan bi dostan jî bi dijminan jî dida hîskirin ku ez vî karî dimeşînim. Hevalan jî bawerî bi hewldanan dianî û ew bêbandor dihiştin. Ji bo ev pêvajo ji vê xelas bibe pêwîstî bi hewldanên bihêz, partîbûn pêşxistin, bi perwerde û bi rêxistinbûnê ve her tiştê xwe danîna holê hebû.

Di mijara azadiya jinê de jî ew şerê mezin ê wekhevî û azadiyê ku em li hemberî jineke wiha dimeşînin, hindek hewldanên wê vala derdixistin, derfet nedida ku ew xwedî bandor be. Dixwast pêşketina jina azad pêşî lê bigre. Lê belê nekarî li pêşiya gelaleyên me û hizirandinên me yên ji bo afirandina jina azad pêş bikeve bibe asteng. Di 8 Adara 1987'an de di mijara jinê de min axaftina destpêkê ya berfireh kir. Ji beriya wê bi salekê di 8 Adarê de wê pevçûn û nakokiyek dijiya. Di nava partiyê de dê jina azad û kesayeta azad derbikeve yan na. Bi encamên vê pevçûnê ve girêdayîbû. Hêjaye mirov li ser hostehiya min a vir raweste. Bi qasî ku mirov derfetê nedê wê ku partiyê feodal bike, ji wê zêdetir di bin serdestiya KT yê de bihêle aliyekî din jî derfet nedayîna wê ji bo ku aliyekî kesayet de jî tehrîk bike û bixe, wê jî bi sebreke mezin têperandin gelekî girîng bû. Lê belê me

xwe bi vê jî têr nedît. Me danî holê ku jin wisa nabe. Me ji bo pirsa ‘wê jin çawa bibe?’ jî zelaliyek anî. Nedihate wê wateyê ku ew jin wisa be, dê jinên din jî bi wî awayî bin. Teqez dê riya ku diçû azadiyê bihata dîtin.

Ji ber ku hindekî ev ferq kir wê demê çend jinên ku hebûn tune kirin. Ew hemû hevalên me yên xebatê bûn. Mînak Sayime Aşkin hebû, mamoste bû, tevlîbûna wê jidil bû, hindek şaşî û kêmasiyên wê hebûn. Lê belê yeke ku were cezakirin nebû. Bi ihtimaleke mezin li Lolanê bi bandora wê ve hatibû cezakirin. Dîsa yeke ji Pazarcik’ê hebû di mijara têkîliyan de lewaziyeke wê derketibû. Bi îşkenceyeke gelekî wehşî ve li wir dabû kuştin. Ev îşkenceya destpêkê ku di nava partiyê de hatibû pêkanîn bû. Ev kesayet serokê îşkence û hin cezakirinên di nava partiyê de bû. Pêkanîna xwe ya destpêkê jî li ser çend jinan ceriband. Di sala 1985’an de ev cezakirin mijara gotinê bû. Di wê de xwestekeke afirandina kesayeteke tirsnak hebû. Dixwest hîsekê ava bike ku tu jin nikarin, tu caran bêyî wê gavekê jî biavejin. Dixwest zilamekî di mercên koletiyê de ew jinên li pey desthilatdariyê dibezin, bibin xizmetkarê wê biafrîne. Girêdaniyeke di wateya teqez de dixwest. Ger hindekî hedê xwe nezanibin jî şaşitî û kêmasiyên wan tespît bike, bi cezakirineke bêrihm ve dixwast wan jî tune bike. Bi vî awayî çend kes sedî sed xistin xizmetkarên xwe.

Xeteriyek hebû ku ev nîqaş jina azad derbixe holê û wê derbas bike. Bi vî rengî dibe ku her kêliyê hemû lêyîstokên xwe derbikevine holê. Dibe ku koledariya mezin ku ferz dike tenê li partiyê û Kurdistan’ê ne, koletiya ku li jinê jî ferz dike, dibe ku biqelişe. Ji bo ku ew çênebe li aliyekî cezakirinên wehşî ferzdikir, li aliyekî din jî ew xizmetkarên xwe weke rengê xwe bi kar dianî. Ez jî hindekî bi jinan re mijûl dibûm. Ne tenê ji bo ku jin in, min dixwast bikaribin şîroveya hezkirin û azadiyê bikin. Em weke we nakin û têkîliyeke ji rêzê ava nakin. Têkîliyên ku em bi pêş bixin dê têkîliyên hindekî xwedî ast û dest bide kesayeta azad bin. Dê milîtanbûna ku xwe dispêre kesayeta azad bi vî rengî ji bo kesayeta wekhev û azad rê vebike. Ev dê bi vî rengî were bidestgirtin û dê encamên wê jî bi giştî be. Ji ber ku wê ev yek ferqkiribû, ew jî gelekî bê bandor dibû. Ji me baştir kesayet nas

dikirin. Lewaziyên hindekan tune dikir, ji bo hindekan jî serûberkirina evîndariyê dikir û digot, “emê te bidin wî.”

Wê demê hindek kes bi xwe ve girêdabûn û digot, “hêza jinê ji min tê pirskirin.” Digot, “xwediyê hêza jinê ez im.” Û xwe bi zilaman dida hîskirin. Digot, “ger di hindek keçikan de çavên we hebe, ev destpêkê ji pejirandina min re derbas dibe. Ger xwestekên keçikan ên wiha hebe, ger hun min guhdar nekin ezê we ceza bikim û bikujim.” Zilam û keçikên ku li derûdora me wiha bi xwe girê dida. Her diçû em bi tenê diman. Piştre min fêm kir ku xwestekên çewt ên azadiyê yên keçikên li derûdora me re hene. Xwestekên xwe yên jiyîna li Ewrûpayê û jiyanên taybet hene. Dîtineke ku min re gelekî baş dijî diafrîne. Dibêje “ma ev zilam bi min re nezewiciye, ji bo çi hun jî nezewicin? Li modelê temaşe bike, li gor bejna xwe tu jî pîvana xwe bigre.” Û kesayet teşwîqê vî tiştî dikir. Berovajî rewşeke wisa nebû. Lê belê di mijara xirab bikaranîna vî tiştî de gelekî xwedî biryar û erk bû. Ji bo zilaman jî û keçikan jî heman tektîk bi kar dianî. Digot, “hun dibînin ew bi xwe dizewice we jî wiha ezep (bêkar) dihêle.”

Hun dizanin ka min ev têkîlî çawa meşandiye, lê belê keçik di destên wê de bûn. Wê demê şiklî be jî min nedikarî bibêjim ev têkîlî nîne. Min di dilê xwe de dizanî ku ev ne têkîliye, lê ger min ev belav bikira dê tedbîr bistenda. Ji min re digot, “tu ji ber berjewendiyên partiyê û sosyalîzmê tu caran nikarî van tiştên ku ez ferz dikim xuya bikî.” Rast digot. Li gor berjewendiyên partiyê û sosyalîzmê min nedikarî ez pêkanînên wê vebikim. Ev qasî zanebû û hindekî jî ben di destên wê de bû. Gelek zilaman jî ew guhdar dikirin. Hindek ji wan heta keçik jî ji vê kesayetê bandor bûn. Dîsa zilamên klasîk hebûn. Di nava wan de serûberkirinek çêkiriye û ew bêbandor hiştine. Ji bo yê ku ji jinê û ji keçikan qet fêm nakin re û ji bo yê ku ji bo jinekê dikare her tiştê xwe bifiroşe serûberkirinek hatibû çêkirin. Heta sala 1985’an bi van serûberkirinên xwe ve her diçû hiştibû yên derûdora me bêrist bimînin. Heval pê bawerbûn ku ez xwedî kedê me, lê hest û kaprîs hebûn. Benê wan jî xistibû destên xwe.

Bi vî rengî dema em hatin sala 1986'an qutbûn, nakokî û pevçûn dê ber bi encamê ve biçûna, bûyera herî dawî ya ku wê diceriband a çeka jinê li hemberî me bikaranîn derkete holê. Digot, "ez weke jin ev qas tiştî li te ferz dikim, tu çawa ber bi tiştekî din ve naçî, ji bo çi tu li hemberî jinekê serî hilnadî?" di rastiyê de bi vê tiştê dixwest ku min vexwînê tehrîkê. Di wan mercan de hêdî hêdî watedayîna jina azad çêdibû. Wê jî weke çekeke mezin li hemberî vê rastiyê sekinandinê dijiya. Xwest li hemberî vê bi rûpoşa şantajê û bi ceribandina valaderxistinê ve bersivê bide.

Hindek kesên ku me bi zorê pêş xistibûn, bi ziraviyeke mezin dişopand û bi hosteyî bi xwe ve girê dida. Yê têkîliya çend zilam û jinan di Kongreya Sêyem de xuya kiriba, dê li têkîliyên azadiyê şantaj kiriba û ji bo zilaman jî gotiba, "hun dikarin kongreyê bixin destên xwe, hun dikarin weke hun dixwazin bijîn." Hevalekî ev yek îxbar kir. Got, "ew dixwaze me bi kar bîne" xizmeta herî mezin a vî hevalî xeberdayîna wî ya komploya vê jinê bû. Me jî rêbaz guhertin. Ger hun jidilbin ên derûdora we jî wiha ji dil bi we ve werin girêdan û dema komployeke gelekî girîng pêş ket dê xeberê bide we. Jixwe wisa jî bû. Me çeka şantajê berovajî kir û kongreya sêyemîn tenduristî bi pêşxist. Me di kongreyê de cara yekem pirsgirêka kesayetê di Kurdistan'ê de bi serûber û komkirî danî holê. Di bin ronahiya nirxandina "ya ku tê dahûrîn ne kêlî dîrok e, ne kesayet civak e" ve me di dîroka PKK'ê de dahurîn bi kûranî û di pêvajoyeke herî girîng de dest pê kir.

Nirxandinên me yên di derbarê rastiya jinê, di 8 Adara 1987'an de ez bawerim gelek tişt ronî kirin. Van nirxandinan derfet da ku gavavêtinên azadiyê yên wiha pêk werin. Vê pirsgirêkê piştî pêşketinan riyek qut kir. Tevgera jinê piştî dahûrandinên ji sala 1987'an hetanî niha her sal têne kirin û bi gihandina kesayetê ve di nava PKK'ê de û di Kurdistan'ê de riyeke gelekî qut kir. Dibe ku hindek ji we bihizirin ku tevgera azadiyê bi hêsanî pêş ket. Dibe ku di nava PKK'ê de pêkanîna bandora jinê ji bo we xwezayî be. Berovajî wisa nîne. Çîroka vê dirêj e. Tekoşîneke gelekî mezin hebû. Şerekî ku ji şerê we yê hun li eniyê dikin, ji wê dijwartir û zêdetir şiyarî û

sebir dixwest hate kirin. Jin dibe yan jî zilam dibe ger îro hindekî nêzîkî azadiyê ye, gîredaniya wê bi tekoşînê ve çi qasî heye wiha me danî holê.

Pêwîst e hun baş fêm bikin ku azadiya jinê bi hêsanî dernekete holê. Di nava vê de bi qasî jina ku bi hezaran salan hatiye xistin, nêzîkirina azadiyê bi têkîliyeke tevlîhev ve li hemberî serdestiya noker feodal de tekoşîna ku hatiye meşandin bi şiyarbûneke mezin ve ber bi encamê ve birin heye. Qaşo me têkîliyeke rêhevaliyê li ser bingehê hev hezbikin pêş xist, lê belê encamê vê bû şerekî partiyê, netew û azadiya jinê.

Di mijara azadiyê de bi hêsanî serkeftin nayê pêkanîn. Çawa ku bi gotinên antî feodalîzm, antî kapîtalîzm, antî dagirkerî û antî emperyalîzmê rizgariya netewî ya Kurdistan’ê nayê pêşxistin, hunê bibînin ku bi zêde axaftinê ve mafên jinê, rizgariyê jinê yan jî têkîliya jin û zilam ve rê ji têkîliyê re nayê vekirin. Min zexta mezin a di vê mijarê de, durûtiya mezin û ferzkirina mezin ji holê rakir. Aliyê jinê yê erênî min bi pêş xist. Di dîrokê de kesayeta jinê wendakiriye. Ji hemû civakî çînî hetanî niha civaka li Kurdistan’ê çawa hatiye xistin û ketiye rewşeke ku ji jinê xirabtir em wan tînin heman cihî û girêdidin. Piştre li hemberî vê tekoşîn hetanî roja me di asta kesayet û komî de gavekî bi pêş ket. Di mijara azadiya jinê de hizirandina çi, çawa çêdibin teorî û pratîka wê ve weke vê hindek pêşketin bûne mijara gotinê.

## Evîn karekî hêjayî egîdan e

Em jî rewşa we gelekan dizanin, ez van kesayetan bihêlim di bin navê evîn û hest de dê bi destên xwe gelek caran benên xwe bi dagirkeriyê ve girê bidin. Hun dibêjin, “ger ez rojekê werim nava partiyê ezê ji bo te werim.” Hun tên an jî nayên ev yek ew qasî girîng nîne. Ev çîroka we jî dide dest. Ez nabêjim hun hemû wisa ne. Di heman astê de ne. Lê belê têkîliya ku hun pê ve girêdayîne gelekî kûr e. Dema li hember jî derdikevin, dema tên girêdan jî gelekî xirab e. Ez tevlîbûna we ya partiyê çawa bi pêş dikeve diyar dikim. Ev yek ji bo jinan jî derbasdar e. Dema em jinekê dikişînin tekoşînê em nîşan didin ku ev yek bi xwe çênabe. Di encamê pevçûneke mezin de pêk tê.

Dibe ku hun xwe azad bibînin, bibêjin bi biryara azad ve hatine. Lê belê gelo zemînê azadiyê yê PKK’ê nebûya we dikarî hun çend rojan li çiyan bimînin? Ger ev tevdîr û ev tekoşînên mezin nebana û rêberên cuda bi we re bibana, dê li ser bingehê girêdaniyên herî kole û feodal qaşo têkîlî bi pêş biketa. Niha jî qaşo yên nêzîkî me ne, yên fermandar in wiha bikin, gelo ma yên din çi nakin?

Jinên ku herî zêde pêwîste bi nirxan ve girêdayî bin, nayên perwerdeya şoreşgerî û rêxistinê. Nabêjin “ka em dixwin û vedixwin, em hindekî jî bi karên partiyê re mijûl bibin.” Weke ji nexweşiya vebayê direvin ji van karan rev heye. Ew jinên din jî bi hêsanî nameşin. Min jî negot bila wiha bin, di rastiya Kurd de ev hene. Bi hezaran şehîdên me, bi hezaran nirxên me hene. Lê belê pêwîstiyê bi girêdaniya van ve nabînin. Bi tiştên ketûber ve tên girêdan, gelo di gelek kesayetan de ma ev tişt nîne? Gelo di bin van ev helwestên we yên bertek û nebûyîna we ya partîbûyînê de ev asta we ya hestan ristekê nalêyîze? Gelo di bin gilî û gazindên we de cihê hestên we yên gelekî paşketî û hov nîne? Gelo rastiya vê jiyanê bi partînebûyîna we ve têkîliya xwe nîne? We di vê mînakê de hebûna pêwendiya wê gelekî balkêş dît.

Bi sedan mînakên vê hene. Mînak milîtanekî me yê gelekî baş hebû. Provakatoran jê re gotin “were Ewrûpayê tu li vir weke tu dixwazî dikarî bijî, ji bo vê em navendê bixin destên xwe, dema ku me navend xiste destên xwe, emê biryarê bidin, ne ber bi Hekariyê ve, ber bi Ewrûpayê ve biçin. Wê demê keçika ku tu jê hez dikî emê bînîn Ewrûpayê, bi vî rengî tuyê jî bigihê evîna xwe ya mezin.” û pê lêyîstin. Me ev heval şande welat, lê belê tenê ji ber keçikekê ket. Rexmî kesayetekî gelekî zindî bû jî veguherî mirovekî weke ku felç derbaskiriye û anîne rewşekê ku mirov êdî nikaribe rabike. Me ew anî rewşekî ku hindekî bikaribe bimeşe û hetanî welat jî şand. Dema ku gavekî biavêje sînor dibêje, “ez nikarim derbas bibim” di rastiyê de kesayetekî ku gelekî çalakiyên xwe yên cidî hebûn. Lê belê bû qurbanê hestên erzan û provakatoran. Weke vî bi sedan têkîliyên me yên binirx

hebûn. Ji ber ku dahûrîna hestan nekarîbûn bikin pir bi hêsanî çûn. Berovajî ger van bikarîbûna dahûrînin dibe ku her yek ji van biba serfermandarek.

Dahûrîna hestan karekî hêsan nîne. Bihizirin ka min hindekî ber xwe nedaya gelo îro ji partîbûnê û Kurdîtiyê tu şop diman? Di rizgariya jinê de pêşveçûn û afirandina derfetên azadiyê hêsan nîne. Di nava PKK'ê de ev bi şerkirineke mezin ve gengaz e. Li ser vê bingehê pevçûnên mezin, qutbûnên mezin û cihebûnên mezin mijara gotinê ye. Ez wisa bawer dikim ku hindek keçik û zilamên biaqil dibêjin, “PKK azad e, ji ber wê jî em jî azad in, em dikarin yekcar têkîliyan bi pêş bixin.” Dikarin têkîliyê bi pêş bixin lê belê qet nebe em çîroka xwe baş bînin pêş çavên xwe. Gelo em di riya afirandina jin û zilamê azad de çi dikin? Ji bo çi hindek hîn jî me weke pîrhebokan dibînin? Kêm maye me dijminê evînê îlan bikin. Gelo hun ji evînê û hestan çi fêm dikin? Emê ev qasî bingehên wê ava bikin, we bînin beramberî hev û piştre jî navên min derbikeve “dîktatoriyê.” Gelo wijdan di ku dera vê de ye? Pêwîste mirov hestên xwe bijî, lê belê qet nebe bi zanêbûna kûr a rastiya xwe ve tevgerînê jî bizanibe. Naxwe ev dê bibe bêagahiyeke mezin, xefleteke mezin û nankoriyeke mezin. Wisa ye ku asta têkîliya jin û zilamê azadiyê çî ye, çi qasî hêzê dide, çi qasî hêzê distîne hîn jî mijarên nîqaşê ne.

Di salên dawiyê de hin dahûrînên jinê ku me bi pêş xistine hene. Dîsa rewşeke ku berdewamkirina xebatên jinê, tevlîkirina we ya pratîkê heye. Ev hemû karên ku bi hewldanên mezin ve têne pêşxistin in. Feraseta me ya namûsê jî heye. Hun dê jinê bixin rewşeke ku pênc qirûşan nake, di destên ên ku xwe weke egîdan dibînin de jin dibe ku hefteyekê de were rewşa paçekî. Emê vê yekê çawa bipejirînin? Rastiya hindekan wiha ye. Dîsa jî dê bixwazin dersa namûsê bidin min. Baş e, ez dizanim li ser xwe serdest bim, kêm zêde min dikarî pîvanên xwe yên baş bûn, xweşikbûn û namûsê nû bikim. Min dikarî xwe hindekî ji feraseta we ya namûsê rizgar bikim. Ger min xwe rizgar nekiriba gelo ma di nava partiyê de yek jinê jî dikarîbû bi azadî pêş bikeve? Mînak di tekoşîna ku li Başûrê Kurdistan'ê tê meşandin de jineke ku bingehê wê Xiristiyan bi navê Margaret hebû lê belê ew jî kuştin. Di tekoşîna perçeyê Başûr de ji vê zêdetir jinek jî nîne. Ger hun wisa

bawer dikin ku di nava refên PKK'ê de jiyîna bi hezaran jinan bi xwe ji xwe ve çêdibe, yan jî hevaltî û têkîliyên we yên pîroz ve çêdibe, ev xefleteke mezin e û înkarkirin e. Ev çîrok misoger ne wisa ye. Di vê mijarê de înkarkirin û tevlîhevkirineke mezin heye. Him jî ev ji aliyê yên herî nêzî me ve tên kirin. Kêm maye ku me gunehbar bikin. Gelo ger jineke ku zilamek gelek jê hezdike hebe yan jî zilamekî ku jinek gelekî jê hez dike hebe, dikare beşeke biçûk a mijûlbûnê bi qasî min nîşan bide? Gelo weke kesayetên ku evînên herî xwedî azwer dijîn, dikarin xwe tevlî asta azadiyê ya wiha û rastiya tekoşînê bikin?

Emê van hemû tiştan wiha pêş bixin. Lê belê rexmî vê emê weke "astenga" li pêşiya têkîliyan û "dîktatorek" werin nirxandin. Di PKK'ê de têkîliyên jin û zilam bi hêsanî pêş nakevin. Me xwest em van têkîliyan bi pêş bixin. Cara yekem jî me xwest em bi jinê dest bi vî karî bikin, hun dibînin çi hate serê me. Pêwîste em ji vê dersan derbixin. We dît ku çi hate serê bi sedan milîtanî. Ji welatê xwe direvin. Dijmin ên ku bi îşkenceyê nayê rê bi vê rêbazê ve tîne rê. Ew keçikên ciwan û xortên ciwan ên di civakê de hîn di panzdeh saliya xwe de çawa tên pûçkirin. Em naxwazin diyar bikin ku rejîma 12 Rezberê di vê mijarê de çi kiriye.

Ez girîngiya fêmkirina we çîroka di nava partiyê de diyar dikim. Hun dizanin ku di civateke wiha û îdarekirina jinekê çi qasî zehmet e. Dibêjin "jin e, ger ji malê bireve ne diyar e ka wê çawa bigihê ku derê?" jinekê dema ku zincîra feodaliyê qetand ji beriya ku bigihê panzdeh saliya xwe direve. Dibêjin "an dê biçe gewende yan jî biçe zirnecî." Heta bigihê wir direve. Ji ber ku zincîr di asta ku mirov nikare li ber xwe bide de ye. Hun zilamên ku xwe di mijara jinê de pispor dihesibînin, ger hun bikaribin jinekê di nava heftiyekê de di nava têkîliyeke tenduristiyê de bihêlin ezê ji we re bibêjim bijî. Asta di Kurdistan'ê de misoger derfetê nade ji bo meşandina evînê.

Me bûyera evîn, hest û hezkirinê şîrove kir. Pêwîst e hun van hîn bibin. Riya rast a evîn û hezkirinê heye. Riya têkîliyan a teqez azadkirinê û xwedî hêzkirinê heye. Ger hun van li aliyekî bihêlin, rê vebikin ji bo skandalên ku

her roj ji aliyekî ve partiyê têk bibe, evê bibe xirabiya herî mezin ku hun bi partiyê dikin. Hindek provakator ji bo ku polîtîkayên me yên di vê mijarê de vala derbixin gelekî bi ser me de tên. Qaşo dê lewaziyên me bi kar bînin. Ev yek karê provakatoran e. Ew her tiştî dikin. Tiştên çawa bi min kirin we dît. Lê belê emê jî hindekî bizanibin li ber xwe bidin.

Ez dikarim ji bo yên ku di Kurdistan'ê de nirxekî mezin didin hest û evîna xwe vî tiştî diyar bikim: ez bawer dikim ku me riya vê ya rast nîşan da. Me teoriya vê ava kir û di heman demê de ev teorî zanistî ye. Hevgirtina ku di PKK'ê de pêk tê evîna herî mezin e. Serkeftina di dahûrîna û derbaskirina wê ya pratîkê de hatiye pêkanîn serkeftina herî mezin a li hemberî her cureyê fetisandina feodalî û kîlîtbûnê ye. Ev jî serketina evînê ye. Lê belê pêwîste hun girêdaniya vê ya bi şer re bibînin. Asta jineke kole, zilamekî hatiye kolekirin, zilamekî ku hatiye rewşa pîrejinekê ya di nava me de bibînin. Piştre behsa evînê bikin. Evîn karekî ku pêwîste bi egîdî were kirin e. Bêyî ku hun xwe rast nas bikin, di çareseriya rastiya xwe de gavekî serkeftî jî neavêjin hunê behsa kîjan têkîliyê bikin? Ji bo evînên we hemûyan rêza min heye, lê belê ez dihizirim ku wiha evîn nabe. Ez li hemberî evînê jî nînim, ji ber ku ez dizanim têkîlî weke ku hun bawer dikin bi pêş nakeve. Dê bêencam bîmîne, dê we gelekî bide şermê û bixe rewşeke tengav, lewma ez bi rexneyî nêzîk dibim.

Min nîşan da ku têkîliya jin û zilam çi qasî bizehmet e. Hun nikarin bibêjin "ya te îstîsnayek e" ya min ne îstîsnayek e. Pergaleke ku giştî û her kesek di nav de ye, derxistina wê holê ye. Hun dixwazin biceribînin. Li vir jî hindekan ceribandin, xwestin nîşan bidin ku weke çavkaniya hemû pirsgirêkên me zewacên erzan pêk anîn in. Bi vê tenê ne partiyê, netewe û pêvajoya ku netewbûn hatiye tê de çawa vala derdixin. Vaye têkîliya Kurd, vaye têkîliya jin û zilam, vaye zewac! Hunê çi ji zewacê bikin? Ger hun bikevine vê riyê dê kî we li van çiyan xwedî bike? Emê vê têkîliyê çawa rabikin? Ger em hemû di nava hewldaneke wiha de bin, hilberîn û şer bisekine misoger gel me qebûl nake. Ger gel qebûl neke, dê alîkarî qut bibe, ger alîkarî qut bibe emê li çiyan birçî bimînin û nikaribin şer bikin. Dema bi

evînê ve mijûl bin dê şer raweste. Dê kî me li van çiyan rizgar bike? Ger hun bixwazin sîxuriyê jî bikin, nîjadperestiya hov dê jina di destên we de bigre, jixwe pêşmergeyan kiribû biryar. Digotin "gelek keçikên wan hene, her yek ji me em biçin emê yek diduyan bînin." Ji ber ku hindekî ji min ditirsiyan min pêşî li wan girt. Ez hindekî xwedî bandor im û rewşeke min a ku giraniya xwe heye, li holê ye. Ez zêde ihtimal nadim ku di welatên biyanî de hestyariyeke ku hun li çiyê dijîn hebe. Ez zêde ne ewle me ku derbasbûna jiyaneke malbatê ya gelekî bipergal zêde tendurist be. Pergal û rewş guhertine.

Di nava bûyera PKK'ê de di vî alî de tiştên ku çêdibin pêwîste mirov gelekî baş têbigihêne. Têkîliyên hêsan û partîbûyîna hêsanî nabe. Jin û zilam bi hêsanî azad nabin. Em nikarin bi hêsanî zilamên binamûs biafirînin. Rêza min ji evînên we re heye, lê belê ew zilam û keçika ku hun xwe dispêrinê ji zû ve tune bûye. Destpêkê em wan bi pêş bixin. Jin û zilamên milîtan derbixin holê. Ev yek bingeh e. Ger şerekî veguhertina kesayetekî mezin nebe, hun nikarin li rûyê hev binêrin. Hatina beramberî hev a kesayetên lewaz heta asta hin têkîliyên me yên hetanî duh bi pêş diketin bihizirin. We bi xwe diyar kir ku ev çi qasî seranser in, çi qasî ketî ne, çi qasî ezez in, çi qasî ji armancê qut dikin. Gelo em dikarin ji van re bibêjin têkîliya hest, evînê yan jî têkîliya bi hezkirinê? Yek ji we jî nikare vî tiştî bipejirîne. Tê wê wateyê ku em di riya şaş de ne. Tê wê wateyê ku pêwistiya me bi nûbûnê heye. Tiştê ku ez dikim jî ew e.

Ger dagirkerî we ev qasî xistibe feodalîzmê we ji kesayetê dûr xistibe, jin ev qasî tunekiribe, ew jina ku dibêjin navdar e, ger meşeke rast û axaftinê nizanibe hunê bi vê jinê re çawa evînê bijîn? Tiştê ku hun bi navê evînê tînin ziman zayendîtiyeke gelekî ji rêzê ye. Evîn feraseteke mezin a dinyayê, bergeha li dinyayê, bingehê felsefîk netewî û bîrdozî û jiyaneke tekoşer pêwîst dike. Ger ev nebin evîn nabe. Hun nikarin jixwe têrkirina zayendî ya ketûber, hestên ketûber, nêzîkbûnên seranser û seqet re bibêjin "evîndarbûyîn." Ev him evîndariya dagirkeriyê û him jî ya feodalîzmê ye. Ev evîndarî ji ketîbûnê re, tunebûnê re lewaziyan û xilasbûnê re ye. Pêwîste

ku hun vê evînê red bikin û tenezûlê wê nekin. Em ji aliyê zayendî ve tune bibin lê belê bi evînên wiha erzan ve em xwe nexapînin. Ger hun xwe li ser vê bingehê dahurîn nekin ber bi bûyîna jina azad ve hun nikarin gavan biavêjin. Nêzîkbûnên zilam ên li ser bingehê wekhev û azad nikarin bi pêş bixin. Ger we gav neavêt bihevrebûnên we yên dipîrozîne, hêzdar dike yan jî rê li ber avakirina civakeke ku em armanc dikin de çênabin.

## Azadbûna civakê bi azadbûna jinê ve gengaz e

Me ev pirsgirêk heta dawiyê bi zanistî danî holê. Hunê pêwendiyê ji vê re bikin. Ên ku têkîliyê bi pêş dixin roja diduyan dibêjin, “ez ji şer qut bûm, ji rêxistinê qut bûm, hestiyar bûm, ketime qeyranê.” Rewşa yên dikevine têkîliyan hemûyan wiha ye. Ger têkîliyeke wiha me ji rêxistinê û şer qut dike, dûr dixe gelekî şexsî dike, dixe weke komeke qeyranan wê demê me ji vê evînê çi fêm kir? Emê çawa vê têkîliyê tehemûl bikin? Em nikarin evînên wiha bipejirînin. Ên ku hestên xwe yên wiha hene, em nikarin zêde qîmete bidin wan. Hun nikarin ji ber ku ev yek wiha ye bibêjin, “di PKK’ê de evîn nîne, hezkirin nîne.” Di PKK’ê de evîn heye, di PKK’ê de hezkirina herî nirxdar heye, evîna herî nirxdar jî heye. Lê belê ev evîneke weke hun fêm dikin nîne.

Di çîroka Mem û Zînê de jî rexmî ku her du alî jî zarokên axayan in, ev evîn pêk nayê, ev rastiyeke Kurdan e. Ev nîşan dide ku di sedsala 16-17’an de bihevrebûn û evîn çi qasî zehmet e. Gelo hun çawa dibêjin di nêvengeke ku dagirkerî ev qasî rûxandiye û cihekî ku kesayet ev qasî hatiye xistin evê çêbibe? Yek jî di pêvajoya ku Ehmedê Xanî jiyaye de taybetmendiyên Kurd gelekî zindîne. Di wir de tu asîmîlasyonek û bi vî rengî dagirkirineke çandî nîne. Begayetiyên Kurd ên heta dawiyê serbixwe hene. Evîneke ku li ser vê bingehê bi pêş neketiye, hunê çawa di bin dagirkeriyeke giran de û mercên ku kesayet tune dibe de him jî pêvajoya bêkesayetkirina herî mezin a serdema me de civakeke weke ya me gelekî paşvemayî de serbixin? Hunê çawa xwe bigihînin evîn û hezkirineke hêsan?

Ez bi hevaltiya xwe ve girêdayî me. Ez bi hevaltiya jinan ve jî girêdayî me. Lê belê hîn jî em şerê vê yê mezin dimeşînin. Em nirxên ku em di riya wan de şer dimeşînin dizanin. Em di mijara evînê de jî, di mijara jinê de jî çi dikin baş dizanin. Ger mêrek an jî jineke bi we ve hatiye girêdan hebe, gelo ma hun dikarin di nava PKK'ê de weke ku xwe serbest bihêlin? Ger hun serbest bihêlin gelo ma ji destên we dernakeve û naçe? Ji ber ku kesayet nîne. Ger ew di vê pêvajoyê de bisînor be jî çawaniya şerekî azadiyê yê wiha, heta artêşbûna wê dijîn, ev rewş nîşan dide ku bingehekî mezin ê evînê hatiye pêşxistin. Yên ku biaqil in dikarin şîroveyên xwe bi pêş bixin. Ji ber ku di vir de jina xwedî hêz û zilamê xwedî derdikeve. Di têkîliya xwedî hêzan de jî bihêzbûn derdikeve. Hunê rê bidine van hemû tiştan. Wê têkîliyên derveyî şer maye, bi rastiya şer ve nehatiye girêdan, heta hindekî berovajiyê wê ye hilbijartiye. Ev berovajî feraseta evînê ya PKK'ê ye. Pêwîst nake ku em feraseta xwe ya evînê tevlîhev bikin. Evîn pirsgirêkeke xwetêrkirina du kesan nîne. Bihevrebûneke asta netewî ye. Bi mirovahiya pêşverû re hevgirtin e, xwe bi mirovahiya pêşverû ve dayîna qebûlkirin e. Rûxandina astengên feodal e. Derbaskirina hestên biçûk, malbatgerî û eşîretgeriyê ye. Di asta netewî de gihiştina hêza mezin a hezkirinê zanebûna wê û rêxistina wê ye. Gihiştina rêxistin partiyê ye û di serî de jî gihiştina rastiya partiyê ye. Bi hemû aliyên xwe pêşwazîkirina rizgariya netewî û civakî ya welat e. Ger we ev sînor derbas kirin, hestên we jî û evînên we jî mezin e. Ger hun hîn nehatibin van sînoran em nikarin li Kurdistan'ê behsa evînan û hestan bikin. Bi tenê mirov dikare li wir behsa xulamtiya dagirkeriyê, têkçûn û pîsîtiya wê bike. Lê belê dema ku hun bixwazin evînê bijîn, gelo ma hun çi dikin? Cerdewan bi pereyên ku ji cerdewaniyê girtine, zewaca duyem dikin. Ji bo ku jina duyemîn bistînin, kar dikin ku pereyan peyda bikin. Encama vê jî dibe xiyanet. Zuriyet jî, zilamtî jî ev qasî bi hev ve girêdayî ye. Ez vî tiştî dernaxim, ev rastiyên ku kesên dixwazin bihizirin nikarin piştçav bikin in.

Me di rizgariya jinê de derfetên yekîtî, nîqaş û meşê pêş xist. Weke berê ew zilamên ku ji serdestiyê zêdetir tu tişt ferz nedikirin nînin. Zilamên ku

bikaribin bibin rêheval hene. Me serkeftineke wiha bi dest xist. Dibe ku hindek ji we ji vê yekê têr nebin. Lê belê ger hun li dîrokê û rastiya civakê temaşe bikin, hunê baş fêm bikin ku em dixwazin çi bibêjin. Me zemînên rast ên hestên we afirandin. Me riya rast a hestyarbûnên we yê ku çêbibin nîşan da. Nirxeke mezin bidin vî tiştî. Ev destkeftiyên gelekî saxlem in. Vî tiştî bilindtirkirin û serkeftin pêkanîn şerê me yê mezin e. Rizgariya evînê jî, jinê jî, zilam jî bi vê ve girêdayî ye. Hun wisa bawer dikin ku em di van mijaran de zêde bi kûranî nahizirin. Berovajî hun gelekî seranser û xafil in. Hun welatparêziya min dizanin, ji hemû taybetmendiyên xwezayê yên zindî û ne zindî, em ji nêrînekê bigrin, têkîliya cîraniyê bi qasî min jiyaye, heta têkîliyên min ez nikarim pêwendiyê bi vê mijarê re nekim.

Hun şensekî bi du peyvan ê pêşketinê nadin têkîliyên xwe. Keç û zilamên herî navdar jî li gel we be roja diduyan hun dê ava wan derbixin. Lê belê yê ku jin û zilam bi pêşxistiye em in. Tu Kurdek di vê mijarê de şensê avakirina zemînekê nade jina azad. Li holê ye ku zilam û jinên Kurd ên herî navdar ji azadiyê çi fêm dike û çi qasî azad e? Lê belê ezmûnên me û hindek pêşketinên me derxistinê holê hene. Ez nabêjim ku min her tişt afirand, lê belê tevgera rizgariya jin a ku em dixwazin bi pêş bixin heye. Ez nabêjim bi hemû tiştên xwe ve temam e, serkeftin misoger e. Lê belê tekoşîneke li pêş çavan heye. Rêxistina vê jî her diçe bi pêş dikeve. Ev karekî tenê bi min ve pêk were nîne. Ev şerê hemû kadro, gel, jin û zilam e. Me tiştên ku dikete ser milên xwe kir, hîn jî em dixwazin afirandêr bin. Ez dikarim diyar bikim ku di nava heft salên derbasbûyî de bi taybetî me dahûrandinên kûr bi pêş xistin. Di nava çend salên dawiyê de jî me berfirehiyek da vê mijarê. Li gel vê jî em ber bi xwedîhêzbûna pratîkî ve jî diçin. Ev pêşketin tenê di asta Kurdistan'ê de ne, di asta navnetewî de jî girîng e. Erkeke me heye ku em vê pêşketinê pêşdetir bibin.

Pirsgirêka jinê pirsgirêkeke ku her rojekê derbas dibe di cîhanê de her diçe derdikeve pêş. Em partiyek in ku bi şoreşa Kurdistan'ê ve armanc dikin ku bersiva herî mezin bidin vê. Ew kesayetekê ku di nava partiya me de azad dibe çareseriyeke mezin e. Asta azadiya di nava partiya me de misoger

asta azadiya jinê jî derdixe holê. Ev yek weke ku tê bawerkirin hîn zêdetir piştgiriyê dide şoreşgerî û azadiya civakê. Di cihekî de bi qasî ku jin azad bibe, civak jî azad dibe. Em ji bo vê kûrbûneke weke “bi qasî ku kesayet azad bibe, di têkîliyên jin û zilam de jî wekhevî û azadî bi pêş dikeve” didin qezenckirin. Pêwîst e em balê li vê aliyê PKK’ê jî bikişînin. Pêwîst e mirov baş bibîne ku şoreşa Kurdistan’ê tenê şoreşeke serdestiya zilam nîne. Pêşketineke şoreşgerî ya ku serdestiya hevpar a jin û zilam e. Em derfetê nadin ku şoreşa me taybetmendiyên xwe yên feodaliyê girantir bin û bibe şoreşekî di bin serdestiya zilam de bimeşe. Hîn ji wê zêdetir em derfetê nadin ew taybetmendiyên kesayetê ku kapîtalîzmê cihê kiriye û derfet nadin taybetmendiyên serdestiya zilam jî. Em bawer dikin ku me di bihevrebûna jin û zilam de di zemîneke ji bo azadî û wekheviyê re vekirî de PKK pêş xist. Em nirxekî mezin didine xwe ku em vê rêgezê baş di pêş çavan re derbas dikin û bi pêş dixin. Misoger him rêgez û him jî pêkanîna rêgezê heye. Li gor vê jin jî û zilam jî xwe bi pêş dixin.

Cara yekeme ku şoreş li ser bingehê hevpariya jin û zilam bi pêş dikeve taybet e. Ev hêmaneke ku dema me rastiya xwe hindekî dahûran bi ser xist û misoger kir. Bêguman dê di vê riyê de hîn zêdetir tekoşîn were dayîn. Pêwîste biçûk neyê dîtin ku di vê pêvajoya şoreşê de jî di vê têkîliyê de asteke rêgezî û hêzeke pêkanînê ya ev qasî berfireh hatiye bidestxistin.

Em dixwazin di artêşbûna jinê de gaveke pêşdetir biavêjin û asta wekhevî û azadiyê bigîhînin bingehên saxlem. Ger em tevlîbûna jinê di şerê leşkerî de jî bînine vê astê jixwe ev tişt di hemû civakî û siyasî de nîşandan gengaz e. Ev jî dê bibe şoreşeke ku hîna di serî de çawaniya jin û zilam bi rengekî wekhev û azad dixe rojeva xwe. Ev jî dê bibe pêşketineke şoreşgerî ku nirxên xwe yên navnetewî gelekî bilind e. Pêşketina PKK’ê weke partiyeke wiha dîsa di rizgariya jin û şoreşa jin de rizgariya netewiya Kurdistan di çawaniyeke wisa de bi pêş dikeve dihêle ku nirxên wê zêdetir pîroz bibe. Me bingehê vî tiştî ava kir bi hindek hewldanên bisînor ve şensê pêşketinê dayê. Yê ku xwedî îdîa ne û nirxekî mezin didin milîtanbûyîna vê dikarin zemînê vê rast bi kar bînin û milîtaniya xwedî hêz a jin û artêşbûna jin,

kesayeta zilam a gelekî xwedî nirxe hatiye dahurandin û milîtaniya vê pêk bînin.

Serkeftina şoreşê ji tiştê tê bawerkirin zêdetir girêdayî di nava tekoşînê de kesayetên wisa zêdetir derdikevine holê û şoreşên ku di rêbertiya van de tê meşandin de meşa ber bi armancê ku hatine danîn ve ye. Kesayetên wiha hîna ji niha ve him ji netew û civakeke serbixwe û azad re him jî şêwazên wê yên ku heta hêmanên wê hatiye daxistin re dikarin rêbertiyê bikin. Çareseriyeke ku di nava partiyê de hatiye serxistin, ji bo serxistina wê ya di nava civakê de jî pîvanek e. Ji ber wê jî ev qas nirxdayîna me ya vê rêgezê nîşan dide ku em çi qasî bi armanca xwe ya civakî ku em bi biryar in, dahatuyê de avabikin re di nava ahengiyekê de ne. Hê ji niha ve xwedî rêgezî tê wateya di rizgarkirina pêşerojê de bi îdîabûn e. Hê ji niha ve her çi qasî hewldanên rastî zehmet jî bin, her çi qasî hêdî jî bi pêş bikeve her çi qasî ji bo we dijwar be jî, avakirineke civakî ku li ser vê bingehê dahatuyê di mercên taybet de tê pîrozkirin emê şansê xwe yê serkeftinê bigihînin ewlehiyê.

Şoreş weke di her mijarê de ji mijara hizirandinê re jî qîmeteke mezin dide yan jî xwe dispêre hizirandina saxlem û pêk tê. Em di zanebûna bingehê hizir a şoreşa Kurdistan'ê de ne. Di vê mijarê de jî ew hizirandina ku hatiye pêşxistin, a ku di civakên Rojhilat a Navîn de nirxên darezînê yên feodal ku gelekî bibandor e, hişkbûna di zilam de çi qasî bihêz dike em di zanebûna wê de ne. Rexmî vê nêzîkbûneke wiha ya azadiya jinê nirxeke mezin rave dike. Ger di nava partiyê de stirandina hevîrê vê û avakirina kesayeta vê were biserxistin, ne tenê di Rojhilat a Navîn de em ji mercên civakî yên gelekî paşverû ve jî derbikevine holê, dê di qada navnetewî de jî gelekî bibandor be. Wê bibe hêzeke rêber a çareseriyeke ku ji mirovahiyê gelekî pêşdetir e. Em dibin sazûmankarê şoreşeke wiha û ji ber vê yekê em nirxdar dibînin.

Li ser vê bingehê PKK'yîbûn di nava şoreşeke wiha, di nava şerekî rizgariyê de cihgirtin weke perçeyekî vê bi artêşbûna jinê ve hin gav avêtin gelekî girîng e. Gavên wiha her dem hewldanên mezin dixwaze. Ji ber ku nû

ye û dibe ku bêwate jî were, ji bo mirovan pêwîst dike ku helwesteke berfirehtir û israr hebe. Dîroka partiya me bi mînakên gavên di destpêkê de bêîdîa diyar dike, lê belê piştre watedarbûna wan derdikeve holê ve dagirtiye. Jixwe em nikarin bêjin ku ev ew qasî bêwate ye. Em niha baş fêm dikin ku ev çi qasî watedar e û şêwazekî hêzê dide tekoşînê ye. Bi kurtayî em baş dizanin ku, em di rizgariya jinê de rizgariya zilam û welat dibînin. Tenê em bi zanînê ve namînin, pratîka wê gelekî baş dijîn û em bawer dikin ku emê hîn bihêztir bijîn.

Li ser vê bingehê em nirx didin ji her demê zêdetir partiya xwe bînin, rewşeke partiya desthilatdariyê ya serdestiya jin û zilam a hevpar zêdetir e û ji niha ve têkîliyên vê bi ziravî amade dikin. Emê temsîla wê ya şoreşgerî ber belavkirina wê ya civakê û di avakirina civakê de bikaranînê emê ziraviyeke mezin ve bikin. Emê her dem vî alî xebatên ku em pêk tînin balê bikişînin. Em ji bo şêwazê herî kevin a dîrokê yê çewisandin û dagirkeriyê dayîna bersiveke wiha ve em ji bo azadiya civakî ya ji dagirkeriyê dûr û wekhev di heman demê de ji bo pêşerojê jî biwate ye rêbertiye bikin.

Weke tê zanîn gelek rêhevalên me yên jin ên binirx şehîd ketin. Şehadetên di nava saleke derbasbûyî de hatin jiyîn hêjayî bîranînê ne. Ew şehadetên radestnebûnê û heta dawiyê berxwedanê bûn. Him ji aliyê çawanî û him jî aliyê hêjmar de şahadetên gelekî li pêş bûn. Ew şehîdên girêdayî vê rastiyê bûn. Xebata ku em ji bo bîranîna wan bikin jî partiya xwe û şoreşa ku ew jê re rêbertiyê dike wiha em bikin xwedî hêz û serketina wê pêk bînin.

**8 Adar 1994**

# DAYÎKA UWEYŞ ZAYENDÊREKE NEZAN A SERHILDANEKÊ YE

Jineke ku bi aliyên xwe yên erenî yan jî neyînî li ser tevgera jina azad bandor kiriye jî dayika min e. Îro salvegera yekemîn a mirina dayika min e.

Rastiyeke ku pêwîste em di Kurdistan’ê de li ser bisekinin jî rastiya dayikê ye. Dayik di giştî de raveya zayînekê ye. Wateya herî ketûber di nava me de ya dayikê welidandina gelek zarokan û berdewam kirina nifşê xwe ye. Ez di serî de li hemberî vê derketim. Mirov dikare bibêje bersiva herî tund min bi xwe da dayîka xwe. Weke dayîkeke hemû mafên xwe yên li ser min bi welidandina min ve girêdayî derdixiste pêş. Min jî digot, “tu vê mirîşkê û çêlîka wê dibînî? Mirîşk ji çêlika xwe re çi qasî dayik be, tu jî ji bo min ew qasî dayîkî.” Ev şibandineke gelekî çors bû, lê belê min ev kir. Heta min nêzîkbûneke di wateya “şûna ku zarokên te yên wiha hebin, qet nebin baştir e.” Her dem min anî ziman. Ji ber ku ew dayikeke ji rêzê bû, ez jî zarokekî ji rêzê bûm. Zarok weke ku dixwaze nikare bijî, dayîk jî dixwaze xwe bi zaroka xwe ve bidomîne. Ev nakokiyek e.

Dayika Uweyş nezan û bêplan bû. Lê belê li gor xwe dayika serîhildanê bû. Di heman demê de jineke ku zêde neketibû kontrola zilam. Bêguman têkîliya xwe ya bi min re cuda bû. Ez nebawerim ku dayika min bizanibe ku çi dixwaze. Ji bo min dihizirî ku “dê bibe karsaz hindekî pereyan bi dest bixe ji bo ku çend metre paç, çend cilan bikire.” Ev xwestekên zêde xwedî naverok nebûn. Tiştê ku ji ewladê bixêr behs dikir hindekî feraset nîşandana vê rewşa wê di wateya madî û manewî de hindekî bersiv dayîn bû. Zarokek jî di vê wateyê de bersivê dide dayîka xwe. Ji bo bibe kur an jî keça baş a dayika xwe baldar dibe. Rastiya we jî bi giranî hindekî wiha ye.

Di her tiştî de berovajîbûn di vir de dest pê kir. Gelo cihêtiya nebûna zarokekî wiha ye, yan jî bişensî yan jî bêşensiya wê hun dibêjin em vî tiştî fêrbûn. Min li gor xwe hê ji zû ve li hemberî dayikê şerekî wiha kir. Gelo ma mirov li hemberî dayîka xwe şer dike? Me kir. Ez gelekî kêm ketime rewşa zarokê ku dayika wî gelekî jê hez dike. Dayika ku zaroka wê jê hez

dike. Gelo bi vî rengî bûyîna me tawanek bû? Ya rast a we ye yan jî ya min e? Hêjaye mirov li ser vê yekê raweste. Em li vir ji pêvajoya zarokatiyê teoriyekê dernaxin. Lê belê psîkolog diyar dikin ku teşegirtina ji zarokatiyê ve hemû pêşketinên piştre bandor dike. Em jî pê ewle ne ku ev tişt wiha ye. Ev rastiyeke dîrokî ye. Ger tekoşeriya wê demê nebûya, tekoşeriya pêvajoya piştre jî nedibû. Gelo ez gelekî biaqil bûm, an jî biryar gelekî guhertî bû ku ev tekoşerî ferz kir? Ev jî mijareke cihê ye. Di vir de pêwîst nake ku mirov rewşên gelekî taybet ên awarte behs bike. Ev rewşeke ku di her têkîliyên dayik û zarok de tên jiyîn. Lê belê pêvajoyên ku me dest pê kiriye, pêvajoya ku nakokî hindekî zelal dibe ye. Ev di temênên zû de tê wê wateyê. Em hesabxwestinê gelekî zû dest pê dikin. Feraseteke wê ya serdestiyê heye. Li gor xwe dê hindek kevneşopiyên malbatê serdest bike. Hindek xwestekên min ên azadiyê hene. Ezê jî wan ferz bikim. Kevneşopiyên malbatê, tiştên ku ew fêrbûye ye. Tiştê ku ez weke azadiyê fêr bûme jî, li hemberî serdestiyeke gelekî paşverû şerê azadiyê ku pêş dikeve ye.

Di vir de xala girîng bandora bav zêde serdest nîne. Mirov dikare balê lê bikişîne. Ger desthilatiyeke bihêz a bav hebûya misoger dê rewş bihata guhertin. Ger bav malbat ji hemû aliyan ve bixista bin kontrolê û ew bêbandor bihişta dê li ser min jî hindek encamên wê çêbibana. Mînak dibe ku min vê rewşa binakok nedîta. Dibe ku nakokiya dayik û bavê derfet dide ku ez di vir de gavan biavêjim. Bavekî bêbandor lê belê dîsa jî dixwaze baviktiya xwe yan jî zilamtiya xwe bimeşîne. Naxwaze vî tiştî bi hêsanî berde lê belê li aliyekî din jî jineke ku dixwaze xwe ber bi pergala dayiksalar ve bibe, yan jî jineke dayiksalar û weke dayikekê dixwaze cihekî di malbatê de peyda bike. Di vê mijarê de jî li gor xwe mijûlbûneke xwe heye. Ev bi rastî jî nakokiyeke girîng e. Ev nakokî hindekî derfetan ji min re ava dike. Di wateyekê de di pêvajoyên piştre de sudgirtina ji nakokiyan cara yekê ez di vê malbatê de fêr dibim. Ango ez li hemberî desthilatiya bav bi têgeha ku jê re hêza dayikê tê gotin nas dikim.

Ev di malbatê de rê li ber bêbandoriyê vedike. Ji ber ku rê li ber vedike, ez jî xwe bi xwe dibêjim di temenekî zû de dikarim azad nêzîk bibim. Ger

dayika min li hemberî bavê min derdikeve, gelo ji bo çi ez li hemberî hindekan dernekevim? Li gor jinên din dayikeke wiha him wêrekiyê dide û him jî dihêle ku ez hindekî din serbest û li gor xwe nêzîk bibim. Weke ku mirov bibêje dema du hêz bi hev re mijûl dibin, dibe ku rewşa pêşketina hêza sêyemîn bibe mijara gotinê. Dema ku ev wiha bi hev re mijûl dibin, weke ku hev bêbandor dihêlin, hêza sêyemîn a zarokekî dikare pêşketinekê nîşan bide. Ev rewş misoger li ser me bi bandor dibe. Ez hindekî ji vê bandor dibim. Rewşa heyî bêyî ku ez zêde bikevim desthilatiya dayik û bav jî gengaz dike ku ez xwe bibînim û xwe hindekî din azad hîs bikim.

Gelek caran şerkirina dayik û bavê bi hev re nehiştina vî tiştî rihetî û aramiya di malê de zêde cih neda têgehên weke himbêza dayikê û parastina bavê. Di rastiyê de tu nikarî di nava vê de ji xwe re cihekî peyda bikî. Tu nikarî li parastinê bigerî û hezkirinê peyda bikî. Ez dihizirim ku ev jixwe her cureyê bêrêziyê li hev ferz dikin. Mirov nikare baweriyê bi vê rewşê bîne. Yan jî bi vê rewşa xwe ve bawerî pê nayê anîn. Bi vî rengî hê ji zû ve nebawerkirina malbatê û li hemberî nirxên malbatê guman bi pêş dikevin. Jixwe piştre hate fêmkirin ku ev çawa watedar û girîng e. Ji ber ku bi rastî jî bandora malbatê li ser zarokan diyarker e. Mirov dikare diyar bike ku hîn jî gelek ji we zarokên malbatê ne. We bi malbatê re nirxên darezînê yên malbatê re şer nekir û mezin nebûn. Ez hîn jî ji bo ew şaşiyên ku we ji wan girtiye sererast bikim dixebitim. Ger hun bînin ber çavên xwe min ew nirxên ku kole dike, dinepixîne, dike diz û xwe bi rengekî gelekî sexte dixe şûna mirovan çawa zelal kiriye û bi van nirxên darezînê re çawa her roj şer kiriye, dê rastiya we ya malbatê xwe hindekî din zelal bike.

Îhtimala ku hun hemû “zarokê baş ê malbatê” mezinbûne bilind e. Ez tiştekî ji vê re nabêjim, lê belê di nava vê şêwaza mezinbûnê de di asta herî jor de girêdayîbûn, koletî, qirêjî û nepixandin heye. Hun encamê vê yê biêş û ku nayê qebûlkirin tînin nava partiyê. Gelek ji we dibêjin, “ez partiyê weke malbatê dibînim.” Hun diyar dikin ku têkîliyên weke yên malbatê di nêvenga partiyê de digerin, xwe jî weke zarokekî baş ê malbata partiyê dinirxînin. Mînakên vê derdikevine holê. Ger hun partiyê weke rêxistina

malbatê bibînin hunê bibin belaya serê partiyê. Malbat saziyeke hov e. Ger hun nirxên vê saziyê bi nirxên netewî û siyasî ve tevlîhev bikin, ezeziyeta di wir de, jiyana erzan û bêked a di wir de ji partiyê jî hêvî bikin, ew hezkirin û rêzdariya ku we di wir de dîtiye, bêyî ku kedê bidin di nava partiyê de jî bigerin hunê bibin bela seriyan. Jixwe beşeke ji we bela seriyan e. Ji ber ku rastiya we ya malbatê di we de gelekî xirab rûniştiye. Hîn jî hun nikarin ji bin vê rewşa bela seriyan derbikevin. Encameke girîng a ji wir derbikeve ev e.

Ez nirxeke mezin didim tiştê ku malbatê daye we, hun mezin kirine heta mezinkirina we ya dayikekê. Ev mezinbûneke gelekî zehmet e. Ango ez dibêjim bila xwedê bi min her karekî bide kirin lê belê karê mezinkirina zarokekî ya dayikê nede min. Mezinkirina zarokekî karekî zehmet e. Ez nikarim di wan mercan de bi wî rengî tehemûlê mezinkirina zarokan bikim. Bêguman ez dijberî zarokan nînim. Weke ku ez pesnê xwe nedim, lê belê bi zarokan re yê herî zêde weke hevalekî mijûlbûnê ez didomînim. Ez dixebitim ku nêzîkbûneke ji bo zarokekî weke zarok na, weke mirovekî ku yê pêş bikeve bi rengekî cewherî derbasî jiyanê bikim. Lê belê dîsa jî rojekê li hemberî girîn û qarîna zarokan berxwedayîn ne gengaz e. Dayik gelekî balkêş ber xwe didin. Bêguman ev berxwedan wan jî dixe û mehf dike. Ev paşdemayîna dayikan hindekî jî ji rûyê van zarokan e.

Ev nakokîyên gelekî cuda ne û mirov dikare gelekî cuda bidest bigre. Ango di nava rastiya Kurd de şêwazê mezinbûna di malbatê de rê li ber encamên gelekî giran vedike. Hun çi qasî bi naz û derveyî kedê hatine mezinkirin? Rexmî ku malbat feqîr jî bûn, wan hun weke paşeyekî mezin kirin, ev nakokiya mezin e, pirsgirêkeke mezin e. Jixwe zarok her dem bi gotinên “kurê min mezin dibe, dibe paşe” tên mezinkirin. Di encama vê de jî hun weke generalekî sexte ku qet ked nedaye li beramberî me disekinin. Ev encamekî şêwaza mezinkirina we ye. Hun wisa fêr kirine. Gotine “zarokê min ê herî baş e, herî xweşik e, herî yê paşe ye” bêyî hun qet kedê bidin, ji kêleka pêşketineke bi hewldaneke teorîk û pratîk a dijwar derbasnebûna we û ev paye layiqî xwe dîtina we milîtanî layiqî xwe dîtina we bi şêwazê

mezinbûna we ve girêdayî ye. Başbûneke min ez tevlî şêwazeke wiha ya mezinbûnê nebûm. Min bi şensî yan jî bêşensiya mezinbûneke wiha nejiya.

Tê wê wateyê ku rewşa min a nakok di nava malbatê de û gelekî zû derketina vê nakokiyê li ser pêşketinên piştre çêbûne bandoreke diyarker kiriye. Ew gumanên ku min ji vê saziyê dikirin, hişt ku ez li hemberî kevneşopiyan parastinan û piştdayîna wan ve xwe li ser piyan hiştinê jî gumanan bikim. Jixwe her kes dibêje dê bavê wî yan jî dayika wî çawa wan biparêze û wisa mezin dibin. Bêyî ku xwe bispêre dayik an jî bavê xwe ne gengaz e ku zarokek mezin bibe. Lê belê bi rengê ku me jiyaye, me ev tişt zû dîtin û gelekî zû qutbûn, ev jî ji bo serbixwebûna me ya piştre piştgiriyeke mezin dide. Ji bo fêmkirina me, nakokiyên di civakê de ne li gorî nirxên malbatê li gorî nirxên netewî û civakî zirav nêzîkbûna me derfet dide, min ji bo vê hê jî zû ve vekirî dihêle.

Pêwîste ez înkar nekim ku van ez parastime. Pêwîste ez vê jî bi bîr bînim, dibe ku ez bibama zarokekî ku stuyê xwe ditewîne jî. Dayika min li gor nakokiyên xwe ber bi şervantiyekê ve çûyînê de gelekî bibandor bû. Heta ez dikarim bibêjim, terbiyeya herî mezin min ji wir girt. Ango min helwestên dayîka xwe de ev tişt dît. Ger tu dijminên xwe ve mijûl nebî, tu nikarî nan bixwî yan jî tu carî nikarî bijî! Dibe ku ev taybetmendiyeke girîng a perwerdê ye. Ji ber ku dayika min li hemberî ewê ku wê li gorî xwe dijmin dizanî tekoşer bû. Mînak dema ku zarokekî sîleyek li min bidaba û min tola xwe nestendiba û ez hatibama wê ez diqewitandim û digot, “tuyê herî teqez bersivê bidî.” Ez şerê ku min bi hindek zarokan re kiriye tînim bîra xwe, ev pevçûn misoger bi ferzkirina wê ve çêdibûn. Ger ji min re bimaya dema ku zarokan li min didan, ezê bigîriyama û biqêriyama, min dê bixwasta ku min biparêzin. Minê ji dayik an jî ji bavê xwe re gotiba biçe tu tola min hilbigre. Jixwe min wisa jî dikir. Rewşa hemû zarokan wiha ye. Ango dema ku lêdan xwarin û zirarek gihişte wan digrîn dibezin, destpêkê diçin gel bavên xwe, piştre dayika xwe himbêz dikin, dixwazin bersiveke wisa bidin dayîn. Di vir de bersiveke wisa ne mijara gotinê bû. Digotin “ew jî zarokek e, tu jî zarokek î tuyê biçî bersivê bidî.” Dibe ku ev şêwazeke rast a perwerdê be, ji

aliyekî din ve jî dayika min bi xwediyên wan zarokan re şer dikir. Digot, "ger zarokê te wiha kiribe, ez jî wiha dikim." Lê belê bi me jî dida kirin.

Dayika min bi min hesteke wiha da qezenckirin. Bi xwespartina min ve her dem ji min piştgirî girtinê ve, alîkarî dîtinê ve wisa bi girînê ve bi taybet wiha nêzîkbûnê ve tu nikarî bijî. Teqez pêwîste bersiveke te hebe! Gelekî hov be jî weke tolhildanekî yan jî hesteke mezinbûnê ye. Aliyê bavê di şer de xwedî hêzê nebû. Aliyê dayikê zêdetir xwedî hêz bû. Li aliyê bav jî şerkeriyek hebû, lê belê aliyê dayikê hîn diyarkertir bû. Ev taybetmendiyeke dema jiyînê tekoşerbûyîn e. Dayika min zêde me neda perçiqandinê. Ji ber ku di wan şerên bi wan zarokan re dibe ku em bihatana perçiqandin. Zarokên hember hîn xwedî hêzbûn û zêdetir bûn. Di wir de hêza xwe parastinê hebû. Şerekî xweparastinê yê dijwar dihate dayîn. Ango ev tişt dida hîskirin. Ez wisa stûyê xwe natewînim. Ezê şerekî mezin bikim. Ezê qiyametê rabikim! Di gund de jî dayika min a herî navdar bû. Tufaneke serîhildanê bû. Di qîjandinê de, di dujûndayînê de kesek di ser re nebû. Zilam be, jin be kê dibe bila bibe bêtirs diçû ser. Ango kesayeteke balkêş bû. Hindekî jî ji aliyê parastinê ve me bi hev re hindek tişt parvekirin. Naxwe dibe ku em bibana yekî lewaz jî. Weke ew dibêjin, gengaz bû ku ez bibama zarokekî lewaz ku stûyê xwe ji her tiştî re ditewîne. Di vê wateyê de pêwîste mirov nirxê wê teqdîr bike. Derveyî vê tiştekî ku bidine me tunebû. Piştî ku pêvajoya dibistanê dest pê kir, tiştekî ku ez ji dayikê fêr bibim nemabû. Ev pêvajoyeke qutbûnê bû û dê bidomiya.

Gelo ji dayîkan qutbûn çi qasî rast e? Ew zarokên mînak ên dayikên xwe, dema derfet û pereyên wan çêdibin giştî diyariyan ji dayika xwe re dikirin. Min serî li rêbazeke wisa neda. Di rastiyê de pereyên min jî hebûn. Rexmî ku min hindek pere qezenc dikir jî, ez nehizirîm ku ji bo xizmên xwe, ji bo dayika xwe diyariyekê bikirim. Dibe ku wan ev tişt baş nedîtibin, dibe ku ez di vê mijarê de bi înkarî nêz dibûm. Lê belê li gor min pêwîst bû ku kurbûn cudabûya. Li gel ku ez weke kurê ku wan dixwast nebûm, di min de lêgerîna bûyîna kurekî baş ê hîn cudatir hebû. Ez tu caran bi diyariyên erzan ve nêzîkî têkîliyên dostaniyê nebûm. Ez hîn jî wisa me. Min ji bo we diyar kir

ka ez çi qasî bi hevaltiyê ve girêdayî me, di temenên zû de çi qasî lêgervanekî mezin ê hevaltiya zarokan bûm. Ji bo ku ez bi wan re bim, min çi qasî hewl dida. Heta ji bo hevaltiyên wisa ava bikim, hêzeke çawa mezin min bi dest xist. Min didît ku ev bi diyariyên erzan ve çênabe û di rastiyê de min diceriband ka ev diyariya erzan çî ye? Min hindek tiştên ku balê bikişînin nîşan dida, ev zêde balkêş nedibûn. Ji bo pêşketina têkîliyên xwedî hêz û avakirina hevaltiyên xwedî hêz derfet nedidan. Ji bo wê jî hîn di temenên biçûk de ez li riyên cuda yên girêdana mirovan hizirîm. Ez xebitîm ku riyên mezinbûna girêdaniya malbatê yên guhertî bihizirim.

## Mafê Dayikê Bi Tenê Bi Tekoşîneke Dijwar Ve Tê Dayîn

Bi têkîliyên madî yên ji rêzê ve, bi têkîliyên diyariyan ve, bi têkîliyên xizmayetî û kirîviyê ve hebe nebe hun dikarin çend ehbaban bi dest bixin. Hemû mirovahî, hemû gelê xwe nikarin bi dest bixin. Ji ber ku wê demê pirsgirêk ev bû. Em qezenckirina hemû gel li aliyekî bihêlin, me nedikarî em cîranên xwe jî bînin gel xwe. Ez bi xwe ji xwe re dihizirîm û min digot ma tu çi kesayetî ku cîranên xwe jî bi watedar bi xwe re nakî yek, rexmî ku tu gelekî dixwazî tu nikarî gundiyên xwe jî qezenc bikî. Vî hestî hişt ku hîn zû ve em bikevine pêvajoya lêgerîna girêdaniyên kûrtir. Tuyê cîranên xwe, hemû gundiyan her biçe hemû gel, ger gengaz be hemû mirovahî çawa bigihînî hev? Tuyê kûrbûna pêwendiyê çawa biafirînî? Di me de lêgerîna bîrdozî û siyasî, lêgerîna partiyê wiha hate avakirin. Ango mirov ew qasî bêpêwendî ne û ew qasî hêsan dest ji hev berdidin ku tu neçarî kûr werî girêdan. Ji ber ku diyariyên erzan an jî girêdanên ku bi rêbazên feodal ve tên avakirin, min zêde ew xwedî hêzê nedîtin û min jî pêwendî nîşan neda.

Girêdaniya olî ji bo min kûrtir hat. Wê demê min ol himbêz kir. Min ziraviyek raber kir ku ez wan girêdaniyan ve bi ciwatê ve werim girêdan, hêzê bidim ciwatê û bibim hêzek. Piştre jî ez ber bi zanistî û felsefeyê, her çû bîrdoziyê û bîrdoziya sosyalîst ve çûm. Têkîliyên ku em jê re dibêjin, têkîliyên siyasî hatin avakirin. Mînak gelo mezinbûna têkîliyên siyasî yên li gel min çawa hate avakirin? Ev weke helwestekê li hemberî lewaziyên

mezin ava bû. Mînak di we de hîn jî têkîliyên sempatiyê girantir in. Hun bi hêsanî dikarin radestî kesayetên lewaz jî bibin. Hun van têkîliyên wiha bes dibînin an jî bêtêkîlîbûnê asayî pêşwazî dikin. Li gel min hîn jî pêvajoya kûrkirina têkîliyê heye. Mezinbûna siyasetê ya li gel min an jî saxlembûna di têkîliyên min de bingehê xwe ji temenên ku zû de digre. Di rastî de ez têkîliyê dixwazim, ji bo vê gavan diavêjim. Lê belê hun bi hev zû têr dibin an jî çend têkîliyên erzan we têr dike. Bêtêkîlîmayîn ji bo we gelekî asayî ye. Ji bo min jî bêtêkîlî mayin îşkence ye.

Ez têkîliyên lewaz baş pêşwazî nakim. Di min de lêgerînên têkîliyê hîn bingehtir, hîn radîkal, hîn saxlem, hîn kûrtir bi sedsalan bidome heye. Ev lêgerîn jî min dibe bîrdoziyê, felsefeyê û polîtîkayê. Her diçe dibe têkîliya artêşê. Ger we têkîliya artêşê anî asteke têkîliya herî saxlem, têkîliya agir di wir de hun digihên lûtkeyê. Ji ber di vir de kesayet jiyana xwe datîne holê. Kesayetê ku di riya wê de jiyana xwe datîne holê, kesayetekî ji rêzê nîne. Têkîliya vî nabe têkîliyeke ji rêzê. Ev çavkaniya xwe ji berteka ku min li hemberî nêvenga bêtêkîliyê ya gelekî lewaz û zêde baweriyê nade girtiye, digre. Ger hun belavbûna netewî û têkçûna netewî ya di xwe de hîn baştir fêm bikin, encama ku hun ji vê derbixin pêwîste bibe giranîdayîna têkîliya rêxistinî. Di vê mijarê de nirxandina wê zêde zehmet nîne. Ger asta we ya têkîlî û rêxistinê kûr û radîkal nebe, ezê bibêjim ev yekî hov e. Ji ber ku bi çend têkîliyen erzan ve fêr bûye. Di asta netewî de têkîlî û rêxistinê nagere. Zelal e ku ev yek ji bo min kesayetekî ketûber e. Ji bo têkîliya artêş û şer pêwendiyeke mezin nîşan nade. Ev nabe gerîlayekî baş û fermandarekî baş. Ji ber ku wateya têkîliyê nizane.

Di vir de hindekî kûrbûna min ev qasî ravekarbûna min bi çi ve girêdayî ye? Berteka min li hemberî bêtêkîlîbûna kûr, têkçûna netewî, derbaskirina asta netewî, dîsa qutbûna mezin a ji malbatê bi çi ve girêdayî ye? Ez jî qutbûm, lê belê min rê li ber malbateke mezintir –malbata Kurdistan'ê-vekir. Min bêhêziya malbata xwe dît, gelekî zû ve ji têkîliyên malbata xwe û ji gundiyên xwe qutbûm. Gelo ez feqîriya wê, êşa wê dixwazim çawa derbas bikim? Ji bo vê ez dixebitim ku malbata mezin a Kurdistan'ê bînim asta

malbateke baş a cîhanê. Ev min dike rêxistin, girêdanî, artêş, partî û eniya wê ya mezin. Ev hemû tişt jî dihêlin ez hewldanê bidim, lêgerîn û lêhûrbûneke mezin bikim. Bi vî rengî ji malbata Kurd a ku dihele û gelekî lewaz e derbasbûna malbata mezin a Kurdistan'ê pêk tê. Berovajî israrkirina we ya di malbatgeriya ji rêzê de, bandoreke neyînî li ser malbata mezin a Kurdistan'ê dike. İsrarkirina we ya di têkîliyên xwe yên ji rêzê de di azwerî û girêdaniyên xwe de, girêdaniya ku hun nîşanî ehbabên xwe, hevjîn, dost û birayên xwe didin dihêle ku di girêdaniya rêhevaliya mezin û di pêşxistina girêdaniya mezin a di artêşê de lewazî çêbibe. Rê li ber lewaz bi destgirtina girêdanî û saziyên weke wan ên çînî û mirovî vedike û rê vedike ku hun lewaz tevlî van bibin. Ji ber ku hun tiştên kevin dijîn, hîn jî hun di dilê xwe de dayik, bav, malbat, bira, hevjîn, dost, kirîv, xizim û kevneşopên kevin didine jiyîn. Bi kurtayî we hîn bandora saziyên kevin ji ser xwe neavêtiye. Avêtina van di şûna van de bi veguhertinê ve yên bihêz danîn pêk nehatiye. Di vî alî de jî hun lihevhatî ne, reformîst in û di riya navîn de ne. Ji ber ku we veguhertineke radîkal pêk neaniye, we di xwe de şoreş pêk neaniye, we ji zarokatiya xwe hetanî niha ev tişt nekiriye. Hun dixwazin PKK'ê jî ber bi wir ve bibin. Bi vî rengî hun dibin belaya seriyan.

Em di PKK'ê de kesayetê ji nû ve dadihûrînin. Ji bo me ne riya navîn, ne jî tiştekî din pêwîst dike. Gelo sedemên vê çi ne, hun ji vê çi qasî bandor bûn? Hema kesayeteke ku bandor nebûye nîne. Di encama vê de mirov nikare bibe, xwedî damezrînêrê artêşê, rêxistiner û xwedî hestên bihêz. Hêjmara kesayetên weke we gelek in. Lê belê çawaniya wan lewaz e. Gelo evê çawa were derbaskirin? Ev bi dahûrandina dayik û malbatê ve dibe ku hindekî were derbaskirin. Dibe ku hun bibêjin "tu xwe dadihûrînî vê jî dikî malê hemû netewê" bêguman pêwîste her kes vê bike. Kesekî ku rastiya xwe ne dahurandibe û nekiribe malê netewê ew xirabiyê dike. Kesekî ku rastiya xwe û malbatê nas nake başiyê nake. Ez nabêjim înkar bikin an jî qet encaman jê dernexin, ez dibêjim berovajî bikin. Di vê mijarê de dilsoz û bibiryarbin. Wê demê hunê bigihên a rast bihêz. Bi vî rengî destgirtina min a dayika xwe û zelalkirina nakokiyan nayê wê wateyê ku ez wan înkar

dikim. Min bal kişand ku ez heta dayika Kurdistan'ê bigihêm. Ez bawerim ku min ew jî anî astekê ku bû dayikeke nav û dengê wê tê bihîstin. Merasîma cenazeyê wê ku sala derbasbûyî hatibû kirin, ji her aliyê Kurdistan'ê bi hezaran zêdetir mirov tevlî bûn. Ger ez di nava têkîliya berê ya dayik û kûr de bimama dê ji gund çend sed kes bihatana yan bi bîr bianîbana yan jî nedianîn.

Rexmî hemû nakokî û pevçûnan dîsa jî wiha gengaz e ku mirov bibe ewladê baş ê dayikê. Ango me gav avêt. Têkîliyeke dayîk û kur a ku tune bûye, yan jî têkîliyê malbatê ber bi têkîliya welat, welatparêzî û dayik-axê ve birin watedartir û pîroztir e. Di rastiyê de mafê dayîkekê wiha tê dayîn. Gelo mirov dikare çawa pêwendiyê nîşanî jinekê bide? Bi şêwazê ku me dahûrandina azadiya jin de nîşan da mirov dikare ji dayikê re jî bersiveke watedar bide. Pêwîst nake mirov diyariyên erzan bikire. Li gor min dahurandineke azadiya jinê rêzdariya herî mezin e ku mirov li dayîkê nîşan bide. Ger bandora dayîka min nebûya gelo ma min dikarî wiha ez nêzikî jinan bibim? Bandorên ne yekser ên van têkîliyan ên li ser min rê vekir ku ez balê li jinan bikişînim. Hêza dayîkê şervantiya dayîkê, bandora wê ya li ser min hişt ku ez balê li pirsgirêka jinê bikişînim. Hişt ez jinan înkar nekim, herî kêm nebim weke bavê xwe yan jî zilamê cîranên xwe. Ez dihizirim dibe ku di vir de jî para dayîka min hebe. Bandora jineke wiha jineke ku wisa bi hêsanî naxwaze bikeve bin desthilatiya zilam jixwe gelekî şênber e. Gelo piştre min ev bandor çawa veguherte teoriyê? Vaye! Dahurandinên di derbarê pirsgirêka jinê de. Gelo me ev çawa veguherte tekoşîna azadiyê?

Bêguman ez nabêjim dayîka min teqlît bikin, lê belê dayîka min jî di mercên gund de di wê paşketîbûnê de tekoşîneke baş dikir. Bila keçên me yên ciwan jî tekoşînê bikin. Ger hun balê bikişînin, destpêkê ez bi dayîka xwe re pev diçim, di rastî de ez wê bi hêsanî napejirînim. Lê belê bi bandora wê ya bi riya neyekser ez digihînime teoriyeke şênber û piştre jî ber bi encamekê weke hemû jin jî dikarin şer bikin ve diçim. Ev jî di asta herî jor de bi giştî di jinê de ber bi bûyereke azadiyê birinê de girêdaniyeke wiha nîşan danê de bibandor dibe. Ev dibe bandorbûneke rast. Ger dayîka we

gelekî serhildêr be, gelekî nezan be, heta di vê wateyê de neçar be, pêwîste ku mirov ziraviyê nîşanî rêxistina jinê bide. Ger hun dixwazin bi dayîkê ve girêdayî bin, li şûna ku hun jineke weke dayîka xwe ve xwe têr bibînin, pêwîste hun neçariya dayîka xwe veguherînin jina xwedî hêz. Hunê wê demê bipeyitînin ku hun ewladekî baş in. Teorî ev qasî hêsan e. Hun dikarin lewaziyê veguherînin hêzê, serhildêriya wê veguherînine artêşbûna biplan a jinê. Ango hunê bibêjin me dahûrîneke Kurdistan'ê, dahûrîneke malbat, dayîk û jinê kir. Pêwîste her kes vê bike. Ger hun vê bikin hunê xwe rast nas bikin û encama rast derbixin.

Dayîkek di heman demê de axa dayîk e, welatparêzî ye, azadî ye, veguherîna azadiya jinê ye. Gelekî zelal e ku ev tiştekî giştî tam bicihanînê ye. Em yek jî şêwazê layiqbûna dayikê ya wiha diceribînin. A herî rastî jî ev e. Ji ber ku niha dayîk jî dorfireh tevlî tekoşînê bûne. Vê gavê gelekî bibandor in û gelekî gihiştine feraseteke rast a dayîkbûnê.

Em gelekî baş dizanin ku dayîk bêyî ku hêsran birêjin ewladên xwe bi kêfxweşî dişînine şer. Dema ku zarokên wan digihên şehadetê jî bi tilîliyan ve bersivê didine vê. Jina ku berê li ser êşeke biçûk a zaroka xwe diricifî îro dema ku hemû zarokên xwe dişîne şer dibe jina herî wêrek. Ew jî nîşan dide ku em rast nêzîkî rastiya dayîkan dibin. Tirs û êşa wan a mezin em vediguherînin wêrekî û rêzdariya rast. Ev jî ji vê re şahidiyê dike. Di rastiyê de ev hemû tişt me dibe pirsa "gelo mirov dikare çawa bersivên rast bide hiquqa dayikê?" her çi qasî gelekî teorîk be jî her çi qasî xwedî naverokeke siyasî be jî ev bersiv ya herî watedar e.

Dema ku dayîka min nefesa xwe ya dawiyê dide dibêje, "bi navê min gelek xêran bikin, gelek duayan bikin." Xêra me û duayên me tekoşîn e. Riya ku hun ji dayîkên xwe, yên bi taybet dijîn, bibin ewladên bixêr weke ew jî dixwazin şervantiyeke serkeftîtir e. Duayê xêrê ya dayîkên we şervantiya we ye. Tiştê ku ew ji we dixwazin, çend diyarî nînin, jixwe êdî wê qebûl nakin, gelo her roj dayikên we ji min çi dixwazin? Dayikên we ji min re dibêjin, "zarokên me baştir bide şerkirin, em ne li dijî şehadeta wan in, lê demeke ew qasî kurt de şehadeta wan em nikarin rabikin." Ev

xwestekên sotîner û rast in. Ev jî erka we ye, li gor ku xwestên dayîkên we ev in, hun jî şervantiyeke demdirêj bikin, bibin milîtanên balkêş. Ger di we de girêdanî hebe, wê demê pêwîstiyê bînin cih.

Dibêjin mafê dayîkê bi hêsanî nayê dayîn. Li gel me mafê dayîkê bi tenê şervantiyeke bêhempa ve tê dayîn. Ew gelekî baş dizanin ku dayîkek çawa neçar dimîne, çawa rûbirûyê heqaretê dimîne, çewisandin û biçûk hatina dîtin çî ye, ji dayikan fêr bibin. Dîsa ka zehmetî, êş û tengasî çî ye ji dayîkan guhdar bikin. Ger ew niha ji me milîtaniyeke baştir dixwazin û bi rastî jî ger rêza me ji bo vî tiştî hebe, wê demê pêwîstiya vê ya anîna cih nîşana baştirîn a girêdaniyê ye.

Ez dihizirim ku min tiştê ku dikevin ser milê xwe kiriye. Lê belê erkên ku hun jî bi cih bînin hene. Di şer de zû mirina we û bi dayîkên xwe şîn dayina kirin, nayê wê wateyê ku hun milîtanên rast in. Bersiva herî rast a ku hun bidin hiquqa dayîkiyê, hun di nava berxwedaniyeke dijwar, û di nava şerekî dijwar a jiyanê de bin. Ji ber ku weke din bersivdana bîranîna wan ne gengaz e.

Ji bo banga dayikan –ez dizanim ku ev gelekî sotîner e- bersiva herî baş a ku hun bidin şerekî demdirêj û serkeftî gengaz bikin. Ji ber ku vê gavê dayîk hemû vê dixwazin, bi meşa wan ve jî ev yek zelal e. Aliyekî vî karî yê din ango şehîdên jin hene. Ne gengaz e ku mirov vê nebîne, weke din dijmin jinan wehşîtir qetil dike. Dijmin dixwaze bi feraseta me ya jin û namûsê bilêyîze. Dîsa dixwaze çavên dayîkan bitirsîne û çavên wan bi giriyê dagre, bitirsîne û xitabê aliyê me yê lewaz bike. Bersiva ku em bidin dijmin jî pêwîste bibe şervantiyeke dijwar ku rê li ber serkeftinên mezin vedike. Weke din mirov nikare bersivê bide êş, zehmetî û feqîriya mezin a dayîkên li Kurdistan'ê. Ez van êşan gelekî baş dizanim, jiyaneke wiha ya dayîkan biêş û biçavgirî heye. Weke ku hun bawer dikin êş û giriyên çavên wan rawestandin ew qasî hêsan nîne. Ger min hindekî rê li ber vê vekiribe, ji ber ez rast nêzîkî erkên xwe bûme. Ger em niha ji bo lewazî û neçariya jinê hindekî bi azadî bersivê didin, ev pêwîstiyeke feraseta me ya mêrxasiyê ye. Naxwe min jî dikarîbû ku ez weke we nêzîkî hiqûqa dayîkê bibim. Dibe ku

ev li xweşiya min jî biçûba. Zêde zehmetî jî nedida min. Lê belê ne gengaz e ku mirov vê weke nêzîkbûneke birûmet binirxîne. Mafên dayîkê dayîn zehmet e. Dibêjin mafê dayîkê nayê dayîn. Lê belê ger wiha were kirin, mafê dayîkê hindekî tê dayîn, pêwîste mirov bide jî.

Pêwîste em ji her demê zêdetir wateyê bidin rastiya dayîkê. Pêwîste em Kurdistan'ê bi xwe weke rastiyeke dayîkekê bihizirin. Pêwîst e em Kurdistan'ê weke axa dayîk, welatê dayîk bibînin, binirxînin û azad bikin, wiha wateyê bidin. Pêwîste em dayîkên di nava wê de hindekî din bihêz bikin ji bo jiyana wan a madî û manewî hindekî din derfetan pêk bînin û di roja me de em şervantiyê bikin û vê pêk bînin û her wiha bersivê bidin. Misoger e ku mirov nikare mafê dayîkê înkar bike, mirov nikare mafê dayîkê neyne cih. Lê belê ger mirov bixwaze layiqê dayîkê bibe ev bi tenê mirov were rewşeke milîtanên wiha ve gengaz e.

**11 Nîsan 1994**

## RASTÎYA RÊBERTÎYÊ RASTÎYA DAHÛRANDINA MALBATÊ YE

Di Kurdistan'ê de pêkhatina civakî ber bi malbata azad ve bi giranî bi saziya malbatê ve çêdibe. Hebûna civakî bi hebûna malbatê ve hetanî dawiyê girêdayî ye. Hebûneke din a civakan bi perçeyek axê ya diyar ve di nava hev de ye. Bi cihbûna parçeyeke axê bi wê ve mijûlbûn û pêşketin taybetmendiyeke civakî ya herî bingehîn e. Pêşketineke ne bêax, ne jî bêmalbat gengaz e. Lê belê ev di dîrokê de gelekî diguhere.

Di roja me de civak bi netewpereziya herî muhafazakar ve li gel perçeyên axê ku di bin navê welat de hatiye avakirin de saziya malbatê bi rengêkî gelekî berfireh dijîn. Ev her du rastî heta dawiyê bi têkîlî û bi nakokî ne. Di navbera wan de bi qasî ku têkîliyeke qut nabe heye, hetanî dawiyê nakokiyên dijberî hev jî hene. Bandorî û saziyên din ên civakî bi vê her du pêşketinên bingehîn ve di nava têkîliyên erênî û hişk de ne. Bêyî ku di perçeyekî axê yê diyar de be û bêyî di nava saziyên malbatê yên bingeh de bimîne, ne pêşketineke aborî ne jî huner û hiquq ya herî girîng jî pêşketineke siyasî û leşkerî ya bi tendirustî dibe mijara gotinê. Ji bo ku ev tişt çêbibin destpêkê lêhûrbûna di perçeyekî axê ya diyar de di bin navê malbatê de pêşxistina saziyeke civakî gelekî girîng e. Heta ev yek weke binkeyeke jêneger derdikeve pêşberî me. Lê belê malbatgeriya bêsînor dibe ku li pêşiya lêhûrbûna axê de astengiyeke mezin jî ava bike. Yan jî bêyî ku lêhûrbûna axê pêk were, avabûna malbatê jî dibe ku tevlîhev pêş bikeve. Yan jî ger mirov bi pirsgirêka axê ve rast neyê girêdan, mirov nikare ji bo pêşketineke malbatê ya tendurist re bibe bersiv. Ger di van saziyên bingehîn de pêşketinek were pêkanîn, encax wê demê aliyên din ên pêşketina aborî û civakî watedar bin. Ji dîrokê pê ve bi şêweyên cuda yên civakî de lêhûrbûna di axê de û pêşketina saziya malbatê mirov dikare gelekî dirêj vebêje. Mirov dikare ji malbata klanan ku em di nava dîrokê de dibînin dest pê bike heta malbata duserî ya roja me were. Malbatên weke dayiksalar a serdestiya dayikê tê de heye, polîgamî (yên bi gelek hevjînan), monogamî (yên bi yek

hevjînî) yên gelek serî û yek serî, malbatên bi gelek hevjînî, malbatên xanedanan ên gelekî berfireh, malbatên baviksalar ên serdestiya zilam tê de heye, di dîrokê de bi mînakên xwe yê dewlemend ên cihêreng ve derdikevine pêşberî me. Em zêde li ser van nasekinin ê ku dixwaze li gor dilê xwe pêşketinên cuda yên şêweyên civakî û yên gelên din lêkolîn bikin û lêbigerin, pêkanîna vê jî ne zehmet e.

Di vê mijarê de tiştê ku em herî zêde pêwîste vebikin, rastiya malbatê ya di Kurdistan'ê de ye. Wisa tê fêmkirin ku bêyî rastiya malbatê were dahûrandin û were cihêkirin, ne azadî, ne pêşxistina siyasetê, ne leşkerbûn, ne jî ji aliyê aborî ve pêşketin gengaz e. Nakokiya bingehîn a Kurd bi nakokiya malbatê ve hetanî dawiyê girêdayî ye. Bêyî ku nakokiya malbatê çareser bibe û bikeve riya xwe em bawer nakin ku mirovên Kurd ifleh bibin. Di rastiya Kurd de tengasî, xetimandin, neçarî û girêka kor a herî mezin di rastiya malbatê de ye. Ji dîrokê hetanî niha kîjan bandoran rê li ber vê rewşê vekiriye, dibe ku bibe mijara lêkolînê ya gelekî dirêj. Lê belê mirov dikare bandorê vê yê herî bingehîn di nakokiya axê û malbatê de bigere. Ew axên ku tê de lêhûrbûn hatine çêkirin, ji ber ku nekirine welat rê li ber berovajî pêşketina malbatê ango bûyîna girêka kor vedike. Ger lêhûrbûna di axê de bi pêşketina civakî ve di nava hev de pêk neyê, malbat xwe gelekî dikişîne hundirê xwe, dema wisa bû bêwate dibe. Bi qasî ku bêwate bû, him bêwelatî, him jî di nava wê de civakîbûn rewşeke tevlîhev ava dike û heta belav dibe. Ji bo ku bikaribin pêşiya vê xwe didin ser saziya malbatê bi vî rengî şêweyê malbateke gelekî bêwate, ji tu derdan re nabe derman û weke çavkaniyeke bingehîn a dînîtiyên me û pirsgirêkên me derdikeve holê. Di rêjeyeke mezin de ketîbûn û hatina xistin a Kurd bi xwe kişandina hundir a malbatê ve di nava hev de ye.

Him di dîrokê de him jî di roja me de bêwelatîbûn û bêcivakîbûn tê xwestin bi hembêzkirina malbatgeriyê ve dibe ku berovajî were sekinandin. Lê belê ev jî rê li ber encamekî xirabtir pêşketineke berovajîtir ango qutbûna ji axên ku li ser lêhûrbûn çêbûye û ji girêdaniyên civakî cihêbûnê re vedike. Di vê wateyê de ger em bibêjin nakokiya malbatê nakokiya Kurd a civakî ya

bingehîn e di cih de ye. Li cihên din jî nakokiyên sereke hene, di dîtinê de li gel me nakokiya sereke dagirkerî ye. Lê belê di rastiyê de yê ku wê xwedî dike giran dike, hêzê dide wê, yê ku nêvenga giyanî weke kesayetekî gelekî lewaz pêşkêşî wê dike malbat e û saziya malbatê ye û nirxên wê yên darezînê ne.

Saziya ku kesayeta Kurd tê de gelekî diçelmise, dirûxe û tê xistin bêyî ku were bîst saliya xwe, xwe bi xwe bêrist bihêle saziya malbatê ye. Di vê wateyê de avakirina malbatê û jiyîna wê tê wateya tunebûna her tiştekî. Ew hewldanên ku zilamê Kurd an jî jina Kurd ji bo ku malbateke wiha li ser piyan bigrin didin, hewldanên tunebûnê ne. Xwezî! Gengazbûya ku me wêje û sînemaya vê nîşanê kadroyên xwe bida! Bi pênasekirineke zanistî ya kurt ve nîşandana vê zehmet e. Lê belê em vê gelekî hîs dikin û dibînin. Jixwe gelek ji we ji ber jiyana xwe û ji ber ku we gelekî zindî nakokiya wê jiyaye, hun jî di zanebûna wê de ne ku ew îfleh nake. Jixwe tenê ne di dîrokê de di roja me de jî malbatgerî, eşîretgerî û qebîlegerî çawa ku ji aliyê dijmin ve tê bikaranîn, bi gelek mînakên balkêş ve dema li pêşberî me ye, em bawer nakin ku pêwîstî bi alimbûna di vê mijarê de zêde hebe. Dibe ku ev feraset di têgihiştina rastiyan de bes be.

Her diçe di dahûrandinên PKK’ê de malbat derdikeve pêş. Sedemên vê bi zêdebûna derfetên dahûrîna nakokiya Kurd ve jî girêdayî ye. Pirsgirêk ji ber xwe ve dernakeve pêş, bi qasî ku nakokî rast bi dest werin girtin û ber bi çareseriyê ve were birin dê nîşan bide ku malbat û kevneşopên li derûdora wê, hizir û hest bi siyaset û leşkeriyê ve di nava têkîlî û nakokiyeke çawa de ne. Dema ku serkeftin hate xwestin jî girêdaniya wê dê ji nêzîk ve bi dahûrîna malbatê ferz bikin. Bi vî rengî em neçar dimînin ku dahûrînên malbatê bi pêş bixînin. Di vê wateyê de dahûrîna malbatê di heman demê de dahûrîna siyasî û leşkerî ya bingehîn e. Ji bo ku mirov bikaribe di bûyera Kurd de siyasîbûn û leşkerîbûnê pêk bîne, pêwîste dahûrîna malbatê bi pêş bixe. Di vê wateyê de pêwîste mirov jin û zilamê Kurd him bi şêweyê klasîk û ketî ve, him jî bi şêwêyê jinûve were avakirin û were pîrozkirin ve zelal bike û bixe rê.

Ez wisa dihizirim ku şûna mirov di vê mijarê de zêde nirxandinên teorîk pêşkeş bike, weke rêbazeke vegotinê ezmûnên xwe vekirin, dê hîna di cih de be. Jixwe derdikeve holê ku hun hîn zêdetir wisa fêm dikin. Rastiya Rêbertiyê di heman demê de rastiya dahûrîna malbatê ye. Di vê wateyê de bi rengekî şênber min, ango rastiya Apo nirxandin dibe ku karê we gelekî hêsan bike. Ji ber ku weke tê zanîn, hun ji vegotinên bilind ên teorîk zêde encaman dernaxin. Ger hun derxin jî mirov nikare bibêje hun bi lez bi jiyanê ve dikin yek. Lê belê weke mînakeke zindî hun bi taybetî asta Apo dizanin. Rastiya Apo di roja me de rojane de di nava dostan de, di eniya dijmin de bi dijwarî jî di jiyana we de cihekî hetanî dawiyê mezin digre. Her diçe dilê we û mejiyê we diteqîne. Ji ber wê jî lêkolînkirina vê hetanî dawiyê guncaw e. Dibe ku ev yek we bibe fêrbûneke mezin, ji bo veguhertina mezin û ketina riya rast piştgiriyê bide.

Di nirxanên berî vê de me dahûrînên malbatê kiribû. Em bawer nakin ku careke din dubarekirina vê sudwer be. Di gelek dahûrînan de me kesayeta jin jî û zilamên Kurd jî nirxandibû. Şûna ku em wan dubare bikin, ezmûnên Apo guhertîtir lêkolînkirin, dibe ku wateyeke bi şêweyê temamker û tekûz ava bike. Ji ber ku kesayetekî wiha, bi rewşa xwe ya dijî ve hîn jî gelekî bibandor e. Gelekî şênber hîn jî li hemberî dijmin dikare li ber xwe bide. Hîn neketiye rewşa berxwedanên Kurd ên klasîk ango rûbirûyê binketinên giran nemaye. Tengbûnekî û lewazbûnekî najî. Di vî kesayetî de pîrozbûn, lêhûrbûn û berfirehbûn didome û bi ast dibe. Di derbarê hemû aliyên civakî de têgihiştin û pêkanînê bi pêş dixe. Bi qasî aliyê aborî ji aliyê leşkerî ve, bi qasî siyasî ew qasî moral, bi qasî rêxistînêr ew qasî ji aliyê çalakgeriyê ve jî hetanî dawiyê çalak e û heta di rewşa teqandinê de ye. Mirov dikare gelekî zelal diyar bike ku hetanî niha mînakekî wiha xwe zêde nepeyitandiye. Em dibêjin rexmî hemû astengiyan, ji yê nêzîk heta yên dide revandin, bi rengekî zane yan jî nezan, rexmî ku van astên ku astengiyan ava dikin, xaneya wî ya serkeftinê hînkariyeke mezin e.

Ez jî xwe lêkolîn dikim, ez çend ez im, mirov dikare weke din lêkolîn bike. Helbet pêwîstiya min jî bi xwe nîqaşkirinê heye. Him jî ev yek erka

min e. Ya herî girîng jî pêwîste ez xwe negrim û ji bo hemû nûbûnan xwe vekirî bihêlim. Di vî kesayetî de bi şiyarbûneke mezin ve jiyanê ji nûbûnan re vekirî hiştin, bi qasî redkirinê qebûlkirinê jî bihêz pêkanîn, bi qasî bandor bertek jî nîşan dan, bi qasî sempatiyê dijsempatiyê jî gelekî bihêz nîşandan, heta dawiyê bihêz tê meşandin. Him gelekî zarok, him gelekî mezin, him gelekî dîrokî, him gelekî rojane, him gelekî bizanist, him gelekî bihest, him gelekî felsefîk, him jî gelekî pragmatîst, him gelekî bihêrs û bikîn, him jî gelekî şêrîn, him gelekî yê tê xwestin him jî gelekî bibertek, were qehirandin. Ev kesayet bi van hemû rengan ve xwe vekirî, zindî, ciwan, bi jiyanê ve dagirtî dihêle. Dikare hêzê nîşan bide ku vî tiştî bi baldariyeke mezin bidomîne. Gelekî nûjen û afirandêr e. Bi qasî ku gelekî xwedî rêgez e. Ew qasî dikare pratîkî be jî. Ev hêman girîngiya vî kesayetî hîn jî zêde dike. Ev kesayet cihêkarê mezin, awêneyeke mezin, şûrekî mezin û operatorekî mezin e. Bi vî aliyê xwe ve jî dibe amurekî çareseriya civakî. Dikare nermbûna xwe di vê asta wiha de bigre û nîşan bide. Misoger weke her kesekî nêzîkî jiyanê nabe û dest ji jiyanê jî bernade. Jiyana ku her kes dizane bi rexnekirineke mezin pêşwazî dike, bi jiyana azad ve jî gelekî girêdayî ye. Encamên ku hene mirov dikare bi xetên stûr ve wiha kurteber bike.

Dîsa jî lêkolîn û bihêzbûnê bi vegotineke zelal ve danîna holê hînkar e. Ev sedemên ku hatine hêjmartin jî, ji aliyê rastiya Kurd ve weke mînak nîşandayîna wê çi qasî girîngiyeke mezin rave dike, wê datîne holê. Ji ber ku di van hêmanên ku me hêjmartine de, rastiya Kurd rewşeke berovajî derdixe holê. Ne dîrokîbûna wê maye ne jî rojanbûna wê. Ne hestên wê mane ne jî vaca wê. Ne hezkirina wê heye ne jî antîpatiya wê. Ne rêgeza wê heye ne jî pratîka wê. Ne felsefeya wê heye, ne jî pêkanîna wê. Bi kurtayî ger em taybetmendiyên bingehîn ên Kurd wiha rêz bikin kesayeta rêbertiyê weke panzehîra van hemû taybetmendiyên bingehîn ên neyînî derdikeve holê. Jixwe hê ji niha ve rastiya malbatê yên ku hemû Kurdan serûbin kiriye, tenê ne malbat, kesayeta zilam û jinê jî serûbin kiriye, ji ber taybetmendiyên xwe yên çareseriyê derdikeve pêş. Heta hejandina mezin a ku dewleta Tirk derbas dike, dîsa dahurandina mezin a civak û malbata Tirk

jî vî kesayetî ve gengaz e. Taybet KT heftê salî di nava tengasiyeke mezin de hiştiye, binkeya civakî ya ku ew xwe dispêre jî ber bi îflasê ve biriye. Hîn ji wê wêdetir bala Ewrûpa û DYA yê kişandiye –ku ev hêzên serdest ên bibandor ku di cîhanê de ne- û ev jî bi polîtîkayên rojane ve li ser vê polîtîkayê radiwestin.

Em vî kesayetî weke şexsekî bi dest nagrin. Weke tê dîtin di vê wateyê de dibe raveya saziyeke mezin. Di dîtinê kesek e lê belê ji ber rastiya ku ew temsîl dike ji rastiya civakeke bi milyonan zêdetir xwedî bandorekê ye. Jixwe pênaseya rêbertiyê jî di vê çarçoveyê de tê raberkirin. Jixwe ev bandor hemû zelal datînin holê ku pêwîste ev kesayet bi baldariyeke mezin ve were nirxandin. Her diçe her kes û heta dewlet jî maseyan ava dikin û lêkolîn dikin. Li gor min yê ku di vê mijarê de baş nizane lêkolîn bike, saziya PKK'ê bi xwe ye. Rexmî ku bi dijwarî di bin bandora vî kesayetî de ne, gelo matmayîbûne, gelo nikarin hêzê avabikin, gelo neçar in, sedemê wê çi dibe bila bibe jêhatiyên milîtanên PKK'ê yê têgihiştin û pêkanînê gelekî lewaz e. Ji ber vê sedemê jî ji nû ve lêkolînkirin, di gihiştina encaman de wateyeke mezin rave dike. Pêwîste mirov vî kesayetî bi dest bixe û bi gelek aliyên xwe yên cihê ve lêpirsîn bike. Ez jî dema ku ji bo xwe bidim nasandin, dixebitim pêwîste ez diyar bikim ku ev kesayetekî heta dawiyê zehmete ku mirov bi dest bixe. Ji ber ku ev kesayet ji barbarîzma Tirkan a hezar salî cara yekem xwe rizgar kiriye. Tenê di wateya fîzîkî de xwe rizgar nekiriye, bi giyan û zanebûna xwe ve jî xwe rizgarkirin gelekî girîng e. Tam hezar sal in, kesekî ne tenê Kurd jî kesekî ji gelek netewan, çandan û saziyan xwe ji vê barbarîzmê nekariyê rizgar bike. Lê belê vî kesayetî him xwe ji vê rizgar kir, him jî ew xiste tengasiyekê.

Milîtanên weke we şer dikin, pêwîste vê ji berî nan û avê bixwin û vexwin. Ji ber ew bi tenê ye, xwe rizgar kiriye û hîn jî xwe nedaye perçiqandin û daqurtandin. Ev ji bo we gelekî pêwîst e. Ji ber ku hun şerê germ, kêlî bi kêlî dijîn û hunê bijîn. Ger rastiya Apo ev qasî girîng e, xwedî nirxekî ku pêwîste û dide jî wê demê gelo emê çawa lêpirsîn bikin? Ji ber rastiya partiyê pêwîste mirov bi rêbertiyê ve, bi rastiya milîtaniyê ve û bi

siyasîbûna rêbertiyê ve girêdayî bi dest bigre. Rêbertî, kesayeta Apo û felsefeya wî ji aliyê sosyalîst ve heta bi qasî huner û hiquq a herî girîng jî ji aliyê leşkerî ve tê nirxandin.

Lêgerîna jinê lêgerîna azadiyê ye. Lêgerîna jinê, lêgerîna welat e. Hezkirina jinê, hezkirina welat e. Mijûlbûna bi nakokiya jinê re şerê herî mezin e. Ev tez in, ê nizane ji jinê hezbike, nizane ji welatê xwe hez bike. Ev yek ji bo jinê dibe ku hîn guhertîtir were ziman. Ê ku bi hêsanî li jinê digere û dibîne, bênamûsê herî mezin e. Yê ku bi erzanî têkîliya jin û zilam ve tê girêdan ketiye û wenda kiriye. Yê ku di têkîliyên jin û zilam de diyalog, xweşikbûn û hêzê dernaxe holê, misoger nikare bibe kesayetekî mezin. Milîtanekî ku nikare di vê mijarê de xwe bipîve nikare xwedî ast be. Yê ku bi tenê bi hestên xwe ve tevdigere, yekcar bi erdê ve dibe yek. Ê ku bi xafilî û sewdaserî ve gavan diavêje yekcar wenda dike. Bi qasî ku gelekî cidî û zanistiye yê ku xwedî nêzîkbûneke wêrek nîşan nedin, dê lewaz bimînin.

Ji ber ku ez van hemû tiştan diyar dikim, ne xwe bêşens bibînin, ne jî min wekî zalimekî binirxînin. Ez yekî ku dixwazim bibime hevalekî baş. Ji bo hevaltiyê hewldaneke balkêş heye. Azweriya wî ya herî mezin, azweriya hevaltiyê ye û cihêtiya jin û zilam jî nake. Ew azweriya hevaltiyê ye ku, ev kesayet ber bi damezirînêrê rêxistinekê ve biriye û tiştê ku kesekî ji bo vî gelî di dîrokê de nekiriye û bi ser nexistiye daye kirin. Ger ev dilê hevaltiya mezin nebûya du Kurdan nedikarîn werin gel hev.

Di nava kesayetên ku xayinên xwe gelek in, bira li hemberî bira dildar nîne, dema ku hestyariyekê jî nîşan didin, mirina herî kirêt dijîn de rêxistineke wiha afirandin, ji perçekirina atomê zehmetir e. Ev hatiye serxistin. Ji ber wê jî kesek nikare bibêje, “ev kesayet nikare bibe hevalekî baş.” Ji ber ku bêhempa ye û hatiye peyitandin. Hîn jî hevaltiyê bi pêş dixe û ji bo berdewamkirina wê ziraviyeke mezin nîşan dide. Tam li cihê xwe nerûniştiye lê belê ji nîqaşa azad re hetanî dawiyê vekiriye. Misoger bi pêwîstiya vê bawer dike û ji çareseriya rêxistinê re hemû zemîn ava kirine. Bi qasî rik û sebra mezin, bi bawerî û zanebûnê ve ev kar kiriye. Em bawer

dikin ku hun jî di vê wateyê de dikarin werin hevaltiyekî û her biçe rêhevaltiyekê.

Ev bûyera ku di têkîliyên jin û zilamên Kurd de û girêkakor a di malbatê de veguhertina jiyanê ber bi gihandina azadiyê û çareseriyekê ve gavên pêş ve avêtine. Weke ku digihê jina ku bi baldarî û hostetiya mezin ve diaxive, dimeşe û şer dike, dikare ji nû ve bigihê kesayeta zilamê binamûs jî. Ev pêşketinên gelekî girîng in, lê belê hîn biencam nebûne. Ji bo ku vê bi encam bikin, hunê baş tê bigihên û teqez serkeftinê esas bigrin.

**31 Çile 1995**

# PÊWÎSTE MIROV BI GIRÊDANÎYA XWEŞIKBÛNÊ BI AZADÎYÊ RE BAWER BIKE Û ŞERÊ WÊ YÊ DIJWAR BIDE

Em gelaleya romanê bi pêş dixin. Kesayeta ku dixwaze bijî, em lêpirsîn dikin. Jiyan pîroz e. Tênegihiştina erkên xwe, redkirina mafên jiyanê ye û ev jî tawanê herî girane ku mirov pêk tîne. Bi rengekî giran darizandina jiyanê bi tenê aliyê aborî, civakî, çandî û leşkerî dê bi xwe re destjêgerîna mafê jiyanê hemû bîne. Zanîna rêzdayîna jiyanê xeteriya li ser jiyanê dîsa jiyana ketî û bilehnet, kirêtî û dijminê li ser wê dîtin û derbaskirin girîng e. Pêwîste mirov bizanibe ku şoreşgerî bi tenê ev e, bi wî rengî tevlî jiyanê bibe, bibe şervanê vê yê balkêş û vê bi ser bixe. Dema ku mirov li kesayetê lêpirsîn dike, tiştên bingehîn ev in. Kesayetê ku tê lêpirsînkirin weke ku dixeniqe. Ev xeniqandin bi xwe rastiya netew, gel û rastiya wê ya civakî ye û rastiya ku derfetê nade jiyanê û jiyanê diqehirîne ye. Di vê wateyê de bêyî ku di nava partiyê de jî veguhertin werin pêkanîn, dema ku ji bo çareseriyê ji beşa civakê ku tê xwestin were pêşxistin hêza nêzîkbûnê tê nîşandan. Zexta wê ya li ser jiyanê çêdibe, bêyî ku were derbaskirin ne gengaze ku mirov bigihê jiyanê. Em di vir de şerekî rasteqîn a namûs û mirovatiyê didin. Erka şoreşgerî ya li ser bingehê netew û çînî piştre tê.

Yê ku nikare ji bo rastjiyînê û mirovbûyînê biryara xwe bide ne ji mafên netewî, ne jî ji zextên çînî û ji dagirkeriyê nikare behs bike. Vê gavê armanca herî bingehîn a şerê me em bixwe ne. Gefa herî mezin li pêş jiyana ku dijmin tevlîhev kiriye, kesayeta we ya ku naşibe tu tiştan û ji bo tu derdî nabe çare ye. Kesayeta we ya ku tê de neçarî, ketîbûn û kirêtî tê hilberîn û rastiya we ya malbatê ye. Çîroka kesayeta ku dixwaze ji bo vê çareseriyê peyda bike û xwe ji dil tevlî bike, dixwaze hemû jêhatiyên xwe derbixe holê û bersivê bide, bi rastî jî gelekî balkêş e. Me dixwast ku hun ev kesayeta ku bûye rastiya partiyekê û şerekî rast têbigihên û pêk bînin. Lê bêlê ji ber ku we nekarî hun vê pêk bînin, hişt ku em vê çîrokê vebêjin.

Em bi mehan e heta bi salan e vê dahûrandina kesayetê dikin. Lê belê ew qasî kêmbûna hişk a we ya têgihiştinê heye ku hun ew qasî girtîne ku dema em behsa dil dikin, bi rastiyeke weke dilê gamêşê ve, dema em behsa ponijandinê dikin, bi binkeyên ku serî qerisiye û kils girtiye ve rûbirû dimînin. Ev nêzîkbûn, neşiyarbûn û bêferasetbûn didomin û diçin. Dîsa jî hun wisa bawer dikin ku hun dijîn. Em nikarin vê re bibêjin jiyan. Hun jî nikarin bibêjin ku em dijîn. Navê xwe bi kirina Mihemed ve mirov nikare bibe Mihemed, bi navê xwe kirina Egîd ve mirov nikare nikare bibe Egîd, hun hindek navan bi xwe ve dikin û wisa bawer dikin ku hun gihiştine mezinbûnê. Ev xefletek e. Li navê nêrînê ve nirxdayîna xwe helwesteke durû ye. Li mirovan nêrînê ve xwe mirov dîtin, xwe xapandineke mezin e. Em dixwazin we ji wê rewşa bûyîna xwedî xapînan derbixin. Vê jî em dixwazin veguherînine kesayetekî ku cewher û gotina wî yek e û hêsan naxape û naxapîne.

Di vê wateyê de pêwîst e hun teqez jiyanê ji xwe re bikin armanceke rast. Ew dubarekirina we ya jiyanê ku hun hîn jî gelekî ferz dikin, nikare xwe ji valabûnê û bêwatebûnê rizgar bike. Hunê bizanibin ku pirsgirêka we ya jiyanê heye. Hunê mafên xwe yên jiyanê rast bi kar bînin. Pêwîst e mirov pirsên ‘Kurd dijî yan jî najî, Kurd çawa dijî, çi dijî?’ rast bibersivîne. Dema ku ol jî ev qasî behsa heram û helalê dike, li gel me bersivnedayîna pirsa ‘gelo jiyan heram e yan jî helal e?’ ne efûkirinê derdixe holê. Em nikarin stûyê xwe li hemberî jiyana di nava dujînan de ye bitewînin. Em nikarin jiyaneke wiha bipejirînin. Ev ji bo kesayetên ku dixwazin ji bo jiyana ku tê lêpirsînkirin bibe bersiv wiha ye. Ev nayê wê wateyê jî ku xwe bi kuştinê ve ji kar xelas bike. Zelal e ku bi xwe dayîna jiyînê ve dê bersiva vê were dayîn û bi destxistina şêwaza şer a ku vê armanca xwe pêk bîne ve dikare bi serkeftî ji nava vî karî derbikeve. Derveyî vê ji bo tu kesî riyên jiyanê nevekirîne.

Pêwîst e mirov riya jiyanê bizanibe. Ger tê xwestin jiyan were domandin, pêwîst e her kes neçariya pêkanîna wê hîs bike. Hun neçarin vê weke amentûyekê, weke nefesekê û stranekê fêr bibin. Pêwîst e hun bizanibin ber

bi çareseriyê ve biçin. Pêwîst e êdî sextetî, durûtî, alozî, şerê kor û tevlîheviya di vê mijarê de were derbaskirin. PKK êdî bi rihetî dikare bibêje hêza bi biryar a çareseriya Kurd e. Lê belê mirov nikare tam bibêje ev ji bo endamên wê pêk hatiye. Derfetê çareseriyekê heye. Gihiştina wê tê wateya şêwaza bi karanîna rast a mafê jiyanê pêk anîn e. Ger em vê encamê careke din lêpirsînê nîşan bidin, şiyarbûn û bi vê girêdayî hizirandina wê pêş bixin, dibe ku çareserî hîn hêsan bibe.

## Çîroka mın çîroka herkesekî ye

Hun çîrokan zêdetir hez dikin, ji ber ku teorîkbûn hindekî jîrbûnê dixwaze. Rexmî şêwazê dayîna me ya perwerdeya teorîk bîrdozî û siyasî derkete holê ku seranser tê mayîn. Ji ber wê jî bi şêwazê çîrok û roman vegotin bû neçariyek. Ji ber vê sedemê çîroka bi navê Rastiya Rêbertiyê bi zimanê roman ravekirin bû mijara gotinê. Gelo kesayetê ku tê lêpirsînkirin hate kîjan asta jiyanê? Yê ku hindekî xwedî hizir û hestan hebin dikarin me ronî bikin.

Gelo qehremanê romanê di vê tengasiyê de dixwaze ji bo çi çareseriyê peyda bike? Gelo em ji vê re bibêjin macera yan xeyalperestî? Gelo dînek bû yan jî neçarbû? Gelo gelekî bi sînor be jî xwest çareseriyekê bi dest bixe?

**Y:**

**-** Rêberê min dema mirov li pêvajoya 1975’an temaşe dike, em dikarin ji beriya her tiştî diyar bikin ku qehremanê romanê xwedî hestekê ye. Ev hindekî ji bo aliyê hember jî derbas dibe. Dema ku em vê dikine destpêka romanê di beşa duyemîn a romanê de jî qehremanê romanê him dixwaze ceribandinekê bike, him jî ew koma ku dixwaze biteşe bike û hindekî terbiye bide. Hindek heval ji ber ku ji vê terbiyeyê hindek encamên guhertî derdixin zerarê dibînin. Qehremanê romana me xwe tenê bi vê ve têr nabîne. Bûyera bi hevrebûna deh salan heye. Em dikarin vê bihevrebûnê wiha şîrove bikin. Tê xwestin ji komê re were gotin, “jiyaneke çawa ye, lê temaşe bikin û bibînin.” Dixwaze bi serkeftî çûyîna vê pêvajoyê ji hindek aliyan ve diyar

bike. Ev hindekî dişibe ristê ku Mata Harî di şerê cihanê yê yekem de ku di sala 1914'an de di navbera dewletên cîhanê de derketiye holê lêyîstiye. Mata Harî him bi serbazên Elman, Frensî û Îngîlîzî re, him jî bi serbazên saloxgeriyê re di nava têkîliyan de ye. Hindek serbaz dikevin xefika vê û bi erdê ve dibin yek. Hindek jî xefikên vê ferq dikin û bersiva wê digerin û dibînin. Şerekî beramber hev e.

Ez dixwazim vê yekê diyar bikim: qehremanê romanê lêyîstokên Mata Harî ya roja me ferq kiriye û li hemberî wê tevdîr bi pêş xistine. Lê belê ev tevdîr di nava pêvajoyeke deh salî de çêbûye. Di nava van deh salan de qehremanê romana me bi ser ketiye.

**Rêber Apo:**

**-** Bêguman pêwîst e ev pêvajoya deh salan bi hemû aliyên xwe ve di çîrokê de yan jî di romanê de were vegotin. Lê belê em werin berî wê. Gelo qehremanê romanê bi şensekî ve yan jî bi bêşensiyekê ve rûbirû ma? Yan jî gelo hewldaneke gelekî bi plan û bi zanebûn dest pê kir?

**Y:**

**-** Di qehremanê romana me de hest hene. Dema ku mirov li herikîna romanê temaşe dike, mirov dikare ferq bike ku li hev rasthatinên destpêkê, hevdîtinên destpêkê bişensî nîne. Di rastiyê de aliyê hember jî di nava plansaziyeke wiha de ye û gelekî berfireh nebe jî li tiştekî wiha digere. Lê belê di qehremanê romanê de ji teşegirtina hestekî gelekî biplan, bibername zêdetir hestekî diyar heye. Lê belê piştî li hev rasthatinê beramber hev qartên xwe yan jî şûrên xwe dikişînin. Dixwazin xwe hildine saxlemiyê. Mirov dikare vê yekê ji bo herduyan jî bibêje.

**Rêber Apo:**

**-** Ger em hîn kûrtir bikin qehremanê romanê bi taybetî di vê pêvajoyê de, di nêzîkbûna bûyera hest de, hindek taybetmendiya derdixe pêş. Ger mirov balê bikişîne, heta wê rojê xwe gelekî diçewisîne. Heta refa dawiyê ya zanîngehê wiha tê. Li gel ku ji temenê gelekî zû pê ve di cewher de ji pêwendiya jinê re, negirtîbe jî civaka feodal a giran û feraseta namûsê ya ku

li ser rastiya Kurd serdest e, bi taybetî jî muhafazakariyeke gelekî tund dihêle ku wî gelekî bikişîne hundirê xwe û kesayet xwe gelekî biçewisîne. Heta pêwendiya xwe vediguherîne ol û bûyîna şagirtekî baş. Bi vî rengî dixwaze vê xeteriyê ji xwe dûr bixe. Bi taybet dema ber bi bîst saliyê ve tê. Li hemberî tengasiya gelekî mezin, ku bikeve nav de ew bîra kor a mezin ango li hemberî bûyera zewicandinê hindekî ne pêwendîdar e û zêde nezîkî wê nabe. Bi vî rengî tengezariyê hindekî derbas dike. Lê belê weke kesekî ku kûrbûna hestan dijî, hîn li gundê xwe ye, dixwaze bi pêwendî keçikên gund binirxîne. Heta dibîne ku keçik ji ber pêwîstiya rêpîvanên gelekî tund tên dîlgirtin. Helwesta xwe ya li hemberî vê jî kêm zêde datîne holê. Piştre bi derbasbûna jiyana bajaran ve pêwendiya keçikên bajaran, bi taybetî yên mamosteyên jin qezenc dike û vê baş dinirxîne. Lê belê bi qasî ku nikare bi jinan re biaxive jî ji xwe bêbawer e. Heta zanîngehê jî wiha didome.

Di nêvenga zanîngehê de rexmî ku li hemberî faşîzma 12 Adarê ji ber berxwedana ciwanên şagirt re bi qasî ku bikaribe rêbertiyê jê re bike, ji xwe bawer e, li hemberî nirxên civaka bûrjûva bi taybet li hemberî têkîliyên jinê, hetanî dawiyê di nava nêzîkbûneke muhafazakar de ye. Di vê mijarê de li ser xwe, li ser vîna xwe serdest e. Di vê pêvajoyê de tê xwestin malbata Kurdistan'ê were afirandin. Di nava koma şoreşger de jî dikeve nava helwestekî weke pergala malbatê. Gelo dema ku dikeve nava malbata wiha, bişens e yan jî bêşens bû, zanebû yan jî biplan bû? Yan jî ji ber xwe ve çêbû? Em vê yekê lêpirsîn dikin. Pêwîst e mirov lêpirsînê pêşdetir bixe. Gelo ma pêwîstbû ku ev kes xwe wiha biparêze? Gelo ma di cih de bû ku hestên xwe wiha biçewisîne? Gelo heqê pirsgirêka hestan dida? Dahûrandina van tiştan gelekî girîn e. Di rastiya Kurd de bi taybetî jî di bûyera afirandina hestan de wendakirineke mezin tê jiyîn. Di vê xalê de li pey hev ev tespît pêş xistin ne zehmet e. Di têkîliyên jin û zilam de kevneşopî serdest e. Her kesek dikeve bin serdestiya vê. Qehremanê me yê romanê hindekî biguman li vê temaşe dike û bi metirsî lê temaşe dike. Bi hêsanî weke pez stûyê xwe naxe bin kêrê. Ev piştre ji aliyê rizgarkirina hestan de girîngiyeke mezin rave dike. Lê belê ew nirxên civaka bûrjûva ku

bilind dibe, bi destên nokerên, di Kurdistan'ê de ev tişt gihandina raveyeke gelekî xwedî hêz dihêle ku ev kesayet zêdetir xwe bigre hundirê xwe. Ew xwe di nava neçariyeke mezin de dibîne. Ev çewisandina hestan dihêle ku ew bigihê komeke şoreşger. Di vir de bandor hetanî dawiyê pêşçav e.

Di wê demê de bi giştî tiştê di zilam de yan jî di jinê de dihate jiyîn ev bû: Di bûyera Kurd de yan li gor kevneşopên tund lêyîstina xwe bixwebûnê weke çarenûsê yan jî bi taybetî ji bo civaka bûrjûva (heta di nêvenga gund de ji bo bûrjuvaziya biçûk) ew maceraperestiyeke ku çavkaniya xwe ji çavên xwe nûvekirinê digre, dibe ku rewşa ji rêderxistinê bihata jiyîn. Kontrolnekirina hestan dibe ku rê li ber rewşeke xeter vebike. Ez bawerim qehremanê me yê romanê di vê mijarê de hindekî bitevdîr e.

Tişta ku di vir de girîng e, dema ku şoreşgerên me yên ciwan dikeve pêvajoya gihiştinê xwe nîşandaneke hestan a bi welatparêziyê ve girêdayî pêk tîne. Vî mafî di xwe de dibîne. Berî her tiştî ji xwe bawer dike. Ji ber ku koma şoreşger hatibû damezrandin û ev rastî bi navê Kurdistan'ê pêşketineke hetanî dawî girîng bû û ji bo her tiştekî dê rewatî bida. Bûyerek an jî rastiyeke ku derfetê dide vê dixwaze bi vîna xwe ve biafirîne û ji tiştekî natirse. Dibêje, "êdî hest ji bo min xeter nabin, berovajî dibe ku hêzê bide çalakiya mezin" dixwaze hemû taybetmendiyên hember fêm bike, lê belê dibêje rexmî her tiştî dibe ku çêbibe. Heta dibe ku dişibe şêwazê yê ku hindekî bi îdîa ye, hindekî jî dixwaze bi qehremanî bimeşe mijara gotinê ye.

Qehremanê romanê bi navê welat û gel heta bi navê azadiya jinê xwe ji bo mêrxasiyê amade dike. Wê demê dibêje, "kê derdikeve hemberî min bila derbikeve, dibe gelekî binakok be, dibe gelekî bi aheng be dîsa jî ezê derbikevime serî." Heta di vê mijarê de hindekî jî çavtarî ye, ji ketina nava helwestekê ku aliyê wê yê hest zêdetir e jî natirse. Lê belê di vir de bingehê polîtîk gelekî girîng e. Ji bo hest diwêre, lê belê zemînê ku pêlê dike, misoger polîtîk e. Ger hun dixwazin teqez ji vê encamê derbixin, divê hun bi pirsên weke di bingehê ku tiştên me ji aliyê hestan de kiriye, tê de polîtîka heye yan jî nîne? Gelo zemînê polîtîk gelekî cidiye û gelekî girêdayî ye? Xwe lêpirsîn bikin, qehremanê me di vê mijarê de ji xwe bawer e. Dibêje,

“ez bimirim jî dest ji vê zemînê bernadim.” Ji ber wê jî hember dixwaze bi ku ve bibe bila bibe ew li ser pîvanên xwe serdest e. Dîve hest çavan kor neke, ji zemîn qut neke. Bi temamî xizmeta wê bike.

Pêwîst e em vê hestê lêkolîn bikin, ji bo rastiya gelê Rojhilat a Navîn jî ev gelekî girîng e. Qehremanê me yê romanê her diçe dixwaze kûr bibe û hesta azadiya pîroz bidest bixe.

Mirov dikare lêpirsîn bike, ka şoreşa Îslamî çi qasî evîn bi pêş xistiye. Rastiya evînê ya Hz. Mihemed çi qas e? Heta pêwîste mirov Hz. Îsa jî lêpirsîn bike. Gelo rastiya evînê ya di Îsa de, rastiya Meryem, rastiya Ezîze, rastiya Rahîbe çî ye? Ev mijar di dîrokê de gelekî bibandor bûne. Di rastiya Îslamê de Ehl-î Beyt kevneşopa Hz. Fatma xwedî girîngiyeke mezin in. Ew kevneşop hetanî roja me jî bandora xwe didomînin. Yekî ji Rojhilat a Navîn ku ji vê bandor nebûye heta di dinyayê de jî nîne. Kevneşopa evînê ya di bûyera Kurd de xwedî kûrbûneke dîrokî ya belkî ji hezaran salan, hîn wêdetir e. Em dixwazin ew destana dawî ya ku ketiye devê herkesî bînin ziman û di vegotinê de hêsaniyê pêk bînin.

Em dixwazin wateyê bidin rewşa malbata Kurd di roja me de ya biêş û hilweşiyaye, xiyaneta wê ya welat û mirovahiyê ew asta wê ya ku dijberî azadiyê û hemû diyardeyên jiyanê ye, ya ku gelekî kirêt dike, neçar dike ger gengaz be em dixwazin ji vê re riya rizgariyê peyda bikin. Em dixwazin bi feraseta namûsê ya ku hatiye berovajîkirin, pê pênaseyekî û naverokekî bidin qezenckirin. Em dixwazin ji bo ku jiyan xweşik bi pêş bikeve piştgiriyê bidin. Gelo di vê wateyê de qehremanê me yê romanê dikare ji bo van hemû tiştan bibe bersiv? Gelo gavên ku diavêje di cihê xwe de ne? Lêkolîneke mezin ji bo van pêwîst e. Ji ber ku dixwaze piştî ketineke mezin bi destpêkirina jiyanê ve bilindbûnê bi dest bixe. Vê gavê di nava serûbinbûna mezin a welat de tê xwestin ev yek were pêkanîn. Ev vediguhere şerekî mezin. Tê xwestin ku riya jiyanê were peydakirin. Nedîtin û nebihîstina wê tê wateya rewşekê ji kor û kerekî hîn xirabtir jiyînê. Gelo di vê wateyê de silav dayîna jiyanê, rêzgirtina jiyanê, ma bi namûsê tê kirin? Gelo ma qehremanê me di vê mijarê de rastî rexmî hemû zehmetiyan fêm

kiriye? Em vê lêpirsîn dikin. Bila kesek vê ji rêzê nebîne û teqez fêm bike. Ji ber ku di vê çîrokê de çîroka her kesekî veşartî ye.

**Zer:**

- Serokê min taybetmendiya qehreman a ku mirovan matmayî dihêle şûna pevçûnên hêsan nakokiyên mezin hildibijêre. Di rastiyê de nakokiya qehremanê romanê dibe nakokiya hemû civaka Kurd. Ger ji vê serkeftî derbikeve, dê çareseriyên mezin biafirîne. Dibe ku nakokiyeke hêsantir jî bihata hilbijartin. Lê belê dibe ku vê çareseriya mezin neaniya.

**Rêber Apo:**

- Tu dibêjî ev hesîna qehreman heye.

**Zer:**

- Di vê mijarê de rêxistinkirî ye. Him di rewşa bêserkeftiniyê de, him jî di rewşa pêşketina evîna pîroz de dê bi serkeftî be.

**Rêber Apo:**

- Tu dibêjî, hilbijarte ye, dahiyane ye. Ne serkeftî be jî, serkeftî be jî dê qezenc bike. Tiştê ku di çareserkirina girêka kor a Kurd de pêwîst e were kirin ev e.

**Zer:**

- Qehreman berî wê jî ceribandineke vê ya serkeftî dike. Mînaka di zarokatiya xwe de têkîliya ku bi hevalê Hesen Bîndal (Hemze) re pêş xistiye heye.

**Rêber Apo:**

- Rewşeke gelekî balkêş e. Ger tu balê lê bikişînî, di vê têkîliya hevaltiyê de ji nêzîkî xwe hevalekî hilnabijêre û ger hilbijêre jî di rêza yekem de cih nadê. Di civaka gund de hevalê xwe yê zarokatiyê, ku wê milê xwe yê nakokiyê esas digre heye. Ev dibe şopeke çareseriyê ya cidî. Diyar dike ku nakokî bi dest xistiye. Gelo di temenekî zû de dixwaze bi hevalê xwe Hesen Bîndal re çi çareser bike? Di wir de bûyereke Kurd, zagoneke Kurd heye. Ez bawerim dijmin ev weke “se bi seyan dayîna şikandin” nirxand. Em dikarin

bi kurtayî ji vê re bibêjin pevçûna eşîreta Kurd, nakokiya gel a Kurd. Di temenekî gelekî zû de vê nakokiyê dibîne û dikeve nava helwestekî balkêş a "ezê vê bi hevalên xwe yên biçûk re çareser bikim." Ez bawerim ev dibe tevdîreke jiyanê. Ev tercîheke gelekî mezin e.

**Zer:**

**-** Jixwe qehreman di jiyana xwe de her dem wê esas digre. Ango qet ên hêsan nahilbijêre. Ya rast hildibijêre û dixwaze jiyanê ji ya zehmet bi dest bixe.

**Rêber Apo:**

**-** Bêguman tiştekî balkêş e. Ev di ketina pêvajoya hemû karan de jî wiha ye. Karan bi şêwazekî herî zor, lê belê herî paqij bi dest digre. Mînak xwe gihandina hêlînên teyran ku tu kesek nikare xwe bigihêne, bi marên gelekî xeter ve mijûlbûn, nêçîrvaniya çûkan ku weke mijûlbûnên herî xeter in, her dem hilbijartina wan dibe perçeyekî jêneger a taybetmendiya vî kesayetî. Nêvenga gund jî bi nêzîkbûneke tinazî ya weke "benê xwe qetandiye, dîn e, xwedê zarokên kesekî wiha neke" ve pêşwazî dikirin. Ev hêman ji bo pêvajoyên paşê gelekî şopan nîşan didin. Lê belê ev têkîlî hindekî din berfirehtir e. Ji ber ku di navenda paytextê de komeke ku kesekî ji nava dewletê jî tê de, bi navê Kurdistan'ê ku heta dawiyê xeter e tê damezirandin. Ji nêvenga gundekî – ku wê demê jî gelekî xeter e- vê carê di dilê dewletê de ye, di nava kelehê wê de ye. Di nava keleha dijmin, bi saziya dewletê ku xalên pêş de ye re pêwendiyê çêdike. Heta xwe nîşandaneke bi azwerî, bi hest nîşan dide.

Ger bal lê were kişandin, em dixwazin hîn kûrbûna wê fêm bikin. Dibe ku ev yek di vejîna Kurd de jêneger bû, dibe ku çareyeke din peyda nedikir. Ji ber ku hindekî li ser xwe serdestbû, xwe hindekî diparast. Lê belê bi carekê ve hewldaneke wiha ku nedihate hêvîkirin, pêkanîna wê mirovan gelekî dide hizirandinê. Jixwe endamên din ên komê vî tiştî di nava matmayînê û metirsiyê de nîqaş dikin. Gelo em vê ji bo çi ev qasî vedikin? Ji bîr nekin ku kesayeta hemû Kurdan qurbanê vê têkîliyê ne. Ji sedî nod li ber gerîna deriyê dewletê û xwe şalûzîkirina civaka bûrjûva ve di tengaviya

civaka kevneşop û di bîra kor de ji xwe wenda dikin. Ê ku rizgar jî dibe, ji aliyê dewletê ve bi temamî tê wendakirin. Niha wisa tê fêmkirin ku qehremanê me him bi yeke ku kevneşopa feodal, arîstokrat di asta herî jor de temsîl dike re, him jî saziyeke ku bi Kemalîzmê re di nava girêdaniyên herî kûr, hilbijartinê re ya herî zehmet hildibijêre. Ger ji bin derbikeve, dê bibe sedemê derketineke mezin.

Aliyê hember ji bo vê amade ye yan na? Mirov dikare nîqaş bike. Qehremana jin ji bo hesteke wiha bersiveke weke qerîsekê dide. Gelo ma ji bo çi ew qasî sar nêzîk bû? Gelo ma ji bo çi berovajî qehremanê zilam kete nava hestyariyekê yan jî bêhestyariyê. Şahid bi xwe heye. Qehremana jin dibêje, "ez dikarim bi şivanekî re parvekirina hestan bikim, lê belê bi vî kesî re qet nabe." Gelo li gor we ev tê çi wateyê?

**Zer:**

**-** Li gor min rêxistinbûna hemberî xwe ferq dike. Dibîne ku nikare wî bi hêsanî bi bin bixe û ew ji yê din cudatir e. Dixwaze bêhempa bi ser de biçe.

**Rêber Apo:**

- Pêwîst e em vê ji aliyê Kurd ve, ji aliyê çarenûsa komê ve binirxînin. Ango hesteke ku hindekî xwedî nirxe nîşan bide, dê ji bo Kurdistan'ê û ji bo komê bisûd be. Gelo em bi rêgeza herî serûber a Kemalîzmê ve dîsa bi mînaka arîstokrasiyê ya noker a ku herî serûber û plan ku vê jî ber bi hest û hestyariyê ve dibe, em rûbirûyê hev in.

**Zî:**

- Girêdaniya kedê ya Rêbertiya partiyê di dema zarokatiyê de mijara gotinê ye. Di rastî de ev ji zarokatiya wî pê ve pêş dikeve û qet nabe dîlê kevneşopan. Van napejrîne. Fatma ya ku jineke Kemalîst e, hestên xwe hîn zêdetir dixwaze ji bo vê bi kar bîne. Lê belê dema ku li hemberî xwe kesayetekî kedkar dibîne, fêm dike ku nikare vê yekê bi kar bîne û ji ber vê jî nêzîkbûna wê cuda dibe.

**Rêber Apo:**

- Em hîn jî kûr bikin. Di vê mijarê de pêşxistina lêpirsînê gelekî gengaz e.

**Mer:**

- Serokê min, ez dixwazim ji beriya vê li ser xalekê rawestim. Di rastiyê de dema ku têkîliyeke wiha bi pêş dixe, ez dibînim ku qehreman dixwaze ji dijmin, sûdê wergire. Heta dixwaze dijmin jî bixe bin xizmeta tekoşînê. Herî kêm ji bo ku xwe ji dijmin biparêze vê yekê dike. Bi vî rengî dijmin jî bi kar tîne.

**Rêber Apo:**

- Rast e, girêdaniya wê bi dijmin re dibîne. Lê belê dîsa jî têkîliyeke wiha bi pêş dixe. Gelo emê ji aliyê qehreman ve çi navî bidine şêwazê vî şerî?

**Zer:**

- Serokê min Hespê Troya kelhe ji hundir ve fetihkirin.

**Rêber Apo:**

- Rast e, mînaka Hespê Troya kelhe ji hundir ve fetihkirin. Wekî din?

**Me:**

- Serokê min, di wateyekê de xwe amade kiriye, misoger plana xwe çêkiriye, lê belê li hemberî wê dijmin jî gelekî bihêz e. Ango zehmetiyeke mezin heta xeteriyek jî heye. Yek jî di bin vê de binketin jî heye. Lê belê qehremanekî ku li hemberî vê tevdîrê xwe girtiye heye. Di vê wateyê de hindekî jî pêvajoya hevsengiyê ye.

**Rêber Apo:**

- Ji pêvajoya hevsendiyê zêdetir, qehremanê me dixwaze berî ku bikeve şerê artêşên mezin herî kêm di rewşa hevsengiyê de bikeve ceribandineke şer. Vî tiştî dixwaze bi kesayeteke ku pê re di têkîliyê de ye û bi nakoke re biceribîne. Wisa tê fêmkirin ku hesînek pê re heye, dibêje berî ez ku şerên qadan ên mezin bidim, gelo ezê bi vê ceribandinê ve çi qezenc bikim û çi wenda bikim? Ger hun balê lê bikişînin, mirov ji beriya bikeve şerên mezin

ceribandinên biçûk werin jiyîn ku rûbirûyê wendahiyê giran û binkeftinan re nemîne. Ev rêbazê qehreman balkêş e. Dizane ku dê bi dijminê xwe re zû dereng were beramber hev. Dikeve ferqê ku jixwe dijmin ji hundir ve kelhe fetih kiriye. Ango Kurd bi kar aniye û Kurd tune kiriye. Heta dibîne ku malbat jî bi kar aniye û hîn xirabtir daye wendakirin. Ew bi xwe jî ji bo vê rêbaza dijmin bersiveke ku dişibe wê dide. Him bi tena serê xwe.

Di xala ku hatiye wendakirin de, di malbatê de tespîta têkîliyekê dike. Piştre saziya arîstokrat, noker esas digre. Ji ber ku ew dizane ew jî beşeke civakî ya herî bingehîn ku di Kurdistan'ê de dide wendakirin e. Dixwaze xwe bigihîne nirxên wan ên darezînê. Wê jî dihêle herî dawiyê û wisa tê fêmkirin ku di vê tevgera xwe ya amadekarî, keşif û biplan de rast nêzîk bûye. Bêyî ku ceribandinên wiha bike, ceribandinên wiha nejî, ne malbatê ne jî Kemalîzmê dikare nas bike. Ev çalakî jî dibe tevgereke baş a ezmûn û ceribandinê, li hev rasthatineke baş û keşfeke baş e.

**Me:**

**-** Serokê min di vir de armancên dijmin hene. Dema ku dijmin ew lewaziya ku di kesayeta Kurd de heye dixwaze bi kar bîne li hemberî wê tevdîran digre. Ango bi taybetî xwesteka dijmin a bi karanîna lewaziya qehreman heye.

**Rêber Apo:**

**-** Gelo ji van taktîkan re çi nav tê dayîn? Tê gotin, dê şer bi pêş bikeve, qehremanê me bi tena serê xwe û rêbaz tê gotin. Pêwîste mirov ji aliyê Kurd ve vê yekê fêm bike. Ji ber ku xala mifte ya şer ev der e. Di vê pêvajoyê de dijmin yekcar vî tiştî dibêje "Kurdê ehmeq hîna serê xwe ranekir hate lêyîstokê." Reîsê malbatê dibe ku rexmî hemû bêxwestekiya keçikê dibêje, "em vî Kurdî bi dewleta xwe ve girêbidin, keça min wî qebûl bike." Ev di çapemeniyê de jî derket. Şertê wî jî misoger bi dewletê ve girêdan bû. Dewlet jî –ku misoger MİT di dewrê de ye- dibêje, "çûk kete qefesê." Ev rastiyên li pêş çav in.

Keçik jî gelekî balkêş e. Li gor xwe dê ristê bilêyîze. Gelo Mata Harî ye, yan sîxureke bi cureyeke din e? Gelo xafilek e, gelo gelekî zane û xwedî plan e? Pêwîste mirov van fêm bike. Ev qehreman jî naşibe ew qehremanên ji rêzê ku hun dizanin. Naşibe kesên wisa. Mînak xwe nexiste nava xwe nîşandana hestan. Çawa ku jin ji bo ku jinbûna xwe bi erzanî bijî, hetanî dawiyê xwe weke amûr bi kar tînin –ez nabêjim wisa ye- bi ihtimaleke mezin qehremana jin weke rêbaz dikeve nava helwesteke gelekî berovajî. Di vir de jî hesabekî mezin a polîtîk heye. Aliyê hember jî di wateya hest de, bi qasî serê derziyê naxwaze derfet û tawîzan bide. Şertên wê hene. Di asteke mezin de dibe ku biplan e û zane ye. Tam jî tê gotin hêzbûna bi hestan ve pevçûneke mezin dest pê dike. Bi qehremanê ku yekî ji gel e, pevçûna Kurd- Kemalîst, Kurd-feodal dest pê dike. Ev belayeke mezin e. Şens, an jî bêşensiyeke mezin e. Pêwîst e hindekî dilê we hebe. Ji ber ku pêwîste em vî qehremanî fêm bikin. Bi tena serê xwe di keleha dijmin de û ev kelhe jî di nava sêçar çemberan de hatiye dorpêçkirin. Aliyê hember Kurdek e ku serdestê hêza hest, pere û hêza siyasî ye.

Filmeke Yilmaz Gûney bi navê “Sûrû” (kerî) hebû. Şivanê ji Muşê tê Enqerê ji bo ku keriyê xwe bifiroşe, dîn dibe. Dîsa filma “Zugurt Axa” hebû. Di vê filmê de axayekî Rihayî yê zugurt heye. Axa tê Stembolê, li gor kevneşopan, li mizgeftê destnimêje digre, bêguman çakête xwe derdixe diavêje ser milên xwe, yekî çav vekirî tê çaketê xwe yê xirab bi yê wî re diguhere. Zugurt axa piştî sed mîtroyan dimeşe û piştre dibêje, “ev çaket ne yê min e” ango zilam ji milê wî derxistiye, çaketekî din li wî kiriye. Zugurt Axa ne di ferqa wê de ye jî. Bêguman piştre bi gelek lêyîstokan re rûbirû dimîne. Tiştekî ku li Stembolê nayê serê wî namîne. Vaye Kurd ev e. Axayê wî feqîr e, gundiyê wî yê feqîr jî. Tiştekî ku Kurd li Enqerê, li Stembolê qezenc bike nîne. Lê belê qehremanê me dixwaze li vir qezenc bike. Pêwîst e hun vê biçûk nebînin. Ew jî mînakeke Kurdistan’ê didamezirîne. Komeke cidî ava dike û dixwaze vê bi hêza hestan bihêz bike. Vaye bûyerê di vir de şax û çiqil dan.

Dewlet misoger vê yekê dibêje “Kurdê ehmeq ket!” reîsê malbatê dibêje “tiştê ku em dikin karên ji rêzê ne, serê komê ye, emê bi riya keçikê re wî bikin endamekî baş ê dewletê.” Niha dora keçikê ye. Gelo dê vê riste çawa bi serkeftî bilêyîze? Bêguman Kurd xwe hindekî amade dike. Ji heftsaliya xwe pê ve ew xwe guhertî rêxistin dike. Bi zanistiya modern ve hev dinase, dixwaze hindekî sosyalîzmê fêm bike. Wisaye ku pêşketina tevgera şoreşgerî jî mijara gotinê ye. Tevgerîna ciwanên şoreşger bi germahî tê jiyîn. Dîsa Kurdîtî jî hindekî deng vedide. Dixwaze wan bigihîne hev, bibe xwedî ristekî. Qehremanê Kurd bi pêşketina tevgera şoreşger ve ferq dike ku weke berê nikare bi hêsanî bijî. Bi navê Kurdistan’ê hindek liv û diyarde hene. Dihizire ku ev dibe ku dawiya wan bîne. Di nava metirsiyekê de ye ku êdî asta xayînî nayê pêşxistin û dê bersiva xwe bibîne.

Kevneşopa CHP yê ya Kemalîst heye û şaxên wê yên çepgir hene. Lê belê ev jin bi jîrî fêm dike ku şensê wan ê bi taybetî li hemberî tevgerê ku nû ji dayik dibe nîne û pêwendiyê bi komê re çêdike. Pêwendî nîşandana qehremana jin ji komê re û ji rastiya Kurdistan’ê re balkêş e. Pêwîst e hun vê hindekî baş fêm bikin. Hemû diyarde vî tiştî nîşan didin: Qehremana jin ji bo ku Kurdistan ji nû ve were afirandin û ji bo azad bibe tevlî tekoşînê nebû. Dixwaze ew Kurdistana ku ji dest çûye asta ku hatiye wendakirin, an bi ketina nava tevgera şoreşger ve û ji rê derxistinê ve yan bi rengekî dijwar valaderxistinê ve yan jî bi xistina bin serdestiya xwe ve tiştê ku çil salan malbata wê kiriye ew jî dixwaze çil salên din bidomîne. Tê fêmkirin ku hizirandina destpêkê ya qehremana hember ev e.

Gelo dê vê hizir û armancên xwe çawa derbasî jiyanê bike? Ji aliyê bîrdozî gelekî bihêz e, weke polîtîk jî têgihiştiye. Pêşketîbûneke wê ya wiha heye. Di vê wateyê de dixwaze di nava komê de bibandor be. Yek jî dixwaze jinbûna xwe bi kar bîne. Kesayeta vê jinê kesayeta sîxurê objektîf e. Zilamê Kurd gelekî lewaz e, hele di nêvenga Enqerê de li hemberî Kemalîzm û arîstokrasiyê gelekî hêjar e. Jin bi jêhatiyên xwe yên taybet ve bi xwe ewle ye. Dibêje, “ez dikarim bi risteke ku weke bavê min ku kete nava serhildanên Kurd ên destpêkê ku di pêvajoya ji 1925’an heta 1940’ î

çawa ku vala derxist, ez jî dikarim vê pêşketina Kurdan tune bikim.” Dihizire ku ev derfet bi dest xistiye. Di şiyarbûn an jî di vejîneke Kurd ku çêbibe de rolekî bêyom careke din bi serkeftî lêyîstin, roleke rast a sîxuriyê ye. Şerekî ji damezirandina komarê heta berî wê, heta niha tê meşandin dema ku em tên salên 1970’an bi rengekî gelekî balkêş, di şexsê komeke gelekî biçûk de bi du kesayetên gelekî guhertî û nakok ve careke din pêkhatina wê mijara gotinê ye. Niha gelekî zelal tê fêmkirin ku cewherê wê ew e. Wê demê me nedikarî em ew qasî fêm bikin. Lê belê asta pêşketina şerê niha, her çi qasî li ser bingehê gelekî lewaz de be jî, bi rengê şerekî dûelo ya di nava du kesan de dest pê kiribe jî ji hemû aliyan ve dibe rastiyeke dîrokî. Bi rastî jî qehremana jin gelekî xwedî hêz e. Li pişt wê dewlet, Enqere û MİT heye. Zimanê wê û vegotina wê jî bihêz e. Dibe ku weke jin jî gelekî bi bandor be. Ger wê hêza xwe jî bi kar bîne, komekê yan jî zilamekî ku nikaribe bi rê ve bibe nîne. Bi kurtayî astên aliyan dîroka ku li şûna xwe hiştine rastiya civakî û mezinbûna kesayet wiha ye.

Ji heftsaliya xwe û pê ve wê jî perwerdeya serokatiyê dîtiye. Wê perwerdeyeke serokatî ya ji qehremanê zilam, tundtir, heta hîn bi pîvanên pêşketî ve dîtiye. Li hevrasthatina di bin pêwendiya gelekî berfireh û piştgiriya dijmin de balkêş e. Ew li hevrasthatin ji bo her du aliyan jî tê wateya şerekî hatiye amadekirin û biplan. Ew rewşa bi rengê serhildêriya Kurd a kevneşop gelekî hatiye derbaskirin. Lê belê nûbûnek û şerekî nû di çerçoveyekî ku şopên wê stûr bi xwe re dide jiyîn dest pê dike. Gelo ma ev şerê deh salî, çi da û çi bir? Hîn jî em li ser vê disekinin. Pêvajoya vê ya 76’an heta beriya wê heye. Gelo ma ev şer çi dide peyitandin? Gelo vî şerî çi nîşanê gelê Kurdistan’ê kir û çi anî? Gelo vî şerî çi anî malbatê em dikarin hindekî din destpêkê lêkolîn bikin. Ez bawerim me qehremanê zilam kêm û zêde fêm kir. Em vê jinê hindekî din fêm bikin. Ji bo çi wiha nêzîk bû yan jî kesekî ku şêwazê wê yê helwestan hindekî din balkêş dibîne heye? Gelo hun di vê mijarê de hindekî hizirîne?

**X: -** Ez hindekî dixwazim ji xaleke cuda lê temaşe bikim. Li gor min ev hewldana veguhertina hest a li evînê ye. Ew jî afirandina ya baş û xweşik e.

Heta ger ew kesayeta li hember weke dijmin were gotin, gava yekem di şexsê wê kesayetê de dê çawa bi hev re were jiyîn danîna holê çêdibe. Bi redkirina aliyê hember ve destpêkirina şer mijara gotinê ye. Ez dihizirim ku şer hîn jî li vir didome. Ger wê hestê veguherînê evînê, ger bi rastî jî were wî tiştî pêwîste ew jin dest ji gelek tiştên xwe berde. Ango pêwîste kesayeta xwe ya kevin taybetmendiyên xwe, hestên xwe, ristê ku dijmin dayê wê bi hemû aliyan ve berde ku bikaribe evînê bijî. Lê belê kesayeta li wir vî tiştî bernade.

**Rêber Apo:**

- Gelo ma ev gengaz bû?

**X:**

- Serokê min ji ber ku ez dihizirim hîn şer xelas nebûye, dê şer vî tiştî diyar bike û ev yek gengaze jî.

**Rêber Apo:**

- Şer xelas nebûye, niha jî Tansu derxistine hemberî min. Gelo ma bi rastî jî ew qehremana jin a di romanê de dikarîbû evîndar biba? Yên ku di van mijaran de xwedî agahî ne dikarin hindek tiştan bibêjin.

**Nû:**

- Serokê min li gor min nedikarî evîndar be. Mirovekî ku di wan mercan de mezin bûye, bi Rêbertiya netewî di wê demê de, di wateyekê de ew qehremanê ku xwe ji bo Rêbertiyê amade dike, dibe ku bi pîvanên xwe ve evîndar bibe. Lê belê ev evîneke ku bikaribe bersivê bide qehremanê romanê nebû.

**Rêber Apo:**

- Gelo pîvanên wê çi dibûn? Em lêkolîn bikin, ji ber ku her Kurdek bi van pîvanan ve hatiye zincîrkirin.

**Nû:**

- Ew him Kurdê ku kesayeta xwe wenda kiriye, him bi xwe xiyanet kiriye di rastiyê de Kurdê ku ji aliyê hindekên din ve hatiye dizîn temsîl dikir.

**Rêber Apo:**

- Ew Kurdê ku bi xwe girêbide, em hindekî dikarin fêm bikin, lê belê gelo jinbûneke çawa derbixe pêş ku wî Kurdî nêçîr bike? Gelo ma dikarîbû çawa min nêçîr bike? Ger bal lê were kişandin, sîxurek jî dikare lêyîstokên evînê bike. Ev jin ji bo çi hewldanên lêyîstokên evînê pêş nexist?

**Nû:**

- Wê nedikarî wê jî bi ser bixe. Ji ber ku ew qehremanê romanê bi qasî ku van lêyîstokan danequrtîne xwe ava kiribû.

**Rêber Apo:**

- Weke taktîk wisa ye.

**O:**

- Serokê min, li holê ye ku di vir de qehremana jin bi rêxistî hatiye. Bi taybetî di wê de hesteke serdestiyê heye. Ew bi xwe jî dizaneke ku wendakirina herî mezin a Kurd jî bi taybet di têkîliyên jin û zilam de ye. Lê belê ji derxistina zanebûnê ya ku qehremanê zilam di vê mijarê de bi rê xistiye dûr e. Bi hesteke qehremanê zilam a gelekî birêxistî û misoger gelekî pîroz re rûbirû dimîne. Lê belê di vir de şerekî polîtîk, taktîk a di navbera du hêzên rêxistî, bi taybetî şerekî ji hev bihêzbûnê mijara gotinê ye. Jixwe jinê dema fêm kir ku di vir de nikare bihêzbûnê pêk bîne, dest ji hesta xwe ya serdestiyê bernade. Li şûna ku li hemberî qehremanê zilam hestekê bijî, bi şivanekî re hevparkirina hest tercîh dike.

**Rêber Apo:**

- Diyar e ku dikare şivanekî jî weke xulam bi kar bîne. Qehremana jin dibêje, “ez dikarim bi xulamê xwe re her cure hestê parvebikim lê belê ji yekî ku ev qasî birêxistî û dixwaze min jî tevlî armancên xwe bike, Rêberê netewî be jî ezê bi qasî dilopeke avê jî cih nedime wî.” Dibe ku hun bibêjin

helwesteke wê ya gelekî misoger a çînî û dijmintiya netewî hebû. Gelo rexmî vê ji bo çi nedikarî taktîkekî pêk bîne? Hêmaneke ku divê em hindekî fêm bikin ev e.

**V:**

- Serokê min ferq dike ku qehremanê romanê bi sosyalîzmê ve kûranî girêdayî ye. Jixwe bi piştre dibêje "tuyê tu caran di riya sosyalîzmê de cih nedî min." Nêzîkbûneke wê ya wiha jî hebû.

**Rêber Apo:**

- Piştî deh salan vî tiştî dibêje, "tuyê ji ber min dest ji berjewendiyên partiyê, yê sosyalîzmê bernedî." Bi vê ve armanceke xwe diyar dike. Pêwîst e hun di vê mijarê de kûrbûnê bi dest bixin. Gelo ji bo çi yekcar asta hest ê aliyê hember sekinî? Jineke ku ji giştî di Tirkiyê de jinên navdar hîn di asteke jor de ye û di bandorkirina zilam de hoste ye. Vî aliyê xwe ve jî dikare vê gelekî bi rihetî bimeşîne. Gelo ji bo çi ev yek nemeşand? Pêwîst e em vê yekê ji aliyê rastiya şer ve jî fêm bikin. Gelo tiştê ku ew wiha girt çi bû? Gelo nêzîkbûna min a ji bo wê ya biplan bû yan jî asta xwe rêxistinkirinê ya qehremanê zilam ristek dilêyîst?

**Y:**

- Serokê min li gor min ev bûyer heye. Qehremana jin bi rêxistî tê. Herî kêm zirxên xwe li xwe dike. Lê belê vî tiştî bi tiştên hîn guhertî ve ser digre û naxweze aliyê din bi vê bihise. Qehremanê zilam jî di vê mijarê de gelekî birêxistinkiriye. Tê destpêkê diceribîne, mînak di şer de ji bo ku eniya hember were ceribandin, destpêkê top tên avêtin. An jî bi avêtina hawanan re eniya hember tê ceribandin. Ger di eniya hember de qelşek hebe, êrîş tê pêkanîn. Qehremana jin vê yekê diceribîne. Lê belê tu qelşek nîne. Delaliyê, evînê, nazdariyê diceribîne, lê belê ferq dike ku di eniya hember de qelşek nîne. Vê carê bi taktîkeke cihê ve dixwaze hestên xwe diyar neke. Li gor di van mijaran de taktîkên jinan hene. Destpêkê bi riya evînê û bi nazdariyê ve hestên xwe diyar dikin û dixwazin zilam bînin rê. Lê belê dema ku nikarin

vî tiştî pêk bînin, xwe weke kevir dikin û dixwazin zilam bînin rê. Dibe ku ev yek jî bibe taktîkek.

**Rêber Apo:**

**-** Nêrîna bingehîn diyar e. Kurd ketiyê jinê ye. Çi qasî pêşketîbûna xwe îdîa bike jî ew jî dê bibe Kurdekî ku dişibe wî. Qehremana jin dibêje, “pêwîst e ez bi taybetmendiya vî Kurdî ya ketîbûnê ve bikûjim.” Ger nêrîna bingehîn an jî taktîka esas ev be, yên din dibe ku di rêza duyemîn de bîmînin. Heta dawiyê di vê taktîkê de israr heye. Dema ku têkîliya xwe dest pê dike, bi ihtimaleke mezin dibêje, “Kurd kete nava sewdaseriyê, nikare vê tengaviyê derbas bike, dê di nav de bifetise. Gelo wê demê ezê vê taktîkê çawa derbasî jiyanê bikim?” Ku deh salên din jî ji qehremanê romanê re got, “tu naşibî tu Kurdî.” Navenda PKK’ê jî di nav de bi rêya bandorkirinê zilamê herî navdar dikare girêbide. Ev jîrbûna wê heye. Di nava PKK’ê de yek kesayetekî ku yan bi girtina hemberî xwe ve, yan jî bi kişandina gel xwe ve bandor nekiriye, nexistiye û bêbandor nehiştiye nîne. Du hevalên me yên bi qehremanî li ber xwe didin dibêjin, “em vê bikujin.” Qet çareyeke din ji destên hevalan nayê. Bêguman hewldaneke wiha jî zêde encam nedida. Ji ber wê jî nêrîna bingehîn, ku pêvajoya piştre nîşan daye tê fêmkirin. Taktîk dibe ev: “çawa ku Kurd bi sedan sal in, di malbatê, di têkîliya jinê de hatiye wendakirin, tunekirin, pêwîste ez vî zilamî jî bi vî rengî tune bikim.” Destpêkê ceribandinê dike, dibêje “hindekî asta xwe ya hestan heye, dibe ku sewdaser be.” Kurdê klasîk derbas kiriye yan na ne diyar e. Zilamê Kurd ê klasîk û malbatê tam derbas kiriye yan na, qehremana jin jî lêpirsîn dike û ev deh salî heta hîn zêdetir didome. Gelo çi qasî dikare radestî ajo, hest heta evîna xwe bibe?

Vaye di vir de berxwedaneke Kurd a gelekî balkêş heye. Qehremanê me bi qasî ku nas dike, hindekî dikare li ber xwe bide. Rojên gelekî bikabûs derbas dike. Xwezî me bikarîba ev pêvajoya deh salî bi vegotineke wêjeyî ya dewlemendtir bianiya ziman! Ne bi rojane bi kêliyan di bin zexteke balkêş de ye. Zilamê Kurd ê klasîk di nava xwe de dahûrîn dike û yê derbas

bike. Jin jî kêli bi kêliyan tehrîk dike. Pênc qirûş qîmet nade hestên wî yên pîroz. Her kêliyeke wê heqaret e.

Qehremanê romanê dixwaze li ber van hemû tiştan li ber xwe bide. Qehremana jin fêm bike, dibe ku veguherîne. Gelo çawa dixwaze rêxistinê bi hesta "ez" ve di nava hev de pêş bixe û biparêze? Şer û teoriyê dixwaze çawa pêş bixe? Roj bi roj, demjimêr bi demjimêr bi vî tiştî re çawa dijî gelekî balkêş e. Naxwaze hestan bike qurban. Naxwaze dest ji bîrdoziya xwe, polîtîka, welat û gelê xwe jî berde. Lê belê ger hun balê bikişînin, di vê xalê de zilamekî di van temenan de wenda nekiriye tuneye. Him jî bi rengekî herî ketî tê wendakirin. Lê belê qehremanê me hîn jî li ber xwe dide. Jin di vir de dixwaze hostetiya xwe ya taktîk bidomîne. Dibêje, "pêwîst e ez vî Kurdî di vê lêyîstoka klasîk de tune bikim." Ev tenê lêyîstokeke klasîk nîne. Lêyîstokeke gerdûnî ye. Ew jî polîtîkaya xwe dewlet û asta xwe hesab dike. Lê belê hest di destên wê de ne. Vê carê çekeke berovajî ye. Ango ji bo ku hetanî milîmekî bihêz neke çi hebe dike, berovajiya wê bêhestiya mezin raber dike û dixwaze tune bike. Li gor min di vê xalê de hosteyeke mezin e. Ger sîxureke ji rêzêbûya dê hîn guhertî tevgerîba. Pêwîste em fêm bikin ku vê hostetiya mezin a taktîk çawa nîşan dide. Ger hun vê yekê fêm nekin, hun nikarin Kurd fêm bikin û dahûrînin.

Bêguman di vir de nazdariya jinê xwe xemilandina wê jî heye. Xwe xistina hezar û yek rengî ya jinê ji sîxuriya objektîf a tê zanîn, heta sîxuriya subjektîf, sîxuriyê bi hemû aliyan ve lêyistina wê mijara gotinê ye. Li hemberî vê zilamê herî navdar, "zilamê egîd" weke tê zanîn di nava demeke kurt de dikeve. Kurdekî ku neketiye nîne. Gelo ji nav we çend kesan ew Kurdê ketî derbas kiriye? Gotina vê yekê zehmet e. Gelek ji wan li pêy wê tiştê ne. Yê ku gihiştiye çareseriyê nîne. Di vê wateyê de pêwîst e Kurd çi qasî vejiyaye were nîqaşkirin. Di nava PKK'ê de qehremanê me hîn jî dixwaze pêşketinan pêk bîne. Pêwîste tu kesek vî tiştî weke meseleyeke ji rêzê bi dest negre. Ji ber ku şerekî rast heye.

Em ji bo qehreman tiştekî din diyar bikin: Dema ku bikeve têkîliyeke ji rêzê aliyekî vê yê neyê fêmkirin nîne. Tu ji yekî donzdeh salî re keçika

dixwaze bîne, ne dibêje erê, ne dibêje na. Kevneşop e, bi rihetî pêşwazî dike. Ji donzdeh saliyê pê ve zilamê Kurd jî, keça Kurd jî wiha ye. Ev weke çarenûsekê, weke zagonekê ye. Gelo kî dikare li hemberî vê derbikeve? Di nava we de çend kes hene ku vî tiştî red bikin? Ger hun red jî bikin hunê bikevin rewşeke xirabtir. Hun xwe ji bo çi vedişêrin?

Hun dibêjin pirsigêka malbatê. Ji bin têkîliyên malbatê kesên herî navdar jî nekarîne derbikevin. Derketina wan jî hewldaneke mezin dixwaze. Ji ber wê jî pêwîst e mirov şerê qehreman biçûk nebîne. Ya herî girîng jî pêwîst dikir ku teqez di şerekî de bin bikeve, bi neket. Dibe ku tenê hestên wî dikarîbû çil caran ew biriba binketinê. Yek jî me ev tespît kir. Ev têkîlî têkîliyeke ku nebe nabe ye. Ger ê ku şerê Kurd dest pê dike, yê ku herî maqûl e, şêwazê wê yê herî zêde encam digre û yê bibe tevgereke keşfê, tenê li ser vî bingehî dibe. Ger dê şerekî pêşîn pêwîst bike, dê li vir çêbibe. Di vir de bêyî ku ceribandin çêbibe, tu şerekî Kurd nayê dayîn. Ev zagoneke şerê Kurd e. Misoger divê hun vê bibînin. Rizgarkirin û nerizgarkirina Kurd jî di destpêka vî şerî de tê fêmkirin. Di nava vê têkîliyê de dê zelal bibe ku ji hemû aliyan ve şerê jiyanê gengaz e yan na.

Hun hindekî vî qehremanê ku dijî dinasin, vê gavê Rêbertiya gelê Kurd dimeşîne. Hatiye astekê ku di Kurdistan'ê de bûye kesayetekî herî bibandor. Serkeftina tam bi destnexistibe jî destpêka wî gelekî girîng e. Di nava kelha dijmin de gaveke wisa avêtiye ku, di nav de her roj mirin û xefik heye. Ger di tevgera keşfê ya Kurd de yan jî di pevçûneke biçûk li ser lingan nemîne, di salên piştre berî şerê rêxistinî, bîrdozî û siyasî di şerê hest de dê wenda bikira. We nekarî şerê hestan qezenc bikin. Di we de hest û dil nîne. Ger dil hebûya, li hemberî şehîdan hun wiha nêzîk nedibûn. Mînak di nava partiya me de tiştê hevalên me yên zilam ku li hemberî şehadetên li hemberî rêhevalên me yên jin dijîn, bi gotina herî ji rêzê ve weke ku ga li şemendeferê (trên) temaşe dike ye. Dest ji qehremaniyê berdin, mirovên ji rêzê jî ne wiha ne. Hestên wan nînin. Dibêjin, "jin mir em ji wê xelas bûn." Gelo şoreşgerekî dilê xwe wiha ye, çi qasî şoreşger e? Mirov nikare bihizire ku yê ku asta xwe ya hest wiha ne, şoreşê pêk bînin. Têkîliyên wan,

têkîliyên belaya seriyan e. Têkîliyeke ku çêbibe jî rev e. Şêwazekî herî ketî esas digrin. Her têkîliyeke jin û zilam hatiye avakirin her çû rê li ber revê vekir ê ku nereviya jî rê li ber qeyranê vekir. Di nava rêxistinê de ji aliyê hindekan ve qeyran tê pêşxistin û ber bi ketîbûnê ve tê birin. Gelo çend kesên ku ev derbas kirine hene? Hindek kes weke min xwe diparêzin. Lê belê gelo heta kengê xwe biparezin? Me şer dest pê kir, amadekarî dibe ku heta astekê be, şerê hest jî di nav de vê gavê dema şer e. Hîn jî qehremanê me bi tena serê xwe vî şerî dimeşîne. Gelo çawa şer dimeşîne? Em kêlî bi kêlî bişopînin. Lê belê ev hevdîtina şer a destpêkê gelekî girîng e. Bi tenê wêjewanekî baş dikare vê bigihîne vegotineke xweşik.

Wisa tê fêmkirin ku qehremana jin xwe gelekî baş amade kiriye. Ji serokwezîrê KT yê hîn zêdetir xwedî jêhatiyekê ye. Her kesek ji bo vê jinê dibêje, “serokwezîra herî serkeftî ya li hemberî PKK’ê.” Wisa tê bi lêvkirin. Di rastiyê de ev li gel wê weke çêlikekê dimîne. Dibe ku şagirta wê, dirêjiya wê heta siya wê be. Vaye şerê destpêkê yê pêşî li hemberî vê kesê hate dayîn. Dibe ku enî nêzîkî hev bin, şer hindekî din mezin bû. Lê belê em hîn jî di eniyên pêş de şer dikin. Em di nava xwe de şer dimeşînin. Di rastiyê de ya ku hîna girîngtir e, pêwîste em kûrbûna di têkîliyê de ji çavan nerevînin. Gelo çawa hate xwestin ku Kurd were xistin? Ew xal gelekî girîng e. Kurd ji bo çi hestiyar bû? Ji bo çi hate xwestin ku bi vê hestê were tunekirin? Bêyî ku em vê yekê fêm bikin, em gavan navêjin.

Me ev pirsyar kir: gelo mafê Kurd ê hestiyarbûnê hebû? Gelo ma pêwîst bû ku hestên xwe biçewisîne? Ger hun bixwazin bibêjin, gelekî biplan bû, bixwazin bibêjin maceraperestî bû, min serî li hewldaneke hestan a wiha da. Lê belê gelo ev çîrok bi kîjan xefikan ve dagirtî bû? Hun nêzîk nabin ku vê fêm bikin. Kurd naxwaze vê fêm bike. Lê belê ez bawerim qehremanê me yê Kurd hindekî bi jîrî nêzîkbû. Di rastiyê de gelekî niyeta wî pak bû, ji hêza hestan bawer dikir, lê belê rastî hindekî cuda bi pêş diket. Weke taybetmendiya xwe ya herî mezin wenda nekir, weke Kurdê klasîk nêzîk nebû. Mînak Kurdê klasîk di têkîliya destpêkê de dibe ku serî li kêrê û sîleyan bide. Tu caran qehremanê romanê nekete nava vê hewldanê. Ger

biketibayê, dibe ku dê di roja yekem de wenda bikira û plan xirab biba. Wê ew nebûya tevgereke keşfê, dê biba tevgera xwe tunekirinê. Tê fêmkirin ku hindekî jîr e. Lê belê aliyê hember ne ku bi salan li bendê bisekine, dixwast di nava çend heftiyan de encamê bigre. Piştre ev xapandina têkîliyê veguherî xapîna dewletê.

Yek jî ekîba şerê taybet a dewletê yê ku di tevgerê de ye, Pîlot (Necatî Kaya) heye. Ji bo qehremanê me dibêje, “her kêliyekê ez dikarim serê wî jêbikim, xwêyê bikim û bixwim.” Ew jî rastiyeke li pêş çavan e. Dibe ku ew jî li pey qehremanê zilam e. Ger bigre dê deh mîtroyan wêdetir biavêje. Her carê dibêje, “kewa di çente de ye, pijandina çûkê, xwêyêkirina wê.” Ev peyv ji devê wî dirijin. Ango dihizire ku çûka di qefesê de ye “Kurdekî ehmeq e.” Dibêje “kekê ji bavê min dusedhezar lîre mîras maye, zêr pêwîst e, cemidank pêwîst e, çi pêwîst e ezê bikirim. Min li filan kolanê taxa çaremîn jî kirê kir û amade kir.” Yekser ji gel dewletê hatiye. Temaşe bikin Kurdekî çawa qezenc dikin. Jin û Pîlot çar bi çar in. Qehremanê me jî dixwaze ji herduyan sûdê bigre. Pereyên malbata wan gelekî dixwe û bi komê jî dide xwarin. Di van salan de komê dispêre aboriya van û dide jiyîn.

Bêguman pênaseya dewletê ya di vê demê de ev e. MİT ê di 1979’an de digot “ev zilam bîstûçar demjimêrên rojê di himbêza me de bû, şev û roj me ew xwedî dikir, çawa bû ku ev çûk firiya?” Ev peyvên ku bikaranîbûn. Ew çûka ku jê re digotin kew, gelo ji qefesê çawa firî? Gelo ew kevok bû yan jî bazek bû? Nasdikin an nasnakin divê mirov ji wan bipirse. Ji bo çi dibêjin kew? Dema ku gotina kew bi kar tînin, dixwazin kesayetê ku sewdaser bûye, ketiye nava pereyan û mal û milk tê destnîşankirin. Hun ji bo cigareyekê jî tawîzan nadin. Em bi hêsanî nikarin bi kesekî cigarê bidin berdan. Lê belê qehremanê romanê gavên xwe yên destpêkê diavêje. Jineke hetanî dawiyê balkêş, Pîlotekî Kurd ê ku hetanî dawiyê bi pereyan xwedî dike û rastiyeke şerê taybet a ger hindekî serê xwe rabike, dê wî bi erdê ve bike yek heye. Gelo qehremanê me, çawa nêzîk bû, çûknebûna xwe çawa nîşan da? Ji bo ferasetê hindekî din kûr bikin li xwe bihizirin. Hun piştî ku ji bo cigareyê, ji bo madiyata rojane ev qasî ketîbûnê nîşan bidin, di mercên

herî zehmet de, di keleha Enqerê de dê zilamê we yê herî navdar çi bikira, çawa xwe rizgar bikira û çawa gav biavêta? Gelo ji jineke ji rêzê mêrxasekî ku xwe rizgar bike, ji nava wan derdikeve? Ger hun bi pîrozbûna vî şerî ve, bi pîrozbûna rêxistinê û tekoşînê re girêdaniya mezin bipeyitînin, dibe ku derbikeve. Di vir de pêwîste hindekî şerê rêxistinê were fêmkirin. Ji bo çi qehreman dest ji hîmê rêxistinî berneda? Kurdê herî hêjar, ji bo mirîşkekê dê xwe bixe nava pevçûnê û tune bibe, gelo çawa bû ku qehreman wiha neket? Di vir de pêwîst e mirov wateyê bide bîrdozî, polîtîkayê, ger hebe bide pîroziya berxwedêriyê.

Jixwe mezinbûna PKK'ê jî tenê ji bo vî qehremanî na, ji bo hemû berxwedêran divê mirov wiha rave bike. Ew kesên ku tevlî binkeya li derûdora qehreman bûne, ji bo ku rastiya qehreman parvekirine misoger pîroz in. Lê belê ji bo qehreman rojên baş derbas nabin. Di van salan de qehreman qasî ku nikare şûşeya çayê di destên xwe de bigre, bêmecal e. Bi vê bandorê ve şûşeyeke çayê bi ser çoka xwe de dirijîne û çoka wî dişewite. Niha hun bi dil in, wêrek in, hun dikarin çekê hilbigirin û derbikevin hemberî dijmin. Berovajî qehremanê romanê nedikarî li hemberî dijmin şûşeyeke çayê jî di destên xwe de bigre.

Hun xwe dispêrine vî qehremanî û şer dikin. teqez pêwîst e em çîrokê bizanibin. Ger hestên we hebin, bila hindekî bi pêş bikevin. Ger zanebûna we hebe , kar bikin ku vê hindekî fêm bikin. Qehremanê romanê neket. Em niha dixwazin fêm bikin ka ji bo çi neket? Jin ji bo xistinê gelekî jêhatîbû û gelekî xwedî hêz jî bû. Gelo Kurd dikarîbû çawa wenda bike? Em çîrokê ji bo ku vê hîn baştir fêm bikin digrin dest. Ji ber ku piştre jî digot, "rexmî ku Kurd ji hemû aliyan ve di nava kefa destên min de bû, wenda nekir, min wate neda vî tiştî." Dema ku ev tişt got, em diketin sala 1986'an.

Binkeya PKK'ê dema ku kongreya sêyemîn dijiya, qehremana jin dixwaze lêyîstoka dawiyê ya jinbûna xwe bike. Qehremanê me dema ber bi wan rojan ve tê, dixwaze li gor xwe çareseriyan hilberîne. Qehremana jin dema em ber bi sala 1986'an ve dihatin, gelekî baş di ferqa wê de bû ku êdî kar ber bi encamê ve diçe. Bêguman ev sal xaleke vegerokê ya gelekî girîng

bû. Gavavêtina 15 Gelawêjê hatibû kirin. Lê belê ber bi binketinê ve çûyîna wê, mijareke kêliyan bû. Ew kesên ku berpirsyariya pratîkî hilgirtine ser milên xwe jî, bêhêvî bûn. Hindek ji wan bi xirabkirinê ve mijûl dibûn. Wê ev yek ferq dikir. Milîtanê herî navdar jî, li hemberî pirsgirêkan tenê dikarîbû guleyekê li serê xwe bide. Kesên ku herî zêde pêwîst bû xwedî li tekoşînê derbikevin, ên ku îdîa dikirin ku qaşo binamûs in xwekuştinê dihizirîn. Ên din jî xirabkar bûn. Ev jin dîsa di tevgerê de bû.

Dîsa di wê demê de şehadeta Egîd (Mahsum Korkmaz) heye. Ji bo qehreman vî tiştî dibêje, “ew jî mir, ên din jî li ber serê te dixin nava qeyranan û didine revandin, ma gelo tuyê piştî vê çibikî?” Hîn jî li pey bi dijwarî bikaranîna jinbûna xwe ye. Di navbera du qehremanan de gotûbêjeke wiha derbas dibe.

Kurdê herî navdar li holê ye. We dît ku Kuçuk Emrah çawa veguherî qereçiyekî. Ew kesayeteke ku MİT ê amade kiriye. Vê gavê di şexsê wî de jin û zilam têne xistin. Bi taybetî ciwaniya şoreşger gelekî hate xistin. Nokerekî Amedî, yê wiha mezinkirina wan li hevrasthatinek nîne. Dema ku me partî îlan kir Brahîm Tatlises weke “qralê stranbêjan” bi lêv kirin. Heta roja me jî bi dijwarî tê bikaranîn. Ev rasthatî nehatin hilbijartin. Dema ku me karê dil ê şoreşgerî û karê hestan xwest pîroz bikin wan jî ev bilêv kirin. Heta Hulya Avşar jî hate ferzkirin. Ew jî bingehê xwe Kurd e, bazar bi van ve hate dagirtin û ciwanekî ku nekete bin bandora wan nema. Yilmaz Guney jî di wê demê de ev tişt digot, “me xwenîşandan kir, me xwest em bibin artîst, lê belê van kesan gelekî xirab derdixine hemberî me. Pêwîst e em çareya vê bibînin, bang li Brahîm Tatlises bikin, ezê wî şiyar bikim. Ev dê gotinan bîne ser mêrxasiya me.” Piştre jî hêza wî têra vê nake. Weke tê zanîn li hemberî qanserê bi bin dikeve û dimire. Yilmaz Guney nikare ji bin hatina civaka bûrjûva ya 12 Rezberê ya di ser wî de derbikeve. Yilmaz Guney zilamekî gelekî mêrxas bû. Lê belê nikare xwe ji binketina hemberî qansêrê jî rizgar bike. Ji ber ku ji bo hevjîna xwe gule berda. Berdana guleyê û tunekirina xwe bi hev re çêbû. Faşîstek hebû, ew tehrîk kir anî lêyîstokê û

wî xwe tune kir. Piştre jî qad ji bo kesayetên ku şerê taybet bi kar tîne re ma. Ev aliyekî vî karî ye.

## Hesta herî baş a ku mirovek nîşanî mirovekî bide hesta xweşikbûn û jiyanê ye

Dema ku di civaka Kurdistan û Tirkiyê de malbat, jin, zilam û bi taybetî ciwan bi çeka şerê taybet ve tê xistin, em li eniya xwe ya hundir temaşe bikin. Wisa bawer nekin ku ev enî hêsan e. Hîn jî ji sedî nod hun di bin bandoran de ne. Me hindekî hun ji vê qutkirin. Lê belê dîsa jî karê veguhertina we ji serxistina tam dûr e. Vaye di çarçoveyeke wiha û di vê nêvengê de em dixwazin qehreman rizgar bikin. Jin ew qasî dijwar e ku dibêje, “tu zilamekî çawa yî? Ew zilamê Kurd ê em dizanin li hemberî jinê di nava bîstûçar demjimêran de yan wisa dibe yan jî bi weke din dibe, gelo te deh sal in çawa wiha tehemûlê min kir? Tu ji bo çi pevçûnê nakî? Ji bo çi li min nadî, ji bo çi guleyan li min nadî? Şêwazekî nêzîkbûnê yê zilamekî li gor jinê heye, tu ji bo çi li ber min nagerî, xwe naxî nava rewşên guhertîtir?” Bêguman dema ku me rewşa vê jinê çavdêrî dikir û Kurdê klasîk ê bênamûs derbas dikir, me nedikarî em bi van re mijûl nebin. Me dê bi rengekî gelekî plansaz dest bi derxistina rastê ya tevgera jinê jî bikira.

Bêguman dê vê jî weke marekî bişopanda. Dema ku em ber bi sala 1986’an ve dihatin, ango piştî deh salan dibêje “te dest bi bênamûsiyê kiriye, gelo ma bi jinên din re têkîliyên te bi pêş dikevin? Gelo bi Kurdê zewicî, Kurdê xwedî namûs çi dibe?” Kurdên me di vê mijarê de berdewam dike ku hindekî din bi plan be. Ji ber ku ew Rêber e. Qehreman bûye Rêber û neçare bi biryar be. Ger di vê mijarê de durû be, ger ferasetê namûsê ya klasîk an jî ya şoreşger çareser neke, dê tune bibe û him jî ji zû ve. Jin weke guran dişopîne, dibêje, “tu li hemberî jina xwe di nava lêgerîna jineke dinê de yî ha! Vaye ezê vê bombê biteqînim.” Weke were fêmkirin, him pêwîstiya jinbûna xwe ya bi pîvanên bûrjûva, feodal û civaka komûnal a seretayî bi cih nayne û him jî dibêje, “te dest bi dijderketina rêgeza namûsê kiriye.”

Gelo qehremanê me yê li hemberî van çi bikira? Em dikarin hindekî vê lêpirsîn bikin. Tiştê kişand, kişand bi qasî ku li ber xwe da, li ber xwe da. Li gel van hemû tiştan gelo divê çi bikira? Gelo vê çîrokê çawa wiha didomîne? Gelo mafê wî ji bo wê heye? Jiyana rojekê provakasyoneke mezin bû. Divê mirov ji bo rêxistinê berxwedana wî ya ji bo vê çi qasî rast e fêm bike. Ji ber ku bêyî ku ew were fêmkirin, fêmkirina PKK'ê ya nûjen, PKK ya hatiya dahurandin, PKK e ya ku dihizire û hindekî dikare rêxistinê ava bike, ne gengaz e. Ez xwe dispêrim ev qasî şehîdî û van tiştan diyar dikim. Ger vî şerî mezin ê têgihiştinê fêm nekin, hunê xiyanetê li hemûyan bikin.

Ger hun li hemberî jineke wiha bûna, gelo we dikarî bi deh salan hun li zincîrê bidana û we li ber bidaya? Li gundê me dema ku jin hate anîn, an jî bi zilam mêrbûna wî hate bawerkirin, di nava bîstûçar demjimêran de pêwîstiyên jin û mêrbûnê tîne cih. Ev jin em bihêlin rojekê deh salan –heta dem jî girîng nîne- di rojekê de dike, her cureyê heqaretê û tehrîkê dike yan jî li gor xwe şerekî bi pêş dixe. Pêwîste em fêm bikin ku gelo ev yek çî ye? Ji ber ku di vir de dewlet, kemalîzm, çîna serdest û kesayeteke rêber a ku gelekî baş hatiye mezinkirin heye. Ger Kurd vê yekê fêm neke nikare tu karan bike. Mêrên klasîk, jinên klasîk rexmî hemû fedakariyên xwe zêde serkeftî nînin û ev jî pîvana we diyar dike. Hun nikarin ji vê romanê re bibêjin nepixandiye. Nepixandî be jî weke romaneke Kurd a rast bi pêş dikeve.

Niha her kes behsa qehremaniya jinê dike. Gelo ev jin ji bo çi ev qasî tevlî şoreşê bûn? Dinya balê li vê dikişîne. Civînên me yên jinê yên li Ewrûpayê jî jinên herî pêşketî yên Ewrûpa û femînîstên wan dikişîne nava xwe. Ev nîşan dide ku astekî pêş de hatiye bidestxistin. Gelo ji jina herî paşketî ya dinyayê û yê ku bênav e çawa rewşeke wiha derkete holê? Bi taybetî ji bo fêmkirina şehîdên jin pêwîst e ev yek were dahûrandin, bêguman ji bo vê jî çalakiyên qehreman, taktîkên wî yên şer û şêwazên wî di qada hest de jî fêmkirin girîng e. Bi taybet di vê mijarê de şehîd Ronahî xwedî biryar bû û hemû şehîdên din jî wisa bûn. Ew dibine şehîdên

Rêbertiyê. Divê mirov vê asta mezin fêm bike. Ger ev nebûna şerê rizgariya netewî û gerîla çênedibû. Ev bi şerê ku qehreman meşandiye ve yekser girêdayî ye.

Lê belê ji bîr nekin ku qehremaneke din a jin jî hebû. Gelek balkêş e ku niha wenda ye. Qehremana jin, bû raz û kete bin erdê. Yê ku wê dibîne nîne, gelo emê çi navî bidin jina wendayî ya ku dixwast ev qasî xwedî bandor be? Ya herî girîng jî şerê wê yê ku bi me re kiribû. Dibe ku li hemberî me weke jina şerê taybet şer dike, ma gelo em dikarin ji vê birevin? Ger em birevin jî ma gelo em dikarin xwe jê xilas bikin? Em di vê mijarê de rasteqîn bin.

Dibe ku sala 1995'an ji pêşketina şer re şahidiyeke balkêş bike. Dibe ku cara yekem şerê eniyan bi rengekî xwedî wate bibîne. Berî hun werin vê rojê pêşiya wê bihizirin. Her kes dibêje "ev mucîzeyek e" ne mucîze ye, şerekî nefes bi nefes û bi zanistî hindekî hatiye pîvandin û hatiye pêşxistin e. Ev şerê Kurd gelekî girîng e. Ev şerekî ketûber nîne. Hindek taybetmendiyên şerê Kurd ê ji hemû şerên din cudatir hene. Mînak li Başûr jî şerekî Kurd heye, lê belê ev şer çil sal in Kurdan tune dike, ger em nekevine nava vî karî dê bibe şerê xeniqandinê. Şerê Kurd ji xeniqandinê zêdetir tu encaman nade. Lê belê hîn jî şerê Kurd gelekî bi biryar e û aliyê xwe yê serkeftinê her diçe zelal dike. Bi kurtayî qehremana jin xwe disparte vê teoriyê yan jî vê dîtînê: rêgeza ku Kurd tune dike diyar e. Rêgeza malbat, jin û ketîbûnê. Kurdekî ku nakeve nava vê jî nîne. Ev Kurd jî dê bi vî tiştî bihata xistin. Lê belê hîn ji roja destpêkê ve li hemberî vê li ber xwe da. Dema ku li ber xwe dida, hesta pîroz dixwest. Hesta pîroz razeke xweşik a ku zindî dikir, ava cewher a ku teqez pêwîst bû. Di rastiyê de qehremanê zilam di vir de bi tenê li pey xwe têrkirina kesayetê nînê. Dixwaze di vejîna Kurd de pêşkêtineke bîrdozî, polîtîk û li gor xeta rêxistinî pêşketinekê pêk bîne. Bi rastî jî dê hindekî wiha pêş bikeve. Lê belê plansaziya kujer a aliyê hember mijara gotinê bû. Ev plana kujer dewlet e, nokerî ye, milîtaniya wê ya ku gelekî serdest e. Ger tu hemû taybetmendiyên Kurdîtiya berê derbas bikî, dibe ku bikaribî di şer de gavekî biavêjî. Heta tuyê dest ji hemû hestên serdestiyê ku li ser zilam serdest e berdî.

Ez bi tenê ji aliyê zilamê Kurd ve diyar nakim. Ji her neteweyekî yê ku ji asta çandekê ye, bi taybetî ketina civaka çînî ve piştî ku gihişte zêdebûna zayendî asta zilamekî li hemberî jinê serdestî ye. Li gor kevneşopên her netewekî ev serdestî çi be, çawa be wisa tê kirin û tê meşandin. Mirovê Kurd di vê mijarê de yê ku herî xirab e. Li hemberî dewletê di aborî de, di jiyana civakî heta çi qasî bandoriyên civakî, sazî û dezgeh hebin di hemûyan de wenda kiriye. Di nava malê de qadek hatiye afirandin û zilamê Kurd di nava vê qadê de teqez serdest e. Zext û despotîzma dewletê li ser wî çi qas be, zext û serdestiya wî ya di nava malbatê de û li ser jinê jî ew qas e. Tiştê ku hindekî din bi serî kirine, dixwaze hîn zêdetirî wê jî ji jinê û ji zarok derbixe. Vaye Kurd ev e. Ger bal lê were kişandin, dibe tîpê zilam ê herî xeter. Dema ku Kurdê nû derdixe holê di giştî de zilamtiyê û bi taybet jî zilamê Kurd neçare berovajî veguherîne. Ango yê dest ji vê zilamtiyê berde. Dest jê berdan jî hêzê dixwaze. Gelo hunê ji taybetmendiya zilam a ku di asta zagonekê de bihêz e çawa jê tawîz bidin û dest ji vê berdin.

Qehremanê me yek du ceribandinên revê kirin. Dema ku kom avabû, dema ku hêza wî têra jinê nake –jin bihêz e, xirab dike- got ez dihêlim. Lê belê dît ev yek ne rast e. Careke din hate qehremana jin û li hemberî jinê tevdîrên xwe girtin. Dema ku jin bi wêrekî bi ser de hat, li Amedê careke din ji malê reviya. Ma gelo tu zilam ji malê direvin? Her hal ev yek gelekî kêm tê dîtin. Dixwaze ji destên jinê rizgar bibe lê belê ev yek ne gengaz e. Ji neçariyê dîsa şûn ve vegeriya. Ger bal lê were kişandin, di van salan de rewşeke were rizgarkirin, dema ku tê xwestin rêxistin were rizgarkirin misoger ji vê têkîliyê re pêwîstî heye. Ango hîsî be jî hindekî neçare vê têkîliyê bimeşîne.

Qehremanê romanê vê ihtimalê her dem dihesibîne. Qasî ku dewlet vê têkîliyê bizanibe nayê ser komê! Bi ihtimaleke mezin ji ber vê pêwistiyê li ber xwe dide. Piştre zelal bû ku dewlet dibêje, “ev têkîlî têkîliya kewa di çente de ye.” Kewa di çente de nayê kuştin. Ji bo nêçîrkirina kewên din tê bikaranîn. Gelo ew “kew” kengê firiya? Ev der girîng e. Mînak ji Amedê hatina Mêrdînê û piştre derketina derveyî welat gelekî balkêş e. Mînak kewê

dixwast ji cihekî weke qefesê rizgar bibe. Roja destpêkê nekarî bireve, nekarî bifire heta şûn de dihat. Piştî du sê rojan ceriband, di carekê de rev û firîn bi ser xist. Derketina ji Amedê hindekî tê vê wateyê.

Di 1978’an de valatiyeke biçûk dibîne û ber bi îlankirina partiyê ve jî diçe. Ev gaveke gelekî girîng e. Piştî ku ew gav hate avêtin, dema ber bi 1979’an de hatin çêbû, herî zêde ev lêyîstok mehek an jî du mehan an didome yan jî na. Lêyîstoka partiyê lêyîstokeke mezin e. Qehremanê me dilsoz e, lê belê di hembêza dewletê de ber bi partîbûnê ve diçe. Herî kêm dewlet jî wisa bawer dike. Lê belê weke bîrdozî, siyasî û rêxistinî jî tam şoreşgeriyek tê kirin. Di vê xalê dema ku dewlet û derûdora me di nava metirsiyeke kûr de ye, dema tê gotin dê rewş çawa bibe, qehreman ceribandina firîna ji qefesê dike. Qehremanê me di van salan de tê Mêrdînê, gelekî bêmecal e. Ji qefesê derketiye lê belê rewşeke wî ya wisa zêde bifire jî nîne. Ber bi Rihayê ve tê, di rastiyê de baskên wî hebin jî, rewşeke wî ya ku baskên xwe biçerpîne nîne. Di nava kolanan de digere. Dijî yan jî najî ne diyar e. Ew qasî bihêvî jî nîne.

Dijmin dibêje, “Apocî derûdorê tevlîhev dikin” lê belê qehreman bi xwe di asteke bizehmet nefes stendinê de ye. Vê carê dizane dê çûk bixine qefesê û yekcar serê wî were jêkirin. Jixwe Şahîn Donmezê ku xiyanet kiriye hatiye girtin. Ji polêsan re dibêje, “em biçin Amedê, Apo bigrin bînin, careke din bixin qefesa ku me jê berdabû.” Ji Enqerê di dema xwe de biryar dernakeve yan jî Enqere bawer dike ku qehremana jin hîn jî li ser karan serdest e. Ji ber ku di wê navberê de rewşeke balkêş çêdibe. Dema ji Enqerê çûyîn çêdibe, tu caran firîna ji qefesê nayê gotin, hindekî jî veşartî tevgerîn çêdibû. Nezikî du sê mehan qet agahî nayê dayîn. Ew dibêje “ew li Amedê li avahiya Gunaydinê ye. Çûk di qefesê de ye.” Wisa bawer dike. Dewlet piştre bi ser wir de digre, wisa bawer dike ku em hîna li wir di qefesê de ne. Berovajî ew du meh in ku em ji wir firîne. Bêguman ji ber ku “çûk” hindekî metirsîdar e, diçe gel sempatîzanekî dibêje, “biçe sînor bişopîne, gelo ma mirov dikare ji wir derbikeve?” Ev firîn firîna dawiyê ye. Ango tevgereke bi

baskbûyînê ya ku heta tehtên herî hişk derfetê dide, firînê. Ji deştê dê bifire û bi qasî ku nekeve hêzê digre û ev yek jî tê pêkanîn.

Piştre bi rengekî xwezayî bi qehremana jin zagonên rêxistinê tê bibîranîn û tê gotin "veşartîbû me nedikarî em xeberê bidin gelek kesan jixwe tu jî ne li holêbûyî, pêwîst nake ku tu qet gumanan bikî, tu dikarî werî derveyî welat jî." Qehremana jin tê, dixwaze lêyîstoka xwe bidomîne. Di rastî de êdî rewş guhertî ne. Êdî yê ku di qefesê de ye, ne "kew e", "baz e."

Bêguman şer didome. Mirov li bendê nebe ku şer wisa erzan bi encam bibe. Bi ihtimaleke mezin dewlet dibêje, "çûk firî, lê belê dê biçe û careke din were girtin." Hin nêçîrvanên xwe yên tên zanîn dixe tevgerê. Yek ji wan jî Semîr (Çetin Gungor) bû. Semîr jî hosteyê careke din nêçîrkirina çûkan bû. Jin jî wisa bû. Ev di dîtinê de dijber bûn, lê belê di cewher de li pey heman armancê direviyan. Van di pêvajoyeke dijwar de, di xebateke dijwar de ji bo xirabkirinê çi diviya ew kirin. Ango di zindana Amedê de îşkence hebû, yek jî li derveyî welat îşkenceya van hebû. Dibe ku îşkenceya van a li derveyî welat ji îşkenceya vekirî ya zindana Amedê deh qatî biqehr bû. Li hemberî van berxwedan tê kirin.

Kemal Pîr, careke din ji Beyrûdê dikeve rê, vê lêyîstokê dibîne, di rastî de vê lêyîstokê berê jî dibîne. Dibêje, "em bikujin." Lê belê çênabe. Piştre vediqete û ber bi welat ve diçe. Piştî tê girtin, di zindanê de dibêje, "ji hevalê Cuma (Cemîl Bayik) re bibêjin, bila ji bîr neke. Ew çi pêwîst e dizane, wasiyeta min e." Piştî berxwedana xwe ya balkêş nefesa xwe ya dawiyê wiha dide. Ev gotin, gotinên dawiyê yên wasiyeta mêrxasekî ne. Pêwîst e mirov bizanibe tê çi wateyê. Kemal Pîr dihizire ku rêhevalê wî yê Rêber di nava xeteriyê de ye, bawer dike ku dibe wenda bike, bikeve nava lêyîstoka jinê, nekaribe xelas bibe. Di vê mijarê de metirsiyên xwe yên kûr hene. Gelekî dixwaze bi me re alîkar be û heta dixwaze lêyîstokê zelal bike, lê belê hêza wî têr nake. Diperçiqe, diçelmise û nikare bike.

Ev ew qada ku tê de nû cih hatiye girtin de hemû jêhatiyên xwe nîşan didin û dilêyîzîn. Dixwazin nefes negirtinê bidomînin. Tu carî nabêjin "salên zehmet in, em jî hindekî ji bo çareseriyê alîkar bin." Ev gelekî

bêmerhemet in. Di dîtinê de nakokiyên wan hene, lê belê destên xwe dane hev û hev tehrîk dikin. Bi taybet piştî kongreya me ya duyemîn, dibêje, “em yekî ji wan nahêlin bişînine Botanê.” Ev xirabkariya mezin bêdilî û provakasyon cara yekem serûber û bi rengekî gelekî biplan li van salan hate ferzkirin. Em jî gelekî saf nêzîk dibin û tiştên wiha hêvî nakin. Lê belê tiştên ku nayên hêvîkirin çêdibin. Diyardeyê wê derdikeve holê. Lê belê emê çawa bi ser de biçin, em tam nikarin derbixin. Ev karekî mezin a zanistî û siyasetê ye. Wisa weke ku hun bawer dikin an jî pêk tînin bi hêsanî nayê çareserkirin. Mînak ji bo ku em tiştên ku hatine serê hêzên çepên Tirk û Kurd nejîn, ji bo ketineke welat a tendurist me her tişt da ber çavên xwe.

Çawa ku me di sala 1976’an de got divê kom hebe, ji bo xatirê komê her tişt were kirin, vê carê jî me digot, pêwîst e partî xwe li welat belav bike û teqez em bigihên welat. Duaya me û sonda me ev bû. Her tişt li gor vê hate sererastkirin. Me ev lêyîstoka mezin jî li gor vê rêgeza pîroz xirab kir. Ger em ketina welat pêk bînin dê dijmin gaveke din bi bin biketa.

Wê demê provakatorên din ketin tevgerê. Encax bi şerekî pênc salan a dijwar ve me karî ne kongreya duyemîn, ne jî ya sêyemîn nedin provakakirin û me partî ji vê belayê parast. Ji ber ku dewlet hîn jî di biryara “ya me, dê navendê jî, Apo jî, PKK’ê jî bigre” de bû. Zilamên wê yên din jî hebûn û gelekî bihêz bûn. Di biryara tiştên ku di hemû rêxistinên veşartî de bi ser xistiye, dixwast di PKK’ê de jî bi ser bixe. Jixwe dibêje, “çûk firî, biçe bigre” wisa tên û ez bawerim li gor xwe dihizirin ku “çûk” xistine bin kontrolê.

Şêwazekî vî qehremanî jî heye. Wî xwe hîn ji heft saliya pê ve di nava şer de hindekî bi pêş xistiye. Ji hevaltiyê û ji têkîliyan gelekî fêm dike. Yekê ku nirxekî gelekî mezin dide têkîliyên mirovan e. Ji ber wê jî di têkîliyan de wendakirina wî zehmet e. Gelo yekî ku xwe ji bo hêza têkîliyê amade dike, dikare wenda bike? Gelo çawa vê pêk tîne? Bêguman zemîneke wisa rûdine ku çi tişt ji bo wî bide jiyîn pêwist be wê hîs dike. Dibihîse û bi mirînî, dijwarî wê dike. Ev yek ji bo rêxistinê jî wisa ye. Têkîliyê vediguherîne têkîliya rêxistinê. Di vê mijarê de, di nêvenga heyî de jîrbûna meşandina

rêxistinê nîşan dide. Bi dostekî ji rêzê ve bi rihetî dikare têkîliyê peşbixe. Bi rexmî hemû bibandorbûna xwe ve hêza aliyê hember nîne. Mînak her du provakator jî jin jî, Pîlot jî gelekî bibandor bûn. Dewletê jin jî, zilam jî gelekî balkêş mezin kiribû. Ji aliyê bibandorbûna xwe ya balkêş ve Pîlot hosteyekî mirovan ku bi salan di nava jinan de hatibû perwerdekirin. Jin jî di asteke ku bikaribe her cure têkîliyan bi pêş bixe di nava zilaman de hatibû gihandin. Ê ku di wan salan de ez dorpêç kiribûm ev bûn. Tiştê ku jinê dixwast yek kesek jî ber bi welat ve neyê şandin û partiyê bi xwe spartina pûçkirina derve ve tasviyekirin bû. Wan ev tişt di pêvajoya kongreya duyemîn de, di asta herî jor de ceribandin.

Jinê her tiştê xwe di pêvajoya ku em ber bi kongreya sêyemîn ve diçûn de danî holê û xwest encamê bigre. Ez bawerim di vir de ji aliyê têkîliya jin û zilam de encameke gelekî girîng heye. Jinê bi hêrseke mezin fêmkiriye ku ev qehreman nakeve. Heta diyalogên wan rojan hene. Dibêje, “tu zilamekî çawa yî? Tu dikarî ji bo sosyalîzmê û partiyê her tiştekî bidî ber çavan û her tiştekî bikî.” Qehremanê me jî herî dawiyê dibêje, “te hesabên şaş kirin, te bawer kir ku bikaranîna hest û zayendîtiyê ve bikaribî min bixî û ji ber wê jî tiştê di kesayeta her Kurdê wendakirî de, tu hizirî ku di şexsê vî kesî de jî werin wendakirin.” Jinê deh salan bi dijwarî şer kir û di encam de gelekî neçar ma. Çawa ku di destpêkê de qehremanê me yê zilam neçar bû piştî deh salan jî qehremana jin gelekî neçar bû. Ez vê di wateya hêza bîrdozî, siyasî û rêxistinî de diyar nakim. Di van mijaran de û ji aliyê hestan de jî jixwe di serî de bihêzbû. Hest ber bi binketinê ve naçin, rê li ber bandoreke kujer venakin. Wî girtibû saxlemiyê.

Qehremana jin vê ferq dike. Li hemberî jina ku tê xwestin were bikaranîn çekeke jinê ya mezin tê çêkirin. Di vê mijarê de amadekarî gelekî balkêş hatibûn kirin. Di vê mijarê de qehremana jin tune ye. Ji difna xwe bêhnê distîne û di vê mijarê de vî tiştî dibêje, “netirse ez te jehrî nakim.” Weke mînaka cihê ku agir nebe ji wir dû ranabe, tiştekî wiha di serê xwe re derbas dike. Lê belê ev ji bo wê zêde watedar nayê. Ji ber ku armanc di dest de girtina rêxistinê ye. Ji bo ku bikaribe rêxistinê di dest de bigre divê

qehremanê li hemberî wê were tunekirin. Him jî li ser bingehê tunekirina rêxistinê ve divê ev were kirin. Ango qehremanê romanê dê bînine rewşeke wisa ku bibêje “ez nikarim bikim” û biweşe. Divê lêyîstok wisa were lêyîstin ku qehremanê me were rewşeke pênc qiruşan. Qehremanê me berdewam dike van gotinan dibêje, “ev lêyîstok xirab bû, ma lêyîstina te ya wiha ne şermbû? Baweriya te bi xwe gelek e, tu gelekî bi xwînsarî û bi armanc nêzik dibî. Te xwest tu hezar caran bimirî, lê belê min tu nedayî kuştin. Te her cureyê heqaretan got, lê belê min devê xwe xirab nekir.” Bêguman ev çîroka derxistina holê ya Kurdê nû ye. Ger rêzdarî û edeba wî ne mezin be nabe. Dê uslûbê wî jî gelekî bibandor be. Ango weke we nêzîk nabe. Ger hunbûna we dê di nava demjimêrekê de bi erdê ve bikira yek. We dê ev kar li dev û rûyê xwe bigeranda. Lê belê qehremanê romanê naxwaze evînê bixe asteke wiha ji rêzê.

Êdî dewlet bi temamî li aliyekî tê hiştin. Rewşeke dewletê ku li ser qada Rojhilat a Navîn û rewşa qehreman zêde bi bandor be nîne. Xeterî ji holê hate rakirin. Hevsengiya dinya û herêmê tê pêşçavkirin. Dewleta Tirk çi dike bila bike, çi qasî hevkarên xwe ji bo hawarê vexwîne bila vexwîne nikare bi hêsanî cihê ku Rêberiyê yan jî qehreman girtiye bi dest bixe. Ya yekem ev e. Ya duyem, partî hate pêşxistin. Li hemberî nêzîkbûnên provakatîf ku dixwestin her roj deh caran rêxistinê belav bikin, şerekî dijwar a bîrdozî û rêxistinî hate dayîn û rêxistin ji vî şerî xwedî hêz derket. Ew rêbaza ku bi jinbûnê gelekî bi kar dianî bi berxwedaniyeke dijwar û bi sebrê bersiva xwe dît û gihiştina dahûrandina jinê çêbû. Ew kêliya ku dîroka Kurd girêka Kurd ku dest bi dahûrînê kir, bi dest xist û ev dibe tunebûna qehremana jin. Kesayetek li hemberî lêyîstoka mezin hevsengiya cîhanê hesab dike û wê bi aliyê xwe ve dadihûrîne. Bi vî rengî dewleta Tirk di rewşeke ku nikare serdest be de girt. Dikare partiyê bîne rewşekê ku bibe partiyeke ku bikaribe ber xwe bide û şer bike. Hebûna vê hindekî misoger dike û piştre di mijara jinê de jî ber bi dahûrandineke mezin ve diçe.

Xuyakirina hindek hêmanan ne zehmet e. Teza jinê ev bû: ev zilam nikare li ber xwe bide, teqez dê bikeve! Wisa dengekî mezin dernaxe û

nakeve, dê bixurife. Ger bixurife yan jî li gor feraseta namûsê ya klasîk ji rê derbikeve wê di nava rêxistinê de were teşîrkirin. Tu sedem nîne ku wisa nebe. Ferzkirinên jinê yên rojekê jî bese ku wî ji rê derbixe. Ji rê derxistin du cure ne, tez ev e. Yan dê teqez stuyê xwe li ber jinê bitewîne, yan jî dê dev jê berde. Qehremanê me herduyan jî nake. Qehremana jin vî tiştî balkêş dibîne. Weke ku stû nehate tewandin, awantajên wê yên gelekî xwedî hêz jî hatine nirxandin. Ger qehremanê romanê bixwaze bi hezar û yek cure derfetên dewletê ve zayendîtî û jiyana hêsan çêbibe, pêwîst e şewqa kesk pêxîne û stû bitewîne. Ger ev werin pêkanîn, li gor pîvanên jinê dê kar sererast bibin, ger kar sererast nebin dê her roj polîtîkayeke ji hev xirabtir were ferzkirin. Ew jî tê ferzkirin. Li hemberî vê weke riya duyemîn jî yan tuyê bikujî –ku me ev qebûl nekir- yan tuyê biqewitînî yan jî tuyê di mijara jinê de durû bî.

Li hemberî van hemû tiştan tekoşîn di asta dîrokî, civakî, teorîk, bîrdozî, siyasî û rêxistinî de ye. Jixwe ger Rêberek van hesab neke, nikare bibe Rêber. Tu şerê mezin ê mirovahiyê didî. Dema te got, “ajoyên min ber xwe nadin, ez nikarim ajoyên xwe yên birçîbûn û zayendîtiyê sererast bikim, veguherînim.” tuyê wê kêliyê dozê wenda bikî. Ger Kurd di vê mijarê de rizgariyê dixwaze, ne dê ketiyê ajoyan be, ne ketiyê rihetiyê be ne jî sewdaser be. Dê xwe ji nû ve biafirîne û nereve. Nikare bi rengê jina diduyan a sisiyan re zewicandinê ve jî çareseriyê peyda bike. Çi qasî qehremanekî xwedî bandor dibe bila bibe, dê hest û evînê wenda bike. Dema ku evîn wenda kir, dê welat wenda bike. Qehremanê romanê qehremanekî ku weke hun dizanin nîne. Xwe erzan têr nake. Neçare ku her tiştekî bi şêwazê ku layiqê Rêberan e bimeşîne.

Pêwîste hun ji vê çîrokê hindek encamên jiyanî derbixin. Mînak gelo serkeftina hest hate pêkanîn? Gelo evîna Kurd di vê çalakiyê de serkeftin bi dest xist? Kê dikare me ronahî bike.

**Nû: -** Serokê min em dikarin bibêjin di vir de evîna Kurd qezenc kir. Ango evîna Kurd hate avakirin. Di rastî de ew evîna Kurd a ku nîne, di vê têkîliyê de ava dibe. Hemû rastiya civaka Kurd di nava vê çîrokê de veşartî

ye. Heta vejîna Kurd girêdayî nakokiya ku di vê çîrokê tê jiyînê ye. Ji nû ve derketina Kurd a ser dika dinyayê bi serkeftina di van têkîliyan re girêdayî ye. Binketina di vir de binketina civakê ye. Serkeftina di vir de bûye serkeftina civakê. Evînek ava bûye û dijî.

**Rêber Apo:**

**-** Belê, gelo em dikarin hindekî giyana Ehmedê Xanî bi bîr bînin?

**Nû: -** Li gorî min temsîlkarê wî yê herî rast qehremanê çîrokê ye. Evîna rast a ku di xeyala Ehmedê Xanî de jî ev bû. Evîna ku ew li bendê bû û xeyal dikir jî ev bû. Naxwe evînên ku dawiya wan du term bûn nîne.

**Rêber Apo:**

-Mirov dikare diyar bike ku ew misoger e vê armanc dike û xeyal dike. Piştî sêsed salî be jî giyandayîna wî bûyereke girîng e. Ez xwe tenê naxim şûna evîndarekî. Di dinyayê de yê ku herî zehmet vî karî bike ez im. Lê belê di vê mijarê de ez gelekî xwedî biryar im. Dîsa jî em li hemû tiştên çêbûne temaşe bikin, gavavêtinên qehreman di cih de ne. Him hêvî ye, him jî yê ku hêviyê pêk tîne ye. Agirê mirovahiyê bi dest xistiye her diçe gur dike. Dîsa mirovên nû afirandinê her diçe bi pêş dixîne. Ev hindekî baweriyê dide. Ev çîrok dikare baştir we bi we bide naskirin.

Çîrok dê çawa bi encam be, dê şer diyar bike. Em hêvî dikin hun cihê xwe yê di çîrokê de baş diyar bikin. Qet pêwîstî bi Medosayan (di mîtolojiya Yewnan de jina mar ku xirabiyê temsîl dike) nîne, jina ku bûye weke siyekê her cure jina ketiye bilêyîzin. Pêwîst nîne ku zilamên sexte, zordest jî bijîn. Misoger pêdîvî bi xweşikbûnê heye. Pêdîvî bi girêdana xweşikbûnê bi azadiyê re heye. Misogeriyeke ku ew jî bi şer ve dê were afirandin heye. Hindekî xweşikbûn layiqê me ye. Ji bo vê jî pêwîst e em şer bikin, divê em vî şerî bidin ber çav.

Hesta herî baş ku mirovek nîşanî mirovekî bide, hesta xweşikbûn û jiyanê ye. Her tiştekî ku nabe jiyana xweşik, ji bo mirov a herî xirab e. Ger di me de her tiştek vê dibe kirêtiyê jiyan di bin derbeyên dijmin ên dijwar de hîn tê wendakirin, tercîha me ya şer di cih de ye. Bêguman me dixwest em

xweşikbûnan bi şêweyeke aştîxwaz bi dest bixin. Lê belê nabe. Ev çîrok bûyereke gelekî hişk, gelekî dijwar û gelekî dîrokî ye. Balê li hemû ceribandin û ezmûnan bikişînin. Ger em şer nemeşînin, em nikarin jiyanê û xweşikbûnên jiyanê bi dest bixin. Ez dixwazim xweşikbûnê layiqî hevalên xwe bibînim. Jixwe bûyîna hevalê min an jî qehreman bi li gor rêgeza xweşikbûnê tercihkirina şer ve gengaz e.

Di PKK'ê de qehreman tenê kesek nîne. Hemû yên ku li ber xwe didin, hemû şehîd û yên xwedî ked in. Van misoger li gor rêgeza xweşikbûnê şer hilbijartine û bûne şervanê xweşikbûnê. Weke din tu wateyeke din a vî şerî nîne. Ev şer ji bo rihetiyê û payeyê nayê meşandin. Ev tişt wiha were hizirandin, xirabiya herî kirêt ku li bîranîna qehremanan were kirin e.

Misoger pêwîst e mirov bi xweşikbûnê bawer bike, girêdaniya jiyana xweşik, bi dijwarî şer ve heye. Ji bo vê jî gelekî rêxistinperest bin, çeka ziman û her cureyê çekê bi kar bînin. Weke din mirov nikare bigihê vê armanca pîroz em dixwazin hevaltiya we wiha bijîn û bi hevaltiya we ve ya herî xweşik parve bikin. Lê belê divê mirov şerê wê jî gelekî bihêz bide. Divê kesek di vê mijarê de xelet nebe. Divê hun ewlebin ku qehreman jî wiha ye û jiyaneke wiha zêdetir tu çareyeke din nedîtiye. Divê hun di cihê wê de tevlî vî tiştî bibin. Naxwe tevlîbûnên kêm dê durûtî be, munafiqî be û encam nade. Dibe ku hun bibêjin, ev hevaltiyeke gelekî zehmet e, lê belê bi cureyeke din xweşik jiyîn ne gengaz e. Tê xwestin di vê çîrokê de ji bo we jî ristek were dayîn, jiyana xweşik layiqî we were dîtin. Zehmet be jî divê hun bi dilsoziyeke mezin û azweriyeke mezin ve vê bipejirînin. Dema ku ev hate pejirandin dê hest mezin bibe. Li gel mezinbûna hest hizirandin jî mezin dibe. Dema ku ev mezin bûn, rêxistin jî û şer jî mezin dibe. Dema şer jî mezin bû, destkeftiyên wê jî mezin dibe. Cihekî ku destkeftî zêde ne jî xweşikbûn zêdetir pêk tên. Dibe ku niha hun bibêjin, "ev hemû xeyal in, tu nikarî bi xeyalên erzan ve me têr bikî." Dibe ku hun di vê mijarê de mafdar bin, lê belê dîsa jî ez ji xeyalên xwe nagerim.

**3 Reşemî 1995**

# ŞERÊ RÊBERTÎYÊ ŞERÊ TÊKÎLÎYÊN AZAD IN

Ev dema ku em ber bi yekem kongreya netewî ya yekîtiya jinên azad a Kurdistan'ê ve diçin, xebatên ku em dimeşînin û dahurandinên ku em bi pêş dixînin gelekî girîng in. Bi taybetî dema ku em mijara jinê û malbatê bi rastiya Rêbertiyê re di nava hev de dest digrin, em dixwazin hemî rîyên hundirîn a rastiya Kurd bi gotineke din ve girêkakor a Kurd derxine pêş. Em bi vî rengî gihiştine encamên gelekî nû gelekî ku vediguherîne. Mirov dikare bibêje rastiya Kurdistana azad û gelê Kurd bi rastiya jina Kurd ve weke goşt û neynok di nava hev de ye, heta weke perçeyekî jiyana azad a jêneger derdikeve pêşberî me. Ya girîntirîn jî lêgerîneke me ya jiyaneke çawa heye? Em ji asta vê ya hest bigrin dest, heta asta siyasî, leşkerî û rêxistinî gelo dê teşedayîna tendurist û rast çawa bibe? Me xwest em bersivên têrker bidin vê.

Divê mirov ji bîr neke ku pirsa "çawa bijîn" ji bo me pirseke jiyanî ye. Jixwe weke gel, hiştine ku em dest ji jiyanê berdin, radestbîna me ji hemû polîtîkayên hêzên barbar ên dagirkerên har û heta hêzên îmhakar-kujer –ku ev polîtîkayên mirinê ne- derfetên berxwedanê nedîditina me hiştiye ku em weke gel ji jineke kole xirabtirîn bin. Jixwe tu îdîayeke jinê di jiyanê de nîne.

Ez bawer dikim ku divê hun cidî bin. Weke milîtanên bijarte yên tevgera jina azad ji ber ku pêwîste hun bi qasî îdîaya mezin a meşandina pêwîstiyên jiyana şervaniyê him ji aliyê hizirandinê, him jî ji aliyê pratîkî ve hewldana wê jî divê hun di asta rêbertiyê de bimeşînin. Yek kêliyê jî ji vê yekê nayê gerîn. Tevlîbûna we ya ji bo şoreşa me, yan jî cihgirtina jinê ya di nava şoreşê de destgirtina wê ya ketûber, nirxnedayîna vî tiştî, dibe ku bibe helwesteke herî neyînî ku mirov bikeve tê de. Berî her tiştî divê rêza we, baweriya we û îdîaya we bi xwe hebe. Yê ku rêza xwe û baweriya xwe nîne, yê ku nizane çi dixwaze û ji bo pirsgirêkên zayenda xwe nabe çareserî, tê wateya di asteke girîng de dest ji îdîaya jiyanê berdaye û hatiye qutkirin.

Ji dîroka partiyê û ji jiyana min hetanî niha, heta dema ku min jin nas kir, heta niha min xwest ez wateyeke diyar bidim rastiya jinê. Min xwest bi rengên cuda diyar bikim ku, ev mijareke hetanî dawiyê jiyana me mijûl dike û min dît ku ev têkîlî bi aliyê siyasî, rêxistinî, heta bi hemû aliyên jiyanê ve girêdayî ye. Weke ku gelekî tê bawerkirin, pirsgirêkeke kesayet û taybet jî nîne. Têkîliyeke xwedî nirxekî her çûye bûye girêka kor, hemû pirsgirêk pê ve hatine girêdan û bê bandor dibin. Rastiya Rêbertiyê di wateya ku daye vê têkîliyê ve gavavêtineke herî girîng a dîrokê pêk aniye. Zehmetiya herî mezin, bi taybet serdestiya teqez a dijmin tenê ji venêrîna saziyên polîs û îstîxbaratê na, rizgarbûna ji hêza madî û manewî ya dijmin jî di rastiya vê têkîliyê de derdikeve pêşberî me. Ger lewaziya herî bingehîn a mirovên Kurd weke rastiyeke civakî ya herî teng, nêzîkbûna malbatê neyê derbaskirin, çareserkirina pirsgirêka netewî û afirandina tevgereke şoreşgerî ya siyasî bila li teniştekê bimîne, civakîkirina kesayet jî ne gengaz bû. Kurd di vê wateyê de di nava vê têkîliyê de wenda dibe û dikeve rewşekê ku nayê naskirin. Em serkeftina xwe ya herî mezin dema ku me ev têkîlî veguherande aliyê şoreşê ve dipeyitînin.

Ger bal lê were kişandin Rêbertî çekê hilnagre û çalakiyê nake. Yan jî xebatên rêxistinî yên gelekî veşartî nameşîne. Dixwaze hindek pêvajoyan, hindek feraset û helwestan derbas bike. Serîhildana destpêkê li hemberî malbatê ye. Encamên wê hetanî dawiyê girîng in. Gavavêtina wî ya saxlem a ji pêvajoya ciwaniyê ya ku bi xeteriyan ve dagirtîbû, ji şêwazê wî yê di mijara malbat û jinê de ya bi tevdîr xwe bi hêsanî naxe û bi têkîliyên koletiyê ve nayê girêdan. Dema ku dest bi pêvajoyeke polîtîk kir jî şêwazê pêwendîdariya bi pirsgirêka jinê ve xwedî girîngiyeke mezin bû û bi serkeftî ji wê derketin dibe şoreşeke rastî. Ev şêwazeke guhertî ye. Lê belê ji bo ku rastiya Kurd bi şêwaza şoreşgerî were fêmkirin dibe ku ev nêzîkbîn a herî pêwîst û rast e.

Hun jin îro dixwazin di asta herî pêş de tevlî şoreşê bibin. Gelo bingehê vê yekê çawa hate avêtin? Hun weke rêberên jiyaneke nû derdikevine holê, gelo ev çawa pêk hat? Kê çi dibêje bila bibêje, her kes dibîne ku ev

gavavêtina we, pêşketineke gelekî girîng e. Lê belê çîroka vê bi taybetî di pêşketina partî û rastiya Rêbertiyê de weke stranekê ye. Em dixwazin ji têkîliyeke gelekî gemarî bûye û hatiye xistin bigihên rengekî têkîliyan a gelekî pîroz û pak. Kê negihiştibe hestên pîroz ew kesekî ku di jiyanê de yê herî bêîdîa ye. Ger kê hestên pîroz bi armancên siyasî yên bingehîn ve bi partî ve ku ew jî amureke herî bingehîn a pêkanîna wê ye, xwe ji wê berpirsyar nabîne û nikare bimeşîne, em bawer nakin ew jî di jiyanê de zêde bi bandor be. Em bawer nakin ku pênc qiruş nirxê hestên wî hebin. Mirov bi hestên xwe ve hene, bi qasî kîn û nefretên xwe bi hezkirin û sempatiyên xwe ve mirov in. Em ji bîr nekin ku gelê me di van mijaran de jî binketineke gelekî xirab dijî, di têkîliyên jin û zilam de kor, ker û bêhîs dimîne. Bi dinyayê ve û jiyanê ve zêde têkîliya xwe nîne. Gelo miriye yan jî qerisiye? Bi şêweyeke ku em zehmetiyê dikişînin, pênase bikin de dijîn.

Şerê Rêbertiyê şerê têkîliyên azad e. Ji bîr nekin ku ger hun di roja me de gavavêtineke kesayetê ya girîng nikarin bikin, ev rewş bi paşverûtiya asta azadiyê ya di têkîliyên we de hene ve girêdayî ye. Ger Kurd gelekî di bin de be û paş de be ev ji ber ku misoger zêde nesîbê xwe ji têkîliya azad negirtiye û bi vê nehatiye girêdan wiha ye. Hun dixwazin bijîn, lê belê girêdaniya vê ya bi azadiyê re nikarin çêbikin. Her tişt weke xeyalên pêknehatî dimînin. Ger hun balê bikişînin şerê Rêbertiyê li gel serîhildana destpêkê weke çalakiya azadiyê dest pê dike. Li rastê ye ku çi qasî pîroz, çi qasî cewherî çi qasî hezkarê hevaltiyê ye. Ev taybetmendiyên bingehîn îro tê rewşa Rêbertiyê. Di civakê de tê gotin, “mirov di heft saliya xwe de taybetmendiyên xwe yên bingehîn nîşan didin û hemû taybetmendiyên xwe kêm zêde di vî temenî de diyar dibe.” Bi rastî jî wisa dibe. Ger hun heftê salî jî bin, ger we asta xwe ya azadiyê diyar nekiribe, mirov nikare bibêje ku hun zêde mezin bûne.

Em nirxandineke ku asta xwe ya azadiyê, pêşketiye dikin. Dibe ku ji bo hindekan ev yek zêde pêwîst neke, lê ji bo min xwedî nirx e. Ji ber ku di nav de asta azadiyê heye. Ez çêbûm hetanî niha ji têkîliyên ku asta xwe ya azadiyê pêşketiye re heme. Ger bal lê were kişandin hemû jiyana min bi vê

ava bûye. Tiştê ku we jî anî vê tekoşînê ev azwerî ye. Ez nirxeke mezin didim hestên keçên ciwan. Heta em şoreşeke mezin jî bi vê şêweyê ve ji bo wan dikin. Lê belê we hîn girîngiya vê ya mezin fêm nekiriye. Di rastiyê de ev cewherek û taybetmendiyeke jiyanê ya herî xwedî nirx û herî pêwîst e. Ji ber ku hun di van temenan de bi xirabwendakirinê re rûbirûyê hev in. Em jiyaneke çawa li aliyekî bihêlin, jiyaneke hatiye mehkûmkirin û encamê wê misoger mehkûmiyet e, ji bo we weke çarenûsekê ye. Ji ber rika ku min li hemberî vê hîs kir, bi we re min têkîliyeke ev qasî ji dil bi pêş xist.

Di têkîliya jin de cidîbûn, bawerî dayîn û li gorî cewherê wê nêzîkbûn, nêzîkbûneke herî mêrxasî ye. Pirsgirêkeke min a empozekirina jiyanê nabe. Pîvanên ku min di derbarê xwe de pêş xistiye, çi qasî ji bo nirxên mirovahî û gel bin, ew qasî jî ji bo jinê ye. Rêbertiya ku pêk hatiye, ji bo jinê jî çareseriyeke mezin e. Misoger pîvanên vê hene, bi kesayeteke wiha ve koletî, bêferasetî, bêrêzî, bêhezkirinî û her cureyê helwestên ketî bi bandor nabin. Asta azadiyê ya kesekî bi helwesta ku li hemberî rastiya jinê girtiye ve tê diyarkirin. Ez di vê mijarê de gelekî pêşketî me. Bi vî rengî li gor xwesteka min a wekhevî û azadiyê hindekî daxwazên we bi pêş dikevin. Ji bo em xwestekan derbixine holê bi salane em hewl didin.

Hun her dem van hevokan bi kar tînin, “em hîna nû dest bi naskirina jiyanê dikin, mijara hestan nû fêm dikin.” Kanî hun ew qasî hestyar bûn? Kanî we ewqasî navê xwe kiribû jîn û jiyan, hun temsîlkarê kîjan jiyanê bûn? Ji bo çi hun hîna nû hindek hestên pîroz nas dikin? Ma gelo ev zêde dereng nabe? Yekî ku hestên xwe ev qasî paş de û tevlîhev dikare çi qasî siyasî be? Çi qasî dikare bibe xwedî çalakiyeke saxlem?

Di wateya kevneşop de weke ku jinbûn tiştek baş nîne, azadiya we ya rave yê heta kesayeta we hindekî bi pêş dikeve. Lê belê hîn jî ji gihiştina asteke saxlem dûr e. Ev zilamtiya Kurd a belaya seriyan e jî ji ber jinbûna we ya kole ye. Hun jinbûneke wisa erzan, ji rêzê, radest bûye yan jî gelekî neçar, lewaz, bibertek û fetisî pêşkêş dikin ku ev bi serê xwe jî têra tunekirina wî dike. Min rikeke mezin bi vê hîs kir, tê zanîn ku ev di nava partiyê de weke politîkayeke çawa bibandor tê meşandin. Jiyanek û hestên

me hene. Gelo ev çawa kete bin xizmeta gelekî û netewekî? Encamên ku hun ji vê derbixin hene. Weke din divê em nejîn. Pirsgirêka me ya "çawa bijîn?" gelekî cidî ye. Ez naxwazim zêde nêzîkbûnên li ser rastiya we ferz bikim. Bi qasî ku min pêwendîdar dike, ez pêşniyariyên xwe yên hizir û jiyanê pêşkeş dikim.

Jineke ku kesayeteke xwe nîne, ji bo min zêde tiştekî rave nake. Jineke gerstêr ku dinyayek û rastiyeke wê nîne, ji bo min heqaret û îşkenceya jiyanê ye. Ger îro ez ez im, hindekî jî bi riya vê nêzîkbûnê ye. Tu caran ji bo xwe ne koleyekê layiq dibînim, ne jî weke ku gelekî tê jiyîn xwe dikim dîlê têkîliyên ketî. Min çalakiya xwe ya mezin û jîrbûna xwe ya exlaqî wiha bi pêş xist. Ez dixwazim bi we re hetanî dawiyê ji dil bim. Ger hun balê li vê bikişînin, li vê derê helwestên ku pêşketina civaka sibehê tê nîşandan. Asta vê gavê heye, civaka ku sibehê pêk were ye. Ez weke şexs nêzîk nabim. Ger ez ez bim, ger ezê xwe veguherînime civakeke azad divê hîn ji niha ve ez xwe di têkîliyên bi we re de bipeyitînim. Rêbertiyeke bi biryar encax dikare xwe wisa nîşan bide û divê hun bikaribin vê ji her kesekî bixwazin. Her kesekî ku we vedixwîne erk û şer an jî her kesekî hun pê re şer dimeşînin re civak çawa tê pêkanîn? Bi rastî jî gelo ma gelekî jîrbûneke wê ya wisa heye? Ger wisa be hun dikarin bimeşin. Berovajî hun maceraperestek in, hun rêwiyên jiyaneke ku dawiya wê nediyar e û dê wenda bibe û biçeye ne.

Ji bo çi hun ev qasî li hemberî asta azadiyê bêxem dimînin, têkîliyan ev qasî ji nedîtî ve tên? Di rastiyê de hun bi vê ve xirabiya herî mezin li xwe jî dikin. Zayenda we bi xwe zayendeke bi lenet nîne. Ger hun zayendeke ku pê re bi rûmet were jiyîn bin, wê demê pêwîste hun bi xwe dinyaya xwe xeyal bikin û vê pêk bînin. Kesayeteke ku gelekî bi zilam ve hatiye girêdan, heta kesayeteke gerstêr ku di bin serdestiya wî de teşe girtiye, bi temamî tune ye. Hun ji bo vê bi qasî hun dixwazin bibêjin, "namûs" an jî "jina baş a mêrê xwe, keça baş a bav û diya xwe" ev ji aliyê zanistiya azadiyê ve tunebûnek e. Misoger divê helwesteke we jî ya exlaqî, exlaqeke we ya azadiyê û rêgezên we yên ku vê dişopîne hebe. Bi we hatiye hînkirin û gotin "jina baş wiha dibe, wisa dibe" ev tişta pîvanên exlaq ên kevneşopan û klasîk ku bicih

bûne gotiye ne. Di nava van de her cureyê berjewendiyên zordestiyê hene. Weke zarokan hun hatine xapandin û bi wir ve hatine girêdan. Divê mirov li hemberî vê rêzdar nebe.

Dibe ku jiyana me ji bo yên hînî gelekî dûzjiyînê bûne pir berovajî be. Dema ku hindekî fîzîka we pêş ket yekcar hun dixwazin li gor kevneşopan serê we were girêdan. Gelo “serîgirêdan” gelekî rast e? Gelo gelekî ji bo pêşketinê dibe hewldaneke vekirî? Gelo jina ku bi mala xwe ve û malbata xwe girêdayî ye exlaqa rast temsîl dike? Civateke şervan a ku mirov nikare xeyal jî bike, mijara gotinê ye. Ev nakeve hizrên gelek kesan. Lê belê ji bo bersivdana pirsgirêkên bingehîn ên dîrokî ev jiyan jêneger e. Ger vîneke we ya serbixwe nebe, hîn di donzdeh saliya we de dê serê we were girêdan û mirov nikare bi we re biaxive. Jixwe hun tune ne. Encax hun bikaribin bibin ên kesên din. Ew dikarin her tiştekî bi navê we biaxivin.

Hun niha tune nînin, hun zêde nehatine girêdan, rastiyeke ku ez xwedî rêz dibînim jî ev e. Di civakan de, di ciwatan de, zêde mafê gotinê nadin pîrejinan. Her dem dibêjin “bi hevîrê destên xwe tevlî nebe, teqez tu yê kesên din î, ma tu çi diaxivî?” ev yek ne rast e. Ya herî xirab jî di vê jiyanê de hest miriye û evîn nîne.

Şoreşa Rêbertiyê di heman demê de şoreşeke evînê ye. Mijareke din a ku hêzên dagirker û komkujên wehş bi serxistine jî tu şop ji evînê û hestan nehiştine. Çalakiya me çalakiyeke mezin a azwerî û evînê ye. Hun bawer dikin ku hun gelekî hestyar in. Lê belê dema ku we asta me ya hest û ya xwe anî gel hev hunê bibînin ku çi qasî hun lewaz in. Heta mejiyê hestiyên xwe bi her tiştekî, bi axa dayik, bi rastiya gel, rêhevaltiyê û erkên bingehîn ve girêdanî hestan dike xwedî hêz. Kî çi qasî bihêz e? Asta we çi rave dike? Dema dor hate gotinên erzan her kes diaxive, ez tu caran naxwazim kesek hêsrên çavan birijîne. Lê belê şiyarbûna herî mezin û jiyana hestiyarî em temsîl dikin. Ez ji hestên erzan nefretê dikim. Yekcar girîn û rijandina hêsran diyardeya neçariyê ye û taybetmendiya kesayeta jinitiyê ye. Cihekî min di dinyayeke wiha de nabe.

Em ji bo çi we jinan li gor hêza zilam a kevneşop exlaq û zagonên wî we bi xwe ve girêdayî bihêlin? Di felsefeya min û helwesta min a exlaqî de ji vê re cih nîne. Bi şêwazeke tê fêmkirin, hişyar û hîskar û hetanî dawiyê pêşketî ve têkîlî bi dest girtin li gor min rûmetir û nirxê xwe yê exlaqî bilindtir e. Ez hêvî dikim ku hun hindekî vê yekê fêm bikin. Dayîka min ji min re digot "tu ji min re çar metre paç nakirî" min hindek pere qezenc dikir, lê belê min kirîna paç qet neanî bîra xwe. Ji ber ku di helwesta min a exlaqî de mirovan bi çar metre paç ve mûkafat kirin zêde xwedî nirx nîne. Lê belê asta exlaqî ya dayîka min wiha dida gotin. Asoya wê têr nake ku ezê bikaribim bibim yekî binirxtir, diyariyên baştir pêşkeş bikim. Bîra wê ev tişt nedigirtin. Dayîkek, jinek, dostekî xwedî nirx û rêhevalek bi diyariyeke madî têrkirin, di bîra min re derbas nabe. Min hizrên mezin, hîsên mezin, xebatên mezin, heta şer ferz kir. Ev rê li ber bihevrebûneke mezintir vedike. Ew ezê ku şer li ser we ferz dikim, dibe ku li hemberî we ji serdestiya herî bihêz, xwedîhêz im. Şer fedakariyê dixwaze, dibe ku bi pereyan, bi zagonên felsefî û exlaqî bi sedan sal in, pêş dikevin ve jin kontrolkirin gengaz be. Lê belê dîsa jî ev gelekî zehmet e. Her dem dê helwestên durû derbikevine holê. Zilam li hemberî jin, jin li hemberî zilam dê durû nêzîk bibe. Nikarin di nava malbatekê de jî têkîliyeke saxlem bi pêş bixin.

Di nava tekoşînê de têkîliyên gelekî xwerû û bi mirinî jî derdikevine holê. Ne girêdayîbûn ez dibêjim girêdanî. Di heman demê de ne yek, bi hezaran têkîliyên girêdaniyê pêk tên. Ji ber ku ji pêdîviyeke gelekî bingehîn a di xwezayiya we re bersiv tê dayîn, ev pêk tê. Qaşo ew jin û mêrên hev gelekî diecibînin, taktîkên rojane ku bi erzanî diecibînin û dikin dibêjin ew kêfxweş in. Ev kêfxweşiyeke bêast e. Dîsa rexmî ku em dibêjin, pêwîst e hun bi mirinî girêdayî bin û her tiştê xwe feda bikin, divê em bilindtir bibin, gelo xwe wendakirina we tê çi wateyê?

Hindek bi pereyan, hindek jî xwe dispêrên sermaya xwe ya jinê û dibêjin, em xwedî hêz in. Yê ku zilamên bi pere û artêş in, di wê astê de diyar dikin ku xwedî hêz in. Pîvana hêzbûnê ya di artêşan de bi zilam û jinên ku bi xwe ve girêdayî ne ve tê pîvan. Çi qas kes bi xwe ve cewherî girêdayî hebe hun

ew qasî xwedî hêz in. Dibe ev zarok hevjîn û xizim bin. Lê belê girêdaniya herî bihêz, girêdaniya fedayîtiyê ye, girêdaniya egîdiyê ye. Di me de ev ast hindekî pêk hatiye. Ger hun balê lê bikişînin, di pîvanên we de egîdî heye. Bipîvin di rastiyê de hun wiha ne yan nebin jî hun neçarin wiha bin. Bi rengekî din girêdaniya we nayê qebûlkirin. Civaka nû wiha teşe digre, asta têkîliya nû wiha tê diyarkirin. Dibe ku tiştên hatine kirin pêşketineke bisînor derbixe holê. Lê belê ger were israrkirin, ev misoger asta civakeke nû ye. Ger hun xwestekên xwe diyar bikin, em dikarin zemîn pêşkeş bikin, nêvengê û mercan bigihînin. Lê belê yê ku pêwîste vîna xwe bide axaftin jî hun in. Di mijara dinyayeke çawa, pergala têkîliyeke çawa de teqez divê hun xwedî îdîa bin. Bi ferzkirinên yekalî ve jiyan nayê sererastkirin. Ev dê gelekî xeter be jî. Jineke ku her tiştê wê li gor zilam hatiye amadekirin dê xizmetê ji koletiyê re bike. Rey û daxwazên jinê zilam diyar dike. Ji ber ku jin naxive, jin helwest diyar nake, jina herî baş jî bi mezin, kek, bav an jî bi mêrê xwe ve girêdayî ye.

Civaka Tirkiyê, gelê li Kurdistan'ê bêziman li hemberî faşîzmeke herî barbar jî bêbertek hatiye hiştin. Dibe ku ev yek ji ber vê rewşa jinitiyê ye. Niha ev tên derbaskirin. Ev bi temamî pêvajoyeke şoreşî ye, tiştê ku ji bo me pêwîst e jî ev e. Dibe ku ji ber we ji evînê zêde nesîbê xwe negirtiye, dikarin me nebaş bibînin, ji ber ku hun di bin pergal û statûkoyê de mezin bûne. Hun nikarin me fêm bikin. Lê belê ez ziraviyeke mezin nîşanî vê didim. Ez nikarim bi şêwaza ku hatiye hînbûn ve bimeşim, nikarim bijîm zêde nikarim ezez bim, bi hesteke ji rêzê ve nikarim xwe têr bibînim. Hela ev Rêbertî hêviya herî bingehîn a netewê be, temsîlkarê îdîayên herî pêş de be, nikare ji rêzê be, nikare xwe bi hestên ji rêzê ve têr bibîne. Em jî dixwazin hindekî wisa bin. Gelo kî bêevîniyê li ser we ferz dike? Ez behsa sewdaseriyê nakim, asta we ya têkîliyê ji min re gelekî hêjar tê. Di vê wateyê de ez çêbûme hetanî niha nikarim li hemberî we rêzdar bim. Gelo ez yekî ku xwe gelekî diecîbînim e? Gelo ez we gelekî dihesûdim? Ez bawer nakim tiştên wiha hebin. Mirov dikare bi rihetî bibêje ku ez gelekî tevlî dibim. Dibe ku hun jî li rewşa min matmayî bin, bikenin û bibêjin "ev

mirovekî çawa ye?” Lê belê jî bîr nekin, gelekî me yê wisa heye ku di cîhanê de yê ku bişibê nehatiye dîtin. Jiyaneke me ya wisa heye ku tiştekî ku ji dînkirinê zêdetir bide nîne. Ez cuda nebim, cudabûna xwe çawa daneynim holê, vê çawa derbas nekim? Ez çawa weke we ji rêzêbûyînê layiqê xwe bibînim?

Ez erzan nagrîm, naqêrim. Lê belê hun hêrsa min a mezin jî dizanin. Ew girîna mezin a serîhildana destpêkê de hemû gund rakire ser piyan. Di serî de mirovên ku em gelekî pê ve girêdayîbûn, gelo em kêm girêdayî nirxên malbatê bûn? Naxêr. Bîranînên tu kesî bi qasî yên min nû û zindî nînin. Ez ji bo wan dijîm. Ez gelekî bi ser malbatê de çûm. Min ji birayekî biçûk, dibe ku ji bo we bêwate be, cihê wî yê di çîrokê de jî behs kir. Dem bi dem ez bi bîr tînim, dibe ku hemû zarok hindekî wisa ne. Çend gotinên zarokan, çend tevgerên wan ji bo min rê li ber hestên herî pîroz vedike. Hun jî bawer dikin ku zarokan gelekî hez dikin. Lê belê pêwîst e mirov ji we bipirse gelo hun ji bo wan çi dikin? Gelo hun ji bo rewşa wan a gelekî ketiye, gelekî hêjar e çi qasî çare ne? Min di temenekî gelekî zû de ji dayîk û bavê xwe re got, di şûna zarokê min ên weke yên we hebin, bila qet nebin baştir e. Dinyayeke ku tiştek pêşkeş nekiriye, tu derfet nedan ji zarokan re rewa dîtin, xirabiya herî mezin ku bi zarokan were kirine. Hestên me yên wiha jî hene.

Min keçikên ciwan ên weke we gelekî dîtin. Ez îro gelekî nêzîkî we me. Lê belê bi salan min got, ev keçik kî ye. Divê ez wê çawa fêm bikim, li gor zagonan divê mirov çawa nêzîk bibe? Ango ji mercên ku gotina tu çawayî jî ne gengaz bû, em hatine van rojan. Min ji bo wan got divê em dinyayeke çawa, jiyaneke çawa ava bikin? Di encamê de me ev kar anî heta gavavêtina we ya azad. Lê belê zilamê me yê navdar jinekê dixe çavên xwe ji bo wê dimire, dikuje, her tiştê xwe bi wê ve girê dide û tune dibe. Min ev tişt nekir. Heta cewher ez daketim. Ger jin heyîneke hewce ye, jê gelek were hezkirin û pê ve were girêdan be, divê mirov rastiya wê jî heta dawiyê bizanibe.

Pêşketin we ji nêz ve pêwendîdar dikin. Ez tenê ji bo hêza we ya hizirandinê derbixim holê û hestên we yên herî pîroz şiyar bikim van tiştan

diyar dikim. Tercîh û xwestek a we ye. Tiştên layiqê we derxistina holê û pêkanîn bi ast û cidiyeta we ve girêdayî ye. Hemû tiştên ku em dikin dilsozmayîn, bi mirovên ku ziman û çavên wan hene re, bi jinên wiha re jiyîn e. Dibe ku ev gelekî zehmet be, lê belê em dixwazin vê pêk bînin. Ji ber wê jî divê em bi kêmanî qasî şer cih bidin têkîliyên xwedî ast. Rastiya Rêbertiyê ji vê re rê vekiriye. Gelo, bi wiha nêzîkbûnê ve em we gelekî tengav dikin? Gelo tekoşînê bi van jinan re meşandin weke gelek bawer dikin, bargiraniyek e? Gelo we jî bi vê şêwazê xistina bin barekî giran e? Gotin a we ye. Bila mirov hetanî dawiyê biaxivin lê belê bila ev maf hetanî dawiyê ji jinê re jî were naskirin.

## Li gel min bi cewherê jinê re jîyaneke xwedî ast pêşxistin azweriyek e

Ez ji, xwe xwediyê jinê yê xwezayî dîtina zilam nefretê dikim. Tu jin divê ji min helwesteke weke xwediyekî xwezayî hêvî neke. Dibe ku di vê mijarê de mirovekî herî neçar im. Dibe ku ez xwediyê her tiştekî bim lê belê xwedîbûyîna jinekê tu caran di aqilê xwe re jî derbas nakim. Ez vê weke bêexlaqî û li hemberî xwe weke tawanekê dibînim. Bi cewherê hemû jinan re pêşxistina jiyaneke xwedî ast, di min de azweriyek e. Di vir de jî milkiyet û çînê nas nakim. Ger jinên bi milkiyet û çîn hebin, ez dixwazim wan hemûyan ji vê bikişînim. Jixwe me hun ji van sînoran kişandine nêvenga azadiyê. Ev dibe encamên xwezayî yên ku xwestek û lêgerînên min ên jinê ye. Ne hun bi hêsanî bi xwedîbûyînê digerin, ne jî kesek tîne bîra xwe ku bibe xwediyê we. Bi tenê dikarin bibin heval. Ev xweşiktir e. Ez xwe li jinê ferzkirinê nefret dikim û ferzkirina bêmaf weke ketîbûneke mezin dihesibînim. Lê belê ji jineke ku xwe bispêre şêwaza têkîliya bimilkiyet û hemû paşdebûna xwe û kêmbûna xwe ferzkirinê jî nefret dikim û vê jî weke ketîbûnekê bi nav dikim.

Me di dîroka mirovahiyê de bi jinê re meşeke bi îdîa pêk anî. Ji ber ku îdîaya we ya gihiştina jina azad heye, mirov dikare bi we ewle be, tevlî bibe bixwaze dinyaya xwe parve bike. Li gor min ev a helal e. Ya heram cihê ku

milkiyetê mirov çarçove kiriye ye. Ger em ji vê rizgarbûnê pêk bînin, wê demê dibe ku hestên pîroz pêş bikeve, vîn rabe ser piyan û hizirandin biherike. Gelo ma min hun gelekî tengav kirine? Lê belê ji bîr nekin ku bi qasî ku tu kes ne bi we re ye ez bi we re me. Ez dikarim îdîa bikim ku ji yê hun jê hez dikin zêdetir ez ê têm hezkirin im, him jî yê hez dikim e. Hatiye peyitandin ku ez yê ku rêhevalê xwe yê jin fêm dikim û dixwazim em bi hev re bimeşin. Ji ber wê jî dema ku hun gelekî tengav bûn û we got, “ev çi kare hate serê me?” xirab nebînin. Sedemê wê ne ez im. Sedemê wê kesayeta we ya ku bi sedan sal in, hatiye wendakirin e, rastiya we ya civakî ku xwe wendakiriye ye, gel e, azadiya gel e. Ez dixwazim tiştê ku we wendakiriye hindekî zindî bikim. Gelo hun ji me çi dixwazin? Gelo we evîn, ewlekarî, bawerî û hizirandin xwest û we di me de ew nedîtin? Em di van hemûyan de xwedî îdîa ne. Divê hun xwestekên xwe pêş bixin û bigihênin hêza nêzîkbûna van tiştan.

Ne bi xeyalên gelekî bêwate, ne jî qet nayê gihiştin nêzîkî me nebin. Rêbertî pergaleke nirxan e. Mirov dikare bigihê, ne tenê li ser jinan, li ser vî gelê ku em bi navê wî tevgerê dimeşînin, li ser milîtanên ku em dixwazin bikin hêzeke dijwar, bêguman emê bibin hêzek. Ji ber ku weke din şoreş nameşe. Lê belê ew meş, di heman demê de meşa we ya ku hun gelekî pêdîviyê pê dibînin û hema ji her tiştî pêşdetir e ya şeref û rûmetê ye. Jixwe ger ew wiha nebûya we nedikarî rojekê jî mecal bidîta û nirx bidayê. Tê wê wateyê ku em di riya rast de ne. Ya esas evîna min û azweriyên min ên azadiyê ne. Weke ku bi xwedê tên girêdan, hun jin jî ev gel jî pêwîstiya bi vê girêdaniyê dibîne. Dibe ku ez ji we hemûyan dijwartir bi vê rêgezê ve hatime girêdan. Ev xeyal xeyalên kê ne, ev evîn evîna kê ye? Ez faniyek im, lê belê hest û hizrên min wê ber bi sedan salan ve biherike û biçe. Pêwendiya vê bi kesayet re nîne. Bi temamî kesayetekî gel, perçeyekî mirovahiyê ya bi nirx e. Me xwest em vê rave bikin ev yek tê qebûlkirin. Weke ku layiqê min hatiye dîtin, bêyî ku birevim dixwazim vê temsîl bikim.

Di exlaqê azadiyê de ji beriya her tiştî xwedî hêzbûn û azadbûyîna vînên beramberî hev hene. Exlaqê azadiyê, şêweyên girêdaniyên koletiyê qebûl

nake. Ji ber ku mirov gelekî lewaz in ne, ji ber ku dixwazin bihêz bin, bi vê ve têne girêdan. Ji ber gelekî bi ajoyên xwe ve girêdayî ne na, li gor pîrozbûyîna azwerî û hestên xwe girêdaniyê esas digrin. Ji bo ku li gor exlaqa gelekî fermî û kevneşopî malekê ava bikin, malbatekê û ku armanca wê ji bo zarokan girêdaniyekî pêşxistinê esas nagrin. Ji bo ku hêzê bidin zagonên bingehîn ên civakê pêwîstiya tevlîbûna hev dihesin. Di têkîliyan de girîn û gazind nabe. Bi girêdaniya mekanîzmayên venêrîna civakî ve jî tevlîbûna têkîliyan nabe mijara gotinê. Taybetmendiya herî bingehîn a vê exlaqê weke ku hesteke estetîk a pêşketî esas digre, di heman demê de parvekirina xweşikbûnê ye jî. Ji bo derbaskirina zehmetiyên mezin jî dibe ku ev girêdanî hewce be. Ji bo ku têkîliya her kesekî heye, bila têkîliya min jî hebe, ez têkîliyê ava nakim. Ger bal lê were kişandin, ev dikeve pileya girêdaniyeke evînî. Yê ku asta xwedayîbûnê tengav dike evîna pîroz e. Hêza we ji bo evînên pîroz ên xwedayî nîne. Lê belê em neçar in wiha bin.

Ez nirxeke mezin didim xebatên jinê. Tu zilamekî bi qasî min xwe nedaye têkîlî û xebatên jinê. Ji gelekî weke Kurdan ku gelekî ketiye, ji hizir û hest dûr ketiye, pêşxistina jinên wiha, ji bo raberkirina mezinbûna vê xebatê têr dike. Zilam an bi jina xwe re yan keça xwe yan jî bi dostekî xwe re pêwendî dikin. Ango jinên ku pê re pêwendiyê dikin ji hêjmara tiliyên destekî derbas nabin û tu zilam nikare vê yekê derbas bike. Têkîliyên ku bi pêş dixin jî bi giştî têkîliyên serdestiyê ne. Profesorekî ispat kiriye ku qaşo zilamek dikare di heman demê de ji du jinan hez bike. Vî tiştî weke dîtineke gelekî mezin dide nîşandan. Ez jî behsa ji hemû jinan hezkirinê dikim. Nêrînên profesor nîşan dide ku ezeziyet çi qasî li pêş e. Ger ez ji hemû jinên ku werin hezkirin hez nekim ezê xwe kêm bibînim. Asta min hindekî wiha ye.

Di dijînameya bi navê "ayetên Apo" de ez ji ber ji jinan hez dikim temê tawanbarkirin. Selîm Çûrûkkaya yê ku ev nivîsandiye, dema ku tevlî xebatên me yên komê yên destpêkê bû du herêmên me yên ku bi hev germ nedibûn hebûn. Ji beşa Çewlikê Zazayên Sunî û ji beşa Dêrsimê Kurdên Elewî hev qebûl nedikirin. Koma me ji her du cihan jî mirov xistin nava

xwe. Ji van deran keçikekê û zilamekî têkîlî ava kirin û zewicîn. Her du jî ji aliyê dijmin ve hatin girtin. Şahidan digotin, “di astekê de bûn ku ji bo vê têkîliyê dikarîbûn çil caran li ber lingên dijmin bigerîbana.” Weke ku ji bo hemû mirovên xwe me ji bo van jî bawer kir ku pêwîste ev têkîlî bibe têkîliya partiyê, ya welatparêziyê, ji bo jin û zilam jî divê bibe têkîliyeke rast û me xwest em rêgezê her dem pêk bînin. Me got bila milîtanên partiyê girêdaniyê di nirxên bingehîn de pêk bînin û wê ezezîbûna gelekî kevin bûye derbas bikin. Li hemberî vê bertekeke mezin raber dikin û dibêjin, “partî me ji me didize, me xerîb dike.” Di rastiyê de ev dereweke mezin e. Hêza ku van her du beşan digihîne hev partî ye. Yê ku durûtiyê dike, xiyanetê dike jî ew bi xwe ye. Hemû nirxên pîroz, bin pê dikin û dixwazin bi riya partiyê ezezîbûna xwe rizgar bikin.

Ji ber ku dizane ez hindekî hêza rêvebirina vî tiştî me jî qaşo pirtukeke bi navê “Ayetên Apo” derxist. Ez vî tiştî ji ber ku gelekî girîng e na, ji bo ku ezeziyeteke gelekî xirab re bibe mînak diyar dikim. Bêyî ku ez jinekê jî zilamekî jî di nava hindek hestên bingehîn de bihelînim, bi armancên rizgariya civakî û netewî û bi şerê rizgariyê ve girê bidim, qebûlkirina min a wan ne gengaz e. Ez ji bo vî gelî dixwazim cara yekê van tiştan pêk bînim. Ji ber ku bi vî gelî wiha tê fêrkirin “xwedîderketina pisîk û seyên xwe rêgeza herî pîroz e” xwedîbûna jina xwe û mêrê xwe jî qaşo rêgeza herî pîroz e. Ez jî vî tiştî weke ketîbûneke herî mezin dinirxînim. Muxalifên Apo jî ji ber vê sedemê derdikevine holê.

Ez nikarim di hezkirinê de pîrozbûnê nejîm. Li gor min pêwendî nîşan nedana pirsgirêkên zayenda jinê û li ser hindek riyên çareseriyê lê hûr nebûn, tê wateya şoreşgeriyeke kêm. Hesteke gelekî balkêş e, min hetanî niha xwe weke mêrekî nedît. Ez naxwazim tu kesî jî weke jineke erzan bibînim. Van hestên wiha layiqê xwe nabînim. Xweşikbûnekî, her gotineke xweşik çalakiyeke xweşik, çi tiştê ku nirxê xwe yê estetîk a xweşik hebe, parvekirina wê di min de asta azweriyê de ye. Vaye exlaq ev e.

Ji ber ku ez mirovekî azad im, ên din di derbarê min de çi nivîsîne, çi gotine ne di xema min de ye. Dibe ku berê ez hindekî ditirsiyam, lê belê

niha qet natirsim. Em nikarin bibêjin ku berê jî tirs hebû, ji ber zêde xwedî hêz nebûm, min zêde nedida derve, lê belê ez niha didime derve. Divê mirov ne tenê ji bo xwe, ji bo hev jî jiyînê bizanibe. Bi qasî ji bo hev jiyînê bizanibin, bi qasî bixwazin pêşketina civakî, dikarin bi pêş bixin. Em rewşeke awarte dijîn. Hun ne dikarin bi têkîliyên civakî yên heyî ve, ne jî pergala dahatûya pêkwere ve dikarin bijîn. Em vê gavê rewşeke ku ya kevin bi rengekî awarte, bi lez ji hev cihê dibe yê nû jî bi rengê hatiye diyarkirin ve xwe derdixe holê dijîn. Di vir de her tişt bi qasî ji aliyekî ve yê kevin dirûxîne, dahatû avakirinê jî esas digre. Zimanê van dibe û li hevketina vê dê bijî. Di kesayetên we de ev tişt zêde nehatine fêmkirin. Hun her dem dixwazin ê asayî bijîn. Dema we nekarî hun ê asayî bijîn, hun dixwazin weke xeyalî bijîn. Jiyana we yan gelekî xeyalî ye yan jî asta paşerojê ya gelekî asayî ye. Hun di van her du xalan de wenda dikin. We şêwazê hûr a pêvajoya awarte tu caran bi xwe neda qebûlkirin û pejirandin. Di we de xeyalîbûn î ji rêzêbûn di nava hev de ye. Vaye di vê xalê de hun tengav dibin.

Rewşa min jî gelekî cuda ye. Teqez pêwîste hun çîroka me baş hîn bibin. Çîrok balkêş e û hînkar e. Mînak lêkolîna we ya asta min a hest gelekî girîng e. Dahûraninda asta wê hestê ber bi afirandina netewekê ve bir. Ev aliyên we nînin. Koletî, pûçbûn û kirêtiya di têkîliyên we de diherike û diçe. Hun vê ji xwe re nakin pirsgirêk. Mînak pîvanên we yên qebûl û redê bi pêş neketine. Di we de bûyera qebûl û redê tevlîhev e. Tiştê ku we red kiriye, hun dikarin roja din qebûl bikin. Di me de pêşketina qebûl û redê pêşdeçûyîna cihêkirinê ya di asta pêş de mijara gotinê ye. Di vê têkîliyê de jî di riya qebûl û redê de şerekî mezin hate meşandin. Her tişt lêyîstokeke sîxuriyê nebû. Dilsozî û welatparêziya destpêkê hetanî dawiyê bû, qezenckirina têkîliyê hetanî dawiyê bû. Lê belê du armancên berovajî hebûn. Yêkê dixwast bi dijwarî berlingên KT yê bigere, yê din jî dixwast bi dijwarî ji wê rizgar bike. Bêguman ev pevçûneke mezin bû. Tu têkîliyên hest û evînê jî nedikarî ve rizgar bike. Jixwe di vê têkîliyê de, di vê hestiyariyê de evîn û girêdanî bi pêş nakeve. Berovajî wê şev bi pêş bikeve.

Di vir de hest û hezkirin dê veguherin kîn û hêrsê, girêdanî dê veguhere dijberiyê. Hest çi qasî bihêzbin, ew qasî jî dê veguhere şerekî mezin. Dê encam bibe weke ku min kiriye.

Pêvajoyên şoreşan, pêvajoyên ku him jiyîna hizir û hestên mezin in û him jî pevçîna wan in. Ên ku ne wiha ne her dem hîs dikin ku di bin lingên şoreşê de dixuşikin û jiyan ji bo wan hîn xirabtir dibe. Ez rastiya şoreşê diyar dikim, ger hêza we hebe em bi hev re bimeşin, em nikarin ê hêsan hilbijêrin. Ger min ê hêsan bijiya, ma gelo ev tekoşîn rojekê li ser piyan dima? Divê em li welat başî û xweşibînê pîroz bikin û em li wir bigihên hêza jiyanê. Şoreş hindekî ji bo vê ye.

Hunê di şoreşê de zilamê xwe bi xwe biafirînin, gelo hunê çawa zilam biafirînin? Berî her tiştî gelo hunê çi qasî xwe biafirînin? Jina ku xwe neafirîne, afirandina zilam li aliyekî bimîne, nikare xwe ji evd û kolebûna wî rizgar bike. Ev kar, karekî lêhûrbûnê ye û hunê ji bo vê hewl bidin. Ciwaniya xwe hindekî ji bo vê feda bikin. Di vê mijarê de hindekî xwe ava bikin, xwe bi çek bikin. Encax hun dikarin wisa zilam veguherînin. Ez çawa ku jinê bi hêsanî naecibînim, hunê jî zilam bi hêsanî ne ecibînin. Ger min bi hêsanî jin ecibandiba, yek jineke xwedî nirx û pîvanên Rêbertiyê dernedikete holê. Hunê jî hindekî vî tiştî ji bo xwe esas bigrin. Jina ku bi xwe ewle ye, divê xwe baş plan bike. Ez tehrîka xweşikbûnê û pîroziya hest a di we de pêş dixim. Ez we vedixwînim egîdiyê. Ev hest û hizrên we gur dike. Dibe ku ji nava we gelek qehreman derbikevin. Hun jî vê rêbazê pêk bînin. Dema hun bibêjin, “ez koleyê te me, nizanim çi yê te me” hunê di serî de wenda bikin. Gelo dema zilamtî tê gotin, behsa çi tê kirin? Ger hun berî vê pirsê bipirsîn jî bibêjin “zilamê ku min xwe dayê” tê wê wateyê ku hun tune bûn. Ji ber ku zilamê di civakê de zilamê ku yê we di heftiyekê de tune bike ye. Ji bo wê jî xwedî plan bin, xwe bi hêsanî nedin dîlkirin.

Ger ez ji bo ku xwe bi we bidim qebûlkirin bi ziravî amade dikim, sedemeke vê heye. Hun jî di mijara wiha bûyînê de xwedî îdîa bin. Tişta herî xirab e, bi erzanî û bi koletî girêdan e. Ez nabêjim bila hezkirin û rêhevaltî nebe, bi kesayet û nasnameya xwe ve vê têkîliyê ji bo vê jî xwe

biafirînin. Hun çi qasî bikaribin bi bandor, bi plan û bi tevdîr bin tê wê wateyê ku hun ew qasî şoreşger in. Naxwe dema we got, “em çi qasî kole ne, em çi qasî jina mêrê xwe ne” hunê şoreşê paş ve bibin. Ji ber wê jî nirxa zemînê azadiyê, rêgeza azadiyê baş bizanibin. Dahurandinên ku min ji bo wê pêş xistiye û hêza partiyê baş binirxînin. Xwe bi jêhatiyên xwe yên afirandêr ve bikin yek. Bi vî rengî hun dikarin di zilam de asteke diyar biafirînin. Dema ez dibêjim, zilamê xwe biafirînin, ez nabêjim zilamekî li gor xwe biafirînin. Ez dibêjim asta zilamtiya ku tê qebûlkirin biafirînin. Hindekî hemû zilaman biafirînin. Ez jî him zilam û him jî jinê diafirînim.

Em destpêkên xweşik pêk tînin û misoger bi pêş dikevin. Ya herî girîng jî di têkîliyan de pêşketin heye. Dema ku mirov dibêje jin, hest û hezkirin tên bîra mirov. Ez vê bi asteke guhertîtir bi dest digrim. Min ji bo vê got, “rizgariya evînê.” Divê hun bizanibin ku ka ev yek tê çi wateyê. Ya herî giring jî ji pirsa “jiyaneke çawa” re eniya xwe ve pêwîste bersivên we yên gelekî hûrbûyî hebin. Hun dikarin li ser vê bi salan nîqaş bikin. Civakeke çawa, siyaseteke çawa, artêşeke çawa, hesteke çawa, têkîliyeke taybet û giştî ya çawa, hezkirineke çawa, ecibandineke çawa, zayendîtiyeke çawa? Hun dikarin van hemû mijaran nîqaş bikin û bigihên zelaliyekê. Ev him mafê we ye û him jî erka we ye.

Girîngiya mijarê bênîqaş e. Şoreşa jinê mijara sedsala 21’ê ye. Ger mirovahî dê piştî vê gavavêtineke girîng pêk bîne, dê vê kûrbûnê di asta jinê de bi dest bixe. Rexmî ku em gelekî ji her alî ve paş ve hatine, em şoreşekî ji hemû gelan pêşdetir kûr dikin. Ev jî ji bo me kêfxweşiyek e.

Her şoreşeke dîrokî di serî de bi kesên kêm û lewaz ve, di axên hêjar de pêş dikeve. Şoreşa Kurdistan’ê jî hindekî wiha ye. Lê belê ev şoreş hindek nirxên bingehîn ên mirov pêdîvî pê hene, di cewherê xwe de dide jiyîn. Perçeyekî vê yê herî girîng jî şoreşa jinê ye.

Em dizanin ku hun bi zehmetiyan re rûbirû ne. Hun ji nava mercên jiyana gelekî cuda û awarte tên. Lê belê şoreşa jinê gelekî giring e, ji bo dahatû û serkeftina şoreşekê ye. Li ser vê bingehê ez bi pêşketina konferansên jinê jî bawer dikim. Kongreya we ya di asta netewî de jî wê rê li ber pêşketineke

zêdetir vebike. Dê her biçe tevgera jina azad pêşketinê pêk bîne. Xebatên we yên di vir de perçeyekî vê yê girîng e. Heta xwedî naverokekî ye û wê ji bo şoreşên din bibe çavkaniyek. Pêwendiya me jî ji bo vê gelekî bilind e.

Ez xwe dispêrim van hemû tiştan û diyar dikim ku em him destpêkên saxlem pêk tînin û him em ji rastbûna riya xwe ewle ne. Em bi asta xwe ya heyî ve jî ji hev fêm dikin. Li gor pêvajoyên kevin, rêzdarî û hezkirina me gelekî pêş ketiye, divê em di vê de bi israrbin. Ev dê me bibe afirandin û hevparkirina nirxên azad, wekhev û ya herî girîng jî ya xweşik. Jixwe şoreş amrazê pêkanîna vê ye. Bi dijwarî pêdiviya we bi vê heye. Di vê wateyê de şoreşa min şoreşeke armancê ye. Şoreşeke bi jinê re jî him pêkanîna ne koletiyê azadiyê, ne kirêtiyê xweşikbûnê, ne şaşitiyê rastiyê ye û him jî şoreşa parvekirinê ye.

**9 Reşemî 1995**

## HER CÎHEKÎ KU JIN LÊ YE, ÇAVKANÎYA JÎYANÊ YE

Dema ku mirov asta pêşketî ya tevlîbûna jinê ji bo refên partiyê û artêşê tîne pêş çavan bi taybetî jin û zilam bandora şêwazên jiyana herî paşketî, ger bi hêz jiya, siyasîbûn zehmet pêş dikeve. Nêzîkbûnên têkîliyê ku nêzîkbûnên kevneşop diyar dike, gelekî paş ve dikişîne, ji bo pêşketina feraseta azadiyê xwe neyînî nîşan dide. Bi vî rengî pêşî li berhemdariya xebatên berfireh digre.

Me di mijarên jiyana di nava partiyê de gelekî pêşketin tomar kirin. Lê belê em hîn jî pirsgirêkên giran dijîn. Em dixwazin jiyanê bi pêş bixin. Ez di wê baweriyê de me ku pêdivî herî zêde di vê mijarê de ye. Ez wisa bawer dikim ku tişta ku di şoreşgerkirina jinê de were balkişandin nêvenga jiyana azad e. Kê çi dibêje bila bibêje, bi kîjan sedemê nêzîk dibe bila nêzîk bibe di rastiyê de tişta ji me re hewce ye jiyana azad û nêvenga tekoşîna azad e. Ji bo vê pêdiviyeke cidî heye û hemû pêşketinên din destpêkê bi destxistina zemîneke wiha ve girêdayî ye. Lê belê tiştê ku ez dibînim, ev tişt nehatiye fêmkirin û nirxê wê nehatiye teqdîrkirin. Ev jî xwe di hemû xebatên din de dide nîşandan. Ez vê jî diyar bikim ku nenaskirina rastiya xwe wê rê li ber nêzîkbûneke gelekî kêm û şaş li hemberê pirsgirêkeke şer a giran vebike ku hunê zehmetiyên herî mezin jî bijîn.

Me demeke dirêj e ev mijara bi dahûrînên berfireh ve ji bo nîqaşê vekir û dahûrand. Lê belê hîn jî hindek hevalên me gelekî şûn vê de dihizirin. Bi qasî ku min nas kiriye hetanî niha wê nêzîkbûneke azadiyê çawa bibe, min bi mînakan ve danî holê. Di vê mijarê de weke ku her kesek di asta cahilekî reş de ye. Jixwe tiştê ku ez wateyê nadimê jî ev e. Em ew qasî ehmeq nînin ku her tiştekî bi têkîliya navbera zayendan ve girêbidin an jî bi qasî ku wê şêwazê têkîliyeke tendurist çawa were pêşxistin neynin ber çavên xwe. Em nikarin ew qasî derveyî jiyanê bin. Rastiya we ya jiyan û têkîliyê xetimiye û rê li ber tengasiyên gelekî mezin vekiriye. Yê ku vê red bike jî nîne.

Her kes dixwaze gav biavêje û bigihê azadiyê. Lê belê her kes nikare rê û rêbazê vê bi dest bixe. Çavkaniya pirsgirêkên we wiha bi pêş dikeve.

Pêşneketina kesayeta we ji ber wê jî pêşneketina rêxistinê çavkaniya xwe ji vir digre. Ger em jinê di asteke nahizire, nikare nîqaş bike û nikare biryarê bide de bigrin dest tu pêşketineke azadiyê tendurist nabe. Ger em bixwazin bi taybetmendiyên koletiyê yên kevneşop ve tevlîhev bikin û binirxînin dîsa jî wê pêşketina azadîxwaz derbeyê bixwe. Di vê wateyê de ji beriya her tiştî divê hun pêdiviya azadiyê baş tespît bikin û pirsa "çawa bijîn" berfireh bipirsin. Ji destpêka temenê xwe hetanî niha min ev pirs dikir, niha jî ez vê pirsê dikim û dixwazim bersivên vê bi pêş bixim. Tişta şerm sergirtina ser pirsgirêkên xwe ye. Hembêzkirina koletiyê ye, xwe spartina siya wê ya bikaprîs û kirêt tênegihiştinê û rewşeke bikompleks û bêrêzdarî jiyîne.

Tu kes nikare înkar bike ku pêdîviyên me bi têkîliyên xwedî rêz heye. Têkîlî gelekî hatine xistin. Tu nirxekî xwe yê rêxistinî û siyasî, rêz û hezkirinê nîne. Her kes weke ku dixwaze dinirxîne û bi kar tîne. Divê ez vekirî bibêjim ku yên ku xwedî rewşeke wisa ne nikarin tu pêşketineke cidî bijîn. Ger hun balê li rastiya Rêbertiyê bikişînin, di vê mijarê de ji jiyana xwe di yek astê de ye. Qebûlkirin û redkirin, rewşa şêlûbûnê zelalkirin, asta bêrêzî û bêhezkiriniyê û dîsa derbaskirina kirêtiyê hindekî pêşxistina xweşikbûnê, kûrjiyîna şêwe û uslûbê vê ji bo pirsa "çawa bijîn?" re dibe bersivek. Hun nikarin van tiştan li aliyekî bihêlin û bibêjin, "ez şervanim, ez azadiyê dixwazim." An jî bêyî ku pêwistiyên vê bînin cih ew kesayeta kevin bi spartina payêyên rêxistinê û domandin weke gotina Xwedê gotina "ez te dadirezînim, şermezar dikim, bi kar tînim" tê wateya ku ji tekoşîna azadiyê tu tiştek fêm nekirine. Hun vê dijîn. Ez fêm nakim ka hun ji bo çi ev qasî ji rêzê nêzî jiyanê dibin. Jixwe yê ku wiha jiyanê înkar dikin û ji rêzê nêzîk dibin di şer de jî, di jiyanê de jî weke kesayetekî ji rê derketî risteke neyînî dilêyîzin.

Divê em bikaribin wate bidin pîroziya jiyanê. Divê em ew bêastiya balkêş a di rastiya jin û zilam de yan jî di vê wateyê de di rastiya civakê de ketina nav çêbûye û nêvenga ku mirov nikare tê de nefesê bistîne, em weke çarenûsê pêşwazî nekin. Divê em bizanibin li hemberî vê hewceye ku şerekî

rast were dayîn. Ez bawer nakim ku yên nizanibin şer bikin ên ku bi bawerî û bi xwe westandinê tekoşîneke pîroz nadin, ji jiyanê tiştekî fêm bikin.

Em demeke dirêj e diyar dikin ku ev xebat gelekî hewce ne û bi serkeftî tên meşandin. Têgihiştin û tevlîbûna vê jî erka we ye. Hun jî dikarin hindekî jina nû, kesayeta mirovê nû, plana berfireh a jiyanê ya wê fêm bikin. Her roj bi şêweyê ku dişibe yê pergalê tê gotin "li vî cihî vî kesî pirsgirêk jiya skandal derkete holê." Di refên me de hevalên me yên niyet pak ku vê gotinê weke şerekî derûnî dijîn kêm nînin. Tam bi şêweyê quşxana paşbêjiyê dikelînin û di vegotinê de dikevine pêşbirkê. Ev bi min gelekî ji rêzê tê. Ma gelo em mirovên ew qasî hêjar, ew qasî ji rêzê ne ku em di têkîliyan de vê bê astiyê bijîn. Rastî hindekî wiha ye.

Li gor feraseta min a sosyalîst ger kesayet azad bin, em ji silavdayîna hev bigrin heta dê çawa ji hev hez bikin, dikarin her tiştekî bi şêwazê herî baş bikin. Ger bi rastî jî sosyalîst bin dikarin bikin. Ji bo çi hunê bi kesekî ku we tunebike re têkîliyê bi pêş bixin? Çi ye PKK yî ye, qaşo gelekî dişibe Rêbertiya partiyê! Ev encax dişibe rewşa artîstên Yeşilçamê. Berê dema ku mirovan ji yekê hez dikir, digotin "ev dişibe filan artîstî", niha jî tê gotin "dişibe Rêbertiyê wî teqlît dike." Ev nabe pîvaneke hezkirinê. Bi taybetî ev yek bi navê min nayê kirin.

Tevgereke ku em dixwazin bi pêş bixin heye. Tevgera jinê jî perçeyekî vê ya girîng e. Divê ez diyar bikim ku di tevgerekê de kombûna ev qas jinê, bûyereke zehmet e û gelek pirsgirêk û xeteriyên vê yên cidî hene. Artêşbûna jinê gaveke cidî ye. Ger bal lê were kişandin hîn em nikarin bikevin jiyana civakî ya asayî. Sedemên vê hene. Bi gotina pêdîviyên xwe ji hev re, em nikarin bi şêweyeke çors ve têkîliyê çareser bikin. Ji ber ku li holê kirêtî heye û ev yek bi temamî çavkaniya xwe ji dagirkeriyê digre. Mirov û têkîlî hatine rewşeke nenasbar. Divê ji beriya têkîliya çors li xweşikbûnê were gerîn. Em li asta pejirînêr a têkîliyê bigerin. Pirsgirêkên me yên wiha hene.

Bi xwe spartina payeya PKK'ê û pêkanîna feodaliyê, teqlîtkirina bûrjûvaziyê bi aqilî nîne. Ger em ji sosyalîzmê bawer dikin, felsefeyek û şêwazeke wê ya têkîliyan heye. Feraseteke xwe ya xweşikbûn û estetîkê

heye. Wisa ye ku ger ev nebin hezkirin nabe, ger ev nebin kesayeta nû bi pêş nakeve. Weke keça malbatê yan jî weke zarokê eşîretê, bi gotina “em girêdayî mezinê xwe ne” ve hun nikarin bigihên tu derê. Ev hebe nebe dişibe şêwazê têkîliya Barzanî û em baş jî dizanin ku ev ber bi ku derê ve jî dibe. Em dixwazin van derbas bikin. Ji ber ku sosyalîst bi jiyanê ve gelekî girêdayî ne. Şer didin ber çavên xwe, wêjevanekî Rusî dibêje, “ji ber ku em ji jiyana azad gelekî hez dikin, me bîst mîlyon mirov şehîd dan.” Gelên Sovyetan di şerê cîhanê yê duyemîn de ev qas şehîd dan. Bêguman şer encax ji bo azadiyê li dij serdestên pergalên koletiyê tê dayîn.

Êdî dema bi dawî anîna hindek tiştan e. Gelo ev çi ne? Di destpêkê de divê di nava me de zilam an jî jinên ku wêrin xapandinê nebin. Êdî emê bizanibin ku her mirovek xwedî rêz e. Êdî divê em bikaribin bidin qebûlkirin ku jin jî xwedî rêz e. Bêguman hun dê vê bi hewldanên xwe ve bidin qebûlkirin. Hun dê gotinên weke “ez bi kar anîm, mijûl kir, xapand, bandor kir, ez xefîl nêzik bîm.” divê êdî bi kar neynin. Divê pîvanên jiyana xwe ya jinê hebe. Jixwe ji bo vê we gav avête şer.

Hun ji dinya serdestiya zilam zerarên mezin dibînin. Bêguman hunê vê sererast bikin. Ger hun neynin pêş çavên xwe ku erkeke we ya wiha heye, dê ji we re bibêjin, “gelo hun ji bo çi hatin?” zilam jî dikarin bi navê we şoreşê bikin. Heta dikarin bibêjin hun bar in jî. Wê demê şûnde ji bo jiyana xwe ya kevin vegerin. Ger hun vê qebûl nakin, çi tiştê ku hun jê ne rihet in, tiştê ku li dijî mafê we yê kesayetê ye û dijî wekhevî û azadiya we ya jiyanê ye, wan bibînin, li hember derbikevin û sererast bikin. Vê jî weke ku ji bavê hêvî dikin, ji dora xwe hêvî nekin. Divêtiyên wê hun bi xwe bi cih bînin. Ez êdî dixwazim ji vê rizgar bibim û di vê mijarê de partiya me bigihînim. Divê tu zilam xwe nespêre erkên xwe, bi zextê û li ser bingehê berjewendiya kesayetan nexe yan jî derfetê nede vî tiştî. Ger di têkîliyan de pîrozî nebe, bavê we be jî cidî negrin. Heta mêrê we be jî, ger ferzkirinên zilam li dijî rêgezên me yên azad in, ma gelo hunê ji bo çi qebûl bikin? Divê em ew girêkên weke “kevneşop wiha ne, ez malê zilam im” êdî derbas bikin û bizanibin nirxên xweşik parve bikin.

Bi tenê redkirin ne, divê em pîvanên xwe yên qebûlkirinê jî bi pêş bixin. Min di vê mijarê de gelek pîvan dan. Hun lê balê nakişînin, lê belê ev pîvan gelekî girîng in. Qebûlkirina zilamekî ya jinekê yan jî ya jinekê bo zilamekî bi pîvanên kevneşop an jî tenê bi ajoyan nabe. Yekê ku li hemberî ajoyên xwe bi binketiye dê perîşan bibe. Yekî ku di bingeh de têkîliyê bi ajoyan ve girê dide nikare nêzîkî pêşketineke cidî ya civakî bibe. Dê encax xayin be, ketî be, tolaz be yan jî bedbext be. Jixwe rastiya civakî ya ku em dijîn jî ev e. Di me de kesekî ku di vê mijarê de jiyaneke ji dijmin re xizmetê dike, ku derbas kiriye weke ku nîne. Em hîn jî ji we hemûyan metirsîdar in. Gelo dê hev çawa bixapînin û werin xapandin? Dê jinbûna xwe çawa bi kar bînin? Gelo dê zilam payeyên xwe di vê mijarê de çawa îstîsmar bikin? Mirov bi qasî li ser vê difikire, ditirse. Lê belê di rastiyê de diviya ku ev gelekî xwezayîbûya, diviya ev têkîlî hetanî dawiyê hêzdar bûya.

Dema têkîlî tê gotin, yekcar têkîliya zayendî ya çors fêm nekin. Têkîlî bi hevrebûneke berfireh, hezkirinên, hizirandinên mirovan ên di derbarê hev de rave dike. Ango em di wateya civakî û siyasî de behsa têkîliyê dikin. Têkîliya zayendî ya çors bûyereke ku zêde li ser were axaftin nîne. Lê belê hun vê jî nikarin binirxînin. Me di van mijaran de jî dahurandin bi pêş xistin. Beriya her tiştî me got ku divê mirov vê mijarê weke tabûyekê nenirxîne. Di rastî de me ev mijar bi zanistî girte dest. Îro di hevalê me yê herî navdar de jî zayendîtî bûyereke balkêş e yan jî weke felsefeya wê ya jiyanê ye. Lê belê divê mirov vê gelekî xwezayî binirxîne. Dema ez dibêjim xwezayî ez nabêjim, ev dişibe nan xwarinê yan jî av vexwarinê. Lê belê divê wateya wê jî were zanîn. Divê zayenda we nebe bela serê we. Ev bûyereke xwezayî ye. Zilam û jinbûna zayendê tawanek nîne. Tişta xwezayî ye, piştre heta dawiyê bi şêweyê dijberê xwezayê tê bidestgirtin dibe mijara gunehbarkirinê. Tê gotin “ji bo çi ez ketime vê rewşê?” Em ji ferasetên weke ku jinbûn tawaneke bi destgirtinê bigrin her cureyê ferasetê weke amrazên şaşitiyan e tê bikaranîn ve dikare biçe. Ev tam cehaleteke reş e. Pêdîviya me bi xwe naskirina di van mijaran de heye. Pirsgirêkên zayendê zayend çareser dike. Bibin kirdeyek, bibin aliyekî xwedî hêz. Nebin alavek

û navgîneke ku weke tê xwestin tê bikaranîn. Ger zayenda we, zayendîtiya we bûye bela serê we, têkîliya vê bi dagirkeriyê ve û bi binkeya civakî ya paşketî re heye. Ev jî pirsgirêkên şer in. Ger ê ku zayenda we li serê we dike bela, pergala dagirkeriyê ye, ger binkeya civakî ya kevinbûyî ye, wê demê van dahûrînin û birûxînin. Ev jî hewce dike ku di we de kesayeteke nû şoreşger ava bibe.

Dema ku em van mijaran berfireh dadihûrînin, ji bo pêşveçûyînê jî rê vedikin. Têkîliyên min ên ev qasî pêşketî bi we hemûyan re hene. Ev tiştekî xirab nîne. Gelo dilsoz pêşxistin, ji bo jinan hindekî riya jînê vekirin xirab e? Hun dibînin ku hun di tekoşînê de kêm zêde zanebûnê qezenc dikin, heta pêşketina giyanî pêk tînin. Ev hîn baştir e. Gelo jineke ku di nava kompleksan de fetisiye, kêrî çi tê? Divê hun di van mijaran de li partiyê nebin bar. Bêyî ku hun bibine kesayeteke zane û ronakbîr di nava partiyê de weke keçikeke sulaleyekê, malbatekê nayê mayîn. Ez qet nirx nadime vî tiştî. Gelek ji we hun ji têgihiştina jiyanê eciz in. Hun nikarin li hemberî me bi kompleks û bi şêwazeke weke ku li benda xwediyê xwe ye rawestin. Ez nêzîkbûnê bi vî rengî weke biçûk kirinê dinirxînim. Ne jineke binamûs, ne jî zilamekî binamûs dikare wiha be. Jixwe em ji ber vê wenda dikin. Wisa ye ku em ew qasî ne lewaz in ku dema me hev dît yekser ketîbin. Ev jî berxwedanek e. Me ji bo di artêşa şer de gihiştina hev soz da. Em nikarin siyê bînin rêzdariya vê. Nêzîkbûnên weke “hevgirtin, revandin, li ser bingehê sewdaseriyê hev xapandin” layiqê we nîne. Em nikarin derfetê bidin ku hezkirina me wiha were tengkirin. Pêwîstiya hezkirinên me yê welat, ax, azadî, partî û rêhevaltiyê bi nirxên gelekî bilind ve esas girtin, zelal e. Gelo bêyî ku bigihê nirxên wiha pîroz, mirov dikare çawa behsa sewdaseriyê bike?

Mixabin em hîn jî vê hindekan de dibînin. Ger di hundirê we de kompleksên wiha hebin biavêjin. Ji bîr nekin ku hun xwe bi çalakiyê diafirînin. Ji bîr nekin ku hezkirina we ji axê re ye, ji azadiyê re ye, ji rêhevaltiyê re ye heta ji we bi xwe re ye. Gelo ma ji bo çi mirov nebe kesayeteke herî rêzdar? Ev erk misoger erka me ye. Ez nikarim bêrêz bijîm.

Ferzkirina min a rewşeke bêrêziyê ne ji bo ez li kesekî bikim, ne jî kesek li min bike nabe mijara gotinê. Di vê mijarê de gelek erkên me hene. Divê ez gelekî zelal diyar bikim ku ji bo hun di vê mijarê de zilaman bînin rewşeke guncaw hewce ye hun şerekî mezin bidin. Gelo weke din dê zayend çawa were rizgarkirin? Ger hun di rewşeke ku werin rizgarkirin de bin, hunê xwe wenda bikin. Ez vê rast nabînim. Ez bawer nakim ku bi xwespartina rêxistinê erk, heta ez bim jî jiyaneke azad tendurist pêş bikeve.

Bi dijwarî pêdiviya rêhevalan bi hev heye. Ger hun balê lê bikişînin, di dahûrandinan de hatiye gotin têkîliya pîroz têkîliya rêhevaltiyê ye. Ya ji bo me ji dayîk, bav, hevjîn, dost û evînê zêdetir pêwîst e têkîliyên rêhevaltiyê ne. Divê em destpêkê vê esas bigrin. Têkîliyên kesayetên ku rêhevaltiyên wan ên saxlem nînin, pênc qirûşan nakin. Lê belê jin rastiyek e. Zayendîtî rastiyek e. Wekhevî û azadî jî di me de rêgezek e. Divê watedîtina van hemû tiştan bi şêwazeke guncaw ve hun bizanibin. Em netewa xwe û azadiya xwe ya civakî diafirînin. Em bi pêkhatina vê jî bawer dikin. Gelo ezê ji bo çi rabim, keçeke weke we hêjar û pêşneketiye ve xwe têr bikim? Ez dibêjim gelo divê mirov vê keçikê çawa binirxîne û pîroz bike, divê ez vê keçikê balkêş bi pêş bixim. Lê belê hindek dibêjin, “divê ez vê keçikê bi kar bînim, bixim û bêast bikim.” Hunê van jî nas bikin. Ez her roj dibêjim, min jî rast fêm bikin. Ger hun di pîvanên wî de başî û xweşikbûnê dibînin bi wî re bin. Ger ez we ji bo xwe bi kar tînim, eşkere li hemberî vê derbikevin. Ji min re bibêjin “heval di vê mijarê de kêmasî û şaşitiyek heye” yê ku vê bi wêrekî dibêje re her dem rêza min heye. Vî tiştî ji bo her kesî û li her cihî bibêjin.

Zilamek tê dibêje “keça min were, min di vê mijarê de di derbarê te de ev tişt bihîstin.” Mêrê jinê û bavê wê be jî nikare wiha xitabî jinê bike. Hun jî dimeşin diçin û dibêjin “rêveberiya me wiha dibêje.” Ez rêveberiyeke wiha nakim. Bi keçeke ciwan re wiha bêast naxivim. Hela ew rêhevalek be, ez vê yekê qet nakim. Lê belê qaşo zilam fermandar e. Hun jî weke keçika noker a pergala ku we jiyaye, yekcar hun bi vê ve hatine hînkirin. Bêşert û merc hun bi zilam ve tên girêdan. Ev Kurdîtiya kevin e. Nêzîkbûna kevneşop e. Em

dizanin ku hun ev qas rûmetê ji ber vê wenda dikin û hêza xwe ya cewher bi pêş naxin. Berpirsyarê vê hun bi xwe ne.

Ya herî xirab jî kesayet hêzê ji min digrin dibêjin “Rêbertiya partiyê jî wiha dihizire, wiha dike.” Zilam dikare her cure têkîliyê weke mal û milkê xwe bi kar bîne û wiha bihizire. Yê ku di vê mijarê de cahil e hun in. Divê hun bihizirin ku Rêbertiya partiyê ne wiha ne. Dema ku hindek bi navê min tevgeriyan, divê hun bikaribin bibêjin, “tu kî yî?” Heta dema ku bi navê PKK’ê ferzên wiha kirin an jî qaşo nêzîkbûnên wiha kirin lêpirsîn bikin. Bi taybetî dema ku weke kesayet jiyana we bandor kirin, hesab bipirsin. Mafê tu kesî nîne ku xwe bispêrin erkên rêxistinê û di mijara jiyana hindekan de ku ez jî nikarim wê bikim dest lê werdin. Hebe nebe kole vî tiştî wiha qebûl dikin. Di vê mijarê de ez we hemûyan gelekî paşketî dibînim. Wisa ne ku hun nizanin jiyanê jî parve bikin. Weke ku hun tevlêbûneke rast nikarin bikin, em ji silavekê bigrin heta têkîliyeke rast a hest, a cidî pejirandin û bûyera parvekirinê nîne. Yekcar dibe sewdaserî, yekcar dibe girêdaniya hev a koletî. Ev rewşeke gelekî xeter e. Bi taybetî şoreşa Rêbertiyê di vê mijarê de girîngiyeke mezin rave dike. Ger ez li hemberî kaprîsên jinekê bi binketibama, em ji netewbûnê derdiketin, me nedikarî em gavekê jî biavêjin. Heta ger ez bi pîvanên zilam ên klasîk û çors ve girêdayîbama dîsa ez bi pêş nediketim. Min di mijara jiyana azad de israr kir, şerekî mezin da û hun jin hatine afirandin. Vê yekê biçûk nebînin, ji ber ev bi hêsanî bi pêş neketiye.

Ji şerê ku me di vê mijarê de daye agahiya tu hevalê me jî jê nîne, dibe ku piştî pêncî salî di derbarê vê de nirxandinên gelekî baş werin kirin. Lê belê ev jiyanî ne. Di vê pêvajoyê de jî tenê riyeke rast a pêşketina jiyanê ye. Di nîqaşkirina jiyanê de bi qasî nirxandina xebatên Rêbertiyê divê mirov bizanibe derveyî wê nayê jiyîn. Ger hewldanên me yên azadiyê nebin, kesek nikare we li vir bide jiyîn, ji bo ku rihet azad bibin kesek di tekoşînê de nagre. Zilam dê riyeke wê bibînin û misoger we bixin bin serdestî û bandora xwe. Dê we hindekî bidin jiyîn, lê belê dê vê hîn zêdetir ji bo ku li ser we serdestiya xwe ya klasîk bidomînin bikin. Wisa ye ku hêza zilamê we jî ji bo dayîna jiyînê ya jinekê jî nîne. Hêza zilamekî azad dayîna jiyîn a jinekê li

aliyekê ji bo dayîna jiyîn a fizîkî ya tendurist jî nîne. Divê rast binirxînin. Hun nêzîkbûneke weke ku paşayê bavê we li gel we ye nîşan didin ev yek xelet e. Wiha bi zilam nayê bawerkirin. Dibe ku zilam hêjar be zêde tiştekî ku bide we nîne, bi gotina “PKK yî ye, weke rêbertiyê ye” ve hunê xwe bixapînin.

Her çi dibe her tiştekî bi niyetên xwe yên zarokatiyê ve bi hestiyariya xwe ya jinê ve pêşwazî nekin. Ger şêwazê me yê Rêbertiyê nebe, di mijara azadiya jinê de çiyan li aliyekî bihêlin, hunê hema di her qadê de bibana xwedî gavên ku li ser bingehê “ev jin a filankesî ye” tê gotin. Gelo ev tiştekî baş e? Ger hun bixwazin em we bikin milkê yekî û pê ve girê bidin. Gelo ma ev tişt gelek tiştan nade wendakirin? Gelo me çi çareserkir ku em bi hev ve werin girêdan? Di demên derbasbûyî de ez jî gelekî saf bûm hatim girêdan. Piştre min lê temaşe kir ku ne gelê min, ne welatê min, ne kesayeta min dimîne. Tiştekî min namîne hemû ji dest min diçin. Ji ber ku ez hindekî bi aqilim min ji vê ders derxistin. Ev ji bo we hemûyan derbasdar e. Tenê sîxurên zane vî tiştî nakin. Di vê mijarê de bi giranî rewşa gelek kesî weke sîxuriya objektîf e. Heta ji wê xetertir e. Min xwe bi zorê parast. Kêm mabû min wenda dikir. Yekî weke min piştî ku ev rewş jiya, gelo hunê çawa li ber xwe bidin? Ji ber ku ev ji bo we hêsan tê hun nikarin mezin bibin, ji rêzê dimînin. Di rastiyê de divê hun cihên ku bi tenê ne jî bibin hêza ku jiyaneke bihêz ferz bikin. Em her dem metirsîdar dibin ka çi bi keçikan hat, gelo pêşketinan asteng dikin, gelo çavkaniya pirsgirêkan in? Di rastiyê de diviyabû ku berovajî mijara gotinê bûya. Divê gotina cihê ku jin lê ye, çavkaniyeke jiyanê ye, derbasdar be.

## Tu wateyekî jiyaneke ku tekoşîna wê nayê dayîn nîne

Li cihê ku jina azad û şer dike hebe, li wir bihêzî heye, zindîbûn heye û wêrekî heye. Lê belê li gel me jin weke belayekê tê dîtin. Ev yek ne rast e û encameke nêzîkbûna zilam e. Feraseteke tevlîhev a weke “ger tu dixwazî yekîneyekê giran bikî, dayîna jinê ya wê yekîneyê bes e” heye. Berovajî di şûna ku nêrîna “ger tu dixwazî baştir bidî şerkirin, divê yekîneyeke jinê jî li

gel be” rast e, vî tiştî tu kes tu caran naxwaze fêm bike. Di rastiyê de nedîtina jinê ya di yekîneyên şerê azad de, ev maf nedayîna wan û tiştekî weke şerê çînî ye. Bêguman dema ku ev maf neyê dayîn hêza siyasî, leşkerî û civakî nayê dayîn. Li gor wan jin ne ya ku şer bihêz dike, heyîneke ku dizane aîdî zilamê xwe be ye. Ji ber vê hêviya zilam an jî ji sedemên nêzîkbûnên kevneşop jin wisa tên girtin. Weke ku yekîneya we ya jin bi xwe rê ji vê re vedike. Weke ku vê îdîaya zilam derbasdar dike, dibêjin “em bûne bar, em bûne nexweşê giyanê, em bûne belaya seriyan.” Di rastiyê de ev yek li jinê heqaret e û bêrêzî ye.

Di rastiyê de divê berovajî were nirxandin an jî divê were lêpirsînkirin ka “zilam ji bo çi giraniyê çênakin, ji bo çi zilam ne nexweşên giyanî ne?” Divê ev yek bi wêrekî were lêpirsînkirin. Gelo ji bo çi her dem nexweşiya derûnî di jinan de pêş dikeve? Ev ferzkirinek e. Bêguman ji ber ku hêza we nîne hun nikarin vê çareser bikin, di encama vê de jî redkirin û bertekên beramberî hev bi pêş dikevin. Ev şêwazeke şerê bêwate ye. Vê gavê di refên me de, di têkîliyên jinê de tam bêwatebûnek serdest e. Ev şerekî hevtunekirinê, tengavkirinê û bêastkirinê ye. Ez dixwazim bi jinê re dê çawa were jiyîn bipeyitînim. Vê carê jî tê gotin “Rêbertiya partiyê çawa bi keçikan re dijî? Kar heta şerê derûnî ku MİT dimeşîne tê anîn. Di rastiyê de peyitandina wê bi jinê re çawa were jiyîn girîng e. Lê belê hindek yekcar me teqlîd dikin. Dibêjin “ma Rêbertiya partiyê jî li gel xwe jinê nahêle?” Ez li gel xwe jinan dihêlim, lê belê min bi jinan re destan afirandin. Bi sedan keçikên ku li gel min gihiştine her yek ji wan qehreman in. Di rûpelên dîrokê de ev hatine peyitandin.

Qaşo rêveber û fermandarên me jin mehf kirine, kirêt kirine anîne rewşekê ku nikarin nefesê bigrin. Tiştê divê were dîtin ev e. Ger yek dixwaze rêbertiyê esas bigre, bila rêbertiyê di kesayeta xwe de mînak bigre. Her jinek kirdeyeke jiyanê ye. Ger yeke entrîkager û nayê îflehkirin nebe, hêzeke jiyanê ya gelekî xwedî hêz e. Yên ku teqlîdan dikin, derketine dibêjin, “emê jî weke Rêbertiya partiyê bin, emê jî bi jinê re bijîn.” Gelo ma hun dizanin ez çawa dijîm, ma gelo we qet ev yek lêkolîn kir? Gelo pîvanên

min çi ne? Gelo ez xwe ferzkirina jinê bi koletî, kirêtiya wê û balkêşbûna wê bi tundayî nenirxînim, ez dikarim bi jinê re bi hêsanî bijîm? Pîvanên min hene, lê belê hindek dema derfetê dibînin bi koletî hev bi kar tînin û diavêjin. Ev rastiya me ya herî bi lehnet e. Bêyî ku hev qet nas bikin, bi hev re çawa bimeşin nizanin, bi salan qaşo bi hev re dijîn. Gelo ma malbatên me ne wiha ne? Di têkîliyên jin û mêran de di rojên destpêkê yên zewacê de sewdaserî heye. Yek du heftiyan bi şûn de ev evîn hemû tune dibe. Divê em serî li hember vê jiyanê hildin. Ev rewşeke herî xeter e û malbateke ku vê najî nîne.

Rêbertî di vê mijarê de tekoşîneke balkêş dimeşîne. Gelo ma ev tekoşîn çi ye? Divê têkîliya herî xweşik bi pêş bikeve yan jî divê mirov hetanî dawiyê jiyanî nêz bibe. Divê baş bizanibin ku dê bibin hêzeke jiyanê ya çawa? Ev qada bi tekoşîneke Rêbertiyê ya mezin ve hate afirandin. Gelo ma hun di qadên din de ji bo çi nikarin bi pêş bikevin? Serdestî û derfetên min gelekî mezin in, ez weke dewletekê me. Ez dikarim weke siltanekî jî bijîm, lê belê ez di vê mijarê de tekoşîneke mezin a sosyalîst didim. Ji bo ku bibe mînakeke sosyalîst a bijarte ez van karan bi ziravî diparzûnim û dihûnim. Ez di zilam de jî, di jinê de jî pîvanên balkêş bi pêş dixim. Ez jina erzan jî, zilamê ji rêzê jî qebûl nakim. Ev di feraseta min a rêxistinê de zelal e. Ez pîvanan datînim pêşiya we. Yê ku van pîvanan bi dest naxin, em li rûyê wan jî nanêrin. Lê belê bi qasî ku pîvan bi pêş dikevin, em ji bixerhatinê bigrin heta hezkirineke baş a rêhevaltiyê, em têkîliya herî pîroz bi pêş dixînin. Pîvan û nêzîkbûnên wiha, misoger mirov bi pêş dixîne. Naxwe, bi gotina klasîk ve "em bi sewdaseriyê ve hatin girêdan, me derfet dît bi kar anî" bêastî ye.

Jiyaneke ku şerê wê nayê dayîn, wateya wê nîne. Hun nizanin ka hun berhemê kîjan hewldan û nêzîkbûnanin jî. Wê demê hunê bixapînin û werin xapandin. Encam di siyasetê de tunebûnek e, komplo ye. Weke din pirsgirêkeke ya we hemûyan a gelekî cidî pêşxistina jiyanê heye. We xwe jî ji bîra kiriye. Ger yekî weke min di Rêbertiya PKK'ê de nebe, kê dizane dê we bixin kîjan rewşê? Me gelek mînakên vê jî dîtin. Hindek provakatorên

ku min dinasîn hebûn, min hemû pêdiviyên wan pêşwazî dikir, wan jî digotin "ev dikare me baş bide jiyîn" lê belê derketina derveyî rêxistinê, bi şer û bi hêviya jiyanî ya gelekî ve lêyîstine ne, di ferqa we de ne jî. Bi vî rengî rewşeke direvin ha direvin tê jiyîn. Ev girîng in, divê hun bikaribin van lêkolîn bikin.

Dibe ku hêza her kesî têr neke, lê belê yên ku xwedî îdîa ne ji bo xwe dikarin di vê mijarê de riya çareserî ya pirsgirêkê bixine rojevê. Ji bo ku ji xeletiyan dûr bixin, dikarin hev perwerde bikin. Hêza min jî bisînor e, nabe ku her tişt ji min were hêvîkirin. Tiştê ku ez ji bo we bikim, ewlekariya we pêkanîn, ji bo gihiştina we amadekirina nêvengê ye. Her tişt ji min hêvîkarina we nêzîkbûneke nepixandî ye. Ger hun em bi heyecaneke zarokekî ve hîn jî bi we re di têkîliyan de çawa dimeşin bînin ber çavên xwe hunê di van temenan de qîmeta van nêvengan baş bizanibin.

Ez bi pêwîstiya azadiyê bawer dikim. Lê belê tiştên ku hun dijîn jî ez weke jiyan nanirxînim. Heta ji vê tengav dibim. Ev ji bo min îşkenceyek e. Şêweyê malbatê û têkîliyên nirx ên ku weke kevneşopiyan tên jiyîn hemû wiha ne. Divê hun hemû bi pêş bikevin ku hun bikaribin ji me rêz û hezkirinê bibînin. Ez bi zorê yan jî bi xwe xapandinê hez nakim. Ez destûrê nadim ku xwe wiha bidim hezkirinê jî. Dema ez dibêjim ez, behsa netewekî dikim, behsa pîvanên netewî dikim. Dema ku pîvana netewî bû mijara gotinê, hunê di nava tevahiya gel de bûyîna çavkaniya hezkirinê fêm bikin. Ji ber ku ev li gel me nîne. Her kes behreke bêberpirsyariyê ye. Di her kesî de felsefeya "malbata min, zarokên min, jina min, mêrê min, hebûn û tunebûna min" heye. Tiştê ku bi netewbûnê, bi vîna gel an jî bi gelê azad ve nagihê hev jî ev e. Ger her kes ev qasî ezez be, bûyîna netew nabe, ji ber wê jî gel ji we hez nake. Ger gel ji we hez neke hun malê kesekê ne, qurbanê wê ne. Vê jî tu kes nikare înkar bike, hun milîtan neçar in ku bibin roniya çavên netewekî. Erkeke we ya wiha heye. Hun ne keçikên ku di malê de mane ne, yan jî yeke ku bi navê azadiyê xwe nasnake nînin. Hun milîtanên erkê yên ku azadiyê bide gelê me û bi gelek aliyan ve şerê wê bidine ne. Ev

xebateke xweşik e, ger pêwîst bike hemû temenê xwe fedayî vê bikin. Mirov ji vê tengav nabe, ji ber ku her tiştekî derveyî vê ketîbûn û rezîlane ye.

Rexmî vî temenê xwe hîn jî ez bêwestan dikevime nava azweriya jiyana azad. Ji bo çi ez wiha nekim, ji bo çi ez xwe tune bikim? Ji bîr nekin aliyekî kişandinê yê wiha di gelek ji we de nîne. Di rastiyê de ez dixwazim nirxeke bilind bidim we, we bînim rewşeke ku gelekî tê hezkirin. Lê belê hun pêşiyê li vê digrin. Şerê wê dê bi teqandina gelek çekan ve neyê serxistin. Şerê we dê bi bersiva ku hunê bidin, çawabûna jiyanê ve were qezenckirin. Ew çeka rast a di destên we de divê wiha were nirxandin. Lê belê ji vê jî agahiya we nîne. Ez jî ji bo ku xwe weke zilamekî ku di mal de maye nebînim, hewldaneke mezin dimeşînim. Gelo ev gel, ev jin ji bo çi min diecibînin? Ji ber ku ez gelekî balê li pîvanan dikişînim. Hemû tevgerên min, bîrdozî, siyasî, rêxistinî û çalakgerî ne. Ev hemû ji bo afirandina asta ecibandinê ye. Gelo weke din bûyîna Rêbêrê gel çawa çêdibe? Gelo ma ez dikarim weke stiriyekî xwe tê re bikim, weke kesayeteke bêhn pê ketiye û despotekî xwe ferz bikim û ma dikarim wiha bibim Rêber? Ger hun baldar bin taybetmendiyên herî bihêz ez di xwe de digîhînim hev û dikarim di nava gel de bimeşim. Gelo ez ji bo we jinan, bibim yekî bibandor çawa tevdigerim? Divê ez jinan bandor bikim, ji ber ku mirov weke din nikare bibe Rêber. Bi çewisandinê û li ser bingehê koletiya we bikaranîna we ve bûyîna Rêber karekî ku encax zordest, feodal û axa bikin e.

Gelek taybetmendiyên hin hevalên me yên zilam ên ku mirov nikare li hember ber xwe bide hene. Lê belê hun ne di ferqa vê de ne. Dibêjin, “gelo ma ez ne PKK yî me, her kes neçare min qebûl bike û hun jî qebûl dikin.” di rastiyê de min diyar kir ku divê hun min jî qebûl nekin. Heta min got, rexnekar nêzikî min bibin. Ji ber ku wateyeke vê ya kûr heye. Min ev diyar kir, ger hun kirêtiyeke min a bi sînor jî qebûl bikin, ev dê zerarê bide netew û şoreşê. Weke din ez we jî bi hêsanî naecibînim. Ev bi laveyan, girî û gazindan çênabe. Ev pirsgirêkeke netewî ye. Yên ku pîvanên netewî bi dest naxe, wisa hêsan nayê qebûlkirin.

Hindek kesên ku ez bi salane bi wan re şer dikim hene. Min li ser vê bingehê bûyera Rêbertiyê pêş xist, heta ku hun neyên rewşeke ku bibin hêza jiyaneke balkêş, bi hêsanî hun nikarin ji min derbas bibin. Dibe ku we hetanî niha ev tişt nedizanîn. Lê belê Rêbertî ev e. Li gor ku Rêbertî wiha ye, dê partî jî wiha be. Berê keçik û zilam dema ku hev qebûl dikirin tu pîvaneke netewî heta estetîk nebû. Nêzîkbûneke "min pere dîtin, jinik girt" hebû. Gelo jiyan di vir de çawa tê wendakirin? Di wê jiyanê de azadî nîne, di wir de firotina bi pereyan, xwe spartina hêz û pûtan heye. Ji vê jiyanê her cureyê kirêtiyê derdikeve. We hetanî duh ev yek qebûl dikir, heta em nizanin ka niha jî pîvanên we çi qasî saxlem bi pêş dikevin. Tê gotin têkîlî û hezkirin, di rastiyê de ev karên zehmet in, ez dibêjim xwezî du milîtanên me yên dizanin hez bikin hebûna.

Têkîliya ku ev behs dikin, ji piştê ve xençerlêdana partiyê ye. Anîna provakasyonê, xirabî kirin, revîn, nexweşî pêşxistin e. Ev ne têkîlî ye, neyîniyeke ku sîxureke herî navdar nikare bike ye. Dema têkîlî tê gotin vê fêm dikin. Gelo ji bo çi têkîlî pîroz nake, ji bo çi derûdora xwe bihêz nake, ji bo çi ne di xizmeta şer de ye? Yê ku van tiştan bipirse jî nîne. Dema têkîlî tê gotin tiştê ku destpêkê tê bîra wan, hev bikaranîn û xiyanetkirina partiyê ye. Ez bi hesret li bendê me ku dê şêwazeke têkîliyê çawa bi pêş bikeve û çawa dê di bin xizmeta şer de be. Ez li hemberî feraseta "teqez emê hev bi koletî girê bidin" şer dimeşînim. Li gorî min ev şer di cih de ye û gelekî jî pêwîst e.

Ez şervanek im, di nava netewekê de jî têkîliyeke hêsan, jina hêsan û zilamê hêsan qebûl nakim. Ezê şer bidomînim, hun di dema derbasbûyî de yeka herî tawanbar bin jî, ger hun destpêkeke jidil bikin û hetanî dawiyê bawerîdayînê bi ser bixin, hunê qezenc bikin. Hun ketibine rewşa herî xirab jî, dîsa jî ji paşeroja xwe netirsin. Pergalê bi hest û kesayetên we lêyîstiye. Lê belê ev der qadeke azadiyê ye. Di îdîayekê de ye ku mirovên me ji nû ve û xweşik biafirîne. Li gor min a rast jî ev e. Jixwe jin û zilamê me yên paşeroja wan paqij bi qasî ku mirov bibêje nîne, ew qasî kêm in.

Zilam ji we zêdetir ketine. Zêde jêhatiyên wan jî nînin. Divê ew jî xwe ji nû ve biafirînin. Pêdivî bi vê heye. Em asta zilamtiyê ya heyî dizanin. Zilamekî ku nikare bibe zilamê jinikê, yan jî xulamê dijmin jî mijara gotinê ye. Gelo em vî zilamî çi bikin? Gelo hun jin zilamên bi vî rengî hunê çi bikin? Zilaman ev avantaj bi dest xistine, dibêjin "em van jinên hêjar bi hezar û yek minetê qebûl dikin." di rastiyê de berovajiya vê yekê rast e. Gelo hun zilamên Kurd ên ku diçewisîne, neçar û ji eziyetê dayîne zêdetir çi taybetmendiyên xwe nîne, çawa weke xwe qebûl dikin? Vê gavê tiştê herî zehmet ez bihizirim qebûlkirina têkîliyeke wiha weke xwe ye. Dibe ku li îşkenceyan berxwedayîn çêbibe. Lê belê mirov nikare li hemberî vê yekê li ber xwe bide. Lê hun vê qebûl dikin. Ji ber vê sedemê jî hun wenda dikin. Gelo hun bi çi tiştên vî zilamî bawer dikin? Ev zilam dikare çi bide we? Ne hezkirina xwe, ne şerê xwe ne jî serkeftineke xwe heye. Ango yekî hêjar e. Wê demê gelo hun ji bo çi ev qasî bi vî zilamî ve tên girêdan? Ez dibêjim zêde pişta xwe nedin min jî. Hêza min jî zêde nîne ku ez we bidim jiyîn. Bi tenê derfetên min ên rêhevaltiyê ya bisînor heye. Dema ku rewş ev e, ger em we serdest bihêlin, mirov zehmet e bizanibe ka hunê xwe bi xwe çawa bixapînin? Xeyalên we yên azadiyê bi sedemên ku qet hesab û kitabê wê ne diyar ve dê tune bibe.

Rexmî serkeftinên xwe ez hîn xwe jî têr nabim. Ev kar karekî afirandina mirov e. Ez zilamekî jî ji bo jinekê, dibe ku ji we zêdetir ne guncaw dibînim. Ev gelekî girîng e. Qebûlkirina vê tê wateya ferzkirina belayeke herî mezin li netewekê ye. Ger zilam we bi navê partiyê bi kar tîne û hun vê qebûl dikin, tê wê wateyê ku hun bi xwe xwe mehf dikin. Ji bo wê jî di têkîliyan de emê gelekî hesas bin. Di vir de şerekî rastiyê tê jiyîn, hun şerê herî watedar li vir dimeşînin, vê yekê qet ji rêzê nebînin. Emê şerefê bi şer dest bixin. Dê rûmeta jinê bi şer were qezenckirin û ez vê gelekî nirxdar dibînim. Heta ev rastî sedema we ya şer, a herî bingehîn e. Gelo kesayeta bêrûmet, kêrî çi tê? Kesayeta nayê cidî girtin, rewşeke xirab dijî. Divê jin jî, keçik jî di van mijaran de rêzdarî û rûmetê bi dest bixin. Em li ser vê bi girîngiyeke mezin disekinin. Cihê ku jin lê ne, pêşketin bihêztir çêdibin,

jiyan dewlemend dibe. Cihê ku jin ne lê ne, jiyan, dewlemendî û zindîbûna xwe wenda dike. Emê vê rêgezê serdest bikin. Weke din ev rêgeza cihê ku jin lê ye, partiyê bawerî qezenc bike jî emê bihêztir bikin. Divê em behsa bihevrebûneke bi jinê re ne ya lewazî, pîrozî pêş dikeve bikin.

Gelek şehîdên me yên xwedî nirx hene. Ji ber ku piştgiriya hewce nehate dayîn, ji ber sedemên zehmetiyên fîzîkî û kêmasiyên din, bi rengekî ku heq nekirine, şehîd ketin. Divê hun ji bo bîranîna wan di eniya xwe de meşaleyê gurtir pê bixin û bersivê bidin vê şerê azadiyê. Di gelek jimaran de şehîdên wiha hene. Dibe ku navê gelekan jî were jibîrkirin. Misoger tiştê ku divê neyê jibîrkirin, ev şehîdên me yên xwedî meşeke qehremaniyê bûn, em bixine hiş û giyana xwe. Ez wan weke kesayetekî ji rêzê nabînim. Ez diyar dikim ku divê li hemûyan jî bi rengekî gelekî bilind xwedî were derketin. Di vê mijarê de divê em xebateke bîranînê ya baş û derxistina rastê ya nirxan bimeşînin. Di nava yên ku şehîd ketine de gelek jin û keçikên ciwan hene. Divê em bikaribin çîroka wan hemûyan binivisînin. Divê hun hemû wan bi dijwarî bidin jiyîn.

Weke aliyekî herî livkar a pêwistiya çawa bijîn emê jinê her dem bi lêv bikin. Ez bawerim emê bigihên çawaniya jiyaneke herî xwedî hêz jî. Asta heyî ya ku em gihiştinê jî em bes nabînin. Emê bibin kesayetên ku gelekî ji xwe bawer, nirxên xwe yên tekoşînê bilind û bibin kombûna têkîliyê ya bi yekîneyên wan ve. Ez tu caran ji van xebatan teng nebûm, ji xebatên jinê mirov tengezar nabe. Ji bo ku ev yek neyê îstîsmarkirin û bi vê neyê lêyîstin, divê hun gelekî xwedî rêgez bin û di pratîkê de şiyar tevbigerin. Em hebin jî, nebin jî divê hun bi hewldanên bilind ve vê bersiva pîroz bidin.

Tişta ku ji bo we ji nan û avê zêdetir hewce ye, ev tekoşîna azadiyê ye, wateya wê ya pîroz e û şervantiya wê ye. Tiştên din zêde ji bo min biwate nayên. Em dikarin weke kesayet we kêfxweş bikin, em dikarin ji bo we cilên baş, doşekên baş, xwarinên baş jî amade bikin, lê belê ev hemû ji min re watedar nayên. Ez çêbûm hetanî niha min bi van tiştan îtîbar nekir. Tiştê ku min îtîbar kir derbaskirina asta koletiyê ve pêşketina asta azadiyê ye. Ji ber ku ev ji min re ji zêr hîn binirxtir tê. Ez li ser vê bingehê vê mijûlbûnê bi

azwerî didomînim. Li gor min herî zêde pêdîviya me bi vê heye. Germahiya wê û sermaya wê ne tiştek e. Heta tu wateya metirsiyên kesayet jî nabe. Ji ber ku ev şerekî herî pîroz e. Teqez ger dê ji ûtopyayekê were behskirin, ev ûtopyaya herî binirx e. Gelo em ji bo çi bi vê ve neyên girêdan? Me hetanî niha bandora nirxên ku vê tiştê derxistiye holê ya li her kesekî dît. Ji bo çi em zêdetirê vê nekin? Min jî çareseriya mezin dît, ji bo çi em vê hîn giştîtir nekin û kûrtir nekin? Em mirovên xwe yên xweşik diafirînin, ji bo çi em bi azweriyeke mezin vê hembêz nekin û ji bo çi serkeftinê misoger nekin?

Divê hun nehizirin ku me hun ji bîra kirine, yan jî kêm nêzikî we dibin. Bi heman rengî divê hun jî ne me gelekî nepixandî, ne jî gelekî seranser binirxînin. Ji bo ku ev xebat xwedî nirx be, ez gelekî ziraviyê nîşan didim. Nekevine nava seranseriyeke weke “ji me fêm nekir, nedît, nenirxand.” Ez her dem derfetên herî baş ên pêşdeçûyînekê tînim pêş çavan. Kar zehmet in. Pêşketinên di vê mijarê de weke ku bi derziyê çalikan dikolin çêdibe. Misoger hêza xwe ya ciwaniyê di cih de bikar bînin. Bi tenê ji bo jiyana rojane na, ji bo bûyîna hêzeke fetihkirinê ya jiyanê heta dawiya temenê xwe û heta azadiya tam him xwe ji vê berpirsyar bîninin him jî weke xwedî erkên ku divê werin biserxistin binirxînin.

Min bi derxistina rastê ya van xebatan ve dibe ku pêşketineke gelê me herî zêde pêdiviya xwe tê de heye, derxiste holê. Ji bo çi ez dest ji vê berdim? Hun zagonên jiyanê ya gelekî kevin bûye dirûxînin. Jiyaneke azadiyê ya tam nîne. Jixwe em nikarin bi qasî ku ev jiyan dê yekcar were dîtin pê bawerbin jî xefil bin. Dijminekî tirsnak û dinyayeke me ya paşverû ku divê em jê tolê bistînin heye. Bêyî ku em tola xwe bistînin, em dikarin çawa hez bikin? Bêyî ku em şer bikin, em dikarin çawa tola xwe bistînin? Bêyî ku hun dijminê xwe nas bikin, li hemberî wî şer bimeşînin, li rûyê hev nêrîna we jî şerm e. Min her dem got ku bi qasî hate şerkirin, hêza min a hezkirinê bi pêş ket. Ger min şer nekiriba, şer bikira jî bi ser neketiba rewşeke min a li rûyê we yekê jî nêrînê nedibû. Ya rast jî ev e. Yê ku şerê xwe nîne û yê ku di şer de serkeftina xwe nîne li rûyê wan nayê nêrîn.

Şer di wateya çors de fêm nekin. Xwe perwerdekirina kesekî jî, têkîliyeke rêxistinî jî şer e. Şer bi rengekî berfireh di qada civakî de tê dayîn, di mijara jinê de ev yek wiha ye. Hemû pêşketinên we yên di van mijaran de şerê herî cewherî yê ku bi jiyanê ve girê bide ye. Li gor ku ez heta vî temenê xwe jî şerkirinê tengezar nebûm, gelo hunê ji bo çi tengezar bibin? Li gor ku em bi biryareke mezin ve li ser disekinin, gelo hunê ji bo çi li ser nesekinin? Hatiye fêmkirin ku ya rast ev e. Pêşketin jî li ser vî bingehî tê pêkanîn. Xweşikbûn li ser vê bingehê xweş derdikevine holê. Em jiyanê gelekî watedar dikin, zirarê nedin vê. Bila tu kes bi navê min li ser navê PKK'ê gotinan neke. Bêyî ku fêm bike bila pêşdarezînên xwe nede axaftin. Hun jî bi zanebûn û bi vînê tevlî her tiştekî bibin. Disîplîna rêxistinî nayê wateya ku her kesayet dest ji rastiya zanebûn û vîna xwe berde. Tê wateya bihêzkirina wê. Jiyan li gel me jiyaneke kûrbûyî ye. Ez dikarim bi rihetî diyar bikim ku ev nêveng jî nêvengên berfireh ên şer in. Hun li vir najîn şer dikin, him jî hun şerê herî zehmet didin. Hun bi çi tiştê ku sedan sal in we ber bi binketinê ve dibe re rûbirû dibin. Çi tiştê ku rast tevlî jiyanê jî bibe, hêza wê jî qezenc dikin. Ev şerekî herî diyarker e.

Ger em li ser vê bingehê nêzîk bibin, zehmetiyeke ku em nikaribin derbas bikin nîne. Wê demê emê tengasî û êşên xwe jî veguherînine hêzê. Ez bi pêşxistina jiyaneke wiha ve kêfxweş dibim. Têkîliyeke pîroz derxistina rastê, asteke jiyanê ya birûmet pêşxistin di mijara jinê de jî derxistina rastê ya jina egîd û birûmet: Vaye evîn ji bo min ev e! Dîsa li gel min afirandina zilamekî binamûs azweriyek e û evînek e. Weke bêyî ku tengezar bim, şev û roj bi vê pev diçim. Di vê mijarê de teqez hun divê Rêbertiyê fêm bikin. Hemû ev şer, perwerde, ev rêxistinbûn ji bo rizgarkirina bişeref û bi rûmet e. Ger jiyana min ji destên min hatiye girtin divê wê demê ez jî şerê wê yê qezenckirinê bidim. Divê ez şerê wê yê welat, azadî, partî û kesayetê bidim. Ez bi yê ku vî tiştî fêm nakin re hêrs dibim. Hela yê ku vî şerî dixin, ji rê derdixin û rûbirûyê binketinê dikin, qet efû nakim. Ji bo çi hezkirinên mezintir hewce nebe. Ji bo çi ne layiq be, ji bo çi şêweyên pêşketî yên rêhevaltiya pîroz nebe, ji bo çi vînên gelekî zane û ji pola saxlemtir

dernekeve holê, ji bo çi hunê jiyanê bi hemû balkêşbûna wê ve nîşan nedin? Ger asteng hebin ji bo derbaskirina van şer ji bo kîjan rojê disekine?

Hezkirinê heta evînê biafirînin. Ev karên zehmet in, lê belê karên ku nebin nînin. Divê evîn bi me weke efsaneyekê neyê, divê em evînê bînine rewşekê ku bibe perçeyekî jiyana me. Lê belê divê bi pîrozî, lê belê pê kêfxweşiyeke mezin bihesin û bînin. Divê em bi zayenda xwe serbilind bin. Lê belê ev serbilindî divê bi zanîna girêdaniya nirxên pîroz ve çêbibe.

Xebateke xwedî nirx ku em pêşkeşî we bikin, xebata azadiyê ye. Dayika min bi salan ji min çend metre paç xwestin lê belê min nekirî. Li hemberî vê ez ji bo azadiya we şerekî didim. Ji ber ku ez vê birûmet dîbînim. Her hindekî hêzeke we ya ji me fêmkirin û şopandinê hebe, divê hun vê azadiyê binirxînin. Divê girêdaniya we û şiyarbûna we ji xebatên azadiyê re hebin. Di serî de emê wateya jiyana şehîdên me yên jin, li ser vî bingehî kûrtir bikin û pêwîstiya girêdaniya xwe teqez emê bi cih bînin.

**8 Çile 1995**

## MÎLÎTANÎYA PÊKHATÎ YA JINÊ NIRXÊ HERÎ PÊŞKETÎ YA ŞOREŞÊ YE

Pêvajoya ku em di azadiya jinê de gihiştinê, pirsgirêkên ku derketine der, kûrkirina nêzîkbûna şoreşgerî û xebatên kadro ku em ji serê sala 1996'an û vir de kûr dikin û didomînin, pêşketinên şervanê azadiya jinê jî bi dijwarî bandor dike. Em ziraviyê nîşanî bidestxistina azadiyê didin û girîngiyê didin şoreşa rastiya jinê dadihûrîne. Em vê gelekî binirx dibînin û ji vê qet natirsin. Ji bo me nîqaşkirina rastiya jinê serîhildaneke berfireh, zanebûn û vîneke azad her dem girîng e. Em çi qasî wêrek bin, em bawer dikin ku şoreşa me dê ew qasî bibe şoreşeke azadiyê. Hizirandina partiyê gelekî pêş ketiye. Pêşketinên di pratîka azadiya jinê de jî gihiştiye astên ku mirov nikare biçûk bibîne ye. Di nava girêdaniya rastiya Rêbertiyê ve ev tê xwestin hîn pêşçav were kirin. Em dikarin pirsgirêkên we yên jiyanê ku mejiyên we mijûl dikin, hêmanên ku xwe weke pirsgirêk disepînin, bi wêrekî bigrin dest. Civata şoreşgeran ji beriya her tiştî hewce ye di dihizirandinê de xwedî hêzbûnê bizanibe. Weke ku em her dem diyar dikin, jin çi qasî azad bibe dê azadiya giştî jî ew qas be. Em asta xwe ya azadiyê bi asta azadiya jinê ve girê didin.

Li şûna ku careke din hêmanên teorîk were dubarekirin mirov dikare giraniyê bide hêmanên pêwîst e di derbarê şêwazê jiyana we de ku werin zelalkirin. Durûtî û çewisîn, her dem birayên cêwî ne û pêşketina kesayetê na, bi xwe re nepêşkêtinê tîne. Jina ku ronak bûye, kesayeta ku hizrê xwe pêş ketiye û vîna wê bihêz bûye her dem hêza pêşketina jiyanê û şerkerê wê ye. Di vir de em dixwazin, bi nasnameya jinê teşeyeke misoger bidin qezenckirin. Tiştê ku layiqê navê me jî ev e. Em dikarin îdîaya di vê mijarê de bi gihandina milîtanên xwedî hêz ên jin ve bipeyitînin. Divê bersiva ev qas hewldanê afirandina milîtanên jin ên narûxin be. Çawa ku jina azad bûye hêza jiyanê ya herî bi nirx be, jina hatiye çewisandin û bi arîşe jî ew qasî bela serê jiyanê ye. Divê hun şensê xwe li ser bingehê jina ku hêza jiyanê qezenc kiriye bi kar bînin. Ev jî ji her tiştekî hîn birnirxtir e.

Em nirxeke mezin didin rêxistinbûna azad a jinê û hatina wê ya rewşeke xwedî hêz. Artêşbûna jinê gotineke ku vala hatiye kirin nîne. Artêşbûna jin bi darezînên xwe yên nirx, bi nirxên xwe yên moral ên bingehîn, bi hêza rêxistin heta bi plana xwe ya jiyanê ve hêzeke civakî ya herî veguhertinêr e. Hê ji niha ve kişandina ji dîlbûyînê, pêşketineke mezin e. Divê mirov qet ji pêşketina artêşa azadiyê, nasname û hêza xwe danîna holê netirse. Divê hetanî dawiyê were fêmkirin ku nêzîkbûna neheq û paşverû ku ji jinekê re tê kirin, ji hemû jinan re tê kirin. Divê her milîtaneke jin bizanibe bibe temsîlkareke gihiştî ya kesayet û hêza jina azad. Çawa ku dema pêwîst kir di tekoşîna azadiya welat û gelê xwe de bi zanebûn jiyana xwe dide, divê ji bo azadiya xwe jî bizanibe jiyana xwe bide û di vê mijarê de bizanibe xwedî rêgez be, bibîne ku rizgariya kesayet ne gengaz e.

Jineke ku rizgariya giştî, ya hemzayenda xwe nabîne, berovajî ji vê direve hewceye weke jineke sexte û oportûnîst were dîtin. Helwesta bingehîn a divê di milîtaniya jinê de were girtin, di pêwendî û hewldana ku ji bo rizgariya giştî ya zayend de were dîtin. Çawa ku reva kesayet ji bo gelên ku riya rizgariyê de ne ne gengaz be, ji bo jinê jî ne gengaz e. Ev ezeziyet divê teqez were derbaskirin. Misoger divê em di ferasetê de, di pratîkê de û di rêxistinbûnê de hebûna hêzeke jinê bipeyitînin. Divê hun nirxên rizgariyê yên bingehîn bi kesekî nedin binpêkirin. Divê hun di vê mijarê de hetanî dawiyê bi rêgez, şiyar û bi berpirsyarî tevbigerin. Bi qasî hizirandinên we yên zelal, helwestên we yên di cih de û dijwar divê xwe li hemberî şaşitî û nêzîkbûnên xelet bêtirs nîşan bide.

Di nirxandinên me de feraseta me ya jinê bi girîngî derkete holê. Di rastiya Rêbertiyê de jî bandor û bandorbûn bi hemû aliyên xwe ve ji dîroka tekoşîna me bi vir ve, hate xwestin ku bi mînakan were nîşandan. Partiya me nêzîkbûneke bi îdîa, tenê ji bo rastiya Kurdistan'ê ne, dixwaze di pîvanên gerdûnî de jî bidomîne. Divê hun di vê mijarê de jî ji xwe bawer bin, rêbertiya enternasyonalbûnê bibînin. Bi qasî şiyarbûna balkêş a gelê me yê şoreşger, ji şiyarbûna jinê ku ji wê hîn watedartir e re divê em di asta ku pîvanên navnetewî jî bandor bike de bikaribin wate bidin. Em bi girîngî

tînin ziman ku milîtaniya pêkhatî ya jinê, nirxa herî pêşketî ya şoreşê ye, çeka wê û hêza wê ya rêxistinê ye. Hun di vê mijarê de çi qasî rê bigrin, hunê ew qasî xizmeta şoreşê bikin. A ku jinbûna xwe azad nake, ya ku bi taybetmendiyên xwe yên jina kole ve di refên me de ye, tê wateya ku xirabiya herî mezin li xwe û partiyê dike.

Divê hun ên ku di refên me de ne, di teşe de şoreşger û di cewher de kole ne zelal bikin û nehêlin di nava we de bijîn. Divê kesê ku pîvanên şoreşgeriyeke rast temsîl nakin, divê nikaribin di nava me de mafê jiyanê peyda bikin. A ku jinbûn û rûmeta xwe li ser bingehê azadbûnê nikare bi dest bixe, her dem sextekar e û dê zerare bide şoreşê. Dîsa li hemberî nêzîkbûnên zilam jî bêyî ku pîvanên xwe yên azadiyê, wekheviya xwe heta feraseta xwe ya moral û xweşikbûnê bînin pêşçav divê tu caran stûyê xwe netewînin û li hemberî tiştên ku tên ferzkirin, bikaribin bi rêgez nêz bibin. Divê hun ispat bikin ku şerê di vê mijarê de tê dayîn ji gotinên vala ava nabe û vê jî di jiyana rojane de di asta xwe ya milîtantiya pratîkî de bikaribin bipeyitînin. Divê hun bikaribin di serê her gavekê de nîşan bidin ku kesayeta azad a jinê çi qasî bibandor e û vediguherîne. Teqez divê her zilamek, hîs bike ku neçare ji jina azad gelekî tiştan fêr bibe. Teqez divê hun vê hêzê nîşan bidin. Divê hun di jiyana rojane de ji têkîliyên ehbabiyê dûr bisekinin.

Di rastiya Rêbertiyê de planeke jiyanê ya çawa tê pêkanîn, divê plana jiyana azad a her milîtanî jî her dem di rewşa guhertinê de be. Divê rojeke we jî bêplan nebe. Em li vir di wateya çors de behsa plana şer nakin, em behsa plana giyanî, moral û jiyana rojane dikin. Divê pirsgirêka jiyanê di kesayeta we de bersiveke ku ji hemû aliyan ve were qebûlkirin bibîne. Bi derve bi bandorbûnê û ferzkirinan ve ne, divê hun jiyana ku vîna we bi xwe û giyana we dixwaze bikaribin biparêzin. Divê hun bi rengekî herî xwedî hêz, bizanibin rêzgirtina jiyanê rave bikin. Jineke ku ji yê tê bawerkirin zêdetir dikare xwedî rêgez bijî, ew xwedî nirx e. Jina ku dîlê hestên xwe ye, ji têkîliyên ku aliyê xwe yê ehbabî zêde ne diyar e, xwe nikare dûr bixe, giyana xwe terbiye nake û bi hêsanî xwe dide dest mehkûmê ketinê ye. Jina

ku hêsan hez dike û li benda hezkirina hêsane jî mehkûmê ji rêziyê û ketîbûnê ye.

Bi zehmet be jî bi qasî bawerkirina pêwîstiya şerekî azadiyê yê rast, divê hun bi rojane hewceyiyên wê bijîn. Divê hun di hemû helwestên xwe de bi cidiyet nîşan bidin ku hebûna jinê di refan de nirxdar e û pîroz e, qet giraniyê nakin, berovajî hêzê didin. Ew feraseta ku jinê nirxdar dibîne, a ku bi qasî di civakê de di nava serdestan de heye, hunê bi pratîka xwe ya şoreşgerî ve di nava refan de jî birûxînin. Divê hun bipeyitînin ku hun çi qasî pêwîst in. Di vir de ya girîng domandina bi israr a nêzîkbûna zanebûn e.

Weke ku hewldanên me yên ji bo pêşketina hizrî, giyanî û fîzîkî ya jinê em nîşan didin, her diçe wateyê dibîne, divê em diyar bikin ku ev hewldan dê di rastiyê de ji vir û pê ve xwe veguherîne rêxistineke şênber û hêza jinê. Bi tenê ji bo destpêkê pêvajoyeke rast hatiye bikaranîn. Derfetên meşê û serketinê ji her demê zêdetir ava bûye. Ger dê li kefxweşiyê were gerîn ew jî bi dest xistina derfeta azadiyê ye. Em bi vê gelekî bawer in û nirxeke mezin didinê. Ez ji bidestxistina vê asta di mijara jinê de kêfxweş im. Ez dikarim diyar bikim ku ez di şikandina koletiya jinê ya ku pirsgirêkeke giran ava dikir û hereşeya vê ya li ser jiyanê hindekî din di vekirina riya azadiyê de gelekî bûme xwedî hêz. Gavavêtin di salên dawiyê de hindekî jî bi azadbûna ji nêzîkbûna jinîtiyê re girêdayî ye. Her dem me bal li vî tiştî kişand. Ez pê ewle me ku him bi asênemayîna di feraseta namûs û moral ku gelekî bi feraseta kevneşop û milkê ve girêdayiye ve him jî bi neketina nava helwesta di bin navê têkîliya azad de ji bo xwe têrkirina ajoyên xwe yên ji rêzê re weke azadî bersivdayîna vê ve me pêşketineke gelekî girîng pêk anî. Ev şerê ku em dualî berdewam dikin him di kesayeta me de him jî di nava partiyê de asta jina azad û zilamê azad derxistiye rastê. Ev yek zehmet bû lê karekî girîng a ku diviya bihata kirin bû. We xwe bi xwe ev ast bi dest nedixist. Bi şerekî Rêbertiyê ya gelekî zehmet ve em gihiştin pêşketina heyî û vê destpêkê.

Bi qasî rizgariya netewî ya gel rizgariya civakî ya jinê jî xwe weke pêşketinek û qezenceke gelekî girîng nîşan dide. Me dît ku di nêvenga jinê ku azad dibe de em her dem xwedî hêz in. Li gel vê dema ku em bi kesayetên azad nebûne û yên jiyana kevin a ku difetisîne re li hev rast hatin jî, me xwe tengav dît. Hîn jî em bi hemû hesasiyeta xwe ve dixwazin nêvenga jina azad ku em dikarin tê de bijîn pêş bixin. Misoger em bawer in ku ev yek gelekî girîng e û şertekî jiyanê ya herî bingehîn e. Zelal e ku li şûna têkîliyên jin û zilam a ku gelekî taybet bûye, bi pêşxistina rizgariya giştî ya zayendê têkîliyên giştî zayend a ku azad bûye ve em a rast dikin. Di vê mijarê de zehmetî jî çêbibin, di nava partiyê de bi taybetî pêşketina helwestên rêxistinî girîng in. Her çi qasî asteng jî hebin, her çi qasî hîn jî tu carî naxwazin vê qebûl jî bikin, di rastiyê de divê hun bibînin ku ev sedemeke ya herî zêde rihet dike ye.

Têkîliyên ku azad nebûne û zelal nebûne, her dem bi xwe re koletiyê û civaka kevin dide jiyîn. Şerê ku di vê wateyê de di rastiya me ya Rêbertiyê de tê meşandin, bi derxistina rastê ya sedan şehîdên jin ve, bi hezaran kesan ve ji artêşbûna jinê re rê vekirinê ve, ji mirov û jinên Kurd ên herî paşketî bi afirandina serhildanan ve xwe bi rengekî gelekî balkêş daniye holê. Dost jî, dijmin jî ditiye ku ev pêşketineke gelekî girîng e. Dibe ku kêmasiyên me hebin, lê belê ya girîng derketina holê ya bi hezaran milîtan û şervanên jin in. Dibe ku weke em bixwazin nejîn, lê belê pêvajoyeke ku ev qasî hêvîdarî pêş ketiye de eşkereye ku tengasiyên kesayet jî dê werin derbaskirin. Bi qasî hêviya rizgariya giştî bi pêş dikeve, misoger e ku arîşeyên kesayet jî dê hîn watedartir werin derbaskirin.

Divê tu kes bi niyetên xwe yên subjektîf ve rizgariyê hêvî neke. Ev ji bo min jî derbasdar e û gelekî zelal e. Em dixwazin zêdetir bikin û bi pêş bixin. Li ser vî bingehî jî hewldanên me berfirehtir in. Dê dahatû nîşan bide ku milîtanên jin ên bihêztir rêxistinkirina wan û tevlîbûna wan a bihêztir ji bo jiyanê û exlaqa rast jî bi vê pêşketinê ve bi tundî girêdayî ye. Hezkirineke rast ku ji bo jiyanê gelekî hewce ye, bi vê pêşketinê ve girêdayî ye û misogere ku ev jî dê bi rengekî me bi lez dorpêç dike dê çêbibe.Zelal e ku

dê şerê hezkirinê jî bibe fêkiyeke vê azadiyê. Teqez e evê li derûdora jina ku azad dibe de bi rengekî berfireh dê bi pêş bikeve. Me diyar kir ku, derveyî vê ji hezkirin û rêzdariyekê zêde nayê behskirin. Jiyaneke bêhezkirin nabe. Lê belê ger ev bi şerekî rast ve were qezenckirin tê pêkanîn. Çawa ku em bi şerê xwe ve welat û azadiyê bi dest dixin, kulîlkdayîna vê jî dê bi hewldanên taybetir ên şerê hezkirinê ve bi pêş bikeve.

## Hezkirina di rastiya rêbertiyê de meşa serkeftinê ye

Dema ku di hundirê we de sarbûn, hişkbûn û nexweşî pêş ket ev tenê dipeyitîne ku we zayenda xwe wenda kiriye û şoreşa hezkirinê ji bîr kiriye. Qirkirina ku dijmin di hezkirinê de pêk aniye we di xwe de temsîl kiriye, zêde ketine, we dest ji xwe berdaye û kirêt mane. Çawa ku di gêrîla de derbe xwariye û bêsedem rûbirûyê gelek zeraran mane, we di aliyê hezkirinê de jî derbeyên mezin xwarine, we ev li partiyê û li rêhevaltiyê jî daye. Rêbertî jî şer dike lê belê di Rêbertiyê de hezkirin mezin e. Qet kêm nabe, berovajî zêde dibe. Hişkbûn pêk nayê germbûn zêdetir dibe. Di rastiyê de hun di bin navê hezkirinê de yan radestî xirabiyê dibin an jî direvin. Di nava we de kesekî ku xwedî evînê ye jî tuneye. Hun nizanin ka evîn çî ye, bêguman wê demê hunê hişk bibin. Dibe ku hun miriyên li ser piyan in, gelo di min de ji bo çi ev qas evîneke mezin heye? Ji bo çi min rojekê jî evîn ihmal nekir? Ji bo ku ez weke we miriyê li ser lingan nînim. Ji ber vê sedemê rêza min ji gelê me, welatê me û ji hemû mirovên me re heye. Ji ber ku ez li hemberî dijminê ku me sar dike û ji piyan dikuje me. Xwedî jiyanekê me. Lê belê hun hişk bûne, di encamên têkîliyên di bin navê hezkirinê de ava dikin de direvin, hun dibine xayin.

Ez ji ber vê vî karî dikim û vî şerî pêk tînim. Ger rêza we û hêza we hebe hun jî dikarin bibin xwedî hezkirinê. Heta niha hêza we nebû, ji ber vê jî we him zerar da xwe, him jî derûdora xwe. Hun çi qasî bibin şervanên milîtan hunê ev qasî berdewamiyê jî bijîn. Dîsa ew jî bi rengekî hêzdar bi destxistina asta azadiyê ve gengaz e. Rizgarbûna ji evîna kesayet ne hêsan e. Ez jî bi şerekî gelekî zehmet ve ji evîna takekes rizgar bûm, dibe ku hun jê

rizgar nebûne. Ji vê rizgarbûn şerekî dijwar dixwaze. Ger hun bi zayend û pirsgirêka jiyanê ya zayendan re pêwendîdar bin van hemuyan jî bi erkên din ên şoreşê ve di nava hev de bimeşînin, hun dikarin wê demê bersivê bidin pirsgirêkên xwe.

Lê belê bi destxistina vê astê jî gelekî zehmet e. Pêşxistina plana jiyana azad ne hêsan e. Ya ku di vê mijarê de diyarker e, azweriya we ye. Xwestekên we çi qasî bi hêz bin, berdewamkirina vê ew qasî bihêz dibe. Ger hun çi qasî di tiştên ji rêzê de û takekesiyê de asê nemînin hun dikarin ew qasî berdewamiyê bi dest bixin. Çi qasî hun xwe li ber tevlîheviya pirsgirêkan bigrin hunê ew qasî bibin şervanê hezkirinê. Gelo Rêbertî di şerê hezkirinê de çawa bi pêş ve diçe? Ev nêzîkbûn û şereke ku di dîrokê de yê dişibe wê kêm in. Bi taybetî gelek fermandarên me di bin navê rastiya Rêbertiyê de hindek nêzîkbûnan nîşan didin. Mînak dibêjin “têkîliya hezkirinê ya Rêbertiyê wiha ye, li gel me hezkirin nehatiye qedexekirin, hezkirin girîng e em jî dikarin têkîliya hezkirinê bi pêş bixin.” Dema ku navê Rêbertiyê hildan devê xwe, dema ev li we sepandin diviya bû ku we şerê Rêbertiyê ku ji bo azadiya jinê dimeşîne bianiya bîra wan. Ew hewldana weke teorîk û pratîk ku riya azadiya jinê de nîşan dide we derbixista pêş. Diviya bû ku we ev pirsyar bikira “gelo te di mijara azadiya jinê çi kir, gelo tu min dinasî, gelo ez di rewşeke werim hezkirinê de me?”

Hun saf in an jî kole ne. Mînak yek ji nava we bi ferzkirineke yek alî ji min hez bike, ez dikarim xwe biparêzim, ji ber ku pîvanên min hene. Jina ku li gor van pîvanên min tevnegere nikare xwe li ser min ferz bike. Ev ji bo we jî derbasdar e. Ger ne li gor pîvanên we bin, hunê dest jê berdin. Hun ew qasî kole ne ku hindek fermandar hêzekê yan jî erkeke xof a rêxistinê bi kar tîne û bi navê Rêbertiyê dibêje, “were ez ji te hez dikim” feodal jî wiha nakin. Di vê rewşê de derdikeve holê ku hun çi qasî paşketî ne. Zagonê hezkirinê hene, hunê ji wî fermandarî re bibêjin, “zagonê hezkirinê hene, gelo te şerê hezkirinê li ku derê da?” Weke din divê hun ji bo hezkirinê pîvanên xwe yên bedewiyê daynin holê û bipirsin, “gelo ma bi rastî jî tu dikarî ji min hez bikî? Ji bo hezkirinê çi pêwîst in?” Di rastiyê de hun

nikarin ji van pirsan yekê jî bikin. Piştre jî yan hun hêjar dibin an jî stuyê xwe ditewînin û radest dibin.

Bi vî rengî Rêbertî xistina devê xwe rewşeke ketî ye, hewldanên herî zehmet ku Rêbertî bi pêş dixe, hewldana hezkirinê ye û ev li ser zimanan destanek e. Gelo ev yek çawa wiha tê bikaranîn û hun çawa li hemberî vê bikaranînê bêbersiv dimînin? Xwezî bikaribiyana ji we hez bikirana, xwezî nirxeke we hebûya min tiştek nedigot. Ez wisa bawerim ku ev fermandar, ew hesta binketinê ya ku şer daye wan, dixwazin di we de têr bikin. Ê ku erkê xwe yê rêxistin û şer bi cih naynin re parvekirina hezkirinê li aliyekî bihêlin, di nava rêxistinê de jî yekîtiyê par ve nakim û ezê her dem bi wan re şer bikim. Ger fermandar di erka xwe û di şerê xwe de binketî ye, heta derûniya revê dijî, dixwaze van lewaziyên xwe di jina kole de têr bike, ew misoger bênamûsî ye. Ev bi feraseta hezkirinê ya Rêbertiyê ve sedûheştê pileyan berovajî ye. Mixabin hindek milîtanên me yên jin di vî alî de gaveke wêrek nekarîne nîşan bidin. Her dem we stûyê xwe tewandiye yan jî tengav bûne û hatine rewşeke ku hun bûne kesayeteke xwedî arîşe.

Di rastiya Rêbertiyê de hezkirin meşeke serkeftinê ye. Têkîliya hezkirinê yên ku binkeftîne pêş dixin, tu pêwendiya wan bi Rêbertiyê re nînin. Di vê mijarê de pêşnexistina we ya gaveke wêrek ji bo we rûreşiyek e. Heta bi nazdarî xwe di asta jinîtiyê de girtina we, dayîna we ya tawîzeke mezin ji kesayeta azadiyê ya pîroz e. We ev hemû tişt jiya û di nava xwe de hun çilmisîn, bêguman ev hemû we tengav dikin. Divê hun xwe ji hemû van jiyînan berpirsyar bibînin. Di PKK'ê de tu kes nikare bi zorê hezkirinê ferz bike. Di PKK'ê de jin jî biçek e. Hun jî dikarin çekê biteqînin, hun dikarin bibêjin "ez ji te hez nakim, tu li xweşiya min naçî" Rexmî vê ger fermandarek êrîşê we bike, wê demê hun dikarin Rêbertiyê berpirsyar bigrin. Lê belê ger we stûyê xwe tewandibe ma dê Rêbertî çi bike? Ha hun radestî axayê gund bûne, ha fermandarê sexte yê di nava PKK'ê de. Tu cudabûna herduyan ji hev nîne. Berpirsiyariya vê di Rêbertiyê de, di rêxistinê de negerin. Di xwe de û di koletiya xwe de bigerin. Ez nikarim pêşî li fermandaran bigrim. Hindek fermandar ji bo ajoyên xwe dibe ku ji

sîxurekî navdar xetertir bin. Bi taybetî dibe ku ew derûniya binketinê ya ku şer di wan de ava kiriye, wan xetertir bike. Dibe ku fermandarê lewaz tola xwe hindekî bi koletiya jinê ve bistîne. Ji ber vê jî divê hun dahûrandinên Rêbertiyê bi baldarî bipejirînin û di nava hêviyan de nebin. Divê hun şerê xwe yê azadiyê bidin û xwe bi bînin rewşekê ku werin qebûlkirin.

Bi qasî ku hun şer bikin dikarin hez bikin, heta bi qasî şer dikin û bi ser dikevin mafê we yê hezkirinê dê ava bibe. Yê ku şer bi ser naxin jî zêde mafê wan ê hezkirinê nabe. Ger hun di qadên bîrdozî, polîtîk û leşkerî de pêşketinan pêk bînin wê demê asta hezkirinê ya jiyanê dê bi pêş bikeve. Tênegihiştina we ya vê li gor vê helwest pêşnexistina we, kêmasiyeke we ya girîng e. Divê hun ji bo pêşketina kesayetan hezkirinê ferz bikin. Kesayeteke milîtan a ku hezkirinê heq dike nîşan bidin. Ger wiha be, her kesê ji bo we rêzdar be û ferzkirinên koletiyê nake. Di dahûrandinên Rêbertiyê de ev hêman di asteke girîng de hatiye ronahîkirin. Gelo çawa dibe ku fermandarek van tiştan li ser we ferz dike? Ez di watedayîna vê de zehmetiyê dikişînim. Wisa ye ku tu pêwendiya hezkirinê bi fermandariyê re nîne. Ji ber ku bû fermandar hezkirin ji ber xwe ve çênabe. Aliyekî estetîk gelekî cuda ya hezkirinê heye. Divê em bi hêza çors û hezkirinê tevlîhev nekin. Hêza çors stûtewandinê, ev jî bêhezkiriniyê ango koletiyê ava dike. Ger ez kirêt bim, di rewşeke hezkirinê de nebim, ji ber ku tenê erka min a Rêbertiyê heye, divê hun min qebûl nekin. Lê belê ger ez di rewşeke hezkirinê de bim, divê hun bikaribin balkêş hez bikin. Rêbertî ger bi rastî jî Rêberên gel bin, çavkaniya hezkirinê ya balkêş in. Gelo ma ez xwe bi zorê bi we didim hezkirinê? Ger min hezkirin heq kiribe, bêguman hunê hez bikin. Ez gelekî baş dizanim ku ger ez yekî binketîbama ezê kêmendamek bûma. Kesekî merhabeyek nedida min û nedigotin tu çawanî jî. Ez vê ji pratîka sotîner a jiyanê gelekî baş dizanim. Çi qasî nav û nîşana min hebûya jî jinan li rûyê min jî temaşe nedikir. Vaye divê fermandarên me vî tiştî esas bigrin. Gelo milîtanên ku tê hezkirin, Rêbertiya ku tê hezkirin kî ye, çawa hatiye vê rewşê? Heta divê berî ku qaşo hezkirinê li ser we ferz bike, hun bizanibin bi hezkirinê nêzîkî wî bibin. Ev hêman hatine ronahîkirin. Ez hêvî

dikim her kes ji pêşketina Rêbertiyê re bi rêzdarî dê wateyê bide û derbasî jiyanê bike.

Şerê evînê gelekî xwîhdan rijandinê dixwaze. Ne ji vê bitirsin, ne jî bikevin nava xeyalên erzan. Bûyîna jina evînê weke pirsgirêkeke mezin bizanibin û daynin pêşiya xwe. Lê belê gelek kesên ku dixwazin bixin hene, nekevin xefikên wan. Ji berê ve ew têgeha xwedawend vala dernexistine. Mixabin niha ew nînin, lê belê em neçarin wê bi pêş bixin. Dibe ku vê gavê hun nikaribin van mijaran bi wêrekî nîqaş bikin, lê belê di vê mijarê de Rêbertiyê, rê û wêrekiya hewce daye. Dibe ku hun dikarin lezekê bi dest bixin û wêrek nêzîk bibin. Hindek kes diçin nêvenga jinê ya ku berhema hewldanên min e, dikarin wan bi gelek fêlbaziyan bi kar bînin. Gelo çawa dikarin min wiha bi kar bînin? Ez dixwazim jinên azad bi şerekî mezin ve bi pêş bixim, ew jî wan bi kar tînin. Ev diz û bênamûsên xetertir in. Dibe ku bixwazin dest daynin ser we û bibêjin “Rêbertî wiha dike” ez tu caran weke ew dikin nakim. Hezkirina min di asta awarte de ye. Ez wê keçikek çawa were hezkirin, bi şerekî mezin ve bi dest digrim û derveyî vê hez nakim. Ger weke min bikarîbûna hez bikirana dê ev welat biba bihûşt û jin hemû dê bibana ferîşte.

Gelo ev ji bo çi we dixapînin? Ji bo çi hun xwe ev qasî radest dikin? Têkîliya min jina xwedî nirx derxistiye holê. Gelo zilamekî ku nikare tu tiştî bike, çawa bi navê min dibe xwediyê we û hun jî li hemberî vê çawa diperçiqin û diçilmisin? Ev heqerateke ku li min hatiye kirin e. Ez zêde li dij nînim ku bi bandora min jinek an jî zilamek were hezkirin, dikarin ji min hêzê bigrin. Lê belê divê ew bi rastî jî hindekî li gor tiştên ku em dixwazin bikin û biafirînin be. Naxwe, bi kolekirina rêhevaleke me ya jin a gelekî xwedî nirx, an jî ji cewher dûrxistin û xistina nava qeyranê ve bêbandorkirin, hêmaneke ku ez pê herî zêde hêrs dibim. Divê ew fermandar tu caran ji bîr nekin ku her xirabîkirina wan dibe ku di cihekî de were tehemûlkirin lê belê di mijara jinê de bi hêsanî nayê tehemûlkirin. Feraseta namûsê ya di min de jî ev e. Ez ne li dijî hezkirin û hatina hezkirina ya jinan jî zilaman jî nînim. Lê belê zagonên van hene, zilam jî, jin jî neçarin van

zagonan bizanibin. Van zagonan ez jî pêk tînim. Tê xwestin bi xwe spartina erka fermandariyê ve bi ferzkirinên ku axayên feodal û zarokên sermayedar ên bûrjûva jî li şûna xwe dihêle, qaşo dê riya jiyanê were dîtin. Ev nêzîkbûneke herî tevlîhev e.

Di dîroka partiya me de, kesayetên wiha kêm derneketine holê. Hindek pravakator hebûn, herî zêde wan xwest ji piştê ve li min bidin. Jinên di nava me de jî li hemberî wan gelekî tawîzkar û gelekî temsîlkar nêzîkbûn. Em ji her alî de pêşketina jinan berdewam dikin, lê belê provakatorên ku çi ne ne diyarin, wan bi koletiyê bi xwe ve girêdidin. Piştre hesabê van nêzîkbûnan hate pirsîn. Bêguman ez di hêza jinê anîna xala hezkirinê û hatina hezkirinê de me û wisa kirina min jî ya herî xweşik e. Lê belê bi îstîsmarkirinan ve û xirab bikaranîna vê jî ew qasî bihêrs im. Jin jî nikarin xwe bi erzanî bi kar bînin. Nikarin bibêjin, “ma xwestek ne ya min e? Çawa bixwazim hez dikim û têm hezkirin.” Ev weke hun dixwazin nabe. Bingehê vê yê gelekî bingehîn ên nirxên moral û rêgezî heye. Hunê vê bibînin. Ez ji vê re dibêjim, “zagona evînê” yan jî “riya hezkirinê.” Divê zilam jî bi taybetî terbiyeyeke mezin û bi moral bikaribin van nirxan fêm bikin.

Gelek sextekar derketine û her diçe hemû keçikan heta ber bi girtinê ve jî dibin. Di demên dawiyê de min li hemberî vê hindek tevdîr girtin. Tevdîrên ku min girtine jî bersivên di derbarê pirsa milîtaneke jin dê çawa bibe? Û çawa bijî? Hatine pêşxistin. Tu caran hunê fermandarên binketî efû nekin. Ew dê binketîbûna xwe her dem bi rengekî herî xirab li jinê ferz bike. Tê xwestin ku jin her dem weke heyineke ku bêkesayetiya zilamê binketiye were dîtin. Divê hun zilamekî ku heta mejiyê hestiyê xwe bi rastiya şer, welat û azadiyê ve nehatiye girêdan, di vê mijarê de xwe bi caran nepêyitandiye, weke xeteriyeke cidî bibînin. Divê dilê we û giyana we ji her tiştî hez bike. Lê belê tu caran divê zilamekî wiha hez neke. Di vê mijarê de gelekî xwedî rêgez bin.

Tenê riyeke anîna rê ya zilamê Kurd wî bi mirînî tevlîkirina nirxên welat, partiyê û her cureyê şer, zilamê Kurd encax evê bi ser bixe, dikare were feraseta namûsê ya rast. Naxwe ew belayekî mezin e û bi wî nexapin. Jin

alîgirê reva ji nava refên me nînin. Ên ku wan direvînin zilam in. Ger di jinê de rev ji sedî yek be, di zilam de ji sedî nodûneh e. Yê ku wê sedî yekî direvîne jî zilam e. Ji vî alî ve xwe rast binirxînin û layiqê helwestên me bibin. Ger şervantiyeke we ya piralî hebe, hunê rêbaza herî bibandor a anîna rê ya zilam jî bibînin. Jineke hêjar weke malekê ku her dem zilam çav bidêye. Gelekî qirêjkirina têkîliya zayendî ya ji aliyê zilam ve taybetî weke amrazekî çewisandinê bi kar anîn û hetanî dawiyê dîtina zilam, xwe xwedî maf dîtin bi temamî çîneyatiyê, bi rastiya çewisandina netewî, dîsa bi pêşketina ne wekheviya navbera zayendan ve girêdayî ye. Zayendîtî jî amrazeke vê ya gelekî girîng e. Zilam weke ku serdestiya xwe hizrî û derûnî bi pêş dixe, weke zayendî jî bi pêş dixe.

Ger hun ji xwe bawer in, hunê xwe azad bikin. Ger hun azadiyê hildibijêrin hunê milîtaniya wê bikin. Mala partiyê jî weke cihekî mala malbatê ya li bendê mayînê nebînin. Ne ji xwe re li xwediyan bigerin, ne jî bixwazin ji xwe re xulamekî bibînin. Em girêdaniya şerê ku em dimeşînin, bi bedewiyê re datînine holê. Divê jin û zilam xweşikbûnê bizanibin. Xweşikbûn tenê di fîzîk de ne, dikare di giyan û mêjî de jî bi pêş bikeve. Ger hun li ser vê bingehê xwe bigrin dest, hun dikarin xwe ji pirsgirêkan rizgar bikin. Weke din pêdîviyên we hîn zêdetir bi têgihiştinê û wêrekiyê heye. Lê belê dema nêzîkbûnên weke “xwe li min ferz kir, bibandor bû, xwedî erk bû, ez jî cahil bûm, min stû tewand” derbas bûye. Weke ku tu kes nikare xwe bispêre erka partiyê û têkîliyê ferz bike, nikare xwe bispêre jinbûna xwe û di refan de cih bibîne. Pêşketîbûna civakî û siyasî esas e.

Emê ji bi destgirtina zayendîtiyê jî netirsin. Ne emê xwe bispêrin zayendîtiyê, ne jî ji ber ku pêwendiya me ya zayendî çêbû emê xwe tawanbar bihesibînin. Di vê mijarê de dahûrîn ronî dikin. Ez nêrîneke weke ku hêviyeke we hemûyan heye dikim. Ez dibînim ku hun derûniyeke weke ku hun xwe dispêrine têkîliyeke zayendî ger serdestek we yan jî jineke we, mêrekî we hebe hunê bi kêfa xwe bijîn û dijîn. Ez divê diyar bikim ku ev jî gelekî xeter e. Di pîvanên klasîk de û têkîliyên wiha de kêfxweşî nîne. Berovajî têkîliyên bi vî rengî çavkaniya nekêfxweşiyê ne. Wiha nikarin

bigihên miradên xwe. Ez çêbûm hetanî niha min ev gotin jî xeter û bi koletî dît. Lê belê hun dibînin ku bi jinan re jî ji xwedî hêz jiyînê em natirsin. Lê belê tişta destpêkê hewce ye nîqaşa bi jinê re ye, axaftin e, derxistina rastê ya vîna jinê ye. Divê zilam jî xwe ji nêzîkbûnên xwe yên zayendîtiya çors rizgar bike. Em destpêkê bi ser bixin piştre bila pîrozbûna zayendîtiyê were bîra me û em ji vê jî netirsin. Mijar gelekî berfireh derdikeve rastê. Bi vê şêwazê danîna holê jî divê neyê berovajîkirin. Her carê nebêjin "vî fermandarî xwe li ser min ferz kir, li min zext kir an jî evîna min a takekes hebû, ez ji têkîliya zayendî kêfxweş bûm" û xwe bi xwe neynin rewşa tunekirinê. Xwe ji nêzîkbûneke paşbêjiyê dûr bixin. Mirov li ser zayendîtiyê ne dibe qehreman ne jî bi pêşdarezînên weke "min xwe gelekî binamûs parast" ve em xwe bixapînin.

Ez xwe di vê mijarê de gelekî hatiye dahûrandin, ji pirsgirêkeke mezin rizgarbûyînê û heta toleke mezin stendinê serxistiye dinirxînim. Wiha li ser xwe serdestbûyina min aliyekî herî bihêz a rastiya me ya Rêbertiyê ye. Tu pirsgirêkên min ên ku ez bi jinekê re çareser nekim nîne. Ez dikarim jinekê di rewşeke hêza jiyanê ya bêdawî de jî bigrim, bi wê re dikarim bijîm jî. Min ev rastî bi dest xistiye. Ev qasî bi ewlebûneke mezin ve hatina we ya tekoşînê ji ber hîskirina we ya pêkhatina çareseriyê ye. Divê hun bikin malê xwe û ev qezenca ku gelekî girîng e, derbasî jiyanê bikin. Weke ku me çavkaniya hezkirinê rast destnîşan kir, me hesta ku dibe lewaziyê jî dahûrand. Em bûyera ku jê re hestên erzan tê gotin û sempatiyan bi hezkirina ku hatiye destxistin ve tevlîhev nakin. Hezkirin bûyereke civakî û siyasî ye. Sempatî jî bûyereke fîzîkî û ajoyî ye. İsrarkirina we ya di jiyîna ajoyan de rê li ber lewaziyê vedike, heta hunê gelekî hov bimînin. Lê belê ger hun hezkirinê xwedî ast bikin hunê mirovbûneke bilind –ku ew jî bi pêşketineke civakî û siyasî ve gengaz e- bijîn.

Di çareseriya PKK'ê û Rêbertiyê de cihnedayîna hest û sempatiyên ji rêzê û li xwe pêkanîna xeteke muhafazakariyeke gelekî hişk, ji bo neketina nava lewaziyan û ji lewaziyan re rê venekirinê ye. Di vê xalê de Rêbertî gelekî muhafazakar e. Lê belê piştre dema ku hezkirina dibe civakîbûnê û

siyasîbûnê bi dest xist jî evîndarekî awarte ye. Diviyabû ku we ev cudabûn gelekî baş dîtiba. Asta ku piştî vê tê, cejna azadiyê ye. Gelo ev azadî çi ye? Çareserkirina girêka kor bi taybet hêza ku ketibûnê pêk tîne, veguhertina pîrozkirinê nêzîkbûna çors û kirêt pîrozkirin û bedewkirinê ye. Ez bi welat û gel ve hatim girêdan. Min ev girêkakor parçe kir jin jî, zilam jî bi vê ve girêda. Cejna ku ez dijîm ev e. Di vê mijarê de şoreş hatiye kirin, divê em li hev parkirina encamên vê şoreşê jî bizanibin. Bi rastî jî ev şoreşek e. Aliyê wê yê leşkerî civakî û rêxistinî misoger e. Kesek nikare van li aliyekî bihêle û bibêje, "Rêbertiyê riya hezkirinê wiha vekir, em jî bi hev şabibin, heta bikevine têkîliyeke wiha". Ev durûtiyeke herî mezin a were kirine. Bêyî ku hêza Rêbertiyê ya siyasî, leşkerî û rêxistinî ya awarte were parvekirin, piştgirî neyê dayîn kê di şoreşa hezkirinê û azadiya zayendî de dibêje, "were em wisa bijîn, wiha bijîn" ew xeteriya herî mezin e. Ev pirsgirêkeke xwedî hêzbûnê û rizgariyê ye. Encax ê ku ev ast bi dest xistine dikarin ji bo vê mafê bi dest bixin.

Ger zilam weke fîzîkî û siyasî xwedîhêz bûna, dikarîbûn we bixin qalibekî ku ew dixwazin. Ji ber ku Rêbertî ji bo azadiya jinê him xwedî rêgez e, him jî şervanekî dijwar e. Yên ku nexwedî vê helwestê ne derfetê ji bo vê nabînin, bi wê nikarin û hêrsa wan jî her diçe zêde dibe. Şerekî min jî ya bi rik heye. Ez di van mijaran de yekî wêrek im, ger jina zilam jî hebe ez dibêjim, tu nikarî vê jinê wiha bi kar bînî. Jina te be jî ezê ji dest te bigrim. Te jî ew xapandiye, yan bi hêza xwe ya madî ya zayendî jî te ew hêjar perçiqandiye. Ev tişt wî zilamî tevlîhev dike. Namûsa ku dizane ya herî pîroz e, jina wî ye, ew jî diheje. Bêguman wê ew zilam bi Rêbertiyê hêrs bibin. Lê belê li gorî feraseta min a azadiyê standina jinan a wiha seqet e. Wisa ye ku jin jî ketiye rewşeke hêjariyê. Ez li jinên di destên wan zilaman de temaşe dikim û dibêjim, xwedê neyne serê kesekî. Ji bo xwe jî ez vê, têkîliyeke bi îşkence, weke têkîliyeke bi vê şêwazê dibînim. Tiştê ku gelek xweşiya wan diçe, ji bo min a herî zêde tê nefretkirin e.

Hun dê balê bikişînin, gelo feraseta ku naxwaze rojekê jî bide jiyîn çi ye? Ev feraseta kê ye? Ji bo çi vê wiha ferzdikin? Ji bo ku hun bikaribin xwe

biparêzin, divê hun vê binirxînin û her dem xwe bikin xwedî hêz. Ez bawer nakim ku jin ev qasî bare jî. Ew nirxandina we ya ku hun xwe weke “em çi qasî li Rêbertiyê dibin bar?” jî ez weke nirxandineke bêberpirsyarî dibînim. Jineke ku kêm zêde PKK’ê nas dike, ne bar e. Ger armancên xwe yê şexsî nebe, ger yeke paşverû nebe bi temamî keseke ku parvekarê barên giran e. Yê ku azadiya jinê esas digre gelekî xwedî nirx e. Divê ji aliyê her zilamekî ve were fêmkirin ku jin çavkaniyeke jiyanê ye. Bi xwe spartina hêz û erka xwe ya zilam gotina wî ya, “ez jinê nadim jiyîn” ez gelekî ketî û xeter dibînim. Artêşbûna jinê divê bi taybetî li hemberî vê ferasetê berxwedaneke mezin nîşan bide û li dij vê şerekî xwedî rêgez bimeşîne. Weke din mirov nikare ji bin vî karî derbikeve. Ger zilam vî tiştî dibêje, ji ber ku bi rêxistinê û erkên di destên xwe de dihêle ye. Wê demê ya herî zêde ji bo we pêwîst rêxistin e û erka wê ye. Bibin rêxistin, erkên wê bi dest bixin û li hemberî vê xeteriyê jî bersiva hewce bidin.

Gelo ji bo çi hîn hun di takekesiyê de bi israr in? Ji bo çi bi rêzdarî nêzîkî artêşbûna xwe nabin? Ji bo çi hun rêgezên xwe weke manîfesto hîn nakin? Ger van nekin, hunê di nava partiyê de nemayînê û qewitandinê yeke weke ku her dem giraniyê çêdike û biçûk lê tê temaşekirin heq bikin. Ji bo vê ji we re rêxistin gelekî pêwîst e. Ji bo ku hun nekevine vê rewşê û ji bo ku derfetê nedin vê çek, zanebûn, bîrdozî û rêxistinkirina wê gelekî girîng e. Ger rêza we ji we re hebe, weke hêzeke artêşê ku di nava partiyê de herî bi rêxistî û herî zêde li rêgezan balê dikişîne, hunê xwe bi ziravî binirxînin û hêza ku nêzîkbûnên ihtimale ji zilam werin ên xeter û neyînî derbas bikin, hunê xwe bispêrin vê rêxistinê û nîşan bidin. Weke din riya rizgariyê nîne.

Di PKK’ê de şerê herî dijwar ê di navbera zayendan de di şer de heta di zayendîtiyê de tê jiyîn. Ger we xwe di vê mijarê de cahil û bêtekoşîn nehiştibe hunê li hemberî encamên vê jî li ber xwe bidin. Şerekî bilind heye û derveyî vê riyeke rizgariyê nîne. Nêzîkbûnên xwekujiyê, qeyran û revê misoger binketin e. Hun bi qasî ku li hemberî dijmin şer bidin ber çavên xwe wêrek dibin. Lê belê gelo hun li hemberî van rewşan ji bo çi nikarin wêrek bin? Ka hun milîtan bûn, ka we dê li hemberî paşverûtiya hundir û

derve stûyê xwe netewanda? Ka we dê azadî esas girtiba? Wê demê pêwîstiyên vê yekê bikin. Di vê mijarê de hetanî dawiyê şiyar bin, bi zayenda xwe, bi jinbûna xwe bawer bin, ji vê kêfxweş bin û vê nedin binpêkirin. Di vê wateyê de misogere ku zilamek ji jinekê xwedî hêztir nîne. Ew ji we zêdetir hewcedarê we ye. Ew ji we zêdetir şoreşger nîne, lê belê ji bo ku ev wiha be divê destpêkê hun rêzê bidin zayenda xwe. Ji bo pirsgirêkên wê hêza we ya çareseriyê rêxistinbûna wê û şerê wê yê li ser bingehê azadiyê pêwendiyê nîşan bidin. A herî girîng jî divê hun bi nirxên wê yên moral heta dawiyê girêdaniyê nîşan bidin. Ger hun vê bizanibin û pêk bînin, weke ku hemû pirsgirêk dê werin derbaskirin, hemû jiyana we dê di nava rêxistinê de rê li ber pêşketinê vebike. Dê têkîlî li ser hemû pêşketinên rêxistinî, siyasî û heta leşkerî bandorê bike.

Bi taybetî li hemberî helwest û nêzîkbûnên ku çavkaniya xwe ji zilam digrin, di nava nêzîkbûneke watedartir de bin. Divê hun bi rêgez û bi pratîka xwe ve bikaribin tevlîbûneke ku têr bike pêk bînin. Pêşketina Rêbertiyê di vê mijarê de xwedî hewldaneke girîng e. Ez wisa bawer dikim ku me derfetên çareseriyê yên pirsgirêkan ên girîng bi dest xistin. Hîn jî ez kar dikim ku pêvajoya herî germ a şoreşa jinê bi ziravî pêş bixînim. Divê ev hewldan jî gelekî rast were fêmkirin. Ne tenê jin divê zilam jî ev xebata ku tê meşandin bi hemû aliyan ve jidiliya xwe, ya fêmkirinê nîşan bidin.

Tiştê ku ji nan û avê girîngtir pêşketina azadîxwaz e. Divê pêwendiya ji vê re her ku biçe were bilindkirin. Divê dawî li ferasetên ku hev bar dibînin an jî weke “nayê jiyîn û nade jiyîn” dinirxîne, were anîn. Berovajî divê were dîtin ku dê rê li ber hevrejiyînê û şer vebike. Misoger e ku gavên em li ser vê bingehê diavêjin, piştî vê jî hîn bi bandortir û encamên serkeftî dê bide. Heta dawiyê bi xwe bawer bin, wêrek nêzîk bibin, hunê bi ser bixin.

**4 Reşemî 1996**

# AZADÎ Û BEDEWÎ BI TEKOŞÎNA JINÊ VE TÊ AFIRANDIN

Berê di rastiya Kurd de ji bo jinê dihate şerkirin. Îro jî dê ji bo jinê were şerkirin. Lê belê ev şer ji aliyê armanc û berfirehiyê de êdî gelekî guhertî ye. Divê şerê jinê weke hêmaneke şerê ax û azadiyê ya ku weke goşt û neynokê bi hev ve ye were nirxandin. Şerê jinê, şerê axê, azadiyê, welat û rêxistinê ye. Berovajî armanc û berfirehiya şerê ku heta niha hatiye kirin e. Divê her kes di vê mijarê de jî di xwe de teqandineke zanebûnê û heta şêwazê xwe yê şer de jî guhertineke bingehîn bike.

Ev aliyê rastiya Rêbertiyê jî gelekî balkêş e. Heta dawiyê ji artêşbûna jinê re cih heye. Lê belê divê hun bikaribin hêzê bidin şêwazê wê yê milîtaniyê jî. Divê em vê ji bandorkirina karkirinê, tengkirinê û lewazkirinê derbixin û wê weke çeka perwerdê ya jiyanê, şer a bihêz bibînin. Ez bawer nakim ku ji vê zêdetir tu daxwazên me hebin. Divê hun hêzbûnê bizanibin. Gelek jin pêwendiyê bi me re dikin, bersivên ku ez bikaribim bidim wan ev in. Ma gelo ji vê zêdetir mirov dikare tiştekî din bixwaze? Ez derveyî vê çareyekê nabînim. Ev şerekî mezin e û ev şerê jinê dê encamên girîng bide. Dê bedewî were qezenckirin, azadî were qezenckirin û şer jî were qezenckirin. Divê her kes hindekî vê cidî bigre. Ev bi qasî ku bûyîna xwedî feraseteke bilind, xweterbiyekirinê jî dixwaze. Nêzîkbûnê bi şêwazê berê dê we bibe karesatan. Ger hun hindek pîvanên bingehîn ên şêwazê Rêbertiyê ya di vê mijarê de bi dest nexin, hunê berî ku bigihên dijmin di sînorê jinê de bi binbikevin. Ev sînorekî gelekî xeter e. Ezmûna min heye. Di vê mijarê de hindekî min cidî bigrin. Ger hun şêwazê rast ên jiyan û şer bi dest bixin dê xebatên jinê, asta wê ya têkîliyê, asta wê ya di têkîliyên xwe yên bi zilam re serkeftinê zêdetir bike, jiyanê pênase bike û misoger dê şer bi pêş bixe.

Ji vî alî ve hindekî mejiyê xwe biwestînin, bi nêzîkbûnên kevneşop ve nebêjin “jin e, lewaz e, weke em dixwazim emê bixapînin.” Ev gelekî xeter in. Hun bikaribin bixapînin jî, nexapînin. Ew ji bo xapandinê dest bidin jî misoger tenezûlê vê jî nekin. Bi qasî ku xwedî rêgezbûnê gelekî bi edeb û

terbiye bin. Di heman demê de bi qasî pîroziya şêwazê têkîliyan zehmetiyên wê jî bînin pêş çavan. Divê em di van mijaran de xwe bigihînin an jî hêza derbaskirina encamên wê bikaribin nîşan bidin. Em pirsgirêkê ji rêze nagrin dest, ger hun xwe di van mijaran de bi rêkûpêk nekin, hunê werin rewşekê ku ji pîrekê hîn xirabtir. Çi kêfxweşiyeke ji bo min ku min bi qasî ku xwe di vê mijarê de nexapand, min jî nexapand û di encam de ev nirxên azadiyê derketine holê. Zilam jî hindekî bi pêş dikevin. Ev li gor rastiya ku min gelekî ji berê ve tespît kiriye çêdibe. Ji bîr nekin ku di sosyalîzmê de jî tu kesî ev ziravî bi dest nexistiye.

Jineke Çînî hate serdana me, ev jin rêveberiya Çîniyan weke navê xwe dizane. Heta sala 1949'an serokê şagirtan bûye. Jina Çînî digot, "di welatê me de di derbarê pirsgirêka jinê de xeletiyek hate kirin. Rewşenbîrekî got, "em hêjmarê di sînorê pênsed mîlyonî de bigrin" lê belê serokên wê demê ev qebûl nekirin û zilam tasviye kirin. Niha hêjmara me mîlyarek û dused mîlyon e û ev jî pirsgirêkeke mezin e. Em dibêjin ji bo malbatekê zarokek bes e û ev polîtîka jî wan zarokan gelekî bi tinazî mezin dike. Ev jî rê li ber pirsgirêkên mezintir vedike." Li gel ku em rêzê didin Mao, min got em dixwazin di vê mijarê de hindekî din kûrtir bibin. Bi şêwazê we nêzîkbûneke me ya malbatê nîne. Me pirsgirêka malbatê weke pirsgirêkeke mezin danî pêşiya xwe. Rexmî ku em hatine vî temenî jî. Ez nikarim diyar bikim ku me hîn jî pirsgirêk tam çareser kiriye. Min ji wê re got, we xwest vê pirsgirêkê di rêkurtkê re çareser bikin û encamê wê jî bû karesat. Wateyeke vê nêrînê jî heye. Ger em vê pirsgirekê pir alî û gelekî baş nehizirin, bi hemû aliyan ve çareser nekin –ku civaka Çînê civakeke mezin e- emê ji wan zêdetir pirsgirêken têkilhev bijîn û bifetisin.

Heta me diyar kir ku komînîstên berê dest ji jinên xwe yên berê berdane, jinên nû stendine û ev jî li gel wan gelekî tê jiyîn. Wê jî di vê mijarê de Mao anî ser ziman. Me got em van hemû tiştan bi bîr tînin û dixwazin ku xeletiyan nekin. Weke din jina Çînî got ku hevjîna Mao Chiang Cing entrîkakareke çawa ye û jina herî xirab a Çînê ye. Me jî got em wê dizanin û weke din me ev dahûrand. Heta me ev weke jineke mîrasxwar nirxand.

Hevjîna wî piştî Mao komek jî ava kir. Lê belê tişta girîng di vê mijarê de hê ji niha ve hêza me ya dahurandinê çi qasî bilind e. Tê wê wateyê ku hun sosyalîzmê jî ava bikin û di navberê re pêncî şêst sal jî derbas bibin, pirsgirêkên ku nehatine dahûrandin, rê li ber binketina sosyalîzmê jî vedike. Tişta ku ez dixwazim di vir de diyar bikim ev e: Pirsgirêk pirsgirêk e, bi hemû cidiyeta wê ve fêmkirina vê û ji bo vê çareseriyên saxlem peyda kirin girîng e. Me ev pirsgirêk çareser nekiribe jî me hetanî dawiyê anî rewşa giştîbûnê.

Ger nêzîkbûnên we yên ne cidî û nêzîkbûnên zilam û jin ên sivik nebin gengaz e ku mirov bersiveke bihêz bide têkîliyan. Di rastiya civaka Kurd de jin gelekî hatiye kirêtkirin û bêhezkirinî gelekî bi pêş ketiye. Zayend weke dijminan nêzîkî hev dibe. Şêwazê mezinbûna zarokan jî gelekî xeter e. Têkîliyên jin û mêrtiyê di astên ku mirov nikare tehemûl bike de ye. Dîsa di refên partiyê de têkîliyên hestiyariyê vê gavê ji sedî nod xayinî ye. Yê ku şûn de dimînin jî înkar dikin. Ger têkîliya hestiyariyê çêbibe dê ji sedî nod bibe xiyanetê. Bêguman ev jî pirsgirêkeke gelekî cidî ye.

Ger hun dixwazin min cidî bigrin, hun jî dikarin rastiya ku serdest e wiha rave bikin. Mirov ji ser vê ve naqewêze. Tê fêmkirin û kar tê kirin ku were çareserkirin. Ez hêvî dikim ku hun dikarin di vê mijarê de bibin şagirtên saxlem û di mijara xeletiyên mezin nekirinê de dikarin xwe rawestînin. Pirsgirêka jin, pirsgirêka têkîliyê, pirsgirêka çawa bijî, pirsgirêka beriya şer e û dema çûyîna ser çêdibe, divê ji vê re bibin bersiv. Ên ku nikarin bersiva rast bidin, ji pirsa çawa bijîn nikarin gavekê biavêjin ber bi çawa şerkirinê ve. Ger ji nava we şervanên mezin dernakevin, ev ji ber ku hun nikarin bersivê bidin pirsa çawa bijîn e. Ez jî xwe li gor pirsa çawa bijîn û bi taybetî jî di mijara jinê de çil sal in perwerde dikim. Ger wesfeke min a Rêbertiyê heye sedema wê ya herî bingehîn, hêza xebatê ya çil salan e. Ez xwe di vê mijarê de digihînim, nîşan didim. Di mijara jin û çawa bijîn de ji bo ku ez xeletiyan nekim ev qasî xwe perwerdekirina min û dîsîplînkirina min rastiya min a Rêbertiyê derxiste holê.

Hun bi ihtimaleke mezin nikarin bersivê bidin têkîliyeke çawa, jiyaneke çawa, ji ber vê digrîn û gelekî xelet bersivê didin şensê xwe yê rêbertiyê û milîtantiyê wenda dikin. Ger hun naxwazin wenda bikin, bi şêwazê Rêbertiyê ve pirsgirêkê cidî bigrin. Bi fazîleta zilamtiya Kurd, jinbûna Kurd bawer nekin. Kar hindekî guhertî ne, rastî hîn cudatir in. Ez dixwazim jinê lêkolîn bikim û wê bi lêv bikim. Bi kevneşopên Kurd encam girtina wan û namûsê tam bi nîşandana wê bawer nekin.

Pirsgirêkeke me ya herî girîng jî xebitandina ziman û dilê we ye. Bêguman gelek hevalên me ne di ferqa vê de ne jî. Nizanin ka ev yek tê çi wateyê jî. Gelo şervantiyeke azadiyê ya wiha bêziman, rûreş –ji bo jin, zilam ferq nake- çawa dibe? Gelo hunê bi kesan re çawa bijîn? Ne di zilam de ne jî di jinê de aliyekî ku min bandor bike nîne. Qaşo hun dibêjin “em ji Rêber gelekî hez dikin.” Lê belê hun Rêber ji hêzê dixin. Ez tiştekî ji niyeta we ya baş, fedakariya we re nabêjim. Ev pirsgirêkeke jêhatiyê û xwe gihandinê ye. Mînak Rêber bi jinê re mijûl dibe, dixwaze ku hetanî dawiyê jinê baş bigre dest û wê balkêş bike. Lê belê gelo rewşa we çi qasî dest dide vî tiştî? Hun çi qasî xwedî xwestek in? We bi salan hemû hewldanên min vala derxistin.

Em dixwazin jina ku pê re were jiyîn derbixin holê. Jin her dem hêjar û neçar ma. Di rastiyê de jin li çiyê zû de ji jiyanê qut bûne û kirêtbûneke mezin dijîn. Me got şer azad dike, bedew dike, tîne rewşekê ku tê hezkirin. Vê berovajî pêk tînin, dibêjin “şer kirêt dike, kirêtî kole dike, koletî dike mî û dike bela seriyan.” Ev derkete holê. Çend jinên hilbijarte derbiketana holê û ev berovajî bikiribana dê çi qasî baş biba! Gelo di nava we de yê ku jiyanê dixwaze kî ye? Dema ku hun derfetê bibînin ne diyar e ka hunê kîjan xeteriyan ferz bikin?

Vê gavê pirsgirêk, nebûyîna hêza mezin û têkîliyeke ji rêzê, bi karesatan encam dibe. Em li têlîliya milîtanên me yên herî navdar temaşe dikin, ditirsin. Ji ber ku weke hev vala derdixin û ji ber vê sedemê partiyê cihê dikin. Ez dizanim ku ji bo dilê xwe yên ji rêzê, her dem hun dikarin dest ji me berdin û xiyanetê li me bikin. Ji ber ku dilên we yên xwedîhêz nîne.

Hemû jin û zilam ji ber ku hêjar in û neçar in, ji me hêzê bigrin û nikarin derfetê bibînin xwe, weke ku bi me ve girêdayîne nîşan didin. Ez jinekê yan jî zilamekî ku bi mêrxasî û merdî heta dawî bi me ve girêdaniyê nîşan bidin, nabînim. Me dît ku dema derfet dîtin çawa reviyan kê? Di vê vê mijarê de derfetên min hebûn, lê belê ez nereviyam. Min ji bo jinê dest ji jinê berneda. Me kesek ji we neda revandin, hêza me ji bo vê hebû. Lê belê dîsa jî me neda revandin.

Em pêvajoyên ku em jî pê bandor bûn ên ku em di bin bandora xavîtî yan jî pergalê bûn, dijmin xwest me bi riya jinê bandor bike. Lê belê me dest ji partiyê û welat berneda. Gelo bi vê şêwazê çend heval li ser piyan in? Hestên hindekan hene, ew jî li hemberî me veguherîne tolhildanê yan jî bêpewendîtiya balkêş. Bi şêwazekî "ma gelo tu yî, yê ku jiyanê wiha li ser me ferz dike?" nêzîkî me bûne. Hemû tiştê ku ez dixwazim, di van têkîliyan de pêşketina mezin û xwedîhêzbûnê derbixime holê ye. Jinê xwe gelekî balkêş ferz kir heta hemû hewldanên me yên partiyê serûbin kirin. Zilam jî hîn hêrsa wî nesekiniye û weke "te çawa ev mal ji dest me girt?" bertekan nîşan dide. Ez jî li hemberî van dibêjim "destpêkê welat, destpêkê partî." Yan jî ez dibêjim bila ev bi welat û partiyê re bi hev re bin, yek li yekî xiyanetê neke. Mixabin kesek nikare hêza xwe nîşan bide. Ev dibêjin "destpêkê ajoyên me, destpêkê li ferasetên me yên bi mal û milk destûr were dayîn." Di vê de jî encam nîne. Ji ber wê jî ez ji vê nefretê dikim.

Ez kesek im ku xwe bi hêsanî naxapînim. Ez ji mirovan jî fêm dikim, di vê mijarê de ezmûnên min hene. Bi hezaran komplo li me hatin kirin. Ên ku xwestin xençerê li me bidin çêbûn, min bi hezaran keç dîtin û gelek ji wan nizanin ka çawa min xençerkirin. Lê belê ezmûnên min hene. Yên ku bi navê hestên erzan û lewaziyan min bixine çi rewşê hene. Min ev hemû dîtin. Min zilamên ku tenê ji ber ku bi jinê re neketiye têkîliyan, bîst salên xwe vala xerckirine dîtin. Bila jineke wî, maleke wî hebe, ji bo wî bes bû. Min jî got bila wisa nebe û bertek nîşanî vê dan.

Mêrxasî destpêkê gotina rêxistin, gotina welat, destpêkê li gor şer gavavêtin e. Li gor jinê, li gor zilam li gor bendewariyên xwe, xwe rêkûpêk

kirina we ne mêrxasî ye. Vaye şer, vaye welat li wir e. Jiyanê mezin bikin û xwe bikin çavkaniya jiyanê. Ew jî dibêjin, “naxêr, em dixwazim hev bixapînin, ger tu destûrê nedî vê em qet naxebitin.” Ê ku vê dibêje bila nexebite. Ji ber ku ji bo min mêrxasî cuda ye. Ger hun xwe bipeyitînin, dê riya jin û mêr vebibe, ger hun xwe nepeyitînin rê venabe. Ev di min de zagoneke netewî ye. Lê belê hun naxwazin vê yekê fêm bikin. Ji bo ku hun fêm nekin jî hun xwe gelekî hestiyar, gelekî bi çavgirî, bi ferasetên bi rengê gelekî girêdaniyên erzan ser digrin. Hun li gor xwe kesayeta durû ya guhertîtir nîşan didin.

Emê di vê mijarê de jî jina gotina wê gelekî vekirî, dil vekirî gelekî rasteqîn dikare bibe aliyekî saxlem a partiyê, azadiyê, şer û rêhevaltiyê, bi pîvan, xwedî rêgez û tawîzan nade biafirînin. Ji ber ku weke din tu çareya me nîne. Emê li ser wê bisekinin. Derveyî wê bila tu kes ji me feraset, helwest û azadiyê hêvî neke. Em ji pirsa Çawa Bijîn re li ser vê bingehê bersivê didin. Divê em ji jiyanê bawer bikin, jiyan gelekî bedew e û bûyereke balkêş e. Tiştên ku di me de hatiye mehfkirin û herî zêde dijmin tehrîp dike jî ev e. Dijmin tu xweşikbûn û tu nirxê ku divê were jiyîn nehiştiye. Jixwe sedemeke bingehîn a ku nahêle hun bi hêz tevlî şer bibin jî, nedîtina we ya derfetên jiyanê –ku ev jî rê li ber encamên jandar vedike- û esas girtina we ya gavavêtinên xwekujiyê ye.

Ger hun bizanibin ku jiyaneke mezin û divê hun pê ve gelekî girêdayî bin heye, hun wiha narevin. Mirinên erzan, bi hêsanî xeletiyan nakin, ev qasî rê li ber wendahiyan venakin. Şehadet jî wisa bi pêş nakevin. Ger hun nirxê bidin jiyanê, ger hun bizanibin ên ku ji we hez dikin tu caran vê qebûl nakin û divê hun tu caran rêhevalên xwe bi tenê nehêlin, hun xeletiyan nakin û rê li ber wendahiyên erzan venakin. Tê wê wateyê ku li gel me nirxeke jiyanê û kêfxweşiyeke jiyanê nîne. Rêz û girêdaniya we ji hezkiriyê we re nîne. Ji ber vê sedemê jî hun bi biryareke takekesî ve dawiya her tiştekî tînin. Ji bo pirsa Çawa Bijîn bersivdayîna gelekî ezez û gelekî bi koranî tê wateya qet nebersivandina vê pirsê ye.

Sedema herî bingehîn ku min li ser piyan dihêle, hestên min ên welat, ên gel heta hestên min ên ji bo jinê ne. Ji ber ku girêdaniyên min gelekî bihêz in, ez berxwedana xwe rêxistinbûna xwe û taktîkên xwe yên rojane pêş dixim. Ji ber ku girêdaniya min bi jiyanê bihêz e, hezkiriyên min gelek in, ên ku bi min ve girêdayî ne gelek in, ên ku ji min hêza jiyanê dixwazin gelek in. Ez jî gelekî ber xwe didim, xwe balkêş rêxistin dikim û bi hêsanî wenda nakim. Ger ji bo pirsa Çawa Bijîn bersiveke we ya wiha hebe, hunê vî welatê xweşik veguherînine herêmên rizgarî, bi rêhevalên xwe ve girêdaniyekê pêş bixin, rêxistinbûna xwe û nirxên şer bilind bikin. Ev hemû ji bo pirsa "çawa bijîn" bersiva herî bingehîn e.

## Ji bo pirsa "çawa bijîn" bersiva rast em didin

Yê ku hêsan wenda dikin, rêza wan ji jiyanê re nîne. Yê ku di carekê de nirxan bi hêsanî serûbin dikin, li hemberî jiyanê herî kêm bi qasî dijmin xeter in. Ez vê gelekî zelal diyar dikim, divê hun jî vê yekê fêm bikin. Em jiyanê weke hêviyekê dinirxînin. Em dixwazin bi gelê xwe, jiyana azad bidin qezenckirin. Em derfetên jiyana wekhev û azad ku jin û zilam gelekî pê muhtacin ava dikin. Ger ev rast be û hun jî bi vê ve girêdayî bin, gelo hun ji bo ji di erkên hêsan de, di çalakiyan de, di rêxistinbûnê de, di propagandayê de çima ne serkeftî bin? Derdikeve holê ku di rastiyê de girêdaniya we ji bo van nirxên bingehîn zêde pêş neketiye. Mînak ger hun weke min ji cewher bi van nirxan ve girêdayîbûna, we dê bizanibiya ka ez ji bo welat çi qasî sebir dikim, ji bo ku ez çekekê bigihînim Kurdistan'ê çi qasî li ber xwe didim û ji bo şervanekî bigîhînim, çi qasî hewl didim. Ji ber ku ez bi jiyana azad ve girêdayî me, ji wê gelekî hez dikim û min ev bi keda xwe ve peyitand. Di rastiyê de gelo hun nirxên amade, welatê amade çawa bin pê dikin? Hun li hemberî rêhevalên xwe weke dijminekî ne û tavilê hun dilan perçe perçe dikin. Peyvên rêz û hezkirinê, nêzîkbûn û helwestên wê ji kesayeta we gelekî kêm dipijiqe. Yan jî hemû weke diriyan tê re diçe. Ji ber vê yekê hun nayên rewşeke ku bibin welatparêzek, rêhevalekî û partiyiyekî ku bi hezkirin û rêzê ve dagirtiye.

Ger hun van kêmasiyên xwe derbas nekin û neyên rewşa milîtanekî xwedî hêz, hun nikarin bibin fermandarekî baş jî. Fermandarî kesayeteke ku hemû nirxên jiyanê tê de herî berfireh dijî ye. Bêguman ger ji we re bimîne, fermandarî çewisandine, xapandine, fêlbaziya gundîtî ye, demagogî ye. Ez dikarim we bi vê rewşa we îdare bikim, lê belê nêzîkbûnên we yên wiha dê bibe valaderxistina tekoşîna me. Hun jî dibêjin qaşo "ez ji bo şer heme." Yê ku ji bo jiyanê wiha bêrêz e, nikarê mafê jiyanê bidê, pirsgirêkeke xwe ya şer nabe. Yekî wiha dê bi şer bilêyîze û bide wendakirin. Berê hun di riya hindek ajoyên xwe de xwînî dibûn. Vê jî we bi navê "namûsa min e" dikir. Jin namûs e, mirov ji bo jinê şer dike. Lê belê divê jin weke malekê neyê bidestgirtin. Ger hun jinê weke malekê bi dest bigrin, hunê wê bînin rewşekê ku nayê naskirin. Ev şerekî şaş e. Nêzîkbûneke ku li gorî kevneşopan û ajoyan e. Diviyabû jin wiha nebûya, yan jî têkîliya jin û zilam ev qasî neketiba. Ev wendakirina jiyanê ye, înkara jiyanê ye, bersiva herî xirab a ji bo pirsa "çawa bijîn" e.

Gelo em hetanî vî temenê xwe, ji bo çi hîn jî ji bo ku jinên welatê xwe biguherînin mijûl dibin? Ji ber ku dema em ji bo pirsa "çawa bijîn" li bersivan digerin, em dizanin ku ev yek bê jin çênabe. Jiyan bi jinê çêdibe. Lê belê bi jineke çawa re? Dema ku hun destên xwe dirêjî jinê bikin, belaya seriyan e, kirêt e û bi girîn e. Dikare di du rojan de we mehf bike. Bi vê jinê re jiyan nabe. Divê zilam jî vê yekalî bi dest negre. Kîjan zilam bi jinê re bikeve nava têkîliyan ew jin jî, ew zilam jî tune dibe. Tiştekî jinê ji zayendîtiya xwe ya çors wêdetir pêşkeş bike nîne. Jîriya wê, rêxistin, hizir û bîrdoziya wê nîne. Şêwazeke têkîliyan a li gor ajoyan tunebûn e. Rewşeke ku di asta civakên klanan de, heta hîn di şûn wan de ye heye. Wisa ye ku ev di me de bûyereke civakî û siyasî ya cidî ye.

Ji aliyê dijmin ve têkîlî bi temamî weke xefika civakî, siyasî û netewî hatiye pêşxistin. Ger em vê xefikê perçe nekin, emê her dem bikevin nava wê û tune bibin. Teqez divê em xefika jin an jî zilam bişikînin û vê berovajî veguherînin. Divê mirov weke ku bi fedakariyên mezin welat qezenc dike, jin û zilam jî qezenc bike. Weke ku partî û rêxistina wê qezenc dike, divê

têkîliyê jî qezenc bike. Dîsa dema ku jin tê qezenckirin, divê şer were qezenckirin. Ev hetanî dawiyê bi hev ve girêdayî ye. Ez naxwazim van mijaran zêde vebikim. Lê belê misogere ku hunê balê li vê bikişînin. Şagirtên baş, şagirtên ku di van mijaran de yê ku cidiyetê raber dikin in. Vê qet weke berê bi dest negrin. Ger hun bi dest bigrin, hunê mehf bibin.

Divê em jiyanê di vir de bibersivînin. Ne em bi erzanî û hêsanî ku hetanî niha li gor kevneşopan û pergalê nêzîk bibin, ne jî divê nêzîkbûneke înkarkar çêbibe. Mirov dikare çareseriya serkeftî peyda bike. Min weke kesayet xebatên jinê ber bi pêş ve birin û min diyalogên xwe yên bi jinê re pêş xistin. Jin ji me gelekî baş fêm dikin û pêl bi pêl têne nava refan. Berê ji bo ku jinê bistînin digeriyan. Dihate gotin em ji ku bibînin, ji ku bistînin. An yeke bêziman didîtin an jî nedidîtin. Min ev yek bi tirsnakî pêşwazî kir. Hun dizanin ku ji bo bi destxistina qelend we dê li Çukurovayê yan jî li cihekî din deh salên ciwaniya xwe tune bikira. Rexmî vê we dê pereyên qelend bidîta yan jî nedîta. Piştî ku hun ew qasî xebitîn û we jin stend jî diviya ku hun çil carên din bixebitin ku ew jî tunebûna her tiştekî bû.

Şêwazên me yên derxistina holê ya jinê cuda ye. Ger em bixwazin em dikarin bi mîlyonan jinan bînin rewşeke gelekî pêşketî, gelekî bivîn û gelekî dikare biryara jiyanê bide. Ev ne weke ku li Edenê deh salan kar bike û pereyên qelend bibîne ye. Ger hun pêwendî bi xebatên jinê bikin, birêz bin hun dikarin jina herî bihêz derbixin holê. Li şûna ku keçik bibêjin "ezê çawa mêrekî bibînim, ez di malê de mam" bila bibin milîtanekî saxlem û mirovê ku rêzê dide wan biafirînin. Şêwazê rast ev e. Lê belê hetanî niha digotin "dê kî li min xwedî derbikeve û ezê kê bixapînim?" Bi rêbazên herî çors û hov ve nêzîkbûnek nîşan didan. Ev yek nabe riyeke rast. Riya rast jina ku bihêz dibe, xwekirina xwedî vîn ji ber vê jî jina ku bedew dike di kesayeta xwe de pêkanîn e. Piştî ku ev hate pêkanîn, tu pirsgirêkên we nabin. Divê hun di malê de mayînê na, bibin milîtanên ku rêz û hezkirina her kesekî qezenc dike. Vaye çareserî ev e û divê hun çav berdin vî tiştî. Derveyî vê pêwendî û rêz nabe, ji bo pirsa "çawa bijîn" jî bersiv bi pêş nakeve.

Zilam jî neçare riya rast a xebatên jinê bibîne. Zilamên ku xebatên jinê ji hemû aliyan ve rast nagre dest, rêza xwe ya di derbarê wê de bi hewldanên xwe ve nîşan nade re, jin nîne. Di PKK'ê de bi xwe spartina hêza rêxistinê û bi zorê stendina jinê ne gengaz e. Jixwe veşartî jî bike dê bibe bela serê wî. Ji bo şerê jinê, ji bo şerê wê ya partî û welat bûyîna milîtanekî rast riya herî rast e. Divê hun destpêkê ji bo welat şer bikin, hêza xwe ya rêxistinî û mêrxasiya xwe ya rast di vir de nîşan bidin. Ev ji bo jinê jî, ji bo zilam jî derbasdar e. Ev yek nêzîkbûna rast me nêzîkî hev dike, bi rêz û hezkirinê ve dagre ye. Ev jî ne gotinan bi hewldanên pratîkî, bi raveya wê ya bivîn û pêşketî ve divê wateyê bibîne. Wê demê hunê di têkîliyê de bigihên raveya jin û zilam a çawa bîjin. Di van mijaran de hîn jî durûtî, erkên ku bicih nehatine, nêzîkbûnên gelekî kesî û dogmatîk û ajoyî hene. Dema ku derfetê bibînin vê yekê bi giranî bi partiyê didin jiyîn. Lê belê ezê derfetê nedim vî tiştî. Divê hun hemû bizanibin ku ez di vê mijarê de şervanekî balkêş im.

Gelek şehîdên me yên jin hene. Ez neçarim wan bînim ber çavên xwe. Wisa ye ku milîtanên me yên zilam ên ciwan xwedî nirx hene. Em dizanin ku ka ew şervanên çi ne. Em ji van hemû tiştan ji bo pirsa "çawa bijîn" re bersivê pêş dixin. Divê hun vê yekê gelekî cidî bigrin. Dema ku we bersiveke bihêz da pirsa "çawa bijîn" dê şer rast were bidestgirtin, hêsan nayê wendakirin, dilopeke xwînê jî vala nayê rijandin. Di bûyera rêxistinê de gotineke ne di cih de jî nayê gotin. Revandina ev qasî mirovî li aliyekî dê di têkîliyan de şêrînî çêbibe û her dem were qezenckirin. Riya ku diçe "çawa bijîn" wiha ye. Ez wisa bawer dikim ku hun jî hindekî vê yekê ferq dikin. Hun di ferqa pêşketinên di vî alî de ne.

Me riya tişta xweşik vekir, derfetên tiştên layiqê jiyanê ne, me derxistin holê. Wisa bawer nekin ku ev xwe bi xwe, bi hêsanî tên qezenckirin. Hun bi şerekî Rêbertiyê ya piralî û berfireh ve derketine holê. Ev jin bi şerekî mezin ve derketine holê. Bila ew bi xwe jî xelet nêzîkî rastiya xwe nebin. Me bi şerekî mezin ve xwe anî vê rewşê, bi vî rengî hindek derfetên rêxistinê derketine holê. Bi feraseta mêrxasiyê ya rast ku me li ser zilam jî pêk aniye ve me hindekî kesayeta bi welat û rêxistina xwe ve girêdayî û bi wê re

zewiciye, derxiste holê û encam jî xebateke baş e. Ev xebat, xebatekî ku rûyê gelê me spî dike, me bi şan û şeref tevlî malbata mirovahiyê dike ye. Di vê de jî kesekî wenda nekiriye, berovajî her kesî qezenc kiriye. Em vê kûr bikin, li ser kesayeta xwe pêk bînin, bi vê jî em bi kesekî nelêyîzin. Wê demê hunê bibînin ku dê xeyal û plana me ya jiyanê gelekî bi pêş bikeve û hestên me gelekî bilind bibin. Ji bo ku ev werin serxistin jî, em şer gelekî baş fêm dikin û gelekî baş şer dikin. Em di şer de bi hêsanî wenda nakin. Ji ber ku ev hemû ji bo pirsa "çawa bijîn" e. Ev jî ji bo welatê me û civaka me ya azad e. Gelek kesên ku em jê hez dikin, bi hezaran girêdaniyên me yên hezkirinê hene. Ev ji bo şensê jiyîna wan e. Dema ku milîtanekî ev tişt hemû wiha fêm kir û kete şer, dê hemû tevdîrên hêsan wendakirinê bigre, hemû hostetiya serketinê nîşan bide. Dibe ku rojekê mirin were serê mirovan, lê belê piştî ku her tiştê ji dest tê hate kirin, her hal mirov dikare wate bide wê şehadetê.

Em dikarin bi kurtayî ji bo pirsa "çawa bijîn" van bersivan bidin. Ez di dahûrînan de bi giranî li ser van mijaran rawestiyam, ev misoger divê di kesayeta we de wate bibîne. Ez bawerim ku bersiva hun bidin vê dê nêzîkbûnên we yên şer jî, pirsgirêkên we yên gelekî cihê re di asta pêş de pêşketinê ava bike. Min xwest ez van mijaran bi cureyeke çîrok, heta bikim roman û vebêjim. Heta ku ji destên me tê jî emê wiha bikin. Lê belê tiştê ku em ji we dixwazin jî êdî bi biryarî ye, kûrbûn e û watedayîna vê ye. Ne bi zorê, divê em ji vê fêm bikin, têbigihên û vê di pratîka xwe de û di şêwazên xwe yên têkîliyan de nîşan bidin.

Mêrxasiya rast ew cidiyeta ku we di derbarê çawa bijîn de bi rêgez û bi şêwazê pratîkî nîşan didin e. Yê ku di vê mijarê de bi biryariyê û kûrbûnê bi dest dixin û vê jî bi jiyana xwe ve dipeyitînin, misoger dê bi dijwarî nêzîkî şer jî bibin. Dê asteke bi şêwazê rast û di pêş de ku dikare xeletiyên di nêzîkbûnên hetanî hatine kirin de sererastkirinekê pêk bîne, bi dest bixin. Weke encamekê vê jî dê wendahî kêm bibin û pirsgirêkên di artêşbûnê de baştir werin çareserkirin.

Mijarên xwedî naveroka civakî ji ber vê yekê gelekî girîng in û ev şêwazeke şoreşgerî ye. Dibe ku ji bo hindekan weke ne pêwîst were, lê belê pêşxistina giyanê ji bo sererastkirina rewşa giyanî ku gelekî tevlîhev û lihevketî ye, divê ev mijar bi serkeftî werin pejirandin. Ger ev nebin hunê bi destgirtina rastiyeke tevlîhev a weke şer de zehmetiyê bikişînin. Encamên vê nêzîkbûnê weke ku hetanî niha çêbûye, dê rê li ber rewşên gelek xeter û ketiye rewşeke ku nayê naskirin re vebike. Ji bo vê jî ez bicihanîna pêwîstiyên vê mijarê girîng dibînim.

Mijar bi kûranî û wergir bi dest hatiye girtin. Me berê nedikarî em ev qasî berfireh binirxînin. We jî asteke diyar bi dest xistiye. Ger ev kêmasî werin çareserkirin ez bawerim dê ji jinê de jî, di zilam de jî pêvajoya milîtaniya rast dest pê bike. Ez li ser vê, weke hunermendekê disekinim. Ev yek ji bo min tenê siyasî û bîrdozî nîne, erkeke netewî ye. Ez dixwazim bi qasî hêza xwe bi nêzîkbûneke wêjeyî dema pêwîst bike gelek taybetmendiyên huner jî xistina tevgerê ve, di vê pirsgirêkê de pêşveçûyînê pêk bînim. Ji vê re rêzdar bin, di vê mijarê de dahurandina nêzîkbûnên xwe yên heta niha bikin. Evê bi we pêşketinên girîng bide pêkanîn. Dibe ku di vî alî de kêmasiyên we yên cidî hebin. Ger ew jî werin çareserkirin, ew taybetmendiyên we yên kesayetê ku em ji serî hetanî niha rexne dikin dê veguherin gavavêtineke mezin.

Hindek aliyên we yên girîng û erenî hene. Em dixwazin van serdest bikin. Em dixwazin bi qasî van bi jiyana rastiyê ve girê bidin, giredaniya wê û şer bikin, di vê mijarê de bi biryariyê ve misoger bikin. Naxwe dê ji van hewldanên me re heyf be. Ji ber ku hun jî gelek hewl didin li hemberî tengasiyan li ber xwe didin, wêrekiyê nîşan didin. Ji bo ku wateyekê rave bikin jî divê hun van nêzîkbûnên ku em dixwazin bikin malê we, bipejirînin. Ger ev çêbibe dê pêwistiyên van rexneyan werin bicihanîn.

Heta dawiyê bi îdîa û xwedî feraset bin. Girêdaniya xwe bi şêwazê Rêbertiyê jî ji nû ve di ber çavan re derbas bikin. Ger wiha be, emê bi we re gelekî rihet kar bikin, ji karkirinê jî kêfxweş bibin. Emê ji jiyîna bi jinan re û ji karkirina bi wan re jî kêfxweş bibin. Di vê mijarê de em ji bo çi ev qasî

lihevketîbûnê, ji bo çi ev qasî ketîbûnê, kêmbûnê û lewaziyê bijîn an jî ji bo çi em li ser a rast serdest nebin? Ji bo çi di têkîliyan de, di jiyanê de ev qasî fetisîn, tevlîhevî, bêrêzî, bêhezkirinî? Gelo ev ji dijmin zêdetir dê sûdê bide kê? Hun dibêjin "kevneşop, şêwazê mezinbûnê, bandorên dijmin." Divê milîtanek êdî van neyne ser ziman. Em vî şerî di riya jiyana bedew de dimeşînin. Ji bo ew cîhana me ya rêz û hezkirinê ku hatiye wendakirin bibînin, ji bo bedewiyên me yên hatine wendakirin derbixin holê, em vî şerî dimeşînin. Şer ji bo şikandin û hilweşandinê nîne. Ji bo mirinê qet nîne. Şer ji bo nirxên jiyanê ne. Ji bo pirsa "çawa bijîn" misoger bersiva rast û di cih de dayînê ye.

**7 Pûşber 1996**

## BEDEWÎ BI XWE AZADÎ YE

Di ferqa cidiyeta kar de nebûn, xwe di bin ronahiya van mijaran de pêşnexistin, di me de hêrseke mezin diafirîne. Li gor min bênamûsî xwe nekarîna perwerdekirin e. Armancên me kesayet li gor şêwazê pratîkî ya tekoşîna me anîna asta têra xwe dike, dikare bimeşe, dikare şer bike û dikare bijî ye. Yekî ku nikare rast wateyê bide pêwîstiya van hemû tiştan jî divê bizanibe ku li gel me zêde cihê wî jî nîne.

Min xwest ku ez pênaseya Rêbertiyê bikim, lê belê ez dibînim ku di mijara jiyana azad de xwe qanehkirin li aliyekî bimîne, hun çi tiştê ku bi jiyanê re têkîliya xwe nîne û koletiyê xwedî dike re, xwe mijûl dikin. Rêhevalên me yên jin rûyê koletiyê ya ku gelekî tirsnak û dixe her cureyê ferzkirina wê naxwazin bibînin jî. Hun di vir de xeletiyeke mezin di nava helwesteke xwe xapandinê de, hewldana jiyînê nîşan didin. Bêyî ku germahiya hêviyên azadiyê hebe, bi van helwestên xapandinê ve berxwedana di jiyana me de, gelekî zehmet e, weke îşkenceyê ye. Yê di we de kêm e ev e. Çi qas şêwazên nêzîkbûnên ku gotin û pratîka wê nîne, hema derdikeve her derê, hun ji wê re hetanî dawiyê vekirîne. Sedema herî bingehîn a xistina kesayeta jinê ya evqasî xwe ji bo her cureyê bandora kolekirinê re vekirî hiştin e. Hêjariya jinê, milîtaniya bêrêgez a jinê, bêpolîtîkabûna wê û bêhêziya wê di bingeh de ji ber ji hemû bandorên kolekirinê re vekiriye û çavkaniya xwe ji wê re zemîn pêşkeş dike digre.

Mînak ji Amedê hetanî Mêrsînê, ji wir hetanî İzmîrê ji bo nanekî somun bi rengekî ku ji masiyekî ku bi torê re dialiqe hîn xetertir xwe diavêjine nanê ku tê belavkirin. Tê gotin ku ev mirov hemû ji Başûre Rojhilat in. Peyama ku ev bide we ev e. Kolekirina gelekî wê tîne rewşekê ku ji masiyekî bi torê ve dialiqe, zêdetir ji bo nêçîrkirinê guncaw dibe. Hun jî perçeyekî vê rastiyê ya herî binî ne. Ji wî alî ve divê mirov nebêje, îdîaya jiyana azad û derbas nebe. Heta ku ev pirsgirêk we hetanî mejiyên hestiyên we dorpêç neke, heta ku hun hemû mijûlbûnên xwe li ser vê bingehê di xwe de qanehbikin, bi encam nekin, bawer nekin ku dê jiyana we wateyekê rave bike.

Bi giryanê, bi lewazî û gazindên xwe danîna holê ve, siyaset nayê kirin. Berovajî her cihekî ku ev helwest heye, li wir siyaset tune dibe. Di mayîna jinê ya derveyî polîtîkayê de rista diyar a vê helwestê heye. Nehatina jinê, rewşa hêza desthilatdariyê ji ber pêkanîna bêsînor a polîtîkayên serdestiya zilam tê. Bersiva ku hun didin vê, nehatina kesayeta polîtîk e. Ev jî tê wateya hun weke jin koletiyê qebûl dikin. Di rastiyê de em dixwazin jinê weke hêzeke polîtîk a rastî pêş bixin. Armanca esas a him feraset, him jî hewldanên rêxistinî yên pratîk ev e. Hemû nêzîkbûnên din, dê vala derbixin û ev jî berovajî daxwazên azadiyê ne. Hun hîn jî weke ku xwe polîtîkirin, xwe gihandina raveya azad, vîn û zanebûnê weke ku ne girîng in nêzîk dibin. Li şûna vê hun rêxistinê weke malbatê dibînin, rêveber jî weke mezinê malbatekê yan jî weke xwişk, bira, mêr û bavekî dibînin û hembêzkirina wê hun bawer dikin ku polîtîkagerî ye. Di rastiyê de ew tê wateya fêmnekirina tiştekî ji polîtîkaya azadbûnê. Hun ew qasî ji hêza xwe ya cewher dûr in ku heta hun ji wê ew qasî ditirsin ku her dem hun pêdîviya hembêzkirina hindekan dibînin. Bêguman ev jî li ser bingehê stûtewandinê pêş dikeve.

Di rastiyê de di nava binkeya partiya me de herî zêde pêdiviya rêhevalên me yên jin ji kesayeta polîtîk re heye. Ji bo pêşxistina rêxistinî û bîrdozî ya li ser bingehê polîtîk pêdiviya jinê ji her kesî zêdetir an jî ji zilam zêdetir heye. Ji ber ku hun di nêvenga ku hun dibêjin sînorê herî paşketî yê hovîtiyê de tenê zayendek in, hun nikarin ji bo zilam pêwîst bin û hun nikarin xwe li ser vî bingehî binirxînin. Heqaret, hovîtî û ketîbûn esas di vir de ye. Jina ku xwe tenê bi cudabûna zayend û zayendîtiya xwe ve bi zilam weke pêdîviyekê dide hîskirin, tê wateya ji bîrdoziyê, polîtîkayê û rêxistinbûnê geriyaye. Ger hun balê lê bikişînin, bêyî ku hun di ferqê de bin, feraseta ku hun layiqê xwe dibînin û bi rojane zilam jî li we ferz dike ev e. Li ser bingehê vê ferasetê bersivbûna ji zilam re, di wateya azadiyê de tawan e. Ev nêzîkbûna ku beramber bi pêş dikeve, cewherê koletiyê ye, lê belê hun ne di ferqa vê de ne jî. Hun dixwazin tenêbûn û tengavbûna xwe bi xwe spartina feraseta serdestiya zilam ve derbas bikin. Hêmanê ku herî zêde em li dij in

ev e. Lê belê em bi rêgez in. Ger em di vê mijarê de gelek tawîzan bidin, emê şensê azadiyê ji hemû aliyan ve wenda bikin. Gelo kekên we, mêrên we, birayên we, evîndarên we wiha ne?

Piştî ku her tişt ji dest we diçe, hun tenê digrîn, bêyî ku tu lêkolînê bikin, tu ceribandinan bijîn hun xwe radest dikin. Navê van nêzîkbûnan radestbûn e. Ya herî girîng jî weke ku ev çarenûseke xwezayî ye, hun rewşa xwe bêpêwendî û neçarhiştinê dijîn. Hun dibêjin "bila hindek werin xwedî li me derbikevin." Di vir de êdî vîn û hizirandina ku diherikîne disekine. Hindek dê werin, dê we weke mal bikirin. Lê belê evê bibe maleke xirab. Divê hun çavkaniya pirsgirêka xwe di vir de bigerin. Ger em vê çareser nekin, em bidestxistina azadiya welat û gel li aliyekî bihêlin, em nikarin weke mirov rêzê bi dest bixin. Dê jiyan ji derewekê ava bibe. Dê bibe xewneke ku tê xeyalkirin, lê belê tu demê nayê jiyîn û biçe.

Ev qasî şerdayîna jiyanê ya rastiya Rêbertiyê, wisa bêsedem û weke ku gelek ji we bawer dikin nîne. Rastiya Rêbertiyê gelekî ku ji miroviyê hatiye derxistin, hemû maf û hêviyên wê ji dest hatine derxistin, şeref û rûmeta wê hatiye binpêkirin, ji bo ku her tiştê wenda kiriye, ji nû ve bi dest bixe, radike ser lingan, rastiyeke ku ev xistin ku dijmin di asteke girîng de bi ser xistiye û ser serdest kiriye û ew ji radestbûnê wêdetir, xistiye nava lingan veguhertiye şensê jiyanê wate dide rûmeta jiyanê, şerefa jiyanê û rastiya jiyanê û ji bo vê hemû hêza ku di dest de dikare dayne holê. Ev jî meşeke mirov e.

Di demên dawiyê de, di kadroyên PKK'ê de, weke ku em rewşeke wiha dijîn, weke ku em mirovên asayî ne, heta weke ku em kesên ku ji zû de şeref qezenc kiriye û êdî tam mafek aniye, ji bo azad jiyînê ji rê derketinek, derewkariyek û rewşeke xwe xapandinê tê jiyîn. Ger ê ku ji bo vî karî Rêbertiyê dike jî hîn di van mijaran de ev qasi zirav e, ev qasî nefes bi nefesê ye, gelo çawa dibe ku hun jiyîna wiha layiqê xwe dibînin. Feraset û rewşa ewên ku hun dixwazin xwe bispêrinê li holê ye. Hun ji bo çi xwe dixapînin? Ji bîr nekin ku hun bi vê asta xwe ve nikarin nîqaşekê jî bikin. Hemû nêzîkbûnên we bi koletî we didin dest. Hun bi hestiyarî, yan jî weke

zarokan nêzik dibin. Şoreşgerbûn ji nêzîkbûna rêzdar a mafê jiyanê re derbas dibe. Bi biryardayîna bûyîna mirovê azad ve dest pê dike. We şoreşgerî tam aniye rewşa şêwaza eşîretê. Hun bi çanda malbatê, ku bandora wê gelekî zêde ye tên nêvenga partiyê. Ez ji bo vê dibêjim, şêwaza Horanta (gelê malê). Ne diyar e ka we biryara çi daye, hun dixwazin bibin çi, dixwazin çawa bin? Dibe ku we di destpêkê de rast an jî bihêz hîn nebûne, lê belê tu aliyeke vê yê were efûkirin ê vê demeke dirêj berdewamkirinê nîne.

Zilaman hun şaş fêrkirin e. Di feraseta min a azadiyê de jî ji bo nêzîkbûnên wiha cih nîne. Ne jineke bi xwe, ne jineke bi zilamekî, ne jî zilamekî bi jinekê bi koletî nêzîk dikim. Rêgeza min ev e. Her milîtanekî ku dixwaze bi min re bimeşe heta ku negihê vê neçare bizanibe nikarin li rûyê hev jî temaşe bikin. Ger hun dibêjin, "bîrdoziyên me hene, em wiha fêrî jiyanê kirine" kê wisa hun fêrî jiyanê kiribin, biçin li wir bijîn. Felsefeya jiyanê ya di rastiya Rêbertiyê de gelekî vekiriye. Raveyên bîrdozî, siyasî û asta rêxistinê, şêwaz û leza ku ji bo jiyanê hewce ye êdî zelal bûye û hatiye asteke ku bi hêsanî were pejirandin. Van mijaran lêkolîn bikin, ez çarçoveya lêkolînê pêşkeşî we dikim.

Em nirxeke mezin didin azadiya jinê, ev bi qasî nan û avê ji bo me hewce ye. Kesayeta jina azad tenê partiyekê, komeke xebatê na, tê wateya ku dema pêwîst kir, jiyana hemû netewekê jî bandor dike. Misoger em bi vê bawer bikin ku, ger em nekevine riya jiyana azad, me ev di rêgez û pratikê de temsîl nekir, em ne dikarin rihet bijîn, ne jî em dikarin bi tiştên din ve mijûl bibin. Hêmanên ku herî zêde ez pê hêrs dibim, beşeke mezin ji nava we û zilam ev derfetê azadiyê ku hezar û yek kedê em dixwazin bi pêş bixin, ji kêleka wê, ji quncikê wê ve dikevinê –ku gelek ji wan bawer dikin ku vê bi navê başiyê heta hezkirinê dikin- dixwazin weke kurman bixwin û tune bikin. Hindek bêyî ku ji dil û ji cewher bijîn û bêyî ku werin rewşa hezkirinê, xwe dispêrin hêzê û erka partiyê û vê ferz dikin.

Ez ne dogmatîk im, ez dixwazim gelek binkeyan di nava jiyanê de çavdêrî bikim. Lê belê ew nayê wateya ku ez bêrêgez û bêhelwest im. Dilê

hindekan jiyan, jin an jî zilam dixwaze. Destpêkê divê were fêmkirin ku ev ji bo me rêgezeke mezin û şerekî polîtîk a mezin e. Di şertên şer de hindek dibêjin, "em çawa dikarin ji hev hez bikin, em dikarin çawa bi destên hev bigrin?" Gelo ma ev dizanin ji hev hez bikin û bi destên hev bigrin? Ger van bizanibana minê ji bo wan li çepikan da ba. Vî tiştî di pêvajoyek û zemîneke ku ji şer dûrketinê dijîn de dimeşînin. Ev ketineke herî mezin e. Ev li şûna ku şensê me yê jiyana azad bi şer hindekî pêş de were birin, niyet çi dibe bila bibe, helwesteke komploger û ji piştê ve xençerkirinê ye, li kesayeta me ya jiyana leşkerî derbeyek e.

Gelo ji bo çi yek kesekî jî ev tişt nedît? Derveyî ezeziyeteke balkêş, gelo ma raveyeke din a vê heye? Tu kes bila vê mijarê şaş fêm neke, li şûna wisa hezkirinên erzan û destên hev girtinan divê em xwe heta mejiyê hestiyên xwe ji bo hevbûnê û bi hev re parvekirinê re amade bikin. Ew îdîaya ku dibêjin, em bêyî evîn û bêcoş in, dereweke gelekî xirab e. Gelo bêyî evînî û bêcoşî kî dijî? Hindek ajoyên herî hov li hev ferz dikin û wisa bawer dikin ku dê evînê coşê û heyecanê bi dest bixin. Ger ev evîn be, wê demê gundiyên ku koleyên zayendîtiyên çors in, evîndarên herî mezin in. Ji ber ku ew vî tiştî weke ku dixwazin dikin. Wê demê divê em bibêjin ku zilam û jinên di kerxaneyan de, yan jî yên di malên taybet de evînên herî mezin dijîn.

Tê gotin "pêdiviyek e, ger ev pêdivî neyê çareserkirin artêşbûn çênabe, tişta ku destpêkê derfet were dayîn ev e." û her kes vî tiştî dadiqurtîne. Hun tawanbar in û yê ku wenda dike jî hun in. Gelo hun ji kîjan pirtukê û ji ku derê hînbûn ku heyecan û evîn ev e? Gelo kîjan rastiya jiyanê ev tişt wiha fêrî we kir? Gelo we xwe bi kîjan sedem û wêrekiyê ve ji hestiyariyeke ev qasî erzan razand? Bi rastî jî bikarîbûna hezbikirana, bi rastî girtina destên hev û hev hembêzkirinê bizanibana minê ji bo wan gotiba bravo! Lê belê ev hemû ji şerê jiyana mezin re li ser bingehê berteka pêş dikeve. Ev yek gelekî zelal e. Tişta ku ez lê seyr dimînim, hun ji bo çi tavilê vê fêm nakin û helwesta pêwîst ji bo çi nîşan nadin? Di vê wateyê de di rastiya me ya civakî de nêzîkbûna zayend pirsgireka herî mezin e. Qada ku herî zêde koletiya me

tê de dijî ye. Bêyî ku hun vê rastiyê fêm bikin, hunê pêwendiyê hêvî bikin, hunê bibin amrazê van nêzîkbûnan! Ma gelo wiha dibe?

Me tu caran bêyî evîn û bêcoş jiyînê pêş nedît. Li gel ku hun dibêjin bi me ve girêdayî ne, hîn jî hun asta evînê ya şerê me yê mezin ku em dimeşînin fêm nakin. Weke rêhevalekî we pêvajoya min a hatina hetanî vî temenî, bi heyecaneke balkêş, bi rengekî ji romaneke navdar zêdetir herikbar heta vir anî. Lê belê hun ji vê encamê dernaxînin. Di rastî de ji bo we di vir de destaneke jiyanê ya rast veşartî ye. Tekoşer e, zimanê wî balkêş e, şerekî xwe yê hest ê mezin heye. Bêyî ku hun vê rast fêm bikin, nêzîkbûnên weke di têkîliyan de germbûn an jî sarbûn, di têkîliyan de bêpêwendîtî yan jî lihevhatin derxistina pêş bêrêziya herî mezin e. We helwesta ku hun anîne welat çi ye jî fêm nekiriye. Hun nikarin pênaseya bayê ku we diherikîne jî bikin. Hun bêberpirsyar a ku weke çi tiştê ku dijberiya li hemberî nirxên ku we pîroz dike, ava dike hun wê temsîl dikin, berfireh dijîn. Giyanên we ji zû de mirine. Hindek dibêjin “giyana min heye” û parêzvaniya giyanê dikin. Gelek ji wan agahiya xwe ji jiyana pîroz, giyana azadiyê ya mezin jî nînin. Piştre jî weke belayekê tê gotin, “giyanên me, hestên me hene.”

Ji vî alî ve rexmî ku ez ev qasî bi giyana netewî û vîna netewî de têm qebûlkirin jî, ez xwe tam têr nabînim. Helwest ev qasî ji rêzê û bi ajoyan ve aliqiye ku vî tiştî bi çavtarîtî li me ferz dikin. Gelo weke ku mirov rêhevalê xwe ev qasî fêm nake, ma gelo ji bo çi bike qurbanê ezeziyeta xwe û bi kar bîne? Gelo di refên me de çend jinên ku planeke xwe ya jiyanê ya xwedî hêz heye? Gelo di nava we de kî heye ku xwedî rêgez e û bi rojane bi ziravî wate bide wê û pêk bîne? Em temsîleke çar bi çar naxwazin, lê belê divê qet nebe lêgerîn hebin, divê pêdiviya vê were dîtin. Divê em li giyana xwe ya ku me wenda kiriye bigerin. Wisa weke tê gotin em têkîliyeke rihet li aliyekî bihêlin, di me de rewşeke ku em ji dil silavan bidin hev jî nehatiya afirandin.

Ez hîn jî nikarim mirovên me silav bikim. Ez biçim gel kîjan dostî ji bo min rihetiyek na, di wir de derketina şerekî heye. Gel e, disekine, naxwaze

di rêzgirtinê de kêmasiyekê bike. Lê belê dema ez li we temaşe dikim, ez dibînim ku li cihê divê pevçûn were kirin, hun bi hemû leza xwe ve ber bi radestbûnê û hêsankariyê ve direvin. Ger hun nêvengeke xwe ji rêzê radest dike bibînin, hunê heta mêjiyê hestiyên xwe, xwe vala bikin, bigrîn û xwe radest bikin. Bi vî rengî hunê bawer bikin ku hun hez dikin û xwestekên we hatine cih, heta hindek bawer dikin ku evîndar bûne. Ez van hemûyan rast nabînim.

Rexmî van hemû pêşketinan, min ji bo we eşkere diyar kir ku rewşa min jî zêde bihêvî nîne. Rexmî hezkirina mezin a gelê me û jinên me, ez xwe hêvîdar nabînim. Lê belê ez dibêjim, dibe ku şer me hindekî baştir bike xwedî hêz. Xala ku gelek kes dikarin bibêjin ez dikarim bijîm, ez vê qebûl nakim. Bihizirin, ez kesekî ku zagonên xwe bi xwe derdixime holê. Ez kesekî ku vê gavê yê herî bihêz ê vî welatî û vî gelî dixuyêm, lê belê rexmî vê ez di xwe de bi qasî zilaman an jî jinan pêwendiya jiyanê nabînim. Nayê vê wateyê ku qet ajoyên min nînin. Dibe ku ajoyên min ji yên her kesekî zêdetir bin, lê belê bi qasî ku ez dihizirim ev tişt dê min ber bi ku ve bibin, bi qasî ku ez xwe hindekî bîrdozî û polîtîk hevseng dikim, ez di nava pevçûneke mezin de dimînim. Min ev hîn ji zaroktiyê pê ve wiha bi dest girt. Her tişt li min bi zehmet dihat, her tiştekî şerm û tengasiyek dida min. Ji bo ez vê bi bin bixim jî, her dem min dixwest ez fêr bibim. Di karê fêrbûnê de jî, ez di rêza yekemîn de bûm. Bi tevî vê min xwe bi tiştên ku ez fêrbûm ve têr nedît. Ger pirsgirêk bi şêwazên pergalê yên kevinbûyî ve xwe têr dîtin be, yan jî di nava qalibên pergalên yên ku gelekî dixe de mayîn be, vî tiştî min jî dikarî di nava rojekê de çareser bikim, bibêjim pirsgirêka jiyanê ev e û derbas bibim. Di vê mijarê de ez gelekî jî jîr bûm, lê belê dema ku min ev li rastiya mirovahiyê, li rastiya gel û li rastiya me da, di gava dawiyê de min pêdîviya ji vê gerînê dît. Min got ez bixwazim bikim jî nikarim bikim. Weke encam di mijara dîtina rastiyê de ez ketime nava lêgerîneke mezin.

Gelo dema mirov rewşa dayikan, keçikan û zarokan dibîne, kî dikare wan wêneyan bipejirîne? Ji bo nanekî somun xwe diavêjin nava heriyê. Mirovekî

ku ketiye vê rewşê her tiştê xwe wenda kiriye. Em nikarin xwe ji van mirovan cihê bibînin, ji ber ku ew gelê me ye û bi pêşketina tekoşîna me ve, dijmin ew xistine vê rewşê. Gelê me li benda rizgarkirinê ye, gelo kîjan kadroyên me her dem vê dihizire û dijî? Ez şehîdan li ser vê zêde nakim, ji ber ku her şehîdekî me sedema şer e. Em ji ku derê lê temaşe bikin jî her tiştek me vedixwîne şer. Gelo kîjan fermandarê me yê birêz vê yekê wiha dibîne û rê dide jiyana xwe? Hunê di vê mijarê de bi aqil bin, hunê bibêjin ku gelo em li gor rastiyên bingehîn dijîn an jî najîn? Û hunê hemû fermandar an jî kadroyên xwe di pêş çavan re derbas bikin.

Hindek lewaziyên gelekî bingehîn ên zilamê Kurd ku tên zanîn hene. Ev zilamê ku hêza wî têra pêşketina çandî, netewî, civakî û siyasî nake, di van mijaran de ji bo pêşketinê xwe zêde bi îdîa nabîne. Dema ku ezeziyet û jiyana rojane bû mijara gotinê, dema tu bibêjî, “tu ji jiyanê çi fêm dikî?” dê çavên xwe berde zayenda jinê ya ku her çûye hatiye tengkirin û daketiye asta herî ketî. Ji wê jî wêdetir çavên xwe berdide tenê zayendiyê. Derfetê me çêbiba û me karîba vê romanê binivisînin! Ez di vê xalê de jî jinan tawanbar dikim. Ez ji ber stûtewandina vê zayendîtiyê, amrazbûna we ya ji vê re misoger ez we kirêt dibînim. Bi nedayîna we ya tekoşînê ya li hemberî vê berovajî xwe dîl dîtina we û xwe weke zemîn pêşkeşkirina we ve, ez we weke tawanbar dibînim.

Li şûna ku zayendîtiyeke wiha hebe, bila qet nebe baştir e. Ji ber ku zilamê xwe ji hemû raveyên wê yên netewî, civakî, siyasî û rêxistinî qut kiriye, bi lez bi navê jiyanê tê gel we, direve zayendîtiya we ya çors a ku ji rêzê ye, neçare û ber bi tu pêşketinan ve nabe. Gelo we ev zilam çawa tespît nekir? Ger li ser we dîktatoriya xwe, kirêtiya xwe, qaşo serdestiya xwe û zilamtiya xwe ya hatiye berovajîkirin, dixwaze serdest bike, gelo hunê ji wî çi sûdî bibînin? Ji bo çi we hetanî niha lêpirsîn nekir? Dibe ku bi we seyr were, ew ne maçkirinê, ne jî mistanê dizane. Lê dide û di encam de dikuje.

Hun ji bo çi jiyanê lêkolîn nakin, kanî jîrbûna we ya lêkolînê hebû? Kanî we jiyana bedew dixwest? Ger hun balê bikişînin, ez li vir behsa ziraviyekê dikim. Dibe ku hun bibêjin, “evîndarê min, ger tu maçkirinê û mistanê

bizanibî, tu canê min î, tu giyana min î.” Lê belê li hemberî we zilamekî wiha nîne. Li hemberî we zilamekî ku bi çend lafazaniya xapînok ve xwe vedişêre û ger we bi dest bixe dê perçe bike heye. Ew bi xwe şêr e, hun xezal in, ger we bixe destên xwe dê we perçe bike. Navê wî jî wiha ye û cewherê wî jî wiha ye. Tevdîra ku min li hemberî vê girtiye, jêgerîna zilamtiyeke wiha ye, ji wê gerîn e. Li hemberi zilamtiyeke wiha xwîna min dicemide, baş e ku ez nebûme zilamekî wiha. Ji bo min çi dibêjin bila bibêjin, ev tişt ji xwe nedayîna xwarinê ve başiya herî mezin min li xwe, dibe ku hindekî jî li jinê kiriye.

Ez her dem vê pirsê ji xwe dikim. Gelo keçeke ciwan, li hemberî zilamekî wiha çawa li ber xwe dide û wî çawa qebûl dike? Ez weke we keçeke ciwan nînim, lê ez vê pirsê ji we sotînertir ji xwe pirs dikim. Di vê wateyê de li hev rasthatin, tenê rastiyeke bi asta zayendî na, dê bibe koletiyeke kirêt. Ji bo ku hun muqayeseya wê hîn baştir bikin, ez vî tiştî diyar dikim. Xortekî ciwan ê bîst salî bixin cihê xwe û bihizirin ku zilamekî serdest wî ji bo xwe dixwaze, weke hevjîn an jî evîndar hilbijêre. Gelo evê bibe li hev rasthatineke çi qasî xeter? Hindekî hêza zilam heye, di dîrokê de hemû zalim wiha dikin. Mînak Fatih Sultan Mehmed dema ku serdestiya xwe bi pêş dixîne, zilamên pêş de yên gelê ku dixe bin serdestiya xwe tîne di bin terbiyeyeke ku jê re “kurikê Osmanî” tê gotin de, di wateyekê de dike pîrek. Di vir de serdestiyek mijara gotinê ye. Ji bo ku bibe sembolîk prensekî gelê ku xistiye bin serdestiya xwe distîne û dixe harema xwe. Keçikan li aliyekî bihêlin, serdestiya Osmanî zilamên gelên din jî wiha dike. Ev qas tiştekî xeter e. Nebêjin asta zayendîtiyê û derbas nebin. Di nava wê de gelek ji rêderketin, gelek serdestiyên ku tên veşartin, ji ber wê jî kirêtî heye. Qada zayendîtiyê qadeke ku di vê mijarê de, divê gelekî bi baldarî were çareserkirin e. Weke tê bawerkirin wisa li ser bingehê pêdîviyeke neçarî nayê bidestgirtin, di wir de serdestî tê ferzkirin, vaye em dijberî vî tiştî ne. Di zayendîtiyê de parvekirina azad daketiye asta herî kêm an jî nîne. Dema ku we têkîliyeke yekalî ferz kir an jî we têkîlî ji pîvanên siyasî, giyanî û bîrdozî qut bi dest girt, hunê bibin dîlê bîrdoziya serdest û di encam de

hunê weke zayend wenda bikin. Piştre jî bi qasî hun bixwazin bi hestyariya jinê ve bigrîn, bi qasî hun bixwazin nêvengê tevlîhev bikin, hun nikarin bigihên tu derê. We bi xwe, rê ji vê re vekir.

Em vala dahûrandina zilam nakin, dema ku tişta mijara gotinê zilamê Kurd be, zilamê ku di refên PKK'ê de be, teqez divê ev dahûrandin saxlem were kirin. Ger hun vî zilamî nedahûrînin, misoger jiyana we di xeteriyê de ye. Divê hun karê dahûrandinê berfireh û zanistî bikin. Divê hun di van mijaran de lêkolîn bikin û dahûrandina zilam kûrtir bikin. Ger di nava refên me de ji têkiliyên ehbabiyê dest bi destan, mil bi milan pêş dikeve re "azadî" tê gotin, divê em bi vê re şer bikin. Tişta destpêkê divê werin kirin ev e. Divê hun bipirsin "gelo tu dikarî ji min li ser kîjan bingehê hez bikî? Tu dikarî çi qasî bi min re bî? Tu dikarî min bibî ku derê?" û van hemûyan lêpirsîn bikin. Dema ku yekî têkîliyeke erzan li we ferz kir, hun tavilî stû ditewînin, yek tê li we tiştekî wiha ferz dike, bi xwe zilam e, kêm zêde serdest e yan jî berpirsyar e. Gelo tiştê ku sibê were serê wê çi ye? Dema ku di refên me de têkîliya serberdayî tê gotin. Zêdetir zilam xwe mafdar dîbine û yekû her dem tê gunehbarkirin jin e. Jixwe ya ku ji aliyê exlaqî ve jî "ya bêexlaq e" jin e. "zilamê yeman" zilam e. Ya ku tune dibe jin e, yê ku wê tune dike zilam e. Bêyî ku hun vî exlaqî û xeteriya yekalî bibînin gelo hun çawa dikarin di nava nêzîkbûneke rihet de bin? Xwezî em bigihiştibana hezkirineke rêhevaltiyê ya ku bêriya wê hatiye kirin, hatiye armanckirin û kêlî bi kêlî xwe di pratîkê de dide nîşandan. Xwezî rêhevalên me yên wiha destên me digrin hebûna! Ez rêzê didim pêwendî û hezkirinên we hemûyan. Lê belê divê em di vê mijarê de hîn gelek rê bimeşin.

Hêvî û armancên min jî yê girtina destên hev hebûn. Ji bo parvekirina bi jinê re xeyal û hewldanên min jî hene, lê belê gelo ev çi qasî dê wekhev be, çi qasî hêzê dixwaze, çi qasî vînê dixwaze? Di dahûrandina dawiyê de min ev rastî bi vê girêdaye. Evîn têgeheke bi serkeftinê ve girêdayî ye. Yê ku serkeftina wî nebe, evîna wî jî nabe. Yên ku di her gavê de serketina xwe nebe, evîna wan jî nabe. Ger di dîrokê de were lêkolînkirin, serkeftin û evîn cêwî ne, yek bêyî yekî nabe. Di me de jî berovajiya wê mijara gotinê ye.

Qaşo evîn, qaşo hest cihê ku binketin dest pê dike de, dest pê dike. Pênaseya hest a xiyanetê jî wiha ye. Divê di her zilamekî de, di her têkîliyê de, di her nêzîkbûnê de van gelekî balkêş lêkolîn bikin. Di her netewî de vî tiştî di şaxên cuda yên huner de bi salan, bi sedsalan nîşan dane. Em neçarin van hemûyan di şoreşê de biafirînin. Ji ber ku li gel me hunera beriya şoreşê nîne. Emê van hemû tiştan di nava şoreşê de çareser bikin. Ev ne şermek e, divêtiyeke şoreşê ye. Ger ev zilam û jin dixwazin wateyê bidin lêgerînên têkîliyan, divê felsefeya azadiyê ya şoreşa me baş fêm bikin. Şerekî mezin ê Rêbertiyê di vê mijarê de şerê afirandina jin û zilam, hest û bedewiyê heye. Gelo yê ku vê nebîne dikare behsa kîjan têkîliyê bike? Kesê ku wateyê nade vê tolaz e, dizek e, dizekiya herî xeter jî di dizîna jinê de nîşan dide. Ez nabêjim ku jin jî dikarin bibin diz, ji ber ku ew her dem hatine dizîn. Xwezî jinekê bikariba zilamek bidiziya.

## Kesayeta zîlan navê yekgirtina serkeftin û evînê ye

Kesayeta gerstêr dixwaze ji jina ku serberjêr diçe û xwe wenda dike, koletiyê herî zêde dijî re hevjîniyê bike. Hevjînî û mêrîtiya zilamê Kurd ev e. Jixwe dema ku me cewherê têkîliyê bi dest xist, nedîtina vê yekê ne gengaz e. Nûbûna ku min li vê derê aniye berovajiyê vê ye. Jin nabe ku bibe kesayeta gerstêr, ger hun serkeftinê esas bigrin, xwe tam di kesayeta serkeftinê de girê bidin, hun dikarin her tiştekî bi ser bixin. Divê keçik bibin sembola girêdayina di kesayeta serkeftinê de. Tam jî di vê xalê de sembola Zîlan kesayeta serkeftinê ye. Kesayeta Zîlan bi hevrebûna jiyan û şer an jî bi gotineke din ve, navê bi yekirina serfetin û evînê ye. Weke sembol wiha ye. Ji bo me sembol jî girîng in. Çi qasî ji sembolên azadiyê re nirx were dayîn, heta çi qasî xwe bispêrin wan, dê ew qasî pîroz bin. Bi hezaran nirxên me yên wiha hene. Yê ku li şûna nirxeke bilind bidin vê û xwe serûber bikin, weke ku PKK ne şiyar e û weke tevgereke nikare nirxên xwe teqdîr bike, bi înkareke mezin ferzkirinê, ji rêziyê û ev yek ji nedîtinê ve hatinê, anîne rewşeke helwestên ku nayên efûkirin, heta ew di asteke bi lehnet de ne.

Wisa hun bawer dikin ku em di partiyê de xebatên jinê ji rêzê bi dest nagrin. Bi temamî dualîtiya serkeftin û evînê de bi dest digrin. Ev pêvajoyeke diyalektîk a gelekî bi zehmet e, yan jî girêdaniya bi felsefeyê ve ye. Lê belê ev yek çareya me ye, yekem riya pîrozbûnê ye. Ger em ji vê bigerin, dibe ku em her tiştê xwe wenda bikin. Me tiştê ku bi navê azadiyê qezenc kiriye, bi dualîtiya girêdana evînê bi serkeftinê, serkeftinê bi evînê ve dest xistiye. Ev diyalektîka vejîna Kurd, rizgariya Kurd e. Ger em ji vê bigerin tu wateyeke me weke laşekî bêhn pêketiye wêdetir namîne. Gavavêtineke girîng a ku min di jiyana xwe de jî hindekî hêz raber kiriye ye. Her çi qasî kêmasiyên min û lêwaziyên min hebin jî, raberkirina min a vê hêzê divê weke pêşketineke balkêş were nirxandin. Ketineke wiha bi bilindbûneke wiha ve temsîlkirina min, gelekî girîng e. Ji bo gelê Kurd hewldana herî zêde sûdê dide jî ev e. Ger hun vê yekê fêm bikin û di vê de kûr bibin, her milîtanekî me dê herî jor de bi serkeftinê ve di jiyanê de bi hezkirinekê ve di lûtkeyê de jî bi riya serkeftin û evînê ve werin girêdan. Em nikarin di vê mijarê de durûbin, tu kesek nikare kesekî bixapîne. Ger hindek dixwazin têkîliya min a bi we re nîqaş bikin an jî ger hun dixwazin bi hindekan re nîqaş bikin, çarçoveya balkêş û ya herî jiyanî ye ev e. Derveyî vê kesek tu mijarê nikare di nava me de bike rojevê.

Divê hun xwe ji piyonbûna ji rêzê ya pergalên koletiyê rizgar bikin. Ji bîr nekin ku em weke gel ketine rewşeke gelekî xirab. Em li şûn hemû gelên dinyayê ne. Weke zayend hun hîn li şûn wan in jî. Gelo kî îdîa dike ku dê jiyan bi hêsanî were qezenckirin? Yê ku vê îdîa dike derewîn e. Dibe ku di dema derbasbûyî de we gelekî xeletî kiribin. Jixwe di şertên giran a koletiyê de bêxeletî derketin nabe. Dibe ku şaşitiyên we yên girîng hebin. Lê belê niha wate nedayîna derfetên azadiyê xwe, endam nedîtina ji bo pêwîstiyên wê, nêzîkbûna ne efûkirinê ye. Ji ber ku hun dest bi jiyanê dikin, ji jiyanê fêm dikin. Ger hun zorê bidin xwe, dikarin bi ser bixin. Ez dixwazim çarçoveyeke ku meşa we bi hemû aliyan ve watedar bike, weke ku xeteke sor xîz bikim. Ger di van hemûyan de ferasetek were bidestxistin, li gor min nebûna meşa we bi şêwazeke balkêş, bi heyecan û her diçe serkeftinê diyar

dike û pêk tîne nayê hizirîn. Ji bo vê ji zilaman zêdetir pêdîviya we pê heye. Wêrekî û fedakariya we jî zêdetir li ser vê bingehê ye. Ev ji cewher dûrxistin, di nefêmkirina vê de israr û helwestên ji rêzê pêkanîn, di rastiyê de dê we ji gavên azadiyê ya ku hêviya we ye dûr bixîne. Dibe ku hun vê dereng ferq bikin, lê belê wê demê jî hunê wenda bikin. Girêdaniya li xwe danê, di jiyanê de nerihetbûn, bi vê nêzîkbûnê ve gelekî girêdayî ye. Li şûna ku hun heyf bikin, li xwe bidin û perîşan bibin, gaveke xwedî rêgez biavêjin, temenê xwe –ku teqez şerekî we yê ku hun qezenc dikin heye- li gor wê plan bikin. Cewherê we jî ji bo vê guncaw e. Tiştê ku ji we tê xwestin rengê ku pêwîste bi vê were dayîne. Ji vê jî netirsin.

Divê hun di nava partiyê de bibin xwedî hewldanekê herî bi îdîa û zilam jî bi hemû aliyan ve sererast bike. Di vê wateyê de ger hun xwe bi rengê YAJK ê şênber bikin û rêxistin bikin, tê wateya ku hun têne wateya çekeke ku zilam jî tîne rê. YAJK hetanî niha nêzîkbûneke li gor wekhevî û azadiyê bû, ji vê pêvajoyê pê ve dê wê jî derbas bike. Divê YAJK bibe çekeke ku zilam tîne rê. Ger YAJK xwe li ser vê bingehê watedar bike, misoger ew dikare zilamê Kurd jî bîne rê. Vaye di vê xalê de em dikarin behsa hêza evînê, ya ku zindî dike, bênamûsî û bêrûmetî bi erdê ve dike yek bikin. Ger wateyeke evînê hebe, divê bibe navê di vê xalê de yê tune dibe, xelas dibe, tîne ser hişên xwe. Ger jin vê fêm bike, li gor vê lêgerîna têkîliyan li ser serê me cihê xwe heye.

Ev di heman demê de serkeftina rûmeta wê ye jî. Him pêkanîna wekhevî û rizgariyê ye, him jî rizgariya zilam a ku gelekî xalan de tevlîhev û tune bûye ye. Yê ku di nava we de xwedî îdîa hebin, bi vî rengî nêzîkbûna zilam, li gor min rastir e. Gelek ji wan dibe ku wekhevî û azadiyê dixwaze bi dest bixe, lê belê divê hun jî zilam tengav bikin. Hun dikarin bi îdîa xwe, bi vîna xwe, bi partîgeriya xwe ya mînak ve, bi xwedîderketina nirxan ve zilamê ku ji gelek aliyan ve kêm, xeter û metirsîdar bînin ser hişên wî. Di vê wateyê de hun nizanin xwe weke çekeke jinê bidin şerkirin. Hun ne di ferqa jêhatî û zayenda xwe heta zayendîtiya xwe ne jî. Her dem weke malekî hatina pêşkeşkirinê, xwedî lê derketinê we weke felsefeyekê fêm kiriye. Ev yek tê

wateya di rewşeke gelekî bêvîn, gelekî bêpêwendî û li benda stendinê de mayîn e. Ev di heman demê de sedemê hemû bêhiziriya we û hestyariya we ya erzan e.

Dema min got divê ji jinê were bawerkirin, tam di vê xalê de min xwest ez rave bikim ku ew jina ku xwedî li nasnameya xwe derketiye, destpêkê bûye yê xwe, ya ku xwe difiroşe na, zindî dike, jiyanî dike, bi hêza xwe ya hizir, her cureyê şêwazên wê yên raveyê têr dike, bi hêza xwe ya rêxistinî ya rast û rêveberiyê bi nêzîkbûnên xwe yên bi nirx ên ku jiyanê fêr dike ye. Jina azad ku ez pênase dikim ev e. Hewce nake mirov ji vê jinê bitirse. Hindek jina wiha weke gelekî xeter jî dibînin. Berovajî ez heyrana jineke wiha me. Tişta ku seyre hemû zilam vê gavê pêşketineke jinan a wiha ji bo xwe weke xeteriyê dihizirin. Gelo wekhevî û azadî li ku derê ye? Kanî li ku derê ye evîna ku li ser bingehê xwedî hêzbûnê? Evîna yê lewaz nabe. Misoger hezkirina yê gelekî nezan û radest bûye jî nabe. Tenê radestbûna wê dibe. Radest ê ku gelekî bêhêz e û hizir, vîna wê bi pêş nakeve, ji têkîliyeke ku armanca xwe ya ajoyî wêdetir derfetê nade tu pêşketinan. Tişta ku ji wêjeya pîrekiyê û mêrîtiyê were hêvîkirin ev e. Yê ku xwedî nêzîkbûneke ku di armancên xwe de wekhevî û azadiyê rave dike û di vê mijarê de hetanî dawiyê ji dil e, bila xwe bipeyitîne. Wê demê em jê re bibêjin merhaba û jê re bibêjin bravo.

Dîktator bi mirovên wekhev, azad û bi rûmet re bûyînê, bi kesayetên xwe û rûmeta xwe nikarin bidin xwarin. Teqez mirovên bêvîn û bêhêz dixwazin. Ger di refên me de jî hindek jineke lewaz û gundî ku bi wan ve girêdayî ye dixwazin bibînin, ji wan bitirsin. Ji ber ku ew misoger di nava nêzîkbûneke dîktatoriyê de ne. Ger zilam her dem ji jineke nêzîkî wekhevî û azadiyê ye û di vê de jî xwedî îdîa ye, ji vê kesayetê direve, yan jî her dem serdestiyê li ser wê ferz dike, heta dixwaze wê bixapîne, ji wî bitirsin. Misoger ji wî rêhevaltiyeke bixêr û hevaltiya hest nayê hêvîkirin.

Misoger e ku hun azadiyê û nêzîkbûnên wekhev dixwazin. Lê belê hun nikarin bipîvîn ka aliyê hember çi qasî ji vê re amade ye. Hun weke yeke ku ji bo xapandinê heta dawiyê misahît e û çavreşek e, nêzîkbûnên wê ji

bertekên gelekî erzan wêdetir naçe nêzîk dibin. Vaye tiştê ku we dibe binketinê ev e. Wisa ye ku êdî di PKK'ê de zayenda jinê, dikare jiyanî bibe. Bibe ya xwe, bigihê vîna xwe, dibe ku nêrîna wê bihêz be dikare her têkîliyeke ku derdikeve hemberî wê rexne bike, bibe xwedî biryara azad. Pîvana hezkirinê, heta yê ku parvekirinê dixwaze çi qasî bi serkeftinê ve xwe girêdaye ye. Yê ku xwe bi serkeftinê ve girêdaye, di heman demê de bedew e, dilnizm e, gihişti ye, bi terbiye ye, rêzdar e. Bêguman mirov dixwaze bi yê ku xwe bi serkeftinê ve girêdaye re jiyanê bi rêzdarî û hezkirineke mezin par ve bike. Hezkirin jî bêsînor bi pêş dikeve. Emê vê yekê bi pêş bixin. Derveyî vê yê ku nirx didin we yan dê ji we re bibêjin, "tu periya xewnên min î" û pesnê we bidin an jî wê bibêjin "tu toza lingên min î" û dujîna bidin we. Dema mirov li felsefeya zilam a heyî temaşe dike tê dîtin ku gelek caran dikevine nava van her du nêzîkbûnan yekê, yan jî ji yekê dikevine yê din.

Divê hun li hemberî kesayetên ku dest nadin hêviyên we yên azadiyê û nasnameya we ya ku em dixwazin bi pêş bixin, helwestên xwe heta planên xwe yên jiyanê bikaribin ferz bikin. Ger tê rê, divê ev weke serkeftina me were nirxandin. Tiştê ku ez bikaranîna xwedîhêz a çeka jinê behs dikim ev e. Zilamê ku li ser vê bingehê were sererastkirin, zilamekî ku jîriya wî ya şerkirinê bilind e. Zilamekî ku dikare wate bide hemû astên şer. Di şerê wî bi xwe de cih ji bo erzaniyeke weke "hele were em hev bijîn" nîne. Ew ji şêwazên têkîliyê ku tê ferzkirin, weke ku hun jî li dijî ne, nefretê dike û mirovekî ji wê re girtiye. Vaye çarçoveya têkîliyê ev e.

Dema ku hindekan xwest van mijaran nîqaş bikin, an jî parvekirina hindek tiştan ferz kirin, hunê bibêjin vaye çarçove ev e. Dema ku got ev ji ku derê derket? Hunê bibêjin bes e lêyîstok, bes e me hev xapand, ez te vedixwînim ferasetê. Ger zilam di ketîbûna xwe de israr bike hunê bi çeka xwe ya YAJK ê ve derbeya mirinê lê bidin. Rêxistinbûn ev qasî ji bo we pêwîst e. Ger xeterî mezin bibe û bi ser we de were, hunê hemû jinan rabikin ser piyan. Ez jî di nav de tu zilam nikarin nêzî we bibin. Her tişt li gor rêzdariyê, li gor pîvanên serkeftina tekoşînê, yan jî li gor asta rast a

azadiyê û wekheviyê çêdibe. Derveyî vê ji bo zordetiyê bandorbûneke bi serdestiya xwe û hêza rêveberiyê, derfet nîne. Ji ber ku ev derveyî rêgez e, tu zilam nikare hêzê ji vê re bibîne. Ev jî ya xweşik e, pêkhatina tiştên ku we hêvî dikir e. Şêwaza me ev e, şerê me bi vê armancê ye.

Ez hêvî dikim her diçe çarçove zelal dibe û ji bo sekinandina saxlem a di nava partiyê de serê ta yê ji bo we gelekî pêwîst e dide. Em hêvî nakin ku hun li ser bingehê vê çarçoveyê bikevine jirêderketineke cidî. Gelo tiştên diqewimin çi ne? Gelo rewşa we ya rast, nêzîkbûnên rast di kîjan astê de dimeşin? Ji bo ku ez vê mijarê zelal bikim û di pêşketina we de gavên mezin bidim avêtin, van nirxandinan dikim. Ger hun dibêjin "ev hemû tişt hatin fêmkirin" divê meşa we her demî û saxlem be. Êdî em naxwazin gotinên weke "tevlîbûna jinan ji jiyanê re lewaz e, bêpêwendî ne" bibihîsin. Divê hin rexneyên we hebin, divê hun bipeyitînin ku ka pêwendiya kê lewaz e, pêwendiya kê tevlîhev e.

## Cewherê tekoşîna me, derxistina rastê ya nasnameya jinê ye

Di dîrokê de li gel hemû xwedayan, xwedawend jî hene. Piştre li cihê jor cih nedan jinan. Ji ber ku civaka bi çînayetî pêş ketiye û jin êdî di binî de ne. Xwedawendiya ya ku di binî de ye nabe. Her dem zilam serdest e, qralên xweda zilambûn e. Qralîçeyên xweda nînin, lê belê berê hebûne. Ev yek zelal nîşan dide ku we jinbûna xwe wenda kiriye, yan jî bi we dane wendakirin. Hemû cehwerê şerê min, bingehê hemû lêgerînên min derxistina rastê ya nasnameya jinê ye. Ev lêgerîneke herî xweşik û pîroz e. Jina ku zilam lê digerin, jina ku bi hêsanî bixapînin û bi zayendîtiya herî çors ve xwe têr bikin û biavêjin e. Ev nêzîkbûneke gelekî xeter e. Felsefeya zilam ev e. Bêguman hunê di vir de xwe bihejînin, bibin xwedî tekoşîneke mezin. Ger hun tekoşînê nekin, hunê di rewşa jinên ku zilamekî wiha, koletiyê û kirêtiyê wiha ji rêzê dike û tûne dike, xwedî dike de bin. Ez jineke wiha di refên PKK'ê de qebûl nakim. Ezê wê weke sîxurekê binirxînim.

Ev tekoşîneke zehmet e, lê belê tekoşîneke gelekî birûmet û jêneger e. Ez bawer nakim ku israreke we di jiyana ji rêzê de hebe. Hêviya we bi çarçoveya ku min diyar kiriye de ye. Lê belê ji ber ku hun apolîtîk in û yên ku her dem hun ji vê dûr xistine, hun nikarin bigihên vê û hun xwe nikarin birazînin hêviyên xwe. Em dixwazin vê yekê derbas bikin. Hezkirin giştî ye û encamekî armancên me yên siyasî ye. Hezkirina yê ku siyasî nabe, pratîkî nabe û rêxistinî nabe, ezez e. Di wateya siyasî de jî heta dawiyê tevlîhev dike, cihê dike û dixe. Kesayet bi axaftinê na, ger bi rastî jî bi aliyê xwe yê siyasî, rêxistinî û çalakgeriyê ve bi biryar be û xwe peyitandibe, wê demê wateyeke hezkirina di wî de bi pêş bikeve çêdibe. Yê ku ji vê direve di hemû nêzîkbûnên wî yên di bin navê hezkirinê de sextetî heye û bi armanca xistinê ye. Ez bawerim ku di vê mijarê de tu kes ji we, xwe naxapîne. Şerê azadiyê ji bo vê pêwîst e.

We wiha bawer kir ku ev der malbat e û em jî mezinê malbatê ne. Ez hîn heft salî bûm, min ev yek mehkûm kir. Divê siyasîbûna me ya mezin li ser bingehê şer derbikeve holê. Ger hun wisa ji zilaman bawer dikin, an jî we xwe weke jineke wisa tevlîkiribe, ma gelo ez çi bikim? Lê belê ji bîr nekin ku rastiya Rêbertiyê navê şerê ê bi vê re ye. Hun vê nû ferq dikin, wê demê we hetanî îro xwe bi xwe xapandiye. Helwesta rast li şûna ku bi durûtî, bêpêwendîtiyê û bêîdîabûna xwe ve xwe ji tekoşînê dûr bixe, bûyîna xwedî helwesteke ku dikare wate bide nirxên mezin a azadiyê û dikare biryara xwe bide, bi biryar û dikare li her cihî hev temam bike, yan jî dikare li her cihî pîvanên xwe deyne holê. Ev yek zelal bûye û asteke ku êdî divê hun hemû bi dest bixin e. Vê yekê ji cewher dûr nexin. Bi nêzîkbûnên oportûnîst ve nekişînin çep û rastê. Ji ber ku tu sûda vê nîne. Yê ku vê weke din dike, li gor pîvanên me yên şer û milîtanên azad, dê bi erdê ve bibe yek. Girîn û gazind nayê qebûlkirin. Ez ê ku ne li gor pîvanên min e, nêzîkî xwe jî nakim. Ên ku pêdiviya xwe bi xwedîhêzbûnê hene, hun in. Ji xwe bawer bin û bi hêz bin.

Ez li şûna ku bibim ji zayendeke zilam, ez li hemberî wî zayendî şerê ku diviya jin bide ez didim. Weke ku di nava gelê Kurd de tê jiyîn, ev zayenda

ku şerê xwe qebûl nake ez şerê wê didim. Şerê jiyan ku pêwîstiyên şerê zayenda xwe bi cih neaniye jî, niha ketiye ser milên min. Rêbertî hêzeke ku were biçûkdîtin nîne. Ew ji bo we şensekî mezin e. Rêbertî tê wateya mirovê ku ew qas zilamê şaş, har û bêpîvan nas nake, disekinîne ye. Tê wateya ew kesê ku rê dide vîna jinê, tê wateya derîvekirina ji dinya azadiyê re ye. Hun nizanin van jî teqdîr bikin. Ev jî me bi hêrs dike, gavavêtina we ya ji deriyê azadiyê û wateya bûyîna we ya xwediyê van gavên ku xwedî hêz in, tê wateya qezenckirina mezin a bi xwe. Ji bîr nekin ku ez şervanekî mezin ê tolhildanê me. Ango ez yekî ku dizane çi bike, ji wan im. Divê hun helwestên xwe hetanî dawiyê lêbikolin.

Gelo bedewî binirx e yan jî zayendîtiya çors? Ger hindek dixwazin bi jinê re bijîn, divê destpêkê bedew be. Li şûna xwe bispêre qaşo zilamtiya xwe ya çors, divê xwe bispêre bedewiya xwe ya mezin û ji bo jiyanê hêzê ava bike. Ez xwe wisa îlan nakim, lê belê hewldana min di vî alî de ye. Nedîtina vê kêmasiyeke mezin e. Her diçe xwesteka mirovan a hindekî hezkirina min, ji ber vê azadiyê ye. Tirs li pêşiya hezkirinê asteng e. Di rastiyê de tu jin ji min natirsin. Ev tê wateya ku ji bo hezkirinê destpêkek hatiye kirin. Ev bi serê xwe têr nake. Girêdaniyeke bedewiyê jî bi serkeftinê ve ya ku qut nabe heye. Jixwe xweşikbûn bi xwe azadî ye. Ev jî bi şer ve tê bidestxistin. Şer jî sekinandin û pratîkeke balkêş a bîrdozî, siyasî, polîtîk û rêxistinî dixwaze. Heta di rastiya Kurd de ji ber ku bêhevsengiyeke mezin a hêzê heye, şervantiyeke balkêş û bin nakeve dixwaze. Di me de diyalektîka bedewiyê wiha ye, ji ber wê jî riya ku diçe hezkirinê bi vî rengîbûyînê ve derbas dibe. Min ev yek hindekî ceriband û dît ku asta pêşketinê ne xirab e. Divê pêwendiya her kesekî li ser vî bingehî bilind bibe.

Dema ku ez dibêjim em ji zilamtiyê bigerin, ez nabêjim em dest ji mêrxasiyê berdin. Berovajiyê ez dibêjim em mêrxasiya mezin derbixine holê. Zilamê ku di wateya çors de wenda dike, ji aliyekî din ve dê bi rengê jina ku qezenc dike ve bilind bibe. Dema ku van hev temamkirin, wê demê dê hêzeke balkêş a artêş û şer derbikeve holê. Dema ku we ev hevsengiya min lêkolîn kir û we xwest hewldanên min bi hemû aliyan ve fêm bikin,

hunê bibînin ku dinya min a jiyanê azadtir û wêrektir e û ji ber vê ez bi ser dixim. Di vê wateyê de dibe ku mînaka min hindek tiştan bide gelê Kurdistan'ê jî û heta gelek mirovan jî. Pêwendî dîtina şêweyê min ê Rêbertiyê, çavkaniya xwe ji vê taybetmendiya afirandin û serkeftinê ya li ser bingehê xwebûniyê digre. Şêwazê Rêbertiyê rastiya ku cewherê wî jî gotinên wî jî, şerê wî jî, ji ber wihabûnê ye.

Hewldanên me yên pêşxistina jinê yek ji şerê me yê mezin e. Her diçe nêzîkbûna ku têr dike û li ser bingehê rast tê bihêzkirin. Vê hê ji niha ve rê li ber hêviyên ku bilind dibe vekiriye. Her roja ku derbas dibe hêvî ber bi pêkhatinê ve diçin. A ku min peroş (heyecan) dike jî ev e. Bilindbûna jinê bi qasî bilindbûna gelê Kurd –ku ew jî ji wê re di nava hev de ye- xwedî nirx e. Misoger ji vê xwe bi şûn de kişandin nabe, berovajî encax mirov pê kêfxweş dibe. Divê hemû zilam jî heyranê vê tiştê bin. Lê belê divê zilam bizanibe ku ev yek hêsan nîne. Dema ku piştgiriya wî nebe, ji heyraniyeke wiha re jî mafê wî nabe. Jiyan parvekirin li aliyekî nikare destên xwe bide wê û ji bo ku bibe xwedî piştgiriyekê, pêdîviya xwe bi hewldanên xwe yên cewherîkirinê heye.

Ez di wê baweriyê de me ku wisa weke tê gotin, an jî weke didin qebûlkirin, jin layiqê xistinê nîne. Min her dem ji vê guman kirin û bertek nîşan da. Dilê min tu deman bi vê razî nebû. Min tu caran nexwast ez jinê wiha bi dest bigrim. Em niha vê bi qasî zanistî ye, weke bûyereke vînê ya cewherî heta em vê bi şêwazeke hunermendekê ku teşekirinê ve, heta rastiyekê ve dibin. Ev jî tiştekî xweşik e. Divê em li ser vê bingehê mêjiyê xwe biwestînin. Ger lêgerînên me yên têkîliyê hebe, divê em bi vê yekê ve girê bidin. Ev di heman demê de bersivdayîna lêgerîneke evîne ye û ketina riya wê ye. Evîna ku giştî bûye, evîna gelê Kurd a ku nû dest pê dike û şoreşa xwe ve hêviyê dide ye.

Bila tu kes di ezeziyeta xwe de vê xirab neke. Bi taybetî divê jinên di nava refan de ne di vê mijarê de xwedî rêgez bin. Bi taybetî bi girêdayîmayîna wasiyeta Zîlanê ve dema ku pêwîst kir, vê her roj bînin pêş çavên xwe û meşeke saxlem esas bigrin. Li gor min tenê nêzîkbûneke were

qebûlkirin, bi qasî ku rast e, ya bi me şer bide qezenckirin û tenê helwesta ku jiyana xweşik ku wê dixwast bi ser bixe dê bîne ye. Em nirxeke bilind didin vê. Divê hemû hewldanên we li ser vê bingehê bin. Kî li ser vê bingehê bimeşe û bi ser bixe, tê wê wateyê ku wê ya herî rast kiriye. Heyecan û coşa vê ji nêzîkbûna herî çors heta ji têkîliyên zayendî binirxtir in. Ez coşa ku li ser vê bingehê dibînim heyecan û ger çêbibe hevnaskirina zayendan a li ser vî bingehî û parvekirina bi hev re ya jiyanê, ez nirxdar û pîroz dibînim.

Divê hemû partiyî gihiştîbûneke bi vî alî ve, bi nêzîkbûnên xwe yên bi biryar ve, xwe gelekî bihêz bikin. Divê em him bi vê bawer bikin, him jî em ji bo pêwîstiyên vê xwe razînin. Ev dê şer ji her demê zêdetir bi pêş bixe, ji ber wê jî jiyana azadiyê ya ku em hêvî dikin dê bibe bersiveke ji nejiyîna me ya gelekî ketiye û gelekî kirêt dike. Nêzîkbûna me, coşa me, hezkirina me û ger hebe evîna me li ser vê bingehê ye.

**5 Reşemî 1997**

# DIVÊ EM BI ŞERVANÊN AZADÎYÊ RE JI NÛ VE JIYANÊ BIAFIRÎNIN

Rêbertî kesayetekî ji rêzê ku ji bo we hun hestên xwe yên ji rêzê û kesayetên xwe yên têr nake bidin jiyîn nîne. Em bi nirxandinên berfireh ve, ji bo ku hun kesayetekê bi dest bixin em hewldanan dikin. Lê belê hun tu caran ji jinbûna xwe ya ji rêzê nagerin. Hun nêzikî bi dest xistina bi wêrekî û zanînê ve asta milîtaniyê nabin. Hun ji pêwîstiyên nirxên pîroz û ya herî girîng jî hewldanan re nikarin bibin bersiv. Taybetî hindek kes dixwazin kesayeta xwe ya neçar û hêjar di partiyê de bidin jiyîn. Qebûlkirina me ya vê yekê ne gengaz e. Divê hun me bikaribin fêm bikin, piştgiriya me rast bi kar bînin. Bi kûrahî bihizirin û veguhertina kesayetê bikaribin bikin. Hun xwe di rewşeke encax bi zorê û kêmendametiyê bidin meşandin de dihêlin. Ev jî têr nake. Weke din hestiyariya we ya kevneşop didome. Ev hemû ne çare ne.

Şerê rast destpêkê di kesayetê de neçare ber bi serkeftinê ve biçe. Ez bim, min dê şerm bikira ku wiha derbikevim hemberî nirxên şoreşgerî. Hun jinbûna xwe ya ji rêzê ve, bi salan e vedişêrin û didin jiyîn. Ger em tevdîran negrin bi xetên stûr ve hun tu caran nahizirin ji nirxên civaka serdestiya zilam, ji kevneşopan û şêwazên wê yên jiyanî rizgar bibin. Ev li xweşiya we diçe. Lê belê ev ji bo partiyê xeterî ye, gefxwarin e. Me ji bo yê hatiye mehkûmkirin nedin jiyîn û ji bo yê pêwîst e bigihê azadiyê rê vebikin, biryar da. Şer ev e, divê em destpêkê qezenckirina vî şerî bizanibin. Lê belê mixabin di we de bersivdana ji hewldanên me re zêde ne pêşketiye. Yê ku herî zêde divê xwe perwerde bike, hun in. Hunê ji bîr nekin ku hun kesayeta ku hemû paşverûtiya netewî û civakî tê de kombûye ne. Kombûna di kesayeta we de kombûna koletiya giştî ye. Heta hun wê perçe nekin, tu caran nikarin ji şermê rizgar bibin. Ew jî şerekî berfireh dayînê pêwîst dike. Di vê wateyê de, yê ku nikarin şerekî wiha bidin pêş çavên xwe, divê bizanibin ku zêde nikarin di nava refên me de cih bigrin.

Ji bo zilaman jî ez diyar dikim: Em tu caran nikarin ji mezinbûna PKK'ê tawîzan bidin. Hunê vê mezinbûnê nas bikin û xwe bigihînin pêwîstiyên wê. Hindek nikarin xwe li ser pişta me weke tiralekî û weke nexweşekî bidin jiyîn. Kesayeta ku nehatiye dahûrandin û ronahîkirin her dem rê li ber bandora neyînî vedikin. Kesayeta herî binirx kesayeta ku li ser xwe serdestiya xwe heye û dizane çi dike ye. Hêmanê ku ez herî zêde kirêt dibînim û pê hêrs dibim, tenê weke nexweşiyeke zayend ne, weke şêwazeyekî nexweşiya koletiya giştî û koletiya civakî, ew rewşa giyanî û helwestên ku hun dikevine nav de ye. Rewşa giyanî ya ku hun dijîn û şêwazên helwestan ji taybetmendiyên şervanên azadiyê dûr in. Di vê mijarê de aqil nekirina we xwe di vê mijarê de pêş çavan re derbaskirinê û bi dest nexistina asta tê qebûlkirin, dê we di nava refan de her dem weke tawanbarekî bihêle.

Em behsa şervantiya çors nakin. Raveya herî kûr a şervantiyê, şervantiya ku kesayetê ber bi fethê dibe ye. Ger hun kesayeta xwe nebin fethê, em nikarin we qebûl bikin. Hun pêwendiyê bi Rêbertiyê dikin û dixwazin girêdaniyê çêbikin. Ji bo wê jî divê hun bi hemû aliyan ve hêza nirxandina wî bi dest bixin. Hun nikarin lewaziyên xwe bispêrin Rêbertiyê, ser bigrin û berdewam bikin. Di saya Rêbertiyê û hêza partiyê de, hun nikarin xwe azad hîs bikin. Ger hun şerê xwe yê xweser a azad bi serkeftî bidin, wê demê di nava partiyê de wateyeke bi Rêbertiyê re meşê çêbibe. Li gel ku ji niyeta we ya baş û feraseta we ya xwe fedakirinê re em nirxeke mezin didin, divê hun herî kêm bi qasî wê bibin xwedî sekinandineke saxlem a ku pêwîst e. Ya ku dibe bersiveke têr ev sekinandin e. Lê belê feraseta ku min di gelek kesayetan de dîtiye, feraseta ku partiyê weke malbatekê, zilam weke mezinê malê dîtin heye. Ev jî gelekî metirsîdar e.

Partî yekîtiyeke tekoşînê ye û her kes di wir de milîtan e. Me kesayeta Zîlan ve tenê dijmin ne, her cure hestên ji rêzê, jiyanên erzan û kesayeta binketî bi erdê re kire yek. Divê hun rêzê nîşanî vê bidin, ew ji her tiştî girîngtir e. Kesek nikare kêmasiyên xwe yên giran bispêre pîroziya PKK'ê û di bin navê "ez jî azad im" de berdewam bike. Her kes neçare bibe milîtan

him jî xwedî wê şensê ye. Ez xwe bi qasî azad bikim, dikarim efû bikim. Naxwe rojekê xwe jiyandina min jî ne gengaz e. Bi qasî ku ez negihêm hêza tekoşîna azad, ez xwe diqehirînim û nikarim bijîm. Lê belê di şer de mirin jî zêde wateyekê rave nake. Êdî nirxeke yê ku şerê mezin qezenc nakin nîne. Tenê şerkirin têr nake, encax ji bo me qezenckirina şer têr dike. Emê vê bînin asteke şîarê. Gotina “ez tevlî PKK’ê bûm, min çek hilgirte destên xwe, min ew bi kar anî, min namûsa xwe rizgar kir” jî nebesiyekê rave dike. Ev têra ku hun xwe biparêzin nake. Encamê van encax gav bi gav bi gihiştina serkeftinê ve wateyekê rave dike. Bi qasî hun dikarin tekoşînê bikin, bîstûpênc salan şer bikin, ger di encam de şêwazê we serkeftinê misoger nake, we wenda kiriye û zêde nirxeke we jî nîne. Em dixwazin veguhertina mezin a kesayetê, di bin vê şîarê de pêk bînin.

Di refên me de helwestên ku ez zêde rast nabînim, di giştî de jî her dem tengasiyê dikişînim û pê hêrs dibim, di giraniyê de ne. Her kes bêyî ku şerm bike, her roj her cureyê nexweşiya xwe ferz dike. Di nêvenga me de yê ku weke pîrejinan digrîn, bi gotinên derew ve dixwazin xwe rizgar bikin, ên ku di şer de neçariyê dijîn, ên ku aso û dilên wan nînin zêde ne. Ev di heman demê de rûreş in. Ên ku nikarin paşverûtiyên xwe bi bin bixin, dayîn û stendineke wan bi dijmin re nabe. Yê ku şerê xwe di bîrdoziyê de, di pratîkê de, di giyan û zanebûnê de, heta di fîzîka xwe de nikarin bibin xwedî hêz, zêde wateyeke bi dijmin re mijûlbûna wan nîne. Temaşekirina we ya kesayeteke ku ev qasî şer dike, şêwazeke we ya helwestan ên ku em xweş nabînin e. Hun rewşeke ku rêhevalên divê bi hev re balkêş şer bikin ne, gelek ji we weke ku di arenayê de bi wehşan re şer dikin dijîn. Ew rewşên paşketî ne û divê ev werin derbaskirin.

Refên şoreşgeran, refên şerên dijwar in. Zindîbûn û şerkeriya ku ez dixwazim di refan de bibînim, gelekî mezin e. Jiyana wan mirinê bi bin dixe. Ez bawer dikim ku ev di kesayeta Zîlan de jî wiha ye. Dema ku ew diçû mirinê jî, di rewşeke meşa jiyana mezin de bû. Ev dê me bi şan, mêrxasî û pîroz bihêle. Her cureyê sekinandinên din ketin e. Sekinandina ku bi çalakî û jiyana xwe ve mezinbûnê ava nake, taybetmendiyeke paşverû ku

divê em herî zêde di refan de mehkûm bikin e. Ger ez çi qasî ne rihet dibim, divê hun jî ne rihet bin. Ji bo paşverûtiyê, kirêtiyê û wendakirina erzan destûr nîne. Hêrsa Rêbertiyê di vê mijarê de çi qasî mezin be, divê hun jî vê parve bikin. Li hemberî şaştiyan, lewaziyan û kêmasiyan Rêbertî çi qasî dijwar e, divê hun jî xwe bigîhinin wê. Nêzîkbûnên derveyî wê bêwate ne. Ger her tişt bi milîtanî çêbibe, xwedî nirx e, xweşik e. Yekî ku bi cewherê xwe, bi helwesta xwe, bi feraseta xwe, bi cidiyeta xwe ve bizanibe çi dike, tu caran jiyanê li ser vê bingehê ji rê dernaxe û xwedî nirx e. Kesayeta ku agahiya xwe ji xwe nîne, her kêliyê weke diriyekê di derûdora xwe re diçe û xwe ji vê ferzkirinê dûr naxîne, kesayeteke tu caran layiqê me nîne û divê di nava me de nejî.

Ez bang li we dikim ku kesayetên qehreman ên PKK'ê, ji nû ve jîndar bikin û esas bigrin. Kesayeta qehreman a PKK'ê divê di kesayeta we de bersivê bibîne. Derveyî vê bi tu sedeman divê hun tu tiştî di kesayeta xwe de nedin jiyîn û cih nedinê. Ev gelekî girîng e û ger sonda girêdaniyê wiha wate bibîne, xwedî nirx e. Ger di kesayeta we de hema ji her şaşitiyê re, ji her kêmasiyê re, ji her nasname û kesayetê re cih hebe, ew kesayet nabe yê me. Ez hêvî dikim hun ji van hemûyan hindek encaman derdixin. Ger hun ji van nirxandinên min fêm bikin, ez bawer dikim ku min bi van ve çarçoveyeke ku hetanî dawiya temenê we têra we bike, pêşkeş kiriye. Ger hun wê fêm bikin û wateya wê pêş bixin, ev ji bo jiyaneke ku her dem we pêş dixe re têr dike. Ger hun di tengbûn û nezaniyê de israr bikin, mirov nikare bihizire ku hunê îfleh bibin. Azadiya jinê li jorî her tiştî girtin, hêmaneke ku em esas bigrin û biryareke herî mezin e. Ev çalakiya mezin ên bi biryariyê jî, bangawaziya vê bû. Tu kes ji me nikare ji nefêmkirina vê û ji cih neanîna pêwîstiyên wê behs bike yan jî em nikarin wiha nêzîkî van nirxan bibin. Misoger emê şehîdên xwe di kesayetên xwe de bidin jiyîn.

Em di şerê jinûve afirandina mirovên xwe de ne. Her hal a herî pêwîst jî ev e. Divê her kes ji dil tevlî vê bibe. Em dixwazin ne bi koleyan, bi şervanên azadiyê re jiyanê biafirînin. Tişta ku ji destên min tê ev e. Divê hinekî jî hun bikaribin bikin. Ez jî tekoşerek im, ji min xwedayîbûnê hêvî

nekin. Bi rengekî kevneşop hatiye hînbûn “mezinê me dikin” ve nêzîkî min nebin. Ez kesayetekî ku şerê kesayeta xwe dixwazim bi hêza xwe bimeşînim im. Ê ku rizgar dike nînim, şervanekî rizgariyê me. Tekoşerekî bi her kesî re hevpar û bi vîna azad im. Naxwe ez şivanê yê ku hundirê wan vala ne, yê ku weke keriyekî pez in, nînim. Ez ji şivaniyê nefretê dikim, ez karkerê binkeya bi zanyarî tercîh dikim.

Ez zilamekî ku hun fêm dikin jî nînim. Qet niyeta min jî nîne ku ez bibim zilamekî wisa. Ji ber wê jî me bi zilamên ku hun fêrbûne re tevlîhev nekin. Li ser vê bingehê neyên girêdan û daxwazan nekin. Ger gengaz be, ji me fêm bikin, ger hêza we hebe hevaltiya rê bikin. Ez şervanekî ku bi hezaran zincîran diqetîne, lê belê ji hendefan jî nakeve me. Divê hun bi çi re, bi kê re dimeşin, bi hemû taybetmendiyên wî ve hîn bibin, li gor wê jî ne derfetên azadiyê xirab bi kar bînin, ne jî ji hendefan gêr bibin. Ji ber ku Rêbertî ew nîne. Rêbertî bi qasî tevdîra mezin e, meşa mezin a azadiyê ye. Bi qasî çalakiya afirandinê ye, yê ku balê li rewşa şênber dikişîne ye. Bi qasî lez û tempo ye, tevdîr e. Bi qasî hest û hizirandin e, bi qasî nêrîn û çalakî ye, yê ku girêdaniya di navbera van hemûyan de, bi ziraviya endazyarekî dipîvîne ye. Ger hun bi van hemûyan ve xwe ava bikin, dikarin bimeşin. Yek kêliyê jî piştçav nekin ku hemû jiyana we ji şervantiyeke mezin ava dibe.

Sekinandina we bi xwe şerek e. Şerê herî mezin israra di vê sekinandinê ye, îstikrar û serdestî ye. Başbûn û rastiya herî mezin ku hun nîşanî mirovê me bidin, di vê sekinandinê de israr e. Naxwe xwe bêtevdîr hiştin tê wateya xwekuştin ê. Ger gengaz be, vê di kesayeta xwe de bi qasî pêwîst e veguherînin cewher û teşeyê. Heta hun bigihên vî tiştî bi israr bin. Divê hun hetanî şerê di xwe de qezenc nekin xwe radestî vînên şaş, heta yê ku şaş şer dikin nekin. Divê hun bi qasî jiyana şaş xwe bi nezanî û koletiyê tevlî şerê şaş jî nekin. Ez van hemû tiştan weke pêwîstiyeke girêdaniya bi bîranînên bi şehîdan, weke raveya watedayîna kesayeta Zîlan û bi pêwîstiyên wan ve girêdayî mayinê dibînim.

Ev rojên ku em di eniyên xwe yên şer de bi bin neketine û ber bi serkeftinê ve diçin, dema ku em Zîlanê bi bîr tînin hun dikarin bi heyecana

ku artêşbûna jin û ji nû ve afirandina jinê dide ve him xwe bi şens bihesibînin, him jî bi îdîa bikin. Hun di rewşeke ku meşek saxlem dikin de ne û bi biryar in. Ên ku li gor vê nêzîk nabin, ezê weke munafiq binirxînim. Ê ku li rûyê me cuda û li pişta me cuda ye û di nava xwe de lêyîstokên din dikin, em ji dil nahesibînin. Xwerûbûn û rastbûn gelekî girîng e. Vekirî axaftin gelekî xwedî nirx e. Bi qasî kûraniya jiyanê, divê hun bi wêrekiyê bimeşin, ew jî xwedî nirx e. Hun hêza bi îdîa ya jiyana nû ne.

Hîsnekirina Rêbertiyê tê wateya zêde fêmnekirina gel û partiyê, lewazbûna xwesteka jiyanê ye. Ew jî tê wateya yan di koletiyê de, yan jî di kesayeta bûrjûvaziya biçûk de israrkirin e. Ger mirov bi kesayeteke wiha ya Rêbertiyê ve bikeve hundirê têkîliyê bi rihetiyê dikare bigihê vê xeta şehîdan a mezin. Di vê mijarê de zelal bin, biryara xwe bi lez, misoger û dema wê de bidin. Zêde talox nekin û dudil nemînin. Bi ezeziyeta xwe ve evîndar nebin, di rastiyên giştî û şêwazên xwe yên jiyanê de, tevlîbûneke wêrek, vekirî û misoger nîşan bidin. A herî xwedî nirx jî ev e. Weke din jixwe em kêrî karekî nayên. Tu tiştek ji şerkirina bi serkeftî ji bo şoreşê bi nirxtir nabe. Ji bo vê jî ya herî pêwîst, kesayeta milîtan a ku xwe ji serkeftinê re razandiye ye. Derveyî vê her tişt ne pêwîst e û dide wendakirin. Di jiyana xwe de destûrê nedin xeletiyên ku wiha vala derdixe û hewldanê ji cewher derdixe. Rêbertî li ser vê bingehê jî ji bo we hêzeke mezin e. Tiştê ku we girtine, bi lez bigihînin hev û milîtaniyeke ku dibe bersiv, bi rengekî nayê vegotin misoger bikin. Veguhertina we ya ku kêmasî û nebesiyên xwe ber bi hêza rêxistinê ve bi fêmkirina Rêbertiyê ve gengaz e. Ji bo vê gelek tişt pêwîst in. Wateya veguhertina rêxistinê di armanc û têgihiştinê de kûrbûn, di biryar û vînê de tûjbûn e. Ez di vê mijarê de di gelek kesan de çêkirîbûn û durûtiyê dibînim.

Her dem hestên min hizirandinên min gur dike. Hizirandinên min hestên min diherikîne. Ev min di armanc de kûr dike. Ev jî min dibe, ez gavan biavêjim. Çîroka jiyana Rêbertiyê, çîroka veguhertina lewaziyê ya hêzê ye. Ez tam zilamekî bûyer im. Ez kesayetekî ku di dinyayê de yê dişibê kêmin im. Kesekî din ê ku herî şertên lewaz de bi qasî min xwe tîne rewşa bûyerê

nîne. Hema her kes li gor pergalê kevneşopan, fermanê û fermiyetê ye. Yê ku şûn de dimînin, anarşîst û serserî ne. Ev kesayetên ku pergal bi hêsanî diperçînin e. Di rastiyê de hîn CİA jî nikare me dahûrîne. Misoger e ku ez kesayetekî gelekî taybet im. Ji wî alî ve dibe ku ji bo neçariya we ya mezin ev yek bibe şopek. Naxwe hun weke miriyekî ne. Gelo di nava pergalê de hetanî li ser bingehê feraseta zilaman de, di jiyanê de ji bo we çi qasî cih heye? Li ser vî bingehî ji bo we tu kesî cih nîne. Hun di mijara dikarin bi zilamekî re çi qasî bijîn de jî, bêhêvî ne. Hun di bin navê jiyanê de belayeke mezin dijîn. Ez bi we xembar dibim. Lê belê kesayetê ku xwe di vir de diafirîne, dikare çareseriyê bi ser bixe. Nanê amade, jîna amade nîne.

Rexmî ev qas şerî hîn jî em di destpêka karê afirandinê de ne. Ji bo mezinbûna hestan pêdîvî bi şerê mezin heye. Naxwe hun bihizirin dê rewşa we çawa bibe? Gelo hunê bi van zilaman re çawa bijîn? Ger hun bixwazin dikarin xwe têkûz bixapînin. Ev jî dê gelekî kirêt be, têkîliya jin û zilam lêyîstokeke mezin a xapandinê ye. Şêwazeke têkîliyê ya ku ez jê nefretê dikim e. Jixwe ji ber ku min ji vê nefret kir, min li gor xwe şêwazeke têkîliyan afirand. Şêwazeke her kesî ya têkîliyê heye. Mînak dibe ku hun pîrekiyekê bikin, an jî dibe ku mêrekî we yê baş hebe. Ev we têr dike, lê belê ev tişt ji bo min tenê divê biçûk werin dîtin û ez cidî nagrim.

## Bi tenê zilamê ku di her xalê de serkeftin bi dest xistiye tê hezkirin

Dengbûna Zîlanê datîne holê ku em dixwazin çi bikin. Ew ji bo jiyana mezin bû bangawaziyek. Gelo emê wê ji bo xwe çawa bînin rewşeke şênberiyê? Di wateya rast de em bi karê afirandina yê ku were jiyîn de mijûl dibin. Ger hun tenezûlê tiştên ji rêzê bikin, hunê gelekî zû di jiyanê de îdîaya xwe wenda bikin. Hezkirinên we nînin. Bêyî ku şerm bikin, hun dikarin hestiyariyên ji rêzê ferz bikin û bi rihetî bigrîn. Dibe ku hîsên we yên mezin nebin, ger hebin jî ev gelekî bêyî armanc in. Rêbertî dibe kesayetê ku di vê mijarê de li ber xwe dide. Bedewiya wî jî di vir de ye. Ez hêsan najîm, hêsan namirim. Jixwe bangawaziya Zîlanê jî ev bû. Hêsan ne

mirin, bi zoriyeke balkêş şêhîdbûn û vê jî bi felsefeya mezin a jiyanê ve girêdan! A ku bala min dikişîne jî ev e. Divê em jiyanê wiha berdewam bikin. Naxwe, ez wisa bi hêrs dibim ku li hemberî we ez xwe bi zehmetî digrim. Ê ku îdîayên xwe yên mezin a jiyanê nînin, şerê wî jî mezin nabe. Her tiştên van bi xeletî û şaştiyan dagirtî derbas dibe. Niha tiştê ku ez dikarim bikim, belavkirina vê şervantiyê ye. Wisa bawer nekin ku hunê li gel min bi hêsanî êşên xwe derbas bikin. Weke kesayet jî, weke zilam jî bi min re wisa hêsan û erzan nayê jiyîn. Ez jî dikarim wisa bijîm, di van mijaran de jî qet xelet nebin.

Min zilam kuşt. Dibe ku ev ji bo we gelekî xemgînî be. Mirina zilam dê bi we gelek tiştan bide wendakirin. Hun dostê xwe yê herî binirx ê ku hun xwe dispêrin, bi hev re dikarin bijîn an jî hevalê xwe yê jiyanê wenda dikin. Jixwe sedemeke ku di bin bêxwestekiya we ya di tekoşînê de radizê jî ev e. Ji ber ku we mêrê kevneşop wenda kir, hun dixuşikin. Sedema tengasiyên we yên hundirîn jî ev e. Ez bawerim ku ger têkîliyeke we ya li gor xwestekên we yên ketî hebûya, hunê gelekî bi rik û bi hêrs bibana. Ez mirovan nas dikim. Dibe ku têkîliyên wiha xwestekên we têr bike. Di vê mijarê de me ferqeke mezin ava kir. Ez hêviyên zilaman jî dihizirim. Dibe ku ew bi hêsanî bibana xwediyê we. Mirov dikare diyar bike ku gelek ji wan dikarin we bi rihetî bixapînin.

Ji dest zilaman girtina min a vê derfetê li zora wan jî diçe. Bêguman Rêbertî ji ber ku di heman demê de fermandariyekê dimeşîne neçare wisa be. Yê ku serê xwe bi karên wiha biçûk re mijûl dike, leşkeriya wan jî xeter e. Êdî di derbarê van de rast nîqaş bikin, dibe ku hun wê demê tercîhên nû bi pêş bixin. Dibe ku mêrek ji dest we biçe, lê belê bi tiştên din ve dê jiyana we wate bibîne. Li gor min hun ne di dema zewicandinê de ne. Hun niha di dema naskirina jiyanê de ne. Ji xwe bawer bin, hun dikarin flort jî bikin. Flort hestên ne xeter in, ger hun zêdetir bi pêş ve biçin, hun nikarin ji bin derbikevin. Em ne di pêvajoyeke zêde evîndarbin de ne. Takekesiyê bijîn de ne û kesayeteke ku di vê hêzê de ye jî nîne. Ez tu caran vê hêzê di xwe de peyda nakim. Dibe ku ezê tu carî vê hêzê di xwe de peyda nekim. Ez vê

weke axaftineke erzan diyar nakim. Ez rastiyeke gelekî girîng tînim ziman. Wisa ye ku wateya van şehîdên mezin jî ev e. Şehadetên mezin, şehadetên jinan jî wiha fêm bikin. Gelo ew şehadetên çi bûn? Divê hun li ser vê bihizirin. Ger hun bihizirin dê hîsên we yên mezin derbikevine holê, hestên we yên mezin gur bibin û kesayetên we yên weke miriyan ku dixuşikin zindî bibin.

Emê berdewam bikin ku hest û têkîliyên biçûk ku we dixuşikîne, ji holê rabikin. Ger hêza we ya evînê ya mezin hebe, hun dikarin wê nîşan bidin. Ez tenê vê riyê dikolim, ez bi bivir lê didim an jî kevirên giran diqulibînim û rê rast dikim. Dibe ku di pêş de hindek di vê riyê de rihet bimeşin. Ev kar wisa hêsan nînin. Bêguman wisa xwe ji bêîdîabûnê re hiştin jî nayê qebûlkirin. Gelo min bi tena serê xwe çawa wêrekî kir ku hetanî îro ez hatim? Niha îdîayên min, şerên min û karên min hene. Her diçe ez di dinyayê de dibim bûyerek. Ez her roj pirsgirêkên nû tînim serê xwe. Hun jî ji pirsgirêkan, tiştên ku we mijûl bikin direvin. Berovajî ez her roj bi ser pirsgirêkan de diçim. Hîn zêdetir pirsgirêk tê wateya zêdetir mijûlbûnê. Zêdetir mijûlbûn tê wateya pêşketinê. Ji bo me felsefeyeke weke din a jiyanê ne gengaz e. Felsefeya ezeziyetê bi tu deran ve nabe. Felsefeyên ku xwe dispêrin her cureyê hêmanên feodal û kapîtalîst jî zêde encamê nadin. Ji bo dinyayên we yên biçûk a herî xirab jî ev e.

Em di dinyaya kerran de dibin dengek. Di dinyaya koran de dibin ronahiyek. Ev deng û ronahî zindî dike. Ji bîr nekin ku di vî welatî de her tişt miribû. Di vî welatî de namûs, mirovahî û jiyan nebû. Di vî welatî de her tişt bênamûsî û ketî bû. Di vî welatî de bedewî nebû, her tiştekî vî gelî di rewşa nexweşiyê de bû. Yek tişta ku min li hemberî van tiştan kiriye, bûme çirûskeke hêvî ye. Ji ber ku ev jî bi ser xist ez hindekî kêfxweşim û dikarim xwe efû bikim. Min dikarî ez vê pêk bînim, a herî zehmet min bi ser xist. Di xeta dijmin de helandin, di korta bêîdîabûnê de gevizîn xirab e. Niha hêviyek heye. Ger hun bixwazin hun dikarin vê hêviyê jiyanî bikin.

Her zilam kêm zêde li gor hindek jinan e yan jî ji bo hemû jinan bûyînê di bûyera azadiyê de nikarin bidin pêş çavan. Lê belê ez vê didim ber çavan.

Dema jiyana mezin be, rêza wê jî hezkirina wê jî, evîna wê jî mezin dibe. Ev bangawaziyek e. Zîlan bi çalakiya xwe hîs nake ku zêde serkeftî ye. Tenê dibêje “ez bûm dengek û li her derê têm bihîstin.” Nekarîn ji Zîlanê fêm bikin, di rastiyê de yê ku ji Zîlanê fêm bike, bi hêsanî namire, pirsgirêkan dernaxe, gazindan nake, nabêje “ez ketim nava qeyranê, teng bûm, jiyan êdî min tengav dike.” Yê ku van disepîne, bêrêz e û tu caran em bêrêzên wiha di nava refên xwe de nagrin. Ango ji ber ku dengekî ku wateya wê gelekî dagirtiye, ji bo ku ez nirxekî mezin didim van dengên wiha, ez bi israr li ser disekinim.

Jiyîna min a bi jinê re ger li ser bingehê ferîştebûnê (melek) be gengaz e. Gelo ferîşteyên vî welatî kî ne? Ger hun ferîştebin jî baskên we nînin, hun nikarin du mîtroyan bifirin. Ferîşte raveya pîrozbûnê ye, ew tu caran nabe kole, her dem azad e. Jixwe di baskên xwe de serkeftinê diçerpîne. Em jinê bi qirêjbûn û koletiya wê ve nikarin nêzîkî xwe bikin. Bêguman ev îdîa û îdealên mezin in. Dibe ku hêza we têra vê neke, ji bo wê ez naxwazim zêde vê yekê li ser we ferz bikim. Lê belê ev armanc in û em jî ji armanc nagerin. Ger li derûdora min qehreman û ferîşte nebin, ez nikarim bi kesekî re bijîm. Sedema ku ez ji we re sebir dikim, ji bo ku dibe hun veguherin e.

Azweriya me ya pêşketinê mezin e. Ger hun kesayeta Rêbertiyê, bi aliyê wî yê cihereng ve nas bikin, hun dema pêş de zehmetiyan nakişînin. Ez di gorê de bim jî ezê xwe bimeşînim. Divê were zanîn ku ezê rêpîvan û şêwazê xwe ve bi hêsanî dest ji tekoşînê bernedim. Gotina “em dûr ketin, dikarin xwe bijîn” tê wateya xwe xistina nava tengasiyê. Ger hun bibêjin “me nabîne, emê hestên xwe yên erzan bijîn, emê ehbapgeriyê bikin” hunê tenê xwe bixapînin. Ji ber sedema giraniya ku hun di PKK’ê de ava dikin, dibe ku hun min jî hilweşînin. Şervantiyeke wiha mijara gotinê ye. Divê cihê keçikan jî di nava vî şerî de hebe. Yê ku di şer de ne, bi şer re mijûl dibin, astên wê kûrbûna hizirandinê ye, rêxistin e. Divê her kêlî xwe zelal bike, paqij bike, xwezayî bike û weke kêrê xwe tûj bike. Ev di heman demê de pêwistiyeke girêdaniya bîranîna Zîlanê ye jî. Ez ne ketiyê jinê, ne jî mehkûmê wê me. Lê belê ez jinê ji nû ve diafirînim. Ev nayê wê wateyê ku

ez vîna we qet tune dihesibînim, berovajî ji bo ku vîna we derbikeve holê ez bangewaziyê dikim.

Bûyîna bi jinê re bi destxistina serkeftinê re gengaz e. Berovajiya vê ev tê wateya bûyîna bi pîrekê re ye. Bûyîna bi pîrekê re tê wateya bûyîna bi binketinê re. Bûyîna bi jinê re ku di wateya ez fêm dikim, bûyîna bi serkeftinê re ye. Bûyîna zilaman bi pîrekan re yan jî bûyîna pîrekan bi zilaman re misoger li ser bingehê qutbûna ji serkeftinê ye. Ji ber wê jî rastiya pîrekiyê û mêrîtiyê li gel min derbasdar nabe. Zilamtî û jinîtiya rast dema bi serkeftinê ve girêdayî be xwedî nirx e. Di heman demê de her kes evîna her kesî ye. Ez di refên me de cih nadim ê ku vê astê bi dest nexin. Ez wan kesayetên kevinbûne, bêgiyan in, bêdil in û ketîne weke bênamûs dinirxînim. Di bin hemû girî û gazindan de, nêzîkbûna “bihêle em bibin pîrek, bihêle em bibin mêr” heye. Tu kes nabêje “ez dixwazim bibim kesayetekî ku dixwaze fetih bike.” Ez weke zilamekî ferqa di navbera xwe û bi van re gelekî baş vedikim û ez bi meşa serkeftinê ve girêdayî me. Hun hemû bedewên dinyayê bin jî, dema ku hun rewşa jinên bi serkeftinê ve girêdayî de bin, ez dikarim bi we re têkîliyê bi pêş bixim. Dema hun hatin xala fedayîtiya mezin, fedakarî û wêrekiya mezin, mirov dikare li rûyê we temaşe bike. Em ji bo vê jî dibêjin, Zîlanbûn.

Weke tê zanîn em bi karê xwe ji nû ve afirandinê ve mijûl dibin. Di serdema ronesansê de Leonardo Da Vincî, Rafael bi peykerên xwe ve jinên xwe afirandin. Em neçarin ji wê hîn hesastir nêzîk bibin û peykereke jinê biafirînin. Afrodît ew jinên xweşik ên tên zanîn derxiste holê. Emê kar bikin ku yên ji wan pêşketîtir biafirînin. Şoreş vê diafirînin. Li gor ku şoreşa me jî heye, emê destpêkê yên wisa xeyal bikin û piştre bi çakûçê lê bidin û teşeyekê bidinê. Ango ji kombûna we hemûyan dê jineke nû were afirandin. Ez li pey wî karî me û ez vî karî bi azweriyê dimeşînim. Ev jî karekî xweşik e. Ango afirandina peykera jinê, karekî ku herî zêde heyecanê dide ye. Zêde têkîliya vê bi takekesiyê re nîne. Gelek eşkere ye ku ev ji bo vê asta netewî, heta mirovahî pêwîst e. Karekî ji vê binirxtir nîne. Em karkerê vê ne, ez hindekî hosteyê binkeya avahiyê me, hun jî karker in. Emê bexçeyekî ava

bikin û her yek ji we dikarin di vê baxçeyê de bibin kulîlkekî rengûreng ku vedikin. Em feraseta xwe wiha balkêş dikin, ez hêvî dikim hunê bi vê re heyecaneke mezintir bibînin. Ji bo jiyanê û şerê wê yê ku tê fermankirin bi rengekî têr û pêşvebirinê nêzîk bibin.

Emê zilaman jî tengav bikin. Heta ku zilamên me bi ser nexin, ne emê wan bixwazin ne jî ewê bi zorê dest bidine we. Bi tenê zilamê ku di her xalê de serkeftin bi dest xistiye, tê hezkirin. Bûyîna zilamê bi jinê re, tê wateya bûyîna bi welat, azadiyê û bi azadiya jiyanê re ye. Divê armanca we jî ev be. Heta ku hun zilam bînin vê xalê, hunê li hemberî wî şerekî watedar bimeşînin û hunê wî bikin mirov. Ev maf û erka we ye. Wasiyeteke din a Zîlanê ev e. Ez bawer nakim ku ew weke jineke kole, xwe pêşkeşî zilam bike. Berovajî Zîlan bi çalakiya xwe ya mezin ve, xwesteka xwe ya jiyana mezin îlan kir. Ev jî ji bo we tê vê wateyê: Heta ku nasnameyên li gor vîna azad, raveya jiyana mezin derbikeve holê, bi hostetî û çalakiyên mezin ve ji şer re berdewam! Ez jî him berdevkekî vê yê baş im, him jî xebatkarek im. Dibe ku xeletî û qisûrên me hebin, lê belê ger hun her tiştî li ser bingehê karkeriyeke wiha bi dest bigrin, dê kesayeta we teşe bigre, teşegirtina jinekê weke çavkaniyeke herî bihêz a jiyanê ava bibe. Li ser vî bingehî dê zilam jî ji nû ve were afirandin. Ji ber wê jiyan jî dê ji nû ve were rêxistinkirin. Emê wiha bigihên avakirina li gor rêxistinbûyîna me ya civakî, armanc û nirxên wê yên her cure binkeyên binesazî û jorsaziyê.

Dema ku em civaka xwe ava dikin ne gengaz e ku mirov ne bi heyecan be. Ev kar tenê kêfxweşiyê didin. Di vir de pirsgirêk kêfa me bi xwe nîne. Jixwe ger em civakê ji nû ve ava nekin em nikarin ev qasî kesayetan têr bikin. Di vê xalê de cudabûna me ji reel sosyalîzmê heye. Reel sosyalîzmê bi temamî kesayet ziwa kir, ew xiste rewşa talî, piştre jî kesayet ji bin mîrata wê bi rengekî gelekî xeter derkete rastê. Me li hemberî vê xeteriyê tevdîrên xwe girtin. Em ew kesayet in ku rizgariya civakî, ji nû ve avadike, li gel vê di nava hev de avakirina xwe jî bi aqilî dimeşînin.

Heta niha em bi bin neketin, serkeftinên me jî hene. Ger hun hemû bi şêwazê Zîlanê ji wê bangawaziyê re bi jiyana xwe ve, bi şerê xwe ve, ya

herî girîng bi bîrdoziyê ve, cihê ku pêwîst kir bi têrkirina siyasî, rêxistinî û rêveberiyê ve bibin bersiv, ji bo ev nebe meşeke mezin û ji bo bi hêviyeke mezin neyê bi serxistin tu sedem nînin. Dibe ku ev şehîdên me ji bo tiştên biçûk negihiştine miradên xwe. Bi gotina civakî ve "serê wan jî nehate girêdan." Baş bû ku serê wan nehate girêdan. Baş bû ku negihiştin miradên xwe. Gihiştina mirad bi meşa armanca mezin ve gengaz e. Em bi dijwarî wan dişopînin û bi nîşandana hewldanên xwe ve nîşan didin ku layiqê vê ne. Ger kesayet heta nefesa xwe ya dawiyê bi serkeftinên mezin ve dimeşe, tê wê wateyê ku gihiştiye miradê xwe. Di vê wateyê de ev hemû şehîdên me gihiştine miradên xwe. Ez jîndarkirina xwe ya wiha ve bi rengekî biryarî di riya rast de dimeşim. Piştî vê tişta ji bo me hewce, ji bo ku serkeftin ji aliyê tu hêzê ve û tu rêbazî ve ji dest me neyê derxistin, divê em bibin xwedî milên bihêz û girtinên bihêz. Riya vê jî ji perwerdeyeke saxlem û ji gavên wê yên pratîkê avêtinê derbas dibe. Jixwe derfetên vê hetanî dawiyê li pêş we hatine rêxistin. Ev derfetên ku we hetanî niha, ji ber sedemên cihêreng nekarîbûne binirxînin, êdî binirxînin. Ger hun weke ku careke din serkeftinê ji dest xwe nerevînin, an jî bigihên tempoya wê ya bilind bi heyecana wê bihesin û heta dawiyê bi îdîaya teqez rojekê serkeftinê bi dest bixin ve girêdayî bimeşin, ne kesek dikare serkeftina di dest we de bistîne, ne jî dê pirsgirêkeke we ya weke negihiştina serkeftinê ya ku di nêzîk de emê bi dest bixin hebe. Serkeftina di dest we de ya me ye. Qezencên wê misoger e. Ew serkeftina ku em bi dest bixin jî, bi meşa me ve gengaz e.

Di vê wateyê de me karî ji bo şervanên azadiya jinê em bibin bersiv. Bi şerê xwe yên berfireh, bi pêwendî çêkirina berfireh a bi we re, bi wêrekî jiyîna bi we re ji zayenda jinê re bi nêzîkbûna rasteqîntir, rêzdartir ve û balkêşkirina jinê ve, me karî bersivê bidine ketina mezin. Ez bawerim yekem xwesteka van şehîdan jî wiha bû. Ji bo vê nirx hate dayîn. Nasnameya jinê ya ku dihate lehnetkirin, her dem dihate kirêtkirin û nirx nedihate dayîn, em ji fîzîka wê bigrin heta hêza wê ya hizirandinê gavekê pêş de hate birin. Weke ku ji we re rêya rast hate nîşandan, gava we bi destpêkeke saxlem ve hate bibingehkirin.

Karên ku werin kirin gelek in, weke zayenda jinê hun di nava bêdadiyeke mezin de tên hiştin. Di vê wateyê de karê herî xwedî nirx azadî ye. Azadî karê şoreşê ye û ev jî hetanî dawiyê li pêşiya me hatiye danîn. Hemû zilam bisekinin jî divê hun bi xwe re biherikînin. Ji ber ku di rastiyê de ev kar we pêwendîdar dike. Zêdebûna qehremaniyê ya jinan jî meşa wêrekî ya jinê jî peyitandina vê ye. Lê belê ji bo vê tempo û kesayetên kûrbûyî pêwîst in. Tenê niyet û xwestek ne, bi qasî ku serkeftinê bi dest bixe hêz pêwîst dike. Hunê wê jî bi hewldanan bi dest bixin. Rêbertî li ser vî bingehî ji bo we alîkarekî mezin e. Ger hun wî rast fêm bikin, derbixine zanebûnê û parve bikin, bikine malê xwe, hunê şêwaz û tempo jî bi dest bixin.

Her tişt li ser vê bingehê xweşik dibe û ber bi serkeftinê ve diçe. Di vê riyê de dîtina serkeftinê çi qasî xwedî nirx be, di wê riyê de şehîdbûn jî ew qasî xwedî nirx e!

**6 Pûşber 1997**

## ZÎLAN HEVPEYMANEKE MEZIN E

Em rêhevala Zîlan di yekemîn salvegera çalakiya xwe ya pîroz a dîrokî de bi rêzdarî bîr tînin û careke din minetdariya xwe diyar dikin. Bêguman em vê weke çalakiyeke xwekujiyê ne, weke çalakiyeke berxwedaniyê ya mezin dinirxînin. Him di rastiya mirovahiyê, him jî ya gelan de mînakên ku dişibine vê hene jî, kesayeta Zeyneb Kinaci di rastiya gelê me de dibe raveya semboleke mezin a ku di PKK'ê de mînakên wê gelekî têne dîtin e. Wê bi xwe nameya ku ji me re nivîsî de wasiyetek kiriye, bi vê wesîleyê ez dixwazim tiştê ku dikeve ser milên min bikim. Gotiye "pêwîstiyên wasiyeta min herî baş hun dikarin fêm bikin û pêwîstiyên wê bi cih bînin." Bêguman vê me him bandor kiriye, him jî pêwîstiya li berpirsyariya xwe rast xwedî derkeketinê daniye holê. Me xwest ji bo gelekî bihizirin û ger gengaz be vê veguherînine jiyanê, awarte bibin. Bêguman hindek pêşketin hene, ev pêşketin zêdetir ji bo fêmkirina vê kesayetê bi xwe ye. Di heman demê de ji bo pratîkirina wê bi xwe û jiyanîkirina wê ye.

Him di nava partiyê de, him jî di rastiya me ya gel de, di rastiya ew şerê ku em berfireh bi dest digrin, taybetmendiyeke gelekî girîng a di nava xwe de wiha karakterîze bikin û ji bo ku bikaribin bikin taybetmendiyeke bingehîn a jiyana nû ya vê şoreşê û vî gelî, me gelek hewldan pêk anîn. Beriya her tiştî divê were zanîn ku çalakiya Zîlanê bersiveke li hemberî polîtîkayên dijmin ên sînoran nasnake û xwe bi tu rêpîvanê ve girêdayî hîsnake ye. Bi navê Kurd ê ku di dinyayê de herî zêde hatiye înkarkirin, di derbarê wê de zû de darezîneke bi rengê ku ji zû ve miriye û tune bûye hatiye avakirin, ji bo doza wê gelekî kêm pêwendî tê nîşandan dema hate nîşandan jî zêde weke gelekî ku bijî nayê xwestin were nirxandin, her çi qasî me berxwedaniyeke gelekî mezin derxistibe holê jî, raya giştî ya navnetewî ku bawer nake ev berxwedan zêde serkeftîbe heye. Heta tiştê ku li ser gelê Kurdistan'ê bi xwe tê ferzkirin, vê mirinê weke çarenûsekê tê bigihê, mijara gotinê ye. Şerê giştiyanî ya dijmin ku ji bo sala 1995'an gelekî berfireh pêk aniye û çi dibe bila bibe vê salê weke sala tunekirinê nirxandina wî, bi navê

azadiyê çi hebe wê jî bi vê salê re bi rengekî binaxkirina dîrokê bi şêweyekî gelekî xeter ve bi hêzeke mezin hatina ser tevgera me, jiyana me, şerefa me û rûmeta me, mijara gotinê ye. Ev di heman demê de tunekirineke namûs, rûmet, ger hêviya jiyanê hebe ya wê ye jî. Ev rojên ku yên ku şûnde dimînin ji jiyaneke bêşeref û bêrûmet nikarin tiştekî hêvî bikin vekirî derdikeve holê, bi gelekî tehrîkirina şovenîzmê dîsa weke dînan xwe xistina nava rêzên şoven a gelê Tirkiyê. Di bin navê "yekîtiya milî" de xwestekên gelekî, yên herî di jêr de jî ji pêş çavan re derbas nekirin, her diçe vediguhere hêrseke mezin. Hêmanên ku wê ji serî de ji bo ew bi xwe hindekî bi azadî bijî balê lê dikişîne, şiyarbûna wê, kesayeta wê kêm zêde têgihiştina wê ya azadiyê tê çi wateyê. Li gel vê hemû aliyan ve niyetên dijmin nirxandina wê piştgiriya dinya emperyalîst li pişt dijminê ku pêk tîne û tu sînoran nas nake, ji aliyê wê ve hêmanên ku heta dawiyê dihatin fêmkirin bû. Çawa hatiye, bi çi armancê hatiye û dixwaze bigihê kîjan armancê, baş tîne ber çavan. Li gel vê rexmî ku demeke kurt berî vê tevlî PKK'ê bûye jî gelekî baş dizane ku PKK tê çi wateyê. Bi qasî ku bikaribe pênaseya ya dîroka PKK'ê bike, hêzekê û xwedî hêzbûnê dijî. Li gel vê dikare kesayeta me jî gelekî baş binirxîne. Li gor asta çanda xwe em çi wateyê rave dikin, him di nava mirovahiyê û him jî di nava dîroka me de em dixwazin Rêbertiyeke çawa bi pêş bixin, lêkolîn kiriye heta di nava refên me yên partiyê de pênaseyeke herî xweşik, herî rasteqîn karîbûye bike.

Vê hevalê em nedîtine û di tekoşînê de jî zêde rabirduyeke xwe nîne. Rexmî vê nirxandina wê ya me ya bihêz, min hetanî dawiyê watedar dît. Divê ez nêzîkbûneke şehîd Ronahî ya ku dişibe vê li ser zêde bikim. Divê ez diyar bikim ku hevalên şehîd ên bi vî rengî dîsa şehîd Bermal jî di heman astê de di nava kûrbûneke wateyê de ne. Bêguman kûrbûna têgihiştinê ya di gelek şehîdên me de van şehadetên mezin pêk tînin. Lê belê di Zîlanê de ev yek gelekî bi zanistî ye û heta dawiyê nêzîkî asta bi biryariyê ye.

Di vir de ez dikarim van hêmanan zêde bi kûranî bi dest bigrim. Hêmanê herî bingehîn a ku divê were zanîn him di mijara rastiya gelê Kurdistan'ê de, him jî di derbarê rewşa mirovahiya navnetewî de di derbarê partiya me û

qada me ya Rêbertiyê de, zanyariya herî berfireh û bi biryariya ku xwe dispêre vê bi dest xistiye. Bi vê ve jî xwe têr nabîne, rêhevaleke ku gelekî di ferqa jiyana rêxistinê de ye. Dikare rastiya jinê bi hemû aliyên xwe ve binirxîne. Heta dawiyê ew ferqa mezin a di navbera şêwaza jiyana ku kole dike û şêwaza jiyana ku azad dike bi dest dixe. Ez ji vê re jî rêzeke mezin raber dikim û ez wisa bawerim ku ev di gelekî kêm kesan de pêk tê. Vî tiştî him bi rengekî dilnizm û him jî gelekî bi biryar bi destxistina wê, bi rengekî gelekî nirxdar, kurt û cewherî vegotina wê gelekî ez bandor kirim. Gelekî kurt be jî ji aliyê zelalkirina van mijaran ve ez hewce dibînim ku hindek nirxandinên wê bi xwe bigrim dest. Hêmanê balkêş ên ku di mijara Rêbertiyê de gotine hene. Wisa diyar dike “dema ku mirov li dîroka her gelekî temaşe dike, bi taybet di pêvajoyên şoreşan de rêbertiyên ku tekoşînê didin, ber bi serkeftinê û rizgariyê ve dibin, mohra xwe li pêvajoyên ku tê de dijîn didin. Him dîrok piştrast dike ku tu tevgerên netewî û çînî bêrêbertî di wateya rastî de jî neçûne serkeftinê. Rêber yekî ku ew nûbûn û pêşketinên ku tê xwestin werin jiyîn, di asta herî jor de temsîl dike, ango li gor hizirandina mirovê nû, civaka nû hemû jiyana xwe li gor jiyana gelekî sererast dike, çarenûsa xwe di çarenûsa gel de dibîne û êşên wî gelî, hest û daxwazên gel ji herî kûrahiyê de dijî û ji bo rizgariyê erkên pratîkî di asta herî jor de dide ser milên xwe ye.”

Ez bawer nakim ku pênaseyeke rêbertiyê ya wiha, akademîsyenekî navdar an jî milîtanek bikaribe bike. Di vê benda kurt de jî pênaseyeke rêbertiyê ya rast bi hemû aliyan ve daniye holê. Di vir de misoger e ku asteke zanebûnê ya gelekî bihêz hatiye bidestxistin. Niha dema ku vê çalakiyê dihizire di hêzeke nêzîkbûnê ya çawa de ye mirov bizanibe û binirxîne gelekî girîng e. Hindek hene gelekî hestyar e, di nava êşan de dê xwe biteqînin, bişewitînin. Lê belê hindek jî hene ku vê bi kûrahiyeke zanebûnê ya gelekî mezin ve dikin. Li gor min ev ferq gelekî balkêş e.

Berdewam dike “li hemberî rastiyeke gel a ku rastiya xwe ya jiyanî nîne, di her qadê de hatiye tunekirin, bi qasî ku bi tu gelî ve nayê qiyaskirin li xwe hatiye biyanîkirin, nirxên xwe yên netewî, çandî, civakî û siyasî hatiye

dagirkirin de bêguman Rêbertiya PKK'ê neçare gelekî cuda be. Di vê wateyê de Rêbertiya partiyê bi gelek aliyên xwe ve, di rewşeke taybetir, nûtir bi jiyana xwe ya pêşketîtir dide jiyîn û jiyana xwe weke ku fedayî jiyana mirovahiyeke gelekî mezin kiriye ye. Diyarkerî û girîngiya wê di vê xalê de misoger û bênîqaş e."

Dîsa di vir de kûrbûnêke zanebûnê ya mezin heye. Rastiya gelê me bi rastiya gelên hemû cîhanê ve qiyas dike, asta wê ya xerîbkirinê di her qadê de –netewî, çandî, civakî û siyasî- ji tunekirinê wêdetir hatiye rewşekê ku nayê naskirin, ferq dike ku jiyana wê ji mirina wê xirabtir e. Bi vê ferqê ve dixwaze Rêbertiyê binirxîne, yan jî em bi rastiyeke bi çi rengî ve rûbirû ne, bi şêweyeke balkêş dikare deyne holê. Bi heman rengî diyar dike ku ev bi feraseteke Rêbertiyê ya herî kîjan be ya dûz ve nayê çareserkirin. Rastiya gelekî wiha nikare bigihê asta şoreşa ku gihiştiye van rojan. Ji bo ku ev were serxistin divê ku gelekî taybet be, divê jiyana xwe veguherîne heta jiyana gelekî vediguherîne ku ev bi rastî jî feraseteke gelekî kûr e. Dibêje "diyarkerî û girîngiya wî di vê xalê de misoger û bênîqaş e." Ev dibe vegotineke balkêş a ku heta dawiyê me bandor dike.

Dîsa ez di berdewamkirinê de astengiyekê nabînim, "dema ku em li dîroka şoreşên cîhanê temaşe dikin, ew gelên ku him tekoşîna netewî him jî tekoşîna rizgariya çînî dane, zemînek û hêzeke dîrokî, civakî, siyasî û çandî ku derfetên pêkhatina şoreşê afirandine hene. Înkara netewî nîne. Pirsgirêkên kesayetê bi qasî li gel me kûr nînin. Dîroka wan bi qasî ya me nehatiye tevlîhevkirin. Zayenda jinê ev qasî nehatiye dagirkirin. Rastiyên olî bi qasî gel me misoger bi şêwazekî xirab nehatiye bi dest girtin. Bertekên wan gelan ji rewşa xwe ya heyî re heye. Di astên xwe yên azadî û wekheviyê de pêşketineke wan heye. Kêm zêde rewşenbîrên wan ên ku rêbertiya wan jê hêzê digre hene. Di şoreşa Kurdistan'ê de jî ev hêmanên ku hatine diyarkirin hemû di rewşeke tunebûnê de bûn."

Di vir de jî nirxandinên xwe yên bi rengê tezan ku gelekî balkêş in û divê her rewşenbîrek li ser bihizire û encaman jê bigre hene. Bila yek her rêzekê bi rengekî tez bi dest bigre, wê fêm bike ku bi rastî jî her bendek pirtûkek e.

Heta dawiyê xwedî hizirandineke zelal e û rastî jî bi dest xistiye. Di vê xalê de ez ji bo rewşenbîrên Kurd xembar dibim. Ev kesayet kopyayeke me nîne. Şagirteke ku zanîngeh qedandiye. Kesayeteke rewşenbîr a ku bi kesayeta xwe lêkolîn kiriye, lêgerîn kiriye û gihiştiye encaman. Mixabin mijûlbûna rewşenbîrên Kurd an jî di giştî de jî gelek kadroyên me ku bi tenê aliyê hestyariyê ji bo me gelekî kêm tê. Di holê de tezên ku werin kûrkirin û bi encamkirin hene.

Hemû gel dema ku dest bi şoreşê kirin, li pişt wan dîrokeke mezin hebû. Zemîneke civakî, çînî û çandî û hêza wê heye. Înkara netewî ew qasî nebû, pirsgirêkên kesayetê bi qasî gel me mijara gotinê nebû. Lê belê ji bo me, ji bo dîroka me ev hemû hatine berovajîkirin. Weke din zayenda jinê bi serê xwe rewşeke sîxuriyeke herî xeter dijî. Herî rast, anîne wê rewşê. Jin tam veguhertine xefikekê, birine rewşekê ku her tiştekî dadiqurtîne, li dora wê hemû darezînên nirxan hatiye berovajîkirin. Ol jî wiha ye. Di vir de tu girêdaniya ol bi rastiya netewî û civakî re nemaye. Berovajî wê dixwe, wê ji her cureyê taybetmendiyên wê yên erênî qut dike û dikare bîne asteke herî nezaniyê.

Di nava tu gelî de ev hêmanên ku em behs dikin, ev qasî pêş neketine. Dibêje, "dema em li astên gelên din temaşe dikin, bertekên wan hene, di astên wan ên azadî û wekheviyê de pêşketinek heye, gelek rewşenbirên wan ku serokatiya wan jê hêzê digre bertekên civakê hene." Diyar dike ku ev hemû ji bo Kurdistan'ê qet ne mijara gotinê ye. Wisa ye ku ev yek rast e. Rewşenbîrên me hela hindek kesayetên ku xwe sosyalîst, demokrat an jî berxwedêr dihesibînin, tika dikim bila xwe û van nivîsan qiyas bikin. Gelo kîjan hîn nêzikî rastiyê ye? Hindekî bila wijdanên xwe deynin rastê, muhasebeya xwe ya wijdan bikin. Gelo hizirandinên herî rast, ma ne ev in? Ev hizirandinên rast û mezin in. Wisa ye ku gelo ev rê li ber berxwedana mezin venake? Ger wijdan û dilê netewî hebe, misoger ev rewşenbîrên me heta qaşo gelek rêxistin, partiyê şoreşger û pêşverû divê bizanibin hindekî rêzê ji vê re bigrin.

Em ji bîr nekin ku gelek ji şoreşgerekî dikarin gelek tiştan hîn bibin. Di dinyayê de gelek kêm şoreşên rizgariya netewî û rêberên wan ku nexwendine hene. Lê belê ev jî kesayetek e. Ez xemgînim ku ev ew qasî xerîb bûne –Zîlan bi xwe jî tîne ziman- ango ku bi qasî jinek û keçeke Kurd xwe gihandiye asta sembolekê ku di dîroka dinyayê de nehatiye dîtin jî nikarin fêm bikin. Dilê wan xerîb bûye û di rewşekê de ne ku nikarin di derbarê wê de biaxivin. Di rastiyê de divê ez diyar bikim ku ev bi serê xwe bûyerek e. Ji ber ku ew rewşenbîrên Kurd qaşo hestyar in, bi qasî ku em ji dîroka dijmin bigrin, heta dîroka gelê Efrîqî jî gelekî baş vedibêjin, ji bo wê helbestan jî dinivisînin, ji bo keçeke Kurd a ku di dîroka mirovahiyê de weke wê kêm tên dîtin nikarin dilê xwe bixebitînin, nikarin tiştekî bibêjin û binivisînin. Ev nexweşiyeke derbas nabe, asteke ketîbûnê û xerîbûnê ye. Ji mirovên wiha zêde xêr nayê. Ez berdewam dikim, ji nameya hevala Zîlan bixwînim.

“Rêbertiya partiyê ji rastiyeke gelekî lewaz derkete rê. Nêzîkbûna wî ya pirsgirêka ol, pirsgirêka kesayet, pirsgirêka jin û malbatê gelekî taybet û zanistî ye. Serokê şoreşa Rusyayê Lenîn jî di çareseriya pirsgirêka jin de gelekî seranser maye. Artêşbûna jinê, konferansên jinê yên pêk tên û kongreya jinê di dîroka şoreşa dinyayê de cara yekem li gel me hatiye pêkanîn. Şêwaza jiyana Rêbertiyê fedakarî, wêrekî, kûrbûn, şiyarî, zeka, hêza wî ya pêşbîniyê û şîrovekirinê, asta wî ya girêdaniyê, zanistî, ezmûn û zanebûnê di asteke ku mirov nikare bi tu rêbertiyan ve qiyas bike ye. Şêwazê wî ye bi dest girtina bûyerê ne dogmatîk e. Rêbertiya partiyê, rastiya Kurdistan’ê, şoreşa dinyayê gelekî baş dahûrandiye, encam derxistiye û taybetbûna şoreşa Kurdistan’ê derxistiye rastê. Bi şêwazeke teqlît, bi qalib û dogmatîk ne, bi şêwazeke gelekî afirandêr ve bi dest girtiye. Sosyalîzma pêkhatî gelekî baş tehlîl kiriye, bi şêwazeke li gor rastiya gelê xwe lê aniye. PKK’ê di şexsê Rêbertiya partiyê de raveya xwe dîtiye.”

Em li vir jî beramberî tezên hetanî dawiyê balkêş û gelekî ronakar in. Gelek dahûrînên me yên di derbarê ol, kesayet, jin, malbat û li gel vê asta civakî û derûnî ya di Kurdistan’ê de me bi pêş xistiye hene. Kesayeta Zîlan

dibe rêhevaleke ku van kêm zêde dinirxîne. Weke din bi şoreşa mezin a Rûs ve dipîve, diyar dike ku Lenîn jî di pirsgirêka jinê de di rewşeke seranser de dimîne. Dixwaze bîne ziman ku ji bo jinê xebatên taybet nehatine kirin û bi tenê di asta kesayetan de bi hindek jinan re pêwendî tê danîn. Ev rast e. Ev erkên ku xwe neçar hîs dikin ji bo bîranîna şehîdên me yên jin ên bi vî rengî ne.

Li gel vê şêwazê jiyana Rêbertiyê gelekî balkêş dinirxîne. Di rastiyê de di serî de milîtanên me yên partiyê gelek beşên pêwendîdar ger behsa girêdaniyeke her yek nirxên pîroz dikin, ger gelê me û dostên me dixwazin hindekî fêm bikin, di asta fêmkirina van rêzên balkêş û gengaz ve derxistina zanebûnê de bi bersiva ku didin ve, divê tiştên ku ji wan tên hêvîkirin nîşan bidin. Hevala me ya Zîlan ev gelekî baş fêm kiriye. Tenê fêm nekiriye bi bersiveke gelekî ji dil gelekî bi feraset û gelekî bi wêrekî ve, ji bo rastiya Rêbertiyê bûyîna bersivê weke erkekê qebûl dike. Bilindiya herî mezin ez di vir de dibînim. Van hevokên wiha, peyvên wiha her kes dikare bibêje, lê belê hevaleke bi qasî vê fêm dike, gelekî balkêş derbasî pratîkê dike û şênber dike dîtin, ji bo min zehmet e. Di dahûrandinên dawiyê de hêmaneke herî zêde ez li ser disekinim, di navbera asta fêmkirinê û rastiyê de ji bo çi ew qasî berovajîbûn û qutbûn çêdibe ye. Mirov bi gotinên û peyvên ku rast dizanin wiha diaxivin. Lê belê gelo pratîkên wan ji bo çi ev qasî berovajî ne? Ez bawerim ev rastiyeke serdema me ye. Mirovahî derewîniyê dijî. Hele di rastiya gelê me de her tişt ji dinya derewan ava dibe. Her kes soz dide, her kes gelek sondan dixwe, her kes gotinên ku bi rewşên xwe yên rojane ve sedîsed di nakokiyê de ye dibêje, lê belê gelek kêm mirovên ku van gotinan derbasî pratîkê dikin hene.

## Zîlan zagona hezkirinê ye, nirxeke herî cidî fêm dike û dijî ye

Rexmî ku gundê Elmali ya Meletiyê qadeke ku bişaftin herî berfireh tê meşandin jî, ez nirxekek mezin didim vê gavavêtina kesayeta Zîlan. Ez dibînim ku di Meletiyê de ev kevneşop di vejînê de wateyekê rave dike. Di

qadên din de jî gavavêtinên ku dişibin vê –taybetî di jinan de- balkêş bi pêş dikevin. Ev me gelekî dike xwedî hêzê. Meletî qadeke ku dijmin û şerê taybet li ser herî zêde kûr dibe û dixwaze her cure encaman jê bigre, qadeke ku herî zêde xerîbûn jî tê jiyîn, nasname û kesayeta netewî û çînî hatiye wendakirin e. Rexmî vê pêkhatina derketineke wiha mezin pêwîst dike ku yek jî ji vî alî ve bi girîngî li ser were sekinandin. Ez rêzeke mezin didime ji Meletîbûna ya di vê wateyê de. Derbaskirina vê ya jiyanê heyecaneke mezin dide min. Dibe ku em ne layiqê nirxandineke wiha ya Rêbertiyê bin jî, misogere ku em dixwazin wisa bibin. Jineke wiha nêzîkbûna jineke azad a wiha hedê me derbas bike jî, herî kêm ji aliyê teşwiqkirina vî tiştî ve girîng e. Em çi qasî wiha nebin jî emê kar bikin ku wiha bin. Weke pêwistiyeke wasiyetê jî emê hewldaneke mezin bidin.

Di vir de ya mijara gotinê ne ez im. A mijara gotinê kesayeteke wiha dikare pênaseyeke wiha bike û ev pênase jî ji bo me hemûyan derbasdar e. Rêbertî li gel me weke kesayeteke ku nav û nîşana wî, eşîret û qebîleya wî heye nayê nirxandin. Jixwe pênase jî wiha ye. Wê demê di mijara rêbertiyê de her kesekî ku bi îdîaye, ger rêzek, şiyariyek û cidiyeteke xwe hebe, hêza xwe ya fêmkirinê û pratîkê ve yekgirtinê hebe, divê bi rêzgirtina kesayeta Zîlan ve di xwe de bersivekê bide vê û nîşan bide. Ez jî yê ku vê nîşan nade re nabêjim mirov, hela qet nabêjim zilam. Piştî ku ji bo min ev mînak hebe, pîvan, fêmkirin û pratîk kirin misoger e. Çi esas e, çi ne esas e, çi her tişt e, çi ne her tişt e, ev hemû gelekî zelal in. Ji ber vê jî ji bo min xwedî wateyeke fermanî ye. Ez hêvîdarim ji bo hemû kesayetên ku li ser vê bingehê îdîayeke weke vê heye, ev dê wiha were fêmkirin û her kes vê li gor hêza xwe bigihîne raveya jiyanî û bigihîne pratîtekê bi xwe. Derveyî vê tu tişt nabe layiqê vê nirxandinê.

Ez berdewam dikim, li vir nirxandinên di derbarê keda me de dike. “Ev pêşketina ku di dîroka Kurdistan’ê de pêk hatiye, keda wî ye, pêşketina wî ye. Ew bi xwe çavkaniya hezkirin, yekgirtin û hevgirtinê ye. Di şexsê xwe de kesayeta mirovê nû ava kiriye. Peyitandiye ku mirov çi qasî dikare bi pêş bikeve. Asta îro ya tekoşîna rizgariya netewî ya Kurdistan’ê li gor şîara “bi

partiyî bin, bi artêş bin, bi enî bin serkeftinê bi dest bixin" hemû pirsgirêkên talî li aliyekî dihêle. Bi hemû gelên Kurd re li ser bingehê rast nêzîkbûna rastiya dijmin e. Di xala ku em hatinê de dema li gel hemû gelê Kurd bi milyonan mirov xistiye bin xizmeta şoreşa rizgariya netewî ya ku bi germahiya xwe hembêz dike û sosyalîzm e. Komara Tirkiyê ya faşîst ji aliyê leşkerî, siyasî, çandî, aborî û di her mijarê de şûn de xistiye û neçar hiştiye."

Di vir de teşhîseke rast a rastiya kedê jî heye. Datîne holê ku kesayeteke bi kedê hatiye afirandin di me de bi taybetî dibe çavkaniyeke hezkirinê ya çawa, çawa digihên hev û hevgirtinê saz dike. Li ser vê bingehê dîsa tîne ziman ku emê bikaribin bibin mirovekî nû. Hevokeke wê ya herî girîng ev e: "peyitandiye ku mirovek dikare çi qasî pêş bikeve." Gelo vê yekê ji bo çi dibêje? Di nava civakeke weke me gelekî paşketî, gelekî hêjar, ji destan tu tiştek nayê û ketiye rewşeke mirovên neçar de peyitandina mirovek dikare çi qasî bi pêş bikeve, bûyereke mezin e. Zîlan vê jî gelekî baş dibîne. Ev nirxandin nirxandineke ku her kes bi hêsanî bike jî nîne. Nirxandineke gelekî mezin e.

Di vî welatî de hezkirin hatiye qetilkirin. Kesayetekî bi navê yekirin û hevgirtinê derneketiyê holê. Di bin navê hezkirinê de hev xwarin û teqez hev tunekirin heye. Ev bi şêwazeke her tiştekî belavkirinê û ji hevgirtinê dûrxistinê tê bi destgirtin. Ev ne girîng e ka ev bi niyeta xirab e yan na? Kesayet bi xwe jî weke diriyekê ne, kesayetên heyî ji ber ku bi temamî ezezên bêsînor in, ne di kûrbûna armanc û dilekî ku bikaribin yekîtî û hevgirtinê pêk bînin, bêgiyan hatine hiştin û hatine fetisandin. Nirxandina vê ya Zîlanê gelekî girîng e. Ji ber ku mirovek bêhezkirin nabe. Yekî ku di armancê de kûr nebûye, ji ber wê jî hêza xwe ya hevgirtin û yekîtiyê nebe, tiştekî wî yê ku zêde bide gelekî nabe. Dema pêwîst kir, mirovek li gor pêdîviya gelekî, pêşketinê nîşan bide gelekî girîng e. Ez divê diyar bikim ku min ev beşekî pêk aniye. Di vê wateyê de ez dixwazim bilind bim hetanî qada xwedayan jî. Di vir de ya girîng bi destxistina ast û çalakiya xwe ve xwestiye hindekî piştgiriyê bide vê. Li gor min nirxandin û çalakiya ku ji ya min mezintire jî ev e.

Ez berdewam dikim, dibêje “pêvajoya nû ya ku em rojên pêş a serkeftinê dijîn de, divê em ku hêviya rizgariya gel in, bi rengekî layiqê jiyan, hizirandin û tekoşîna Rêbertiya me partiyê hemû erkên xwe yên pêvajoyê bi rengekî herî baş bînin cih.” Di vir de tîne ziman divê milîtanek çawa nêzîkî erkên xwe bibe. Berdewam dike, “ew ferasetên bûrjûvaziya biçûk, gundî û feodal ku xwe dubare dikin û di kesayetên me de bi cih bûne, teşekirina dijmin bandorên şerê taybet û bi xwespartina rastiyên ku dişibin van ve rexnedayînên cihêreng zelal bûye ku me bi pêş de nabe. Ez bawer dikim ku rexnedayîna herî baş ji pratîkê derbas dibe.”

Ev jî nirxandineke gelekî balkêş e. Her diçe dibe fêrbûnek. Bi taybet ev di binkeya partiya me de heye. Gelek taybetmendiyên çînî yên kesayetan xwedî karakterekî feodaliya herî paşketî, gundî û bûrjûvaziya biçûk a ku nayê îflehkirin e. Weke raveyeke wê her dem dubare dikin. Lê belê ber bi pratîkirina vê li ser vî bingehî veguhertina jiyanê ve naçin. Di vê mijarê de durûtiyeke mezin heye û rêhevala me ya xwedî nirx Zîlan serî li vê hildide. Di rastiyê de ji vê re dibêje, “bes e.” Wisa fermanê dide, “rexnedayînên erzan nede.” Di hevokên wê bi xwe de ev yek heye. Dibêje “ez bawer dikim ku rexnedayîna herî baş, ji pratîkeke rast derbas dibe.” Ev çalakî di heman demê de çalakiyeke rexnedayîna herî mezin e. Cewherê ku ev gotin rave dikin, derbeyeke herî mezin li her cureyê kêmasiyan e.

Bi taybetî ger partiyî dibêjin girêdaniya xwe hene û bi rastî jî rêza wan hebe, li şûna ku van gotinan gelekî dubare dikin, bi kêmanî di jiyana xwe de ji bo kesayeta ku bi çalakiyeke ev qasî mezin ve bersiva mezin daye vê, divê bersiveke ku dişibe wê bikaribin bidin. Li vir kesek nabêje herin çalakiya xwekujiyê pêk bînin. Ji ber ku ev sembol e, ya herî mezin e. Tişta divê were kirin, van taybetmendiyan di jiyana xwe de û di şerê xwe de kêlî bi kêlî di her qada şer û di her pirsgirêkên wê de bi serkeftî pêk anîn e. Jixwe em sembolbûn û fermanîbûna wê wiha dinirxînin. Em gavavêtina rast a Zîlanê ji kesayeta fermandareke rast û xwedawendekê wiha dinirxînin. Naxwe tu tişt nikare xwe ji durûbûnê rizgar bike. Dibêje ku teqez bi rastfêmkirina vê ve encax dê partiyîbûn çêbibe. Ya ku ez weke şiyariyekê dibînim “dijmin

giştiyane bi ser me de tê, divê em jî bi hemû hêza xwe ve bi ser dijmin de biçin, divê em bi dijmin bidin hîskirin ku emê bedelê azadiyê bi biryarî bidin.” Ev nirxandineke gelekî balkêş e. Bi rastî jî dijmin bi hemû hêza xwe ve bi ser me de tê û dixwaze tune bike. Em vê hîs bikin, em ji azadiya xwe çi tiştê me heye her tişt ji dest diçe. Ji bo em pêşî li vê bigrin, divê em tiştên herî bi biryar bikin. Tişta ku rêhevala Zîlan kiriye, çalakiyeke mezin e. Ji dijmin re dibêje, “bes e, ev qasî bi ser me de neyê! Temam tu bi hêzî, li pişt te hêzên diyar hene, lê belê ya me jî mirovahiya me ya mezin heye, ger pêwîst bike ezê di kesayeta jinekê de jî vê mirovahiya mezin di te de wiha biteqînim û vê bi te bidim hîskirin” û dide hîskirin. Misogere ku çalakiya wê çalakiyeke mezin a dihejîne ye. Mirovahî jî vê wiha hîs dike û vê zêdetir dayîna hîskirin jî dikeve ser milên me. Yê ku dibêje ez bi rastî girêdayî me, girêdaniyeke min a rêhevaltiyê heye, bêyî ku vir de wir de bibe, vê bîne asta taybetmendiyeke karekter û bersivdayîn fermanî ye. Têkîliyeke vê bi ferzkirinê ve nîne. Ev çalakî xwedî nirxeke sembolî ye. Kesayeta Zîlan kesayeta xwedawend e. Mirov bi rêz û pîrozî nêzîkî vê çalakiyê dibe. Mirov weke ku li ber bigere û heta weke ku xwe bide efûkirin, niyaz bike, li gor vê nirxê xwedî moral û kesayeta xwe guncaw bike û bi vî rengî dê xwe bide efûkirin. Encama herî girîng divê were derxistin jî ev e.

Berdewam dike, dibêje “dema em li dîroka tekoşînê temaşe dikin, PKK bi qehremanî, berxwedan, ked, bi biryarî û baweriya mezin a ku sînorên aqil di fêmkirinê de zehmetî dikişîne ve hatiye afirandin. Berxwedan bûye karakterê bingehîn a PKK’ê.” Di vir de dîsa pênaseyeke PKK’ê dike. Dibêje “qehremantiya ku dîroka mirovahiyê yan jî sînorên aqil di fêmkirinê de zehmetiyê dikişîne.” Berxwedan, ked, bi biryarî, bawerî. Bi van ve di vir de taybetmendiyên PKK’ê yên karekterîstîk rêz dike. Ev nirxandin rast e. Dema ku bi milîtaniya rast a PKK’ê ve gihande hev, datîne holê ku divê her milîtanek dê PKK’yîbûneke çawa bi dest bixe. Ger yekî ku bi feraseteke berpirsyariyê ve dibêje, ez partiyîbûme yan jî partiyî me, divê bizanibe partiyîbûn bi tenê weke ku bi van hevokan tê ravekirin dê were jiyanîkirin jî. Rêheval Zîlan jî vî tiştî bi rengekî gelekî balkêş dipeyitîne. Ev feraseta wê û

giyana wê we tengav bike jî, rêzkirina rastiyan ji devê wê ez weke erkekê dizanim.

Berdewam dike, “divê em xwedî li vê mîrasa dîrokî derbikevin û pêwîstiyên pêvajoyê bi cih bînin. Pêvajoya çalakiyên xwekujiyê pêwîst dike, evê him bibe gavavêtineke taktîkî him jî dê bibe çalakiyeke ku ji aliyê me ve bandora xwe ya mezin a moralê. Ev pêvajoya ku dijmin li hemberî Rêbertiya me hewldaneke sûîkastê pêk aniye û dixwaze encamê bigre, bersiva herî baş ku ji dijmin re were dayîn dê çalakiyeke wiha be. Çalakiyeke bi vî rengî tê wateya dijminê ku ji aliyê moral ve rûxiyaye, dîn bike, her qadeke ku dijmin tê de ye dorpêç bike û welat li wî bike zîndan. Ji aliyê me ve jî tê wateya moraldayîna di serî de gelê me û hemû hêzên me yên şer, bihêzkirina wêrekî û berxwedanê careke din peyam dayîna dost û dijmin her kesî ku em di doza xwe de çi qasî xwedî biryar in û di vê riyê de emê bedelê azadiyê di xwe de bombeyan biteqînin û pêk bînin. Xwesteka gelê me ya azadiyê li hemû dinyayê ragihînin û ji bo ku pêvajoya pêş gelê me berxwedanên di vî alî de pêş bixe rêbertî kirin û di her cihî de lezbûnekî bi şer bidin qezenckirin.”

Di vir de feraseta erkê datîne holê. Careke din tîne ziman ku ji dijminê ku bi şêwazê îmhakirinê tê ser me re gotina “bisekine” di kesayetekê de çawa divê veguhere çalakiyê. Her çi qasî ji vê re dibêje çalakiya xwekujiyê jî ev dibe çalakiyeke mezin a berxwedanê û vejînê. Datîne holê ku dema bi hemû hêzên dinyayê re were ser mirov kesayeteke binamûs a gelekî, di xwe de dikare çalakiyeke çawa pêk bîne. Di PKK’ê de çalakiyên wiha gelek in. Ji roja destpêkê heta roja me ev weke taybetmendiya Kurd ne, weke taybetmendiyeke mirovahiyê pêş ketiye. Milîtaniyeke Heqî Karer misoger milîtaniyeke bi vê şêwazê ye. Em tevgereke ku hema her roj qehremaniyên xwe yên wiha hene ne. Di nava van qehremaniyan de yek stêrkên ku herî diçûrise jî Zîlan e. Ew him nirxê mezin a moral a hemûyan e, him jî dibe zanebûna wê ya ku gelekî ronahî dike. Di vir de ne gengaz e ku mirov mezin bandor nebe. Bêguman mirovahiyê bandor dike û misoger dijmin jî bandor kiriye. Encamê çalakiya wê dijmin jî mirovahî û gelê me jî fêm dike.

Bangawazî dike rengekî dilnizm datîne holê ku kesayeta milîtan di pêvajoyên herî zehmet de jî dikare qadirê çi tiştan bibe. Kesayeteke divê mirov rêzeke mezin nîşanî bide, xwe careke din wiha li me ferz dike.

Li vir dîsa xitabî me dike "Rêberê min, ez xwe ji bo pêkanîna çalakiya xwekujiyê endam dibînim. Em beramberî ked û hewldanên we yên qet xelas nabin canê xwe jî bidin têr nake. Xwezî ji derveyî canê me ku em bidin hebûya! We bi jiyana xwe ve ji nû ve gelek afirand. Em eserên we ne. Hun ewlehiya dahatûya hemû gelê Kurd û mirovahiya cîhanê ne. Jiyana we hezkirin, wêrekî, bawerî û rûmetê dide me. Hemû gelê Kurdistan'ê û bi milyonan mirov bi we ve bi mirinî girêdayî ne. Ev balkêşbûna we me jî gelekî bandor dike. Di kêliyên ku em herî zêde tengav dibin de em hezkirina we ya ji me re dihizirin û hêza manewî digrin. Ê ku herî zêde girêdayî şehîdan in hun in. Li ser vê bingehê misogere ku çavên me li pişt me namînin. Ez vê çalakiyê weke erkeke ku pêwîste pêk bînim dibînim û xwe berpirsyar hîs dikim. Ez wisa bawer dikim ku riya derbaskirina paşverûtiyên min ê heyî azadîbûn û xwepêkanîna min ji şer derbas dibe û pêwîst dike ku pêwîstiyên vî şerî werin bicihanîn. Ez dixwazim xwedî li berxwedana rêhevalên Mazlûm, Xeyrî, Kemal, Ferhat, Besê, Bêrîtan, Bêrîvan û Ronahî derbikevim û bibim şopgerê wan. Ez dixwazim bibim raveya xwesteka azadiyê ya gelê xwe. Ez dixwazim li hemberî polîtîkayên emperyalîzmê ku kole dike, bi teqandina bombeyê ya di xwe de mezinbûna rik û hêrsa xwe nîşan bidim û bibim sembola vejîna jina Kurd."

Em li vir bi nirxandineke hetanî dawiyê girîng a ku her hevokeke wê heta her peyveke wê di asta tezekê de were bidestgirtin ve rûbirû ne. Bêguman me jî hindekî xwe fedayî mirovahiyê gelê me û rêhevalan kir. Lê belê bi rastî jî ev bi qasî vê hevokê de ye nîne. "xwezî ji canê me zêdetir tiştên me hebûya me bidaba!" Ev xwe bêsînor fedakirin e û misogere ku ji min hîn bilindtir e. Em nikarin ji bo ev qasî wêrekiyê bikin. Ev nêzîkbûneke herî zêde dihejîne, hîn her dem di hizrê xwe de û dilê xwe de digrim e. Ez hindek tiştan dikim lê belê ez tiştên ku dikim ev qasî pîroz nabînim û weke karên ku divê milîtanek bike dihesibînim. Lê belê hizirandina mirovekî ku tiştekî

ji canê wê hîn zêdetir dibe tiştên din hebin bide, tenê hebûna wê canê xwe yê di dest de ye. Bi rengekî ku wiha gelekî zehmet e û gelekî kêm mirov dikarin biceribînin dayîna wê, li jorî hêza me ya nirxandinê ye.

Xwezî şêwazeke me ya xebatê ya din hindekî din jî ji bo vê rêzdar be, wate bide, hêzê bide hebûya yan jî xwezî hindekî din afirandêriya şoreşgeriya min hebûya ku min bikaribaya kesayetekê wiha, pîroz bikira û jîndar bikira! Ez di nava metirsî û hewldana vê de me. Ez weke her demê careke din soza xwe didim. Em bi jiyana xwe kar dikin ku gelekî biafirînin. Dîsa Zîlan bibêje jî “em eserên we ne” ez nikarim bibêjim ez ew qasî me. Lê belê eşkereye ku ez bandor dikim. Tiştê ku min li vir girê dide, him ji nû ve teşegirtina vî gelî ye him jî weke kesayet bi taybetî jiyîna jinê ya vê teşegirtinê ye. Min dixwast çalakiyeke wiha bihêz neke lê belê kir. Berpirsyarê vê ez im. Ji ber vê jî weke min dixwast tişta pêwîst nekarî bikim jî bêguman piştî vê ezê kar bikim ku zêdetir bikim.

Di nava saleke vê dawiyê ez hizirîm ku divê ez bersiveke çawa bidim rêhevaleke wiha. Ji bo ku tiştên anîne zilam bibin rastî dîsa min gelekî hewldan kirin. Bêguman bûyîna ewlekariya gel û mirovahiyê binirx e. Tenê ji bo gelê me ne, di mijarên ku em dibêjin nirxên mirovî yên bingehîn ku hemû mirovahiyê pêwendîdar dikin de ez gelekî şiyar im. Ji vê tawîzdayîna min jî qet ne gengaz e. Her çi qasî min mirovahiya heyî nejiyaye jî ew nirxên ku tê gotin mirovî bi tena serê xwe jiyabim jî, di vê mijarê de bi biryarbûna min misoger e. Bûyîna rûmet, hezkirin, wêrekî û baweriyê bi wê ve derûdor bandor kirin, bêguman binirx e. Ez jî vê dixwazim. Di van kesayetan de jî ez vê dibînim. Dikarim bi sînor wiha bim, dixwazim zêdetir wiha bim. Azweriya min û di wateyekê de evîna min jî ev e. Ango bûyîna çavkaniyeke ku mirov jê hez bikin, ji bo wêrekiyê rêvekirin, kûrbûna baweriyê û mirovahî danîna holê hindekî hate pêkanîn. Bêguman ez dibêjim, xwezî mirov hîn ciwantir û bihêztir biba jî, bikaribiya mafên van têgehan bidaba.

Ji bo ku ev taybetmendiyên ku bexşê me kiriye zêdetir jiyanî bikin, tiştên tên kirin, bêguman gelekî kêm in. Hêz an jî jiyan têrê bikira ku me

bikaribaya van hîn dijwartir bikira! Bêguman girêdaniya şehîdan emê qet dest jê bernedin. Ev tevger tevgera şehîdan e. Yê ku nikare wateyê bide şehîdan, nikare ji bo min bijî. Divê her kes di vir de bikaribe vê fêm bike. Wateyeke jiyaneke şehîdan heye. Ez vê dibînim û dinirxînim. Heta ez jiyana xwe li gor ên ku dijîn weke miriyekî digrim dest. Lê belê wateya şehîdan jî weke herî jiyanî dinirxînim. Ya ku ji bo min binirx e ev e. Bûyîn û nebûyîna min a xwedî jiyaneke wisa û wiha qet ne girîng e. Lê belê her dem bi bûyîna feraset û têgehên ku bibin wasiyetên şehîdan ve kê min çawa dinirxîne bila binirxîne, hîn zêdetir xwedî nirx e. Divê her kes bizanibe ku ezê tu caran ji vê negerim û pêwîstiyên wê hîn balkêştir bi cih bînim. Ger ê nêzîkî me bibin weke leşkerên fermanê şehîdan nêzîkbûna wan yek riya derketinê ye. Bi rastiyê û bi serkeftinê afirandina vê jî diyardeyek e û raveyeke vekirî ya vê girêdaniyê ye.

Rêheval Zîlan dibêje, “ez dizanim ku derbaskirina paşverûtiyên min ên heyî, azadbûn û xwe pêkanîn di şer re derbas dibe û ez bawer dikim ku divê pêwîstiyên şer jî werin bicihanîn.” Min nedixwest şerekî wiha jê re ne amadeye, di kesayeta de xwe bijî. Lê belê ji ber ku kesayeteke gelekî berpirsyar e û wijdana wê jî gelekî bihêz e, ji diliya teqez dayîna vî şerî nîşan dide. Feraseteke ev qasî mezin û şervantiyeke mezin gihandina hev tenê aîdê qehremantiyên dîrokî ne. Di vir de dibêje divê bîranîna şehîdên qehreman ên PKK’ê were berdewamkirin. Li gor min Zîlan berdewamkirina herî mezin di kesayeta xwe de pêk aniye, kariye bibe şahbanûya hemû şehîdan. Di vir de li hemberî bandorên emperyalîzmê yên ku gelê me û jinê tune dihesibîne û wê bêteşe dike, dibêje “ez dixwazim mezinbûna rik û hêrsa xwe nîşan bidim û bibim sembola vejîna jina Kurd.” Ev jî nirxandinên watedar in û ez bawer dikim ku bandor jî kiriye.

Berdewam dike û dibêje, “îdîaya min a jiyanê gelekî mezin e. Ez dixwazim bibim xwedî jiyaneke watedar û çalakiyeke mezin. Dê tekoşîna me ya rizgariya netewî ya ku di bin rêbertiya Rêber Apo de tê meşandin, di gelekî nêzîk de bigihê serkeftinê û gelê min ê mazlûm di nava malbata mirovahiyê de cihê xwe yê ku heq kiriye bibîne.” Çalakiyeke wiha ku

encamê wê diyar e, heta hucreyên xwe dikare xwe parçe bike weke mirin nanirxîne. Berovajî dibêje" îdîaya min a jiyanê gelekî mezin e" û çalakiyê pêk tîne. Dibêje "ez dixwazim bibim xwedî jiyaneke watedar û çalakiyeke mezin." Çalakî tenê ew bûyera ku nîşan daye nîne. Tiştê ku ew behsa çalakiyê dike, diyar e. Him dê wateya jiyanê kûr be, him jî weke rojane jiyana wê bibe çalakiyek. Ev jî bi şervaniyeke mezin ve gengaz e. Ev çalakî dibe sembola vê. Lê belê di vir de naxweze bibêje, "ez bi çalakiyeke wiha ve tune bûm, vaye ez ev qas im." Berovajî tişta ku dixwaze esas bigre, "ez diçim ser jiyaneke wiha, ez dixwazim bibim xwedî jiyaneke wiha." Di vir de mirin nîne. Li hemberî tişta li civaka me tê ferzkirin, gelekî hatiye biçûkirin û di rastiyê de mirineke rast a ji jiyanê zêdetir mirov her tiştî jê re bibêje, jiyaneke mezin mijara gotinê ye. Xala herî bingehîn a ku divê were fêmkirin ev e.

Bi tenê kesayeteke ev qas jiyanî bûye dikare bibe xwediyê çalakiyeke mezin û bûye jî. Divê ez bi rihetî bibêjim ku ev îdîayek û tezek e ku bi zimanekî wêjeyî bi serê xwe xwedî nirxekê ye ku were romanîkirin. Kesayetên ev qas ketî û dema ku her cureyê ketîbûnên seyr dikin mirov bîne pêş çavên xwe îdîayeke wiha mezin meşeke jiyanê ya bi xwe mezin di asta zindiyên pîroz de bi dest girtin, ger gengaz be vê her roj weke ku nexşî giyana xwe bike bi wê re jiyîn, li gor min yekem riya jiyanê ye. Çawa ku bi xwedê re û bi pêxemberê wî re bi pîrozî, bi mumînî girêdayî mayînê ve tê jiyîn, ger em di wateya netewî de jî hetanî dawî kesayeteke wiha, vê çalakiyê, vî şerî û şêwazê jiyanê wê em bijîn, encax wê demê em dikarin bibin xwedî jiyaneke rast.

Dibêje, "gelê min ê mazlûm dê di nava malbata mirovahî ya cîhanê de cihê ku heq kiriye bigre." Tişta ku dikeve ser milên me li hemberî vê nirxa pîroz erkên xwe bi cih anîn, ev jiyana ku ji derveyî jiyanê dişibe her tiştî bi bêrûmetiyê, bêhezkiriniyê û bêşerefiyê ve dagirtiye tu dewlemendiyeke xwe ya madî û manewî nîne, dirandina wê bûyîna xwedî jiyaneke watedar û bi çalakî. Zîlanê ev sembolîze kiriye û ev pîroz e. Çi qasî bi xwedayê xwe, pêxemberê xwe, nirxên xwe yên em pîroz dizanin ve girêdayî ne di wateya

netewî de jî bi jiyaneke wiha pîroz û divê her dem girêdayî were mayin û bi xwediyê çalakiya wê ve rûbirû ne. Divê em dilnizm bin. Divê em girêdaniya xwe bi şêwaza jiyana xwe ya rojane ve bi şêwazê wê yê şer û serkeftinê ve bikaribin teqez nîşan bidin.

Ez xwendina hevokên wê yên dawiyê berdewam dikim. Dibêje, “li ser vê bingehê careke din girêdaniya xwe ya ji Rêber Apo re, ji hemû şehîdên Kurdistan’ê re, ji hemû hêzên me yên şer û eniyê re, ji rêhevalên me yên zindanan re, ji gelê Kurdistan’ê re û mirovahiyê re rave dikim û soz didim ku ezê bixebitim, layiqê wan bibim.” Ev sozdayîneke mezin e. Sozeke ku jiyana mirovekî herî balkêş girê bide ye. Ez di demên dawiyê de gelekî behsa li gor sozê jiyînê dikim. Divê sozên mezin ên mirovan hebin, li gor van sozên mezin bizanibin bijîn û hêza wê nîşan bidin.

Zîlan tam di vê xalê de bi encam dike û dibêje “îdîaya min a jiyanê gelekî mezin e, ez dixwazim bibim xwedî jiyaneke watedar û çalakiyeke mezin, ji ber ku ez ji jiyanê û mirovan gelekî hez dikim, dixwazim vê çalakiyê pêk bînim.” Ev çalakî bi gelekî hezkirina jiyanê û mirovan ve girêdayî ye. Bêguman li vir dîsa ji bo peyva mirinê cih nîne. Di rastiya gelê me de mirovahiyeke ku hatiye kuştin heye. Hezkirineke hatiye kuştin û qetilkirin heye. Bêdengiyeke ji bêdengiya gorê hîn xirabtir, bi tu rengî nayê tehemûlkirin heye. Vaye ev kesayet bi ser vê de dimeşe. Gelo riyeke vê ya din heye? Misogere ku mirovekî ji dil ji derveyî vê riyê riyeke din nikare bibîne.

Ez li vir bi bîranînê, bi rengê girîn û gazindan qet nehizirîm. Min xwest bîranînê veguherînime, xwe nîşandana jiyaneke dînîtiyê. Gelo min saleke xwe ya dawiyê çawa pêşwazî kir? Ji ber ku ew bi xwe nirxeke mezin dide bûyîna jina azad, min xwest ku pêşketinên balkêş di vî alî de pêk bînim. Di vê mijarê de heta dawiyê ji afirandêrbûnê netirsiyam. Zilam bi giştî ji bo jinekê yan jî ji bo çend jinan jiyînê û vê jî bi şêwazeke sewdaseriyê kirinê gelekî hez dikin. Dema em ji aliyê yê ku dibêjin gelekî evîndar in, li dîrokê temaşe dikin, em dibînin ku di peyvsaziya wan de çend jin hene. Lenînê ku dibêje ez ê herî sosyalîst im jî, Nadejda Kropskaya ku bi hev re dijîn hebû.

Dibe ku çend jinên din ku bala wî dikişînin hebûn. Derdikeve holê ku em nikarin wiha nêzîkî jinê bibin. Di rastiya ku gelê me dijî de jin jîneke di asta herî jêr de û tunebûnê rave dike. Di Kurdî de "jin" ango tê wateya 'jiyanê' jî. Di civaka me de, di rastiyê de "jin" tê wateya "mirina herî xirab" jî. Ev rêhevala me di zanebûna vê ya kûr de ye û di ferqa jiyanîkirina jinê de ye. Lê belê weke bîreke kor bi têkîliyên malbatê yên derûdora wê ve bi darezînên moral û nirxên civakê ve hemû xefik, hemû komplo hesûdî û ezeziyet li derûdora jinê bi pêş dikeve. Min ev bi berfirehî bi dest girt.

Girîngiyeke din a vê çalakiyê jî hilbijartina wê ya qada Dêrsimê ku qadeke herî zêde komkujî jiyaye. Dijmin wê salê gelekî bi ser Dêrsimê de çû. Xwest her tiştekî tune bike. Ji bo wir got, "tunç elî" ango xwest bi dest "tunç" ve li me bide. Jinekê xwest li wir vî destî bişkîne û ew mafdar bû. Ji ber ku ev dest her tiştî, dîroka li wir erdnîgariya xweşik û hemû mirovan bikuje. Mafê xwe heye ku vê çalakiya mezin pêk bîne.

Di serî de di rastiya Kurdistan'ê de jin hatiye rewşekê ku bûye berovajî jiyanê. Ji ber vê jî ez dixwazim ji bo vê raveyeke wiha bikim. Dibe ku hindek dixwazin meşa min û jiyana min binirxînin, dipirsin ka ez bi jinê re yan jî bi jinan re dixwazim çawa bimeşim û bijîm. Heta hindek pirtûkan dinivisînin. Ez neçariyekê hîs dikim ku bi jinan re awarte pêwendîdar bim. Ez kesek bûm ku demeke dirêj min lêpirsîn dikir, temaşekirina jinekê tawane yan na? Ger ne li gor toreyan heta li gor darezînên olî ne rast be ez dixwazim bînim ziman bi salan temaşekirina rûyê jinekê jî ji bo min bi fikar bû. Lê belê min vê gavê rewşeke berovajî derxistiye holê. Bi qasî ku zilam newêrin ber bi rastiya jinê ve biçin, bi jinê re jiyan dê çawa bi pêş bikeve him di hizir de, him jî di giyanê de jiyîn, heta pirsên weke gelo fîzîkî jî bi jiyanê re çi têkîliya wê heye kirin, her diçû bandor li min dikir û ez dixwazim bersivê bidim van.

Kesayeta Zîlan di vir de rastiyeke din derdixe holê. Ew neheqiya mezin, biçûk ketin û li derveyî jiyanê hiştina li derûdora jinê bi çalakiyeke ku diqehirîne bersivê dide. Her kes neçare vê fêm bike. Xwestiye ku ew her cure zext, dagirkirin, xefik û nêzîkbûnên civakî ku bi giranî yên zilam in, bi

vê çalakiyê ve tune bike. Vê bombê herî kêm bi qasî eniyên derve di ew kesên ku li Dêrsimê xwe xwedî hêzeke bêsînor nîşan didin de diteqîne. Dibêje, “hun nikarin jinê wiha bigrin dest, hun nikarin bi jinê re wiha bijîn.” An jî “jin nikare bi we re wiha bijî.” Li gor min çavkaniyeke herî mezin a wêrekiyê jî di vir de ye. Ez nabêjim jiyana ku ketiye tê de rastiya derveyî jiyanê wê ber bi kîn û hêrseke tirsnak ve dibe. Tenê di jina Kurd de ne, li hemberî rewşa ku giştî jinan li beramberî emperyalîzmê ketiye, dixwaze vebêje ku jin ne wiha ye nikare wiha be, bûyereke gelekî cuda ye, dikare bibe nirxeke egîdiyê û jiyanê ya mezin. Li gor min ev gelekî bi nirx e û jin dibe ku li ser vê bingehê were pênasekirin. Jinbûn çalakiyeke mezin e, jiyaneke mezin e, wêrekiyeke mezin e, berxwedaneke mezin e û bûyereke şer e.

Ev çalakî bi xwe çalakiyeke xwedayî ye. Ji ku derê ve lê were temaşekirin bila were temaşekirin, çalakiyên ku bi vî rengî pêk tên, bi qasî mirov bibêje nînin, ew qasî kêm in. Lê belê ger em bixwazin bi bingehê wê ve daynin holê bi jinê re riya jiyanê vekiriye. Ger ez xwe weke mînak nîşan bidim ezê bibêjim, jina lewaz wê ji min hindek tiştan bigre û bibe û dê bixwaze bi lewazbûna xwe ve min bifetisîne. Hîn jî ev kompleks di min de heye. Ji ber ku jina lewaz bi hemû lêyîstokên xwe yên jinîtiyê ve dê bixwaze yê beramberî xwe lewaz bike. Li pişt zilamê dagirker zalim û jinê tune dike de, jineke wiha heye. Ger hun balê bikişînin hemû jinên wiha mulahîm in û altaxê (yardakcı) zilam in. Jin ji ne pîvandinê wêdetir naçe. Vê civaka dagirker, emperyalîzm, pergalên çewisandinê yên ji dema koletiyê hetanî niha derxistiye holê. Rêheval Zîlan derbeya mirinî li jina bi vî rengî jî dide. Vê derê gelekî balkêş e. Bûyîna jineke wiha bila li vir bisekine, bi jinbûneke wiha re di nava lêpirsîneke balkêş de ye û kesayeteke tolhildanê ya ziwa jî nîne.

Dibêje “ez dixwazim bibim xwedî jiyan û çalakiyeke mezin.” Piştî ku van hemû qirêjbûnên dîrokî bi vê bombeyê ve şewitand û rûxand, ji bo jina azad derfetek derdikeve holê. Niha ez vê hîn baştir hîs dikim. Mirov dikare jineke wiha zane û wêrek re hîn balkêştir biaxive û sozan bide. Dikare bi wê

re evîna herî mezin jî bijî. Pêwîst dike mirov vê bi rihetî bibêje ger ji bo me jiyan dê bi jinê re be, divê ev jiyan bi şêwazê Zîlanê be. Ez ji destgirtîbûnê, sozdarbûnê û zewicandinê gelekî tirsiyam. Lê belê piştî ku min hevnaskirineke bi şêwazê Zîlan re jiya, ez hevpeymanekê dikim. Bêguman ez vê ji bo ajoyên xwe yên ji rêzê têr bikim nabêjim. Tenê bi jinbûna asta netewa me de ne, ger gengaz be ez behsa hevpeymaneke nû ya bi jinên ku di nava hêviya hemû mirovahiyê de dikim. Li gor min kesayeta Zîlan kesayeteke ku vê heq dike ye. Ger hevpeymanên nû bi jinê re li ser vê bingehê çêbibe, evê bi şêwazeke herî xweşik de be. Dişibe ku hevpeymaneke tu şerma xwe nîne, heta dawiyê sotîner, gelekî kûr bi zanebûneke ku gelekî ronahî dike ve û dîsa giyaneke gelekî tund dorpêç dike dê bi pêş bikeve.

## Zîlan manîfestoya me ya jiyanê ye

Tê zanîn ku heta niha zêde me ji hezkirinê fêm nekiriye û evînek nejiye. Di Mem û Zîna Ehmedê Xanî de jî ji kêleka evînê jî nehatiye derbasbûn. Gotineke ku li şûna evînê tê gotin heye. Dawiya wê jî Zîneke ku zimanê wê jî nîne û nikare rabe ser xwe, dîsa Memê ku nikare du gavan biavêje ango tu hêzeke xwe jî nîne. Di vê destana klasîk a evînê de jî ji kêleka evînê re jî derbas nabin. Dema em sêsêd salên piştre tînin pêş çavên xwe êdî gotina evînê jî nayê kirin. Tu kes nikare bi yek gotinê li ser hezkirineke xweşik tiştekî binivisîne. Di vir de niha me çi qasî evîn afirandiye yan jî ne afirandiye ew qasî girîng nîne. Lê belê îdîayek û çalakiyeke me heye. Em dixwazin vê bi jinê re bikin. Ji vê re kî çi navî lê dike bila lê bike ne girîng e. Min xwe danî holê. Rêhevalên me, jinên me yên em pê bandor bûne û me bandor kiriye li holê ne. Bêguman dibe ku ev ji min hîn zêdetirê wê hêvî bikin, lê belê ya ku di me de pêk hatiye ev qas e. Min xwest ku ez bibim mirovekî ku weke ew dixwazin heta bibim zilamekî wiha û vê jî bi vê wesîleyê bînim ziman.

Gotineke ku ez vê salê gelekî bi kar tînim jî “kuştina zilam” bû. Wateya kuştina zilam, kuştina zilamê ku li hemberî jinê ji rewşeke ku ji zilamekî, ji

zordestekî, ji yekî ku tune dike, ji rewşeke her alî ve kirêt de wêdetir nîne ye. Her zilamek taybetî zilamên di nava me de neçare vê bizanibe. Gelo ma ezê rewşa zilamên wiha yên li hemberî jinê çi bikim? Ev zilamtî jî jixwe zilamtiyeke ku tu tişt ji destên wî nayê ye. Nikare rast û durist şerekî bide, nikare rast û durist teqtîkekê jî derbasî jiyanê bike. Zelal e ku ev zilam di keçeke Kurd û jineke Kurd ku hişê wê şiyar dibe de tiştekî rave nake. Li hemberî mezinbûneke weke Zîlan zilamtiya klasîk zelal e, pênc qirûşan nake.

Divê her kes bizanibe ku êdî dema bi ajoyên zayendî yên çors ve çûyîna ser jinê derbas bûye. Divê êdî were zanîn ku bûyera jê re jin jiyanî ye û çalakî ye tê gotin, ji ber wê jî bi qasî ku hindekî din gotin vekirîbûnê, xwe anîna asteke nêzîkî wekhevî û azadiyê jî girîng e. Weke din bi jinê re hevdîtin û hevpeyvîn ne gengaz e. Ger rêzdarî, mezinbûn û bi biryarî hebe, ger zilamên me pêwîstiyên vê bi cih bînin, dikarin jinekê bibînin. Gelo jin ji bo çi ev qasî bi me ve girêdayî ne? Di giştî de zilamên me hesûd in, ji bo min girêdaniyên ev qasî mezin jî qet pirsgirêk nînin. Hun nikarin bi qelend – ku di civakê de ev wiha ye- di me de jî bi xwe spartina rade û bi nîşandana hêza xwe ya wiha ve jinekê bi dest bixin. Rêya qezenckirina jinekê bi rengê ku Zîlanê bi xwe nirxandiye dibe.

Ger hun balê lê bikişînin, bi vê rêhevala me ya jin re tu naskirineke min nîne. Lê belê dikare girêdaniya xwe ya herî mezin deyne holê. Ev xal gelekî girîng e. Dixwaze deyne holê ku divê zilamek ji bo jinekê çawa be? Ger hun hindekî wiha bin li holê ye ku jinek dikare çawa were girêdan, tenê bi girêdanê namîne çawa dikare bibe qehreman. Ger hun vê fêm nekin misogere ku hun nikarin ji xwe re bibêjin zilam. Dibe ku li cihekî din, li derveyî me hun dikarin vê yekê bibêjin, lê belê di rastiya me bi xwe de –ez hêvî dikim emê vê di nava hemû gelê me de jî pêk bînin- ne gengaz e ku ji vî kesayetî re weke din rêza me hebe.

Weke din ev jî têr nake. Ango datîne holê ku kesayeta mirovê nû ji bo jinekê çi qasî girîng e. Ger wijdana we û hindekî hêza we hebe, divê hun ji xwe bipirsin tenê jina li gor fermanên min û ferzkirinên min ne gelo divê

ezê li gor jinê çawa bim? Pêwîste vê gavê ev pirs hîn sotînertir be. Gelo ji bo çi jin ji her alî ve li gor te be? Hela îflaskirina te, zêde afirander nebûna te û kirêtbûna te li holê ye, gelo ji bo çi jinek tenê li gor te be? Gelo ji ber ku hindek pereyên te, mal û milkê te heye ye? Gelo ji ber ku hindekî hêza te ya çors heye? Zelal e ku bi van tu hezkirinek, evînek nayê bidestxistin. Kesayetên wiha dê bixwazin bi çewisandinê, jinê bi sedan salan bi xwe ve girê bidin. Vaye li hemberî vê serîhildaneke mezin heye. Ez ji bo vê rêzdar im û ji ber ku ez rêbertiya vê dikim kêfxweş im. Ji ber ku ez Rêberê jinên wiha me, hêzeke mezin hîs dikim. Tu şermeke bi wan re wiha jiyînê nîne. Ez ji ber ku piştgirekî herî mezin a artêşbûneke jinê ya wiha me kêfxweş im. Gelo ji bo çi ev gotinên erzan ve tê nirxandin ku bûyîna alîkarê artêşa jinên wiha egît, gelo ji bo çi ber bi paşbêjiyekê ve dibe? Ev jin in ku her yek ji wan tên asta qehremaniyeke mezin. Ger ji ber ku pîrekên we nînin û hun dihesidin, ew pirsgirêkeke cuda ye. Hun jî mêrxasiyê bikin, hun jî kesayetekî ku jin dixwazin nîşan bidin ku, ev jin bila bibin rêheval û sozdarên we. Lê belê ger hun nikarin vê hêzê nîşan bidin, bêguman dê di vî welatî de ji bo we jin nebe.

Ezê li ser vê bingehê hêza xwe zêdetir bi kar bînim. Ez tolhildêrek im. Hunê qet xwedî li welatê xwe dernekevin, ji bo azadiyê tu tiştî nekin, tu girêdaniyê di navbera gotin û pratîkê de ava nekin, piştre jî hunê ji min re bibêjin “dilê min jinê dixwaze, jiyanê dixwaze.” Ev nayê qebûlkirin. Ev di kesayeta Zîlanê de bi erdê re bûyê yek. Bi taybet her kesekî di nava refên partiya me de bizanibe ku ev gotin vala nehatine gotin. Ger pêwîst bike ezê zilambûneke ku hemû jin dikarin pê ve girêdayî bin pêk bînim. Ezê bi qasî ku ew aliyê manewî de hêz bin û girêdayîbûna tu zilamekî hîs nekin, balkêş bim û dibim jî. Jin vî tiştî bi coşeke mezin pêşwazî dikin, lê belê ev bi tena serê xwe têr nake. Dil dixwaze ku hemû zilamên me li ser vê bingehê hest û hizrên rêhevalên xwe yê jin, kêm zêde di kesayetên xwe de rast temsîl bikin.

Ya herî girîng jî jiyaneke bêwelat, bêazadî, bêşer û bêserkeftin nabe. Ji ber wê jin jî nabe. Ger ev yek neyê fêmkirin, hun nikarin Zîlanê ji ber wê jina milîtan a azad jî fêm bikin. Ez ji hemû zilamên me yan jî rêhevalên me

yên di nava partiyê de dipirsim, gelo yê ku dixwazin bi jinê re bijîn hene? Xweziya we bikaribaya ji jinekê hez bikin, xwezî di vê wateyê de hindekî dilê we û wijdana we hebûya ku kesayeta we hindekî zindî biba! Ez dixwazim riya vê vebikim, li şûna ku bi gotinên erzan ve vir de wir de were axaftin, li şûna ku di derbarê me de nirxandinên wisa û wiha werin kirin divê were fêmkirin ku tê xwestin riya vê were fêmkirin.

Jin zindiyeke ku bi rengekî bişeref û pîroz, bi nirxên mezin ve divê bi hev re were jiyîn e. Ez dixwazim wateya vê bidim. Gelo piştgiriyeke jiyanê ya ji vê binirxtir çêdibe? Ger mêrxasiyeke we zilamtiyeke we hebe, di vê mijarê de gelo ji xwe nîşandanê hîn binirxtir hewldanek çêdibe? Di saleke dawiyê de min xwest di vî alî de hest û hizrên bi vî rengî bi pêş bixim. Em bi gotina bi şer di eniya derve de ev qas serkeftin me pêk anî ve pesnê xwe nadin. Di rastiyê de em ji van xemgîn jî dibin, me tu caran şer bi sadîstî negirte dest. Em gotina leşker û xayinan dikujin kêfxweş nabin. Ji ber ku ew li pêşiya jiyanê weke astengiyekê disekinin, ji ber ku ew dixwazin me kêlî bi kêlî tune bikin em şer dikin. Naxwe di vê dinyayê de yekî ku herî zehmet şer bike hebe ew jî ez im. Lê belê riyeke din a jiyanê nîne. Her roj ez di vê mijarê de bangawaziyê dikim, dibêjim “werin em bi rêbazên mirovî ango bêlêdan, bêyî ku bişkînin û hilweşînin, bêyî ku bikujin hin pirsgirêkên vî gelî yên ku hene nîqaş bikin û çareser bikin.” Lê belê dilê van nîne. Bêwijdanên mezin in. Mafê gelekî çi ye, hêviya mirovên di bin zextê de ne çi ne? Naxwazin qet fêm jî bikin. Xwedî feraseteke di bin navê “yekîtî û hevgirtina netewî” de bila gelek tune bibe, hemû mirov li derveyî jiyanê werin hiştin in. Ev ji bo wan qaşo şeref e. Em vê şerefê gelekî baş dinasin. Mînakê vê di dîrokê de gelek in.

Em ji bo ku xwe ji hêzên wiha zalim ên ku gelekî neheq, gelekî kor, ji hilweşandinê û tunekirinê zêdetir armancên xwe nînin, biparêzin vî şerî didin. Lê belê şerên me yên bingehîn ji bo wateyekê bidin tunebûna jiyana xwe, ev enî herî kêm bi qasî eniya şer girîng e. Em bawer dikin ku jiyaneke were qebûlkirin, were hezkirin û rêzgirtin bi asta ku divê di têkîliyên jin û zilam de were bidestxistin ve dê çêbibe. Ez dihizirim ku jinê bi rengekî

bikaribe bi xwe biryarê bide, nîqaşê bike, weke di kesayeta Zîlanê de tê dîtin, bikaribe kûrbûna wate û hest bi dest bixe pêş bixim. Di vê mijarê de ez kar dikim ku tiştê pêwîst bikim. Ev a rastir e, taybetî ji bo civaka me erkeke herî pîroz a ku divê were bicihanîn e.

Ez dikarim vî tiştî di serî de ji bo gelê me yê rêzdar û dostên me yê ku dixwazin di mijara jiyana nava partiyê de kûrbûneke diyar bi dest bixin re diyar dikim ku zehmet be jî heta ji şer zehmetir be jî berovajî gelek kevneşopan nirxên me yên em pêve girêdayîne, yên olî yan jî exlaqî û moral be jî ez neçarim riya jiyana nû wiha vebikim. Dibe ku were gotin "ol, exlaq û kevneşop wisa dibêjin." Ev ji bo min ne girîng in. Ji ber ku welatê me, jiyan, jin û zilam dane wendakirin. Ez ne di wê niyetê de me ku jiyana erzan û hêsan berdewam bikim. Weke ku li vir hatiye diyarkirin, ez bi rêgeza "îdîa û jiyan dê mezin be" ve girêdayî me. Ji bo vê rêgezê çi pêwîst e ewê were kirin. Şerekî ev qasî mezin, tu endamê olekî nikarin nîşan bidin. Lê belê di PKK'ê de keçikeke ciwan ev hêz nîşan daye. Vê hezkirinê û wijdanê tu kevneşop û exlaqî din de dîtin ne gengaz e. Vaye ev di exlaqê azadî û armancên azadiyê de hatiye nîşandan.

Hemû gelê me, dostên me, hemû milîtanên jin û zilam ên di nava partiya me de!

Divê mirov di ferqa Rêbertiyê de be ku di mijara jiyanê de pêşveçûnek heye. Bi jinê re rast jiyîn û bi ferasetbûyîn dê gelekî hêzê bide şer jî. Ev weke tê bawerkirin, nabe ezeziyetê. Kê dibêje dê bibe ezeziyetê ew dixelite. Bûyîna bi jinê re sedemeke şer e, divê her kes fêm bike ku ger ez di salên dawiyê de çi qasî bi jinê re bûme, ew qasî min zanîbûye ez bibim şervanekî dijwar. Dema ku zilamê kevin bi jinekê re bû, dema xwe bide dê yekcar şerê were qezenckirin re dê xiyanetê bike. Ev zilam ji bo min zilamekî herî bênamûs e. Dibe ku ev kesayet jin be jî. Lê belê ez tu caran nahizirim ku tu jinên li gel min, min li derveyî şer bihêlin. Jixwe Zîlan bi xwe li rastê ye. Bûyîna bi Zîlanê re, bûyîna bi çalakiya şer a herî mezin re ye. Ma hun dixwazin bi jinê re bin, wê demê hunê bibin şervanê herî mezin. Hunê bi welatparêziya mezin û azadiya mezin ve bi hev re bin. Dîsa ma jin dixwaze

bi zilam re be, dê bi mirovên nû ku di şexsê min de ava dibe re be ango dê weke rêhevala Zîlan be. Raveyeke vê ya din nîne. Bûyera ku em dibêjin pîroz e, hevpeymana ku em di dilê xwe de, di mêjiyê xwe de heta dawiyê pê ve hatine girêdan ev e.

Min ji bo vê got manîfestoya jiyanê. Ji vir û pê ve di vî welatî de, di nava vî gelî de jiyana di navbera jin û zilam de dê li gor vê manîfestoyê çêbibe. Ez dixwazim milîtanên jin ên hîn xwedî nirx derbixim holê û vê hindekî din bipeyitînim. Min jinên egîd xiste çavên zilaman, dema pêwîst kir min ji wan zêdetir kire şervan û ger gengaz be min ew rakirin, hindekî wijdan û şer min xwestiye hindekî nîşanî wan bidim. Dîsa ji bo ku bi azweriyeke mezin ve bi jiyanê ve werin girêdan min xwest wate û girîngiya jinê deynim holê. Pêşketin bi sînor in, lê belê li gor min balkêş in. Weke gelek bawer dikin, ev jiyan bêyî ku kûrbûneke zanebûnê û giyaneke mezin çêbibe, nehatiye afirandin. Şehîdên jin ên PKK'ê li gor vê manîfestoyê bi pêş dikevin û dîsa zilamên mêrxas jî li gor vê manîfestoyê derdikevine holê. Min dixwest ku serkeftina van a tam pêk bînin. Ji bo ku hêza min têra vê bike ez kar dikim ku her tiştî bi dînîtî bînim cih. Lê belê dibe ku ev yek têr neke, her kesekî ku soza girêdaniya bi şehîdan re daye, ger gengaz be, bila jiyana xwe ya rojane bi îdîa û çalakiyeke mezin ava bikin. Li gor min yekî ji rêzê be jî ger bi îdîa û çalakiya mezin be, dikare him bibe temsîlkarê jiyanê him jî bi qasî hewce dike bibe şervanê wê, dikare serkeftinê jî misoger bike. Bi wesîleya yekemîn salvegera şehadeta wê û çalakiya wê ya mezin a vejînê ez van tînim ziman.

Rêhevala me ya Zîlan di gotinên xwe de heta dawiyê mafdar e. Îdîa û azweriya wê ya jiyanê heta dawiyê pîroz e. Me ji bo ku ji vê re rê vekir li gel ku kêfxweş in, ji bo ku me nekarî serkeftina wê ya tam pêk bînin jî em hîn di nava perçiqandin û metirsiyê de ne. Lê belê ji bo derbaskirina vê jî em misoger hewldanên xwe yên dijwar berdewam dikin. Weke ku wê bi xwe jî diyar kiriye, evê bibe serkeftinê. Di vê wateyê de bi tenê xeta serkeftinê ya şer ne, kesayeta serkeftinê ya jiyanê jî misogere ku di manîfestoya Zîlanê de wateya xwe dîtiye. Ji vir û pê ve jiyan di bin vê manîfesto û sondê de dê

wateyê bibîne. Rexmî hemû qisûr, kêmasî û şaşitiyên xwe ve me xwest em hindekî pêwîstiyên vê bi cih bînin. Ez bawer dikim ku ji vir û pê ve weke mirovên wêrektir û hîn nêzîkî rastiyan, zanetir him jî gelekî şiyar û hestyar emê pêwîstiyên jiyanê jî bi cih bînin û bi qasî ya şer emê serkeftina jiyanê jî misoger bikin.

**30 Puşber 1997**

## GER BERSIVA JINÊ BI XWE NEBE, PÊKHATINA JÎYANA AZAD NE GENGAZ E

Xebata jina azad bi qasî ku pêwîst e, xebata herî hesas e. Divê bersiva jina azad di hemû qadên xebatê de di asteke têr de were dayîn. Zirara herî mezin a ku tevlîheviya li jiyana azad tê ferzkirin, dîtina jinê jêneger e. Bersiva şêlûbûna di nava partiyê de weke ji bo wateya di asta zayendî de dest jê bernedana serdestiya li ser jinê ye. Bi taybet xwe zelal nekirina eniya jinê yekser bi koletiyê ve girêdayî ye. Ger bersiva jinê bi xwe nebe, pêkhatina jiyana azad ne gengaz e. Bêyî ku bibin xwedî pratîkeke şoreşgerî ya ku xwedî hêz e û diçe serkeftinê tu nirxeke hest nabe û ev ne gengaz e jî.

Di rastiya me ya gel de pirsgirêka zayend û zayendîtiyê ji nêzîk ve girêdaniya xwe bi ketina siyasî ve heye. Şerekî ku zext û durûtî herî zêde dilêyîze û dijber de bi kirêtî dimeşîne jî di qada zayenditiyê de tê jiyîn. Qada ku herî zêde bi jinê dide wendakirin û wenda dike jî ev e. Jineke ku di jiyanê de nikare vê çareser bike, ne gengaz e ku xwe tu mijarî de bi bandor bike. Şopeke herî girîng a ketina Kurd xwe li ser jinê dide xuyakirin, ketina herî bi êş û ya ku ji nav derketin nabe ya ku bi jinê re tê pêkanîn e. Têkîliya ku girêka kor a Kurd herî xeter tê girêdan jî di nava rastiya jin û malbatê de ye. Mirov dikare bibêje ku xala tunebûnê ya ku li ser herî zêde kûrbûn çêdibe, di şêwaza têkîliyê ya li vir de ye. Weke ku neçarî sedemên hemû binketinan e, esasê bingehîn a nêzîkbûnên tevlîhev in jî. Di vir de yê ku hilbijartetiyê nikare tam bi dest bixe, nikare li tu qadan hilbijardetiyeke rast bi dest bixe. Hun hilbijardetiya di vir de çi qasî takekesî bikin, hunê di hemû qadan de ew qasî teng û ezez bin. Di vir de yê ku nikare pîrozbûnekê pêk bîne, nikare di tu qadan de pîrozbûnê pêk bîne. Nasnameyek û kesayeteke ku nikare ajoyên xwe yên ji rêzê derbas bike, nikare bi tu rengî gavekê di hilkişandina pîrozbûnê de biavêje. Zincîrên herî bingehîn û astengiyên li ber lingan ên ketina Kurd û pêknehatina ji vê derketinê yek jî bi şêwazê têkîliyê ya ku li vir derbasdar e.

Di vê wateyê de Rêbertî rastiyeke ku cihê lê ye û dema ku hewce dike bi perçekirina zincîrê ve di kesayet de, di malbatê de û her diçe di civakê de xala derketinê ya herî bingehîn bi dest xistiye ye. Rêbertiyeke ku ev yek çareser nekiriye, mirov nikare behsa tu serkeftina wî bike. Ev afirandêriya di Rêbertiyê de bi perçekirina zincîran a di vê wateyê de ye ve gelekî girêdayî ye. Bi avêtina vê gava mezin ve zaniye ku ji bo hemû qadên din de meşa serkeftî pêk bîne. Çavkaniya hemû tengasiyên we ji ber hun nikarin şêwazeke serkeftî ya rûxandina koletiya xwe bi dest bixin e. Şerê herî mezin û yê encamê digre, şerê ku bi vê girêka kor re tê kirin e. Ev bûyereke siyasî ya girîng e. Di şerê rizgariya netewî ya Kurd de bûyera siyasî û qada siyasî di vê xalê de him ketina wê ravekirinê de, him jî xwedîwatekirina bilindbûna wê de heta dawiyê risteke diyarker dilêyîze. Heta ku hemû lêyîstokên ferzkirinên hemû sîxuriyên objektîf û subjektîf a di vê qadê de neyê derbaskirin, ji hemû gavavêtinên şer ên din re meşeke serkeftî dayîna kirin ne gengaz e.

Heta ku di vê tekoşînê de tevlîbûnên we yên bi xeletî neyên çareserkirin diyarkirina we ya çarenûsa xwe ne gengaz e. Şoreşa ku li vir pêk tê, di çûyina çareseriyê ya hemû astên netewî, siyasî, civakî, çînî û asta zayendî de cihekî xwe yê diyarker heye. Heta ku hun wê bi dest nexin û çareser nekin heta dawiya temenê xwe ji ser hişên xwe çûyîn û di vê wateyê de bi çarenûsgeriyekê ve xuşikandin û çûyîna we jêneger e. Di vê wateyê de jiyana we bi hemû lewaziya hestyarî û tengasiyên bi êş ve dê çavkaniya xwe li vir bibîne. Yekî ku nikare çareser bike, weke ku nikare ji tu êşî û xemgîniyê rizgar bibe, kêfxweşiya wî jî ji kêfxweşiyeke gelekî seranser û diçûrise, ditemire wêdetir naçe. Ev şoreş pêwîst e û hîn jî şoreşeke bingehîn e ku beramberî mirovahiyê disekine. Her çi qasî li gel me were hizirandin ku weke ev pirsgirêk dê piştre were çareserkirin jî, weke şoreşeke herî bi bandor di asta têkîliya kesayet de neyê çareserkirin, gavên din ên şoreşî avêtin jî zêde bi biryar û serkeftî nabe. Ev kirêtiya mezin a ku em di nav de dijîn, encax di vê şoreşê de bi gihiştina çareseriyeke diyar ve hun dikarin derbas bikin.

Zilam –ku ji bo wî jî gelekî xeter e- bi fêrbûnên xwe yên xirab ku ji aliyê xwe ve bi kar tîne dibe ku bi pîvaneke diyar ve xwe bide jiyîn. Jin jî bi qasî jiyana fêr bûyî ku bi girêdayî vê têkîliyê tê ferzkirin ve nikare xwe ji xwedîbûna jiyaneke kirêt, durû û ketî rizgar bike, weke ku di giştî de heye, li gel me jî ew bêpêwendîtiya kûr û bêhêziya ku di rastiya jinê de zêdetir e, weke ku bûyereke siyasî ye, ev bi tenê bi hemû hêza xwe ve bi tevlîbûna xebatên şoreşî ve dikare bigihê çareseriyê. Hun vê çekê çi qasî baş bi kar bînin, ew qasî hun dikarin bibin xwedî gavên jiyanî.

Xebatên me yên di demên dawiyê de, jinê ji bûyîna mijara ezeziyetê derxistiye, weke ku xerman kiriye, ew aniye rewşekê ku weke kombûna hewzekê û rê li ber nîqaşeke di derbarê em wê çawa biherikînin vekiriye. Derxistina we ji bûyîna mijara ezeziyeteke kûr bi navê we pêşketineke mezin rave dike. Hun dest bi fêmkirinê dikin ku heta hun vê ezeziyeta dijberî xwe derbas nekin ne gengaz e ku hun behsa pêşketina her çi vînekê bikin.

Xala ku ez lê sêyr dimînim ev kirêtî xwe dem bi dem nîşan dide ye. Nêzîkbûneke weke di astên jiyan û têkîliyê de weke ku em zextekê pêk tînin, weke ku avakirina têkîliyên gelekî xwedî nirx ên wiha gengaz e, weke ku derfetên wê dema dibînin û vê ji me didizin marîfeteke weke ku wê hesret were derbaskirin û dê bi hestên xwe ve bijîn, weke ku ev mafeke gelekî girîng e, weke ku ev partî nebe dê gelekî xweşik were jiyîn, lê belê li pêşiya van hemû tiştan em astengiyê çêdikin heye. Em dibînin ku nêzîkbûneke wiha rezîl û şermê dide dem bi dem di ev an wî kesayetî de tê ravekirin, heta li ser partiyê tê sepandin. Ev nêzîkbûneke him gelekî şaş e him jî neheq û berovajî ye. Em dixwazin parêzeriya mezin a paşverûtiyê di bin van peyvan de bînin ziman. Di rastiyê de rewşeke wisa nîne. Lê belê weke ku paşverûtiya hundirîn xwe bi wiha navkirinê, zewqê digre û ev jî sekinandineke dij şoreşê ye.

Berî her tiştî kesek li dijî hestên van nîne. Tiştên ku em li dijî ne, dij şoreşgeriya wan a balkêş û dijmintiya wan a hestan e. Dijmintiya wan a li hestên ku aîdê mirov in û xwedî wateya kûr in ku pêş dikevin e. Ya ku em li

dijî ne ev e. Em bi, ev qasî vê tevlîhev dikin û ji bo vê wêrekiyê nîşan didin, hêrs dibin. Naxwe gelekî zelal e ku em zêde îtîbarê nîşanî şêwazên têkîliya yên tevlîhev nadin. Em nikarin ji van re bibêjin hest û têkîlî jî. Em dixwazin diyalogek, ferasetek û hevhestyariyeke ku layiqê zayenda xwe û zuriyeta xwe nîşan bidin. Em dixwazin werin rewşeke ku bibin hêza jiyanê ya bi vîn, watedar û bi armanc. Ne fêmkirina vê û li şûna vê her dem ji cewher dûrxistinê kirêt ferzkirin, bi ferzkirineke dij şoreşê ya tam ve girêdayî ye. Her biçe emê vê şêwazê têkîliyê ya tevlîhev teşîr bikin. Bi qasî ku dixwazin û bi rengê ku dixwazin bila van ferzkirinên xwe di bin gotinên xemilandî de berdewam bikin, ev rastî naguhere.

Di vir de bêyî ku serî li bêjeyên rêxistinê bidin, divê em a herî paşketî, heta ji paşketîbûnê wêdetir a di sînorên meymûniyê de bikaribin deynin holê. Bi taybetî zilam û jinên di nava refên me de teqez bizanibin ku ka di vê xalê de tê xwestin çi were gotin. Ez tu carî li dijî pêşketin û jiyîna hestên xweşik nînim. Berovajî hemû hewldanên me ji bo rêdayîna vê ye. Lê belê ez dikarim diyar bikim ku bi qasî yê ku nikare wateyê bide vê û qaşo têkîliyê bisepîne şêwazeke din a têkîliyê ku kirêt e û mirov pê tinazên xwe bike nîne. Ger di vê mijarê de rêgezeke PKK'ê hebe, divê di pêş de her kes bizanibe ku ev dê wiha bijî û şoreşgeriya xwe girêdana krîtereke wiha jiyanî ye. Bi qasî têkîliyan li gor rêveçûna ajoyên kor birinê, şêwazeke dij şoreşê û ketî nayê hizirandin. Em nikarin vê kirêtiyê layiqê zuriyeta xwe bibînin. Em nikarin radestî xwe bi xwebûna ajoyên ku di zayend û zayendên me de ev qasî paşketîbûn her diçe her cureyê ji cewherdûrxistin û durûtî tê de şax dide, bibin. Em nikarin ji navê vê re jî bibêjin hest û evîn. Bi qasî ku ev şêwazê herî dijminî ya ketina me û wendakirina me ya hemû jiyanê ye, ger emê gavavêtinekê pêk bînin, divê em têkîliyekê jî piştçav nekin ku ev gavavêtin girêdaniya xwe bi derbaskirina vê ve heye.

Ev tu caran nayê xwestin ku were fêmkirin. Weke ku sozek û rêgezeke partiyê nîne, xwe xistina nava ezeziyeta ajoya kor û çûyînê weke merîfetek hesibandin, raveyeke herî ketî ye. Em îdîa dikin ku çawa ku bi hizirandin û xebata şoreşgerî ya mezin ve girêdayî, dewlemendiya madî tê bidestxistin, li

dijî hêza xistinê ya ajoyan hêza wê ya veguhertinê û pîrozkirinê danîna holê ve mirov dikare bigihê hestên herî mezin û jiyana bi tenduristî. PKK di vê mijarê de lêgerînek e, nîqaşek e, navê destpêkirineke azadiyê ye û platforma wê ye. Ger teqez hindek dixwazin gavan biavêjin, divê lêgerîn û nîqaşa wê rast bikin.

Ez dikarim diyar bikim ku îro di vî welatî de û di nava vî gelî de ez gihiştime hêza nêzîkbûneke herî taybet. Lê belê gelo ev bi çi ve girêdayî pêş ket? Ev bi li hemberî girêdana di vê astê de bi tundî xwe parastinê ve li hemberî hovîtî û sîxuriya ku bi salane tê ferzkirin berxwedanê ve ya herî girîng jî siyasîbûneke mezin derfetê şoreşeke mezin û xebatên wê yên di her astê de bi serkeftî meşandinê ve pêş ket. Ango pêkhatina jin û têkîliya azad piştî ku ev xebat hemû bi serkeftî gihişte asteke diyar wateya xwe dît. Yê ku serkeftineke xwe ya siyasî ya cidî, xebateke siyasî ya gelekî cidî û xwe girêdana mezin a armancê nînin, ji bo pirsgirêka jin an jî zilam her dest avêtineke wan a di wateya zayendî de tunebûnek e. Jixwe piştî binketinê têkîliyên tevlîhev û beredayî pêş dikevin.

Yek jî pêşketinên ku bi şêwazê serkeftinê ve girêdayî hene. Wê jî ez temsîl dikim. Ev gelekî zelal e. Li gel nebinketin, serketin, ne ketin bilindbûn, ne qutbûna siyasî di siyasîbûnê de kûrbûn û heta ne qutbûna ji xeta leşkerî serdeçûyînê ve herikandina min a mezin a jinê pêk hatiye. Raveya vê ya herî di lûtkeyê de jî pêkhatina di nasnameya Zîlanê de ye. Pêkhatina bi hezaran mînakên vê ye. Divê tu kes vê ji nedîtî ve neyê. Ev bûyereke hatina afirandinê ye. Ev tenê hatina afirandineke di asta takekes de ne, bûyereke hatina afirandinê ya di asta netewî û civakî de ye. Dema ku pêşketina siyasî ya mezin û piştre pêkanîna leşkerî ku bin nakeve, xwe di asta jin û hestan de da nîşandan, vê rê li ber herikandineke mezin a pîrozkirin û veguhertinê vekiriye. Divê êdî mirov vê yekê bibîne, li pîvanan bide û deyne ser mîhengê. Ya ku di PKK’ê de weke balkêş pêk tê ev e.

Yekî ku hîn çî ye ne diyar e, em serkeftinê li aliyekî bihêlin çavên xwe bernedaye tu şêwazeke rast ji bo hemû pirsgirêkên siyasî, leşkerî, rêxistinî û bîrdozî yên cidî re û ji çareseriya van re xwe girtiye, evîn û hesta wî nabe.

Berovajî her têkîliyeke ku ew ava bike, weke objektîf têkîliyeke sîxuriyê ye. Weke din em ji şêwazên têkîliyê ya çors jî behs nakin. Em di vê mijarê de weke gundiyan xwe nexapînin. Aliyekî hunerî ya hestan ku divê bi ziravî were pêşxistin heye. Ne çors e, hunerî ye. Heta ku aliyê wê yê estetîk ango ji nû ve afirandina wê bi huner re neyê pêkanîn, jiyan xweşik nebe misoger hest û jiyanên watedar pêş nakevin. Ên ku di van hemû mijaran de kêm zêde xwedî hewldan in, dikarin bibin xwedî gaveke rêzdar. Lê belê mînakên ku derketine pêşberî me, kesayetên ku xwe ji bo van hemû tiştan girtine, bi tenê bin neketine di heman demê de di rewşeke dij şoreşê de ne. Kesayetê ku bûne girêka kor yekcar derdikevin pêşberî me û têkîliya tevlîhev ferz dikin.

Gelo di vê rewşê de emê pîroziya şêwaza Zîlan li aliyekî bihêlin û cih bidine şêwazê we yê têkîliyan ên tevlîhev? Gelo hun vê berxwedana mezin çi dihesibînin? Hun çawa xwe li van şehîdên pîroz ferz dikin? Mijara ku herî zêde ez pê hêrs dibim ev e. Hun çawa bi vê diwêrin? Pirsgirêk, pirsgirêka ku ji me gelekî hêzê digrin, bi me didin wendakirin an jî gelek hestên wan ên watedar hene û em wan dihesûdin û naxwazin jî nîne. Pirsgirêk ji bo van gavên pîroz cihekî û di demêkê ku zêde nayê hêvîkirin de bi şêwazê bertek tol vedana xwe nîşan didin. Ger bi zanebûn, ger ne bi zanebûn bikin, divê mirov van hemû tiştên ku ew dikin weke tolhildaneke hemberî pîroziyan bihizire.

Pîrozî hene û ev ji bo me xwedî nirxekî xwedayî ne. Em gihiştina wê esas digrin. Em pîrozbûnê weke helwesteke her dem layiqe bibînin. Jin jî û zilam jî dê di vê mijarê de tiştên pêwîst bikin. Emê vê şoreşê bikin, divê hun di PKK'ê de destpêkê şêwazê vê yê pêkhatinê bi hemû girêdaniyên wê ve derbixine holê. Azadiya nîqaşê heye. Pêwîstî bi tu tabûyan û şermê nîne. Hun di paşerojê de ji ku derê, çawa, ji kîjan şaştiyê û ketinan tên werin, tevgera PKK'ê tevgereke azadiyê ye. Tevgera rabûna ser piyan a koleyan û ketiyan e. Ji ber ku kesayet wisan in, kes şermezar nake. Ya şerm li hemberî rêgezên pîroziyê û nirxên wê yên hatine bidestxistin bi zimanê koleyên herî ketî êrîş kirin û bûyîna raveya wê ye. Aliyekî girîng a xebatên min ên di demên dawiyê de jî ev e. Heta dawiyê em ji pîroziyê, azadiyê û xweşikbûnê

re dibêjin belê. Li hemberî vê heta dawiyê em ji şêwazê têkîliya yên ku ji armanc û serkeftinê qut dike, bi taybetî ya ku qaşo ezezekî balkêş û dibe xiyanetê re dibêjin, naxêr. Namûsa rast jî, di vê mijarê de tiştên divê jê re were gotin erê û na, hetanî dawiyê gotin e.

Cihê ku xwedî astbûn çêdibe eniya wê ya dijber jî bi pêş dikeve. Ev bi dînîtî pêş dikeve û her hal a xwezayî jî ev e. Nakokî wiha ber bi çareseriyê ve diçin. Emê bi hemû bi hev re bibînin yê ku dibêje “ezê van nakokiyan çareser bikim” sibê dê di nava we de çawa dengekî dijşoreşê derbixe. Yê ku di şêwazê rêbertiyê de herî xwedî îdîa ne, yê ku dibêjin “heta mirinê em tu caran cih nadin ketinê, cih nadin têkîliyên din” li vir an jî li wir hunera herî zirav a ketinê pêş dixin. Divê em kesayetan bi hemû astên siyasî, bi aliyê yekser an jî ne yekser ku çavkaniya xwe ji dijmin girtine bi nêzîkbûnên wê yên bi zanebûn an jî nezanbûn binirxînin. Tenê dahûrandina hest têr nake. Lê belê ger ji vî alî ve dahûrînê bikin jî, dahûrîneke weke gelo vê durûtiyê çawa dijîn dê bi rengekî gelekî bi pêş bikeve.

## Rêbertî, rêbertiya hev afirînê ya beramberî ye

Him ji ber rêza ku ez ji jinê re digrim, ji bo jiyana azad him jî ji bo netewek xweşiyê bi dest bixe û ji xala herî zêde hatiye xistin de hêzê peyda bike, şêwazê jiyana şoreşî ya ku ez pêwîst dibînim –ku ev bi rastî jî fedekariyeke mezin dixwaze- û ji bo nasnameya jina azad ku têra we hemûyan bike bi pêş bixim, min kesayeta xwe û nasnameya xwe danî holê. Ji bo ku hêza rast bi dest bixe, gelekî kêm qisûr û kêmasî bibin, bi taybetî ji bo ku kirêtî zêde bi pêş nekeve, rastî û xweşikbûn zêdetir mezin bibe, ez dixwazim şêwaza sekinandina kesayeta min bi vîn û ziraviyekê bimeşînim. Li derûdora min gelo çi çêdibe? Tu nasnameya zilamekî nikare bi şêwazê min biwêre. Jin jî wihabûnê bi xwe nadin xwarin. Ji bo min a balkêştir bi qasî ku daxwaza di dahûrînê de kûrbûnê heye ji bo ku tiştên çêdibin were fêmkirin û ber bi encamê ve bibe, hetanî dawiyê nermbûyîn e. Dema ku em bi nêzîkbûneke azadîxwaz bêyî ku em ji daketina cewherê kar bitirsin, ji bo pirsên kî, çî ye, çi qas e, dê çi bibe, bersivê digerin, zilam û keçik gelo bi çi

ve mijûl dibin? Ev ne lêyîstokek e, ne xefikek e ne jî xefletek e. Ji bo zelalkirina kesayetan şêwazeke şoreşgeriyê ye. Nasnameya min hindekî din cuda ye. Ev nasname bi temamî encameke lêhûrbûna siyasî ye. Ji bo zilam jî, ji bo jinê jî li hemberî bûyera Kurd bersiveke mezin a wiha ye. Yê ku xwedî hêzê hebe, bila ji vê re bibe bersiv. Mînak hemû jinên an jî zilamên ku xwe xwedî îdîa dibînin, dixwazin bigihên hestên min şêwazê min, li rastê ye. Dibe ku hun bibêjin “tu çil salî xwe amade bikî, gelo jin an jî zilamên weke me reben re nêzîkbûnên wiha bêmerhemet çênabin?” divê hun şerê dîrokî xirecir, êş û xemgîniya di vê qadê de fêm bikin. Ev hemû raveya jiyaneke ku çi bibe ye. Gelo ji bo çi hun nêzîkî fêmkirina sekinandinên mezin, pêşveçûnên mezin û tekoşînên mezin nabin? Ji bo çi gelo hun dixwazin tiştên ku hatine kirin vala derbixin? Gelo pêşkêşkirina xwe weke nasnameyeke azad tiştekî xirab e? Ger hun balê bikişînin ez ji we keçikan re, ji jinan re, ji jinên gelê me re nabêjim jina vî zilamî yan jî wî zilamî. Ez dibêjim jinên azad ên gelê me yên ku xwe fedayî azadiyê kirine. Ev sekinandin balkêş e, gelekî girîng û pêwîst e.

Nasnameyên jiyana pîroz ên di dîrokê de bi min re qiyas bikin. Dibe ku asta min li gor hindekan balkêş, li gorî hindekan hewlnak, li gorî hindekan jî gelekî tirsnak be. Çi tê gotin bila were gotin, ev sekinandineke gelekî watedar e. Ev sekinandin berxwedan, aqil, pergal û dil dixwaze. Gelo ev sekinandin nebe, jineke azad jî dikare li ser piyan bimîne? Heta ger ev sekinandin nebe, şervanekî cidî û mêrxas ê zilam jî dernakeve holê. Hemû bi vê sekinandinê ve pêwendîdar e. Hunera herî mezin a leşkerî rengê sekinandinê ya di vê mijarê de serxistin e. Hun nikarin vê yekê lêkolîn bikin, ji ber ku ev hêza we nîne. Di rastiyê de ev sekinandina me di sedan mirovên me de mêrxasiyê pêş dixe, bi hezaran jinî jî bandor dike û radike ser piyan. Ji ber ku hun nizanin ka ev mekanîzma çawa hatiye avakirin û çawa bi rê ve tê birin, yekcar hun xwe dikin şûna qehremanekî. Ji ber ku we şerê min ê mezin ê di vê mijarê de fêm nekir, ew tevlîheviyên ku hun ketine nav de we mehf dike û li hemberî vê sekinandina min diyar dike. Şerekî di nava şer de, him jî şerekî ku gelek mêjiyan wisa bihejîne û felç bike heye.

Wisa ye ku me bi xirabkirina lêyîstokên herî zirav ên dijmin ve di rastiyê de gaveke mezin avêt. Heta bi tenê ew dijminê ku li hember şer dike jî na, ew girêdaniyên koletiyê yê ku bi sedan sal in, her kes heta mêjiyê hestiyên wan girêdaye, ji zû ve dirandina wê me weke erkekê dît û me şer wiha bi bingeh kir. Mezinbûna min û hîn jî hêza min şer bi vê ve ji nêzîk ve girêdayî ye.

Lêgerîna min jî ya jinê hebû, lê belê piştî ku ez li jinê bigerim, diafirînim. Ez jî berê weke lêgerîn û hevdîtinê hevalên me yên jinê nêzîk dibûm. Lê belê min bêwatebûna wê fêm kir. Ez xwe bi hêsanî nadim firotin û hun nikarin min bi hêsanî girê bidin. Ji bîr nekin ku zilamê me yê herî navdar di vê mijarê de dê xwe girê bide û bixapîne. Jin di rewşa kesayetên ku di bin bandora exlaqê gelekî muhafazakar û kevneşop de bi şêwazekî ketî xwe difroşin, de ne. Di navbera van her du aliyan de diçin û tên. Mînakeke ku vê derbas bike, bi qasî ku mirov bibêje nîne, ew qasî kêm e. Hemû jin û zilamên civakê bêyî ku tu asta azadiyê bi dest bixin, di bin navê serî girêdan û bi gotina "gihişte miradê xwe" ve di rastiyê de koletiyeke bi rêk û pêk ve tên girêdan. Mirov nikare bibêje me ev derbas kiriye. Berê van toreyên çarenûsê we jî gelekî girêdabû û hîn jî ez bawer nakim ku hun ji wan girêdaniyan rizgar bibin.

Zilam jî ji vê ne cudatir e, ew bi rengekî hîn xirabtir, di nava vî karî de ye. Di rastî de ez wiha nînim. Ez kesayetekî ku baş dibînim, ev çarenûs an jî mirad nîne. Berovajî bêçarenûsî, bêmiradiye û neçarî ye. Ez kesayetekî ku xwe ji vê rizgar dike me. Bêguman ez kesayetekî xwe bi vê têr nabînim, dema pêwîst kir vîna ku bikaribe hemû gelekî û netewekî jî bi xwe re biherikîne nîşan didim. Rêbertî ev e, Rêbertî bi tenê dema ku ji damarên jiyanê ya netewekî yekî ji wan pêşxist, dikare bibe rêberê netewî. Hindekî vekirina damarên leşkerî, siyasî, civakî û rêxistinî rê li ber herikîna netewî vedike. Ez hîn xebatê destpêka vî karî dimeşînim, lê belê hun ne di ferqa vi tiştî de ne jî. Her kes gelekî seranser, gelekî bêhêz e û nikare bêvîniyê derbas bike. Ev paşdemayînek e. Ger di vê de were israrkirin, ev muhafazakarî heta dijşoreşêbûyîn e.

Em nabêjin bila di vê mijarê de pêwendî û têkîliya tu kesî nebe, berovajî me pêwendiyeke gelekî mezin nîşanî dinya jinê ya azad da û me astek bi wê da qezenckirin. Di vê pêvajoyê de tu kes di asta min de wêrek, ji dil, xwedî nirx, wekhev, azad, şiyar û watedar nikare nêzîkî nasnameya jinê bibe. Ger hun balê bikişînin, zilamê herî navdar her çi qasî gotinên li hev hatî bike jî di rastiyê de di dinya wî de ji bo çend jinan cih heye. Tu zilam ne di wê hêzê de ye ku wateyê bide hemû jinan. Dibe ku gotina wê bike, lê belê nasnameya wî ji vê re girtiye.

Hindek hunermendan xwestin wateyê bidin jinê, lê belê ew jî di asta qeşmeriyê de ye. Mînak Zekî Mûren baş dikete dinya jinan. Lê belê Zekî Mûren ji zilambûnê derketibû. Di rastiyê de di asayiyê de zilam nebû. Bi çelexwariya hunermend ve nêzîkî jinê bibû. Ji vî alî ve zêde cidî nayê girtin. Zilamê herî zêde li ser xwe hakim e, dema dikeve dinya jinê, dibe serdestekî çar bi çar. Zilam weke mêr, evîndar an jî hezkirî tam serdestek e. Jin jî wekheviyê, azadiyê û nêzîkbûneke bi ziravî û ji seranseriyan rizgar bûye, qet nayne bîra xwe jî. Jixwe jin jî ji kevneşopiyên gelekî bi rêvebirinê re, mezinkirinê re û di nava vê çarçoveyê de çar bi çar ji vê re amadebûnê re yan jî ji wiha pêşwazîbûnê re amade ne. Gotina “zilamê me yê mezin hat” tam kesayeteke pîrektiyê ye. Hele hindekî pereyên wî û hêza wî hebe prensê di xeyalê wê de tam raveya xwe dîtiye. Divê mirov bipirse çend vê derbas dikin? Mînakên vê nînin, wê ev qalib neşikandine, em li ser vê bingehê dixwazin zilamtiyeke wiha him di dinya we de him jî ji bo zilaman bişkînin û birûxînin. Ez hêza xwe ji vir digrim. Gelo ji bo çi ez ji we re balkêş têm? Ji ber ku her çi qasî hun ne di ferqa wê de bin jî min kesayetekî ku giyana we diperçiqand, nasnameya we dianî rewşekê ku nedihate naskirin, kuşt. Min di nava partiyê de zilamekî ku misoger li serdestiya xwe digeriya sekinand. Ev jî karekî ku her zilam bike nîne. Ger hin egîdiyên jinê yên balkêş derdikevin holê, dixwazin di ferqa wê de bin, ji ber van karên girîng, ji ber karekî girîng e û ji ber şerek tê dayîne. Min hesibandibû ku hun vê fêm dikin. Lê belê hîn jî di zilam de û di jinê de hin kesayet weke ku xebateke Rêbertiyê ya mezin nîne nêzîk dibin. Lê belê ev dixelitin.

Di serî de wasiyetên şehîdên mezin ên şoreşê, nirxa ku em didin azadiyê re, emê di vê mijarê de şer pêşvetir bibin û ber bi encamê ve bibin. Bêguman ev çîroka min e. Mirov dikare hîn jî li ser bisekine, tu şermeke vê nîne. Ne em binepixînin, ne jî ji nedîtî ve werin, hindek jin an jî zilam li hemberî vê çawa nêzîk dibin xwedî nirxekî lêkolînê ye. Mînak ji bo zilaman û jinan gelo ez xwe wiha weke model datînim holê, hunê çi bibêjin? Dema ez xwe ji hemû welatên me re heta ji hemû jinan re didim tengkirin misoger e ku ez dengek û nasnameyekî gelekî guhertî me. Weke stranbêjekî bi stran an jî bi zimanê xwedî hêza çors jî bangê wê nakim. Di vê wateyê de her tişt we neçarî azadiyê dike. Ger hun balê bikişînin hemû zilamên rêxistina me û welatê me hatine wê rewşê ku hindekî ji gotinê fêm dikin. Di rastiyê de ez berpirsyarê zilaman im jî. Jin û zilamên welatê me û gelê me yê ku ji bo azadiyê radibin, neçarin ji me fêm bikin. Heta ku ev yek neyê fêmkirin, halê yekî ji we jî axaftina tekoşînê namîne. Vê sekinandina mezin ev pêk aniye. Heta ku negihê pêwîstiyên vê sekinandina mezin ne zilambûna zilam, ne jî jinbûna jinê ne gengaz e.

Yê ku li dijî vê sekinandina mezin hene. Ev tam rewşa şer e. Heta dawiyê sivikiyên ku nayên spartin ferzkirin, komplogerî tengasî û nerihetiyên jin û zilam hene. Ev dibe ku di we de jî hebe, lê belê ji bîr nekin ku ev şerek e. Kesayeta ku di nasnameya jinê de yan jî di nasnameya min de teşe digre, dê bibe sembol û ev dê her kesî girê bide. Ev dê bi rengê nasnameyeke jin û zilam ku bi temamî xwedî li welatê xwe derdikeve, dê derbikeve pêşberî me. Zilam û jina ku pê ve were girêdan bi temamî welatparêz e, bi temamî serkeftî ne, bi temamî xweşik e, bi temamî xwedî pîvan e, bi temamî rêxistinkirî ye. Ez nasnameya jinê bi qasî ku ji her gava diavêje, dijmin jê ditirse xwedî sekinandinekê alîgirê dost û gelê me ye, cih nade xefletê û binketinê. Ev tê armanckirin û pêk anîn.

Zilam jî dê wiha were girêdan. Zilam, zilamê ku derfetê bibîne ketîbûneke herî xirab bike nîne. Berovajî ew jî dê bi temamî welatparêz be. Yê wê wisa li nasnameya xwe bikole ku ew hebe, welatê wî û azadiya wî heye. Ji bo wê jî xwedî hêz e, rêxistin e, li hemberî her dibêtiya şer jî amade

ye. Dema ku di kêliyê de kete tevgerê dizane bi ser jî bikeve. Ger ji jinekê, ji bûyereke namûsê were behskirin, ev destpêkê dema ku ev taybetmendî hatin bidestxistin çêdibe. Zilamekî ku çil caran amade ye xwe ji bo jinekê wenda bike, ew zilamê ku li gorî min bi tifê were xeniqandin e. Ev xefikeke mezin e. Hunê kar bikin ku nekevine vê xefikê, kesayeta Zîlan ên din ên ku neketine vê xefikê ne. Ew bêyî ku bihizirin tu zilamekî re bin, şehîd bûne. Wateyeke din a şehadetê jî ev e û divê yên ku dijîn jî wiha bin.

Nêzîkbûna jinê ya zilamekî ketî ji bo me kirêt e. Çi qasî mijûlbim jî hîn di asteke girîng de taybetmendiyên jinê yên xistinê hene. Kanî ew jina ku hêz bi dest xistiye, lî ku derê ye? Hemû hêjar in, nikarin rast û durist rabin ser piyan jî. Tenê tişta ku ez dikim hevaltîkirin, wêrekîdayîn bi jinan re nîqaş pêşxistin, di derbarê bi hevrebûyînê de hêvî dayîn e. Ger hun balê bikişînin, li gel min hewayeke weke “ezê wiha bibim mêrê te, zilamê te” nîne. Hun vê hewayê di hemû zilaman de dibînin, lê belê tu carî hun nikarin di min de bibînin. Kesek nikare gotineke weke “ez wisa serdestê we me, ez wisa begê we me” bi min bide gotin. Ji ber ku ez kesê ku ev rûxandiye me. Tu jinek nikare li pêşberî min bihizire ku bibe jineke çêkirî.

Têkîlî tê wateya ketina riya azadiyê ya mezin û destpêka hestên mezin. Ev bi hêsanî pêş nakeve, bi şerekî mezin ve ketina vê riyê çêdibe. Ji ber ku jin û zilam xwe tam ji pîvanên berê ve nêzîkbûna hev rizgar nekirine. Dîn dibin. Zilam hindekî bi rêxistinbûna xwe kê dizane ji ber vê çi qas hizip ava dikirin? Hun dizanin ku çi qasî bi hêrs in. Ger hun balê bikişînin, tiştên ku ez dikim ne şaş in. Ez vê bi şerekî gelekî zirav û hesas dimeşînim. Ger ez vî şerî bihêlim, gelo di civata zilaman de çi dimîne? Wisa rihetbûnê, çek hilgirtinê û tevlîbûna “karê zilam” li aliyekî bihêlin, piştî demeke kurt dê bibêjin “jina ketî û kirêt, cihê te mitbax e, li zilamê xwe binêre, li zarokên wî binêre” û bi sîleyan dê li we bidin. Ger hun li ber xwe bidin, dê du sîleyên din li we bidin û di encam de we biavêjin, li gor xwe guncaw dibînin. Ê ku hindekî çavdêriya vê bike, hema dikare vê yekê ferq bike.

Zilam ji ber ku niyetên wan xirab in na, ji ber ku zilam in wiha ne. Berî her tiştî bêhêz in. Di refên me de bi taybetî hindek di bin navê qaşo hestên

xweşik de vê ferz dikin. Ez bi vê yekê hêrs dibim. Ev karekî wisa hêsan nîne. Ger hun di roja diduyan de têne komployeke ku dijmin jî nikare bike, ger hun dikarin hemû şervanên xwe û hemû hewldanên wan li aliyekî bihêlin –ku komplogerî ev e- gelo kîjan hestên we dê cidî werin girtin? Gelo çi tiştê têkîliyeke wiha were parastin heye? Em ji bo ku hun bi jinê re pêwendiyê dibihîsin û têkîlî bi pêş dixînin ne, ji bo ku hun canê wê distînin em şermezar dikin. Ji bo hun bêhêz û rêzîl in, em li hemberî vê yekê derdikevin.

Ger hun balê bikişînin sekinandina min, hestên mezin tîne hişên mirov û dikare nasnameyan derbixe holê. Asta têkîliyê ya ku li gel me pêk tê, bi temamî xwedî asta netewî ye. Em pirsgirêka civakî ya herî giran, bi çeka şoreşê ve çareser dikin. Em pîvanên azad ên ku ji bo jiyanê gelekî pêwîst in derdixine holê. Ger hun vê yekê rast dibînin û hêzeke we ya piştgiriyê hebe, hunê nîşan bidin. Gelo ev dê çawa bibe? Dema ez dibêjim evîn, tam karekî siyasetê ye, ez behsa vê dikim. Dê sekinandineke vê ya siyasî ya saxlem hebe. Yê ku sekinandina xwe ya siyasî û rêxistinî ne saxlem be, behskirina wî ji hest û evînê lêyîstok e. Di asta têkîliya jin û zilam de jî, sîxurî ye têkîliyên çelexwarî yên di refên me de weke beredayîbûn tê binavkirin. Di hemû qadan de gelek kesayetên ku bi bin ketine, her diçe bi ser hev de wergeriyane. Gelo ev evîn e yan jî xiyanet e? Gelo ev hest e yan jî bêhestbûn e? Gelo ev tunebûn e yan jî vejîn e? Divê hun van wiha bidest bigrin û bersiva we jî di cih de be. Ji ber vê sedemê cih nedin hestên ên ku sekinandinên xwe yên rêxistinî heta leşkerî ne saxlem in. Bi hezkirin û hatina hezkirin a wan bawer nekin.

Yê ku di siyasetê de wenda dike, qezenckirina wî di hest û evînê de jî tu caran ne gengaz e. Şertê yekemîn a evînê qezenca bilind a siyasî ye. Min hetanî vî temenê xwe vala şer nekir. Pêwendîdarbûna bi xweşikbûnên welatê me jî ne şerm e, heta divê mirov bi van re pêwendîdar be. Lê belê min çare di şerê mezin de dît. Di dinya jinan de cihê min xwedî hêz e û ev jî bi şer ve çêbûye. Dema em hemû jinên me dikişînine bi tekoşînê ve pêwendîdariyê, li kêleka zilamê ku karê wî xulamtiya dijmin e, gelo jin çi

bigere? Zilam xwe weke mêr an jî evîndar daye daqurtandin, lê belê pênc qirûş qîmeta wî nîne. Ez bi cidiyeta zilam bawer nakim, jinên feqîr xwe bi zilam dane daqurtandin. Dema em van tînin ziman dibêjin, "dê hemû jinên me ji destên me bigre." Di vê wateyê de jî min hemû jin ji dest van zilaman girtin, ji destên jinên wisa jî ez zilaman digrim. Ez şer wisa didim. Ger wiha nekim, ne jineke şer dike, ne jî zilamekî şer dike dibe. Hun êşa vê dikişînin, ez jî afirandina vê pêk tînim. Hun di rewşeke asteng de ne, ez bi mîlyonan ve vê pêk tînim.

Gelo şerê netewî weke din çawa tê dayîn? Gelo yek roj berxwedana van mirovên ku ji her alî ve xilas bûne weke din çawa gengaz e? Evîn bi xwe weke berhemekê kêlekê ya vî şerê mezin û weke çavkaniyeke îlhamê pêk tê û em her dem ji bo vê weke bi tacbûn û kulîlkbûnê ve wate didinê. Ger em van şerên mezin di van axan de, di nêvenga ku hemû qirêjî, kirêtî û dirî lê hene bidin, encax wê demê di axên me de evînê vejî û kulîlkan bide. Weke din ne gengaz e.

Ev şer di heman demê de şerê evînê ya sotîner e. Bi pîvanên pergalê ve tê û dibêje "mêrê min, jina min." Ev rewşeke ku divê gelekî were şermezarkirin e. Gelo çi pêwendiya vê bi evînê, bi zilamtî û jinbûna were hezkirin re heye? Ji bo wê hevokeke Ehmedê Xanî yê weke "ax, xwezî me jî evîn pêk bianiya, xwezî ji me re negotina ji evînê dûr in" heye. Pêkanîna evînê ne hêsan e.

Em dikarin van hêmanan hîn berfirehtir binirxînin. Em şervanekî zindî yê evînê ne. Em kesayeta fermandar a şerekî ku ne karê henekan e û ji nedîtî ve nayê ne. Ev di heman demê de pêwîst e. Divê ez balê li vê astê bikişînim. Ji bo we jinan ev yek gelekî pêwîst e. Ji ber ku weke din hilbijartinên me nînin. Zilamekî navdar ê ku hun bikaribin destên xwe dirêjî bikin dê demeke kurt de weke çiyayekî di ser serê we de birûxe. Ew bi tenê bi şerekî wiha ve tê derbaskirin, hindekî vîna we ya azad çêdibe. Ez naxwazim bi pîvanên giştî ve têkîlî jiyana we bibim. Dibe ku hun derbikevin derveyî PKK'ê, hun dikarin her cureyê têkîliyên ku cihê hun dixwazin bijîn. Lê belê hunê qebûl bikin ku ez şerekî dimeşînim, hunê bizanibin ku hêmanên wê him di rêgez

de, him jî di şêwaz de heye û hunê wateyê bidinê. Bi vê ve em dixwazin ji peyva azadiyê re derbasdariyekê bidin qezenckirin. Misoger e ku armanca we ev e û tişta ku sazbarî pê tê qezenckirin jî ev e.

Di vê wateyê de girêdaniya bi Rêbertiyê, ji bo gihiştina armancên xwe jêneger e. Jixwe ez nikarim qebûl bikim ku ev girêdaniya we gelekî erzan û hestyar be. Girêdaniya we ji bo we jiyanî ye. Wê demê hunê misoger ji bo pêwîstiyên wê hîn diyarker û ji zilaman zêdetir cih didinê. Ji ber ku ev a ku ji bo we pêwîstir e. Ji ber ku hin derfet hene, weke jinên ji mal revîne ne diyare ku dê bigihên ku derê, sekinandinina we şerma herî mezin e. Tişta ku herî zêde bi we pêwîst e azadî ye, nasname û kesayeta wê ye. Ji bo vê jî derfetek hatiye dayîn a girîng ji bo vê ji zilam zêdetir watedayîn û bi girêdan nîşan danê ve ber bi encamê ve çûyîn û vê derfeta dîrokî ya mezin baş nirxandin e.

Tu zilam nikare ji bo jinê wiha tawîzan bide. Tişta ez dikim tawîzdayîn nîne. Ji ber ku feraseta min a mirovahiyê wiha ye ez dijîm, ji ber ku ez naxwazim bibim zilamê klasîk min bi vîn û şêwazê xwe yê azadiyê ve xwe teşe kir. Weke hunermendekî zirav ên erzan ji bo ku we qezenc bikim, wiha nêzîk nabim. Berovajî ev pêwîstiyeke felsefeya min a jiyanê ye. Dê bandor û şaxên vê belav bibin. Ger hêza we hebe li ser vê bisekinin, kûr bibin, hêz bigrin û hêzê bidin. Ji we tê xwestin li jiyanê heta dawiyê bi vîn û xwedî feraset bin. Her cureyê çekê, dikevin destên we û ji bo tevlîbûna we ya tekoşînê derfet tên dayîn. Ev çekeke ku bi hêsanî were peydakirin nîne. Zilamên ku hun herî zêde jê hez dikin jî di nav de, zilam çekên wiha nadin dest jinên xwe. Mînak naxwazin zimanê wan vebin, qebûl nakin ku gavan biavêjin şerê leşkerî û siyasî û qebûl nakin ku bi fîzîkên xwe jî li ser piyan bimînin. Ji ber ku bergeha wan vê qebûl nake. Bi bergeha xwe ve dê bixwazin teqez fîzîka we bixin. Ji bo wan teqez êrîşkirin bergeheke weke hatiye asta gurekî birçî ye.

Ji bo ku hun li hemberî şer bikin, derfetên mezin ku ketine destên we hene. Hunê bi wan re şerê xwe binirxînin. Hunê rêxistin û plansaziya wê bikin, di serî de di eniya hember ji dijminê pêşçav em bigrin, li hemberî

hemû bandorên xistinê yên ne yekser ên zilamên di nava me de hunê gelekî zanebin. Hunê projeyeke jiyanê û plansaziya wê ya ku vîna we ya azadiyê û feraseta we ya xweşikbûnê dest dide gav bi gav ava bikin. Hunê her dem têkîliya bi zilaman re li ser vê bingehê bigrin dest. Hunê bi temamî bibin xwedî plan û projeyan. Li pişt we rêxistina hêza jinê heye. YAJK ev e. Ji ber ku hun ne wiha bin dê zilam êrîşî we bikin, ev êrîş jî bi şêwazên guhertî ve dibe. Ji vî alî ve hunê dayîna destên we ya çeka azadiyê weke şensekî bibînin û hunê bibin xwedî feraseteke weke deryayan.

Jinan xwe fedayî şerê mezin a azadiyê kirine. Mînak weke di gotina rêheval şehîd Zîlan de çêbûye dibêjin “xwezî tiştekî ku ji canê me bi nirxtir hebûya û bidaya.” Di derbarê van hewldanên me de ev qas canan xwe tevlî kirine. Ev çek li ser vê bingehê hatine bidestxistin. Ji ber wê jî bi pîrozdîtinê ve, bi kar anîna van karê we yê herî bingehîn e û ev gelekî girîng e. Wateyên din ên vê gotinê jî hene. Têkîliya xwe ya bi jiyana mezin, bi azadiyê re, bi welatparêziyê re bi partî û rêxistinê re gelekî balkêş e. Ger hun yeke birûmet û rêzdar bin, hun nikarin van ji nedîtî ve werin. Ji bo vê rêxistinbûn girîng e û mirov nikare ji lêhûrbûna armancê bigere. Hunê gelekî bi plan bin û bi hev re bi dijwarî pêwendîdar bin ku di dinya zilam a ku ji bo jinê gelekî kêm cih tê dayîn hun bikaribin ji xwe re cihekî bi tenduristî vebikin. Ev şer ji bo vê ye. Bila zilamê me nebin, gelo nebe ma dê çi bibe? Ji jiyana di serdestiya zilam de ya ku hezkirinê nizane, rêza wî nîne rast û dirust parçeyeke axa xwe ya azad nîne hunê çi bikin? Ev jiyan dê hezar caran bibe bela serê we.

Ez xwe dixim şûna we jinan û dihizirim. Ji tiştê we jiyaye mirov bawer nake. Zilamekî min ê wiha hebe, ezê di rojekê de dîn bibim. Ez matmayî dimînim ku hun çawa anîne rewşeke ku hun wiha mulayîm in. Li gor min tişta divê were kirin, teqez berxwedan û şerê azadiyê ye. Ev jî raveya rastiya Rêbertiyê ye. Zewq û kêfxweşî di vê şêwazê vî şerî de ye. Ev şêwaz tolhildan e. Bi destxistina destpêkê xwe, piştre gengaz be civakê û weke dirêjiya wê zilam e. Divê hun zilam wiha bixwazin, ji xwestinê wêdetir divê wiha qezenc bikin û li gor vê biafirînin. Divê hun min jî biafirînin. Dema ez jinê diafirînim, ez bawer dikim ku jin jî dikare min biafirîne. Ya rast hev

afirandina beramber e. Ji ber ku em gelekî çelexwarî hatine xistin û ji derveyî jiyanê hatine hiştin. Ji bo ku em bi beramberiyê hev qezenc bikin, destpêkê divê em wekhev bin. Ger bal were kişandin em zêde wekhev nînin. Ê ku di asta wekhev de nebin, nikarin hev qezenc bikin. Yekîtiya ne wekhevan, nebûneke hîn kûrtir e. Rêbertî di vê wateyê de rêbertiya hev afirandinê ya beramberî ye.

Bi hemû girîngiya xwe ve, wateya xwe ve û bi pêwîstiyên pratîkî ve hewldana herî binirx di vê wateyê de hewldana ku di riya şerê azadiyê de were nîşandayîn e. Şerê ku di vê wateyê de were meşandin jî dê şerê di asta leşkerî û siyasî de ber bi serkeftinê bibe ye. Ev jî bi bandorkirineke beramber û dijwar ve dimeşe. Divê ji bo vê hun li hemberî her cureyê ji cehwerdûrxistinê berxwedêr bin. Divê hun sebir nîşan bidin û kûr bibin, bi feraset nêzîk bibin û her dem hewldana xwe nîşan bidin. Jiyaneke ku di riya wê de were şerkirin, were qezenckirin û were jiyîn hebe, ew jî ev e. Derveyî vê her tişt dixe û çavkaniya hemû êşên me û xemgîniyên me ne. Çi kêfxweşiyeke ku me derfetekî derbaskirina vê bi dest xistiye.

Wê demê em bi hemû hêza xwe bi zêdetir ferasetê ve kûr bibin û bi hewldanên vê pêş bikevin û bersivê bidin. Em bi tenê ev şerê ku binesaziyeke vî şerî ye, asta we ya leşkerî û siyasî misogerkirinê û misogerkirina dawiya serkeftinê ve, xwe têr nebînin. Em wê careke din veguherînine serkeftina di wateya civakî de. Em pîvanên wê yên herî zirav ên tên qebûlkirin, bi şêwazê xwe ve bi planên xwe yên jinê ve biafirînin. Em vê weke hewldaneke herî binirx a jiyanê bibînin. Em vî şerî bi xwe weke jiyanekê binirxînin. Em hêviya xwe û hêrsa xwe li vir tûj bikin. Ger jiyaneke were qebûlkirin hebe, em wê jî di serkeftina vî şerî de bibînin.

**5 Gelawêj 1997**

# HÊZDAYÎNA JINÊ PÊWÎSTIYEKE SOSYALÎZMÊ YE

(Nirxandina ku ji Med TV'yê re hatiye kirin.)

- Îro 8 Adarê roja jinên cîhanê ye. Em dixwazin bi wesîleya vê rojê him rewşa tevgerên jin ên şoreşger ên cîhanê, him jî di taybet de rewşa jinên Kurdistan'ê û tevgera jinên Kurdistan'ê lêkolîn bikin. Hin pirsên me yên cihê reng jî ji vî alî vê dê çêbibin.

Di serî de di 8 Adarê de xala ku divê tevgerên jin ên cîhanê bigihên hev çi bin? Di heman demê de hun ji aliyê jina Kurdistan'ê ve li 8 Adarê çawa temaşe dikin? Hun girêdaniya di navbera 8 Adarê û tevgera jinê ya ku we afirandiye çawa ava dikin? Xuyakirina we ya van ji aliyê temaşevanên me ve dê girîng be.

**Rêber Apo:**

- Berî her tiştî tenê 8 Adarê bûyîna wê ya roja jinên cîhanê ez xweş nabînim. Bûyîna hemû rojên bi jin bi jinên azad şertekî jiyanê ya jêneger e. Lê belê rastiya 8 Adarê jî vî tiştî gelekî zelal diyar dike ku di jiyanê de jin nîne. Nêzîkbûna ku weke tenê di rojeke wiha de jin layiqê bi bîranînê ye, kûrbûna asta koletiyê nîşan dide. Ev mijar her diçe qadeke xebatê ye, ku ez li ser hûr dibim. Ez vê ji şer serbixwe nabînim. Heta weke di hemû şoreşan de çêbûye, mijara herî bingehîn a ku şoreşên di roja me de û bi taybetî şoreşa Kurdistan'ê bi ser dixe, karê çareserkirina jiyana li derûdora jinê ye. Jin, hun ji pirsgirêkên şer ên herî pêşketî bigrin, heta pêşketina aştî û pêşketina wê ya li ser bingehê azadiyê de di navenda her karî de cih digre.

Heta ku jin bi rastiya zîhniyeta li derûdora wê hatiye hunandin, bi rastiya bîrdozî, rêxistin, çewisandin û dagirkirinê ve neyê destgirtin, çareserî li ser vê bingehê neyê kûrkirin, heta ku şoreşê û şer weke ku ji jinê qut bi dest bigrin, ne gengaz e ku şer bibe şerê azadiyê, ne jî aştiya ku piştre bi pêş bikeve bibe aştiyeke rast. Şertekî vê yê herî bingehîn û gelekî bi kok e, çareserkirina tora têkîliyan a li derûdora jinê ye. Ji malbatê bigrin heta exlaq, heta felsefe û heta jiyana olî, gelo ev hemû di vê mijarê de çi dibêjin?

Ji vê zêdetir gelo çi kirine, dihizirin çi bikin? Bi xwe pergaleke çawa hatiye sazkirin? Çareserkirina van hemûyan jiyanî ye. Ez dixwazim diyar bikim ku bi qasî ku ez li ser şoreşa Kurdistan'ê hûr dibim, hîn zêdetir pêwendîdariya min ji vê pirsgirêkê û di vê de lêgerîna min a çareseriyekê ji şer ne qut e. Him di pêşxistina şer de him jî li ser wateya wê ya rast gavavêtinê de ez pêdiviyê dibînim ku divê ev pirsgirêk cidî were bidestgirtin. Wisa ye ku tê gotin şoreşeke bêjin nabe, jiyaneke bêjin nabe. Ev rast e. Lê belê di roja me de bi vê rewşa xwe ve jiyana bi jinê re hela di bin statûkoya heyî de jiyana bi zilam re, rengekî jiyanê ye ku ez hîn jî di qebûlkirina wê de zehmetiyê dikişînim. Heta ez bibêjim ez şoreşa xwe ji bo vê şêwazê jiyanê bi armanca guhertinê ve pêş dixim, dibe ku ezê rastiyeke bi rengekî balkêş bînim ziman.

Weke ku hatiye hînbûn dema ku pirseke weke 8 Adarê ji aliyê jinbûna cîhanê ve tê çi wateyê hate pirsîn, bersiva ku ji vê re were dayîn, ew tê wateya bi bîranîna koletiyeke kûrbûye, gelekî sembolîk heta li gor min girîngiyeke hindekî ne cidî ye. Gelo ji bo çi tenê rojek dibe roja jinê? Gelo hêmaneke jêneger a jiyanê ji bo çi layiqê yek rojê de bi bîranînê ye? Ji bo jinê rojeke weke roja dayikan jî tê diyarkirin. Ev li gor min raveya bêsamîmiyetiyê ne û divê mirov van derbas bike. Divê mirov hemû rojan weke 8 Adarê bi dest bigre û pêş bixe.

Di asta Kurdistan'ê de zêde tiştekî ku em ji bo vê rojê bibêjin nîne. Em şoreşa bi jinê re bi hewldaneke mezin berdewam dikin. Her roj ji bi bîranîna 8 Adarê ya şêwazê klasîk gelekî jor wê re derbas dibe. Heta li gel me kar hatine wê rewşê ku jinekê yan jî zilamekî ku di vê mijarê de nikare gavan biavêje ez bawer nakim ku zêde mafê jiyanê bibînine. Tenê di nava gelê Kurdistan'ê de ne, ew hêzên ku di derbarê asta navnetewî de dixwazin helwestê nîşan bidin, bi taybet jin dixwazin vê pêvajoyê fêm bikin, ez bawerim ezê vê di van nîqaşên me de hindekî bigîhînim zelaliyekê.

Di pêvajoya pêşiya me de ezê zêdetir girîngiyê bidim, civînên bi jinê re. Ez tiştê ku li para min dikeve kirina wê weke deynekê dibînim. Bi taybetî li gel me şehîdên ku pêdivî her dem bi bîranînê hene, him ên ku xwe dikin bombe û diteqînin û bi vî rengî dibine xwedî çalakiyên azadiyê yên cidî ku

dibe zuriyeta mirovahiyê bigihê, him jî bi xweşewitandinê ve ew zûriyeta jinê ya ku dixwaze xwe bi vî rengî paqij bike, erkên ku danîne ser milên me, di şexsê van şehîdan de anîna cih ji bo min deynek e. Bi wesileya vê rojê bi taybetî diyarkirina min a vî tiştî dê di cih de be.

**-** Birêz Ocalan, tavilê em dixwazin vê pirsê bikin. We di axaftina xwe de jî diyar kir ku bergeha Rêbertiya PKK’ê û PKK’ê bi taybetî ya ji bo pirsgirêka jinê bala jinên çar aliyên dinyayê dikişîne. Ango vê gavê bi asta xwe ya nîqaşê û nêzîkbûnên xwe ve hun weke navenda pêwendiyê ne. Ji bo tevgera we derveyî jinên Kurd ji netewên din jî gelek tevlîbûn hene. Hun xwe nêzîk hîskirina jinê ya ji Rêbertiya PKK’ê re bi çi ve girê didin? Li gor we jinên ku ji netewên din tên ji bo çi xwe nêzîkî we hîs dikin?

**Rêber Apo:**

**-** Ez di wê baweriyê de me ku her diçe dê pêwendiya jinê bi pêş bikeve. Sedemê vê yê esasî dinyayeke serdestiya zilam di berdewamkirina derbasdariya xwe de bi rengekî ku yê berê nagerîne, israrkirin e. Heta bîrdoziya serdestiya zilam û nîşandana vê ya jiyanê pirsgirêka jinê hîn girantir kiriye. Bi taybetî di şoreşên sedsala 20. de ji aliyê jinê ve hindek gav hatibin avêtin jî nekarîne biçin çareseriyê. Heta welatên ku sosyalîzma reel pêk hatiye û fermî bûye jî ev ber bi şoreşa jinê ve neçûye. Di kesayetên sosyalîst ên navdar de jî pîvanên jiyana klasîk hatine berdewamkirin. Ev yek eşkere li holê ye.

Dema em tên ser min jî, min pirsgirêk bi şêweyê guhertîtir, gelekî kûr û bi şêwazê gerdûnî dest girtiye, rast e. Ez li vir tenê pêdiviyên şoreşeke rizgariya netewî naynim pêş çavan û dahûrandineke jinê nakim. Heta ji pêvajoya rojane rizgar bikim, di nava feraseteke teng a weke “jin nîvê nifûsê ye, ew nebin şoreş nabe” de jî nînim. Ez bi vê pirsgirekê ve hîn bingehtir mijûl dibim. Ev ji bo min xebateke felsefe û moralê ye. Ji bo ku ez feraseta xwe ya sosyalîst pêk bînim, divê ez vê çareser bikim. Weke kesayeteke zilam ez hîn jî di nava lêgerîna jiyanê de me. Dema em pirsa “jiyana bi jinê re divê çawa be, divê di giştî de jiyan çawa be?” dikin, pirsa “jiyana bi jin divê çawa be?” ji bo min hîn jî pirseke divê mirov li ser hûr bibe ye. Divê ez

zelal diyar bikim ku di vê de ez xwe naspêrim paşdareziyên kevneşop û nirxên exlaqî. Em ji nêzîkbûnên asta zayendî bigrin heta parvekirina jiyanê ya bi jinê re mînak di polîtîkayê de û heta di xebatên artêşbûnê de ez bawer dikim ku gelek pirsgirêk hene. Ez girîngiyê didime pêwistiya bi zelalî nîqaşkirina van. Tenê divê bi sînorên nîqaşê ve xwe têr nebînin, vê ber bi çareseriyên şoreşî yên hîn balkêş ve birin şert e. Ev rastî min hîn zêdetir pêwendîdar dike. Ez vê weke karekî herî bingehîn a sosyalîzma vê pêvajoyê divê pêk bîne dinirxînim. Di sosyalîzma reel de gelekî hatiye peyitandin ku tenê tekoşîna çînî têr nake. Çawa ku di roja me de bi şoreşeke sosyalîst ve ji bo pirsgirêkên derûdor ên ku gihiştine asteke gelekî mezin ji bo emperyalîzma kapîtalîst xweza bi temamî texrîb kiriye û aniye rewşeke ku tê de nayê jiyîn, çareseriyeke bingehîn pêwîst dike, di asta jinê de ev zêdetir pêwîst e. Ez di wê baweriyê de me ku ji bo vê pirsgirêkê ji nêzîkbûnên pergala kevneşop wêdetir pêdivî ji nêzîkbûnên nû yên weke ji bîrdozîbûnê bigrin heta bi hev re bûnên pratîk û heta ji nû ve lêpirsînkirina zewacê jî heye. Ger bal were kişandin nêzîkbûnên me yên di vî alî de nêzîkbûnên gelekî gerdûnî ne. Ev tenê bi girseya jin a netewî ve pêwendîdar nîne. Di qada navnetewî de jî pêwendiya di vî alî de pêş dikeve. Feraseteke sosyalîzmê ya ji vî alî ve bi pêş bikeve, bêguman dê jinê zêdetir bike xwedî rojev. Pirsgirêka jinê tenê di astên zayend û rêxistinî de ne, dê di hemû qadên civakê de bi rengê "divê çawa be" were lêpirsînkirin. Bi qasî ku ji vê re bersiv bi pêş bikevin, dê were dîtin ku di rastiyê de şer û aştî pirsgirêkeke jin e. Heta ku vîna jinê û kesayeta jinê nekeve rojevê bi tenê çareseriyên ku xwe dispêre ferasetên serdestiya zilam dê were fêmkirin ku bi tena serê xwe ne dikare şer ne jî aştiyê çareser bike. Ji ber wê jî ji bo ku şoreşên pêvajoya di pêşiya me de heta şoreş û şerên di sedsala 21. de pêvajoyên aştiyê ku piştî wan bi pêş bikevin bi tenduristî bin, divê em şoreşa jinê kûr bikin. Ez bawerim sedema esas a pêwendiyê ev e.

## Şoreşa civakîbûnê li derûdora çalakiya jinê pêş dikeve

**-** Birêz Ocalan dema hun jinê bi dest digrin, tevgera jinê pêş dixin, di mijara azadbûnê de hin xalên diyar datînin holê, gelo we di jinê de çi dît? Di azadiya jinê de çi heye?

**Rêber Apo:**

**-** Ez berî her tiştî di jinê de xeteriyê dibînim. Bi qasî ku ez xwe nas dikim, em ji lêpirsîna bi dayîka xwe re bigrin, heta mijûlbûn û lêpirsîna keçikan taybetmendiyeke weke di ferqa xeteriyeke kûr de bûn, ji bo min bi bandor bû. Bêyî ku zayendên beramber bi hev re bin, nikarin bi tena serê xwe bin. Lê belê di giştî de rewşeke wisa heye ku ev têkîlî zêde nade qezenckirin. Dema ku ev têkîlî rast neyê dahûrandin her diçe jiyanê hemû tehdît dike. Ez her dem di nava metirsiya vê de me û ev metirsî min dibe dahûrandineke gelekî hûr.

Di serî de bi riya hîskirinê min digot di van têkîliyan de nexweşî heye. Divê ku ev têkîlî wiha nebin. Bi qelendan ve ew keçikên ku li gel min ên ku ez gelek ji wan hez dikim û dixwazim bi hev re bim, wisa di carekê de ji holê wendakirina wan ji min re weke wendabûnekê dihat. Min digot di vî karî de xwezayîbûn nîne. Piştre min li hemû pergalê temaşe kir, min dît ku di rastiyê de yê ku hêza xwe ya pere û zextê heye, ji zû de jin stendiye. Min ferq kir ku ji têkîliyên li gor rêgeza azadiyê û xweşikbûnê tu şop nemaye, ev tenê di xeyalan de heye. Her çi qasî di helbest de, di wêjeyê de, di wêne de, di sînemayê de çi qas dik û senaryo were sererastkirin bila were kirin, di tehlîla dawiyê de min dît ku ev weke ku girseyan ji ser hişên xwe bibe, tê bi karanîn. Berî her tiştî min dît ku çewisandin û dagirkerî di mijara jinê de zagonên herî wehş pêk tîne û evînê dikuje. Vî tiştî min weke berbi tolhildêriyê ve bir.

Evîn têgeheke pîroz e. Qetilkirina evînê hestek û hizreke ku ji bo min bi hêsanî nayê qebûlkirin e. Ez di vê mijarê de weke her kes dike, di ezeziyetê de asê nemam. Min nexwest bi nêzîkbûnên zilamên klasîk ve xwe dahûrînim. Ez kesekî ku hindekî hêz komkiriye me. Mînak îro ez kesayetekî

hêzê yê ku navê wî diyar im. Min xwest ez xwe bispêrim van û pirsgirêkê çareser bikim, min nexwest ez têrbûna zayendî bispêrime hêzê û çareser bikim. Ev ji bo min bêexlaqî hat. Bi qasî ku min di xwe de xeteriyeke ji bi dilî û vîna azadiyê dûr û xwe dispêre hêzê dît, min ziraviyek nîşan da ku ez xwe jî wenda nekim. Ev di heman demê de bi xwe re vê xeteriyê tîne. Bi qasî ku di zilam de hêz bi pêş dikeve qada destpêkê ya pêkanînê li ser mirovan pêşxistina statûyê ye. Gelo statû çi ye? Yan xwe weke kesayetekî manewî bi propagandayên awarte û bi biçûkên xwe ve vê dike û dide qebûlkirin. An jî bi amrazê çewisandinê ve li ser vê zêdekirina dagirkirinê ve û bi lewazkirina mirovan ve dixwaze bi xwe ve girê bide. Pêvajoya pêşketinê ya hêza di zilam de kûr dibe wiha ye. Ev di jinê de bi rengekî xetertir dibe xwedî astekê. Zilam bi vî rengî bi qasî ku hêza çewisandin û dagirkirinê di kesayeta xwe de kûr kir, nêzîkbûna wî ya jinê mixabin bi rengê gelekî bêhevseng û kûrkirina malekî gelekî xeter çêdibe. Di rastiyê de asta ku aniye gelekî kirêt e. Jinê di dîlbûnê de û metabûyînê de heta dawiyê zirav dike. Ji bo ku egoîzma xwe têr bike, heta dawiyê jinê bêhêz dike, bêvîn dike, tîne rewşekê lêyîstokekê û “seyê xemlê” yê efendiyê xwe. Ji ber ku têr dibe, ji vê jî kêfxweş dibe.

Her biçe di pêşketina hemû civakên çînî de rewşa wiha ye. Bi qasî ku civaka çînî pêş ket, hêz bi giranî di zilam de kûr dibe. Bi qasî ku hêz di zilam de kûr bû, di hêza jinê de wendabûneke gelekî mezin derdikeve holê. Em vê hîn jî zelal bikin. Weke tê zanîn bi taybetî di civakên klan ên seretayî de –ez bawerim qada vê herî baş pêk aniye Mezopotamya ye- hêza jinê ya di pêvajoya ji komkirinê derbasbûna hilberînê de bênîqaş e. Di destpêkê de olan, bi rengê xwedawendên jin raveya xwe ya destpêkê dîtine. Ew navê ku hîn jî gelekî bi bandor e, di Kurdî de tê wateya stêrk a Îştar di hemû zimanan de heye. Di roja me de star “stêrk” xwedawendiya jinê rave dike. Ev xwedawend di rastiyê de xwedî risteke dîrokî ya wisa ye. Destpêkê afirandêra civaka niştecih a destpêkê ye. Em ji damezrandina civatên gund ên destpêkê bigrin, pêvajoya herî girîng a şoreşa civakbûnê di asteke mezin

de li derûdora çalakiya jinê bi pêş dikeve. Divê mirov vê yekê qebûl bike. Mirov dikare pênaseya xwedawend Îştar wiha bike.

Tê wê wateyê ku civaka jinê di vê pêvajoya damezrandina destpêkê de mezinbûnekê temsîl dike. Pêvajoya piştî wê derbasbûna civaka çînayetiyê ye û derbasbûna civaka çînayetiyê jî di rastiyê de derbasbûna serdestiyeke zilam e. Pêşketina di serdestiya zilam de ew qasî bêsînor bûye ku hemû xwedayên piştre zilam in. Di rastî de tu xwedawendên jin nemane. Hemû împarator zilam in. Weke îstîsna gelekî kêm jin hebin jî, ew jî jinên weke zilam in. Ji sedî nod û nehê hemû fermandaran hemû bûrokratan zilam in. Bêguman ev jî serdestiyeke bêhevseng nîşan dide. Bêguman li gel ku pêwendiyeke vê bi çînayetiyê re heye, her hal gotina tenê rastiyeke pêşketina mirovahiyê ye, dê nepixandî be. Ango gotina ger zilam serdest nebe jiyan nabe, bi serê xwe tê wateya esasgirtina zîhniyeteke çewisîner û dagirker.

Ez dihizirim ku divê sosyalîzm bi vê re pêwendîdar be. Heta divê li hemberî vê be. Weke tê dîtin, di şêwazên me yên hizirandinê de û şêwazên me yên jiyanê ku çavkaniya xwe ji vê digre de azadî heye. Ger emê di sosyalîzmê de israr bikin, divê em tê bigihên ku xistina ji hêzê ya di asta jinê ya ku ji dîrokê hetanî niha hatiye pêşxistin ne xwezayî ye. Em dibînin ku ev bi pêşketina civakî ve, bi cureyê pêşketina çînî ve girêdayî ye û di roja me de jî ketiye rewşekê ku bûye çavkaniyeke pirsgirêkan a gelekî mezin. Ez di wê baweriyê de me ku ev qasî pirsgirêk werin çareserkirin dê şoreş kûr bibe û divê mirov ew bêhevsengiya di navbera jinbûna zêde ya jinê û zilambûna zêde ya zilam rabike. Bi qasî pirsa zilam divê bibe zilamekî çawa pirsa divê jinek bibe jineke çawa jî ji bo min sotîner e. Ji ber ku dîrok pêwîstiyê dibîne ku em vê pirsê bikin. Di heman demê de di Kurdistan'ê de bi taybetî rewşa zilamê hatiye xistin zêdetir ez kişandime vê pirsgirêkê. Min got ku gelê Kurd gelekî ku hatiye pîrekirin e. Hindek dixwazin vê li dijî me bi kar bînin, di rastiyê de wateya vê ev bû. Ji ber ku ji dîrokê hetanî niha ji ser serê gelê me her dem dagirkirin û desteserkirin kêm nebûye gelekî me yê ku bi her dagirkeriyê ve ango bi her zorbeyiyê ve, bi her despotî -ku ev jî

hindekî dişibe zilamê serdest- ve girêdayî maye heye. Di vê wateyê de min got şibandine jina kole û ev watedar e.

Di vir de dema ez derbasî pirsa “di vê de rista zilamê Kurd çi ye?” dibim, min dît ku rista zilamê Kurd di rewşeke dilêşiyê de ye. Di wateya klasîk de jî min dît ku ev zilam naşibe zilamên netewên din. Hin aliyên wî gelekî cuda ne. Zilamê ku di bin bandora pergalên çewisînêr de ne, êşa vê hemûyî ji jinan û zarokan derdixin. Dîsa balkêş e, dixwaze çavkaniya hemû hezkirina xwe jî di vir de bibîne. Ango him lê dide, him hez dike û him jî rondikan dirijîne. Kesayetekî gelekî bi nakokî. Dixwaze hez bike dikuje, di şêwazê hezkirina wî de kuştin heye. Ji bo zarokên wî jî ev wiha ye. Min ev zilam gelekî neçar dît. Bi qasî ku min neçar dît, dahûrandina zilam jî ji bo min weke bi qasî dahûrandina jinê girîng xuya kir. Di rastiyê de pirsgirêkê ji pirsgirêka jinê zêdetir weke pirsgirêkê zilam jî dahûrandina min girîngiyeke mezin dide jiyîn. Vê di gelek bîrdoziyan de wiha danenîne holê. Ji ber ku gelek bîrdozî xwedî serdestiya zilam in, zêde pêwîstiyê nabînin ku zilam dahûrînin. Ger kesayeteke sosyalîst a kûr nebe, zilam zêde cih nade hizirandinên ku desthilatdariya xwe bixe xeteriyê. Naxwaze xwe zêde bike mijara rexneyê. Ev rewş nêzîkbûneke ku di zilam de gelekî hatiye pejirandin e.

Rewşa min hindekî cuda ye, ji ber ku min qutbûna ji zilamê klasîk di asteke pêş de pêk aniye, Ez bi wêrekî zilam rexne dikim û dadihûrînim. Bêguman ev taybetiyek e. Ji ber ku min jinê jî ji zilamê asta klasîk de him qut kiriye, him jî di azadiyê de riyeke girîng dayê, divê mijarê de jî nêzîkbûnên min gelekî azad bûne. Ez pirsgirêkê di çarçoveyeke gelekî dînamîk de bi dest digrim û dixwazim hindek têgehên nû bi pêş bixim. Têgehên weke ji kuştina zilam em bigrin, bi heman rengî ji nû ve afirandina jinê û kuştina zêde jinbûnê bala min dikişîne. Tenê di asta têgehan de ne, em di nava hewldaneke weke artêşbûna jinê de ne. Ev pêşketinên ku gelek lê şaş dimînin, heta rê li ber bertekên mezin vedikin in. Bêguman ev berhema feraseteke kûr e. Her çi qasî cihê wan ên xwe bi xwe hebe jî di rastiyê de ji bo bingehê şêwazê jiyana nû bikaribe van hemû rexneyan pêşwazî bike,

were avêtin afirandina zemînê gavavêtineke ku xwe dispêre wekhevî û azadiyê neçariyek e. Her diçe plan û bername li ser vê bingehê tê pêşxistin. Ji ber wê jî dema em ber bi civaka nû ve diçin, tişta ku divê her kes bizanibe di vir de jî tê xwestin ku planeke pêşketî derbasî jiyanê were kirin. Bi taybet divê kadroyên me vê yekê bizanibin. Ev him gelekî girîng e, him jî gelek karên ku em bikin piştî şoreşê ne, di serî de çareserkirin e. Di vê mijarê de weke ku xeletiyeke dîrokî neyê kirin, ferasetek jî gelekî xwedî bandor e. Berê dihate gotin, "pirsgirêka netewî, pirsgirêka jinê piştî sosyalîzmê tê çareserkirin." Di rastiyê ev yek ne wiha ye. Ger ev pirsgirêk kêlî bi kêlî weke rojane neyê çareserkirin, ne şoreşa sosyalîst dibe, ne netew rizgar dibin, ne jî zayend rizgar dibin.

## Jiyana rast li ser bingehê bihevrebûna herdu zayendan ve çêdibe

- Birêz Ocalan di rastiyê de çareseriyên ku we anîne gelekî balkêş in, çareseriyên ku bala gelên cîhanê jî gelekî dikişînin. Em dixwazin nêzîkbûnên zilam hindekî din vekin. Gelo 8 Adarê ji bo zilaman çi rave dike? Di heman demê de tiştê ku 'zilam divê ji 8 Adarê fêm bike çi ye?' danîna holê hîn dê sûdwer be. We di axaftina xwe de got, we jin ji zilam qut kiriye û di rastiyê de ev qutbûna di navbera zayendan de dê gihandina hev jî bîne. Naveroka vê gihandinê hindekî vekirin û naveroka têgeha "kuştina zilam" hindekî din xuyakirin dê hîn sûdwer be.

**Rêber Apo: -** 8 Adarê ji bo zilam zêde tiştekî rave nake. Bi asta heyî ya zilam ve 8 Adarê hebe nebe xwedî wateyeke ku weke diyariyekê ji jina ku xapandiye re bikire ye. Hêza gelekan jî têra vê nake. Ez bawer nakim ku zêde pirsgirêka zilam a mijara 8 Adarê de hebe. Min feraseta xwe jî diyar kir. Ger zilam bi taybetî bi şoreşa me ve girêdayî bi jinê re pêwendîdar e bêguman di pêvajoyeke wiha de divê pêwistiya cidîbûnê derbixe zanebûnê. Ev kar jî zêde weke ku ez ji malbata xwe û ji derûdora xwe fêrbûme ve nameşe. Wisa bi jinê re bûn nabe. Yan jî zilam di van rojan de lêpirsîneke

weke “ez jî nikarim bibim zilamekî weke berê” zêdetir li ser xwe pêk bîne. Ez vê pêşniyar dikim.

Hindek hevalên me ji zû ve zilam an jî jinê dixwazin, bi taybet zilam jinê dixwazin. Divê were zanîn ku di van mijaran de hem di asta dahûrînê de şerekî me yê mezin heye, him jî planên me yên bi şer re û bi jiyana azad re girêdayîne hene. Heta ku ji van re çareserî neyê anîn, gerîna jinê ya zilamekî bi dizî, hela bi xwe spartina erkên xwe yên klasîk û hêza xwe vala ye û ev yek xeter e. Di heman demê de hindek jinên kole, zayenda xwe û zayendîtiya xwe hindekî firsend dibîne û vê li nêvengê ferz bike jî xeter e. Ez di vê baweriyê de me ku divê mirov di van rojan de zêdetir li ser van mijaran kûr bibe. Ger ev pirsgirêk we tengav dike be, çareseriyên ku hatine pêşxistin hene.

Divê mirov nebêje şerê jinê yan jî li ser vê bingehê şerê jiyanê û derbas nebe. Kar cidî ye, jiyana rast li ser bingehê bihevrebûna her du zayendan ve çêdibe. Lê belê gelo bi hevrebûneke çawa be? Dema em li rastiya me ya civakî temaşe dikin, em dibînin ku ev bihevrebûn bihevrebûneke ku perîşan e û hêzê dide wendakirin. Weke ku keçikeke panzdeh salî çawa ku serê xwe bixe nava hêlîna mozan, xistiye nava malbatekê. Zilam jî hatiye rewşeke ucûbe ku di temenên herî zû de hemû feraseta namûsê, hemû zilamtiya xwe di serdestiya li ser jinê de dibîne. Di wan temenan de êdî lêgerîna xwe ya ne welatekî xwe, ne jî jiyaneke xweşik a ku derveyî jin û zarokê xwe bihizire nîne. Berovajî tenê ji bo zikê xwe têr bike, li ber deriyê dagirker dê çil teqleyan biavêje. Heta di hatina vê rewşê ya cerdewanan û nokerên di civakê de û xayinên herî navdar jî, sedema xwe ev rewş e. Ev encamê ku ferasetên wan ên ku jiyan û malbat avakirinê ji wan re aniye. Ez van gelekî baş dibînim.

Ez mirovekî welatparêz im. Ji bo min destpêkê mal ne, destpêkê pirsa welat derbasdar e. Ji bo min feraseta çawa dibe bila bibe bila jiyanek hebe ne, berovajî jiyana azad esas e. Ez namûsê jî rûmetê jî di vir de dibînim. Heta ku ev nebin ji bo min ne malbat malbat e, ne jî qesrên min jî hebin qesr in. Ev tu wateyekê rave nakin. Em di nava nakokiyeke dijwar de ne.

Mixabin tiştê ji dest zilamên me tê, ji sêzdeh salî hetanî bîstûpêncên xwe tenê ji bo pereyên qelend, ji bo pereyên cihêz an jî ji bo jinekê bi dest bixe diyar bi diyar gerîn e. Zilam çil teqleyan diavêje xwe cur bi cur difiroşe, keçekê dibîne. Ya ku dîtiye jineke nezan e, tu tiştekî wê ji zayendîtiya xwe ya çors zêdetir bide zilam nîne. Çend zarokên ku çavkaniya pirsgirêkan e zêdetir, nikare tu tiştî pêşkeş bike. Ne ji bo biaxive zimanê wê, ne felsefeyeke wê ya di derbarê jiyanê de nîqaş bike, ne jî ji bo çareserkirina her kîjan pirsgirêkê hêza wê heye. Tu taybetmendiyeke wê bêzimanî û bi zilamê xwe ve ji herî şûn de girêdayînê zêdetir nîne. Jineke wiha zilam jî, xwe jî dê bifetisîne. Ne gengaz e ku wijdana min vê hilgire. Divê ew derûdorên ku bi me re pêwendîdar in destpêkê vê yekê bibînin. Hindek me weke “wê jiyana bi hev re çawa û kengê çêbibe?” rexne dikin, li şûna ku vê pirsê bipirsin “gelo emê çawa dest ji vê jiyana xeter berdin?” li xwe bipirsin. Divê ez eşkere diyar bikim ku ger em ji hevalên me yên herî navdar jî weke “ha ji te re keçikeke xweşik a cîhanê, gelo tuyê çawa bijî?” bipirsin, nikare dayîn û stendina nefesa xwe jî sererast bike, dê matmayî bimîne. Kesayeta wî bêrêxistin e, bêplan e, dibe ku ajoyên wî yên zayendî, yên çors rabe ser piyan. Li gor min ev jî parvekirineke di asteke ketî de ye. Nikare bi jinekê re biaxive jî. Karîna wî ji bo têrkirina ajoyên ji aliyê çors ve ye. Lê belê ev şermeke mezin e.

Ez dipirsim gelo hun ji bo çi destpêkê weke mirov li hev nayên? Em dibêjin pirsgirêkên we yên gelekî bingehîn hene. Yek xaleke hêlîna me ango welatê me, malên me ku destên dijmin lê neketiye, tenê destên wî jî ne, yek xalekî ku di bin potînên wî de nehatiye perçiqandin nîne. Ev gelekî zelal e. Cendermeyek, polîsek weke ku dixwaze dikare bikeve her malbatekê, weke ku dixwaze dikare nêzîkî keç û jina zilam her cureyê heqaretê bike. Ev rastiyeke vekirî ye. Di vê rewşê de zilamtiya zilamê me, jinbûna jinên me çend qirûşan dike? Divê em ji bi destgirtina wêrek a rastiyan û ji nîqaşkirinê netirsin.

Ji bo min têkîlî pîroz e. Ji bo min têkîlî gelekî taybet û gelekî xwedî nirx e. Lê belê roja diduyan dagirkerek were û têkîliyê bi erdê re bike yek. Di

wateya çors de pêwîstî bi dagirker re jî nîne. Jixwe hun bi erdê ve dixuşikin. Tu sedemeke xwe ya aborî, çanda bi hev re jiyînê û tenduristiya xwe nîne. Ev pirsgirêkên cidî ne. Dema em bibêjin çawa bijîn, divê em bipirsin ka gelo em dikarin di van mijaran de çi bikin? Tiştê ku hatiye serê me çi ye? Ez dixwazim hemû keçikên me û zilamên me yên ku wisa bawer dikin asta rûmeteke diyar dijîn, li ser vê bi girîngî bisekînin. Zêde tiştekî ku ez ji yên di bin statûya koletiyê de ne re bibêjim nîne. Lê belê divê di refên me de lêgerînên jin û zilam ên bêrêgez û firsendkar nebe. Pirsgirêkên me giran in. Wisa ye ku me şer jî ji bo vê çareser bikin xiste rojevê. Ev pêwîst e di destpêkê de were fêmkirin. Ez naxwazim zêde vê mijarê jî vebikim.

Ev rastiyeke gelekî balkêş, tu kes nikare înkar bike û her kes dijî ye. Him jî rastiyeke ku bi rengekî tune dike û xilas dike dijî ye. Bêguman ez vê weke çarenûsekê nabînim û ez bawer dikim ku evê were derbaskirin. Ez hêza derbaskirinê jî di me de dibînim. Ez şoreşê ji bo vê weke amrazekî herî girîng dinirxînim. Tam bi hostetiyekê vê jî pêwîstiyên wê bi cih tînim.

Ez van dipirsim û dixwazim ji bo çareseriyê van pêş bixim. Kuştina jinê jî, ya zilam jî ya ku li ser bingehê pergalê ku ji sedsalan hetanî niha em hînbûne, bêguman ez wateya fîzîkî de vê diyar nakim. Astên wan ên moral, astên wan ên hest, astên wan ên têkîliyê xwe spartibe zagonan jî ne rewa îlankirin! Ne wiha zilam, ne wiha jin dibe. Ez bawer dikim ku ev karê ku destpêkê ez bikim e. Ji bo ku hindekî din baş were fêmkirin, em dixwazin tevgereke hevberdanê ya giştî bi pêş bixin. Divê kesek ji vê encamên şaş dernexe. Dîsa vê kesek îstîsmar neke. Ji zewacên heyî re –ev dixwaze li hemberî zagonan be, dixwaze bi zewicandina meleyan be- rêza min heye. Ez nabêjim yêkîtiyên bi vî rengî birûxînin an jî belav bikin. Lê belê ger ev zewac weke îşkenceyê be, mafê her kesî ya belavkirina vê heye. Ango nêzîkbûneke min a kevneperest a weke kuştina zewacê nîne. Ez di ferasetê de behsa tevgera hevberdaneke giştî dikim. Heta yên ku zewicîne, yên ku sozdar in divê destpêkê xwe ji ferasetên klasîk rizgar bikin. Ger pêwîst bike, zewacên wan a fermî dikare berdewam bike, lê belê di cewher de guhertinekê afirandin û di vê wateyê de pêkanîna tevgereke hevberdanê ya

giştî ji min re gelekî balkêş tê. Ji bo ku her kes kêm zêde nesîbê xwe bikaribe ji şoreşê bigre, divê vê yekê bike. Ya yekemîn ev e.

Ya duyemîn, wateya bûyîna vê tê wateya kuştina jinîtî û zilamtiya klasîk jî. Ev tê çi wateyê? Divê zilam ji xeyalê di asta zayend û zayendîtiyê ku xwe zilam dihesibîne û li ser wê ava kiriye, ji darezînên nirxên exlaqî û –heta ezê nebêjim hizir- ji ber hizirandina xwe rizgar bibe. Kuştina zilam ev e. Ango ji bo ku li cihekî destpêka jiyana nû were kirin, divê hindek tişt werin kuştin. Ji bo jinê ev hîn derbasdar e. Bi jinbûna heyî ve tu tişt nayê rizgarkirin. Heta li gor min jin keseke ku divê herî zêde li jinbûna heyî, zilambûna heyî jî bide ye. Ji ber ku ew bi serê xwe ji bela anînê zêdetir tu nirxê xwe nîne. Ev her tiştî bêwate û bêhêz dikin. Jinbûna wê li serê wê bûye bela veguheriye rewşeke ku bûye îşkenceyeke tirsnak. Jinbûna ku pêşkeşî zilam dike, zilam jî dibe felaketê. Her diçe tenê ji bo hemû civakê di wateya çors de zuriyetê berdewam dike.

Weke civakî di rastiya me de bi taybetî gelo zuriyetê divemirîne yan zuriyetê berdewam dike, girîng e. Di asta netewî de vemirandina zuriyetê, di asta welat de bêwelatkirin heye. Mirov nikare behsa asta azadiyê jî bike. Ger ev weke rasteqînî were dîtîn, ev rewş divê ku hindek aliyên birîna me ya kûr, bi operasyonên giran ve, perçe perçe were qutkirin. Li gor min aliyê me yê zindî dê bimîne. Aliyê zindî aliyên ku werin afirandin hene. Bêguman ez li ser van jî hûr dibim. Min dixwest ku bi min re her kesek lêhûrbûneke diyar bijî. Ev li gor min girîng e. Ev çalakiyeke ji nû ve afirandinê ya ji asta hizrê heta asta estetîk, ji asta leşkerî heta asta werzişî divê giştî were destgirtin e û ev jî ji min re balkêş tê.

Ez jinê di refên me de li ser vî bingehî bi dest digrim, zilaman dixwazim li ser vî bingehî nû bikim. Em ji teşekirina fîzîkê bigrin, heta divê giyana wê, şêwazê axaftinê û her diçe hizirandinê wê çawa bibe, ez weke piralî dest li jinê werdidim. Ev yek qet şerm nîne. Di vir de ji şermbûnê zêdetir divê mirov gelekî wêrek be. Pêwîstiya bi cih anîna erkeke jêneger heye. Ne erk jî rewşeke weke afirandina jiyanê li pêşberî me disekine.

Weke tevdîrê destpêkê ku min girtiye, mînak gelo artêşbûna jinê çi bû? Herî kêm artêşbûna jinê ev yek pêk anî. Jinê wisa hizirî "tê wê wateyê ku ez jî dikarim çekdar bim, ez jî dikarim li ser lingên xwe bisekinim, çiyayên ku berê min nediwêriya, ez dikarim serbixwe tê de bimînim. Dikarim biaxivim, dikarim bibim xwedî hêz." Ev ji bo jinê nûbûnên hetanî dawiyê girîng in. Her çi qasî wateya wê derneketibe zanebûnê jî gelekî zelal e ku her diçe ev jinê bihêz dike. Herî kêm fîzîka jinê bi pêş dikeve. Jina ku di panzdeh salî de, bîst salî de weke ku vediguhere pîrekê niha demê tê sî saliya xwe dîtineke balkêştir ava dike. Dîsa di wateya manewî de hêzê bi dest dixe. Tenê li gel me ne, gelek qadên navnetewî de jî pêşketina jinê ya di vî alî de diyar dikin ku balkêş e. Ev li ser israra me çêbûye.

Dema jin dibe mijara gotinê %99.9 feraseta zilamê klasîk dibêje, "hestên min, nêrînên min, namûsa min." Dibêje "divê bibe ya min, min, min." Ev felsefe gelekî xeter e. Ji ber ku jina %99.9 bi her tiştê xwe ve ya te ye, gelo dê di civakê de bi kêrî çi were? Dê di welatparêziyê de çi bike? Di jinê de tiştekî ku ji bo welatparêziyê, azadiyê, rêxistinê, şer, heta ji bo jiyana aborî û civakî bike nehatiye hiştin. We jin xistiye nava kefa destê xwe, weke lêmonekê guvaştiye yan jî weke vexwarineke her dem vedixwin. Bi rastî jin jî wiha ye. Tu tiştê jineke wiha bide civakê û netewê nîne. Tiştekî ku zilam jî bide nemaye. Dema zilam cinetê derbas dike, her carê jina xwe dikuje jî, ji ber vê felsefeya kuştinê ye. Ger bal were kişandin, evîndarên me xwedî karekterekê ne, ku herî zêde evîna xwe dikujin. Ev rastiyeke bi êş e. Ji ber sedemê feraseta xwe ya felsefî li wê derê mezinkirin û bihêzkirina jinê nîne. Tunekirin heye, piştre jî dê tunekirinê weke sembolîk bi xençerê ve bi encam dike.

Qet nebe tevdîrên ku me girtine pêşiyê li vê digre. Ev girîng e. Jin di refên me de heta dawiyê jêhatiyê qezenc dikin. Sedemeke herî girîng a balkêşiyê jî ev e. Lê belê ev ji bo me têr nake. Ev avakirina îskeleta kar e. Dagirtina hundirê vê xebateke ku divê em ji vir û pê ve zêdetir pêş bixin e. Di vê wateyê de em hetanî estetîkê cih bidin. Yek jî di nîqaşên me de nêvenga giran a şer heye. Vê nêvengê û van xebatan gihandina hev jîrbûn û

ziraviyê dixwaze. Ez li ser van disekinim. Guhertina ferasetan ji şerdayînê zehmetir e. Hînbûneke giran a ji vî alî ve dibe ku kevneperestiyeke herî mezin e. Ez dixwazim vê bi hewldanên gelekî azad ve bişkînim. Carna jina di refên me de jî bi zilam re dibe yek û direve. Ango sedîsed malbûyînê qebûl dike. Zilamek xwe dispêre erka xwe derfetê dibîne, heta ku bikuje li ser jinê pêkanînekê pêş dixîne. Divê mirov van bibîne û derbas bike. Heta ku em neyên derbaskirin ji pirsa "çawa bijîn?" re bersiv nayê dîtin.

Her diçe ez li ser van bi rengekî berfireh disekinim. Ez bawerim ên ku kêm zêde ji vî karî teng dibin jî pêwîstbûna vê qebûl dikin. Weke berhemeke xweşik a şoreşa me pêşketin derdikeve holê. Ez bawer dikim ku gavên hatine avêtin gelekî balê dikişîne û îlhamê dide her kesî. Lê belê divê mirov zêdetir li benda encamên van be jî. Ez di wê baweriyê de me ku, hikmê misoger ji aliyê him zilam û him jî jinê ve her biçe ji aliyê hêzên pêwendîdar ên derûdora me ve were dayîn rastir dibe.  Di rastî de em hîn jî xebatên laboratuarê ya vî karî dikin. Hîn jî tam berhemên wê derneketine holê. Lê belê encamê vê yê destpêkê girîng e, balkêş e û erênî ye.

- Birêz Ocalan mijareke din a ku em dixwazin hîn bibin heye. Di navbera Rêbertiya PKK'ê û bi taybetî di mîtolojiyê de navbera hindek xweda û xwedawendan de girêdaniyek tê avakirin. Di navbera Rêbertiya PKK'ê û Prometheus de pêwendiyeke kûr tê avakirin. Gelo hun vê çawa xuya dikin?

**Rêber Apo: -** Em pênaseya Prometheus bikin, wê demê xwedayekî weke Zeus heye. Agir hêzê rave dike û ew jî di destên Zeus de ye. Kesayetê ku jê re Prometheus tê gotin, ew hêza di destên xwedayan de ango agir didize, dixwaze bide gel û vê jî bi ser dixe. Piştre Zeus bi vê hêrs dibe û wî her dem di bin îşkenceyê de dihêle. Ez bawerim xwedî raveyeke wiha ye. Dizîna agir a Prometheus û dayîna dest mirovahiyê bûyereke mezin e. Di giştî de agir germ dike û jiyanî ye. Vê di wateya desthilatiyê de şibandina min, mijara gotinê ye. Ha di destên xwedayekî de be, ha dîktatorekî de be heta ha destên zilamekî de kûr bibe, li gor min hêzên desthilatdar weke hev in. Xwedî saziyeke jor gelan, zayendan û mirovan in.

Desthilatdarî, ji koma rêveberiyê ya ku berê ji xweda dirêjî siltan piştre jî ji siltan dirêjî heta derûdorê wî dibû re digotin. Niha jî ev yek wisa ye. Her çi qasî komar û demokrasî were gotin jî, di rastiyê de hêz di siltan de, di olîgarşiyê de, di dîktator de û derûdora wî de weke di asta zilam de jî, di zilam de kom bûye. Dema ez li çalakiya xwe temaşe dikim, tişta ku min kiriye gelekî balkêş e. Ji bo min berê jî digotin, "ev zilam hêzê didize" di nava tevgera me de jî digotin "ev zilam me ji me didize." Rast e min hêz dizî, lê belê gelo min ji kê dizî? Ez hîn jî ji dewleta Tirk re deyndar im, min hêza wê dizî. Min ji zilam jî hêz dizî. Bi taybet min hêza zilam a li ser jinê jî dizî. Ev balkêş e, lê rastiyek e.

Vê rê li ber hindek bertekên girîng jî vekir. Heta weke em dizanin, emperyalîzmê di giştiya cîhanê de min weke terorîstekî yekemîn îlan kir. Ev tê wê wateyê, nîşan dide ku min hindekî hêza emperyalîzmê jî diziye. Dîsa hindek zilamên gelekî sexte hene. Dibêjin, "dê hemû jinan ji xwe re bike mal." Di rastiyê de ev yek jî di wateyekê de rast e, ji ber ku ez serdestiya wan a li ser jinê dirûxînim û didizim. Ev jî dişibe karê ku Prometheus dike. Ez bawerim zêdetir di vê wateyê de erkekî tîne ziman.

Dema ez dibêjim hêzê didizim bila neyê fêmkirin ku ez diziyeke çors dikim. Bi diran û neynokên xwe ve, weke ku bi derziyê bîrê bikolim, bi hostetiyeke mezin û bi şer ve ez hêzê distînim. Ev ne dizî ye, bi destxistina hêzê ye. Cureyê vê yê şer a balkêş hun dikarin ji min bipirsin. Lê belê rast e ku min kêliyekê hêz dizî ye. Mînak niha ez hêzê bi asta nasnameyê ve didim gelê Kurd. Ji ber ku ev gel gelekî bêhêz hatiye hiştin. Piştî vê dixwazim vê hêzê hindekî bi jinan re parvebikim. Ji ber ku ew jî gelekî bêhêz hatine hiştin. Li gel wê dixwazim hindekî vê li mirovên feqîr û yên xwedî kedê ne belav bikim. Mînak ez di refên me de jî naxwazim kesekî xwedî hêz bihêlim. Ji ber ku di nava me de yên ku qet kedên wan nînin, xwestekên wan hene ku xwe bispêrin radeyê û bibin xwedî hêz. Bêguman ev jî nêzîkbûneke xeter e û ev min qet nasnakin.

Kar û îşê me yên ku hêzê bi rengekî neheq bi dest xistine wê ji wan şûnde girtin û careke din wê li xwediyên wê vegerandin e. Kadroyên PKK'ê

bi taybetî vê neçar in, heta mêjiyê hestiyên xwe bizanibin. Piştî wê parvekirina vê hêzê bi dadwerî, bi ked, bi yên ku keda xwe heyî re jixwe cewherê sosyalîzmê ye. Em bi wê re mijûl dibin. Di giştî de dûrbûna ji hêzê ya zayenda jinê heye. Hêzdayîna jinê jî pêwîstiyeke sosyalîzmê û sosyalîstbûyînê ye. Li gel van hemûyan mirov dikare bibêje ku em Prometheusgeriyeke hemdem dikin.

- Birêz Ocalan we di axaftina xwe de got ku, di nêvenga we de yên ku dixwazin vê hêzê di wateya kesayet de veguherînin desthilatdariyê hene. Di wateyekê de we diyar kir ku Zeus hene. Weke we diyar kir Prometheus li hemberî Zeus'ê ku xwedî serdestî û koledariyê ye derdikeve. Gelo we li hemberî wan Zeusan çawa tekoşîn pêş xist, nêzîkbûnên we hatine kîjan astê?

**Rêber Apo:**

- Edî ev karekî ku ez bizanibim e. Ez vê xuya bikim jî ez bawer nakim ku zêde encamê jê derbixin. Ev hostetiyeke mezin, şêwazeke aîdê xwe, tempo, zanebûn, hezkirin, hest û hêrsê dixwaze. Di rastiyê de yên ku hêrs, kîn û hestên xwe yên mezin nebin nikarin vî şerî bidin. Dîsa xeyalên mezin û pratîkgeriyeke gelekî mezin dixwaze. Ango her gaveke ku tê avêtin pîvanên wê dizane wisa diavêje wê dixwaze. Ez bi Zeus' an re wisa pev diçim, dibe ku xweş nebînin. Lê belê ev ji bo min gelekî girîng e. Ez vê dixwazim, bi dahûrandinan, bi her kesî re nîqaşê bikim. Lê belê zêde jêhatiyê nîşan nadin. Li gor min karekî herî girîng a serdemê wiha tê meşandin.

Ez ji karê xwe kêfxweş im. Weke ku ez dixwazim nebe jî ez bawer dikim ku min hetanî niha ev kar meşandiye. Her hal ji vir û pê ve ezê vî karî serkeftîtir bimeşînim. Ango hêzdayîna gelan û zayenda ku tê perçiqandin hêza jiyanê dayîna yên ku li kêlekan û quncikan dijîn xebateke gelekî ez pê kêfxweş dibim e. Ev xebateke xweşik e û dê were meşandin.

- Birêz Ocalan di heman demê de xaleke ku balkêş e tevgera we xwe dispêre dahûrandinên kesayet û zayend. Bi taybetî tê dîtin ku di jin û zilam de di astên cihêreng de dahûrandin tenê kirin. Gelo nêzîkbûna zilam a dahûrandinên ku ji bo wî tên pêşxistin di kîjan astê de ye? Ji ber ku we di

axaftina xwe ya berê vê de diyarkiribû ku ferasetên zilam ên serdest hene, bi hêsanî naşkên.

**Rêber Apo:**

- Zilamên me li ser bingehê xwe dahurînê nêzîk nabin. Ji bo ku vê pêdîviyê hîs bikin divê di jinan de xwedawend bi pêş bikevin. Gelo divê ji vê yekê çi were fêmkirin? Divê jin bibe hêza vîn, zanebûn heta ya dayîna kirinê. Heta ku jinên wiha dernekevin holê hatina ser hişên xwe ya van zilamên me zehmet e. Hele heta ku jin vê jinbûna erzan kirinê berdewam bikin, zilamê me dê hartir bibin. Ez bawerim bersiva herî baş a ji vê pirsê re bi taybetî divê milîtanên jin ên ku di îdîaya azadbûnê de ne, bidin. Bi gotina "bila zilamên me azad bin" ve zilam azad nabe. Gelo ma bi gotina koleyan a "bila efendiyên me mafên me bidin" ve efendî mafên wan didin? Tê gotin "bila efendiyên me dilê wan bi koleyên xwe bişewite" di rastî de erka efendiyan koletiyeke wiha dayîna kirin e. Erkê zilamê me jî bi jina xwe, jinbûna wê dayîna kirin e.

Ji ber wê jî divê weke vîneke binirx jin bi xwe bikeve nava vî karî. Jixwe tişta ku ez dixwazim bikim hindekî vekirina pêşiya vê ye. Divê mirov vê yekê baş fêm bike. Ez vê yekê ji bo kêfa bavê xwe û ji bo xwe têr bikim nakim. Ji bo ku hindek jinan kêfxweş bikim jî nakim. Ez bi girêdayî feraseta xwe ya dinyayê vê dikim. Ev rûmeteke mezin e. Pirsgirêka feraset û jiyanê ye. Di filmên Emerîkî de xebatê di vî alî de hene. Mixabin di vê mijarê de emperyalîzm pêşdetir e. Heta bûrjûvaziyê ji vî alî ve jî gelek tevdîr girtine. Bêyî ku derfetê bide azadbûna jinê, jin kişandiye nava ehmeqiyeke ku bide gotin "ez çi qasî azad bûm! Ev ji min zêde ye jî." Ango çavên jinê sewandiye. Zilamê li gel me hîn reben û neçar e. Ji bo vê hêza wî jî têr nake.

Mirov ji ku derê ve lê temaşe bike bila bike, pêwîstiya milîtaniya jin a bi bandor li holê ye. Mînak li çiyê jî zilam her dem dibêje "ev jin li serê me giraniyê çêdikin, di şer de zehmetiyê diafirînin" gelo ji bo çi wisa tê gotin? Di rastiyê de di vir de jî fêlbaziyeke zilam heye. Di rastiyê de yê ku jinê giran dike yê ku rista jinê ya di nava jiyanê û şer de înkar dike, zilam bi xwe ye. Giranî li ser vê bingehê derdikeve holê. Ger jin jî pîvanên jina kole ya

klasîk derbas neke, dê xwe bîne asta giraniyê. Jin her dem li bendê dimîne ku zilamek were bi milê wê bigre û dixwaze wê bixe malê xwe. Vaye rewşa ku jê re giranî tê gotin, wiha ava dibe. Dema ku ev yek wiha nebû, wê demê ev derdikeve holê. Gelo em çîroka kevin an jî şêwazê xwe yê klasîk çawa bigihînin hev? Vaye destpêkê ev pirs têne holê.

Ne gengaz e ku ez di vê mijarê de vala bimînim. Ew jina ku we gotiye “giraniyê çêdike” heta ber devê deriyê azadiyê hatiye. Zilam dê ji bo jinekê çil teqleyan biavêje, di deriyên biyaniyan de ji bo pereyê qelendekê peyda bike, ji bo odeyeke çar dîwarî peyda bike, bi temenekî dixebite. Dema ku bi ev qas jinên ku nêzîkî azadiyê ne re bi hev re ne gelo çawa dibe ku jin di jiyanê û di şer de giraniyê ava dike? Di vir de fêlbaziyek heye. Destpêkê dê jinê bixe vê rewşê piştre jî bibêje “efendiyê te hat, begê te hat, stûyê xwe xwar bike, ewê te rizgar bike.” Ev nêzîkbûnên klasîk in û kirêt in. Divê mirov van helwestan derbas bike. Destpêkê jin divê bi rengekî balkêş nîşan bide ku divê mijarê de ne giraniyek e, him şer bi pêş dixe û him jî jiyanî ye.

Di vir de me xwest kesayeta Zîlan dahûrînin. Rexmî ku weke fîzîkî di tengasiyê de bû, mirov dikare bibêje ku ne di jiyanê de, ne jî di şer de giranî ava kir û ev yek hatiye peyitandin. Ev bûyereke ji bo me xwedî nirxeke fermanê de ye. Wê demê ji aliyê zagonên rêxistinê ve, weke ku zêde mafekî zilam tiştekî bibêje nîne. Zelal e ku divê jin jî di rewşa ku giraniyê ava bike de nebe. Jin û zilamê ku bi vê re di nava nakokiyê de ne, nayê qebûlkirin. Herî kêm divê ew ji aliyê nêzîkbûnên me yên rêxistinî ve bi zelalî were zanîn. Rastiya Rêbertiyê di vê mijarê de heta dawiyê xwedî rêgez e û qet nêzîkî tawîzdayînê nabe.

**-** Birêz Ocalan, we behsa Zîlanbûnê û Zîlanê kir. Di axaftinên we yên beriya vê de jî xwedawenda Îştar derbas dibû. Bi taybet em girêdaniya navbera Îştar û Zîlanbûnê dixwazin bipirsin, gelo Zîlanbûn Îştarbûn e? Li ser vê bingehê gelo wateya ku Zîlanbûn dide çî ye?

**Rêber Apo:**

**-** Mirov dikare girêdaniyeke wiha ava bike, ji xwedawend Îştar an jî star –stêrk- ber bi çûyîna Zîlan ve girêdaniyeke balkêş heye. Gelo Zîlan çi kir? Ji

pergalê gelekî nefret kir. Heta bi qasî ku careke din zilamê pergalê neyne bîra xwe, ev zilam înkar kir. Dîsa jiyana ez ez, a ku rêxistinkirinî nîne, înkar kir. Kesayetên ku giraniyê çêdikin, her carê dibêjin “vê dera min diêşe, wê dera min diêşe” di bin navê taybetmendiyên feodal û kemalîst de her dem pirsgirêkan diafirînin, bi erdê ve kire yek. Li hemberî wê hêzeke dijmin hebû. Jiyaneke ku xwe dispêre emperyalîzmê ya li pêşiya jiyanê disekine hebû. Wê ev jiyan misoger mehkûm kir û weke raveya hevgirtî ya van hemû tiştan çalakiyeke gelekî rêxistî, plan û bi hêza xwe ya cewherî ve spartiye pêk anî. Li her cihê xwe amûrên teqemeniyê û sotîner bi cih kir û pîmê agirkirinê girte dest xwe û bi ser armancê de meşiya. Li Dêrsimê bi taybet cihekî ku komkujiya Kurdan lê hatiye pêkanîn, bi ser yekîneya bandoyê ya miziqayê ya artêşa tirk ku xwe nîşandanê dike de ango di ser borazanên komkujiyê de meşiya. Dema ku mirov him wêrekî û him jî fedakariya wê tîne pêş çavan, li gor min dibe ku weke hêzêke çalakiyê ya herî di lûtkeyê de derkete holê û pêk hat.

Dema were gotin “gelo çi pêwendiya vê bi xwedawendiyê re heye?” em dikarin bibêjin ku wêrekî, fedakarî, zeka, ji dilî, qet pirsgirêk çênekirin û serxistin ango serkeftin heye. Ev hebe nebe, taybetmendiyên bingehîn ên ku kesayeta Îştar de jî hene. Ew taybetmendiyên ku aîdî hemû xwedayan in, em li vir jî rastê tên. An jî tê xwestin were gotin, di riya xweda de dixwazin were gotin, di riya xwedawend de, ev yek ferq nake, ev hemû taybetmendî di Zîlan de wiha gihiştine hev. Nameyên xwe yên ji bo Rêbertiyê, gel û mirovahiye hiştine ku divê weke wasiyeta wê werin nirxandin hene. Di vir de dibêje “îdîa min a jiyanê gelekî mezin e, ev çalakî çalakiya jiyana mezin e, çalakiya xweşikiyê ye.” Di nameyên wê de divê li hemberî ku derê çawa were derketin, bi wan çi dayîna fêmkirin çêbibe hatiye nivîsîn. Di vê wateyê de mirov dikare weke manîfesto û kesayeteke him a jiyanê him jî ya şer bibîne.

Bêguman ev yek sembolîk e. Ev tişt jî bi rengekî dilnizmî gotiye, “di vê pêvajoya dîrokî de çalakiya ku ez bikaribim bikim, ev e.” Li gor min ev çalakî di wateya destpêk û dawîbûnê de xwedî nirx e. Nayên teqlîtkirin jî.

Mezinbûna xwe jî ji vir digre. Nirxandineke wiha rastir e. Min wiha şîrove kir, weke encameke vê şîroveya min jî ev dê weke ferman were dîtin û tiştê pêwîst dê were kirin. Ez bawer im ez li ser vê bingehê hindek karan dimeşînim. Ango di vê wateyê de karê ku ez dimeşînim, xwedî nirxekî bilind a sembolîk e û hindekî jî pêwîstiya karê xwedayî ne, bi cih anîn e. Hin Misilman û Xiristiyan dibêjin, "em jî di riya xwedê de ne" mirov dikare bibêje ez jî di riyeke wiha ya xwedê de me. Ez nebêjim pêxemberî jî ez di nava nêzîkbûnên ku dişibe wê de me. Ez dixwazim karê ku wan ji me re hiştiye bimeşînim. Divê çalakiya min û ferman wiha werin fêmkirin. Bi taybet di vê wateyê de teqez were pêkanîn. Ji ber ku li hemberî fermanên xwedayan derketin, tawaneke mezin e û xwediyê xwe dişewitîne. Her tawanekê bikin, lê belê tawana li hember van fermanên di vî alî de nekin.

## Emê bi şoreşa mezopotamyayê ve jinê ji nû ve jîndar bikin

**-** Birêz Ocalan, di serî de Îştar di rastiyê de dema em bi giştî dîroka xwedawendan lêkolîn dikin, em dibînin ku di pêvajoyên nenîvîskî de hema hemû xwedawend ji Mezopotamyayê ango ji Rojhilat a Navîn derketine. Di rastî de mirov ji vir derbikeve rê, gelo mirov dikare bibêje gelê Rojhilat a Navîn, jinên Rojhilat a Navîn nêzîkî serxistin û serketinê ne? Ger li ser bingehê rast nêzîkî xwe bibe, gelo dikare asta serxistin û serkeftinê bi dest bixe?

**Rêber Apo:**

**-** Tê fêmkirin ku ev der welatê dayik a Îştaran e. Weke tê diyarkirin him kêdîkirina civaka mirov, him hilberîna genim di vê herêmê de dest pê kiriye û ev jî bi destên jinê çêbûne. Ji ber wê jî dê bibe xwedawend, bi rengê xwedawendiyê bigihê têgeha xwedayîbûnekê. Hemû zanistî, lêkolînên erdkoliyê piştrast dikin ku ev yek wiha ye. Lê belê dema em tên roja me mixabin tişta ku li şûna Îştar maye, jinên herî paşketî û herî neçar ên cîhanê, malbat û civakên ku xwe dispêrin wan. Her çi qasî li her aliyê di vê yan jî di

wê astê de asteke azadiyê hebe jî li vê derê nîne. Ji ber wê jî cihê ku xwedawend jê ji dayik bûye, veguheriye xirabeyekê. Weke ku ji jiyanê şopek nemaye. Em dixwazin vê bi şoreşa Mezopotamyayê ve careke din zindî bikin.

Di giştî de ev herêma ku weke dergûşa mirovahiyê tê binavkirin, niha gora mirovahiyê ye. Tişta ku em dikin kolandina vê gorê ye û lê rasthatina zindiyekê ye. Taybetmendiyeke tevgera me jî derizandina gora ji betonê ya stûr vê betonê parçe kirin û bûyîna xwediyê pênaseyekê bi rengê vejînê. Di giştî de mirov dikare PKK'ê weke raveya berxwedana mirovên li Mezopotamyayê jî binirxîne. Ji ber wê jî di vê gorê de di herî serî de Îştar hene, Zenubya hene heta Kleopatra hene, Semîramîs hene. Meryem, Fatma, Eyşe, Zeyneb hene. Ez bawerim gelek jinên bi hêz ên dîroka dinyayê şahidê wan e hene. Em di nava mijûlbûneke weke gorên van vekin û bipirsin gelo dê li vir ji nû ve zindî bibin de ne. Hêvî nayê qutkirin.

Axên Mezopotamyayê bi deremet in, li gor min hîn jî li wir ax, av û roj bi rengekî herî berhemdar digihên hev. Ev jî berhemdariya herî mezin diafirîne. Ev ax qadên ku fêkiyên wê herî berhemdar in. Mirovên wan dikarin bibin xwedî jiyaneke herî xweşik. Xwezaya wê hindekî derfetê dide wê. Niha bi navê xwedayan sextekar mane, hemû bûne mûmîn, softa jinên wan jî hatine rewşekê ku her dem bibin belaya seriyan. Weke ku ji xwedawendê şopek jî nemaye xwedayê bi giranî zilam in, li vir êdî xwe bi nehatina zanîneke mezin û softetiyê ve pêçandine. Em dixwazin van hemûyan çareser bikin. Ev jî karekî baş e. Vejîneke diyar heye, divê mirov vê vejînê her biçe bike xwedî ast. Vê gavê di rewşeke komayî de ye û em di nava emeliyatê de dihêlin. Ev weke xebateke atolyayê, weke xebateke laboratuarê ye. Dîsa di şertê herî giran de tevdîrê wê hatiye girtin. Li ser maseyan di rewşa operasyonekê de digrin dest. Em hindek rewşên hêvîdar diyardeyên zindîbûnê dibînin. Bi hostetiyeke mezin ve em aliyên bûne term hindekî zindî dikin –ev ku karên xwedayî ne- em vê dikin. Karê xwedayan di heman demê de karê mirovan in. Bi zanîna wiha van tiştan ve ez hindek xebatên di aliyê li ku derê ava cewher pêwîst be, li wir wê didim, li ku derê

hêvî pêwîst be, li wir wê didim, ji bo ku derê bihêzbûn pêwîst be hêzê didim wir û dimeşînim. Kêm zêde ez van xebatên xwe diecibînim. Lê belê ne gengaz e ku bi tena serê xwe ez dîrokeke bi hezaran salî hatiye xistin vejînim.

Gelek qurban hatin dayîn. Ji jinan û zilaman qurbanên herî nirxdar hatin dayîn. Ev vala neçûne. Li ser xwîna wan herikîna jiyanê dê teqez pêk were. Jixwe di vê wateyê de ez xwe di heman demê de weke hêza jiyanî ya şehîdan dibînim an jî di bin diruşmeke bi rengê erka min a bingehîn jiyanîkirina şehîdane de, didim şerkirin. Ez dikarim diyar bikim ku hêvî gelekî pêş ketiye. Ger pêwîst bike ji bo vê şer, pêwîst bike li ser mijarên jiyanê yên herî azad ez bi hewldaneke mezin de radiwestim. Pêşketin hêviyê didin. Bila kesek nekeve nava xeyalan. Heta ku şervantiyeke gelekî mezin, tekoşîna jiyana azad negihê hev, ji bo vê hostetiyên vê neyên nîşandan, em nikarin behsa serxistina misoger bikin.

Ger em bi qasî hêviyê derfetên wê jî bi serkeftî bigihînin hev, bi qasî pêwîst bike şer bikin û bi qasî pêwîst bike jiyanî bikin, gihiştina van axan dê careke din li rojên xwe yên balkêş, ne bêderfet e. Niha ez bi xeyal û heyecana wê ya mezin ve dimeşim. Sibê du sibe bi qasî ku ji aliyê madî de jî derfetên ser xistine pêş bikeve dê roj bi roj pêkhatina xeyalan jî gengaz be. Ev ax careke din bi qasî ku bibe dergûşa di dema berbanga mirovahiyê dê were rewşa axa wekhevî û azadiyan, dîsa hatina rewşa dema berbangê jênerevîn e. Ez vê wiha dinirxînim û ji berbangê derketina ronahiyê, peroşiyê(heyecan) dide min.

Di encam de ji bo îro ez dikarim diyar bikim ku me hemû jinên azad re ji bo destpêkirina rojên azad şensek bi dest xistiye. Di vir de piştî mijûlbûneke mezin ji şermbûnê rizgarî hatiye pêkanîn. Me hevgirtineke weke her roj di şer de jî, di aştiyê de jî bi hemû hilberînêran re di hemû xebatan li hemberî dagirkeriyê û çewisînê de bi peroşî parvekirina raveya bi azadiya jiyanê me bi dest xistiye. Li gor min encamê watedar a şoreşan divê pêşketineke wiha nîşan bide. Me weke bi sînor gav avête vî tiştî. Ji ku derê ve lê were

temaşekirin bila were temaşekirin, tê dîtin ku jina pêş dikeve û bi hêz dibe jiyan bixwe ye.

Di dîroka gelê me de ji bo jin û jiyanê heman peyv tê bikaranîn. Lê belê dema ku em tên van rojan ev hatine rewşekê ku bûne du peyvên dijberî hev. Em vê hendefê careke din digrin. Ango em êdî jin û jiyanê digihînin hev. Ev pêşketineke xweşik e. Ji ber vê rojê ez vê pêşketinê li hemû jinan pîroz dikim û her dem serkeftinê dixwazim.

**26 Reşemî 1998**

## BÎRDOZÎYA RIZGARÎYA JINÊ BÎRDOZÎYEKE CIVAKÎ YE

**-** Di vê bernameya me de em rastiya civakî ya ku pêvajoya 8 Adarê pêk hat û bi roja me ve girêdaniya wê çêdikin û nîqaş dikin. Li ser vê bingehê destpêkê em dixwazin van pirsan ji we bikin.

Weke hun dizanin îro ji aliyê jinên Kurd û Tirk ve li Kurdistan û Tirkiyê gelek pîrozbahî çêbûn. Lê belê li hemberî vê jî êrîşeke gelekî tund pêk hat. Destpêkê em dixwazin hizirandinên wê yên di vê mijarê de bigrin, dîsa gelo dê di derbarê 8 Adarê de peyameke we ya çawa ji jinan re çêbibe? Hun wateyeke çawa didin vê rojê?

Dîsa di nava rastiya civakî de têgeha malbatê gelekî tê nîqaşkirin, li ser vê bingehê di nirxandinên we yên di derbarê malbatê de hatine kirin de gengaz e mirov diyar bike ku xwesteka we ya guhertina di nav malbata nava civakê de heye. Gelo pêwîstiya derketina malbata nû dê çawa were pêkanîn? Dîsa bi vê re girêdayî bi taybetî di pêvajoyên dawiyê de pirtûkeke ku di civakê de gelekî tê nîqaşkirin heye. Birêz Mahîr Sayin piştî hevdîtina ku bi Rêberê giştî yê PKK'ê re kir, pirtûkeke bi navê "kuştina zilam" hate weşandin û ev pirtûk di nava civakê de gelekî hate nîqaşkirin. Bi taybetî li ser "divê zilam çawa kuştin?" nîqaş hene. Li ser vê bingehê em dixwazin vê yekê ji we jî bipirsin. Gelo zilamê ku divê were kuştin zilamekî çawa ye?

**Rêber Apo:**

**-** Ger ji mêvanan jî hebe ez dikarim pirsan bigrim.

- Êvar baş, birêz Ocalan, ez dixwazim pirseke wisa bikim. Şikandina pêla şoven a di civaka Tirkiyê de pêş dikeve û pêşketina welatparêziya Tirkiyê li gor we çi qasî derketina holê ya hêza vînê ya jinên Tirkiyê ve girêdayî ye? Dîsa di Tirkiyê de û bi taybetî di rastiya jin de rastiyeke ku xwe bi mafên biçûk esas digre re xwe azad bawerkirin tê jiyîn. Gelo evê ji aliyê jinê ve bi çi bibe mal an jî di xala veguhertina vê de nêzîkbûneke çawa pêwîst e?

**Rêber Apo:**

- Ji ber roja jinê ya kedkar ez tekoşîna azadiyê ya hemû jinên dinyayê silav dikim û ez bawer dikim ku pirsgirêkeke wiha bi rengekî cidî ketiye rojeva tekoşînên civakî. Li gel rojevbûna sosyalîzmê ve li ser bingehê gelekî cidî nêzîkbûna van pirsgirêkan partiya me jî tenê bi rizgariya li Kurdistan'ê ve bi sînor nemaye, di serî de Rojhilat a Navîn ji bo tekoşînên civakî yên nû, di dinyayê de jî di asta jinê de di nava nêzîkbûneke him gelekî bi îdîa him jî afiranderiyê esas digre de ye. Ev jî gelekî girîng e. Berî her tiştî divê mirov behsa bîrdoziya rizgariya jinê bike. Em li pey afirandina vê bîrdoziyê ne. Wisa bi yek du bûyer û yek du çalakiyên ji rêzê ve bi şîrovekirinê mirov nikare ji bin vê derbikeve. Heta ku bi rengekî gelekî lez, pêşketina bîrdoziya rizgariya jinê neyê pêkanîn, her tişt xwe xapandinê wêdetir naçe. Ez bawer dikim ku pêdivî bîrdoziya rizgariya jin a gelekî cidî heye.

Ev bîrdoziyeke tenê di wateya rizgariya zayend de nîne. Xaleke ku fêrbûna sosyalîst heta tehlîla zanistî ya civakê me bîne ye û dê deyne pêşiya me ku wê bîrdoziyeke rizgariyê ya navenda wê jin e bi xwe re dê girîngiyeke mezin ava bike. Weke kesayet hêmaneke ku herî zêde ez li ser hûr dibim jî ev e. Bêguman ev nêzîkbûneke fêmînîst nîne. Jixwe ez bi xwe ne jinek im. Lê belê hizirandineke bi asta jinê û navenda wê jin e, her biçe bîrdoziyekê û rêxistineke ku xwe dispêre vê bi pêşxistinê ez gelekî girîng dibînim. Em ji pirsgirêkên şer re anîna çareseriyê bigrin heta gengazkirina aştiyeke ku xwe dispêre azadiyê pêdivî bi pêşketineke bîrdozî ya wiha heye. Hemû bîrdoziyên ku hetanî niha, bîrdoziyên bi mohra zilam û bi giraniya zilam in, bêguman asta vê ya çînî û emperyalîst dagirkeriyê heye. Lê belê bi rengekî gelekî balkêş, asta vê ya serdestiya zilam jî heye. Tu kes nikare vê înkar bike. Nêzîkbûna serdestiya zilam ku li ser civakê hakim e, her çi qasî ji sedan salan hetanî niha ev her dem veşartibe jî yê ku hindekî rêzê ji zanistê re digrin, hindekî ku pêwendiyeke bilind bi rizgariya jinê, ji ber wê jî li ser bingehekî ku bi wê ve gelekî girêdayî ye, bi rizgariya gelekî ve pêwendîdar in, ne gengaz e ku vê yekê nebînin. Ji ber wê jî evê bi

hizirandina xwe de jî girîngiya pêwîstiya bîrdoziyeke ku navenda wê jin e biafirînin, bibînin.

Di rêbertiyên din ên komûnîst û sosyalîst de ev gelekî kêm hatiye bidestgirtin. Lê belê gelekî bi sînor e û nekarîne ferasetên serdestiya zilam derbas bikin. Di jiyanên xwe de jî di rastî de ji feraseta serdestiyê ya di nava malbata heyî wêdetir neçûne. Mirov dikare vê yekê weke kêmasiyeke sosyalîzmê jî bibîne. Ya ku em dixwazim li vir bînin ziman cudatir e. Ev bîrdoziyeke ferzkirinê nîne. Di pêvajoya rêxistina civakî ya destpêkê ya dîrokê de di rastî de bîrdozî navenda xwe jin bû. Mînak xwedawenda mezin Îştar heye. Di zimanê me de Star –stêrk- ango tê wateya Stêrk û ev xwedawenda destpêkê ye. Di rastî de xwedayê destpêkê xwedawend e. Xwedayên zilam piştre derketine rastê yan jî xwedayan piştre xwe bi rengê xwedayên zilam dadîne holê. Bêguman ev jî bi hilberîngeriya jinê ve gelekî girêdayî ye.

Bi kurtayî bîrdoziya jinê tenê bîrdoziya zayend nîne. Di rastî de bîrdoziyeke civakî ye. Ger em bi vê çerçoveyê nêzîkî van pirsgirêkan bibin, divê em hemû nêzîkbûnên hetanî niha yên di asta bîrdozî de ji ber wê jî rêxistinên aborî, çandî, siyasî û leşkerî ku xwe dispêrin wan di ber çavan re derbas bikin. Ji ber ku xwedî serdestiya zilam in. Ji ber wê jî di naveroka wan de şer, newekhevî û çewisandin heye. Ev jî bi xwe re ketina zayendê tîne. Ketina zayendê jî tê wateya ketina jiyanê. Piştî ku jiyan jî ket, -ku ev di asta jinê de balkêştir e- dîlbûna zayend ku hemû civakê ber bi dîlbûnê ve dibe gelekî balkêş e. Di giştî de dê civak wenda bike û riya şerên har ji serî hetanî dawiyê vebike.

Jixwe girêdaniya şerê îro yê li Tirkiyê bi karakterekî gelekî har de pêş dikeve, bi cewherê wê yê çînî û bi emperyalîzmê re heye. Lê belê girêdaniya vî şerî bi feraseteke zilam ê serdest ku gelekî şoven e jî gelekî şênber e. Ji ber vê sedemê nêzîkbûneke bi rengê “ne dema wê ye, piştre jî dibe” heta dawiyê xelet e. Ger em dixwazin dest bi nêrîneke şoreşgerî heta xebateke civakî ya cidî bikin bi dijwarî pêdîvî bi xebateke bîrdoziyê ya ku asta jinê

esas digre heye. Ez zêde nikarim vê yekê li vir vebikim. Jixwe cihê wê jî ne ev der e. Ji ber roja jinê weke têgeh ez vê diavêjim holê.

Hêmana duyemîn bêguman bi vê ve girêdayî ye. Hemû rêxistinên ku bi giranî zilam in, bêguman divê werin rexnekirin. Tenê rexnekirin ne, her biçe derbaskirina van neçar û jênerevîn e. Weke din dawiya şer jî nayê aştî jî çênabe. Hemû rêxistinên milîtarîst ji sedî sed bi mohra zilam in. Di wir de cihekî jinê, zimanekî jinê û dilekî jinê nîne. Ev jî ji serî hetanî neynokê rêxistinên zordest in, hêzên dijwariyê ne. Ger bal were kişandin, mekanîzmaya van cihan ku jin lê gelekî kêm in, an jî qet nînin, pergaleke ku dijwarî, di asta tirsnak de tê pêşxistin e. Ev jî dîtina me piştrast dike. Saziyên ku serdestiya zilam herî zêde bi tevger in, di serî de dezgehên milîtarîst tê wê wateyê ku amrazên balkêş ên şer in. Ango dijberî aştî û jiyanê ne.

Ger em rizgariya jinê dixwazin, divê ku em saziyên xwe dispêre bîrdoziyên serdestiya zilam bi dijwarî rexne bikin. Perçeyeke vê ya girîng jî malbat e. Malbat jî dezgeheke serdestiya zilam e. Ez dîsa naxwazim li vir zêde vebikim. Lê belê ji bo me ev pirsgirêk gelekî girîng e. Bi taybetî ji aliyê civaka Kurd ve malbat saziyeke ku teqez divê ji pêş çavan re were derbaskirin e. Li gor min malbat, di rastî de bîreke bêbînî ku ketina jin û zilam bi rengekî herî xeter tê pêkanîn e. Her du jî çi qasî ketin e, çi qasî çûne kûraniyê û tarîtiyê nizanin. Zemînê ku hemû pergalên emperyalîst-dagirker û dîsa hemû pergalên şerê taybet xwe tê de pêk tînin malbat e. Divê em vê bi dijwarî di pêş çavan re derbas bikin û rexne bikin. Ev weke têgeh nayê wê wateyê ku em bi temamî malbatê înkar dikin. Em malbata ku pêkhatiye înkar dikin an jî em behsa pêwîstiya derbaskirina wê dikin. Têgeheke wiha girîng e.

Di nava malbatê de dîktatorî, milkiyet ji her cureyê maf û hiqûqê dûrbûna jinê êşên wê û gelekî biçûkdîtina wê heye. Berî her tiştî weke fîzîkî tunekirina wê heye. Tu xwestekeke wê ya cidî nîne. Ji bo vê em behsa hestyariya jinê dikin. Ger hemû şert wiha bin bêguman dê jin were girêdan û dê bibe heyîneke ku bi tenê hestên xwe ve dijî. Ev jî bêrêziya herî mezin a li

hemberî mafê mirovan e, êrîşa herî mezin e. Ji ber vê sedemê ger em dixwazin behsa rizgariya jinê bikin, divê saziya malbatê ku wê dixeniqîne, gelekî cidî were rexnekirin.

Li gel vê rexneyê têgeheke din a ku were pêşxistin têgeha qutbûnê ye. Ev hindekan ji me tengav dike. Lê belê ji aliyê bîrdoziya azadiyê divê em vê xuya bikin.

## Tenê ne ji zilam emê qutbûnê ji hemû kirêtiyên pergalê pêk bînin

- Birêz Ocalan, di vê bernameyê de em dixwazin li ser saziya malbatê jî bisekinin. Di nava civakê de jî ev gelekî tê nîqaşkirin, lê belê di vê xala ku hatine tê de jin û zilamê ku di nava saziya malbatê de cih digrin, ji aliyê xwe ve vî tiştî diyar dikin. Di çarçoveya daxuyaniyên ku hatine kirin de, divê derketinek ji malbatê çêbibe. Hizirandinên bi rengê, “ev derketin bi tenê yekser tevlêbûna şer ve gengaz dibe” hene. Di vê wateyê de ger em ji rastiya ku hemû civak ne gengaz e ku tevlê şer bibin, em tevbigerin, gelo mijara çareseriyê û derketina vê rastiyê hîn kûrkirina wê gengaz e yan na?

**Rêber Apo:**

**-** Jixwe tevlîbûna hemû malbatan a şer ne gengaz e. Ez vê mijarê li ser vê bingehê jî nîqaş nakim. Di asta têgeh de diyar dikim. Her kes nikare vê saziyê derbas bike, hun jî nikarin derbas bikin. Ger hêza we hebûya niha hunê bibana serokekî baş, şervanekî rizgariyê yê baş. Ez jî nikarim derbas bikim ango ez şervanekî dijwar im, lê belê hîn jî ger ez weke rojane bi xwe mijûl nebim, ev dê min jî daqurtîne. Ango pirsgirêkeke ev qasî zehmet e. Weke meseleya kunên reş, bûyereke ku her tiştî dadiqûrtîne. Saziyeke ku ji hezaran salî hetanî niha hatiye.

Em dixwazin pirsgirêka Kurd çareser bikin. Bêguman dema ku ez dixwazim pirsgirêka Kurd çareser bikim, ez bi şervanên me yên ku navên wan nehatine dayîn, ku ji komara tirkiyê û ji hêzê emperyalîst xetertir in ve mijûl dibim. Ez bi xortên me yên egît ên herî navdar ve mijûl dibim. Gelekî

şer dikin, dayîk vê tînin ziman, lê belê hêsan şehîd dikevin. Ez dixwazim pêşiyê li vê bigrim, lê belê çareya li hemberî vê rewşê weke ku dayik dikin girîn nîne. Gelo ji bo çi ketine vê rewşê, ev ciwan ji bo çi bi rengekî nayê hêvîkirin diçine şehadetê? Divê ez vê yekê çareser bikim.

Dema ku ez dixwazim vê çareser bikim, mixabin ez neçar dibim ku li ser şêwazê mezinkirina van ciwanan bisekinim. Mezinbûn jî ji heft saliyê pê ve tam felaketek e. Şêwazê mezinbûnê ya di nava malbatê de îro van kesayetan carekê ve dibe tunebûnê. Bêguman ev êşeke mezin e. Dayîkek ji bo kurê xwe yan jî ji bo keça xwe digrî. Di rastiyê de bi hezaran rêhevalên min ên weke çiya hene. Van tenê di dil de dayîna jiyîn têr nake. Divê van di mêjî de çareser bikin û temenên wan dirêjtir bikin. Ev pirsgirêkeke gelekî mezin e. Ji bo vê jî gelo tiştê ku zilam wisa tune dike ev qasî lewaz dike çî ye? Nikare bihizire, xeteriya li pişt were nikare bibîne. Ez vê hindekî bi malbatê ve girê didim. Ez vê ji bo pêdiviya şerekî çareser bikim, pêk tînim. Di vir de hîn gelek hêman hene. Derdê min bêguman rizgarkirina hemû malbatan an jî gotina “hun hemû werin, bi malbata xwe ve tevlî şer bibin” jî nîne. Ev ne gengaz e jî û pêwîst jî nake. Lê belê emê têgeh û rêber pêş bixin, emê jin û zilamê rêber derbixine holê.

Ger em ji pirsa we kiriye re li bersivê bigerin, ev qutbûneke mezin pêwîst dike. Niha gelek nivîskar dibêjin, ev gelekî zehmet e. Xort û keç dema hatine hejdeh saliya xwe dikevine nava sewdaseriyeke tirsnak û neçarin bikevinê. Ez jî wisa bûm, ango gotina vê ne şerm e. Lê belê ev jî dibe ketin. Feraseta sewdaseriyê ya wiha misoger tê wateya xwarina derbeyeke mezin a duyemîn. Sewdaserî bi xwe qutbûna ji hizir û bi rengekî çavreş ji her cureyê koletiyê re derî vekirinê pêwîst dike. Ev tê wateya ketina mezin a hestyariyê, ketina mêjî ya mezin û jihêzketinê. Rewşa ku piştî zewacê derdikeve holê bi taybetî pirsgirêkên aborî û ketina di asta jiyanê de – bêguman divê mirov qet li çand, huner, asta jiyanê û fîzîkî negere- rewşeke tirsnak e. Xortek û keçeke ciwan dema hatin bîstê xwe, asta wan a di nava hilberîneriya civakê de tune dibe û ev arîşeyeke mezin e. Jixwe ev di refên me de weke mirovên ji me re herî zêde pirsgirêkan derdixin derdikevine

pêşberî me. Ji bo em şervanekî biafirînin, neçariya perwerdekirina ku nayê xeyalên mirovan ji nû ve afirandina dil û weke piralî pêşxistina mejî û heta fîzîk em bikevine nava xebatekê wiha derdikeve holê. Çareyeke ku me ji bo vê peyda kiriye bûyera qutbûnê ye. Lê belê ev gelekî zehmet e.

Vaye em di vê mijarê de ji xwe re şehîdên mezin ên jin esas digrin. Ez her dem dibêjim, rastiya Zîlan, rastiya Zeyneb Kinaci di rastî de ji bo me wasiyetek e. Min ji Zîlanê nexwest ku çalakiyeke wisa bike, lê belê ew bi biryara xwe ya kesî ve çalakiyeke wiha dike. Sê nameyên xwe yên weke wasiyetê hene. Ji bo me ew her dem neçare were balkişandin. Ev her yek manîfesto ne. Çawa were jiyîn û divê çawa were şerkirin, bi hizirandina xwe, bi bîrdoziya xwe, bi feraseta xwe ya rêxistin heta çalakiyê ve datîne holê. Em nikarin bêrêziyê li vê bikin. Rêheval Zîlan jî zewicî bû, lê belê derbeya ku di şexsê xwe de li saziya malbatê daye heye. Dîsa azweriyeke jiyanê ya mezin ku ew dixwaze heye. Vê jî dizane ku divê li hemberî kîjan dijmînî û bi kîjan şêwazê bike. Vê çalakiyê bi bedena xwe bi xwe pêk tîne. Ji aliyê me ve ev bûyereke pîrozbûnê ya mezin e. Bi ji nedîtî ve hatinê axaftin nabe. Di rojên wiha de di rastî de divê ev kesayet werin bi dest girtin. Em van weke kesayetên herî pîroz dibînin.

Ger bal were kişandin xwediyê çalakiya wiha di dîroka mirovahiyê de jî gelekî bi sînor in. Dibe ku ji hejmara tiliyên destekî derbas nabin. Ji ber wê jî em neçar in cihê wê di nava jinên hemû cîhanê de gelekî baş deynin holê û girêdaniya pêwîst nîşan bidin. Ji ber ku ev nirxên pîroz in. Di dîrokê de ji bo van tê gotin, ezîze û ferîşte. Ev kesayetên ku divê di vê astê de werin destgirtin in. Di vir de qutbûneke mezin heye. Tenê ji zilam ne, ji hemû pergalê ji hemû kirêtiyan, ji hemû zincîran qutbûneke balkêş heye. Li gor min ev bûyereke mezin e. Tiştê ku dikeve ser milên me şîrovekirina vê ye, teorîk kirin e û ew kirina sedema fermanekê ye. Ji ber ku encamên ev bûyera pêk hatiye bide me hene. Dibe ku di wasiyeta xwe de di nameya xwe de ev neanîbe ziman. Emê van nameyan hevok bi hevok, peyv bi peyv şîrove bikin, vê ji diliyê nîşan bidin û di xwe de pêk bînin. Naxwe, ji

Zîlanan behskirin dê bibe durûtî ku li gor min hêmaneke herî xeter jî di vê mijarê de durûbûn e.

## Kuştina zilamê klasîk felsefe û bîrdoziya min e

- Birêz Ocalan, we di şexsê Zîlan de di nava tevgera we de jina ku azad dibe vekir. Di vê xalê de di azadbûna zilam de cihê jinê çî ye? Ji ber ku em dizanin di refên we de ew qas jî zilam hene. Gelo di vê xalê de ristê jinê çî ye?

**Rêber Apo:**

- Di vê wateyê de me behsa kuştina zilam kir. Ji bo ku em kesekî zêde tawanbar nekin û di bin gumanan de nehêlin, ez dixwazim zilamê ku min di xwe de pêk aniye vebêjim. Di vê wateyê de ez dibêjim destpêkê min xwe kuşt. Xembarbûna jinan û zilaman qet ne xema min e. Ev ji bo min felsefeyek e û bîrdoziyek e. Li gor wê ez nikarim ji jiyanê bigerim. Dibe hindek vê "bêexlaqiyeke" mezin bihesibînin. Dibe ku hindek jî ji vê re bibêjin "harbûneke" mezin. Ev nêrîna wan e, ji nêrîna wan re rêza min heye. Divê rêza wan jî ji nêrîna min re hebe. Ez ji bûyîna zilamekî weke pergala heyî, nefretê dikim. Ez bûyîna zilamekî wiha weke rewşeke ketî ya mezin, ketîbûn û çavkaniya kirêtiyeke mezin dinirxînim. Di bin navê zilamekî wisa de bi jinekê re bûyîn, ji bo min ji îşkenceyê xirabtir e. Ne gengaz e ku ez bikevim nava jiyaneke wiha. Ez ji vê re dibêjim, ketina mezin, zexta mezin û gihiştina hev a hemû derewan. Ev gihiştina hev a hemû hestên ku lewaz dikin, ketina nava hev a hemû helwestên ku kirêt dikin in.

Hêmaneke din a ku ez di vê mijarê de gelek caran dixwazim bi dest bigrim, dibe ku giştî jî pêwendîdar bike. Hêmanê ku hîn zêdetir ez ji bo Kurdan dixwazim şênber bikim, teoriya nû ya evînê ye. Dema em ji bo Kurdan şerekî pêş dixin, hunê bibêjin ka ev evîn ji ku derê derket? Gelê Kurd gelekî ku ji hezkirinê jî gelekî dûr hatiye hiştin temsîl dike. Hezkirin di asta seyr de hatiye ziwakirin û rûbirûyê komkujiyê hatiye. Hindek mirovên me yên xwe rewşenbîr dibînin hene. Weke hun dizanin rewşenbîr

bi huner û wêjeyê ve mijûl dibin û qaşo dixwazin dilê mirovan şîrove bikin. Dema Kurd bûn mijara gotinê mixabin van qet nasnekirine. Gelo dilê Kurd li ku derê, kengê tune bûye? Gelo dilê di Kurd de dilê kê ye? Gelo ev hest hestên kê ne? Gelo ger giyanek hebe giyana kîjan biyanî ye û kîjan xulamî ye? Gelo kîjan bêwijdanî û kîjan neçarî ye? Divê ev werin vekirin.

Gotina ku Ehmedê Xanî ji beriya vê bi sêsed salan gotiye hîn jî ji bo min girîng e. Dema ku wî pirtûka xwe dinivîsand, ev got, “ji bo ku ez bibêjim evîn, irfan û zanistiya Kurdan jî heye, ez vê pirtukê dinivisînim.” Ev gotineke girîng e. Ger bal were kişandin, wê demê ji bo Kurdan behsa pêwîstiya evînekê û îrfanekê dike. Niha tiştê ku ji sêsed salan hetanî niha hebû jî wenda bû. Wisa ye ku di Mem û Zînê de jî evîn pêk nehatiye. Li wir her du jî mirine û şewitîne. Heta bi qasî ku nikaribin di nava rastiya civakî ya wê demê de biaxivin hêjar in. Niha pirsgirêkeke me jî ya wiha heye.

Hun dibêjin zewac û malbat, ez jî ji we re vê dibêjim, gelo bêyî evîn û bêhezkirin jiyan çêdibe? Li gor ku nabe yan jî li gor ku evîn hatiye qetilkirin, gelo emê vê çawa biafirînin? Gelo zilamên me û jinên me çawa dihizirin? Ez bi vê xemgîn dibim, heta dizinixim. Di serî de min malbata xwe jî rexne kir. Li ser vê bingehê ez bi dayika xwe re jî, bi bavê xwe re jî pev çûm. Min got ev malbateke çawa ye? Piştre min lê temaşe kir dît ku ev çîroka hemû civakê ye. Lê belê gelo ma em stûyê xwe li vê bitewînin? Gelo em ji jiyanê, ji azweriya jiyanê û evîna wê bigerin? Gelo yê wê demê çawa bibe? Hun li dîrokê temaşe dikin, jiyan bi temamî ji destên me hatiye girtin. Lê belê em di roja me de dixwazin bijîn. Ez kesekî ku azweriyên xwe yên mezin hene û xweşikbûneke mezin digerim im. Lêgerîneke min a xweşikbûnê jî heye. Lê belê gelo ezê vê çawa bi dest bixim, çawa bijîm? Ez vê di wateya çors de, di wateya madî de nabêjim, ev bi serê xwe pirsgirêkeke bîrdoziyê ye.

Ez pêwîstiya afirandina hindek tiştan dibînim. Bi hezaran keçên ciwan derketine çiyan. Di rastî de ew li evînê digerin, lê belê nizanin dê çawa bigihên wê. Ger tevdîreke me ya gelekî taybet nebe, ez bawerim ku ew fermandarê zilam ê li ser serê wê ji eşqiyayê serê çiyan zêdetir jinê

biperçiqîne. Ev niha pirsgirêkeke girîng e. Ji ber ku tê gotin, “emê herin welat, derkevin serê çiyan azad bijîn û şer bikin” lê belê yekî ku dizane rêhevalê wê ye, bi qasî nirxa ji jineke sukê re tê dayîn nirxê nade jina gerîla. Ji ber ku zilam nezan e, bêhest e û fêm nake. Ji ber fêm nake jî, ji jinê re dibêje, “here bimire, tu bela serê me yî, tu li ser pişta me bar î.” Divê mirov van jî bîne ziman. Zîlan wisa xwe bi xwe dernekete holê. Di refên me de şerekî dijwar a ku dişibe vê heye. Ez nabêjim afirandina zilam hêsan e.

Me YAJK ji bo ku di wateya çors de şer bike ava nekir. Ev yek bila şaş neyê fêmkirin. Zilamê derveyî me jî na, ji bo zilamê di nava me de bînin rê me ava kir. Dema ez dibêjim anîna rê, behsa hindekî guhertin û veguhertina wî dikim. Zilam bi qasî neynokekê naxwaze nêzîkbûna xwe biguhere. Min behsa evîn û hestê kir. Ev zilam li hemberî jina herî azad jî nizane rêzdar be. Gelo ezê vî zilamî çi bikim? Hindek wijdana min heye, ez van zilaman layiqê jinên me nabînim. Ji ber ev zilamê bûye bela serê xwe dixwaze weke elxema bêserûber bi serê jinê de biteqe. Hêza wî têra dijmin nake, plana çalakiyeke cidî û rêxistinê nikare bi pêş bixe. Gunehê wê diavêje ser milên jina li kêlekê ye, dibêje “li pêşiya şer tu bûyî asteng.” Nikare jiyanê dahûrîne, hestên wî zêde pêş neketine, bi ajoyên xwe û dema derfet dît xwe dispêre erkên xwe û dixwaze hêrsa vê ji jinê derbixe. Ev pirsgirêkeke cidî ye. Divê em vî zilamî veguherînin. Tevdîreke herî çors a ku me girtiye jî di vê mijarê de rêxistinkirina YAJK ê ye.

Di demên dawiyê de min ji jinan re got, ez jî di nav de xwe li hemberî me baş rêxistin bikin. Ji ber ku ez di rastiya me bi xwe de zilam xeter dibînim. Hîn jî zilam neguhertiye û veneguhertiye. Di asteke ku wekhev, azad, rêzdar û hindekî jî bi hezkirin nêzîk bibe de nîne. Ango min got ez zilamekî çarîkek im. Ez vê yekê her dem dibêjim. Çi bikim ez xwe dikarim bi tenê ev qasî pêş bixim. Ji bo jineke ku divê wekhev û azad bijî ez xwe di rewşa zilamê çariyek de dibînim. Temenê min her diçe zêde dibe, ez çi bikim dîsa jî ez yekî wiha me. Hun dibêjin rêber, serok lê belê rastiya min ev e. Ez zêde nikarim xeyal, hêvî û dinyayên jinan bixemilînim. Rexmî ku ez ev qasî şer dikim û ji bo jinan ev qasî hewl didim, ez dikarim vê encax ev qasî bikim. Ji

bo wê min got, li hestên xwe hikum bikin. Ger gengaz be, xwe rêxistin bikin, ger gengaz be ji bo guhertina vî zilamî hindekî hêzê tevlî hêza xwe bikin. Naxwe, zalim û neçar nikarin tiştekî bidin.

Dema YAJK hindekî were rêxistinkirin, zilam weke berê nikare êrîş bike. Bi xwe spartina hêza xwe ve nikare bibêje, “ez bi hêzê nêzîkê vê keçikê bibim.” Me ev yek şikand û ev pêşketineke girîng e. Hun dibêjin we malbat çawa çareser kir? Vaye me wiha çareser kir. Li gor min divê êdî zilam li ber xwe bide. Li şûna ku jinikeke erzan bibîne yan jî li pey jinikeke erzan bireve, vaye li holê rastiyeke Zîlanê heye. Zîlan jineke xwedî nirx e, mezin serî hildaye, çalakiya xwe ya mezin daniye. Nivîsa xwe jî nivîsiye, sonda xwe jî xwariye û pêk aniye. Ez her roj dibêjim, ezê ji vê rêhevala jin re rêzdar bim. Dibe ku hun vê ji bîr dikin an jî ji bîr bikin lê belê li holê wasiyetek heye. Di vê wateyê de ez nikarim dest ji pêwîstiya sadiq mayîna wasiyetên şehîdan berdim. Ez dibêjim hunê li gor vê tevbigerin, ev jî karekî gelekî zehmet e.

Nakokiyek derdikeve holê, gelo qutbûn dê bibe tevlîbûna nû, yan jî parvekirina nû? Ger dê bibe, zilam neçare xwe zane, azadîxwaz, bivîn û bi serkeftinê biafirîne. Her dem ez vê mînakê didim. Ger we bal li hêlînên çûkan kişandibe, dema destên mirovekî li wê hêlînê yan jî li hêka di hêlînê de ye bikeve hunê bibînin ku ew çûk wê hêlînê dihêle. Yê me yek cihekî me yê nehatiye dagirkirin, bihostek axa me nemaye. Ger mêjiyekî bi qasî mêjiyê çûkekî hebe, her hal dê bizanibe ku di vê hêlînê de wiha malbateke binamûs nayê avakirin. Divê hun vê yekê bizanibin. Dema em vê rastiyê dibêjin, dê bibêjin “wey ma gelo em nejîn” em bijîn, lê belê em vê rastiyê jî bibînin û çareser bikin. Gelo em çareser nekin dê çi bibe? Vaye Kurd nikare di axa xwe de bisekine. Vaye her kes digrî. Yek kesekî ku dibêje “ez Kurd im, ez dixwazim azad bijîm, ez xwedî rûmet im” jî nemaye. Ez ji we re gerîla vedibêjim. Bi zehmetî dijîn. Wê demê em xwe bi xwe înkar nekin, azad bijîn. Lê belê rastî jî li hemberî me ne. Ger ji vê re hêza we ya çareseriyê nebe, hun nikarin di mayîna welatê me de bi zanebûn û vîna xwe ve di têkîliyên azad de israr bikin.

Gelo emê keçikan çawa bidin jiyîn? Ev bi pereyan nabe, pere zordestî ye. Mal û milk kirin e û bûyereke ku her dem li dijî jinê tê bikaranîn e. Gelo ma em qet nejîn? Vaye di vir de pêdivî bi teoriyeke evînê, teoriyeke hezkirinê ku gelekî zehmet e heye. Divê mirov dil bi pêş bixe. Ger gengaz be, divê jinên me jî xwe nas bikin û bibin xwedî nasnameyê. Mînak ez jî di nav de divê zilamê me yê din teng nebin, zelal bikaribin bibêjin ku zilamekî çawa dixwazin? Ev him maf him jî erka jinê ye.

Zilam ji pergalê maye kevneşopekî axa yan jî beg e. Li gor bîrdoziya feodal a li gel me her zilam xwe datîne şûna axa yan jî reîs. Mafê weke dixwaze lêdana jinê, dijun dayîna jinê di nava erkên xwe de dibîne. Ez nikarim vê bi tena serê xwe derbas bikim. Divê jin xwe rêxistin bikin. Madem hun jiyaneke ku xwe dispêre wekhevî û azadiyê dixwazin wê demê divê hun bedelê wê jî bidin. Divê hema çûyîn û mirin di dest de çek xwesteka xwe peyitandinê nebe. Hunê projeyên xwe, di derbarê zilamekî çawa yan jî hun dixwazin bi zilam re jiyaneke çawa bijîn de pêş bixin. Lê belê ger hun balê bikişînin civaka serdestiya zilam, zimanê jinê jî jêkiriye. Bavê we û dayika we dibêjin “min ji te re mêr peyda kir” ev di bûrjûvayan de jî wisa ye. Di wan de şêwaz hindekî guhertiye. Keçik li pereyê yan jî li mûçeyê zilam temaşe dike, ger rewşa wî di cih de be, bi rengekî ku ji keçikeke gundî xirabtir diçe û direve wî. Di vir de bûyereke jiyanê ya ku xwe dispêre projeya azadiya jinê nîne. Ji ber roja jinê weke hêmanên herî balkêş mirov dikare van diyar bike.

## Jina ku xwe rêxistin kiriye zilamekî ku nikaribe bîne rê nîne

- Birêz Ocalan em dixwazin di vê xalê de vê bipirsin. We got bila jin modela zilamekî çawa dixwaze xêz bike. Gelo di refên we de jin di wê hêzê de ye ku vê gavê vê modelê xêz bike?

**Rêber Apo:**

- Ger di wê hêza ku vê modelê xêz bike de bûya, ezê jî bi wan jinan re nêzîktir jiyîbama. Qet şerm nîne bi jineke xweşik re jiyîn, tiştekî xweşik e. Lê belê ev jî bi tenê bi şer ve tê afirandin. Ev jî bi şerê çors ve ne, di hest de, di hizirandinê de bi taybetî di rêxistinê de û heta di bûyerên estetîk huner de ji afirandina estetîk re derbas dibe.

Ez zilamê herî baş dibînim devê wî jî bêhn pêketiye, ji ajoyên wî wêdetir tu tişt nîne. Ez di jinê de hindek aliyên erênî dibînim. Jin li hemberî jiyanê hîn xwedî feraset e, hindekî din xwedî wijdan e. Di zilam de ev gelekî xirab ziwa bûye. Gelo hunê bi vî zilamî re çi bikin? Ger jixwe ne kole be, yek jineke ku ji malbata xwe gazindan neke nîne. Ez dihizirim ku ev dê bi tekoşînê çêbibe. Ez teoriya evînê vala nabêjim. Divê mirov van gotinan zêdetir fêm bike. Teoriya evînê teoriya şer e. Ger em kêm zêde pirtûka Ehmedê Xanî şîrove bikin, di wir de destana evînê tê nivîsandin. Lê belê encam şewat e. Wê ji devê wî gotina evînê derbikeve lê belê ev dê wî bişewitîne. Mem kurê begekî mezin e, lê belê di nava neçariyekê de ji weremê dimire û diçe. Ev nêrîneke ku divê biçûk neyê dîtin. Tiştê ku ji sêsed salî pê ve heye jî ji dest çû. Li şûna wê şêwazê moriyan, şêwazê jiyana cuceyan ma. Ez nikarim ji van re jî bibêjim jiyan.

Rêza min ji jiyanê re heye. Jixwe taybetmendiyeke me ya herî mezin ku me wenda nekiriye jî rêzdayîna jiyanê ye. Ez bi tenê dikarim vê yekê bikim. Divê ji min zêdetir tiştek neyê xwestin. Jin fedakariyên gelekî mezin dikin û girêdaniyeke di asta balkêş de nîşan didin. Dîsa fedayiyê herî mezin ji nava jinê derdikeve. Ew xwe çawa dişewitînin, bi xwe parastina me ve bi rengekî gelekî balkêş nîşan da. Dîsa yê ku herî kêm direvin jin in. Rexmî vê ev têr nakin. Ev girêdanî min jî gelekî tengav dike. Tiştê ku ez bikaribim bikim, bi şêwazekî rasteqînî jinê hindekî din bi hêzkirin e. Dema em dibêjin bihêzkirina jinê ez behsa ji aliyekî çekdayîna destan, ji aliyekî avakirina artêşa wê, ji aliyekê jî pêşxistina bîrdoziya wê dikim. Em rêxistina wê ya xweser pêş bixin jî ev hemû jî têr nakin. Em kêmasiya jinê derbas dikin. Heta ez dibêjim, em fîzîka wê jî bi pêş bixin.

Lê belê ev yek jî têr nake. Ez dibêjim dê zilam çi bibe, gelo em zilam çawa bi pêş bixin? Ev jî tê wateya belayeke duyemîn anîna serê xwe ye. Ev şer e, bûyera ku ez dibêjim evîn e jî ev e. Weke din em nikarin Kurd biafirînin. Ji ber ku Kurd hêjar e, herî axa û begê wî noker e û lêyîstok e. Qaşo zilamê herî baş bûrokratek e, yekî ku her tiştî bi pênc qirûşan difroşe ye. Yên li şûn dimînin, mirovên weke me ne. Ji me jî encax ev qas derdikeve. Ji bo Kurd jî ez tiştekî din nikarim peyda bikim.

Li Stembolê hindek jinan çalakî kirin. Dijmin jî êrîşî wan jinan kir. Di wir de xala ku were cihêkirin, jina ku radibe azadiyê dizane. Emê wateya weke taybet êrîşkirina wan a van jinan di vir de bi dest bixin. Em dizanin ku êrîşê wêrekiya jinan jî dikin. lê belê ev ji bo me ne tu tişt in. Îşkence ji bo me di plana duyemîn de ye. Evîn bi xwe tê wateya êşa herî mezin. Lê belê ev ji bo me divê zehmet jî pêwîst e ku hun vê bibînin.

Ji ber vê rojê di serî de jinên me yên di nava êşan de digevizin û di nava zehmetiyên mezin de ne û diyariya herî binirx ez bidim hemû jinên me deriyekî jiyanê ku hêza azadiyê ya di hemû dîroka xwe de wenda kirine bikaribe bide vekirin ango hêviya jiyanê bi azadî dayîn e. Di vê mijarê de pêwîst nake mirov zêde lez bike. Çawa ku hun jiyana xwe feda dikin û yekcar mirinê didin pêş çavên xwe divê hun bi heman rengî hêza berxwedanê ya di riya jiyaneke ku azadiyê gengaz dike de nîşan bidin. Dema em dibêjin, hêza berxwedanê ez nabêjim her roj bi zilam re şer bikin. Zimanekî vê, zimanekî vê yê hunerê heye. Zimanekî vê yê rêxistinî, zimanê kişandinê, zimanê kirêtiyên xwe binxistinê heye. Zimanê jinbûna xwe, xweşikbûna jinbûna xwe afirandinê heye. Dema ku jinekê xwe piralî, xweşik, birêxistin û bi plan kir, zilamekî ku ew neyne rê namîne.

Em dixwazin vê di asta YAJK ê de bi pêş bixin. Hêzeke YAJK ê ya du hezar û pênsed kesan, di serî de zilamên PKK'ê dê hemû zilamên di civakê de bîne rê. Ez bi vê bawer dikim û bi jinê bawer dikim. Weke rêhevalên xwe yên jin ez van bi pêş dixim. Hindek ketî îdîa dikin ku min "harem" ava kiriye. Bila ev ketî biteqin. Jinên ku herî zêde em jê hez dikin, li çiyê ne û gelek ji wan jî weke Zîlan gihiştine şahadetê. Ev jinên me ne. Lê belê bi

rastî jî jinên egîd in. Emê bi van jinan re bijîn, weke din bi tu kesî re najîn. Ji ber ku em zilamê van jinan in. Ez ji ber vê rojê ji diyarkirina vê jî kêfxweş dibim: tenê yê jinekê ne, bûyîna zilamê jinên wiha bi rastî jî kêfxweşiyekê dide min. Jinên me, keçikên me, dayikên me, me wiha qebûl dikin, ev gelekî xwedî nirx e. Xweziya gelek zilam wiha bûna! Ger wiha bûna dibe îro jiyan bi temamî biba ya jinan. Ji vê re bi dijwarî pêdivî heye. Ez dilên dayikan, azwerî û hêviyên keçên me gelekî baş dizanim. Ji ber ku ez van dizanim, hetanî vî temenî min anî vê rewşê.

Dema em dibêjin, tevgereke dil a mezin divê hun vê yekê fêm bikin. Divê zilamên me jî hindekî vê fêm bikin. Ango ji ber ku hindekî hêz û erk kete dest, ji ber jin lewaz e, divê hestên xweşik ên jinan û heta fîzîka wan xirab nekin. Divê hindekî wate bidin jinê, heta jinê pêş bixin û wê biçûk nebînin. Gotina "sedî sed malê min e, ez bixwazim lê didim, bixwazim dijûnan jê re dikim" ne rast e. Herî tiştê baş tu bikî, jina te be jî tu çi qasî wê bi pêş dixî ye. Ez her dem vê dibêjim. Karê min, pêşxistina jinikê nîne, pêşxistina jina azad e.

Pêşxistina jina azad îbadetek e. Hindek Hz. Mihemed rexne dikin, lê belê li gorî min di wî de jî ziraviyeke girîng heye. Tê gotin Hz. Mihemed bi gelek jinan re zewiciye û sêzdeh cariyeyên wî hene. Ev yek tê wateya teng girtina dest a bûyerê ye. Di wan şertan de jin biçûk tê dîtin û zarokên keç zindî tênê binaxkirin. Pêşketineke Hz. Mihemed a ji aliyê hezkirina jinê ve heye. Dibe ku armancên wî yên siyasî jî hebin. Lê belê diyar e ku gelek qîmetê dide jinê jî. Ji ber ku emê wî wisa bikin ku bila kesek me tawanbar neke. Ez dixwazim diyar bikim tawanbariyên ne cih de jî bêwate ne. Piştre di Ebasiyan de, di Emewiyan de û di Osmaniyan de harem hatiye pêşxistin. Em wisa nînin, hemû jinên me weke tê dîtin, jinên şervan ên herî dijwar in. Ango di vê wateyê de jinên me qebûl nakin ku destê zilamekî jî li wan bikeve. Ango ger zilam zordest be, kirêt be û azadiya wî ne zelal be, jin wî zilamî qebûl nakin. Di PKK'ê de rastiya exlaq ev e. Ev dê me bibe jiyana nû, saziya malbatê ya nû ku tê qebûlkirin û xwe dispêre wekheviyê û azadiyê, şêwazê têkîliyê û feraseteke dinyayê ya hevpar. Ezê nebêjim, tenê

saziya malbatê jî dê bibe ji nû ve rizgariyeke civakî. Ev gelekî pêwîst e û projeya jiyanê jî ev e.

Ji ber vê rojê divê em xwe tenê pîrozkirina jinê û bi tenê li ser wan axaftinê ve têr nebînin. Divê em vê rojê weke roja ku pêwist e em projeyan ava bikin, xeyal û evînên xwe yên jiyanê pêş bixin binirxînin. Lê belê divê em rasteqîn bin. Ji bo careke din ji bîr nekin vê bikin. Jinên me hindekî wiha ne. Jixwe em jî hindekî bi vê ve dijîn. Her zilam cureyekî dijî, ez jî hindekî wiha dijîm. Zilamekî din jî dê bibêje "bila jina min be, sedî sed a min be, encax ez bi wê re dijîm" ez jî dibêjim ku ger artêşa min a jina azad nebe ez nikarim bijîm. Ev azweriyek e, evînek e. Jina bihêz, egît, rêxistinkirî, xweşik a ku zimanê wê, vîna wê û şerê wê heye xwedî nirx e. Egîdî bi tenê di nava nêzîkbûneke wiha de çêdibe.

Ger zilamek bibêje "bila jin sedî sed a min be, ez li wê bidim, dijûnan jê re bikim" ev li gorî min bêexlaqiya herî mezin e. Ev li mafê mirovan jî êrîşeke mezin e. Jin ev qasî dibe ya te gelo tu ji bo çi ew qasî nabî ya wê? Ew ji sedî sed a te ye, lê belê tu ji sedî yek jî ne ya wê yî. Ger te zimanê wê jêkiribe, te vîna wê şikandibe, weke aborî bi te ve girêdayî be, di vir de zordestiyek, dîktatorî bi xwe heye. Gelo ezê zilamekî gelekî zordest, gelekî newekhev gelekî bêrêz çi bikim? Ez dibêjim vî zilamî qebûl nekin. Ev nêrîneke rast e. Ji ber vê rojê ji jinên me ev xwestin li gor min nêzîkbûneke baş e û divê em di vê de israr jî bikin. Weke din bihêzkirina jinê misoger ne gengaz e.

Heta ku jin bihêz nebe, jiyan rizgar nabe. Her dem tê gotin "ez xwedî hestên wisa me" belê, divê mirov xwedî hestan be, lê belê li hemberî kê hest, hestên çawa, dê kî parvebikin? Piştî wê hun nizanin, nikarin ber pozê xwe bibînin. Ez jî di nav de rastiya me ya zilam vekirî daynin holê. Em weke hun bawer dikin nînin. Em jî hîn ne gihiştine nasnameya wekhev û azad. Gelo ev yek bi çi gengaz dibe? Divê nîqaş hebe, heta dawiyê hun bikaribin zimanê xwe bi kar bînin, vîna xwe bihêz bikin û bîrdoziya xwe ava bikin. Ev yek mafê we ye. Ji ber ku bîrdoziya jinê di civaka komûnal a

xwezayî de serdest û bihêz e. Di rastî de xwe dispêre hilberînê jî. Divê mirov niha jî vê yekê biceribîne.

Hindek ji bihêzbûna jinê ditirsin. Di rastî de ji jina bihêz tirs nabe. Berovajî mirov ji jina lewaz bitirse. Bi tenê jinên nexweş û hundirê wan vala ne, dikarin xeter bin û sîxur in. Ji vî alî ve divê mirov hemû jinên ku hundirê wan vala ne, sîxurê objektîf îlan bike. Ev hêzên çînên serdest, dagirker û nokeran ên sîxur in. Divê mirov li hemberî vê jinbûnê jî şerekî dijwar bide. Jineke ku hundirê wê vala ye, ji jineke ku xwe bi hestên xwe yên erzan ve derbas dike dê bibe sîxurekî xetertir. Ez behsa sîxuriya objektîf a pergalê dikim. Jinên wisa sîxuriya objektîf a pergalê temsîl dikin, bêguman ger jin şiyar nebin, xwe rêxistin nekin, evê bibe xeteriyeke mezin. Pêdîviya hemû jinên me bi vîneke diyar hilbijartina tekoşîneke diyar heye. Naxwe, dê ji dijmin xetertir bin.

## Divê jiyan li ser bingehê bîrdoziya rizgariya jin were pêşxistin

- Birêz Ocalan, we behsa pêwistiya  zelalkirina bîrdoziya jinê bi xwe kir. Di vê wateyê de bîrdoziya di derbarê jinê de gelo dê çawa pêk were?

**Rêber Apo:**

- Îro ez ji aliyê jinê ve diaxivim. Gelo ev bîrdozî pêk were dê çawa be. Ger dê Kurdistan bibe mijara gotinê yan jî ger em bibêjin di axên dayîk de jiyan a herî xweşik e, berî her tiştî bîrdoziya jinê bê ax nabe. Heta vebûna axê ji çandinî û hilberînê re, hindekî bi hunera jinê ve girêdayî ye. Tê wê wateyê ku rêgeza **yekemîn** a bîrdoziya jinê jiyîna wê di axa ku jê ji dayikbûye de ye. Ango rêgeza yekemîn bi gotina rojane ve welatparêzî ye.

Hêmanê **duyemîn** ger ê di jiyanê de cih peyda bike, divê jin bi hizra xwe ya azad û vîna xwe ya azad ve tevlî jiyanê bibe. Ger dê ev bîrdozî pêk were, weke raveyekê vê ya herî şênber jin, weke dixwaze dijî û biryarê dide. Emê bi, bi hizirandina wê bawer bin. Emê li hemberî vîna wê rêzdar bin. Rêgezeke vê bîrdoziyê ya jêneger jî ev e. Ev yek ez jî bim dê jin bibêje “ezê

bi te re bi vîn û hizra xwe ve bijîm." Li gel vê dê gelekî bi rêgez, gelekî bi proje û bi plan be. Di vê rêgezê de ezê hindek avantajên xwe ve jinê bixapînim, ew jî bi jinbûn û zayendîtiya xwe ya erzan ve min bixapîne re cih nîne.

Ji bo ev yek çêbibe û ji bo parvekirina jiyaneke xwe dispêre azadiyê, rêxistinbûn pêwîst e. Ev jî hêmana **sêyemîn e.** Mirovekî ne rêxistî hîç e. Rêxistinbûna destpêkê bi jinê dest pê kiriye. Hêza ku herî zêde divê rêxistinbûnê esas bigre jin e. Dibe ku zilam bêrêxistin be. Yan jî jixwe rêxistina zilam gelek e. Divê jin rêxistina xwe ya taybet ango bi giştîkirina YAJK ê re pêwîstiya xwe heye. Divê saziyên xwe yên hişyariyê li hemû qadan belav bike. Divê jin bi rêxistinbe. Divê hun vê carekê ji guhê xwe re bikin guhar.

Weke hêmanê **çaremîn** jî li gel rêxistinbûnê divê hun hemû jiyana xwe ji tekoşînê ava bikin. Ji ber ku nasnameya jinê ji ber bêtekoşîniyê ketiye nava çar dîwaran. Karên hevîr dane wê bi karên ji rêzê ve hatiye mijûlkirin. Ango di nava ferzkirineke weke kesayeta karên vala hatiye hiştin. Ji ber wê jî di serî de esasên bîrdozî û polîtîk di derbarê rêxistinbûnê çandê, kurtayî her qadeke ku wê bihêz bike de divê tekoşer be, divê jin bibêje "ezê rêxistinêr bim, kar û îşê min tekoşînkirin e."

Li gor min têkîliya jiyana bi jinê re bi estetîk, xweşikbûnê ve jî heye. Ev jî hêmana **pêncemîn** e. Asta kirêtiya jiyanê ya vê gavê têkîliya xwe bi çewisandin û dagirkeriyê ve balkêş e. Divê jina ku dixwaze bijî, huner, çand û estetîkê ji nedîtî ve neyê. Em ji fîzîka wê bigrin xweşikbûna hizir, em ji xîtaba wê bigrin, heta ronahiya giyanî divê bi nêrîneke estetîk û rêgezê ve girêdayî be.

Ger hun van pênc rêgezan jiyaneke ku van bi rengê madeyan û rêgezan hîn jî ziravtir bikin û wê jiyanê ji xwe re esas bigrin, li gor min tê wateya ku we çeka rizgariyê ya herî mezin bi dest xistiye. Ez ji ber roja jinê diyar dikim ku bi vê çeka xwedî îdîaya herî mezin e ve tu zilam û tu saziyên ku hun neynin rê nîne. Li gor min jiyana herî xwedî nirx e. Ger em dibêjin, ji îro re girêdanî, ji îro re rêz li ser bingehê van rêgezan mînak di me de bi

rengê YAJK ê rêxistineke jinê ya hîn bilindtir dibe û tekoşîna wê ya li ser bingehê van rêgezan ve emê bersiva herî mezin bidin mirovahiyê û şerê qirêj.

Ji ber vê rojê careke din ez diyar dikim ku ez di xizmeta hemû jinên azad de me. Dîsa di serî de dayîk û taybetî hemû gerîlayên me yên jin ên egîd ku şer dikin re, diyar dikim ku ez mirovê hemû jinên me yên di nav tekoşînê de ne me û zilamê wan im. Rêz û hezkirinên xwe pêşkeş dikim.

**8 Adar 1998**